Türkiye Caferileri Sitesi

بسم الله الرحمن الرحيم

Bi Navê Xweda yê Rehman û Dilovan

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi

**SÛRETÊ KEWSERÊ**

Bi navê Xweda yê Rehman û Rehîm
Bêgoman me Kewserê daye te. Îcar ji
Rebbê xwe ra nimêj bike û dema tekbîr digirî,
desten xwe jî heya qiriqa xwe rake. Bi rastî yê ku
ûrtkor û nifşebirî ye, ewê ku rikdar û kîndarê te ye.

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi

Îmam Xumêynî

# Şîroveya Çil Hedîs

**Wergêr:**

Seyyid Alî Husêyniyê Bohtî

KEWSER

https://t.me/caferilikcom

www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi

**Navê Orîjînal:** Şerhê Çêhêl Hedîs

**Navê Kitêbê:** Şîroveya Çil Hedîs

**Nivîser:** Îmam Xumêynî

**Wergêr:** Seyyid Alî Husêyniyê Bohtî

**Tîprêzî:** Seyyid Seccad Husêyniyê Cûdî

**Çavdêriya Dawî:** Mucteba Subhî

**Rûpelsazî:** Hesen Başbux

**Çapxane:** W

**Dîroka Çapê:** 25/05/2013

ISBN: 978-605-4792-01-6

Navnîşan:
Weşanên Kewserê
Sofular Mah. Simitçi Şakir Sok. No: 14 / 1
Fatih – İSTANBUL
Tel: 0212 – 534 35 28 / 555 16 66
Faks: 0212 – 631 36 01 / 555 22 12
www.kevseryayincilik.com

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi

# PÊŞGOTIN

Bi navê Xweda yê rehman û dilovan. Hemd û sipas ji Xwedayê xweyîker ê alemê ra û selewat li ser Muhemmed û alê wî hemûyan. Û dûriya ji rehma Xwedê jî ji dijminên wan ra heta roja qiyametê.

Ey Xweda, neynika dil bi ronahiya îxlasê ronahî bike; û jenga şirk û dubîniyê ji sefha dil pak bike; û rêka fireha bextewerî û xilasiyê nîşanê van jaran bike ku li çolan şaş mane û di rê da winda bûne. Û me bike xweyê exlaqê hêjayî; û me behremend bike ji wan cilwe û bêhnên taybet ê welî yên dergahê xwe; û leşkerê şeytan û nezaniyê ji memleketê dilê me derîne; û leşkerê zanîn û hikmet û rehman di şûna wan da deyne; û bi hezkirina ji xwe û xewasên dergahê xwe, me ji dinyayê derîne; û di wextê mirin û piştî wê bi rehma xwe miameletê gel me bike; û dûmahîka karê me digel bexteweriyê hevrê bike. Tu bi heqê Muhemmed û alê wî yê pak bikî, selewat li ser wan hemûyan bin.

Piştî vê hemd û selewat û duayê, çendek bû min ê zeîf nekarî, di dil da hebû û ji xwe ra digot ku çil hedîs ji hedîsên Ehlê Beyta pak (a.s) ji kitêbên cihê pê baweriyê ji kitêbên zanayan (Xwedê ji wan razî be) berhev bike û bi awayekî ku xelk behrê jê bibin, bi wê minasebetê şerh û şîroveyekî bike. Û ji ber wê yekê bi zimanê Farsî nivîsiye ku Farsîziman jî ji wê behremend bibin; da belkî ez ber hedîsa şerîf a Pêxember (s.a.a) bikevim ku kerem kiriye: “Kesê çil hedîsên behre jê bên girtin, biparêze, wê li ber heşrê zana û feqîh be”.

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi



Hemd û sipas ji Xwedê ra ku paşî ra min karî û li hev hat ku ez dest pê bikim. Û ez ji Xwedê Teala daxwaz dikim ku temam kirina wê ji min ra li hev bîne.

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi

## HEDÎSA YEKÊ

خبرنى أجازة، مكاتبة و مشافهة عدّة من المشايخ العظام و الثقات الكرام منهم الشّيخ العلاّمة المتكلّم الفقيه الأصولى الأديب المتبحّر الشّيخ محمّد رضا آل العلاّمة الوفى الشّيخ محمّد تقي الاصفهانى أدام الله توفيقه- حين تشرّفه بقم الشّريف، و الشّيخ العالم الجليل المتعبّد الثّقة الثّبت الحاج شيخ عبّاس القمى دام توفيقه- كلاهما عن المولى العالم الزّاهد العابد الفقيه المحدّث الآميرزا حسين النوري نور الله مرقده الشّريف- عن العلاّمة الشّيخ مرتضى الأنصارى، قدّس الله سرّه. و منهم السيّد السّند الفقيه المتكلّم الثّقة العين الثّبت العلاّمة السيّد محسن الأمين العاملي، أدام الله تأييداته، عن الفقيه العلاّم، صاحب المصنّفات العديدة السيّد محمّد بن هاشم الموسوي الرضوى الهندى، المجاور فى النّجف الأشرف حيّا و ميّتا، قدّس الله سرّه، عن العلاّمة الأنصارى. و منهم السيّد العالم الثقّة الثّبت السيّد أبو القاسم الدهكردي الاصفهانى، عن السيّد السّند الأمجد الآميرزا محمّد هاشم الأصفهانى، قدّس سرّه، عن العلاّمة الأنصاري (و لنا طرق أخري غير منتهية إلى الشّيخ تركناها) عن المولى الأفضل أحمد النّراقى، عن السيّد مهدي المدعوّ ببحر العلوم صاحب الكرامات، رضوان الله عليه، عن أستاد الكلّ الآقا محمّد باقر البهبهانى، عن والده الأكمل محمّد أكمل، عن المولى محمّد باقر المجلسي، عن والده المحقّق المولى محمّد تقي المجلسي، عن الشّيخ المحقّق البهائى، عن والده الشّيخ حسين، عن الشّيخ زين الدّين الشهير بالشّهيد الثانى، عن الشّيخ علىّ بن عبد العالى الميسي، عن الشّيخ شمس الدّين محمّد بن المؤذّن الجزينى، عن الشيخ ضياء الدّين علي، عن والده الحائز للمرتبتين الشيخ شمس الدّين محمّد بن مكّي، عن الشّيخ أبى طالب محمّد فخر المحقّقين، عن والده آية الله الحسن بن مطهّر العلاّمة الحلّي، عن الشّيخ أبى القاسم جعفر بن الحسن بن سعيد الحلّي

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi



المحقّق على الإطلاق، عن السيّد أبي علي فخار بن المعد الموسوي، عن الشّيخ شاذان بن جبرئيل القمى، عن الشّيخ محمّد بن أبي القاسم الطبرى، عن الشّيخ أبي عليّ الحسن، عن والده شيخ الطائفة أبي جعفر محمّد بن الحسن الطوسي جامع التهذيب و الإستبصار، عن امام الفقهاء و المتكلّمين الشيخ أبي عبد الله محمّد بن محمّد بن نعمان الشّيخ المفيد، عن شيخه رئيس المحدّثين الشّيخ أبي جعفر محمّد بن عليّ بن الحسين بن موسي بن بابويه القمي صاحب كتاب «من لا يحضره الفقيه»، عن الشّيخ أبي القاسم جعفر بن قولويه، عن الشّيخ الأجلّ ثقة الإسلام محمّد بن يعقوب الكلينىّ صاحب الكافى، عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن النّوفل، عن السّكونى

عن أبي عبدالله ( الإمام جعفر الصادق عليه السلام ) أن النبي صلّى الله عليه وآله وسلم بعث سريّة، فلمَّا رجعوا، قال:

**«مَرْحَبًا بِقَوم قَضَوا الجهادَ الأَصْغر وَ بَقِىَ عَلَيهِمُ الجِهادُ الأَكْبر، فقِيل: يَا رَسُولَ الله وَ مَا الجِهَادُ الأَكْبر؟ قال: جِهادُ النفس.»**

Bi nivîsîn û devikî[1] hinek ji seydayên mezin û hêjayên cihê baweriyê îcaze dan min, ji wan e: Şêxê pir zana, mutekelimê feqîh ê usûlî, edîbê pir zana, Şêx Muhemmed Riza Alê Allame, Şêx Muhemmed Teqiyê Îsfehanî (dema hatiye Qumê)[2] û seydayê

---

1- Ji bona parastina hedîsan ji destê derewker û hedîsçêkeran û pêşî girtina li gêrana wan hedîsan ji aliyê yên nenas û naehl, zanayên ilmê hedîsê, ji mêj ve îhtimam dane bi resm û edeta dana «îcazeta riwayet»ê. Şêx û mezinên ilmê hedîsê, piştî îmtihankirinê, dema der heqê zanîn û teqwa kesekî da piştî rast dibûna, îcazeta riwayetê didan wî. Feqiyên vî ilmê jî ji bona destveanîna îtibara li gêran û neqilkirina hedîsê da, diçûna bal wan şêx û mezinan, piştî hînbûna ilmê hedîsê, ji wan seydayan îcazeta riwayetê werdigirtan. Ev edeta qenc, hêca jî kêmzêde pêk tê. Ew îcazeta ku şêx û mezinan didan, muxtelif bûn; yek ji wan, îcazeta nivîskî û devikî bû. Kesê xweyê wê îcazetê dibêje: «Filan kes bi îcazeta nivîskî an devikî xeber gihand min». Hema anegora vê sunet û edeta hêja, Îmam Xumêynî di destpêkê da hinek ji silsile ya isnada xwe pişt bi pişt digehîne Muhemmed bin Ye'qûb bin Kuleynî (Xwedê rehma xwe li wan bike).

2- Şêx Muhemmed Riza Mescidşahî, wefatkirî di sala 1362 h., yek ji alimên

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi



zana yê giranqedr ê abidê cihê baweriyê, Hecî Şêx Abbasê Qumî (dame tewfîquh)[1] ewan herduka jî ji mewla alimê zahid ê abid ê feqîhê muhedis Mîrza Husêynê Nûrî (newwerellahu merqedeh)[2] ji allame Şêx Murteza yê Ensarî (q.s).[3]

---

mezinê Îsfehanê û ji binemala şêx Muhemmed Teqiyê Îsfehanî ye. Ew ji feqiyên Mîrzayê Şîrazî û Seyyid Muhemmedê Fişarekî û Axondê Xorasanî û heval û hevdersê Ayetullah Şêx Abdulkerîmê Hairî bû. Şêx ji sala 1344 heta 1345 h. li bajarê Qumê mijûlê ders xwendinê bû. Piştî şehadeta mamê xwe, Hac Axa Nûrullahê Îsfehanî, vegeriya Îsfehanê û heta axirîka omrê xwe li wêderê ma. Ew, merce'ekê şiîyan bû ku heta wefatê di medreseyên Îsfehanê da dersdana wî berdewam bû. Ceddê wî Şêx Muhemmed Teqiyê Îsfehanî, wefatkirî di sala 1248 h., yek ji feqîhên bi nav û deng û ji şagirdên Wehîdê Behbehanî bûye. Dersdana cenabê wî li bajarê Îsfehanê bû, ku Mîrzayê Şîrazî û Seyyid Hesenê Muderris ji şagirdên wî bûne. Berhema bi nav û dengê wî kitêba «Hidayetul Musterşidîn» şerha «Mealimud Dîn»ê ye.

1- Hac Şêx Abbasê Qumî (1294-1359 h.) ji hedîsgêrên mezinê şîa li sedsala 14-ê, yek ji şêx û mezinên ehlê riwayetê ye ku Îmam Xumêynî ji wî îcazeta riwayetê wergirtiye. Cenabê wî salên dirêj digel Allameyê pirzana Mîrza Hesenê Nûrî (r.a) bûye ku der heqê berhevkirin, nivîsîn û teshîhên berhemên Mîrza gelek alîkarê wî bû. Şêx Abbas, lêkolek jîr û nivîserê kitêbên zehfî bû. Sefînetul Bihar, yek ji berhemên wî ye ku telîfa wê 27 salan dewam kir. Ji berhemên wî ne: Mefatîhul Cînan, Muntehel Amal, Tetimmetul Munteha û Fewaidê Rezewiye.

2- Hac Mîrza Husêyn bin Muhemmed Teqî, Nûriyê Tebersî (1254-1320 h) feqîh, mufesir û li zemîna ilmê hedîsê da bêmînak û di ilmê ricalê da jêhatî bû, ku der heqê belavkirin û parastina hedîsên Ehlê Beytê xweyê cihek mezin e. Cenabê wî ji şagirdên Şêxul Îraqîn, Şêx Murteza Ensarî û Mîrzayê Şîrazî bû. Hac Şêx Abbasê Qumî û Axabozorgê Tehranî, ji şagirdên wî bi xwe ne ku jê îcazeta riwayetê wergirtine. Ji berhemên wî ne: Mustedrekul Wesail.

3- Şêx Murteza Ensarî (1214-1281 h.) bi navê «Xatemul Fuqeha wel Muctehidîn» hatiye nas kirin, ji neviyên sehabî yê Pêxember, Cabir bin Abdullah el-Ensarî ye. Cenabê wî yekî ji seratirîna di ilmê usûlê da ye ku tehewulek mezin di vî ilmî da çêkir. Hêca jî raman û berhemên wî heta bi îro mijara qalê û cihê behs û lêkolînê ye, ku feqîh û zanayên fiqhê gelek ehemiyetê didinê ku şerh û şurûhên zehfî ser berhemên cenabê wî nivîsîne. Hinek ji seydayên wî ev in: Şêx Mûsa Kaşiful Xita, Şêx Alî Kaşiful Xita, Mela Ehmedê Neraqî

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

Türkiye Caferileri Sitesi



Her weha seyyidê cihê baweriyê, feqîhê mutekelimê pêbawer Allame Seyyid Muhsin Emînê Amilî (dame tewfîquh)[1] ji feqîhê allame, xweyê nivîsokên zehfî, Seyyid Muhemmed kurê Haşimê Mûsewî yê Rezewî yê Hindî, ewê ku di saxî û mirina xwe da li Necefa eşref (q.s)[2] ji Allameyê Ensarî. Her weha seyyidê alimê cihê baweriyê Seyyid Ebulqasimê Dihkurdî yê Îsfehanî[3] ji seyyidê giranqedr Mîrza Muhemmed Haşimê Îsfehanî (q.s)[4] ji Al-

---

û Seyyid Muhemmed Mucahid. ji meclisa dersê wî feqîhên gelek mezin perwerde bûne ku Axondê Xorasanî, Mîrzayê Şîrazî û Mîrza Muhemmed Hesenê Aştiyanî yek ji wa ne. Ji muhimtirînê berhemên wî, Resail, Mekasib û Teharet e.

1- Seyyid Muhsin bin Abdulkerîm bin Alî bin Muhemmed Husêyniyê Cebel Amilî, bi nasnavê «Emîn» (1282-1371 h.) yek ji mezinê zanayên îmamiye û yek ji mefaxir û cihê şanaziyê şîa yên danzdeh îmamî ye. Cenabê wî dersên destpêk û muqedematê hema li zadgeh û welatê xwe da xwend û paşê li bajarê Necefê, bal Axondê Xorasanî, Şerîetê Îsfehanî, Hac Axa Riza Hemedanî, û Şêx Muhemmed Taha Necef û mezinên dî dewam da tekmîlkirina zanînên xwe. Ew piştî temamkirina tehsîlê, vegeriya Cebelê Amil û li wêderê dest pê lêkolîn û telîf û tedrîsê kir. Ji cenabê wî gelek berhemên ilmî vemane ku muhimtirînê wan kitêba binavûdengê «Ayanuş Şîa» ye. Ji vê kitêbê çendîn çap berdest e. Ji berhemên wî ne: Esasuş Şerî'e, di babetê fiqha îstidlalî, Eddurretul Behiyye, el-Mecalisus Seniyye, Me'den el-Cewahir fî Ulûmil Ewail wel Ewaxir.

2- Muhemmed bin Haşimê Mûsewiyê Rezewî ê Hindî (1242-1323 h.) li Hindûstanê ji dayik bû û li bajarê Necefê ders xwend û hema li wêderê wefat kir. Ew, yek ji şagirdên Şêxê Ensarî ye. Ji berhemên wî ne: Nezmul Lealî, di babetê rical; Ercûze, di babetê fiqh; Teqrîratên dersa Şêxê Ensarî.

3- Seyyid Ebulqasimê Husêynî yê Dêhkurdî, wefatkirî di sala 1353 h., yek ji şagirdên Mîrza Hesenê Şîrazî û Şêx Zeynul Abidînê Mazenderanî û Mîrza Husêynê Nûrî ye. Ji berhemên wî ne: Haşiye ser tefsîra Safî, haşiye ser kitêba Wafî, haşiye ser mekasib û el-Wesîle fîsseyri wes sulûk.

4- Muhemmed Haşim bin Zeynul Abidînê Mûsewî yê Îsfehanî, bi nasnavê «çehar sûq» (1235- 1318 h.) yek ji feqîhên îmamiye û biraderê nivîserê kitêba «Rewzatul Cînan» e. Ew, yek ji şagirdên Şêxê Ensarî, Seyyid Muhemmed Kazimê Yezdî û Şêx eş-Şerî'e yê Îsfehanî ye. ji berhemên wî ne: Îstishab, Usûlê Alê Resûl, haşiye ser kitêba Esfar, haşiye ser kitêba Lum'e, haşiye ser

https://t.me/caferilikcom
www.caferilik.com

lameyê Ensarî (me rêkên dî jî hene xêncî ji rêka digehê Şêx, ku me terk da) ji mewlayê seratir Ehmedê Neraqî[1] ji Seyyid Mehdî yê xweyê keramatan ku bi Behrul Ulûm hatiye nav kirin (r.a)[2], ji seydayê mezin Axa Muhemmedbaqirê Bihbehanî[3] ji bavê wî yê hêj bilindmertebetir Muhemmedê Ekmel[4] ji mela Muhemmed

---

Qewanîn, haşiye ser Mealim.

1- Ehmed bin Muhemmed Mehdî bin Ebûzerê Neraqî, wefatkirî di sala 1244 h., hem feqîh û hem muheddis bû, ku di ulûmên rical û rîyazî û zanînên aqlî da bi nav bû û bi zuhd û teqwayê meşhûr bû. Pirtirê ulûman bal bavê xwe Mela Muhemmed Mehdî yê Neraqî, ku yek ji bê emsalên wê demê bû, hîn bû. Seydayên wî yên dî Seyyid Mehdî Behrul Ulûm û Şêx Caferê Kaşiful Xita bûn. Ew seydayê Şêxê Ensarî û Seyyid Muhemmed Şefî'ê Capleqî bû. Ji berhemên wî ne: Miracus Seadet, Miftahul Ehkam, Ewaidul Eyyam, Minhacul Usûl ila ilm el-Usûl, Mustened eş-Şîa û dîwana wî ya şiîrê bi zimanê Farsî.

2- Seyyid Mehdî bin Murteza Tebatebayî yê Burûcerdî (1154-1212 h.) meşhûr bi «Behrul Ulûm» yek ji feqîhên mezin û arifên kamilê xwey keramat bû ku bal xas û amme ve gelek bi qedr û qîmet bû. Ew ji wan kêmkesan bû ku li demê xeybeta dirêja Îmam Mehdî (a.s) çend caran digel wî hezretî mulaqat kiriye. Seyyid Behrul Ulûm hem di babetê ilmî hem jî îctimaî û civakî da xwey qedr bû; ku gelek ji feqîhên mezin wek: Şêx Cafer Kaşiful Xita, Seyyid Muhemmed Cewadê Amilî, Şêx Muhemmed Teqiyê Îsfehanî, Mela Ehmedê Neraqî, Ebû Aliyê Hairî û Şêx Esedullahê Teseturî, perwerde kirin. Meşhûrtirînê berhemên wî: Mesabîh, Eddurer en-Necefiyye, di babetê fiqh; û her weha kitêba «rical» in.

3- Muhemmed Baqir bin Muhemmedê Ekmelê Behbehanî (1116 yan 1117- 1208 h.) meşhûr bi «Wehîd» û «Ustadê koll» û «Axa», feqîh, usûlî û ricaliyek bi nav û deng bû. Ewî bajarê Kerbelayê ji kar û barê xwe re merkez hilbijart û bi terbiyeta gelek şagirdan û rêk xistina meclisên behs û munazire, karî hakimiyeta exbariyan li ser fiqhê ji holê rakê. Ji mşhûrtirînê şagirdên wî ne: Seyyid Mehdî yê Behrul Ulûm, Şêx Caferê Kaşiful Xita, Mîrzayê Qumî (xweyê kitêba Qewanîn), Mela Ehmedê Neraqî, Seyyid Alî Tebatebaî (xweyê kitêba Riyad), Seyyid Mehdîyê Şehristanî, Seyyid Muhemmed Baqirê Şiftî û Seyyid Cewadê Amilî (xweyê kitêba Miftahul Keramet).

4- Mela Muhemmedê Ekmel, bavê Muhemmed Baqirê Behbehanî, di ilm û teqwayê bi nav û deng û yek ji îcazeta riwayet wergirtiyan bû.

https://t.me/caferilikcom

Baqirê Meclisî[1] ji bavê wî yê lêkol mela Muhemmed Teqî Meclisî[2] ji Şêx Muheqiqê Behayî[3] ji bavê wî şêx Husêyn[4] ji Şêx Zeynud-

---

1- Mela Muhemmedbaqir bin Muhemmed Teqiyê Meclisî yê Îsfehanî, meşhûr bi «Allameyê Meclisî» (1037-1111 h.) yek ji zanayên mezinê şîa di ulûmên muxtelifê Îslamî da, bi taybet di ilmê hedîsê da gelek jêhatî bû. Seydayên wî, bavê wî û Şêx Hurrê Amilî û Seyyid Alîxanê Şîrazî bûne, û ewî bi xwe gelek şagirdan wek: Mîrza Abdullah Efendî (nivîserê kitêba el-Ulema), Seyyid Nîmetullahê Cezayirî, Mela Salihê Mazenderanî, terbiyet kirin. Ew, der heqê berhevkirin û komkirina hedîsên îmamiye de pir xebitî û pitir ji 60 cild kitêb bi Farsî û Erebî nivîsîne. Muhimtirînê berhemên wî, kitêba «Biharul Enwar» e. Ji berhemên wî ne: Mir'atul Uqûl, Şerha Kafî; Heyatul Qulûb, Zadul Mead, Heqqul Yeqîn, Celaul Uyûn, Hilyetul Mutteqîn û el-Erbeûn Hedîs.

2- Mela Muhemmed Teqî bin Meqsûd Aliyê Îsfehanî, meşhûr bi «Meclîsiyê ewil» (1070 h.) feqîh, muheddis, ricalî û kesayetiyek abid û zahid bûye. Li berhevkirina hedîsên şiî da têkeliyek bi tesîr hebûye. Ji şagirdên Şêxê Behaî û Mela Abdullahê Şûşterî ye; ewî gelek berhem û kitêb hene ku meşhûrtirînê wan ev in: Şerha ziyaretê Camî'e, Rewzetul Mutteqîn di şerha Men la Yehzuruhul Feqîhê da, Îhyaul Ehadîs di şerha Tehzîba Şêxê Tûsî, Erbeûn Hedîs û şerha Sehîfe ya Seccadiye.

3- Şêx Behauddîn Muhemmed bin Husêyn bin Abdussemedê Amilî, meşhûr bi «Şêx Behaî» (953-1030 h.); di wextê xwe da di zanîn û funûnên muxtelif da seydayek mezin û bê emsal bûye. Hema di wextê xwe da bi nasnavê Şêxul Îslamê Îsfehanê meşhûr bû. Sedrul Muteellihîn, mela Muhemmed Teqiyê Meclisî, Muheqiqê Sebziwarî û Fadil Cewad ji şagirdên wî bûne. Ewî gelek berhem û kitêb di babetên cûrbicûr nivîsîne ku hinek ji wan ev in: Cami'ê Abbasî û haşiye ser Qewaidê Şehîd, di babetê fiqhê da; û Teşrîhul Eflak, di babetê heyetê da; Meşriquş Şemseyn, Heblul Metîn, şerha dua ya Sebah, şerha Erbeîn Hedîs, di babetê hedîs û duayê da, el-Fewaidus Semediyye û Esrarul Belaxe, di babetê edebiyatê da.

4- Şêx Husêyn bin Abdussemedê Amilî (918-984 h.), bavê Şêx Behaî ye ku bi çend piştan digehê Haris bin Abdullahê Hemedanî ku ji sehabiyên mezinê Mîrê bawerdaran Alî (a.s) bûye. Ew ji şagirdên Şehîdê Sanî û Seyyid Hesenê Korekî û seydayek lêkol û ehlê edeb û şiîrê bûye ku gelek kesan di dersdana wî da hazir dibûn. Ji berhemên wî ne: Dirayetul Hedîs, Erbeîn û Şerhul Qewaid.

https://t.me/caferilikcom

dîn, meşhûr bûyî bi Şehîdê Duwê[1] ji Şêx Alî kurê Abdul'alî yê Meysî[2] ji Şêx Şemsuddîn Muhemmed kurê Muezzinê Cezînî[3] ji Şêx Ziyauddîn Alî[4] ji bavê wî Şêx Şemsuddîn Muhemmed kurê Mekkî[5] ji Şêx Ebûtalib Muhemmed Fexrul Muheqiqîn[6] ji bavê

---

1- Şêx Zeynuddîn bin Şêx Nûreddînê Amilî, meşhûr bûyî bi Şehîdê Sanî (911-966 h.) ji mezinê feqîhên Şîa û zanayê bi ulûmên muxtelif û ehlê îbadet û zuhdê bûye. Ewî der heqê her çar mezhebên fiqhî yê ehlê sunetê xodan zanîn bû û ders dida. Ji berhemên wî ne: Şerha Lum'e, Mesalikul Efham fî şerh Şeraiul Îslam, Muniyetul Murîd fî Adabil Mufîd wel Mustefîd, Esrarus Selat, Keşfur Reybe fî Ehkamil Xeybe.

2- Şêx Alî bin Abdulaliyê Meysî yê Korekî, meşhûr bûyî bi «Muheqiqê Korekî» û «Muheqiqê Sanî» (938 h.) feqîh û usûliyek temam û ji mefaxir û feqîhên mezinê şîa ye. Ew li demê padişahî ya Sefewî hat Îranê û li bajarên Qezwîn û Îsfehanê da dest bi dersdanê kir û şagirdên bihagiran terbiyet kirin ku hinek ji wan: Şêx Alî Minşar, Seyyid Emîrê Esterabadî û Şêx Abdunnebiyê Cezayirî ne û berhema wî ya pir bideng Cami'ul Meqasid e di şerha Qewaid ya Allameyê Hillî da.

3- Muhemmed bin Muhemmed bin Dawûd, Muezzinê Amiliyê Cizînî, pismamê Şehîdê Ewil, zana û şairek bi qedr û qîmet bû.

4- Şêx Ziyauddîn Alî bin Muhemmedê Mekkî, zanayek fazil û lêkol bûye. Şêx Muhemmed bin Muhemmed bin Muezzin ji wî riwayet neqil kirine.

5- Şêx Şemsuddîn Muhemmed bin Mekkiyê Amilî, meşhûr bi «Şehîdê Ewil» (734-786 h.) yek ji mezin û zanayên bilind mertebeyên îmamiye; di ulûmên muxtelif da seydayek bilind mertebe bû ku di babetê fiqhê da ji wî ra «Îmamul-Fiqh» dihata gotin. Şehîd, di binemalek ehlê ilm û edeb da mezin bû ku zarokên wî çi keç û çi kur, hemû ji ehlê ilm û fiqhê bûn. Şehîd, bal gelek seydayan ders xwend û ji alimên mezhebên muxtelif îcazet wergirtin. Meşhûrtirînê şagirdên wî ev in: Şêx Zeynuddîn Alî bin Xazin, Şêx Abdulaliyê Korekî, Şêx Hesen bin Suleyman, Şêx Miqdadê Sûrî. Ji berhemên wî ne: Durûs, Zikra, Beyan, Qewaid, el-Lum'e ed-Demişqiye û el-Erbeûn Hedîs.

6- Fexrul Muheqiqîn, Ebûtalib Muhemmed bin Hesen (682-771 h.) ji mezinên feqîhên îmamiye bûye ku hatiye gotin ewî di temenê deh salî da gihaye dereca îctihadê. Ew bi xwe yek ji şagirdên bavê xwe Allameyê Hillî ye ku mîratberê ilmê bavê xwe tê hesabê. Şehîdê Ewil, Seyyid Heyderê Amolî, Seyyid Tacuddîn, kurê wî Zehîruddîn çend ji şagirdên wî ne, ji berhemên

wî ayetullah Hesenê kurê Mutehher Allameyê Hillî[1] ji Şêx Ebulqasim Cafer kurê Hesen kurê Seîdê Hillî yê Muheqiq[2] ji Seyyid Ebû Alî Fexxar kurê Me'edê Mûsewî[3] ji Şêx Şazan Cebraîlê Qumî[4] ji Şêx Muhemmed kurê Ebulqasimê Teberî[5] ji Şêx Ebû Alî Hesen[6] ji

---

wî ne: el-Fewaid fî Helli Muşkilatil Qewaid, şerha Mebadîul Usûl û her weha el-Kafiyetul Wafiye di babetê ilmê kelamê da.

1- Ayetullah Şêx Cemaluddîn Hesen bin Yûsuf bin Alî bin Mutehherê Hillî (648-726) feqîh, muheddis, mufessir, mutkellim, edîb, xodanê zanîn der heqê ilmên aqlî, neqlî û di demê xwe da berpirsyarê ehlê îmamiye bûye û nasnavê «Allame» yek ji taybetiyên wî bûye. Ew bal seydayên mezin ji ehlê sunet û şîa ders xwendin. Çend ji seydayên wî: Muheqiqê Hillî, Xwace Nesîruddînê Tûsî û Seyyid Ehmed bin Tawûs û Şêx Necîbuddîn bûne. Xace Nesîruddînê Tûsî dersa fiqhê ji wî wergirtiye. Kurê wî, Fexrul Muheqiqîn jî yek şagirdên wî bûne. Ji berhemên wî ne: Tebsiretul Mutiellimîn, el-Muxtelif, Qewaid, Tezkiretul Fuqeha, Keşful Murad fî şerh Tecrîdul Eqaid, Elfeyn, el-Muxteser û Telxîsul Keşşaf.

2- Şêx Ebulqasim Necmuddîn Cafer bin Hesenê Hillî (602-676 h.) meşhûr bi «Muheqiq» yek ji feqîhên bilindmertebe yê şîa bûye; Allameyê Hillî û biraderê wî û Seyyid Xiyasuddîn bin Ehmed bin Tawûs ji şagirdên wî feqîhê bi nav û deng bûne. Kitêba Şerayiul Îslam ji hingê heta bi niha bal feqîhan gelek bi qedr û qîmet bûye ku feqîhê pir bi nav û deng Şêx Muhemmed Hesenê Necefî, di şerha wê da kitêba el-Cewahir nivîsiye. Ji berhemên wî ne: el-Muteber fî şerh el-Muxteser, Muxteser en-Nafi', el-Mearic, di babetê ilmê usûlê da.

3- Seyyid Şemsuddîn Ebû Alî Fexxar bin Me'edê Mûsewiyê Hillî (-600 h.) fazil, edîb û muheddisek bilindmertebe û xweyê kitêba er-Redd ela ez-Zehab ila Tekfîr Ebîtalib.

4- Şêx Celîl Siqe, Ebulfezail Şazan bin Cebraîlê Qumî, zanayek bi qedr û feqîhek bilindmertebe ye. Kitêbên Fezail û nasîna qibletê nivîsîne.

5- Îmaduddîn Ebû Cafer Muhemmed bin Ebî Qasim Teberî, kurê Ebû Qasim Alî bin Muhemmedê Amolî. Kitêbên Bişaretul Mustefa li Şîatil Murteza, el-Ferec û Şerhu Mesail ez-Zerî'e, ji berhemên wî ne.

6- Ebû Alî Hesen bin Muhemmed Tûsî, ji feqîhên mezinê şiî û ji şagirdên bi nav û dengê bavê xwe, Şêx Tûsî ye. Ew piştî bavê xwe, bû berpirsyarê terbiyetkirina şagirdên bavê xwe; gelek ji şagirdan ders ji wî wergirtin. Tûsî heta sala 515-ê h. dijiya û çendek ji berhemên wî ew in: el-Murşid ila Sebîl

bavê wî Şêx-ut Taife Ebû Cafer Muhemmedê kurê Hesen ê Tûsî xweyê kitêbên «Tehzîb» û «Îstibsar»ê,[1] ji serokê feqîh û mutekeliman Şêx Ebû Abdillah Muhemmed bin Muhemmed bin Numan, Şêxê Mufîd[2] ji seydayê xwe, reîsê muhedisan Şêx Ebû Cafer Muhemmed kurê Alî kurê Husêyn kurê Mûsa kurê Babeweyhê Qumî xweyê kitêba «Men la Yehzuruhul Feqîh»[3] ji Şêx Ebulqasim Cafer

---

et-Teebbud, Emalî û şerha Nihayetul Ehkam.

1- Ebû Cafer Muhemmed bin Hesenê Tûsî (385-460 h.) meşhûr bûyî bi «Şêxut Taife» yek ji mezintirîn û seratirînê zanayên cîhana Îslamê ye. Tûsî, reîsê feqîh û mutekellimê zemanê xwe bû û li babetê ilmên rical, edeb, tefsîr û hedîsê da gelek bilindmertebe bû. Seydayên wî Şêx Mufîd, Seyyid Murteza, Ibn Xezairî, Ibn Abdûn, bûne; Şêx, xweyê du kitêbên meşhûr yên şîa yanî Îstibsar û Tehzîbê ye ku herdu ji çar kitêbên serekî ya îmamiye tên hesabê. Kitêbên Nihaye, Xilaf û Mebsût di babetê fiqhê û kitêbên wek: Fihrist, Rical, Îxtiyaru Marîfet er-Rical, Uddetul Usûl, el-Xeybet, et-Tibyan fî Tefsîrîl Quran, Telxîs eş-Şafî, Misbahul Muctehid, ji wî ne. Şêx Tûsî piştî şewitîn û ji nav çûna kitêbxana wî (di sala 448 h.) ji Bexdayê berew Necefê ve çû û medrese ya ilmiye ya Necefê damezirand.

2- Şêx Ebû Abdullah Muhemmed bin Numan (336 yan 338-413 h.) meşhûr bi «Mufîd» û «Ibn Muellim» yek ji giregirên mutkellim û muheddisên şîa ye. Ewî di zemanê xwe da seydayê mezinê Bexdayê bû. Ew li bal Îmam Mehdî (a.s) bi qedr û qîmet bû ku di herdu nameyên ku Îmam Mehdî (a.s) jê ra rê kiribûn, Îmam, navên wek «Exun Sedîd» û «Şêx Mufîd» û «Weliyyun Reşîd» û «Weliyyun Muxles» û «Nasirul Heq» û «Da'î ila Heq» di xitabê da bikar anî bûn. Cenabê Şêx Mufîd, bal seydayên mezinê şiî, sunî û zeydî, wek Cafer bin Muhemmedê Qûliweyh, Şêx Sedûq, Ibn Cuneyd, Îskafî û Alî bin Ebî el-Ceyşê Belxî da dersên xwe kamil kirin. Seyyid Murtezayê Elemul Huda, Seyyid Rezî, Şêx Tûsî, Neccaşî, Kiracikî û Salar bin Abdulezîz bi nav û dengtirînê şagirdên wî bûne. Qasî dused berhemên piçûk û mezin ji wî vemane ku meşhûrtirînê wan ev in: Îrşad, Îxtisas, Ewail el-Meqalat, Emalî û Muqenni'e.

3- Muhemmed bin Alî bin Husêyn bin Mûsa bin Babiweyhê Qumî, kunya wî Ebû Cafer û meşhûr bûyî bi «Ibn Babiweyh» û «Sedûq» (381 h.) yek ji mezinê zanayên îmamiye û yek ji mezinê ehlê hedîs û fiqha şiî ye. Ewî di demê xeybeta kurt ya Îmam Mehdî (a.s) û seba xatirê dua ya wî hezretî ji dayik bû. Cenabê wî ji bavê xwe, Alî bin Babiweyh, Muhemmed bin Hesen

kurê Qûleweyh[1] ji seydayê giranqedr Siqetul Îslam Muhemmed kurê Ye’qûbê Kuleynî, xweyê «Kafî»yê[2] ji Alî yê Îbrahîm[3] ji bavê wî[4]

---

bin Welîd û Cafer bin Muhemmed yê Qûliweyh riwayet neqil kirine û yek wek Ibn Şazan, Xezairî, Şêx ebû Cafer Muhemmed Durîstî ji cenabê wî riwayet neql kirine û gêrane. Hatiye gotin ku nivîs û berhemên wî ji sêsedan jî zêdetir in ku meşhûrtirînê wan ev in: Men la Yehzuruhul Feqîh, Îkmalud Dîn we Îtmamun Nîme, el-Xisal, et-Tewhîd, Uyûnu Exbarir Riza, el-Emalî, Me'anî el-Exbar, Îleluş Şerayi. Mezar û qebrê wî li bajarê Rey da ziyaretgeha hejêker û muhibbên Ehlê Beytê ye.

1- Ebulqasim Cafer bin Muhemmed bin Qûliweyhê Qumî (368 h.) ji muheddis (hedîsgêr) û feqîhên mezinê şîa di sedsala çarê hicrî da ye. Cenabê wî ji Kuleynî û Ibn Uqde û Alî bin Babiweyhê Qumî (bavê Şêx Sedûq) riwayet gêrane û yên wek Şêx Mufîd, Neccaşî û yên dî ji wî riwayet neqil kirine. Di babetên fiqh û hedîsê da çend kitêb nivîsîne ku «Kamiluz Ziyarat» bi nav û dengtirînê wan e.

2- Muhemmed bin Yaqûb bin Îshaq bin Kuleyniyê Razî, meşhûr bi «Siqetul Îslam» (328 an 329 h.) yek ji mezinê muheddis û hedîsgêrên şîa û her weha seydayê seydayên ehlê hedîsê ye û di vî ilmî da di tarîxê da seratirîn kes tê hesabê. Ew bal zêdetir ji çil kesan ilmê hedîsê fêr bû. Gelek ji mezinên ehlê hedîsê ji wî hedîs neqil kirine, yên wek: Cafer bin Muhemmed bin Qûliweyh, Harûn bin Mûsayê Til'ekbirî. Kuleynî ewilîn nivîser ji nivîserên çar kitêbên serekî yên şîa ye ku di dirêjiya çend sala da kitêba pir berketî ya Kafî di sê beşên «usûl», «furû» û «rewze» da berhevê serhev kir. Ji berhemên wî ne: Kitabur Rical, Resailul Eimme, Kitabu Reddi Qeramite û her weha kitaba Te'bîrur Ruya.

3- Alî bin Îbrahîm bin Haşimê Qumî, muheddis, mufessir û feqîhê axirîka sedsala sisê û destpêka sedsala çarê hicrî û yek ji seydayên Şêx Kuleynî bûye. Hatiye gotin ku ew gelek berhem berdest kirine, ji wa ne: Kitab Menaqib, Qurbul Esnad, kitab eş- Şerayi', Kitabu Mexazî, Kitabul Enbiya û her weha tefsîra Quran a Kerîm. Mezar û qebrê wî li bajarê Qumê da ye.

4- Îbrahîm bin Haşimê Qumî, ji yaran û sehabîyên Îmam Cewad (a.s) bûye ku ji sehabîyên îmaman (selamên Xwedê li ser wan bin) gelek riwayet neqil kirine. Hatiye gotin ku ewilîn kesê ku hedîsên Kûfiyan li bajarê Qumê da belav kiriye, hema ew bûye. Kitêba Newadir we Qezaya Emîrul Muminîn, yek ji berhemên wî ne.

ji Newfelî[1] ji Sekûnî[2] ji Ebû Abdillah (a.s) neqil kiriye ku got:

«Pêxember (s.a.a) leşkerek rê kir, vêca dema zivirîn, kerem kir: Aferim û xweşî û berfirehî ji wê komê ra ku cîhada piçûk pêk anîn û cîhada mezin li ser wan mayî. Hat gotin ey Resûlê Xwedê, cîhada mezin çi ye? Kerem kir: Cîhada gel nefsê ye»[3].

**Şerh:**

Seriyye, birek ji leşker e. Û hatiye gotin ku: Çar sed kes baştirîn seriyye ye. Û kelîmên dî yên hedîsê ronahî ne.

Bizane ku mirov ucûbeyeke xweyê du neş'et û du cîhanan: Neş'eta eşkere ya mulkiye ya dinyewiye, ku bedena wî ye; û neş'eta navdeyî ya veşartî ya melekûtiye, ku alem û cîhanek dî ye. Û nefsa wî ku ji alema veşartî ya melekûtiye ye, hinek meqam û mertebe û derece jê ra hene ku bi awayek giştî bi çend awayan pişk û teqsîm kirine; hinekan kiriye heft qisim, carna çar qisim û carna sê qisim û carna du qisim. Û ji her yek ji mertebe û derecên wê ra leşkerên rehmanî û eqlanî hene, ku ewî dikeşin bi aliyê melekûta e'la ve û ji bexteweriyê ra gazî dikin, her weha leşkerên şeytanî û cehlanî hene ku ewî bi aliyê binî ve dikeşin û ji bextreşiyê ra gazî dikin. Her daim di navbera van herdu leşkeran da şer û xirecir e û mirov meydana şerê van du leşkera ye: Eger leşkerê rehmanî ser bikeve, mirov ji ehlê bextewerî û rehmetê ye û pêçayî di nav silka melaîketan da û di nav koma enbiya û ewliya û qencan da

---

1- Husêyn bin Yezîdê Nûfilî, şair û helbestvanê bi nav û dengê bajarê Rey bûye; Şêx Tûsî di kitêba Ricalê xwe da, ewî yek ji sehabîyên Îmam Riza (a.s) hesibandiye. Cenabê wî li bajarê Rey wefat kir.

2- Îsmaîl bin Ebû Ziyadê Sekûnî, yek ji amme (ehlê sunet) bûye û ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet neqil kirine; Şêx Tûsî di kitêba «Îddetul Usûl»ê da nivîsiye ku zanayên îmamiye bi riwayetên ku ewî gêrayîn, amel kirine. (Binhêre kitêba Îddetul Usûl, c. 1, p. 38).

3- Furû'a Kafî, c. 5, p. 12

ye; û eger leşkerê şeytanî û nezaniyê ser bikeve, mirov dibe ji ehlê bextreşî û xezebê û di nav koma şeytan û kafir û bêbehran da ye. Çikû di van kaxizan da me qesta dirêjkirinê nîne, em ê îşare bikin bal hinek mertebên nefsê ve û bi kurtî behsa hinek aliyên bextewerî û bextreşiyê bikin. Em ê behsa çawaniya cîhada digel nefsê di nav wan merteban da bikin; înşaallah.

## Meqamê yekê: Neş'eta mulk û eşkere

### Vebir: Îşare bal meqamê ewil yê nefsê ve

Bizane ku meqamê ewil yê nefsê û merteba wê ya binî, menzil û meqamê mulk û eşkereyê dinyayî yê wê ye. Ku ronahiya veşartî ya wê di vê bedenê da tê dîtin û jiyanek 'erezî jê ra di vê bedenê da daniye. Û meydana şerê wê, hema ev beden e û hêzên wê yên eşkere di nav eqalîmê heftane da cih girtiye; yanî: Guh, çav, ziman, zik, bin zik, dest û pî. Û ev hêzên belav bûyî di vî memleketê heftane da di bin emrê nefsê da ye, di meqamê «wehm»ê da. Çiku wehm paşayê hêzên eşkere û nefsê ye. Nexwe eger wehm bi emrê xwe an bi emrê şeytan hukum bike, ev hêzên hanê dibin leşkerên şeytan û memleket bindestê hukûmeta şeytan dibe û leşkerê rehman û aqil ji nav diçin û dişikên û ji neş'eta mulkiye ya dinyayiye ya însan dikişên û jê bar dikin û memleket dibe taybet û xasê şeytan. Û eger wehm di bin emrê aqil û şer'ê da fermanê bide wan û herekat û sekenatên wan di bin sîstema aqil û şer'ê da bin, memleket dibe memleketê rehmanî û aqilanî û şeytan û leşkerê şeytan jê bar dikin û derdikevin. Nexwe cîhada nefsê ku cîhada mezin e û ji kujrana di rêka Heq Teala de bilindtir e, di vî meqamî da ew e ku mirov ser hêz û quweyên xwe yên eşkere bikeve û ewa bixê bin fermana Xaliq û memleket ji şeytan û hêzên wî vala bike.

**Vebir: Der heqê tefekurê da ye**

Bizane yekemîn şertê cîhada gel nefsê û çûna bi aliyê xaliq ve, tefekur e. Hinek ji alimên exlaq, ew di merheleyên destpêkê da, di merteba pêncê da danîne; û ew jî di meqamê xwe de durist e.

Tefekur, di vî meqamî da ew e ku mirov di şev û rojê de –her çend kêm be jî- di vê yekê da fikir bike ku xweyê wî ew aniye vê dinyayê û hemû wesîleyên rehetiyê ji wî ra berhev kirine û bedenek salim û hêzên durist ku her yekî hinek menfe'et hene dayînê, ew hêzên ku aqil têda heyirî ye, dayînê. Ji aliyê dî ve jî vêca ev hemû pêxember û kitêb rêkirine û rênimûnî kiriye û gazî kiriye, gelo berpirsiyarî û wezîfa me di beranberê vî xweyiyê her kes çi ye? Gelo ev hemû, hema ji vê jiyana heywanî ra û îdare kirina şehwetê ra ye, ku di van da em gel heywanan şirîk in; an mexsedek dî heye? Gelo evan pêxemberên giranqedr û weliyên mezin û şehrezayên hêjayî û alim û zanayên her milletekî ku ew gazî kirine bi aliyê qanûna aqil û şer'ê ve û ew paşda dane ji şehwet û viyanên heywanî û ji vê dinya fanî tirsandine, dijminî gel wan hebûne û hene, an rêka durista ji me bêçareyên ku ketine nav xwest û viyanên nefsanî ra, wek me nas nekirine?

Eger mirovê  bi aqil bêhnekî bifikirê, wê fêhm bike ku mexsed ji vê, tiştek dî ye û mexsed ji vê xilqet û çêkirinê, alemek bilindtir û seratir e û ev jiyana heywanî ya bi xwe ne mexsed e. Û mirovê bi aqil gereke di fikra xwe da be û bi halê bêçareyî ya xwe rehm bike û bêje xwe: Ey nefsa bextreş, ku salên dirêj te omrê xwe di rêka şehweta de ji dest daye û tiştek ji hesretê pê ve destê te neketiye, baş e ku tu hinekî rehmê li xwe bikî, ji Malikul Mulûk şerm bikî û hinekî di rêka eslî da gava xwe bavêjî, ku hema ew e ku dibe sebebê jiyana daimî û bexteweriya her û her; û bexteweriya her û her nefiroşe bi viyanên çend rojeyên fanî, ku ew jî bi zehmetek zêde jî bi dest ve nayê. Hinekî di halê ehlê dinyayê da fikir bike, ji yên kevn heta bi niha ku tu dibînî, vêca bibîne ku derd û zehmetê wan di beranberê rehetiya wan da çiqas pirtir û zehftir e, ew jî di

halekî da ye ku ji her kesî ra rehetî û xweşî peyda nabe. Hinekî di halê wî mirovê ser şiklê mirovan da fikir bike, ku ji leşkerê şeytan e û ji aliyê wî ve hatiye rêkirin û te bi aliyê bayê dil ve gazî dike û dibêje te ku: «Gereke tu jiyana maddî bi dest ve bînî»; hinekî ewî bide xeberdan, ka gelo ew bi xwe ji rewş û hal razî ye? An ew bi xwe têketiye û dixwaze hinek bêçare yên dî jî mubtela bike?

Di her hal û karî da bi zarî ji Xwedayê xwe bixwaze ku te digel wezîfe û berpirsiyariyên te yên di beranberê wî da nasyar bike. Û hêvî ew e ev fikirkirin ku bi niyeta cîhada digel şeytan û nefsa emmare ye, rêkek dî ji te ra veke ku tu bikarî bigehî menzil û meqamek dî yê mucahidetê.

**Vebir: Der heqê biryar û ezmê da ye**

Menzilek dî ku piştî fikirkirinê ji mirovê mucahid ra tê pêş, menzila «ezm» û «biryarê» ye. (Û ev xêncî îradê ye ku Şêxur Reîs[1] di kitêba «Îşarat»ê da ew dereca ewil ya arifan zaniye).

Hinek ji seydayên me (Xwedê temenek dirêj bide wan) kerem dikiran: Ezm, cewhera însaniyetê û pîveka seratiya mirov e û ferqa dereceyên mirov bi ferqa dereca ezm û biryara wî ve girêdayî ye.

Biryara munasibê vî meqamî, ew e ku mucahid qirar û biryarê

1- Husêyn bin Abdullah bin Sîna (nêzîkîya salên 370-427 an 428 h.) meşhûr bi «Ebû Alî Sîna», «Şêxur Reîs» ji mezinên hekîm û tebîbên Îslamî û yek ji seydayên bi nav û dengê mekteba Meşşaiyê felsefe ye ku di ulûm û zanistên dî da jî xweyê meqam bûye. Seratiya îstidad û jîrî ya wî, yek ji taybetiyên wî ye. Bi wî awayî ku ew karî lidemek kurt da dersên xwe dawî bîne û berhemên giranqedr di babetên cûrbicûr da berdest bike. Hinek ji berhemên wî ev in: el-Îşarat wet Tenbîhat, ku ji mentiq û tebî'iyat pêk tê ku ji aliyê gelek kesan ser da şerh hatiye nivîsîn ku meşhûrtirînê wan, şerha Fexrê Razî û Xace Nesîrê Tûsî ye; Şifa, ji mentiq û riyaziyat, tebî'iyat û îlahiyat pêk hatiye ku gelek bi tefsîl hatiye nivîsîn; en-Necat, di babetê felsefê da; el-Mebde wel Mead, Qanûn, di babetê tibbê da; Qesîde Eyniye û et-Te'lîqat.

bide, ku bêemrî jê çênebin û terka gunehan bike, her weha wacib û ferzan bi cih bîne û ewa ku di zemanê saxiya wî da lê derbas bûye telafî bike û biryara li ser vê yekê bide ku şiklê xwe yê eşkere bike însanek gorekî aqil û şer'ê û gorekî eşkereyê hukm bide, ku ev kes mirov e û însan. Û mirovê şer'î, ew e ku gorekî xwesta şerîetê muamele bike û eşkereyê wî, eşkereyê Resûlê Ekrem be (s.a.a) û di hemû bizav û sekinîn û kiryar û nekirinên xwe da, pey wî bikeve û xwe wek wî lê bike. Û ev karek mumkin e û her çêdibe. Lewma ji her kesî ra eva he heye ku bikare eşkere û rûmetê xwe, wek eşkereyê wî hezretî lê bike.

Evê jî bizane ku mirov nikare bi rêkên Xwedayî ve biçe, xêncî ku di destpêkê da xwe bi eşkereyê şerî'etê ve bigire. Heta mirov edebên şerî'eta heq di xwe da çêneke, tu exlaqek qenc di wî da çênabe û ronahiya marîfeta îlahî di dilê wî da şewq nade û ilmê batin û esrarên şerî'etê ji wî ra munkeşif nabin. Piştî keşfa heqîqetê û ronahîbûna dil bi şewqa mearifan jî, eşkereyê wî, gorekî adabên eşkere û zahirî ye. Ji ber vê yekê ev gotin pûç e ku: «Pê terka zahir û eşkereyê, ilmê batin peyda dibe»; an: «Piştî peydabûna ilmê batin, êdî îhtiyac bi adabên zahirî û eşkere nîne». Û ev gotin ji cehla bêjerê wê ye der heqê meqamên îbadet û derecên însaniyetê da. Û belkî vê der heqê da min karî di van kaxizan da ez ji vê meselê biaxivim û ronahî bikim; înşaallah.

**Vebir: Muhimiya biryar a terka bê emriyan û pêkanîna wezîfan**

Ey ezîz, bixebite, da bibî xweyê biryar û îradê, ku Xwedê nekirî eger bê ezm û biryar ji vê dinyayê biçî, hingê tu însanê sûrî yê bê mejî yî, ku di wê cîhanê da tu li ser şiklê mirovan wê werî ber heşrê. Lewma ku ew alem cihê xuyabûna navdeyê û eşkerebûna xef û veşartiya ye. Û wêrekiya guneh kirinê, kêm kêm mirov bê ezm û bê biryar dike û evî cewherê hêjayî ji mirov distîne. Seydayê me yê giranqedr kerem dikira: Guhdana «xina»yê ji her tiştî pirtir îrade û biryarê ji mirov digire.

Nexwe ey bira, xwe ji bêemriyan dûr bigire, û biryarê bide ji hicreta bi aliyê Heq Teala ve, û eşkereyê xwe bike eşkereyê însan, û bikeve di silk û mesleka ehlê şerî'etê re û di tenêtiyê da ji Xwedayê Tebarek û Teala bixwaze ku di vê rêkê da aliyê te bike û Pêxemberê Ekrem û Ehlê Beyta wî (s.a.a) ji xwe re bike navcî, da Xwedê aliyê te bike û destê te bigire û nehêle bikevî şimitînên ku li pêş te heyîn, çiko mirov di jiyana xwe da hinek şimitîngehên kûr hene, ku çêdibe mirov bikeve têda û tu rêkek xilasî ji wê peyda neke û nekevê di fikra çarekirinê da jî. Û belkî welê be ku navcîtiya navciyan jî êdî feydê nediyê (ji wê penah û hana xwe ji Xwedê re dibim).

**Vebir: Der heqê muşarite û muraqibe û muhasibe da ye**

Ji wan tiştên ku ji bona mucahid lazim: «muşarite» û «muraqibe» û «muhasibe» ye. Muşarite; ew e ku mesela di destpêka rojê da gel xwe şert bike ku îro bêemriya Xwedayê Teala neke û biryarê li ser wê çendê bide. Ronahî ye ku bêemrî nekirina rojekî, karek rehet û hêsan e û bi rehetî mirov dikare evê yekê bike. Tu biryarê bide û şerê bike û biceribîne û bibîne çiqas rehet e. We heye şeytan û leşkerên wî mel'ûnî, evî karî li ber te giran û mezin bikin, lê ev ji telbîsatên wî mel'ûnî ye, ji dil lanetê lê bike û wehm û xeyalên pûç ji dil derîne û rojekî biceribîne, hingê tu dê tesdîq bikî.

Piştî vê muşaritê, gereke tu bikevî muraqibê. Ew, wereng e ku tu di hemû muddetê şert de, hay jê bimînî û pê amel bikî û eger Xwedê nekirî, kirina karekî bervajiyê fermana Xwedê ket dilê te, tu bizanî ew ji şeytan û leşkerê wî ye, ku dixwazin te ji wî şertî vekin. Lanetê li wan bike û ji ber wan hana xwe ji Xwedê re bibe û ewê xeyala pûç ji dilê xwe derîne û bêje şeytan: Min îro gel xwe şert kiriye ku ez xilafê fermana Xwedê nekim, lêbelê nîmetê min, eve salên sal e ku qencî li min kiriye û selametî û saxî û emniyet merhemet kiriye û Ew başî digel min kirine, ku eger heta ebed jî ez di xizmeta wî da bim jî, ez nikarim heqê yekî ji wan jî eda bikim, neheqî ye ku ez evî şertê xwe bi cih neynim. Hêvî ew e

ku înşaallah şeytan bêt dûrkirin û berê xwe bizivirîne, û leşkerê rehman ser bikeve. Û ev muraqibatan digel tu karekî û barên te; wek kesb, kar, sefer û tehsîlê... dijatî nînin.

Vêca tu berdewam bî di vî halî de heta şev, ku wextê muhasibeyê ye. Û ew jî ev e ku tu hesabê gel nefsa xwe bikî der heqê vî şertî da ku te digel Xwedayê xwe gotin; ku kanê gelo te bi cih aniye û di vê muameleyê da te xiyanetê li xweyê qencî yên xwe nekiriye? Eger te durist pêk anîbe, ji ber wê şukrê Xwedê bike û bizane ku tu gavekî pêşve çûyî û ketî ber nêrîna Xwedê û înşaallah wê Xwedê te rênimûn bike ji pêşketina karên dinya û axretê re û karê sibehê wê rehettir be. Çendekî bi vî awayî biborîne; hêvî ew e ji te ra bibe meleke û ji te ra gelek rehet û hêsan bibe, hingê ye ku tu dê ji fermanbirina Xwedê û terka gunehan lezet û xweşiyê bibînî di vê alemê da, ku ji xwe ne cihê kirhê ye.

Bizane ku Xwedayê Teala teklîf û wezîfa giran û ji qamê der, li te nekiriye, lêbelê şeytan û leşkerê wî kar û baran ji te re bi zehmet didin nîşandan. Û eger Xwedê nekirî, di wextê muhasibê da te dît di şertê hatîkirin da sistî û kêmasiyek ji te peyda bûye, ozrê xwe ji Xwedê bixwaze û qirar bide ku sibehê mêrmêrane bi şertê xwe amel bikî. Û tu bi vî halî be, heta Xwedê dergehên serketin û bexteweriyê li ber te veke û te bigehîne rêka rast ya însaniyetê.

**Vebir: Der heqê bîranînê (tezekur) da ye**

Ji wan karên ku ji mucahideta di beranberê nefs û şeytan da pir alîkar e û gereke mirovê salik pir hay jê hebe, bîranîn e; em ê pê behsa ji vê yekê xilasekê bidin vî meqamî, di halekî da ku gelek tişt hêj mane jî. Û ew di vî meqamî da, bîranîna Xwedayê Teala û ew nîmetên wî ne ku dane mirov.

Bizane, ji wa tiştên fitrî ku di sirûşta mirov da heye, ew e ku qedr û qîmet ji xweyê nîmetê ra tê dayîn. Her kes dema di kitêba zatê xwe da fikir bike, dibîne ku têda nivîsiye ku gereke ji wî kesî ra ku başiyek gel mirov kirî, qîmet bêt dayîn. Û kifş e ku çiqas başî

mezintir be û ew ê ku başî dayî, di başî kirinê da bê xereztir/minettir be, ewqas qîmetdana wî di nezera fitret û sirûştê da pirtir e. Mesela eger doxtorek te ji koriyê xilas bike, tu dê qedr û qîmetê jê ra bigirî û eger te ji mirinê xilas bike, tu dê bihayek pirtir bidiyê.

Vêca niha binhêre wa qencî û nîmetên xef û eşkere yên ku Xwedayê Teala dane me, ku eger cin û îns bixwazin yek ji wan bidin me, nikarin û me hay jê nîne û îhtimamê nadinê. Mesela ev hewayê şev û roj ku em behrê jê dibin û jiyana me û hemû heyî ya dorûber bi wê ve girêdayî ye; eger çarêkekî tunebe qet yek heywan jî sax namîne, çiqas qenciyek mezin e, ku eger cin û îns pêkve bixwazin tiştek wereng bidin, nikarin. Her weha hinekî der heqê qenciyên dî yên Xwedê da fikir bike; wek selametiya bedenê û hêzên eşkere, wek çav, guh, zewq û lemsê; her weha hêzên navdeyî, wek xeyal, wehm û aqil... ku bê wî qasî ku em jê bixwazîn û bê wî qasî ku minetê li me bike. Û bi van tenê jî bes nekiriye û pêxember rêkirine û kitêb hinartune û rêka bextewerî û bextreşî, bihişt û dojehê ji me re ronahî kiriye û çi tişta di dinya û axretê da em muhtacê wê, daye me, bê wî qasî ku muhtacê bendetî û guhdayîna me be û digel wê jî ku guhdan û neguhdariya me ji wî ra ferq nake.

Tenê ji feyda me ra emr û nehy kirine. Piştî bîranîna va nîmetan û hezaran nîmetên dî, ku hema bi rastî beşer nikare kulliyatê wan jî bîne hêjmarê, vêca çi bigihê çiq û cuz'ê wan. Gelo di sirûşta hewe da qîmetdana xweyê van nîmet û qenciyan lazim e? Û gelo xiyanet li xweyê van qenciyan, gorekî aqil çawan e?

Her weha ji wa tiştên di fitret û sirûştê da hatiye nivîsîn û çandin qîmetdana bi mirovê mezin e. Ev qîmetê ku xelk ji ehlê dinyayê û mal û serwer û padişahan û mezinan ra digirin, ji ber wê ye ku di melheza wan da ew mezin hatine dîtin û naskirin. Gelo çi mezinahiyek qas mezinahî ya Malikul Mulûk e ku ev dinyaya bêqîmet û hemû mexlûqê di wê da, ku piçûktirîn alem û tengtirîn neş'et e, hêca aqilê kesekî negihayiye, belkî kaşifên mezin yên dinyayê hêca nekarîne ji ziviroka rojî ya me bi xwe ku ji zivirokên rojî yên

dî piçûktir e agah bibin! Gelo di sirûşta aqlî da ev mezinê he ku pê îşareyekî ev alemên he û bi hezaran alemên veşartî xelq kirine û çêkirine, qîmetdana wî ne lazim e?

Her weha qîmetdana bi wî yê hazir di kitêba fitret û sirûştê da lazim e. Hûn dibînin ku eger Xwedê nekirî, kesek xirabiya kesekî bêje di wextê ne hazirbûna wî da, eger ew kes hazir bibe, bi awayek fitrî û sirûştî ji xirabî gotina wî disekine û kirr û bêdeng dibe û qîmet didiyê. Kifş e ku Xwedayê Tebarek we Teala li her cihî hazir e û hemû hebûn û heyî di bin çavdêriya wî da îdare dibin, belkî hemû pêkve di hizûra wî da ne û alem hemû «mehzer»ê rubûbî ye.

Vêca ey nefsa xebîsa nivîser, bîne bîr, ku çi zulm û gunehek mezin e eger tu bihêzên ku ewî bi qenciya xwe dayîn te, di hizûra pak û paqija wî da bêemriya wî mezinî bikî. Gelo eger te zereyek şerm û heya hebe ne heq e ku tu ji şerman bihelî û di erdê da biçî xwarê?

Nexwe ey ezîz, ezemet û mezinahî ya Xwedayê xwe bîne bîr û berê xwe bide nîmet û qenciyên wî û haziriya wî ji bîr neke û bêemrî û nefermaniya wî terk bide û di vî şerê mezin da, ser leşkerên şeytanî bikeve û welatê xwe bike welatê rehmanî û heqanî û leşkerê Heq Teala di şûna leşkerê şeytanî da deyne, da Xwedayê Teala alî te bike, ku tu di vê xebatê da bigehî meqam û mertebeyek dî û bigehî meydana mezintir ya şer, ku li pêş te ye; ew jî cîhada gel nefsê ye di alema batin da û meqamê duwê yê nefsê ku em ê jê biaxivin; înşaallah.

### Meqamê duwê

**Vebir: Der heqê şerê leşkerê navdeyî**
**yê rehmanî û yê şeytanî da ye**

Bizane ku nefsa mirov memleket û meqamek dî jî heye, ku memleketê batin û melekût e; leşkerê nefsê ku li wêderê ye, pirtir û muhimtir e ji wê ya di memleketê zahir û eşkere da heyî û şer û

xirecir û berberekaniya di navbeyna leşkerê rehmanî û şeytanî da li wêderê mezintir e û serketin pirtir û muhimtir e û heçî ya di memleketê mulk da eşkere dibe, serkaniya wê hema ew e. Eger her yek ji leşkerên rehmanî û şeytanî di wî memlektî de ser bikevin, di vî memleketî da jî ser dikevin. Cîhada gel nefsê di vî meqamî da li bal seydayên mezin û ehlê sulûk û exlaq gelek muhim û girîng e; belkî mirov bikare bêje ku serkaniya hemû bextewerî û bextreşiyan û derece û derekatên wê di wî meqamî da ye, ku gereke mirov di vê cîhadê da gelek hay ji xwe hebe.

Çêdibe Xwedê nekirî, ji ber binketina leşkerê rehmanî di wî memleketî da û vala hiştina wî welatî ji leşkerê xasib û ne ehl yên şeytanî re helaketek heruher ji mirov ra bê pêş ku neyê cubrankirin û şefaeta mehderkaran ber wî nekeve û Erhemur Rahimîn jî Xwedê nekirî bi nerehetî û xezeb berê xwe bidiyê û mehderkarên wî gel wî bibin dijmin. Jarî û rebenî ji wî ra ye, yê mehderkarên wî bibin dijminên wî. Xwedê zane kanê çi ezab û tarîtî û zehmet û bextreşiyek di pey vê xezeba îlahî û dijminiya ewliya ên Xwedê re heye, ku agirê dojehê, ziqûm, mar û dûpişkên wê pêkve li beranberê wê da qet ne tiştek e, Xwedê neke ewa ku hekîm û ehlê îrfan û sulûkê der heqê wan ezaban da dibêjin bi serê me yên zeîf û bêçare da bê, ku di beranberê wê da hemû ezabên dî sehl û hêsan in û hemû dojehên ku hewe guh lê bûyîn li beranberê wê da rehmet û bihişt in.

Xalib wesfê dojeh û bihiştê ku di kitêba Xwedê û xeberên enbiya û ewliya da hatine, dojeh û bihişta amela ye ku ji bona ceza û kirha karên baş û xirab hatine hazirkirin. Carna jî îşareyek veşartî dike bal bihişt û dojeha exlaqî ve ku muhimtir e, carna jî behsa bihişta liqa û raberbûnê û dojeha firaq û cudabûnê dikin ku ji hemûya muhimtir û girîngtir in; lê behs kirina wê hemû nixûmandî ye û tenê ji ehlê wê ra hatiye behs kirin. Ez û tu ne ehlê wê ne. Lê ya baş ew e em înkar jî nekin û me bawerî hebe bi hemû wê ya Xwedê û weliyên wî gotine, da belkî ev îman û baweriya giştî jî bi kêr me be. Carna jî çêdibe ku ji ber înkara ne di cih da û

redkirina bê wext û bê fêhm û zanîn ji bona me zererên zehfî têda hebin û di vê dinyayê da em pê nehesin. Mesela dema te guh lê bû ku filan hekîm û arif an filan murtazî tiştek got ku rêk neke-ve gel selîqe û viyan û xwesta te, di cih da nebêje gotinek pûç û xeyal e. Belkî ewê gotinê serkaniyek kitêbî, hedîsî û aqlî hebe ku te nedîtibe. Çi ferq dike ku tu feqîhekî ji ber fetwadanê der heqê xûnbihayê da ku zanîna te wê der heqê da kêm e û bê delîl û medrek tu wî red bikî, an yek ji ehlê sulûka îlellah û arifê bîllah gotinekî der heqê zanînên Xwedêyî an ehwalê bihişt û dojehê de bêje û tu bê delîl û medrek înkara wî bikî. Hêsan e hûn tohîn û bê edebiyê lê bikin.

Dibe ku ew ehl û pisporê wê fennê, delîlek ji kitêba Xwedê an ex-barên îmamên hîdayetker hebin û neketibe destê hewe, hingê bê ozrê meqbûl, hewe înkara Xwedê û Pêxember kiriye. Û kifş e ku gorekî min, ne tiştek durist bû, an zanîna min negiha bû wêderê, an min bervajiyê wê ji ehlê minberê bihîstibe, evên he ne ozr e.

Welhasil bila ez ji mexsedê dûr nekevim. Ewa der heqê bihişta exlaq û melekata da û dojeh û derekatan da hatî gotin, musîbete-ke ku em nikarin guh lê bibin jî.

Nexwe ey ezîz, fikir bike û çarekî peyda bike û rêkek ya xilasiyê û wesîlekî dest ve bîne û hana xwe ji Xwedayê pir birehm û di-lovan ra bibe û di şevên tarî da bi girî û zarî ve gazî wî bike ku ji vê cîhada gel nefsê ra alî te bike, da bi hezkirina wî tu ser bikevî û memleketê (wucûda) xwe bikî rehmanî û leşkerên şeytanî ji wê derênî û malê bidî destê xweyê wê yê eslî; da bextewerî û rehmetên Xwedê bidin te ku hemû wesfên bihiştî û hûrî û qesrên wê di beranberê wê da qet ne tişteke jî; ew jî hakimiyeta giştî ya Xwedê ye ku weliyên Xwedê jê xeber dane û seratir ji wê ew tişt in ku ne guhê kesî bihîstiye û ne çavekî dîtiye û ne di dilekî ra derbasbûye.(1)

---

1- Mecmeul Beyan; tefsîra ayeta 18 ji sûretê Secde.

**Vebir: Hinek hêzên navdeyî**

Bizane ku Xwedayê Teala bi qudret û hikmeta xwe di alema nediyar û navdeyî da hêz afirandine, ku gelek feydên wan hene. Ewa ku li vêderê bi behsa me ve girêdayî, sê hêz û quwa ne: Hêza «wahime» û «xezebiye» û «şehwet»ê ye. Ku her yek ji wan gelek feyde hene ji parastina mirov... ra. Tişta ku li vêderê gereke ez jê biaxivim ev e ku, ev sê hêz serkaniya hemû melekatên qenc û pîs e û jêdera hemû sûretên veşarî yên melekûtî ye.

Tefsîla vê xeberdana kurt ew e ku: Wek çawa mirov di vê dinyayê da rûmetek dinyayî heye ku Xwedê Teala ew gelek baş û qenc û bi çêkirinek bênimûne çêkiriye, bi awayek wereng ku aqilê felasife û mezinan ji ber wê di heyirî û şaşiyê da maye û heta niha zanistên heyîn nekarîne bi duristî nas bikin... ji mirov ra vêca şikl û dîmenek melekûtî û veşartî heye ku ew şikl li pey melekatên nefsanî û xulqê navdeyî, yê piştî mirinê ye, çi berzex be an qiyamet. Eger xulqê batin û meleke û serîra mirov însanî be, sûret û şiklê melekûtî yê wî jî însanî ye. Lêbelê eger melekên wî, ne însanî bin, sûretê wî jî ne însanî ye û li pey ewê serîre û melekê ye. Mesela: Eger melekeya şehewî û heywanî li ser batin û navdeyê wî xurt bibe û hukmê memleketê navdeyî (batin) bibe hukmê heywanî, hingê gorekî wî xulqî, sûretê wî yê melekûtî şiklê heywanekî bi xwe ve digire. Û eger melekeya xezeb û direndeyiyê ser navdeyê sîreta wî bikeve û hukmê memleketê batin û serîrê, bibe hukmê dirandin, sûretê veşartî yê melekûtî dibe şiklê yek ji dirindeyan. Û eger wehm û şeytenet, bû meleke û navdeyê wî û sîreta wî, bû xweyê melekatên şeytanî wek: Hîle, lihev zivirandina kar û meselan, buxtan û xebergêrî û xeybet, şiklê veşartiyê melekûtî yê wî, wê gorekî şiklê yek ji şeytana lê be. Û carna çêdibe du an çend meleke bibin bingeha şiklê melekûtî; hingê li ser şiklê çi yek ji heywana nabe, belkî şiklek ecêb û xerîb jê ra peyda dibe ku di vê alemê da mirov nikare nimûneyek wek wê jê ra bibîne. Ji Pêxemberê Xwedê (s.a.a) hatiye gêran ku roja qiyametê hinek ji xelkê bi şiklên wereng mehşûr dibin ku meymûn ber wan da ne

tiştek in.[1] Belkî çêdibe di wê cîhanê da kesekî çend şikl û sûret hebin; çiko ew cîhan, ne wek vê cîhanê ye ku ji şiklekî pê ve qebûl neke. Ev gotin gel burhanê jî rêk dikeve ku di cihê xwe da jê hatiye xeberdan.

Bizane kêşek û mîzan di van şiklên cûrbicûr da, ku yek ji wan mirov û însan e, di wextê derketina ruh ji bedenê ye; ku di alema berzexê da peyda dibe û di axretê da tê dîtin ku destpêka wê berzex e. Dema ruh ji bedenê derdikeve bi çi melekeyê ji dinyayê biçe, sûret û şiklê axretê bi xwe ve digire û çavê melekûtiyê berzexî, ewî dibîne û ew bi xwe jî dema çavê xwe yê berzexî veke, şiklê xwe dibîne, eger çav hebe. Ew kesê di vê cîhanê da bi şiklekî ye, nabe ku di wê cîhanê da jî bi wî şiklî be. Xwedê Teala li ser zimanê hineka di heşrê da weha dibêje: «Çiko te ayetên me ji bîr kirin, îro tu hatî ji bîr kirin»[2]. Ey bêçare, te çavê mulkî yê eşkerebûn hebû, lê navdeyê melekûtî ya te kor bû, tu niha bi koriya xwe hesayî, lê tu ji ewil ve kor bûyî, te çavê dil ku ayetên Xwedê pê tên dîtin, tunebû. Ey bêçare, te bejn û bala û şiklê spehiyê mulkî heye, lê mîzan û kêşeka melekût û batin, ne ew e; gereke tu duristiya batin û navdeyî peyda bikî heta tu di qiyametê da serbilind bî. Gereke ruhê te, ruhê mirov be, heta ku şiklê te yê alema berzex û qiyametê jî şiklê mirov be. Tu goman dikî alem û cîhana veşartî û batin ku cîhana kifşbûna xefan û eşkerebûna melekata ye, wek cîhana eşkere û dinyayê ye, ku tevhevî û xeletî têda çêdibe? Çav û guh û dest û pî û endamên te yên dî, hemû bi zimanên melekûtî, belkî ser gotina hinekan, bi şiklên melekûtî li ser heçî tişta te kirî, wê şehdeyiyê bidin.

Vêca ey ezîz, çavê dil veke û xebatê bike û rehmê bi halê xwe bibe, da belkî tu bikevî ser şiklê mirovan û bi şiklê mirovan ji vê dinyayê derkevî; hingê tu ji xilasbûyan û ehlê bexteweriyê yî. Ne weha be tu goman bikî ev we'z û xeberdan e; ev netîce û dest-

---

1- Ilmul Yeqîn, c, 2, p. 901

2- Îşare ya bal ayeta 125-126 ya sûretê Taha ve.

hata burhana hukmî ya hukemayên mezin û exbarên rastgo û paka ye; li vêderê, me ne li ber e ku em delîlê bînin û riwayetan bigêrin.

**Vebir: Der heqê pêşgirî ya pêxemberan ji serberedayiyê da ye**

Bizane ku çêdibe wehm û xezeb û şehwet ji leşkerê rehmanî bin û bibin hegera bextewerî ya mirov, eger tu wan teslîmê aqilê durist û pêxemberên Xwedê bikî; û dîsa çêdibe ji leşkerên şeytanî bin jî, eger tu ewa serbixwe bihêlî û ser wan du hêzan, wehmê bikî hakim û hefsarê wan herduka bidî destê wê. Ev jî ne xef e ku çi yek ji pêxemberên giranqedr bi awayek giştî û ji kokê pêşiya wehm û xezeb û şehwetê negirtine û çi yek ji wa yên bi aliyê Xwedê ve gazî dikin negotine gereke bi temamî şehwet bê kuştin û mirandin û xezeb bi temamî bên temirandin û teybîra wehmê ji dest bêt dayîn, belkî gotine: Gereke pêşî li wan bêt girtin û ew bikevin li bin mîzan û kêşeka aqil û qanûna îlahî da û bi wê rêkê ve berpirsiyariya xwe bi cih bînin. Çiko her yek ji van hêzan dixwazin karê xwe bikin û bigehin mexseda xwe, her çend bibe sebebê xirabî û tevheviyê. Mesela: Nefsa heywaniya ku di nav şehwetê de noqî bûyî, dixwaze serberedayî be û bigehê mexsed û murada xwe, eger çi bi zinaya muhsine di mala Xwedê da be. Û nefsa xezebgirtî dixwaze bigehê mexseda xwe, eger çi bi rêka kuştina enbiya û ewliyan ve be. Û nefsa xweyê wahme yên şeytanî dixwaze karê xwe bike, eger çi bibe sebebê fesad û xirabiya di erdê da, alem û cîhan tevhev bibe.

Pêxemberên Xwedê (a.s) hatin, qanûn anîn û kitêbên ezmanî ji wan ra hatin, da ku pêşiyê li zêdegaviyên tebîet û sirûştê bigirin û nefsa mirov bixin bin emr û fermana aqil û şer'ê da û ewê terbiyet bikin bi awayek wereng ku ji mîzan û pîveka aqil û şerî’etê dernekevin û gorekî wan, amel bikin. Nexwe heçî nefsa ku mîzan û pîvekên qanûnên îlahî û aqlî li ser memleketê xwe bike hakim, ew bextewer e û ji ehlê xilasiyê ye; eger ne, gereke ji ber bextreşî û tarîtî û zehmetiyên ku pêşiya wî da heyîn û ji ber wan şiklên

tirsnak û bizdan yên qebr û berzexê ku di qiyamet û dojehê da jî digel wî hevrê ne, û ji ber desthata melekên xirab û exlaqên kotî û fasid ku ji wî venabin, hana xwe ji Xwedê ra bibe.

#### Vebir: Der heqê kontrola xeyalê da ye

Bizane, ewilîn şertê mucahidê di vî meqamî û meqamên dî da, ku dibe sebebê serketinê li ser şeytan û leşkerê wî, parastina teyrik û firindeyê xeyalê ye. Çiko ev xeyal firindeyeke pirfirok e; ku her bêhn ji çiqekî difirê ser çiqas dî û sekin jê ra nîne. Û xeyal yek ji heçk û destgiraye ye ku şeytan bi wê rêkê ve ji bextreşiyê ra gazî dike û bi wî aliyî ve dibe.

Mirovê mucahid ku li ber e xwe durist bike û dilê xwe pak û paqij bike û ji leşkerê şeytan vala bike, gereke hefsarê xeyalê bi dest xwe bigire û nehêle bi ku ve bivê bifire û gereke pêşiyê li xeyalên xirab û pûç bigire; xeyalên wek kirina guneh û fiîlên şeytanî. Û gereke daim fikir û xeyala xwe bide ser tiştên hêjayî. Û eva he her çend di destpêkê da hinekî zehmet tê dîtin û şeytan û leşkerê wî ewê li ber çavan mezin dikin, lê bi hinekî hay ji xwe manê, kar rehet û hêsan dibe. Çêdibe tu jî qederekî evê yekê tecrube bikî û hay jê bimînî: Kengê ku nefsê berê xwe da karek pûç û nebaş, tu berê wê bizivirînî û bidî karê ne heram û mubah û berketî, eger te netîce girt ji xwe li ser vê tewfîq û rêketinê şukrê Xwedayê Teala bike û dest ji vî karî nekêşe, da belkî Xwedê bi rehmeta xwe rêkek melekûtî ji te ra veke û tu bikevî ser rêka rast ya însaniyetê û karê sulûka bal Xwedê ve ji te ra rehet bibe.

Hay jê hebe û bizane ku xeyalên xirab û pîs, û fikirên pûç, ji berve avêtinên şeytanî ne, ku dixwaze bi wê rêkê ve li ser memleketê te yê batin deshelatê ji leşkerê xwe ra çêke, û tu ku mucahidê li dij şeytan û leşkerê wî da yî, tu dixwazî sefheya nefsa xwe bikî Xwedêyî û rehmanî, nexwe gerek tu hay ji hîle û pîlanên wî leînî hebî û van xeyalên pûç ku bervajiyê razîbûn a Xwedê Teala ne, ji xwe dûr bikî; da bi hezkirina Xwedê tu vê çeperê ku gelek berketî ye,

di vî şerî da ji destê şeytan û leşkerê wî derênî. Çiko ev çeper, serhed e; eger tu li vêderê ser ketî hêvîdar be.

Ey ezîz! Di her bêhn û wextekî da alîkariyê ji Xwedayê Teala bixwaze û bi halê şikestî ve li pey hev bêje: Ey Xwedê! Şeytan dijminek mezin e ku daim berê wî li enbiya û ewliyayên te bûye, tu hevrê be digel min ê zeîf û bêçareyê di nav ewham û viyanên pûç, batil, xeyal û xurafatan ra, ku ez bikarim ser vî dijminê xurt bikevim; û di vê meydana şerê da tu gel min be, da ez bikarim vî dijminê ku gefa li însaniyet û mirovaniya min dike bişikînim; tu bi xwe alî min bike, da ez bikarim leşkerê wî ji vê herêmê ku mexsûsê te ye derînim û destê wî xasibî ji welatê te bibirim û kurt bikim.

**Vebir: Der heqê muwazeneyê da ye**

Ji wan tiştên di vê rêkê de dibin alîkar û gereke mirov hay jê bimîne, muwazene ye. Ew jî ev e ku, mirovê aqilmend feyde û zererên her yek ji exlaqên xirab û melekatên rezîl ku jêderên şehwet, xezeb û wahimê ne û hêç in û di bin fermana şeytan da ne, muqayise bike digel feyde û zererên her yek ji exlaqên qenc û fezîletên nefsanî û melekatên berketî, ku jêderên van e; lêbelê li bin fermana aqil û şerî'etê da ne, vêca di pey ra binhêre baştir kîjan e, ewê bike. Mesela: Nefsa serberedayî ku xwest û viyanên wê hed û sînor jê ra tunehin, û eva he jê ra bûye meleke û di wê da cih girtiye û gelek melekên dî jî vêca ji wê zêde bûne û rezîletiyên zehfî civiyane hev, ji feydên wê ew e ku der heqê kirina çi pîsatî û zêdegaviyan da kêmasiyê neke û xwe jê venede û çi malê dest ve bêt, bi çi rêkê ve bêt, xwe jê paşda nede û çi tişta ser viyana wî be, bike; her çend ku xirabî jî pê ve bên.

Û ji feydên xezebê, ku ji nefsê ra bibe meleke û gelek melekên rezîl yên dî jî ji wê peyda bibin, ew e ku kî ber destê wî bikeve bi bindestkirina wî, zulmê lê dike, û eger kesek hinekî berxwedanê bike, çi ji destê wî be li beranberê wî da texsîratiyê nake û bi çê-

bûna tiştek kêm, ku ne li ser viyana wî be, dest şer dike û ceng û qerqeşê rê dixe; û bi çi rêkê ve jê ra çêbe, heta eger bibe sebebê xirabî û fesada alemê jî, tişta bervajiyê meyl û viyana wî be, ji nav dibe.

Her weha feyda nefs a xweyê wahime yên şeytanî, ku ev meleke tevlî wê bûye, ev e ku bi çi hîle û şeytenetê çêbe, xezeb û şehweta xwe bixe kar û pêşiyê lê veke, ewê dike û hemû nexşe û pîlana têxe rê, da ku xwe li ser serê evd û bendên Xwedê mezin û xurt bike, her çend bibe sebebê rebenkirina binemalekî, an bêçarekirina xelkê bajarekî an perîşankirina memleketekî.

Evên he ew feyde ne ku di van hêz û quwan da hene, eger li bin emr û fermana şeytan da bin.

Halhale eger mirov baş baş bide aqilê xwe û halê van kesan berçav bigire, mirov dibîne ku kesek çiqas qewî be û meyl û xwest û viyanên xwe bi dest ve bîne, dîsa negihaye yek ji hezaran jî. Belkî ji xwe çênabe di vê alemê da her kes bigehê viyan û arzûyên xwe; çiko ev alem, alema tezahumê ye û mewadên vê alemê neguhdarê îrade û viyanên me ne û meyl û viyanên me jî hed û sînorek jê ra nîne.

Mesela: Quwe û hêza şehewî, di mirov da bi awayekî ye ku eger bi ferzek mehal jinên bajarekî pêkve dest wî ve bên jî, wê bikeve fikra jinên bajarê dî da û eger yên welatekî dest ve bên, wê berê xwe bide welatek dî. Daim ewê dixwaze ya ewî tuneyî. Her çend eva he ferezî û xeyalek pûç e; lê dîsa tenûra şehwetê her pêkirî ye û mirov negihaye arzû û mexseda xwe.

Her weha quweya xezebê, di mirov da wereng hatiye çêkirin ku eger bibe serok û xweyê memleketekî, wê berê xwe bide memleketek dî, ku ne di destê wî da ye. Û belkî çiqas dest ve bêt jî wê ev quwe di wî da zêde bibe. Kesê înkar bike, bila binhêre halê xwe û halê xelkê alemê ji padîşah û qudretmend û zordaran, hingê wê gotina me durist bizane û teyîd bike.

Nexwe her daim mirov aşiqê wê ye, ya ne di destê wî da û ewa ku neyî. Û eva he ew sirûşt û fitret e ku seydayên giranqedr û hekîmên mezin yên Îslamê nexasima şêx û seydayê me arifê îlahî û kamil cenabê Axa Mîrza Muhemmed Aliyê Şahbadî (ez gorî wî bim)[1] pê wê, gelek ji zanînên îlahî sabit dike[2] ku ne girêdayî ne bi behsa me ve.

Di her hal û karî de eger mirov bigehê mexseda xwe jî, gelo çiqas wê behremend bibe? Ma quwe, hêza ciwanî û xortîniyê çiqas berdewam e? Dema bihara omr berew payîz biçe şahî ji dil û, hêz ji endaman derdikeve; zaiqe ji kar dikeve û tam kêm dibe û çav û guh û hêza pê hesanê û hêzên dî nekar dibin û kêmasî dikeve lezetan, an bi temamî ji nav diçin.

Hemû awayên nexweşiyan êrişê tînin; dezgahên givirandin û kêşan, dûrkirin û bêhngirtin, nikarin karê xwe bikin û xêncî ji wah û ah û êşa dil, hesret û poşmaniyê tiştek ji mirov ra namîne. Nexwe ji zemanê fêhmabûnê heta ji karketin, an li kêmasîdana quwe û hêzan, ji mirovê li ser xwe û sehîh û salim ra ji sî çil salan

---

1- Mîrza Muhemmed Alî kurê Muhemmed Cewadê Îsfehaniyê Şahabadî (1292-1369 h.q) feqîh, usûlî, arif û feylesofê pir bi nav û dengê sedsala çardeh ê hicrî ye. Ewil li bajarên Îsfehan, Tehran û Necefê ders xwend. Birayê wî, Şêx Ehmed, Mîrza Muhemmed Haşimê Çarsûqî li Îsfehanê, Mîrza Haşimê Îşkewerî, Mîrza Hesenê Aştiyanî li Tehranê û Axondê Xorasanî, Şerî'etê Îsfehanî û Mîrza Muhemmed Teqiyê Şîrazî li Necefê, seydayên wî bûne. Ewî di destpêkê da li bajarê Samirrayê Îraqê û paşê li Qum û Tehranê li Îranê dest bi dersdanê kir ku Îmam Xumêynî (Xwedê rehma xwe lê bike) li bajarê Qumê, di dirêjîya salên 1347-1354 h.q, bal wî dersên îrfan û exlaqê wergirt. Îmam Xumêynî gelek behsa qencî ya wî dikira. Rehmetîyê Şahabadî piştî vegerîna ji Qumê li bajarê Tehranê cih girt û dest bi terbiyeta şagirdan kir û hema li wê bajarê wefat kir û li bal qebrê hezretê Abdulezîmê Hesenî, di meqberê rehmetiyê Şêx Ebulfutûhê Razî da hat bin ax kirin. Ji berhemê wî ne: Şezeratul Me’arif, el-Însan wel Fitret, el-Quran wel Itret, el-Îman wer Rec'e, Menazil es-Salikîn, şerh li ser kitêba Kifaye.

2- Reşehatul Bihar, kitêba “el-Însan wel Fitre”.

zêdetir nîne, ew jî eger nexweşî û gîrûgiriftên ku her roj em dibînin û jê bêxeber in, jê ra çênebin û neyên pêş.

Hema niha ez ji te ra ferz bikim, ferzek xeyalî û bê binyat: Hema em bêjin eve te sed û pêncî salan omr kir û hemû awayên şehwet û xezeb û şeytenetê ji te ra civiyan û fereza qet tu nexweşî ji te ra çênebûn û qe tu tiştên ne li ser meyla te ji te ra nehatin pêş, gelo ji vî zemanê kurt ku wek bayê dibore, çi ji te ra heye? Ji van lezetan, te ji jiyana xwe ya her û her ra çi qût berhev kiriye? Ji roja perîşanî ya xwe ra; ji roja nedarî û tenêtî ya xwe ra; ji berzex û qiyameta xwe ra; ji mulaqat û rû bi rû bûna digel Xwedê, melaîketan, ewliyan û pêxemberên Xwedê ra, te çi hazir kiriye? Xêncî ji karên pîs, kotî û bêmerês, ku hema tenê Xwedê Teala bi şiklê wan dizane û bes; ku wê di berzex û qiyametê da teslîmê we bikin.

Agirê dojehê û, ezabê qebr û qiyametê... ku te guh lê bû û te qiyas kir gel agir û ezabê dinyayê; te xelet fêhm kiriye û xelet qiyas kiriye. Agirê vê cîhanê agirek peydabûyî yê sar e. Ezabê vê cîhanê ezabek sehl û hêsan e, fêhma te di vê alemê da kêm û kin e. Eger hemû agirê vê cîhanê kom bikin jî, nikare ruh û canê mirov bişewitîne; agirê wêderê xêncî cism û bedenê, ruh jî dişewitîne, dil dihelîne, mejî dişewitîne. Evên he hemû ku te guh lê bû û heçî ya te heta niha bihîstî dojeha kar û amelê te ye, ku tu li wêderê hazir dibînî. Xwedayê Teala kerem dike: «Ewa kirine, hazir dibînin».[1] Te li vêderê malê yetîm xwariye û lezet biriye, Xwedê zane şiklê wî karê te kirî û jê lezet birî, çi ye! Te li vêderê xeberên pîs ji xelkê ra gotine û dilê wan sotandiye, hema Xwedê zane ev ê dilşewitandina bendên Xwedê çi ezab jê ra heye! Dema tu bibînî tu dê pê bihesî, kanê te bi xwe bi destê xwe çi ezab ji xwe ra hazir kiriye. Dema tu xeybet bikî, hingê şiklê wê yê melekûtî yê hazirbûyî, wê li te bêt zivirandin û tu digel wê mehşûr bibî û tu dê ezabê wê tam bikî. Evên he ku dojeha kar û amela ne, dojeha sehl û rehet û sar û xweş e û ji wan kesa ra ye ku ehlê guneh in; lê

---

1- Kehf / 49

vêca kesên bûne xweyê meleke û tebîetên xirab, rezîl û pûç, wek: Teme', hirs, cuhûd, cidal û şer, hejêkirina mal, meqam, dinyayê û melekeyên dî yên pîs û rezîl, ew dojeh e ku mirov nikare bide fikra xwe, ew cûre şikl jê ra hene ku di dilê min û te ra derbas jî nabe, ku ji navdeyê nefsê bi xwe da derdikeve û ehlê dojehê ji ber ezabê wan dibizdin. Di hinek riwayetên cihê baweriyê da hatiye ku ji mutekebiran ra di dojehê da dûl û geliyek heye, dibêjinê: «Seqer», ji ber germa zehfî, şikayeta xwe bir bal Xwedê û izn jê xwest ku bêhnekî bigire, piştî girtina iznê, bêhmek girt ku dojeh ji ber wê şewitî.(1)

Carna ev sebeb welê tên, ku mirov ji her û her ra di dojehê da dihêlin, çiko ew îmanê ji mirov digirin, wek hesedê. Çawa ku di riwayetên durist da hatiye: «Wek çawa agir dara dixwê, hesed jî îmanê dixwe». Û wek hezkirina ji mezinahî, mal û dinyayê, çawa ku di riwayetên sehîh da hatî: «Eger du gorî ji du aliyan ve bikevin nav keriyek pezê bê şivan, zûtir ji wê ewan ji nav nabe, wek çawa ku huba mezinahiyê û hezkirina dinyayê dînê mirovê bawerdar jê digire û ji nav dibe».

Xwedê neke ku, dûmahîka gunehan bibe sebebê çêbûna meleke û exlaq ên zulmanî û pîs û, ew jî vêca bibin sebebê ji destçûna îmanê û mirina di halê kufrê da; çiko dojeha kafiran û dojeha baweriyên pûç û nedurist gelek zehmetir û dijwartir û tarîtir e ji wan herdu dojehan.

Ey ezîz! Di zanistên bilind da sabit bûye(2) ku derecên dijwariyê xilasek jê ra tune, çiqas tu û yên dî bidin aqilê xwe, hêj ji wê jî dijwartir heye. Eger te burhana hukema nedîtiye û tu keşfa ehlê dil qebûl nakî, lê hemd ji Xwedê ra tu ehlê îmanê î û tu pêxemberan (selam li ser wan bin) rastgo zanî, û xeberên di kitêbên muteberên me da hatine, ku zanayên îmamî hemû ewa qebûl dikin tu

---

1- Kafî, c. 2, p. 310, h. 10

2- Esfar, Sedrul Muteellihîn, c. 1, p. 45, 56, 69

durist zanî; duayên ji îmamên pak gihayine destê me, tu durist zanî, te ku serwerê ehlê teqwayê mîrê bawerdaran Alî (a.s) dît, te ku munacata serwerê secdeberan Zeynul Abidîn (a.s) di dua Erefe ya Ebû Hemze da dît, hinekî di naveroka wan da bifikire û piçpiçên wê bide aqilê xwe. Ne lazim e tu duayek dirêj bi lez û bez di carekî da bixwînî û di me'na wê da fikir nekî, min û te halê Seyyidus Sacidîn (a.s) nîne ku, em wê duaya berfireh li ser halê xwe bixwînin, nexwe şevê çaryekekî, sêyekekî ji wê bixwîne û di me'ne û piçên wê da fikir bike, belkî tu jî halekî peyda bikî. Em ji van jî derbas bibin, hinekî di Quranê de bifikire û bibîne soza çi ezabî daye ku ehlê dojehê ji Malik dixwazin ku wan bikuje! Heyhat! Mirin li holê nîne. Û binhêre Xwedê Teala der heqê yên poşman bûne da dibêje: «[Ew dibêjin] Xwezika di aliyê Xwedê da min kêmasî nekirîbûya»[1]. Gelo ev çi poşmanî ye ku Xwedê Teala bi vî awayî jê xeber dide. Di ayeta pîroza Quranê da fikir bike û, bê hizr û bê fikir jê derbas nebe. Di behsa roja qiyametê da, kerem dike: «Roja ku şîrde, wê ya şîr didayê ji bîr dike û her avisek barê xwe davêje û tu xelkê serxoş dibînî, halhale ne serxoş in, lê ezabê Xwedê dijwar e”. (Hec / 2).

Ezîzê min, durist bifikire; haşa Quran, ne kitêba çîroka ye; gel hewe henekan nake, binhêre çi dibêje? Ev çi ezab e ku ezîz û dilberan jî bi mirov dide ji bîrkirin? Pêgiranan bêbar dike, gelo çi ezabek e ku Xwedê Teala bi vî awayê girîng behsê jê dike û li cihek dî dibêje: «Mezin û dijwar!». Xwedayê ku mezinahî û ezemeta wî hed û hesr jê ra nîne, eger dibêje: «ezabek dijwar û mezin e», vêca hesaba wê bikin, kanê çi ye? Aqilê min û te nikare evê têbigehê. Eger tu binhêrî xeber û riwayetên Ehlê Beyta pak (a.s) û hinekî têda bifikirî, tu dê pê bihesî ku li wê cîhanê mesele-ya ezabê, ne wek wan ezaba ye ku te zaniye. Raberkirina wê gel ezabê vê alemê qiyasek batil, pûç û xelet e.

Ezê hedîsek berketî ji Şêxê Sedûq bigêrim, ku tu bi meselê bihesî

1- Zumer / 56

û bizanî musîbet çiqas mezin e, halhale ev hedîs der heqê dojeha amelan da ye, ku ji hemû dojehan sartir e. Gereke tu vê jî bizanî: Şêxê Sedûq ku ev hedîs ji wî ye, keseke ku alim hemû xwe li beranberê wî da piçûk zanin û qîmet didinê, ew keseke ku bi dua Îmam (a.s) hatiye dinyayê; keseke ku berê Îmam Zeman (Xwedê hatina wî zû bike) ketiye. Nivîser bi rêkên muxtelif ve ji zanayên mezin yên îmamî ku digehênin Şêxê Sedûq hedîsê neqil dike û meşayixên navbera me û Sedûq da hemû ji wan kesên cihên baweriyê ne. Nexwe eger tu ehlê îman î gereke te bawerî pê hebe.

**Hasilê hedîsê ev e:**

Rojekî ku Pêxember (s.a.a) rûniştibû, Cebraîl bi kol û xem ve ku rengê wî guherîbû, hat balê, Pêxember gotê: «Çima ez te xemdar û mereqdar dibînim? Got: Ey Muhemmed (s.a.a) çima ez ne wereng bim, halhale ev roj rojên pifandina dojehê ye. Pêxember (s.a.a) got: Pifandina dojehê çi ye? Got: Xwedê ferman da agir, ew hezar sala şariya heta sor bû, pey ra dîsa emrê wê kir, hezar sala şariya heta sipî bû, piştî fermanek dî ku dayê hezar sala şariya heta reş bû û niha reş û tarî ye. Eger helqeyek zincîra wê ku heftêh zir'a ye, bikeve ser dinyayê, bêşik ji ber germa wê, wê dinya bihele, eger dilopek ji ziqûm û «Zerî»a wê bikeve nav ava ehlê dinyayê, wê ji ber bêhna wê, ehlê dinyayê hemû bimirin. Vêca Pêxember (s.a.a) giriya, Cebraîl jî giriya. Vêca Xwedê melaîketek bi aliyê wan da rê kir û gote wan: Xwedê selaman li hewe dike û dibêje min hûn herdu ji kirina gunehan parastin û êdî bi wê ez hewe ceza nakim».

Ezîzê min! Hedîsên wek vê gelek in, hebûna dojeh û ezabê dijwar jî ji wan tişta ye ku di hemû dînan da heye û ehlê mukaşifê û xweyê dilan di vê dinyayê da nimûneyek ji wê dîtine. Baş di vê hedîsê da bifikire, eger der heqê duristiya wê da hema tu goman jî bikî, gelo ne heq e ku tu wek dînan li çolê bikevî? Çi bûye ku em evqas ketine nav bêxeberî û cehaletê re? Gelo melaîketek wek çawa hatî bal Pêxember û Cebraîl, hatiye bal me jî ku me ji ezabê

wê êmin bike? Di wî halî da jî Pêxemberê Xwedê heta axirîka omrê xwe jî ji tirsa Xwedê bêtebat bû û xew û xwarinek rehet tunebû. Girî û zarî û munacat û nalenalên Alî bin Husêyn (a.s) dilan diperitîne. Çi li me qewmiye ku em evqas bêperde ne ji kirina gunehan ra û li huzûra rubûbî da evqas bêşerm in. Ey wax ji me û bêxeberiya me ra! Ey way ji me û dijwariya sekerata mirina me ra! Way ji me ra di berzex û dijwariyên wê da û di qiyametê û tarîtiyên wê da! Ey wax û way ji me ra ji ber dojeh û ezab û cezayê wê!!!

**Vebir: Der heqê îlaca exlaqên pîs da ye**

Ezîz! Ji xew hişyar bibe û ji bêxeberiyê derkeve û xwe zîrek bike û heta muhlet heye firsend û derfetê ji dest nede; hêca ku tu dijî, çarekî ji xwe re bibîne; heta hêzên te di îxtiyara te da ne, tu ciwan î, exlaqên pîs desthelatî ser te nekiriye, melekatên rezîl di te da cih negirtine, ji bona ji navbirina exlaqên xirab û temirandina agirê şehwet û xezebê, çarekî bibîne.

Baştirîn rêka îlacê ku zanayan ji bo me gotine, ev e ku: Dema te exlaqek ji van pîs exlaqan di xwe da dît, tu mêrmêrane heta qederekî bervajiyê wê amel bikî û di beranberê nefsê da rabî, û di dijê wê xwesta rezîl da, bikevî kar û amel. Û di her halî da ji Xwedê bixwazî ku di vê berberekaniyê de alî te bike, bêşik piştî demek kurt wê ew exlaqê pîs ji nav biçe, şeytan û leşkerê wî, wê ji wê çeperê baz bidin û leşkerê rehmanî wê xwe li wêderê cih bike.

Mesela yek ji exlaqên rezîl û pîs ku sebebê ji navçûnê û tengî ya qebrê ye û dibe sebebê ezabê li herdu cîhanan, bê exlaqiya digel ehlê malê, cîrana, hevkaran, xelkê gund û mehellê ye, ku jêderê xezeb û şehwetê ye. Eger mirovê mucahid demekî lê bixebite ku kengê nexweşî û tiştek ne li ser viyana wî hat pêş, ku bû sebebê geşbûna agirê xezeba wî û xwest dilan bişewitîne, dijûna bike û xeberan bêje, bila bervajiyê nefsa xwe amel bike, netîce û desthata vî karê kotî û xirab, bide bîra xwe, xwe nerm bike û

lanetê li şeytan bike û ji ber wî hana xwe ji Xwedê ra bibe. Ez soz didim hewe, eger hûn evê yekê bikin, piştî çend careka wê ew exlaq bi temamî bêt guherîn û exlaqê qenc bikeve şûna wê û di memleketê canê hewe de cih bigire. Lê eger hûn gorekî meyla nefsê rabin, çêdibe ku hema di vê cîhanê da hewe ji nav bibe û Xwedê nekirî bibe sebebê kuştina kesekî, çêdibe di halê xezebê da mirov ji newamîsê îlahiye ra xeberan bide, çawa ku me dît hineka di halê xezebê da xeber gotin û murted bûn. Hukema gotine: «Gemiya bê xodan a ku di nav mewc û pêlên deryayê da maye, ji xilasiyê ra nêzîktir e ji xilas bûna mirovê xezebgirtî»[1].

An eger Xwedê nekirî, tu ji ehlê cidal û xirecir û serxistina xwe yî, di gotûbêjên zanistî da -çawa ku ev exlaqê kirêt di hinek ji me telebe û feqiyan da heyî- demekî bervajiyê nefsê amel bike, di civatan da ku tijî xwenda û nexwenda ne, eger gotûbêjek çêbû û te dît yê li beranberê te da gotina wî durist e, bêje ez xelet im, û gotina wî tesdîq bike; ez hêvîdar im di zemanek kêm da ev rezîletî rabe. Xwedê neke, ev gotina hinek ji ehlê mukaşifê durist be, ku dibêje ji min ra mukaşefe çêbû: «Texasuma ehlê agir» ku Xwedê jê behs dike, mucadila ehlê ilm û hedîsê ye. Eger îhtimala duristiyê jî bêt dayîn, gereke mirov pê rabe ku, evî xesletî durist bike.

Di hedîsê da hatiye ku Pêxember (s.a.a) kerem kir: «Xelkên pêşda ji ber mucadile û xirecira di dîn da ji nav çûn... Ehlê xirecirê xusirîne bi xusirînek temam... Şefaeta min ber ehlê xirecirê nakeve... Piştî pûtperestiyê yekemîn tişta ku Xwedê nehya min jê kirî, xirecir e».

Dîsa kerem dike: «Heqîqeta îmana ebd, kamil nabe, heta xwe ji xirecirê venede; her çend heqî gel wî be».

Vê der heqê da hedîs zehf in. Çiqas nebaş e ji serketinek kêm ra ku çi eser û fêkî jê ra nîne, mirov ji şefaeta Pêxemberê Xwedê

1- Tehzîbul Exlaq û Tethîrul E'raq, Ibn Miskiweyh, babetê Tehewwur û Cubn, p. 162. vê xeberdanê ji Buqrat neqil dike.

bêbehr û mehrûm bibe û gotûbêja ilmî ya durist, ku ji baştirîn îbadeta ye, mirov bixe di dereca mezintirîn gunehan da, ku di pey pûtperestiyê ra tê.

Di her hal û karî da gereke mirov yek-yekê exlaqên kirêt û pîs, berçav bigire û bi muxalefet û bervajî amelkirina xwest a nefsê, ewê ji memleketê ruhê xwe derîne. Dema xasib derket, xweyê malê wê bi xwe be, êdî ne muhtacê zehmetî ya kesek dî ye.

**Vebir: Çareya exlaqnebaşiyê**

Şer û mucahida gel nefsê, ku di vî meqamî da xilas bû, dema mirov leşkerê îblîs ji welat deranî û memleket kir cihê melaîketa û bingeha bendeyên qenc ên Xwedê, karê berveçûna Xwedê hêsan û rehet dibe, rêka durist a însaniyetê eşkere û ronahî dibe, dergehên xêr û xweşî, bihiştan li ber wî vedibin, deriyên dojeh û derekatên wê li ber wî tên girtin. Xwedayê Teala bi çavê rehmet û dilovaniyê lê dinhêre û di nav silk û cilkê ehlê îmanê da tê pêçan û dibe ji ehlê bextewerî û eshabê yemînê. Rêkek bi aliyê dergehê mearifên îlahî ve jê ra vedibe ku hedef û armanca çêkirin a cin û însa ye[1] û Xwedê Teala di wê rêka pir xeter da alîkariya wî dike.

Me dixwest em hinekî ji sêyemîn meqamê nefsê û çawaniya cîhada gel wê xeber bidin û ji hîleyên şeytan biaxivîn, lêbelê me ew munasibê vêderê nedît û em jê derbas bûn. Ez ji alîkariya Xwedê hêvîdar im ku bikarim nivîsokek serbixwe vê der heqê da binivîsim.

1- Îşare ye bal: Zariyat / 56 ve.

## HEDÎSA DUWÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب، عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن أبي المغرا، عن يزيد بن خليفة، قال: قال أبو عبد الله، عليه السّلام:

**«كُلُّ رِياءٍ شِركٌ. إنّه مَن عَمِل للنّاسِ كانَ ثَوابُه على النّاسِ، و مَنْ عَمِلَ لِلّه كانَ ثَوابُه عَلى الله.»**

Bi seneda hatiye gotin, Yezîdê kurê Xelîfe ji Îmam Sadiq (a.s) digêre ku kerem kir: «Hemû 'riya' şirk in. Kesê ji xelkê ra bixebite, kirha wî ser xelkê ye, û yê ji Xwedê ra bixebite, kirha wî ser Xwedêye».[1]

### Vebir: Der heqê riyayê û derecên wê da

Bizane, riya ew e ku mirov karên qenc û xesletên baş an baweriyên heq, ne bi niyeta durist a Xwedêyî, belkî ji nîşandana xelkê ra ji xwe nîşan bide, da ku qîmet li bal wan peyda bike, an li bal wan bi diyanet û emanetdariyê ve meşhûr bibe. Riya jî di çend meqama da ye:

Meqamê yekê; Ew du derece ye: Ya yekê, ew e ku baweriyên heq û zanînên îlahî ji xwe nîşan bide, da ku bi diyanet li bal xelkê meşhûr bibe, qedr û qîmet bidinê. Mesela, wek vê ku bêje: Di hebûnê da ji Xwedê pê ve ez tiştekî xodan eser nizanim. An: Xêncî ji Xwedê ez tewekula xwe nadim ser kesî. An bi kinaye û rasterast

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 293, kitêba "Îman û Kufr", babetê riyayê, h. 3

xwe, xweyê baweriyên durist bide nîşandan. Û ev awayê duwê pirtir tê dîtin. Mesela: Dema behsa tewekulê an razîbûn bi qeza îlahî dikeve ber behsê, ew bi ah kêşan an ser hejandinekî xwe di nav wan da nîşan dide.

Dereca duwê, ew e ku baweriyên nedurist ji xwe dûr bike û xwe jê berî bizane bi niyeta wî qasî ku xwe di dilê xelkê da bide hez kirin. Çi deqe-deq be û çi bi kinaye.

Meqamê duwê; Ew jî du derece ye: Yek ew e ku de'wa xesletên qenc û baş bike û ya dî ew e, bi awayê hatiye gotin ne başiyan ji xwe dûr bizane.

Meqamê sisê; Riyaya marîfetê ye li bal feqîhan (Xwedê ji wan razî be). Ewê jî du derece hene: Yek ew e ku îbadet û karên şer'î bike bi qesta nîşandan û dest ve anîna dilê xelkê, vêca ferq nake çi amel bi qesta riyayê bike an çawaniya wê û an şertên wê... Çawa ku di kitêbên şerî'etê da hatiye.(1)

Ya dî ew e ku bi wê niyetê terka karekî bike. Em ê li vêderê ji hinek xirabiyên wê û van sê meqaman biaxivin. Her weha bi kurtî em ê ji îlac û çareserkirina heryek ji wan xeber bidin.

## Meqamê yekê: Riya di baweriyê da

### Vebir: Heqîqeta riyayê

Bizane ku riyaya di baweriyan û zanînên dînî da, ji hemû qismên riyayê dijwartir e û dûmahîka wê ji hemûya xirabtir û reştir e. Xweyê vê riyayê, eger bawerî bi wê ya dike tunebe ji wan minafiqa ye ku ebedî di agir da ye û ezabê wî dijwartirîn ezab e. Û eger baweriya wî pê hebe, lê ewê yekê ji bona biqedr ketina di dilê xelkê da bike, evê he her çend ne minafiq e, lê ev kar dibe sebeb ku nûra îmanê ji dilê wî derkeve û şûna wê da tarîtiya

---

1- Tehrîrul Wesîle, c. 1, di behsa "niyeta nimêj"ê da.

kufrê bikeve dilê wî; ew, her çend di ewil da bi şirka xefî muşrik e; çiko zanînên heqe ya îlahiye û baweriyên heq e ku gereke xalis ji Xwedê ra bin, xêncî Xwedê têda kiriye şirîk û desthilata şeytan di wan da çêkiriye û ew karê qelbî, ne ji Xwedê ra bûye -em ê di vebirekî da ronahî bikîn ku îman ji amelên qelbî ye û ne ilmê petî ye-, çawa ku di wê hedîsa şerîf da hatiye: «her riyayek şirk e». Lê di her hal û karî da ev karê xirab û sirûşta tarî û meleka pîs, paşî ra mirov digehîne wêderê ku mala dil bispêrê xêncî Xwedê û kêm kêm tarîtî lê zêde bibe, heta mirov bê îman ji vê dinyayê derkeve. Û ev îmana xeyalî ya wî, şiklê bê me'ne û, kelaşê bêruh û, qalikê bê kakil e û Xwedê jê qebûl nake. Çawa ku hedîsa ji Alî bin Salim di kitêba Kafî ya şerîf da hatiye, evê meselê dibêje: «Rawî dibêje min ji Îmam Sadiq (a.s) guh lê bû, got: Xwedê Teala gotiye: Ez baştirîn şirîk im. Kesê di karê ku dike da, xêncî ji Min bike şirîk, Ez jê qebûl nakim. Ez tenê wî karî qebûl dikim ku xalis û muxlis ji Min ra bike».

Kifş e ku amelên qelbî eger ne xalis bin, Xwedê lê nanhêre û ewê qebûl nake û dide şirîkê dî, ew jî ew kes e ku kar ji nîşandana wî ra hatiye kirin, nexwe karê qelbî dibe mexsûsê wî kesî, û ji heddê şirkê derbas dibe û dibe kufra xwerî û temam. Belkî jî bêt gotin ku ev kes ji minafiqa ye; çawa ku şirka wî xefî ye, nifaqa wî jî xefî ye. Rebeno goman kiriye mumin e, lê hema di destpêkê da muşrik e û di desthatê da minafiq e û gereke ezabê minafiqa tam bike û ne xwezika wî yê paşî ra bibe ji minafiqan.

**Vebir: Der heqê vê da ku ilm xêncî ji îmanê ye**

Bizane ku îman xêncî ji wê ye ku mirov bizane Xwedê yek e û zanîn hebe der heqê sifetên wî yên kemalî, subûtî, celalî û selbî da, û zanîn hebe der heqê melaîketan, pêxemberan, kitêban û roja qiyametê da. Çêdibe kesekî van der heqan da zanîn hebe, lê îman tunebe. Şeytan qas min û te herduka zanîn der heqê temamê van da heye û kafir e. Îman, kar û amelek qelbî û dilî ye heta ew nebe, îman jî nîne. Gereke kesek bi burhan û delîla aqlî

an lazimiya dînan tiştekî bizane û bi dilê xwe jî jê ra teslîm bibe û amelê qelbî ku awayek yê teslîm bûn û binbarbûn e, bi cih bîne heta bibe mumin. Kemala îmanê jî dilrehetî ye. Ronahiya îmanê ku bihêz bû, di pey ra dilrehetî di dil da peyda dibe. Ev hemû tiştek in xêncî ji ilm û zanînê. Çêdibe ku aqilê te bi delîlê bi tiştekî bihese, lê dil teslîm nebe û zanîn bê feyde bimîne. Mesela: Tu bi aqil pê dihesî ku mirî, nikare zererê bigehîne xelkê û hemû miriyên alemê qasî mêşekî bizav û hereket nînin û hemû hêzên cismanî û nefsanî jê vebûne, lê çiko dil eva he qebûl nekiriye û teslîmê aqil nebûye, tu di şeva tarî da nikarî gel mirî bimînî. Lêbelê eger dil teslîmê aqil bû û ev hukmê he jê qebûl kir mayîna digel mirî, çi muşkilekî ji te ra çênake û tirs têda nîne û namîne.

Nexwe kifş bû, teslîmbûn ku behra dil e, tişteke xêncî ji ilm û zanînê, ku behra aqil e. Çêdibe mirov bi delîla aqlî hebûna Xwedê û yekbûna wî û roja qiyametê û baweriyên dî yên heq sabit bike, lê ji van baweriyan ra îman neyê gotin û ew kes mumin neyê hesabê, û di nav kafir, an minafiq û muşrikan da hesab bibe. Ji ber ku îro çavê dilê hewe girtiye û hewe besîreta melekûtî nîne, ev çavê mulkî, pê nahesê û dema xefî eşkere bûn û selteneta heqe ya îlahiye derket meydanê, û tebîet têk çû û heqîqet derket, hingê hûnê pê bihesin ku hûn mumin bi Xwedê nebûne û ev hukmê aqilê girêdayî bi îmanê ve, nebûye.

Heta ~la îlahe îllellah~ bi qelema aqilê, li ser sefha safî ya dil neyê nivîsîn, mirov ne mumin e bi wehdaniyeta Xwedê û dema ev kelîma pak ya Xwedêyî ket dil, Heq Teala dibe padişahê dil; êdî mirov ji Xwedê pê ve di memleketê heq da xodan tesîr û kartêker nizane; û ji kesek dî, ne berhêviyê meqam û mezinahiyê ye û mertebe û meşhûrbûna li bal yên dî naxwaze, vêca êdî dil riyakar nabe. Nexwe eger hewe riya di dil da dît, bizanin dilê hewe teslîmê aqil nebûye û îmanê ronahiya xwe nedaye dilê hewe û hûn hinek dî ji xwe ra îlah û eserdaner di alemê da hesab dikin, ne Xwedê. Û hûn di nav koma minafiq, an muşrik û kafiran da ne.

**Vebir: Xetera karê riyayê**

Ey riyakar, ku te baweriyên durist û mearifên îlahiye sipartiye şeytan û dijminê Xwedê Teala, te taybetiyên Heq Teala dane hinek dî û te nûra ronahîkerê ruh û dil, sermayeya xilasî û bextewe- riya heruher guherand bi tarîtiya bi bizdan, bextreşî û ji navçûna ebedî û bi dûriya ji liqaya Heq Teala. Hazir bibe ji tarîtiyên bê ronahî ra, ji tengaviyên bê berfirehî ra, ji nexweşiyên bê selametî ra, ji mirina bê saxî ra, ji wî agirî ra ku ji navdeyê dil derdikeve û melekûta nefse, mulkê bedenê dişewitîne; şewatek wereng ku ez û tu nikarin têbigehin. Çawa ku Xwedê di ayeta şerîfe da behsa agirekî dike: «Agirê geşê Xwedê ku raberê dilan dibe» «Narullahil mûqedeh * elletî tetteli'u alel ef'ide» (Humeze / 6-7). Qet ji agirê Xwedê pê ve tu agirek dila naşewitînin.

Eger sirûşt û fitreta tewhîdê ku "fitretullah" e; ji dest çû, şûna wê da şirk û kufr rûnişt, êdî şefaeta şefaetkaran nabe behra mirov û mirov daim di ezab da dimîne; ew jî çi ezab? Ezabê ku ji qehra rubûbî tê der!

Nexwe ey ezîz, ji xeyalek batil ra, ji bona hezkirinek kêma bende yên Xwedê, xwe nede ber xezeba Xwedê û ewa muhabetên îlahî û hêjanên wî yên bê xilasek, lutf û merhemetên wî nefiroşe bi hezkirinek kêma xelkê, ku ji poşmanî û nedametê pê ve tu sûd û eserek jê ra nîne. Dema destê te ji vê alemê ku cihê kesb û dest ve anînêye, kurt bû, êdî poşmaniyê tu feydekî nîne û li xwe zivirîn bê sûd e.

**Vebir: Hişyariyek ilmî ji binbir kirina madda riyayê ra**

Li vêderê em ê der heqê tiştekî da hişyariyê bidin, hêvî ew e der heqê vê nexweşiya dilî da, di vî meqamî û meqamên dî da feydê bide. Ev hişyarî tişteke rêk ketî digel delil, mukaşife û riwayetên pakan û kitêba Xwedê, aqilê hewe jî ewê tesdîq dike. Ew jî ev e ku Xwedayê Teala ji ber qudreta xwe ya ku hemû tişt li ber xwe girtî û pê desthelata xwe ya ku li ser hemû kaînata heyî, û ser

hemû tiştî da girtî, dilê hemû evdan di bin emrê wî da û di destê qudreta wî da ye û kesî bê îzna wî ya tekwînî tesîr û kartêkirinek li ser dilan nîne. Xweyê dil bi xwe jî, bê îzna wî nikare di dilê xwe da teserufê bike. Bi vê me'nê, di Quran û riwayetên Ehlê Beytê da, bi îşare, kinaye û deqedeq, gotin hene. Nexwe Xwedê xweyê dil û kartêkerê di wê da ye, hûn ku bendeyên zeîf û bêhêz in, hûn nikarin bê teserufa Xwedê di dilan da teseruf bikin. Û îradeya wî ser îradeya hewe û hemû mexlûqan ra ye; nexwe riya ya hewe eger ji wî qasî ra ye ku hûn dilê bendeyan bi aliyê xwe ve rakêşin û li bal wan qedr, qîmet û hêjanekî peyda bikin û bi qencîhê meşhûr bibin, eva he bi temamî ji teserufa hewe der e û di teserufa Xwedê da ye. Ew, Xwedê û xweyê dila ye ku yê Ew bixwaze dila bi aliyê wî ve dide. Çêdibe ku hûn bervajî jî netîcê bigirin. Me dît û guh lê bû, mirovên riyakar û durû, ku ne dilpak bûn, paşî ra hetika wan çû û bervajiyê wê ya dixwestan netîce girtin. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da (c. 2, p. 294) îşare bi vê me'nayê hatiye kirin; riwayetker ku Cerahê Medainî ye, der heqê tefsîra vê ayetê da: «Vêca kesê berhêviyê liqaya Rebbê xwe be, bila karek qenc bike û qet tu kesekî di îbadet da neke şirîkê xweykerê xwe», ji Îmam Sadiq (a.s) digêre ku: «Kesek xêrekî dike û bi wê razîbûna Xwedê naxwaze, belkî li pey wê ye ku xelk pesnê wî bidin û hez dike xelk bi wî karê wî bihesin, evê he ye kesê ku di îbadetê Xwedayê xwe da şirîk çêkirî». Pê ra kerem kir: «Ew kesê karek qenc xef bike, dê roj û şev derbas bibin û paşî ra, wê Xwedê başiyê jê ra eşkere bike. Û ew kesê veşartî xirabiyê bike, wê zeman ser ra derbas bibe, heta Xwedê xirabiyê jê ra eşkere bike».

Nexwe ey ezîz, navê qenc ji Xwedê bixwaze. Ji xweyê dil bixwaze ku dilan bi aliyê te ve bide. Tu ji Xwedê ra bixebite, Xwedê xêncî ji başiyên axretê û xweşiyên wê alemê, wê di vê cîhanê da jî başî û hêjana bide te, wê te mehbûb bike û cihê te di dilan da çêke û te di dinyayê da serbilind bike. Lê eger tu bikarî bi temamî dilê xwe ji vê hezkirinê jî paşda bide, batin saf bike, da amel ji vî cihetî ve jî xalis bibe û berê wê bikeve Xwedê; qirêja ruh jê biçe û reşati-

ya nefsê jê xilas bibe. Hub û buxza xelkê zeîf û navdariya li bal bendeyên reben çi feyde jê ra heye? Fereza ku feyde jê ra hebe jî, feydeyek kêm û kurt e. Weha ye dûmahîka vê hezkirinê bibe riya û Xwedê nekirî, mirov bi aliyê şirk, nifaq û kufrê ve bibe. Eger di vê dinyayê da hetika wî neçe jî, wê di wê alemê da li huzûra Xwedê û bendeyên wî yên qenc, pêxemberan û melaîketên muqereb da hetika wî biçe û ser jêr bibe û bêçare bibe; hetika wê rojê tu nizanî çi hetikek mezin e. Ser bi jêra wê rojê, Xwedê zane ku çi tarîtî jê ra hene! Wê rojê ye ku ser gotina Quranê, kafir dibêje: «Xwezika ez ax bûma»[1] û êdî feyde nake.

Ey reben! Te ji bona piçek muhabet û meşhûr bûna bê feyde hêjanên zehfî ji dest dan, te razîbûna Xwedê ji dest da, te xwe xist ber xezeba Xwedê. Ew karên gereke te bi wan hêjanên axretî û şahî ya heruher dest ve bianîna û tu biçûyayî bihiştê, te guherandin bi zulumatên şirk, nifaqê, poşmanî û ezabê dijwar dest xwe ve anî û te xwe kir siccînî. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatiye: Îmam Sadiq (a.s) dibêje, Pêxember (s.a.a) kerem kir: «Melaîket bi şahî amelê bendan jor ve dibe, dema qenciyên wî dibe bal Xwedayê ezîz û celîl, dibêje: Van karan bixin di siccînê da. Çiko evî mirovî ev kar ji razîbûna Min tenê ra nekirine». Ez û tu di vî halî da nikarin fikra siccînê bikin û dîwana amelên faciran bizanîn û şiklê van amelên di siccînê da bibînîn. Em ê wextekî bi heqîqeta meselê bihesin ku êdî bê feyde ye û çare nîne.

Ey ezîz, hişyar bibe û bêxeberî û serxweşiyê ji xwe dûr bike û amelê xwe di kêşek û pîveka aqil da bikêşe û bipîve, pêş wê yekê da ku di wê cîhanê da bêt kêşan. Û hêj hesab gel te nehatî dîtin, hesabê gel xwe bibîne. Neynika dil ji şirk û nifaqê pak û paqij bike û nehêle qirêja şirk û nifaqê ewqas bimîne pê ve ku êdî heta agirê axretê jî nekarê ewê temîz û paqij bike, nehêle ronahiya fitret û sirûştê cihê xwe bide zulmet û tarîtiya kufrê. Nehêle ku «Fitretellah elletî feteren mase aleyha – Rûm / 30» ji nav biçe.

1- Nebe / 40

Evqas xiyanetê li vî emanetê îlahî neke! Neynika dil paqij ke, da cemala Heq têda bêt dîtin û te ji alemê bê niyaz bike, da agirê muhabeta îlahî di dil da hilbe û muhabetên dî hemûyan bişewitîne, ku tu bêhneka wê bi alemê hemûyê nadî û tu wereng lezetê ji bîr û zikrê Xwedê bibî ku bizanî kanê lezetên dî hemûya çi ne. Eger tu ne ehlê vî meqamî jî, ev yek ji te ra ecêb be jî, nîmetên îlahî di cîhana dî da ku Quran û hedîsan jê xeber dane ji bona dest ve anîna dilên xelkê, ji meşhûr bûna çend rojekî ra, ji dest nede û ewa hemû xêran ji nav nebe û xwe ji wan hemû hêjana mehrûm neke û bexteweriya heruher bi bextreşiya daimî nefiroşe.

**Vebir: Gazîkirin ji îxlasê ra**

Bizane ku Malikul Mulûkê heqîqî û xweyê heqîqî yê qencîhê, ev hemû başî gel me kirine û pêşiya hatina me ya vê alemê da, xwarina xweş û munasib digel mîda me ya zeîf û xizmetkarên bi meyl û hezkirina zatî dane me, ku xizmetek bê minet dikin, dorûber, hewayê munasib, qencî, başiyên dî yên xef û eşkere jî dane. Xêncî ji van vêca di alema berzex û axretê da, hêca em neçûyîne gelek hazirî ji me ra dîtine û gotiye me: «Vî dilî ji min ra an ji hêjanên min ra xwerî û xalis bikin ku desthat û netîca wê ji hewe ra ye û hûnê feydê jê bibînin». Lê dîsa em guh nedinê û bêemriya wî bikin û bervajiyê razîbûna wî amel bikin, çiqas zulmek mezin e ku netîca wê jî dîsa li me bi xwe dizivirê û qet tu zererek nagehê padişahiya wî, û em ji bin hakimiyeta wî dernakevin; em çi muşrik bin û çi yekperest ji wî ra ferq nake. Eger em arifê billah û mutteqî û nefspaqij bin, feyda wê ji me bi xwe ra ye û eger em kafir û muşrik bin jî bi zerera me bi xwe ye: «Hema bi rastî Xwedê bê niyaz û bê îhtiyac e ji alemê» (Alê Îmran / 97). Ewî niyaz bi îbadet, îxlas û bendetiya me nîne; neguhdarî, şirkî û durûyiya me zererê nagehîne memleketê wî. Lêbelê çiko Ew Erhemur Rahmîn e (ji hemû bi rehman bi rehmtir e) rehmeta wî ya berfireh û hikmeta wî ya cihgirtî, bûye sebeb ku rêka rast, ya baş, xirab, ya kirêt û sipehî nîşa me bike û kendalên rêka rast a însaniyetê, tehîsok û

şimitîngehên rêka bexteweriyê jî nîşan bide. Xwedayê Teala di vê hîdayet û rênimûniyê da û di vê îbadetkirin, îxlas û bendetiyê da minetên mezin li me kirine, ku heta çavê besîret, nêrîna berzexî û heqîqetbîn venebe, em nikarin fêhm bikin û têbigehin. Û heta ku em di vê alema teng û tarî da û di vê zulmetkede ya tebîet da û di nav qeyd û zincîrên zeman û mekan da bin, em nikarin Xwedayê mezin fêhm bikin û nîmetên wî yên ku di îxlas, îbadet, rênimûnî û hîdayetê da heyîn, bidin aqilê xwe.

Ne weha be tu goman bikî me minet heye ser enbiyayên hêjayî an ewliyayên giranqedr ê Xwedê, an aliman, ku rênasên bexterwerî û xilasiya me ne û em ji nezanîn û bextreşiyê xilas kirine û em gazî kirine ji cîhana ronahî, kêf, şahî û mezinahiyê ra û ewqas ji terbiya me ra zehmet kêşane û dikeşin, da ku me ji zulmet û tarîtiyên eqîde û bawerî yên pûç, batil û cehaletên murekkeb[1] dûr bikin û ji wan ezabên ku sûretê melekat û exlaqên rezîl û şiklên bizdêner yên melekûtî yên amel û kiryarên me yên kirêt û bêmerês xilas bikin, û me bigehînin wan ronahî, şahî, kêf, xweşî, rehetî, hûr û qesran ku em nikarin bidin aqilê xwe jî, ku ev alema mulk digel vê hemû berfirehiya xwe tengtir e ji wê çendê ku helqeyek ya bihiştê bînin têda; evan çavên me taqeta dîtina tayek mû yê hûriyek nîne, ku evên he hemû sûret û şiklê melekûtî yê wan bawerî, exlaq û kiryara ye, ewên pêxemberên giranqedr nexasima xweyê keşfa kullî û fermana cami', Xatemê pêxemberan (s.a.a) bi wehya îlahî fêhm kirî, dîtî, bihîstî û em bi wî aliyî ve gazî kirine. Em ên reben jî, wek wan zarokên ku guhdariya aqilan nakin û ewan dişkînin û her daim digel wan ketine şer û berberekanî û xirecirê ne; lê ewan nefsên pak û ruhên paqij ji ber dilovanî û merhemeta ku di beranberê bendeyên Xwedê da heyîn, qet tu caran di gazî û daweta xwe da ji ber nezaniya me

---

1- Cehla murekkeb ev e ku mirov bi nezanîya xwe nizane, nizane ku nizane. (Wergêr)

kêmasî û texsîratî nekirine û bê zor û zêr, em bi aliyê bextewerî û bihiştê ve birine, bê wî qasî ku kirh û ucretekî ji me bixwazin. Hingê jî ku Resûlê Ekrem (s.a.a) ji ucreta xwe ra hema tenê hejê kirina mirovên xwe dixwaze;[1] sûret û şiklê vê mewedet û hejêkirinê di alema dîtir da belkî ji bona me ji hemû şiklan ronahîtir be, ew jî ji me bi xwe ra ye ku em bigehin bextewerî û dilovaniyê. Nexwe kirha risaletê dîsa li me bi xwe zivirî û em jê behremend bûn. Em ên reben me çi minet ser wan heye, îxlas û hezkirina me ji wan ra çi feyde têda heye, me çi minet heye ser alim û zanayên umetê? Ji wî yê gotinên dînî dibêje bigire heta bi Pêxemberê giranqedr û heta Xwedayê Teala (celle celaluh) her kes di derece û meqamê xwe da, ku rêka hîdayetê nîşa me dike, minet li ser me hene ku kirha wan di vê cîhanê da em nikarin bidin, vê alemê liyaqeta kiriya wan nîne; nexwe mineta Xwedê û pêxemberê wî û ewliyayên wî ye. Çawa ku Xwedayê Teala kerem dike: «Bêje wa yên ji ber musilmanbûna xwe minetê li te dikin û dibêjin me bê şer Îslam qebûl kir: bi Îslama xwe minetê nedeynin ser min, belkî mineta Xwedê ser hewe ye, ji ber rênimûniya hewe ji wê îmanê ra ku, hûn behsê dikin; eger hûn rastgo ne, di vê de'wayê da. Bi rastî Xwedê bi xefên ezmana û erdê zana ye û Xwedê bîna ye bi wê ya hûn dikin». (Hucurat /17-18)

Nexwe eger em di de'wa îmanê da rastgo û sadiq bin, di vê îmanê bi xwe da jî mineta Xwedê ser me heye. Xwedê ji alema xeybê agah e û zane şikl û sûretê îman û Îslama me di alema xeybê da çi ye. Em ên reben ji ber ku em heqîqet û rastiyê nizanîn, em zanînê ji wî yê meselego digirin û mineta xwe lê dikin, em teqlîda alimekî dikin û mineta xwe lê dikin, bi îmameta alim em nimêja xwe ya cemaet dikin û minetê lê dikin, halhale mineta wan ser me ye û em jê bêxeber in. Belkî ev minet, kar û amelên me bervajî dikin û ewê têxin di siccînê da û ber bayê berdidin.

---

1- Şûra / 23

## Meqamê duwê: Riya di exlaq û melekatên navdeyî da

### Vebira yekê: Kêşeka riyazetên heqanî û nefsanî

Bizane ku riya, di vî meqamî da, her çend ne di dijwariya meqamê ewil da ye; lêbelê pêhişyarbûna li gotinekî çêdibe karê riyakar bizivire cihekî ku beranber bibe gel karê riyakar di meqamê yekê de. Me di beyana hedîsa pêşiyê da got ku, mirov di alema melekûtê da çêdibe hinek şikl hebin, ne wek şiklên însanî û ew şikl û sûret tabi'ê melekûta nefsê û melekatên wî ne. Eger te melekatên qencên însanî hebin hingê ew melekat sûretê te dikin însanî ku bê kêm û zêdahî tu digel wan melekeyan mehşûr bibî. Belkî melekat hingê qenc in ku nefsa emmare tesîr di wê da nekiribe û di duristkirina wê nefsê da mudaxele tunebe. Seydayê me (Xwedê temenê wî dirêj bike) kerem dikira: «Mîzan di riyazeta batil û riyazeta şer'î ya durist da, qedema nefsê û qedema heq e". Eger salik bi qedem û gava nefsê hereket kir û riyazeta wî ji peydabûna quwayê nefsê û hêza padişahî ya wê ra be, riyazet batil e û sulûka wî digehê aqibeta nebaş. Û dawet û gaziyên batil û nedurist zêdetir ji mirovên weha çêdibe. Û eger mirovê salik bi qedema heq ket sulûkê û ket pey Xwedê, riyazeta wî heq û şer'î ye û wek çawa ayeta pîroz dibêje, Xwedê alîkariya wî dike: «Kesê di rêka me da xebat û mucahidê bike, muheqeq em ê wî bixin ser rêkên xwe» (Enkebût / 69). Vêca axirîka karê wî dibe bextewerî û ji ez-ezî û xwebîniyê diçe paş û ji xwenîşandanê dûr dikeve. Û ronahî ye ku kesê exlaqbaşiya xwe û melekatê qenc yên nefsa xwe bixe di çavê xelkê ra û nîşa wan bide, gava wî gava nefsê ye û xwebîn û xwexwaz û ji xwehez e. Û eger mirov xwebîn be, êdî Xwedêxwazî û Xwedêbînî xeyalek vala û karek pûç û batil e. Heta ku memleketê wucûda te tijî ye ji huba nefsê û hezkirina meqam, mertebe, mezinahî, navdengî û riyaseta ser evdên Xwedê, mirov nikarê melekatên te melekatên qenc hesab bike û exlaqê te exlaqê îlahî bihesibîne; kartêkerê di memleketê te da, şeytan e û melekûtê batinê te, ne şikl û sûretê mirov û însa-

na ye. Û piştî vebûna çavê berzexî, tu dê melekûtê xwe ser şiklê ne mirov, belkî wek yek ji şeytanan bibînî. Û zanînên îlahiye û tewhîda durist ji dilek weha re ku jîngeha şeytan e peyda nabe û heta melekûtê te, ne melekûtê însanî be û dilê te ji van xwehrî û xwexwaziyan paqij nebe, nabe cihê Heq Teala. Di hedîsa qudsî da hatiye: «Erd û ezmanê min, min di xwe da nagire, lê dilê bendeyê min yê bawerdar, min di xwe da digire». Qet tu mewcûdek ji dilê mumin pê ve, ne ayneya cemala mehbûb e. Kartêkerê di dilê mumin da, Heq Teala ye, ne nefs. Karker di wucûda wî da mehbûb e. Dilê mumin ne serberedayî ye, ne herze ye. Destê Heq di memleketê dilê wî da kartêker e, guherîn û guhaztina dilê wî di destê Heq Teala da ye[1].

Ey reben, tu ku abide nefsê yî û kartêkerê di nefsa te da şeytan û cehl e û te destê kartêkirina Heq ji dilê xwe biriye, te çi îmanek heye ku bibî tecellî ya Heq û padişahiya mutleq? Vêca bizane heta tu di vî halî da yî û ev rezîla xwenîşandanê gel te heye tu kafirê billahî û di silkê minafiqan da têyî hesabê, her çend tu di xeyala xwe da musilman û mumin î.

**Vebira duwê: Settariyeta Heq Teala ne pêşîgirê xeyûriyeta wî ye**

Nexwe ey ezîz, hişyar bibe û penbûyê bêxeberiyê ji guhê xwe derîne û xewa xefletê ji çavê xwe ra heram bike û bizane ku Xwedê Teala tu ji xwe ra çêkirî, çawa ku di hedîsa qudsî da hatiye: «Yebne adem, xeleqtul eşyae li eclik, we xeleqtuke li eclî» «Ey kurê adem, min her tişt ji te ra afirandiye û tu ji xwe ra afirandî»[2]. Û dilê te kir cihê xwe, tu û dilê te yek ji newamîsên Xwedê ne; Ew, ji namûsa xwe ra xeyûr e, evqas der heqê namûsa Heq da perdedir nebe, destdirêjiyê baş nezane, bitirse ji xîreta Heq Teala ku hetika te di vê cîhanê da bibe û êdî tu nekarî durist bikî. Tu di

1- Biharul Enwar, c. 72, p. 48: el-Uşre.

2- Ilmul Yeqîn, c. 1, p. 381

melekûta xwe da, di huzûra melaîketan û pêxemberên giranqedr da namûsa îlahî diqetînî û exlaqê qenc ku pê wê ewliyayên îlahî teşebbuha bi Heq peyda dikin, tu teslîmê xêncî Heq dikî û tu dilê xwe didî dijminê Heq û di batinê melekûta xwe da dikevî şirkê, bitirse ku Heq Teala di vê cîhanê da hetika te bibe û belayekî bîne serê te, ku êdî qet cubran nebe. Xwedê settar e; lê xeyûre jî, erhemur rahimîn e; lê eşeddul mu'aqibe ye jî. Vedişêrê û xef dike, heta wextê ku ji qeydê ne derkeve, çêdibe ku Xwedê nekirî ev karê mezin û hetika ji qeydê der, xîretê ser sitirandinê bixe, çawa ku di hedîsa şerîf da hatiye gotin.

Nexwe hinekî bi xwe ve were û berê xwe bide Xwedê û li wî bizivire ku Xwedê, rehîm e û ji rehmetkirinê ra li pey behanekî ye. Eger te berê xwe dayê, pê xufrana xwe kêmasî û texsîratî yên borî vedişêrê û nahêlê xelk pê biheshên û te xweyê qencî dike û exlaqên hêjayî di te da dixweyhêne û te dike ayna sefa ya xwe û di wê alemê da îradeya te xweyê eser dike, çawa ku îrade ya wî bi xwe di hemû aleman da kartêker û xweyê eser e. Çawa ku di hedîsê da hatiye gêran: «Dema ehlê bihiştê cih digirin nameyek ji aliyê Xwedê ve ji wan ra tê, ku naveroka wê ev e: Ji aliyê wî ve ku her sax e û mirin jê ra nîne, ji wan kesa re, ew ên sax, û mirin ji wan ra neyî, çi tişta ez hebûna wê bixwazim ez jê ra dibêjim: Hebe, vêca di cih da çêdibe, îro Min weha li te kiriye, tişta tu hebûna wê bixwazî bêje: Hebe, wê hebe». Bila te evqas xwexwazî tunebe, tu îradeya xwe teslîmê Xwedê bike, wê Zatê Muqeddes jî te bike mezherê îrade ya xwe û te kartêker bike di karên xwe da; wê memleketê îcadê di axretê da bike di îxtiyara te da. Û eva he tiştek xêncî ji «tefwîz»a mehal a batil e, çawa ku di cihê xwe da me'lûm bûye.

Vêca ey ezîz, tu bi xwe zanî, tu kîjanê bixwazî, ewê bigire, vê, an wê. Di her halî da, Xwedê ji me û hemû mexlûqan û îxlasa me û hemû mewcûdan bê niyaz û bê îhtiyac e.

## Meqamê sisê: Riya di amel da

### Vebira yekê: Têkeliya şeytan di îbadet da

Bizane ku riya, di vî meqamî da ji meqamên dî, pirtir û berfirehtir e, Çiko bi awayek giştî em ne ehlê wan du meqama ne; ji ber wê yekê şeytan bi wê rêkê ve bi aliyê me ve nayê; lê çiko zêdetirê xelkê li pey îbadetê sûrî û eşkere ne, şeytan bi vê rêkê ve tê û hîle pîlên wî di vê mertebê de pirtir in. Bi gotinek dî çiko giştiya xelkê xweyê bihişta cismanî ya amela ne û bi rêka kiryarên qenc û terka karên pîs ve mertebe û derecên axretî dest xwe ve tînin, şeytan bi vê rêkê ve tê û reh û rîşeyên riya û xwenîşandanê di kar û amelê wan da av dide, da çiq û belgên wê zêde bibin û seyyiat û guneh bikevin şûna hesenat û qenciyan da û bi rêka îbadet ve ewa bixe dojehê da û bi wan tişta ku dixwazin axreta xwe ava bikin, ewê xirab bikin û ewa ku ji «îlliyyîn»ê ye karekî dike ku bi emrê Xwedê, melaîket ewê têxin di «siccîn»ê da. Nexwe ew ên xweyê vê yekê ku zad û qûtê wan hema ev amel in, gereke gelek hay ji xwe hebin ku Xwedê nekirî eva he jî ji dest wan dernekevê û bi temamî nebin ehlê dojehê û rêka bexteweriyê ji wan ra nemîne û deriyên bihiştê li ber wan bên girtin û deriyên dojehê li ber wan vebin.

### Vebir: Hûriya mesela riyayê

Gelek caran çêdibe ku mirovê riyakar bi xwe jî hay jê nabe ku riya ketiye nav kar û amelên wî ra û amelê wî riyayî û pûç e; çiko hîleyên şeytan û nefsê, ewqas hûr û rêka însaniyetê ewqas zirav û tarî ye ku heta mirov baş baş venejenê, mirov nizane kanê çi ye. Çiko huba nefsê di sirûşta mirov da heye, vêca perda xwexwaziyê kêmasiyên wî vedişêre. Bi hezkirina Xwedê belkî hinek ji vê gotinê di nav behsa hinek ji van hedîsan da bê. Mesela tehsîla ilmê dînî ku ji taet û îbadetên muhim e, mirov carna ji ber perde ya stûra huba nefsê, di vî îbadetî da dikeve nav riyayê ra; halhale ew bi xwe pê nizane û hay jê nîne. Mirov dixwaze di

huzûra alim û mezinan da gotinek muhim hel bike ku kesek dî ew rêka hellê jê ra neanî be û dixwaze hema yê rêka hellê avêtî meydanê ew tenê be. Û her çiqas gotinê baştir vejenê û şîrove bike ewqas zêdetir şahî dibe û heçî kesê xwe bere bike, hez dike xwe ser wî bixe û pêşiyê jê bistîne û ewî di civatê da serbijêr û şermende bike û gotina xwe çi heq û çi batil di mejiyê xelkê da bike xwarê û piştî serketinê, bi awayekê mezinahî û tekeburê di xwe da dibîne û eger yek ji mezina jî teyîd û tesdîqa wî bike ji xwe nûra ‘ela nûr e. Rebenî nizane ku li vêderê ber çavê alim û zanayan qedr û qîmetek peyda kir, lê ji çavê Xwedayê wan û Malikul Mulûkê alemê ket û ev amel bi emrê Heq Teala di siccînê da hat xistin. Yek jî ev ku ev karê riyayî tevlî çend gunehên dî jî bû, wek: Şermende kirin û şikandina mumin, eziyet kirina birayê îmanî, carna jî xurîn û hetikbirina yê bawerdar ku yek yekê wan ji paşvedan û dojehîkirinê ra sebebek serbixwe ye.

Eger nefs dîsa dava hîleyên xwe ji te ra bavêje û bêje te: Mexsed kifşbûna hukm ê şer'î û eşkerebûna heqiyê ye ku ji baştirîn îbadeta ye, mexsed ne xwe nîşandan û eşkerekirina seratî û zanînê ye; di navdeyê xwe da jê bipirse, eger hevalê min ev hukmê şer'î bigota û ev mesela muşkil hel bikira û tu di wê civatê da bin biketayî, gelo ji te ra ferq nedikira? Eger we bê, tu di vê de'wê da sadiq û rastgo yî.

Eger dîsa dest ji hîle pîlên xwe nekêşa û got: Çiko beyana heqiyê baş e û li bal Xwedê xêr jê ra heye, ez dixwazim bigehim vê qencî û xêrê, bêjiyê: Fereza eger digel binketinê û tesdîqa heqiyê, Xwedê dîsa wê xêrê bide te, gelo hingê jî tu dê serketin û xelebê bixwazî? Vêca binhêre navdeyê xwe, eger te dît di vî halî de dîsa tu serketin û meşhûrbûna li bal alim û zanayan dixwazî û ev gotûbêja ilmî ji wî qasî ra be ku tu li bal wan qedr û qîmet peyda bikî, hingê tu bizane ev gotûbêja ilmî ku ji seratirîn taet û îbadeta ye, riyayî û ji xwe nîşandanê ra ye û ev amelê te gorekî di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatî di siccînê da ye û te şirîk ji Xwedê ra çêkirine; ev kar ji dest ve anîna meqam û qedr û qîmet ra ye û gorekî riwayet dibêje, xe-

tera wê ji îmanê ra zehftir e ji keriyê pez ku du gorî ji du aliyan ve bikevin navê. Nexwe tu yê ehlê zanînê, nefsa xwe salim bike, da tu nebî ji alimên bê amel ku halê wan me'lûm e.

Ey Xwedê! Dilê me ji qirêja şirk û nifaqê paqij bike û neynika dilê me ji jenga hezkirina dinyayê ku serkaniya van meselan hemûya ye, temîz bike û di vê sefera tarî û pir xeter û di vê rêka xwehro mehro da digel me be û alîkariya me rebenên ketine di dava hewayê nefsê û huba meqam û mezinahiyê da bike, tu î qadir û karayê ser her tiştî.

Yek ji îbadetên mezin, cemaet e û xêra pêşnimêj pirtir e, ji ber vê yekê şeytan xwe tevlî vî îbadetî dike û gel pêşnimêj dijmintir e û li ber e ku ewî ji vê xêrê paşda bide û amelê wî ji îxlasê vala bike û bixe di siccînê da û we bike ku ew, şirîka ji Xwedê ra çêke. Vêca bi rêkên muxtelif ve xwe têxê dilê hinek ji pêşnimêjan da; wek ucbê -bi hezkirina Xwedê em ê paşê hinekî jê biaxivin- û wek riyayê, ew jî ew e ku evî îbadetî nîşa xelkê bike da ku di dilê wan da mezin bibe û biqedr bikeve û bi nav û deng bibe. Mesela: Dibîne filan mirovê biqedr di nimêja cemaet da hazir bûye, vêca ji kêşana dilê wî ra pirtir xwe dişikêne û bi rêkên muxtelif, û hîlên zehfî ve ewî têxe dava xwe û di civata da car car behsa wî mirovê qenc dike, da wa yên ne hazir pê bihesîne ku filan mirovê qenc di nimêja cemaeta min da şirîkatî kiriye. Û di dilê xwe da jî bi awayek wereng hezkirina xwe ji wî mirovî ra nîşan dide ku di omrê xwe da bêhnekî jî ew hezkirin ji Xwedê û weliyên wî ra nîşan nedaye. Nexasima eger ji tacirên muhterem be! Û eger Xwedê nekirî, mezinzadeyek rêka xwe winda bike û bikeve di rêz û sefa nimêja wî da, hingê musîbet hêj mezintir dibe!

Ji aliyê dî ve şeytan dest ji pêşnimêjê cemaet kêm jî nakeşe, diçe balê û dibêjite û ewî mijûl dike, da bi xelkê bide fêhmê ku ew ne mirovek dinyayî ye û ji ber wê çendê bi mizgefta piçûk a taxa feqîr û jaran razî bûye! Ev jî wek wê ye an hêj ji wê jî xirabtir e, çiko heseda rezîl, di dilê wî da cih dike. Ji dinyayê bêbehr e, vêca sermaya axreta wî jî jê distîne û di dinya û axretê da ewî li erdê dide.

Di çi yek ji halan da şeytan dest ji min û te nakeşe û me hay dide ku em cemaet û koma musilmanan xirab, kêmasî û nebaşiyê ji wan ra çêkin û evê yekê ku me cemaet nîne, wereng nîşan bidin heçweku me bi xwe, xwe daye paş û em ji dinyayê derbas bûne û em dûrê ji huba mezinahî û meqam in. Em ji van herdu deste û birran xirabtir in! Me ne dinyaya temam a desta ewil heye; û ne dinya naqis a desta duwê, digel wî qasî me axret jî nîne, halhale eger bi dest me ve be, em ê ji wan herdu destan pirtir li pey meqam û huba mal û mezinahiyê bin.

Şeytan bi îmamê cemaet tenê bes nake û agirê viyana wî bi dojehîkirina wî tenê natemire û berê xwe dide me'mûm û nimêjkeran, çiko xêra sef û rêza yekê pirtir e û xêra aliyê rastê ji ya çepê pirtir e, ewil ewan dike armanc û hedef; ew rebenê pepûk ji mala wî ya dûr kişandiye û di sefa yekê li aliyê rastê rûniştandiye û jê ra weswesê çêdike ku xelkê bi vê seratî û başiyê bihesîne! Ew jarê belengaz jî pê nahese ku ji kî ve derb lê dikeve, haletekî ji xwe nîşan dide û bi awayekî seratiya xwe nîşan dide! Û şirka xwe ya batinî eşkere dike û amelê xwe têxe di siccînê da. Ji wêderê vêca bi aliyê sefên dî ve diçê û ewa têxe kar, da ku bi kinaye û îşare eyb û kêmasiyan ji wa yên di sefa ewil ra çêkin û muqedesê reben bidin ber tîrên xirabiyan û xwe ji wan xirabiyan berî bizanin. Carna jî tu dibînî şeytan piştîvanî kir û mirovek biqedr -nexasima eger ji ehlê ilmê be- danî sefa paşîn, da bide fêhmê ku ez digel vî meqamî û vê mertebe û derecê, gerek min li pey vî zilamî/ îmamî nimêj bikira, lê çiko ez ne mirovek dinyayî me û bayê dil û hewayê nefsê li bal min nîne ez di sefa dawî da rûniştime! Tu hinek ji van kesan qet di sefa yekê da nabînî.

Şeytan ji îmam û me'mûm bes nake û bi aliyê tek mirovan ve diçe, ewî li bazarê an li mal hefsar dike û tîne, tê û seccadê di kuncekê mizgeftê da radixe, ew çi yek ji îmaman adil nabînê, di nav koma xelkê da di ruku û secdan da tesbîh û zikrên dirêj dide! Bi vî awayî dixwaze bêje xelkê, ku ez evqas muqedes û ehlê îhtiyatê me ku ez nimêja cemaet terk dikim, da newebe ez bikevim

pey pêşnimêjê ne adil! Eva he xêncî ji wî qasî ku ew xistiye nav ucb û riyayê ra, nîşan dide ku ew, meselên şer'î jî nizane! Çiko merce'ê teqlîdê vî mirovî, ne me'lûm e, zêdetirê ji başiya eşkere di îqtidayê da şert bizane. Lê ev ne ji ber vê ye; belkî ji nîşandana xelkê ra ye ku, xwe di dilê wan da mezin bike. Û her weha karên me yên dî jî di bin ferman û kartêkiran şeytan da ne. Ew mel'ûn çi dilê qirêj bibîne xwe têda cih dike û kar û amelên xef û eşkere dişewitîne û bi amelên qenc, me dike dojehê.

Nexwe ey ezîz, hûr hûr binhêre amelê xwe û di hemû karan da hesabê gel nefsa xwe bibîne û di hemû karan da jê bixwaze cewab bide ku: Çima dest davêje karên xêr û hêjayî? Ji ber çi der heqê nimêjên şevê da pirsiyar dike, an zikrên wê tîne ser ziman? Dixwaze ji Xwedê ra meselan fêhm bike û bêje, an dixwaze bide fêhmê ku ji wî qismî ye? Çima bi çi awayê hebe behsa sefera xwe ya ziyaretî dike? Heta dibêje ku çend caran çûye! Çima razî nabe ku sedeqên wî yên xef, veşartî bimînin? Bi çi awayê bikare jê xeber dide û xelkê pê dihesîne. Eger ji Xwedê ra ye û dixwaze xelk jî jê bigirin û di karê xêrê da pey wî biçin û ew bibe ji qismê: «Eddallu alel xeyrî ke fa'ilih - ew ê ji başiyê ra rênimûnî bike wek wî ye, yê ew xêr kirî», eşkere kirina wê baş e û bila ji ber vî dilê paqij şukrê Xwedê bike, lê bila multefit be ku di vê gotûbêja gel nefsê da hîle lê neyê kirin û karê riyayê ji xwe ra muqedes neke. Û eger ne ji Xwedê ra be, bila terka wê eşkere bike; çiko ew «sum'e» ye ku ji şecera mel'ûne ya riyayê çêdibe û Xwedayê Mennan amelê wî qebûl nake û emr dike ku bixin di siccînê da.

Gereke em ji ber xirabiya nefsê hana xwe ji Xwedê ra bibin, çiko hîle pîlên nefsê gelek hûr in, ya em zanîn ev e ku karên wê ne xalis in. Eger em bendeyên xalis ên Xwedê ne, çima şeytan evqas eserê di me da datîne? Halhale ewî soz daye Xwedê ku tevlî evdên muxles nebe û destê xwe dirêjê wan muqedesan neke.[1] Ser

---

1- Îşare ye bal ayeta 39 - 40 ya sûretê Hicr: Qale rebbî bima exweytenî. Îblîs got: Ey Xweda ji ber ku te ez ji rê deranîm, xêncî ji ebdên te yên muxles, ez ê erdê ji hemûyan ra bixemilînim û hemûyan ji rê derînim.

gotina seydayê me yê hêjayî (Şahabadî, Xwedê omrê wî dirêj bike) şeytan kûçikê dergahê Xwedê ye, eger kesek gel Xwedê nas be, neyariya wî û eziyeta wî nake; seyê ber deriyan nakeve pey nasên xweyê malê. Şeytan nahêle yê nenasê xweyê malê, biçe mal ve.

Nexwe eger te dît şeytan li dora te dizivire, bizane karên te ne xalis in û ne ji Xwedê ra ne. Eger hûn muxlis in, çima serkaniyên hikmetê ji dilê hewe ser zimanê hewe da neherikîne, halhale eve çil sal e hûn bi xeyala xwe ji Xwedê ra kar dikin; û di hedîsê da hatiye ku: «Kesê çil sibehan xwe ji Xwedê ra xalis bike serçavkên hikmetê ji dilê wî ser zimanê wî da diherikin». Nexwe bizane kar û amelê me, ne ji Xwedê ra ne; lê em bi xwe jî ne multefit in û me hay jê nîne û derdê bê derman jî hema ev e.

Wey ji wan kesên ehlê taet, îbadet, cum'e, cemaet, ilm û diyanetê ra ku dema çavê xwe vekin û bibînin axret hat û ew ji ehlê gunehên mezin/kebîre ne û belkî ji ehlê şirk û kufrê jî xirabtir in û nameya amelê wan reştir e.

Wey li halê wî yê bi nimêj û îbadetê xwe ve biçe dojehê! Eman ji ber wa yên sûret û şiklê sedeqe, zekat û nimêja wan, ew şikl û sûret bin ku ji wan bêmerêstir neyên melheze kirin!

Ey reben tu muşrik î! Xwedê bi qenciya xwe, Xwedêperestê ehlê gunehan efû dike -înşaallah- lê kerem kiriye: «Xwedê ew muşrikê ku bê tewbe ji vê dinyayê derkeve, efû nake»[1].

Wek çawa te dît di hedîsên şerîf da hatiye ku: «Riyakar muşrik e». Kesê ku riyaseta xwe, pêşnimêjiya xwe, ders gotina xwe, tehsîl û xwendina xwe, rojiya xwe, nimêja xwe, welhasil kar û amelê xwe yê qenc û baş ji nîşandana xelkê ra bike, da ku li bal xelkê biqedr bibe, ew muşrik e û gorekî di hedîsên Ehlê Beytê da û di ayeta şerîfe da hatiye, Xwedayê Teala ewan efû nake. Nexwe

1- Îşare ye bal: Nisa / 48 û 116 ve.

xwezika tu Xwedêperestek biyayî ji ehlê gunehên mezin û tu gunehkarê guneh eşkere biyayî, lê te şirîk ji Xwedê ra çênekiribûya.

Vêca ey ezîz, ji xwe ra bifikire û çarekî bibîne, bizane bi navdengî ya li bal xelkê çi ye; ne tişteke û dilê vî mirovî ku eger çiwîkek bixwe pê têr nabe[1] qedr û qîmetek jê ra nîne û evî mexlûqê zeîf qudret û karînek nîne, qudret û quwet hema ew e li bal xweykerê alemê ku fa'ilê alel itlaq û musebbibul esbab e.

Mexlûq hemû eger kom bibin da pêşûyekî çêkin, nikarin û eger pêşû tiştekî ji wan birevîne nikarin jê bigirin.[2] Qudret li bal Heq Teala ye. Ew e yê muesir û kartêker di hemû tiştî da. Bi her zehmet û bi çi awayî be, bi qelema aqilê di dilê xwe da binivîse ku: «Ji Xwedê pê ve çi kartêker di alemê da nînin».

Tewhîda fiîlî ku yekemîn dereca tewhîdê ye, çawa hebe di dil da cih bike; baweriya dil pê bîne û jê ra teslîm bike û muhra hêja ya «la îlahe îllellah» li dil bixe û şiklê dil bike şiklê kelîmeya tewhîdê û bigehîne dereca rehetî û îtminanê û pê bide fêhmê ku xelk nikarin feyde û zererê bidin û nafi' (feydedêr) û darr (ziyandêr) Xwedê ye. Korîtî û tarîtiyê ji çavê xwe bibe, çiko tirs heye ku bibî ji bêjerên: «Rebbî lime heşertenî e'ma»[3] û di roja eşkere bûna xef û veşartiyan da kor bêyî ber heşrê. Îradeya Heq Teala ser hemû îradeyan ra ye, eger te pê vê kelîmeya mubarek, dil rehet kir û ew teslîmê vê baweriyê kir, hingê hêvî ew e ku kar cih bi cih bibe û reh û rîşeya şirk, riya, kufr û nifaqê ji dil bêt birîn. Bizane ku ev eqîda durist rê ketiye gel aqil û şer'ê jî, û gomana cebrê têda nîne. Çêdibe hinek ku ji pêşekî û binyatên meselê bêxeber in û hinek gotin ber guhê wan neketine, bêjin qey eva he cebr e, halhale ne

---

1- Îşare ye bal hedîsa ku Kafî gêrayî: "Yebne Adem lew ekele qelbek tairun lem yeşbe'". Kafî, c. 1, p. 93, h. 8-ê.

2- Îşare bi Hec / 73: "Ew ên xêncî ji Xwedê hûn gazî wan dikin, eger hemû berhev bibin, nikarin mêşekî çêkin. Û eger mêş, tiştekî ji wan birevîne nikarin jê bigirin".

3- Taha / 125: "Ey Xweda, çima te ez kor anîm heşrê?!".

cebr e. Ev tewhîd e, û cebr şirk e; ev hîdayet e, û cebr rêwindatî ye. Vêderê ne munasibê cebr û qederê ye, lê li bal ehlê wê ronahî ye û xêncî ji ehlê wê heq nîne bikeve nav vê ra, belkî ji xwe xweyê şerî'etê ji ketina nav wê ra nehy kiriye.

Çawa be, di her halekî da bi girî û zarî ve ji Xwedayê dilovan bixwaze ku te berew ronahî ya tewhîdê hîdayet bike û ronahî ya yekbînî û yekperestiyê bixe dilê te, da tu ji alemê hemûyê vebî û her tiştî kêm bibînî. Û bi halê şikestî ve ji Xwedê bixwaze ku kar û amelên te xalis bike û te rênimûnî bike ji rêka îxlasê ra. Û eger te halek peyda kir, evî bendeyê zeîf û betal û valayê ji heqîqetê ku omrek mijûlê hewa û bayê dil bûye û dilê wî ji qirêja gunehan û nexweşiyên dilî welê hatiye ku tu şîretek, tu ayet û riwayetek, tu burhan, delîl û nîşanek di wî da eser nakin, bi duayekî bîne bîr, belkî bi duaya hewe rêkek ya xilasiyê peyda bike, çiko Xwedê mirovê bawerdar ji deriyê xwe navêje û dua wî qebûl dike.

Piştî bîranîna vê gotinê ku te bi xwe jî zaniya û ne tiştek nû û taze bû, demekî hay jê bimîne ku tu hûr bibî der heqê dil, kar, rawestan û bizavên xwe da; û veşartiyên dil hinekî teftêş bike û hesabek dijwar gel bibîne, wek çawa mirovên dinyayî hesabê gel şirîkê xwe dikin; heçî amelê ku şubha riyayê têda hebe terk bike, her çend karek hêjayî be; heta eger te dît tu nikarî di eşkere da wacibat û ferzan xalisane pêk bênî, bi xefî pêk bîne, her çend eşkerekirina wan sunet e, belkî ji xwe kêmtir tê pêş ku di eslê wacib û ferzan da riya çêbe, zêdetir di sunet û nafilan da çêdibe. Di her hal û karî da bi awayek cidî û mucahideyek dijwar dilê xwe ji şirkê pak bike, da newebe Xwedê nekirî tu di vî halî da ji vê alemê bar bikî ku hingê serhatek xirab ji te ra heye û rêka xilasiyê ji te ra nîne û wê Xwedê xezebê li te bike. Çawa di hedîsa şerîf da hatiye: Kitêba «Wesail» ji «Qurbul Îsnadê» neqil dike û sened digehê Mîrê bawerdaran (a.s). Ew dibêje: «Resûlê Xwedê (s.a.a) got: Kesê bi wê ya Xwedê jê hez dike xwe nîşa xelkê bide û di xefiyê da bi awayekî ne hez xwe nîşa Xwedê bide, wê di halekî da liqayê Xwedê bibe ku kerbê Xwedê jê tê».

Di hedîsa şerîf da du îhtimal hene: Yek ev e ku mirov, karê qencê xwe nîşa xelkê bide û karê kirêt û pîs bi xef û veşartî bike. Ya dî ev e ku mirov, eşkereyê amel nîşa xelkê bide û di navdeyê xwe da riyayê bike. Di herdu halan da jî riya çêdibe, çiko kirina wacibat û qenciya bê qesta riyayê nabe cihê xezebê. Belkî mirov dikare bêje, me'na duwê baştir e; çiko kirina karên pîs û kirêt bi awayek eşkere dijwartir û xirabtir e. Welhasil, Xwedê neke Malikul Mulûk û Erhemur Rahimîn xezebê li mirov bike. Ez hana xwe ji Xwedê ra dibim ji xezeba wî yê dilovan.

**Vebir: Der heqê beyana hedîsa hezretê Alî (a.s) da ye**

Em ê vî meqamî bi hedîsa hêja ya Kafî ya şerîf ji mewlayê xweparêzan, Mîrê bawerdaran (a.s) dûmahî bînin. Şêxê Sedûq jî (r.a) hedîsek wek vê ji Îmam Sadiq (a.s) neqil kiriye ku şîretên Pêxember (s.a.a) in, ji Mîrê bawerdaran ra (a.s). Ew jî ev e: Îmam Sadiq (a.s) ji Îmam Alî (a.s) neqil dike ku got: «Riyakaran sê nîşan hene: Dema xelkê bibîne, bi kêf û şahî ye û dema tenê be tenbel û bêhal e û hez dike di hemû karên wî da xelk medh û pesnê wî bidin».

Çiko ev xirabiya xebîs, carnan ewqas veşartî ye ku mirov bi xwe jê bêxeber e -di navdeyê xwe da ehlê riyayê ye û goman dike amelê wî xalis e- ji ber wê hinek nîşan jê ra gotine ku pê wan nîşana mirov ji navdeyê xwe xeberdar bibe û bikeve pey mu'alice û dermankirinê.

Mirov di nefsa xwe da pê dihese wextê ku tenê ye, meyla wî ji îbadet ra nîne, eger bi zehmet an gorekî adetê îbadetekî jî bike ne ji dil û viyan dike; ser û destê amel dişkêne, baş û durist ewê bi cih nayine. Lê dema di nav mizgeft û cemaetan da be û ber çavê giştiya xelkê be, dest davêjitê, bi kêf, şahî û dilxweşî ewê dike; dixwaze secde û rukû'ên wî dirêj bin û baş sunetan bike û şert û ruknên wê bi cihhatî bêt dîtin. Eger mirov hinekî multefit be û ji nefsa xwe bipirse, wê dava xwe bi rêkek muqedes ve deyne û bêje eva he ji ber wê ye, çiko xêra îbadetê di mizgeft û cemaetê da

pirtir e, lewmane tu bi kêf û şahî yî. An eger ne di mizgeft û cemaetê da be, wê bêjiyê: Baş e mirov amelê xwe li ber çavên xelkê baş û bi cih pêk bîne, da ku xelk mirov ji xwe ra bikin ders û ew jî amelên xwe baş bikin û dîndarî ya wan pirtir bibe. Bi her wesîla hebe mirov dixapîne. Ev kêf û şahî ji nexweşiya dil pê ve ne tiştek dî ye ku ser mirov da tê û ew xwe durist û salim dibîne û êdî li dermankirina xwe jî nagere. Nexweşê ku xwe salim bizane, êdî hêvîdariya selametiyê jê ra nîne.

Jarê belengaz di navdeyê xwe da dixwaze amelê xwe nîşa xelkê bide û ew bi xwe jê bêxeber e. Û belkî guneh di qalibê îbadet da dike û xwenîşandanê dike di qalibê berfirehkirina dîn da. Her çend kirina sunetan di halê tenêkiyê da sunet e, çima nefs dixwaze daim nav xelkê da bi cih bîne? Dema nav xelkê da ye, ji tirsa Xwedê ji dil ve digirî, lê tenêkî çiqas xwe dişidîne jî qet çavê wî şil nabin! Çi bûye ku di nav xelkê da tirsa ji Xwedê çêdibe? Di şevên Qedr da; nav cemaetên çend hezar neferî da, girîn, ah û nalîna wî bilind e; sed rikat nimêj û Cewşena Kebîre, Sexîre û çend cizûkên Quranê dixwîne û qet westan jê ra nîne, lê di wextê tenêkiyê da nikare deh rikatan bike û pişta wî diêşe! Eger karê mirov ji razîbûna Xwedê ra, an ji nazilbûna rehmetê, an ji tirsa dojehê, an jî ji şewqa bihiştê ra ye, çima dilê wî dixwaze çi karê ku dike xelk medh û pesnê wî bidin? Guhê wî li devê xelkê ye û dilê wî li bal wa ye, da bibîne kî medhê wî dike û pesnê wî dide; ev hecî çiqas mirovek durist e! Di danûstandinan da her wisa. Eger mexsed Xwedê ye, ev zêdegavî çi ne? Eger bihişt û dojehê tu bal amel ve birî, nexwe ev hezkirin çi dibêje? Multefit be ku ev hub ji dara kotî û xebîsa riyayê ye. Welhasil çiqas ji te be, xwe durist bike û xwe ji van hub û hezkirinan, vala û xwerî bike.

Di vî meqamî da ez ê tenbîha gotinekî bidim: Ew jî ev e ku heryek ji van sifetên nefsanî, çi melekatên qenc û çi xirab, derece û mertebên zehfî jê ra hene. Gelek caran çêdibe yek ji wan merteban di wesfdana di qencîhê da û berîkirina di xirabiyê da taybetê arif û welî yên Xwedê bê û xelkên dî gorekî derece û merteba ku

heyîn, ew sifet ku ji desteya yekê ra kêmasî ye ji wan ra ne kêmasî be; belkî bi awayekî, kemal jî bêt hesabê. Her weha çêdibe ku hesenat û başî yên vê destê, nebaşî û seyyi'atên desteya dî bên hesabê. Yek ji wan riya ye, ku ev xeberdana me der heqê wê da ye. Xulûs û dilpakî di hemû derecên xwe da ji taybetiyên welî yên Xwedê ye û yên dî di wê da ne şirîk in. Û navkirina xelkê bi mertebeyek ya wê, gorekî mertebe û dereca ku heyîn neqs û kêmasiya wan nîne û zererê nagehênê îman û îxlasa wan. Mesela: Nefsa xelkê bi hesebê sirûşta wan, dixwaze ku başiyên wan li bal xelkê eşkere bibin, her çend xêran ji eşkerebûnê ra nakin, lêbelê nefsa wan bi vê hezkirinê ve hatiye girêdan û li ser wê sekiniye, lêbelê eva he nabe sebebê pûçbûna amel û nabe şirk, nifaq û kufr, her çend ji weliyan ra neqs û kêmasî hesab dibe û di bîr û hizra welî û arifê billah da şirk û nifaq e. Û dûrbûna ji mutleqê şirkê, her weha îxlasa hemû aliyî û bi hemû merteban ve, mertebe û meqamê yekê ye ji ewliyan ra û ji bona wan meqam û mertebên dî jî hene ku evder ne cihê xeberdana ji wa ye. Eva he ku îmamên pak gotine: «Îbadetê me îbadetê ehrar û azamêra ye», yanî, ne ji şewqa bihiştê ra û ne ji tirsa agirê dojehê ye; belkî ji meqamatên wan yên me'mûlî û merteba yekê ya wîlayetê ye. Wan di îbadeta de ew halet hene ku em û hûn nikarin fêhm jî bikin.

Pê vê ya te guh lê bûyî, kifş bû ku li hevanîna van du hedîsan çawa çêdibe; hedîsa borî ku ji Resûlê Xwedê û Mîrê bawerdaran (s.a.a) û hedîsa dî ku «Zurare» ji hezretê Ebû Cafer (a.s) neqil dike. Hedîs ev e:

Zurare dibêje: «Min der heqê kesekî da ku xêrekî dike vêca dema kesek bi wê xêrê dihese bi dîtina wî kêfxweş dibe, ji Îmam Baqir (a.s) pirsiyar kir, ewî kerem kir: Eger wî karî ji dîtina xelkê ra neke, tiştek nabe (çi lê nayê), kes nîne ku nexwazê başiya wî li bal xelkê eşkere bibe».

Di yek ji van du hedîsa da hezkirina pesindanê bûye nîşana riyayê û di ya dî da gotiye ku çi lê nayê mirov bi eşkerebûna başiyê

kêfxweş û şahî bibe. Eva he ji ber îxtilaf û ne wek yekbûna mertebe û dereca ye. Awayek dî ji yê li hevanîna van du hedîsan heye; lê em jê derbas bûn.

## Tetimme: Sum'e

Bizane, sum'e jî ji dara xebîsa riyayê ye. Ew jî ev e ku mirov xesletên xwe bigehîne guhê xelkê, da ku meşhûr bibe û dilan bi aliyê xwe ve bikêşe. Ji ber vê yekê me cuda jê xeber neda û di behsa riyayê da ji wê xeber da.

# HEDÎSA SISÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب، عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن عليّ بن أسباط، عن أحمد بن عمر الحلاّل، عن عليّ بن سويد، عن أبي الحسن عليه السّلام، قال: سألته عن العجب الّذي يفسد العمل. فقال:

**«العُجْبُ دَرَجاتٌ، منها أن يُزيّنَ لِلعَبدِ سُوء عَملِه فَيَراهُ حَسَنًا، فَيُعْجِبُه و يَحْسَبُ أنّه يُحْسِنُ صُنْعًا. و مِنها أن يؤمن العبد بربّه فيَمُنّ على الله تعالى و للهِّ عَليْه فيه المَنُّ.»**

Alî bin Suweyd dibêje min ji Musa bin Cafer (a.s) der heqê wê ucbê da pirsî ku amelan pûç û xirab dike, vêca kerem kir: «Ucbê derece hene: Yek ji wê ew e ku pîsatiya amelê bende jê ra dixemilîne, heta ewê baş dibîne, vêca dikeve ucbê û goman dike karek gelek baş kiriye. Yek dî jî ev e ku bende, îmanê bi Xwedê tîne û ji ber îmana xwe, minetê li Xwedê dike, halhale di wê meselê da mineta Xwedê ser wî ye».(1)

### Şîrove:

Gorekî gotina aliman (Xwedê ji wan razî be) ucb, ew e ku mirov kar û amelê xwe yê qenc, pir û mezin bibîne û bi wê şahî bibe û delaliyên xwe bike û bêkêmasî bibîne. Lê şahîbûna wî digel tewazu û dilnizmiyê di beranberê Xwedê Teala da û şukirkirina ji wî ra ji ber ku Xwedê tewfîq dayiyê, ku vî karê qenc bike, eva he nabe ucb û tiştek baş e.(2)

---

1- Kafî, c. 2, p. 313

2- Camius Seadat, c. 1, p. 357; Mehecce, c. 6, p. 276

Cenabê muhedisê giranqedr «Meclisî» -ku Xwedê cihê wî xweş bike- ji cenabê lêkolê zana û zanayê mezin şêxê giranqedr «Behauddînê Amolî» weha digêre ku gotiye: «Bê şik kesê karek qenc wek rojî girtin û îbadetê şevê... bike, di nefsa xwe da kêfxweş û şahî dibe, vêca eger ev şahîbûn ji ber vê be ku Xwedayê Teala qencî digel kiriye -ku ew qencî jî ev amelê qenc û salih e-, digel wê yekê jî di halê tirsanê da be, ji ber kêmasiya ku di emelê da heyî, û di halê bizdanê da be, ji ber zewal û ji navçûna wê û zêdahiyê ji Xwedê bixwaze, ev kêfxweşî û şahîbûn ne ucb e. Eger ev şahîbûn ji ber wê be ku ev kar kiriye û ew ji wî bi xwe ye û ew e xweyê vî sifetî û amelên xwe mezin bizane û ji xwe ra bike palgeh û xwe bêkêmasî bibîne û bigehê cihekî ku heçku bi vî karî minetê deyne ser Xwedê Teala, hingê ev şahîbûn dibe ucb.[1]

Ev jarê he dibêje: Tefsîra ucbê wek çawa gotine durist e, lê gerek amel giştîtir ji amelê qelbî û qalibî bêt hesibandin û her weha dagirê amelê pîs û baş bêt zanîn. Çiko ucb, wek çawa kar û amelê cewarihî (endamî) li ber xwe digire, şamilê amelên ciwanihî (dilî) jî dibe û ewan difesitîne û xirab dike; çawa ku xweyê xesletên qenc ji ber xesletên xwe dikeve ucbê, her wereng xweyê xesletên nedurist jî ji ber xesletê xwe ecêbgirtî dibe. Çawa ku di vê hedîsê da behsa van herduka hatiye kirin. Çiko di nezera xalib da xef e. Piştî vê bi hezkirina Xwedê em ê behsa herduka bikin.

Gereke bêt zanîn, ew şahiya ku ucb jê hatiye nefiy kirin û baş hatiye dîtin, gorekî halê new'ê ye û em ê di vebirekî da behsê jê bikin.

Bizane, çawa ku di hedîsa şerîf da îşare pê hatiye kirin, ucbê derece hene:

Dereca ewil, ucba bi baweriya zanînên heq e, di beranber da jî, ucba bi kufr, şirk û baweriyên pûç da ye.

---

1- Mir'atul Uqûl, c. 1, p. 218, h. 1-ê.

Dereca duwê, ucba bi melekeyên baş û sifetên qenc da ye, beranberê wê jî, ucb e ji ber exlaqên pîs û melekeyên kirêt.

Dereca sisê ya ucbê, bi amelên salih û kiryarên qenc e, di beranberê wê da jî, ucba ji ber amelên kirêt û karên ne rêkûpêk e.

Xêncî ji van, derecên dî jî hene ku vêderê ne cihê behsa ji wa ye. Bi hezkirina Xwedê em ê di çend vebiran da îşare bikin bal van derecan û serkaniyên wan û rêka îlac û çareserkirina wan ve û vê der heqê da em alîkariyê ji wî dixwazin.

**Vebir: Mertebeyên ucbê**

Bizane, ucbê di heryek ji van derecên hatine gotin da, mertebe hene ku hinek ji wan merteban eşkere û ronahî ne, û mirov bi hişyariyek kêm pê dihese. Hinek dî gelek hûr û zirav in, ku mirov bê lêkolînek temam û hûr nêrîna li amelan, nikare pê bihese; her weha hinek ji mertebên wê zehmettir û dijwartir û muhliktir in ji yên dî.

Merteba yekê, ku ji hemûyan dijwartir e û mehleka wê zêdetir e, haleke ku ji ber piriya ucbê di mirov da peyda dibe, ku di dilê xwe da ji ber îman û xesletên xwe yên dî, minetê li Xwedayê Teala û Malikul Mulûk dike; goman dike bi îmana wî, memleketê heq berfireh û dînê Xwedê ronahî bûye, an ji ber ku şerî'etê beyan dike û xelkê îrşad û hîdayet dike û emrê bi me'rûf û nehya ji munker dike, an bi cihanîna hed, hudûd û minbera wî, dînê Xwedê geştir dike, an goman dike bi çûna nav cemaeta musilmana û şîn girtina ji Îmam Husêyn (a.s) ra geşiyek di dîn da çêkiriye û ji ber vê yekê mineta xwe datîne ser Xwedê û ser serwerê mezlûman û Resûlê Ekrem (s.a.a). Her çend evê yekê neyinê ser ziman jî, lê di dilê wî ra derbas dibe. Û minetkirina li bendeyên Xwedê di karûbarê dînî da jî ji vê pêkê ye; mesela, di dana sedeqên wacib û sunet da û ji ber alîkariya feqîr û jaran minetê li wan bike. Carna ev minetkirin, heta ji mirov bi xwe ra jî veşartî ye. (Behsa nebûna minet a xelkê ser Xwedê û hebûna minet a

Xwedê ser wan, di hedîsa duwê da derbas bû).

Merteba dî ew e, ji ber ucba zehfî ku di dilê wî da heye, delaliyên xwe li Xwedê Teala bike û eva he tiştekê xêncî ji minetkirinê; her çend hineka ferq nexistine nav wan da.

Xweyê vî meqamî goman dike mehbûbê Xwedê ye, û xwe di rêka «muqereb» û «sabiqîn»an da zane û eger navek ji welîyên heq an «mehbûbîn» û «muhibîn»an, an ji salikê meczûb bêt birin, di dil da xwe ji wan dihesibîne, çêdibe ku riya an nefs sivikiyê ji xwe nîşan bide û an bi awayek wereng bêje ez ne ji wa me, ku kifş bibe mexseda wî ev e ku ez ji wa me. Û eger Xwedê belayekî ser da bîne, hawara wî bilind dibe ku ev bela ji ber dostî û welayê ye[1]. Mudde'iyên îrşadê ji arif û mutesewif û ehlê sulûkê, ji vê xeterê ra ji yên dî nêzîktir in.

Dereceyek dî ew e ku, ji ber îman an melekat, an amelan, Xwedê deyndarê xwe bizane û xwe musteheqê xêrê bibîne û berpirsiyariya Xwedê bizane, ku ewî di dinyayê da ezîz û di axretê da meqam û derecan bidiyê û xwe bawerdarê pak bizane û kengê navek ji muminan bêt birin, xwe di nav wan da bibîne û serî hilde û di dilê xwe da bigerîne ku eger Xwedê bi edalet jî ra be, gereke ewî xêrdar bike û belkî hinek zêdegaviyê dikin û evê yekê tînin ser ziman jî. Û eger belayek ser da bêt û nexweşiyek jê ra çêbe, di dilê xwe da xeletiyê tîne ser Xwedê û ji karê Xwedayê adil dimînê ecêbmayî ku çawa bela ser bawerdarê paqij da dirêje, minafiq û fasiqan ji xweşiyan behremend dike û di dilê xwe da ji Xwedê û teqdîrên wî di’enirê û di eşkereyê xwe da razî tê dîtin, xezeba xwe ji Xwedayê xwe yê xweyê qenciyan ra rê dike û razîbûna bi qezayê nîşa mexlûqan dide. Û dema guh lê dibe ku Xwedê di vê dinyayê da bela dide bawerdaran, ser selametiyê dide dilê xwe, nizane ku bela, ser minafiq da jî tê, ne ku hema bela ji mumina ra ye.

---

1- Di hedîsan da hatiye: “Heçî Xwedê hejê bike, bela serda tîne”. Bihar, c. 64, p. 236, babetê “Îbtilaul Mumin”.

Dereceyek dî ya ucbê ew e ku xwe seratir û baştir ji xelkê bibîne; bi îmanê ji yê bê îman û bi îmana kamil ji yê mumin û bi sifetên baş ji wî yê ew sifet neyîn û bi kirina waciban û terka heraman ji wî yê ne wereng û bi kirina sunetan û hay jê mana cum'e, cemaetan û terka mekruhan, xwe ji xelkê kamiltir dibîne û seratiyekî ji xwe ra dihesibîne, xwe, îman û amelên xwe ji xwe ra dike palgeh û xelqên dî xweyê kêmasî û kêm zane û bi çavek zelîl, berê xwe dide xelkê û bi dil an ziman eybê ji xelkê ra çêdike. Hemûyan bi awayekî ji dergahê rehmeta Xwedê davêje, û rehmet û dilovaniyê ji xwe û birekî wekî xwe tenê ra zane. Ew kesê bigehê vêderê, welê lê tê ku, çi karê qenc ji xelkê bibîne, qenc hesab nake û bi awayekî xirabiyê ser da tîne; lê karê xwe pak û paqij zane. Kar û amelê qenc ê xelkê bi tiştekî hesab nake, lê hema eger ew kar bi xwe, ji wî çêbe, gelek mezin û bi cih zane. Eyb û kêmasiyên xelkê xweş dibîne, lê ji eyb û kêmasiyên xwe bêxeber e. Ev nîşanên ucbê ne; her çend mirov jê xafil e. Û ucbê hinek derecên dî jî hene, lê min hinek negotin û ez ji hinek dî jî bi neçar xafil im.

**Vebir: Ehlê xirabiyê jî carna ji ber xirabiya xwe ecêbgirtî dibin**

Ehlê kufr û nifaq, müşrik, mulhid û xweyê exlaqên pîs û melekatên rezîl û ehlê gunehan jî carna digehin wî halî ku ji ber kufr û zindîqî ya xwe, an nebaşexlaqî û pîskariyên xwe dikevin ucbê û şahî dibin! Bi wê, xwe xweyê ruhek azad û dûrê ji teqlîdê, û bawernekerê xeyalatan dihesibînin û ji xwe ra mêranî, cesaretê zanin û baweriya bi Xwedê ji xeyalatan û amelkirina bi şerî'etê ji kêmmêjîtî hesab dikin û exlaqê baş û melekatên qenc, ji jarî û belengaziyê dijimêrin û karên qenc û îbadet, ji kêmfêhmiyê dihesibînin. Vêca ji ber wî ruhê azadê ku bawerî bi xeyalatan neyî, û pakiyê bi îbadetan nake, xwe musteheqê pesindanê zanin. Xesletên pîs ên nedurist, rehên xwe di dilê wan da kirine, çav û dilê wan ji wê tijî bûye û li bal wan hatiye xemilandin û ewa kemal dihesibînin. Çawa ku di vê hedîsa şerîf da îşare pê hatiye kirin, li wêderê ku kerem dike: «Yek ji derecên wê ew e ku kar û amelê

bende jê ra dixemilîne bi awayekî ku ewê qenc û baş dibîne». Û ev îşare ye bal vê gotina Xwedê ve ku kerem dike: «Ma gelo ew ê amelê wî yê pîs jê ra hatiye xemilandin, vêca ewê baş û sipehî dibîne...»[1] her wereng li wêderê ku dibêje: «Goman dike ku karê qenc dike», îşare ye bal vê gotina Xwedê ve ku: «Bêje ez hewe pê bihesînim ka kî di karên xwe da xusirîtirîn in? *Ew in yên karê wan di dinyayê da pûç bûyî û ew we dihesibînin ku karek baş kirine *Ew, ew in yên ayetên Xwedayê xwe û liqaya wî înkar kirine û karên wan şewitîn, vêca em di roja qiyametê da biha û giraniyekî nadin wan»[2]. Ev deste ji xelkê ku cahil, nezanin û xwe alim, zana hesab dikin, rebentirînê xelkê û bextreştirînê mexlûqa ne. Doktorên ruh û rewan ji îlackirina wan ra çare nînin û dawet û şîret eserê li wan nakin û carna jî netîca bervajî dide. Evên he guh nadin burhan û delîlê; çav û guhê xwe ji ber hîdayeta pêxemberan û burhana hekîman û wazên zanayan girtine. Gerek mirov ji ber wa gunehên ku bi aliyê kufrê ve dikêşin, hana xwe ji Xwedê ra bibe. Nefs û şeytan ji ber piçûk hesabkirina hinek gunehan, mirov têxin nav wî gunehî ra û piştî ku rehê xwe di dil da kir xwar, û mirov ew guneh kir, berê xwe dide gunehek mezintir û piştî ducarkirin û sêcarkirinê, ew jî li ber çavê mirov piçûk û kêm dibe, û mirov her gunehê mezintir dike.

Bi vî awayî mirov gav bi gav pêşve diçe, heta ku gunehên mezin ber çavê mirov piçûk û kêm dibin, heta guneh hemû bi wî awayî bên dîtin, û Xwedê û şerî'et û qanûnên wî û pêxember, di dilê wî da kêm bibin, û netîca wê dibe kufr û zendeqe û ucba bi wan. Belkî di behsên hêj bên da em vê der heqê da biaxivin.

**Vebir: Pîvek ji hîleyên şeytan ra heye**

Çawa ku xweyên ucba di gunehan da ji dereceyekî bal dereceyekî ve diçin, heta karê wan bigehê kufr û zindîqiyê, xweyê ucba

1- Fatir / 8

2- “Qul hel nunebbiukum bil exserîne e'mala...”, Kehf /102-104.

di îbadet da jî, ji dereca kêma ucbê bi aliyê dereca kamiltir ve bilind dibin. Hîle pîlên nefs û şeytan, di dil da bi pîvek û mîzan e.

Qet ne mumkin e nefsê te yê bi teqwa û ji Xwedê tirs, hay bide ji kuştin û zinayê ra; an wî yê şerîf û dilpaqij ji dizî û rêgiriyê ra rêke. Ji ewil ve çênabe bêje te, ku ji ber îman û amelê xwe minetê li Xwedayê xwe bike; an xwe ji mehbûbîn û muhibbîn û muqerebîn ên dergahê wî bihesbîne. Di cara yekê ji dereca binretir dest pê dike, heta xwe bixe di dil da û te mecbûrê kirina sunet û zikir bike û di wî halî da gorekî halê te, kar û amelê yekî ji ehlê gunehan ji te ra berçav bike û mejiyê te bixe kar, ku bi hukmê aqil û şer'ê tu ji vî baştir î û karên te sebebê xilasiya te ne û şukrê Xwedê ku tu pak û paqij î û bê guneh î û ji gunehan dûr î. Ji vî karî du desthat dikevin dest: Yek ev ku nisbet bi evdên Xwedê gomana xirab bike, û ya dî ev ku xwe bi’ecibîne; bizane ku ev herdu jî ji navber û kar xirabker in. Ji nefs û şeytan ra bêje ku: Ev mirovê xweyê vî gunehî, belkî hinek melekat têda hebin û xweyê hinek kar û amelan be ku ji ber wan Xwedê ewî bide ber dilovaniya xwe û rehmê lê bike û ronahiya ewî exlaqê qenc û wê melekê bibe sebebê hîdayeta wî û dûmahîk û aqibeta wî bikeve ser xêr û başiyê. Belkî bela ya guneh ku ser vî gunehkarî da hatiye ji ber wê be ku nekeve nav ucbê ra, ku ji guneh mezintir e; çawa ku di hedîsê da hatiye, Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Xwedê zane ku guneh ji mumin ra baştir e ji ucbê, û eger ne ev bûya, qet mumin naxista nav guneh ra». Û belkî ji ber vê xirab dîtinê dûmahîka min bikeve ser nebaşiyê.

Seydayê giranqedr, arifê kamil, ez gorî Şahabadî digota: «Di dilê xwe da eyban ji kafir ra jî çênekin, belkî nûra fitreta wî ewî hîdayet bike, ev kêmasî çêkirin û lome, we heye bibe sebebê aqibet ne xêrî ya hewe. Emrê bi me’rûf û nehya ji munker tişteke xêncî ji kêmasî çêkirina di dil da», heta vê jî digota ku «Kafirên ku ne me'lûm e di halê kufrê da miribin, lanetê li wan nekin, belkî di wextê çûnê da hîdayet bûbin û ruhaniyeta wan bibe sebebê pêş neketina hewe”. Bi her hal nefs û şeytan hewe têxin di dereca

ewil ya ucbê da, kêm kêm hewe ji wê derecê dibin bi aliyê dereca jortir û her dibin û dibin, heta mirov bigehênin cihekî ku bi îman an amelê xwe minetê li Xwedayê xweyê qencî yên xwe û Malikul Mulûk bike û karê wî bigehê axer.

**Vebir: Xirabiyên ucbê**

Bizane ku ucb bi xwe bi xwe ji navber û paşveder e, îman û amelên mirov pûç û xirab dike. Çawa ku di vê hedîsa şerîf da rawî ji wê cûre ucbê dipirsê ku kar û amelan ji nav dibe û difesitîne, Îmam (a.s) ucba di îmanê da, dereceyek ya wê zaniye. Û di hedîsa derbas bûyî da te dît ku li bal Xwedê Teala ucb ji guneh dijwartir e û ji ber wê çendê mirov têxe gunehê, da ji ucbê êmin bibe. Û Resûlê Ekrem ew, yek ji wêrankeran hesab kiriye. Û di kitêba «Emalî» ya «Şêxê Sedûq» da ku seneda wê digehîne Mîrê bawerdaran Îmam Alî (a.s) hatiye: «Kesê bikeve ucbê, wê ji nav biçe». Û şiklê vê şahiyê di berzex û paş mirinê da şiklek bi bizdan û dijwar e ku çi bizdan wek wê nabin. Û çêdibe ev wesiyeta Resûlê Xwedê (s.a.a) li Mîrê bawerdaran (a.s) îşare be bal wê yekê ve, li wêderê ku kerem dike: «Çi tenêtî, bi bizdantir ji ucbê nîne».

Mûsayê kurê Îmran (a.s) ji şeytan ra got: «Behsa wî gunehî ji min ra bike ku dema mirov ew guneh bikin tu desthelatê ser wan dikî». Şeytan got: «Ew hingê ye, dema xwe biecibîne û kar û amelê xwe mezin bizane û gunehê wî ber çavê wî piçûk bibe».

Xwedayê Teala dibêje Dawûd (a.s): «Ey Dawûd, mizgîniyê bide gunehkaran, û sidîqan bitirsîne” got: «Ez çawa mizgîniyê bidim wan û evan bitirsînim?» Kerem kir: «Mizgîniyê bide gunehkaran ku Ez tewbê qebûl dikim û ji gunehan diborim. Û sidîqan bitirsîne ku ji ber amelên xwe nekevin ucbê, çiko heçî bendeyê Ez hesabê gel bibînim helak dibe». Em hana xwe ji Xwedê ra dibin, ji ber munaqişa di hesabê da ku sidîq û mezintirê ji wan li helakê dibe.

Şêxê Sedûq di «Xisalê» da senedê digehîne Îmam Sadiq (a.s) ku kerem dike: «Şeytan dibêje, eger di sê tişta da ez ser zarokên

Adem bikevim, êdî xema min nîne, çiko piştî wê tiştek jê nayê qebûl kirin: Dema amelê xwe zehf hesab bike û gunehê xwe ji bîr bike û bikeve ucbê».

Xêncî ji wan xirabiyên ku te der heqê ucbê da guh lê bûyî, ew darek xebîs e ku zêdetirê gunehên mezin pê ve tên û eger reh û rîşeyên xwe di dil da bike, mirov digehîne kufr, şirk û mezintirê ji wan.

Yek ji xirabiyên wê, piçûk zanîna guneha ye. mirovê ketî ucbê li duristkirina nefsê nagere û xwe pak û paqij dihesibîne û nakeve wê fikrê ku xwe ji gunehan paqij bike. Perda ucb û hicaba stûra ji xwerazîbûnê pêşiyê li dîtina xirabiyan digire û ev, ew guneh e ku mirov ji hemû kemalatan paşda dihêle û têxe nav eyb û kêmasiyan ra û paşî ra mirov li helakê dibe, tebîbên ruh û rewan nekar dikin ji îlackirinê ra.

Her weha nefs û amelê xwe, ji xwe ra dike palgeh û ev dibe sebeb ku mirovê jar û reben xwe muhtacê Xwedê nezane û li zêdahî û kerema Xwedê nenihêre û bi aqilê xwe yê piçûk Xwedê mecbûr bizane ji dana xêr û sewabê ra û goman bike eger bi edlê jî muamele digel bêt kirin, musteheqê xêrê ye. Pey ra wê vê der heqê da axiftin bêt kirin; bi hezkirina Xwedê.

Yek dî ji xirabiyên wê ev e ku bi kêmasî berê xwe dide evdên Xwedê, kar û amelê xelkê bi tiştekî nahesibîne; her çend ji kiryarên wî bi xwe baştir bin. Eva he jî yek ji rêkên helaketa mirov e.

Ji xirabiyên dî yên ucbê ev e ku mirov bi aliyê riyayê ve dikişe. Çiko eger karên xwe kêm hesab bike û exlaqê xwe nebaş bizane, xwe, sifet û karên xwe ne ecibîne, belkî xwe û hemû tiştên xwe kirêt bibîne û ewa nedine ber dîtina xelkê û nîşan nede, barê xirab nabe bazarê. Lê dema xwe kamil dît û amelên xwe qabil, wê li nîşandanê bigere û xwe bifroşe.

Xirabiyên riyayê di hedîsa duwê da derbas bûn, gereke ew xirabî û mefsedeyên ucbê jî bên hesabê.

Xirabiyek dî ew e ku ev rezîl û qirêja he dibe sebebê cih hatina rezîletiya tekeburê, û mirovan mubtela dike bi gunehê kibrê. (Înşaellah piştî vê em ê behsê jê bikin) û xirabiyên dî jî bi wasite an bê wasite pê ve tên, ku behsa ji wan xeberdanê dirêj dike.

Nexwe bila xweyê ucbê bizane ku pîsatiyên dî jî bi vê pîsatiyê ve tên û serkaniya hinek tişta ye ku her yek sebebek serbixwe ye ji helaket û ezabê ebedî ra.

Eger ev xirabî durist fêhm kir û baş baş lê nihêrî û berê xwe da hedîs û eserên ji Resûlê Xwedê û binemala wî serwerî (s.a.a), muheqeq wê ji xwe ra lazim bizane ku li duristkirina nefsa xwe bigere û xwe ji vê rezîletiyê xilas bike û rehê wê di nefsa xwe da binbir bike, da ku newebe Xwedê nekirî bi vî sifetê pîs ve cihê xwe biguhêze û biçê alema dî. Wextekî ku çavê mulkî yê dinyayî hat girtin, berzex û qiyamet hat, wê bibîne ku halê ehlê gunehên mezin ji yê wî baştir e; ji ber poşmaniya ku ji wan çêbûyî an baweriya ku bi kerema Xwedê heyîn, ew kirine nav behra rehmeta xwe ra, lê evê reben, çiko xwe musteqil zaniye û di navdeyê xwe da xwe ji kerema Xwedê bê minet kiriye, Xwedayê Teala ser hesaba wî sekiniye û wek çawa wî xwestî bi edalet muamele gel kiriye û ew pê hesandiye ku qet tu îbadetek ji Xwedê ra nekiriye, amel û îmana wî pûç û betal e. Xwedê neke, Xwedê Teala bi edla xwe muameleyê gel kesekî bike, ku eger ew hal bêt pêş, ji ewilîn û axirînan yek tenê jî xilasî jê ra nîne. Îmamên hîdayetê (a.s) û enbiyaên giranqedr di dua û munacatên xwe da kerema Xwedê xwestine û ji edaletê û şidandina ser hesabê tirsiyane. Munacatên xewasên dergehê Heq û mamên pak (selamên Xwedê li ser wa bin) ji îtirafa bi teqsîrê û pêk neanîna heqê îbadetê wî, bi awayek bêkêmasî, tijî ne. Dema seratirîn mexlûq û nêzîktirîn kes bal Xwedê, gazî bike ku: «Ma 'erefnake heqqe marîfetik we ma 'ebednake heqqe îbadetik - Çawa tu layiq, me tu nas nekirî. Çawa heqê îbadet, me îbadetê te nekiriye»; vêca wê halê xelkê çi be?

Belê, ew nas in gel mezinahiya Xwedê û zanin ka nisbeta mumkin û wacib çi ye. Ew zanin eger omr û temenê dinyayê hemûyê di taet, îbadet, tesbîh û tehmîdan da biborînin nekarin şukrê nîmetên Xwedê bikin. Ew zanin ku çi mexlûqekî tiştek ji xwe nîne; heyat, qudret, ilm û hemû kemalatên dî sîbera kemala wî ne. Û mumkin, feqîr belkî feqra mehz û mustezil û bindest e, ne musteqil. Ma mumkin çi kemal ji xwe heye, heta vêca kemalê bidit? Çi karîn ji xwe heye da amel kiribit? Ew, Xwedênas in, cemal û celala Heq nas kirine. Yên reben em in, û belengazên ku di nav perdên nezanî û bêxeberî û ji xwerazîbûnê ra ne, em in; û perda bêemriyê wisa ser qelb û qalib, çav û guh, hiş û aqilê me da girtiye ku, em di beranberê selteneta mezin û qahire ya Heq da radibin û em xwe musteqil zanin û xwe tiştek hesab dikin.

Ey mexlûqê jarê rebenê bêxeber ji xwe û bêxeber ji nisbeta xwe digel xaliq, ey bextreşê mumkinê bêxeber ji wezîfa xwe di beranberê Malikul Mulûk da! Ev cehl û nezanîn e ku bûye sebebê van hemû bextreşiyan û ev tarîtî û qirêjiya me. Xirabiya kar ji serçavkê ye û şêlûtî di serkaniyê da. Çavê nasîn a me kor e û dilê me mirî ye û ev e serçavka hemû belan û em ne di xema duristkirinê da ne jî.

Ey Xwedê! Tu tewfîqê bide me, tu me gel wezîfa me nas bike û bi me bide nasîn, tu ji wê ronahiya ku te pê wê dilê arif û weliyan tijî kirî, behra me tê bike. Tu dagîriya qudret û selteneta xwe û kêmasiyên me nîşa me bike. Tu me'na «elhemdu lillah - hemd ji Xwedê ra» bi me reben û bêxeberên ku hemda hemûya nisbet didin bal xelkê ve, bide fêhmê. Tu bi dilê me bide zanîn ku çi mehmede û pesn ji çi mexlûqan ra nînin. Tu heqîqeta: «Ma esabeke min hesenetin, fe minellah we ma esabeke min seyyî'etin fe min nefsik» «Başiya bigehê te ji Xwedê ye û nebaşiya bigehê te ji te bi xwe ye» (Nisa / 79) ji me ra eşkere bike. Tu kelîma mubareka tewhîdê bixe di dilê me yê hişk û tarî da.

Em ehlê hicab û tarîtî û ehlê şirk û nifaqê ne, em xwexwaz û ji xwerazî ne, tu huba nefsê û huba dinyayê ji dilê me derîne. Tu

me bike Xwedêxaz û Xwedêperest. Înneke ‘ela kulli şeyin qedîr - hema karîna te tenê li ser her tiştî heye.

**Vebir: Serçavka ucbê hezkirina ji nefsê ye**

Bizane ku ucba pîs, ji huba nefsê peyda dibe; çiko huba nefs di sirûşta mirov da heye û serçavka hemû xeta û rezîl exlaqî yên mirov huba nefsê ye. Û ji ber vê ye ku mirov karê xwe yê piçûk mezin hesab dike û ji ber wê, mirov xwe ji başan û nêzîkê dergahê Heq dêjmêre û ji ber amelê xwe yê ne qabil, xwe musteheqê pesn û medh zane û belkî heta carna karê wî yê kirêt ber çavê wî sipehî û rind dibin, eger ji kar û amelê xwe baştir û mezintir ji hinek dî dît, ewqas muhim nagire û daim mirov karên qenc ên xelkê bi awayekî bi aliyê xirabiyê ve dibe û karê xwe yê xirab û nedurist bi aliyê mertebeyek ya başiyê ve dibe. Nisbet bi mexlûqê Xwedê xirabbîn e, lê nisbet bi xwe xweşbîn. Pê vê huba nefsê. ji ber karek piçûk û tevlî hezar karên xirab, Heq Teala deyndarê xwe zane û xwe musteheqê rehmet û dilovaniyê dibîne. Baş e ku niha em hinekî der heqê qencî yên xwe da bifikirîn û îbadetê xwe bixin bin qa’idên aqlî da û bi însaf lê binhêrin, gelo em bi wan dibin musteheqê medh, pesn, xêr û rehmetê? An lome, ceza, xezeb û niqmetê. Û eger Heq Teala ji ber vî amelê ku em qenc û sipehî dibînîn, me bi agirê qehr û xezeba xwe bişewitîne, di cih da ye û rêk ketîye digel edalet û duristiyê.

Niha der heqê vê pirsiyara ez bikim da, ez hewe dikim hekem û dawer û ez ji hewe dixwazim piştî fikirkirin û teemmulê, bi însaf tesdîq bikin. Pirsyar ev e ku eger Resûlê Ekrem (s.a.a) ku sadiq û musediq e, ji hewe ra bêje: Eger hûn di omrê xwe hemûyê da îbadetê Xwedê bikin û xwe ji şehwet û xwestên nefsanî vedin, an di omrê xwe hemûyê da vajiyê gotina Xwedê bikin û gorekî meyl û xwesta nefsanî gava xwe bavêjin, di dereca axreta hewe da ferq nake û di her hal û karî da hûn ehlê xilasiyê ne û hûnê biçin bihiştê û êmin in ji ezab. Hûn nimêj bikin an nekin ferq nake, lê razîbûna Xwedê tenê di wê da ye ku hûn di vê cîhanê da îbadetê

wî bikin û hemdê wî bidin û xwe ji xwestên nefsanî vedin û di beranberê wê da jî xêr û kirhek ji hewe re nîne, gelo hûnê bibûna ji ehlê me'siyetê an ehlê îbadet? Hewe wê xwestên nefsanî terk bidan û hewe wê lezetên nefsê ji razîbûna Xwedê ra û ji seba xwatirê wî li xwe heram bikira yan ne? Hûnê dîsa biçûna cum'e û cemaetan, an hûnê di şehwet, lehw û le'îb û kêfa xwe da noqî bibûyan? Bi însaf û bê riyakarî cewab bidin. Ez der heqê xwe û yên wek xwe da bêjim ku, em ê bibûna ji ehlê bêemriyê û me wê taet û îbadet terk bida û em ê mijûlê xweşiyên nefsanî bibûna.

Nexwe ji vê, ev netîce hat girtin ku karên me hemû ji xweşiya dil ra û îdarekirina zik û binzik ra ye û em benî yê zik û şehwetê ne; em ji lezet û xweşiyek mezintir ra xweşiyekî terk didin. Nimêj ku mîraca qurba îlahî ye, em bi cih tînin, da em nêzîkê jinên bihiştî bibin! Ne girêdayî ye bi qurba Heq ve û ne ji guhdanê ra ye; hezaran fersexa ji razîbûna Xwedê dûr e.

Ey belengazê bêxeber ji zanînên îlahî, ku ji îdare kirina şehwet û xezebê pê ve tiştek dî fêhm nakî, tu xwe û yê muqedesê hay ji zikir, wird, sunet û ferzan heyî û xwe ji mekruh û heraman vedayî û exlaqê qenc heyî û dûrê ji exlaqên pîs û xirab, dane di terazûya însafê da; gelo qey karên ku tu dikî ne ji bona gihana xwestên nefsê û rûniştina ser textên zêrîn û hevyariya gel wan şûx û şengên bihiştî û berkirina cilkên hevrîşim û îstebreq û cih girtina di wan qesr û kaxên xweş û sipehî û gihana xwestên nefsê ye. Gelo gereke eva ku hemû ji xwexwazî û bayê dil ra ne, bê nisbet dan bal Xwedê û îbadetê Heq ve? Ma gelo çi ferqa te heye gel wî palê ku ji kirhê ra kar dike, vêca dibêje ji razîkirina filan kesê ra kar kiriye û tu ewî derewîn dikî? Gelo tu ku dibêjî ez ji nêzîkbûna Xwedê ra nimêj dikim tu ne derewker î? Gelo nimêja te ji nêzîkbûna Xwedê ra ye, an ji nêzîkbûna jinên bihiştê ra? Hema ez eşkere bêjim ku ev îbadetên me hemû di nezera arif û ewliyan da ji gunehên kebîre ne. Ey reben, tu di huzûra hezretê Heq (c.c) da û di mehzera melaîketên muqerebên wî da vajiyê razîbûna wî amel dikî û îbadetê ku mîraca qurba Heq e, tu ji nefsa emmare

û şeytan ra dikî, vêca bêşermiyê digehînî wêderê ku di huzûra Xwedê û melekên wî yên muqereb da tu çendîn derew û buxtana dikî û tu minetê datînî û xwe diecibînî û tezellulê dikî û şerm jî nakî. Ev îbadetê min û te, gel gunehê gunhkaran ku dijwartirînê wê, riya ye, çi ferq heye? Çiko riya şirk e û pîsatiya wê ji ber wê ye ku te îbadet ji Xwedê ra nekiriye. Îbadetê me hemû xwerî û xalis şirk e, xulûs û îxlas di wê da nîne, belkî razîbûna Xwedê bi awayê şirîkatî jî di wê da nîne, hema tenê ji bona şehwet û îdara zik û binzik ra ye.

Ezîz! Nimêja ji xwatirê jinê ra -çi jina dinyayê an jina bihiştê- ne ji Xwedê ra ye, nimêja ku ji gihana arzûyên dinyayê an axretê ra be, pêwenda wê bi Xwedê ve nîne. Nexwe evqas delalî ji çi ra ye, çima weha bi nêrînek kêm tu li bendên Xwedê dinhêrî û evqas tu xwe nêzîkê dergahê Heq dihesibînî? Ey reben hema tu bi vê nimêja xwe ve musteheqê ezab û zincîrên heftih zira'î yî.[1] Nexwe çima tu xwe xodan heq dibînî? Û ji ber vê yekê tu ji xwe ra ezabekî hazir dikî? Tu wan amelên ku destûra te pê hatiye dan, bike û bizane ku ne ji Xwedê ra ye û bizane ku Xwedê bi rehm û kerema xwe wê te bibe bihiştê û Xwedê ji ber zeîfiya bende yên xwe bi wasita xufran, rehmet û setariyeta xwe qismek ji şirkê ji wan ra nedîtî zaniye. Bihêle bila ev perde neyê dirandin û hicaba xufrana Heq van seyyiatan ku em bi navê îbadet dikin binixumîne, Xwedê nekirî, eger sefhe wergerê û edalet bêt meydanê, wê kifş bibe ku bêhna genî ya vî îbadetê me, ne kêmtir e ji bêhna genî ya gunehê gunehkaran.

Pêşda me îşare kir bal hedîsekî ve ku «Kuleynî» yê cihê baweriyê di Kafiyê da gêraye û seneda wê gihandiye Îmam Sadiq (a.s). Li vêderê ji teberuk ra em ê hinek ji vê hedîsê bînîn.

Xwedayê Teala dibêje Dawûd (a.s): «Ey Dawûd, mizgîniyê bide gunehkaran, û sidîqan bitirsîne». Got: «Ez çawa mizgîniyê bidim

---

1- Haqqe / 30-32

wan û evan bitirsînim?». Kerem kir: «Mizgîniyê bide gunehkaran ku ez tewbê qebûl dikim û ji guneh diborim. Û sidîqan bitirsîne ku ji amelên xwe nekevin ucbê, çiko heçî bendeyê ez hesabê gel bibînim helak dibe».

Piştî ku sidîqîn di hesabê da li ber helakê bin, halhale ew ji gunehan pak in, ez û tu çi dibêjin? Ev hemû hingê ye ku amelên min û hewe ne tevlî riya ya dinyayî be, ku ji paşveder û herama ye û kêm çêdibe ku amelên me vala bin ji riya û nifaqê. Bihêle ev jî bêt gotin: Eger dîsa cih ji ucb û xwe delalkirinê ra hebe, bike; lê eger cihê şermê û serşûrî û îtirafa bi teqsîrê ye, piştî her îbadetê tu dikî bi cid ji ber wî îbadetê te kirî, ji ber wan derewên te di huzûra Heq Teala da kirî, ji ber wan tiştên te bê cihet nisbet dayîn bal Xwedê ve, îstixfar û tewbe bike. Gelo ne cîyê tewbê ye ku tu di beranberê Heq da di destpêka nimêjê da dibêjî: «Înnî weccehtu wechiye lillezî feteres semawati wel erd... Bi rastî ev e bi duristahî ve min berê xwe da wî yê ezman û erd çêkiriye; û ez ne ji muşrika me». Gelo berê dilê te li çêkerê erd û ezmana ye? Gelo tu muslim û dûrê ji şirkê yî? Gelo nimêj îbadet û mehya (jîn) û memata (mirin) te ji Xwedê ra ye? Gelo ne cihê şermê ye ku tu di nimêjê da dibêjî: Elhemdu lillah rebbil alemîn? Gelo tu hemd û pesnê hemû ji Xwedê ra dizanî, an ji bendeyan ra? Ma gelo ne derew e ku tu dibêjî: Rebbel alemîn, halhale tu rebbîniyê di vê alemê da ji hinek dî ra sabit dikî? Gelo ne cihê tewbê ye? Ma gotina: Îyyake ne'bud we iyyake neste'în, ne şerm e? Gelo tu îbadetê Xwedê dikî an îbadetê zik û binzik? Gelo tu Xwedêxazî an hûrul'eynxaz? Tu di karan da alîkariyê ji Xwedê dixwazî an tişta ne di bîra te da hema Xwedê ye? Gelo tu ku diçî ziyareta mala Xwedê meqsed û meqsûda te Xwedê ye û tu Xwedêxazî? Tu li pey eserên cemal û celala Xwedê yî? Gelo tu ji seyidê mezlûman Îmam Husêyn (a.s) ra matem û taziyê digirî û li ser û rûyê xwe didî, an ji gehana xwest û arzûyên xwe ra? Zikê te, te mecbûr dike tu meclisa ezayê danî? Gelo bayê dil te bi aliyê îbadet û nimêjê ve radikişê?

Ey bira! Hûr bibe der heqê hîlên nefs û şeytan da. Bizane ku

nahêlin tu yê belengaz xalisane omrê xwe derbas bikî û nahêlin tu vî karê xwe yê nexalis ku Xwedê bi kerema xwe qebûl kiriye, bigehînî mexsedê. Karekî dikin ku bi rêka ucb û xwe delalkirinê ve kar û amelê te pûç bikin û ev feyde jî ji kîsê te bibe. Tu ji Xwedê û razîbûna wî dûr î û tu nagehî bihişt û hûrul'eyna jî, ev ne tişteke, vêca tu dê daim di agir da ezab bibînî û di agirê qehrê da bişewitî. Te goman kiriye ku bi van amelên rizî û ser û pî şikestî û tevlî riya û sum'e û hezarûyek musîbetên dî, te heqek ser Xwedê peyda kiriye? An tu bûyî ji muhibbîn û mehbûbînan? Ey rebenê bêxeber ji halê muhibbîna! Ey bextreşê bêxeber ji dilê muhibbîna! Ey belengazê xafil ji şewata muxlisîn û ronahî ya amelê wan, te goman kiriye ku karê wa wek ya min û te ye! Tu xeyal dikî seratiya mêja hezretê Mîrê bawerdaran Îmam Alî (a.s) ji ya me, ev e ku medda «weleddallîn»ê dirêjtir dike an xwendina wî duristtir e? An secde û rukûên wî, zikr û wirdên wî pirtir in? An seratiya wî di vê da ye ku her şev sed rikat nimêj dikira? An munacata Seyyidê Sacidîn Îmam Zeynul Abidîn (a.s) wek munacata min û te ye? Gelo ew jî ji hûrul'eyn, xûx û hinara re evqas digiriya û zarî dikira? Sond bi wa bi xwe, «we înnehu le qesemun 'ezîm», eger beşer hemû pişta hev bigirin û bixwazin «la îlahe îlle llah»ek ya Mîrê bawerdaran bêjin, nikarin! Xwelî li serê min û naskirina min, ya min ji meqamê Alî (a.s) heyî! Sond bi meqamê Alî kurê Ebû Talib, eger melekên muqereb û pêxemberên hatine hinartin, xêncî ji Resûlê xatem (s.a.a) ku serokê Alî û xeyrê wî ye, eger bixwazin tekbîreka wî bêjin nikarin; halê dilê wan, xêncî ji wan bi xwe, kes nizane.

Ey ezîz! Evqas peyva Xwedê neke! Evqas de'wa huba Xwedê neke. Ey arif, ey sûfî, ey hekîm, ey mucahid, ey murtaz! Ey feqîh, ey muqedes, ey mumin, ey jarên reben, ey bextreşên li ber bayê dil ketine, ey rebenên mayîn di nav hezkirina nefsê re! Hûn hemû jar û bêçare ne; hûn hemû ji îxlas û Xwedêxaziyê gelek dûr in; evqas gomana qenc der heqê xwe da nekin, evqas xwe delal nekin. Ji dilê xwe bipirsin, bibînin kanê Xwedêxaz e an xwexwaz?

Muwehhid û yekperest e an muşrik e? Nexwe çima ucb? Evqas serxweçûna bi amel çi me'na jê ra heye? Amelê ku hemû piç, şert û mercên wê durist bin jî, ji şirk û riya û ucb û xirabên dî vala be jî, lê bihayê wê gihana xwestên zik û binzik be, çi qîmet jê ra heye ku hûn teslîmê melaîketa bikin? Eva amelan gereke hûn ji ber çava veşêrin. Ev amelên he ji kirêtî û bêmerêsiya ne, gereke mirov jê şerm bike û xef bike.

Ey Xwedê em ên jar hana xwe ji te ra tînin ji ber şeytan û nefsa emmare; tu bi xwe me ji hîle û xapandinên wa biparêze, tu bi heqê Muhemmed û Alê Muhemmed (s.a.a) kî!

## HEDÎSA ÇARÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب عن عليّ بن إبراهيم، عن محمّد بن عيسي، عن يونس، عن أبان، عن حكيم، قال: سألت أبا عبد الله، عليه السّلام، عن أدنى الإلحاد. فقال:

**«إنَّ الكِبْرَ أَدْنَاهُ.»**

Hekîm got: Min ji Îmam Sadiq (a.s) pirsî: «Kêmtirîn merteba îlhadê çi ye?». Kerem kir: «Kêmtirînê wê tekebur e».

### Şîrove:

Kibr, haletek nefsanî ye ku mirov pê wê xwe ser xelkê bilind û mezin dike û xwe ser wan ra digire. Û esera wê, ew kar in ku ji mirov çêdibin ku ji wan eseran ra tekebur dibêjin. Û ev halet tişteke xêncî ji ucbê.

Gorekî me pêşda gotî, ev sifetê pîs û rezîl ji ucbê çêdibe; çiko ucb, ji xwerazîbûn e, û kibr, xwe bilindkirin û xwe mezinkirina ser xelkê ye. Dema mirov kemalekî di xwe da dibîne, haletekê kêf, şahî û delalkirinê di mirov da peyda dibe, ji wî haletî ra ucb tê gotin û dema yên dî xweyê wê kemalê nezane, di wî da haletek dî peyda dibe, yanî haletê xwe seratir dîtin û meziniyê; vêca ji vî haletî, haletê xwe mezinkirin û bilindkirinê peyda dibe ku jê ra tekebur tê gotin. Û evên he hemû di dil û navdeyê mirov da ne, û esera wê di eşkere û rûmetiyê da ye. Eva he çi di heyeta bedenê da be, çi jî di kiryar û gotinê da be, tekebur e. Welhasil mirovê

xwebîn, xwexwaz dibe û dema xwexwazî zêde bibe ji xwe razî dibe û dema ji xwerazîbûn fûrî, xwe mezinkirin çêdibe.

Bizane ku sifetên nefsanî, çi ji aliyê kêmasî û rezîletiyê ve û çi kemal û başiyê ve, gelek tevhev in û ji ber vê yekê ji hev qetandin û cudakirina hineka ji hev, gelek zehmet e û carna ne wek yekiyek dijwar der heqê veqetandina wan, di nav zanayan da çêdibe; an welê tê ku mirov nekare bi awayekî ku xeletî neyê ser, ewan te'rîf bike. Ji ber vê, ya baştir ew e em dev ji vê berdin û biçin ser eslê mexsedê.

Vêca gereke bêt zanîn ku ji kibrê ra jî derece hene, wek derece yên ku me ji ucbê ra gotin. Û xêncî wan hinek derecên dî jî hene, lê çiko li wêderê ne muhim bûn û li vêderê muhim e, em ê jê biaxivin. Ew derece yên ku di ucbê da derbas bûn şeş derece ne:

Yek, kibra ji ber îman û baweriyên heq, ku di beranberê wê da, kibra ji ber kufr û baweriyên nedurist e.

Ya dî, kibra ji ber melekatên hêjayî û sifetên baş in, di beranberê wê da, kibra ji ber guneh û karên xirab e.

Heryek ji van çêdibe ji derecên ucbê çêbin û çêdibe sebebên dî jê ra hebin ku pê ra em ê behsê jê bikin. Lê nexasima ewa li vêderê tê melhezekirin kibra ji ber sebebên xariciye ye, wek neseb, heseb, mal, minal, mezinahî, riyaset û tiştên wereng. Bi hezkirina Xwedê em ê di çend vebira da qasê mumkin behsa xirabiyên vê rezîlê, îlac û çareserkirina wê bikin û ya em ji Xwedê dixwazin ew e tesîrê li min û xêncî min bike.

#### Vebir: Der heqê derecên kibrê da ye

Bizane, bi îtibarek dî ji kibrê ra hinek derece hene: Ya ewil kibra bi Xwedê ye, ya duwê kibra bi pêxember û weliyên Xwedê ye (s.a.a); ya sisê, kibra bi fermanên Xwedê ye, ku ev herdu jî li kibra bi Xwedê dizivirin. Ya çarê, kibra li ser bendeyên Xwedê ye, ku li bal ehlê marîfetê ew jî li kibra bi Xwedê dizivire.

Kibra bi Xwedayê Teala ku ji hemûya pîstir û ji navbertir û dereca jorî ya wê ye, di nav ehlê kufr û înkar û de'weker û îdîakerên ulûhiyetê da peyda dibe. Carna jî nimûna wê di nav ehlê diyanetê da peyda dibe ku xeberdana ji wê, ne munasib e, û eva he ji wê peyda dibe ku yê mumkin (mirov) qet heddê xwe nas nake û der heqê meqamê wacibul wucûd da nezane tam û temam e.

Kibra ser pêxember û weliyan, di zemanê pêxemberan da gelek hebû. Xwedayê Teala xeber daye ji wa yên digotan: «Enu'minu li beşereyni mislena».[1] Ew ji wan bûn ew ên gotine: «Lewla nuzzile hazel quran 'ela reculin minel qeriyeteyni 'ezîm».[2] Di destpêka Îslamê da li ber weliyên Xwedê gelek tekebur hatekirin û di vî zemanî da nimûneyek ji wê di hinek ji wa yên xwe bi Îslamê nav didin, tê dîtin.

Kibra bi fermanên Xwedê jî di nav hinek ji ehlê gunehan da tê dîtin, wek vê ku kesek neçe hecê, ji ber ku amelên wê wek lîbasê îhramê... ji xwe ra baş nezane û nimêj neke, ji ber ku halê secdê munasibê halê xwe nezane. Û carna di hinek ehlê îbadet, ilm û diyanetê da peyda dibe, wek vê ku ji ber tekebura xwe bang nade, an eger gotina heq ji yek wek xwe an yek binretir ji xwe guh lê bibe, qebûl nake. Carna gotinekî ji yek wek xwe dibihîze û gelek dijwar ewê red dike û neqenciya xweyê wê gotinê dibêje, lê eger hema wê gotinê bi xwe ji mezinek dînî an dinyayî guh lê bibe, qebûl dike. Heta çêdibe di ya ewil da ji dil qebûl neke û di ya duwê da ji dil qebûl bike jî. Ev mirov, ne li pey heqiyê ye. Tekebura wî, heqiyê dinixûmîne û xwe kêmkirina ji wî mezinî -ku ne ji ber sifetê qencê tewazu û nefs sivikiyê ye- ewî ker û kûr dike û hema ji ber vê tekeburê ye ku êdî dersekê an dersdana kitêbekî ku ji xwe ra kêm bizane, nabêje. Her weha li xwe nagire ku ji hinek kesên nav û nîşanek dinyayî neyîn an ji komek kêm ra dersê bêje û an pêşnimêjiyê ji komek kêm ra an li mizgeftek piçûk da

1- Muminûn / 47: "Ma gelo em baweriyê bi du kesên wek xwe bînin?".

2- Zuxruf / 31

bike, her çend bizane razîbûna Xwedê di wê da ye. Carna jî ev mesele ewqas hûr dibe ku mirov bi xwe nahese ku ew karê ku gel xelkê dike ji kibr û quretiyê ye, îlla ku li duristkirina nefsa xwe bigere û baş baş di hîlên wê da bifikire.

Lê vêca xwe mezinkirina li ser bendeyên Xwedê, ji hemûya xirabtir, kibra li ser alim û zanayên dînî ye; ku xirabî ya wê ji hemûya pirtir û zerera wê ji hemûyan gelektir e. Terka civat a reben û jaran, xwe pêşxistina di civatan û di rêk û muamelan da ji vê pêkê ye. Eva he di nav hemû deste û biran da ji giregiran bigire heta bi alim û muhedisan, ji dewlemendan bigire heta bi feqîr û nedaran da heye, xêncî ji wî yê Xwedê ew parastî. Û ji hev qetandina nefs sivikî û xwe şêrînkirinê û tekebur û weqarê carna pir zehmet dibe û gereke mirov hana xwe ji Xwedê ra bibe ku ewî rêrast bike. Û eger mirov bikeve fikrê ku xwe durist bike, Xwedê Teala bi rehmet û kerema xwe ya berfireh alîkariyê dike û pê ve çûna rêkê li ber mirov rehet û hêsan dike.

**Vebir: Der heqê sebebê eslî yê tekeburê da ye**

Tekeburê gelek heger û sebeb hene, lê hemû li vê dizivirin ku mirov di xwe da kemalekî xeyal dike, ku dibe sebebê çêbûna ucbê û tevlî dibe gel huba nefsê û dibe perdeyek dî ji kemalê ra û goman dike ku ew ji wî kêmtir in û eva he dibe sebebê xwe mezinkirina dilî an eşkere.

Bo nimûne, carna yek ji nav zanayên arif da peyda dibe û xwe ji ehlê îrfan û şuhûdê û eshabê dil û sabiqa husna, hesab dike û xwe ser xelkê ra digire û zanîna hekîm, feylesof, feqîh û muhedisan zanînek sersere dihesibîne û xelkên dî wek çarpiyan zane û bi çavê tehqîr û kêmiyê li hemû bendeyên Xwedê dinhêre. Û rebenî peyva fena'a fillah û beqa'a billah dibêje; halhale mearifên îlahiye, der heqê xweş dîtina tiştan û mewcûdatan diaxive. Û eger bêhna mearifên îlahî lê ketibûya, di beranberê ronakî yên cemal û celala Heq da, xwe mezin nedikira, heta ew bi xwe jî di

wextê xeberdan û amel da bervajiyê hal û haletê xwe dibêje. Û eva he ji wê pê ve nîne ku mearif û zanîn negihaye dil û qelbê wî. Jarê reben hêca negihaye meqamê îmanê, de'wa îrfanê dike û hêca behrek ji îrfanê nebiriye, ji pêkhatina wê diaxive.

Di nav hukeman da jî hinek peyda dibin ku çiko xwe xweyê burhan û zanîna heqîqetan hesab dikin û xwe ehlê yeqîna bi Xwedê, melaîketan, kitêb û pêxemberên wî zanin, bi çavê kêmiyê dinhêrin xelkê û ilm û zanînên dî, ji zanînê nahesbînin û hemû bendeyên Xwedê di ilm û îmanê da xweyê kêmasî hesab dikin û di dilê xwe da, xwe ser wan mezin dikin û di muamele û rabûn rûniştinên xwe gel wan da jî bi tekebur in, eva he di halekî da ye ku zanabûna bi meqamê rubûbî û feqra mumkin xilafê wê dixwaze û hekîm ew e ku xweyê meleka nefs sivikiyê be, ji ber ku der heqê destpêk û me'adê da zanîn heye.

Gorekî deqa Quranê, Xwedê hikmet da Loqman[1] û ji fermanên wî ji kurê xwe ra gorekî gotina Quranê, ew e ku dibêje: «Me'dê xwe ji xelkê negire û bi tekebur ser erdê ve rê ve neçe, bi rastî Xwedê hej milhejênê xwe mezinker nake».[2]

Di nav mudde'iyên îrşad û tesewuf û tehzîba navdeyî da jî carna yek peyda dibe ku tekeburê ser xelkê dike û der heqê alim û feqîh û peyrewên wan da gomanxirab e û xeberên nebaş ji hukema û zanayan ra dibêje û xêncî ji xwe, wa yên xwe sipartine Xwedê, ehlê helaketê zane û çiko destê wî bi xwe ji zanînê vala ye, ilman stiriyê rêkê dihesibîne û ehlê wê, şeytanê rêka salik dizane; halhale ewa ku di meqamê de'wa wî da ye bervajiyê wê ye. Û gereke hadî yê xelayiq û murşidê li rê winda bûyan bi xwe, ji muhlikat û mûbiqatan dûr be û ji dinyayê derbas bûbe û di cemala Heq da xerq û noqî bûbe û gereke tekeburê ser bendeyên Xwedê neke û der heqê wan da gomana xirab tunebe.

---

1- Loqman / 12

2- Loqman / 18

Di nav feqîh û zanayê şerî’et û hedîs û qutabiyên wan da jî carna kesek peyda dibe ku xelkên dî kêm zane û tekeburê ser wan dike û xwe musteheqê hemû awayên mezinkirin û qedrgirtinê dihesibîne û guhdarbûna xelkê ji xwe ra lazim zane ku ew çi bêje, gereke gotin gotina wî be, «la yus’elu ‘emma yef’elu we hum yus’elûn»[1] ji xwe ra goman dike û xêncî ji xwe û çend kesek wek xwe, ehlê bihiştê nizane û navê çi komekî ji ehlê her zanînekî be, nebaşiya wan dibêje û xêncî ji ilmê xwe ku ji wê jî bêbehr e, ilm û zanînên dî bê fikir û melheze tavêje û sebebê helaketê dihesibîne, zanayan û zanistên dî ji ber nezanîna xwe qebûl nake û wereng dide nîşan ku diyaneta wî bûye sebeb ku ewan kêm bizane û tehqîr bike; halhale zanîn û diyanet dûr in ji van exlaqan. Şerî’eta pak «peyva bê zanîn» heram kiriye û îhtirama musilmana ferz û wacib zaniye.[2] Ev rebenê bêxeber ji zanîn û diyanetê, muxalefeta emrê Xwedê û pêxember kiriye û ew kiriye di qalibê dîn da, halhale sîreta selef û xelefê zanayên mezin xêncî wê bûye.

Ev halê zanistên şer'î ne, ku gereke zanayên wê nefs sivik bin û koka tekeburê ji binî ve hilkin. Qet çi zanîn, tekeburê nayinin û gel nefs sivikiyê ne muxalif in. Em ê (di dewama behsê da) ji sebebê vê çendê ku ilmê van kesan muxalifê amelê wa ye biaxivin. Di nav zanayên zanistên dî wek: Tib û riyazî û tebî'î û her weha xweyên sen’etên ceriyan û mekanîk... da jî, tekebur gelek peyda dibe; ew xweyên zanîn ên dî hema kî be, qet bi tiştekî hesab nakin û bi çavê kêm dinhêrin ehlê wê, halhale zanîna wan qet evê yekê nake lazimê xwe.

---

1- Enbiya / 23: “Xwedê ne berpirsyar e ji ya dikê, lê ewan ji ya dikin berpirsiyar in”.

2- Îsra / 36. Her weha binhêrin Nûr / 15. Usûla Kafî jî 9 hedîs anîne. Gelek riwayet der heqê hurmeta xûn, rûmet û malê musilmana da hatine. Yek ji wan ev e: “Îhtirama pêxember û bawerdar ji mala Xwedê girîngtir e”. Wesail, c. 10, p. 422. Her weha di Kafiyê da binhêrin babetên: “Heqê bawerdar ser birayê wî”; “Kesê eziyeta musilman dike”; “Kesê pey kêmasiyên bawerdaran dikeve.”

Xêncî ji ehlê zanînê, hinek ji ehlê menasik û îbadet jî vêca tekeburê ser xelkê dikin; ewan kêm dibînin û xelkê heta bi aliman jî ehlê necatê hesab nakin. Kengê ji ilm û zanînê bêt axiftin, dibêjin: Ilmê bê amel çi feyde jê ra heye? Ya muhim kar û amel e û wî amelê ku ew bi xwe, xwe pê ve mijûl dikin gelek muhim dihesibînin û bi çavê ucb û kibrê li hemû kesî dinhêrin; halhale eger ehlê îbadetê heqîqî û bi îxlas bûna, gereke amelê wan ew durist bikiran. Nimêj ji kirêt û pîsatiyê paşda dide û mîrac û wesîla jor ve çûna mumin e, evê pêncî salan nimêj kirî û hay ji ferz û sunetan mayî tekeburê girtiye ku îlhad e, û ucbê ew girtiye ku ji fehşa û munkerê mezintir e, ew nêzîkê şeytan û exlaqê wî bûye! Nimêja ku paşvederê ji fehşa û munker nebe, dil neparêze, ji ber zêdekirina wê, dil ji dest biçe, ew ne nimêj e. Nimêja ku ji ber zehf hayjêmana wê, te nêzîkê şeytan û yên nêzîkê wî ku tekebur e, bike, ew ne nimêj e; ne ku nimêj evê dike lazimê xwe. Eva he ew kibr e ku ji ilm û amel çêdibe.

Lê vêca ewa ku ji xêncî van çêdibe, ew jî dîsa li vê yekê dizivire ku mirov di xwe da kemalekî dibîne û wê kemalê di yên dî da nabîne. Mesela: Kesek ku xweyê neseb û binemal e, carna di beranberê yê ew neyî da, tekebur dike. Û ew ê xweyê cemal û sipehîtahiyekî, kibra xwe dike ser wî yê ew neyî, an wî yê li pey wê. An ew ê xweyê eşîr û xweyê mirov, alîkar û feqî, xwe mezin digire li ser wî yê ew neyîn.

Nexwe hema bêje sebebê tekeburê hema xeyalkirina kemalekî ye û şahîbûna bi wê ye ku yên dî ji wê dûr dibîne. Heta bi xweyên kar û amelên pîs û kirêt jî, carna kubariya xwe dikin, çiko ewa ku di xwe da dibînin bi awayekî goman dikin qey kemal e!

Evê jî bizane ku carna xweyên sifetên tekeburê ji ber hinek tiştan, xwe ji eşkerekirina wê vedidin û qet ji xwe nîşan nadin, lêbelê evê dara xebîs rehên xwe di dilê wî da kirine xwarê û ji ber vê yekê dema ji halê xwe yê tebî'î dertê, peşikên wê jê dipekin. Wek vê yekê ku xezeb serî jê bistîne û di wî halî da ji mezinahî, hêjan

û heyî ya xwe biaxive -ilm an amel an tiştek dî- û bide rûyê xelkê, şanazî û fexra xwe pê bike.

Carna jî tekebura xwe eşkere dike û şol bi tiştek dî nîne û kibr û quretiya dijwar, ewî hêç dike, vêca carna tekebur di herekat û sekenat û kiryarên wî ra xuya dike, wek vê yekê ku di çûna civatan û derketinê da, xwe pêş xelkê têxe û rê nade feqîr û jaran ku bên civata wî û xwe ji civatên wan dûr dike; di rêveçûn, nêrîn, pirsiyar û cewabê da tekebura xwe li xelkê dike. Û yek ji lêkolan ku me gelek ji esasê gotinan di vê hedîsê da ji wî girtine û me'ne kirine dibêje: «Dereca nazil û kêma tekeburê di ilmê da, ew e ku mirov rûyê xwe ji xelkê bizivirîne, heçweku mirov pişta xwe dabe wan; û di abidan da, ew e ku me'dê xwe ji xelkê bigire û ehniya xwe li wan bike girê, heçweku xwe ji xelkê vede û kerbê wî ji wan be». Rebenî nizane ku teqwatî, ne di ehniyê û me'dgirtin û berzivirandinê da ye û ne di stû xwehrkirin û ser berjêrkirinê da ye, belkî teqwatî di dil da ye. Resûlê Xwedê (s.a.a) tiliya xwe bal singê xwe ve kir û got: «Teqwatî li vêderê ye».

Carna tekebur bi ziman ra xuya dike, ku xwe pak û paqij dide nîşandan û fexr û kubariya xwe li ser xelkê dike. Abid di halê fexrkirinê da dibêje: Min filan amel û kar kiriye û xelkê kêm dike û karê xwe mezin nîşan dide, carna jî rasterast nabêje, lêbelê tiştekî dibêje ku ewê me'nê dide. Û yê zana dibêje yê dî: Tu çi dizanî? Min filan kitêb çendîn û çend caran dîtiye; çendîn salan ez di nav mecami'ên ilmî û zanistî da bûme û min seyda, zanayên mezin dîtine û gelek zehmet kêşaye û gelek kitêb nivîsîne û berhev kirine... Di her hal û karî da gereke mirov ji ber nefsê û hîlên wê, hana xwe ji Xwedê ra bibe.

**Vebir: Mefsedên tekeburê**

Bizane ku ev sifetê pîs ê ne rêkûpêk, bi xwe xirabî têda hene û gelek xirabî jî jê çêdibin. Ev rezîla he mirovan dûr dike ji kemalatên eşkere û navdeyî û ji behremendî yên dinyewî û uxrewî

paşda dide, kîn û dijminiyê çêdike û mirov ji çavan têxe û ber çavê xelkê kêm dike û xelkê mecbûr dike ku beranberiyê digel wî bikin û ewî tehqîr bikin. Di hedîsa Kafiyê da ji Îmam Sadiq (a.s) neqil bûye ku kerem dike: «Her bendeyekî lixabek ser serê wî ye û serê wê di destê melaîketekî da ye, vêca dema tekebur ewî digire dibêjite xwe niviz bike, Xwedê te niviz bike. Ew daim di dilê xwe da mezintirînê xelkê ye û li bal xelkê jî piçûktirînê wa ye. Dema nefs sivik bibe, Xwedê Teala ewê lixabê ji ser serê wî radike û dibêjiyê: Mezin bibe, Xwedê te mezin û bilind bike, vêca li bal xwe piçûktirînê xelkê ye û li bal xelkê mezintirînê wa ye".

Ey ezîz! Ew mêjî û nefsa te heyî, xelkê jî heye; eger tu nefs sivik bibî, xelk wê qîmet bidin te û te mezin ragirin û eger tu tekeburê bikî, pêşketin çênabe û eger ew bikarin wê te kêm û piçûk bikin û pakiyê bi te nakin, eger nekarin jî tu dê di dilê wan da kêm û piçûk û bê qîmet bî. Tu bi nefs sivikiyê dilê xelkê vegire, dil ku hat bal te wê eserên xwe eşkere bike. Û eger dilan berê xwe ji te zivirandin, hingê eserên wê dê bervajiyê xwesta te bin. Vêca eger tu qîmet û mezinahîxaz bî jî, gereke tu bi wê rêkê ve biçî; yanî gereke tu nefs sivik bî û digel xelkê biborînî. Desthat û netîca tekeburê bervajiyê xwesta te ye. Ne hema tu netîceyek dilxwaz nagirî, belkî tu wê netîca bervajî bigirî, xêncî ji vê jî ev exlaq dibe sebebê zelîlî û kêmiya di axretê da; çawa ku te xelk di vê dinyayê da bê qîmet û kêm kirine û xwe ser serê wan mezin kiriye û kubariya xwe li wan kiriye, di axretê da sûret û şiklê wê zelîlî û şikestîbûn e.

Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatiye ku birayê «Ferqed» dibêje, min ji Îmam Sadiq (a.s) guh lê bû, digota: «Mirovên mutekebir, wek mêrûyên zeîf lê tên û heta Xwedê ji hesabê xilas dibe, ew di bin piyê xelkê da tên perçiqandin».

Di şîretên Îmam Sadiq (a.s) ji hevalên xwe ra bi vê me'nê hatiye ku dibêje: «Ji xwe mezinkirin û tekeburê bitirsin; çiko mezinahî taybetê Xwedayê ezîz û celîl e û kesên di wê da bi Xwedê ra bi-

keve nîzaê, wê Xwedê ewa têk bide û roja qiyametê ewan zelîl bike». Vêca ez nizanim eger Xwedê yekî zelîl bike wê çawa zelîl bike û çi bêt serê wî? Çiko karûbarê axretê gel dinyayê ferq dike; zelîliya axretê, ne wek zelîliya dinyayê ye, çawa ku xweşî û nîmetên wê jî ne munasibê dinyayê ne; xweşiya wê ser fikra mirov ra ye û ezabê wê ji hizra mirov der e; hêjana wê ser wê ra ye ku em fikir bikin, zelîlî û şikesta wê ne wek wan zelîlî û şikesta ye ku em didîn fikra xwe. Paşiya karê mutekebiran jî dojeh e. Di hedîsê da hatiye ku: «Merkeba tekeburê agir e». Kesê ku li merkeba agir siwar be, wê ewî bavêje di agir da û heta eserek ji vî sifetî di wî da hebe ew rûyê bihiştê nabîne. Çawa ku ji pêxember (s.a.a) hatiye gêran ku: «Kesê qas li ba xerdelê tekebur di dilê wî da hebe, naçe bihiştê». Îmam Baqir û Îmam Sadiq (a.s) jî gotinên wek vê, gotine. Di hedîsa şerîfa «Usûla Kafî» da jî ji Îmam Baqir (a.s) neqil bûye û hasilê me'na wê ev e ku: «Îzet û kibriya ji Xwedê ra ye, kesê hinek ji wê hebe wê Xwedê ewî deverû bavêje di dojehê da. Ew jî çi dojeh! Dojeha ku ji mutekebiran ra hatiye hazirkirin ne wek dojeha xelkê ye». Hema li vêderê gêrana wê hedîsa piştşikên bes e: vê hedîsê îtibarek temam heye û wek sehîhê ye: «Ibn Bukeyr» ji Îmam Sadiq (a.s) digêre ku kerem kir: «Di dojehê da gelî û dûlek heye ku jê ra dibêjin «Seqer», ew (gelî) ji ber germayê şikayeta xwe bir bal Xwedê û xwest ku nefesekî bikişîne, vêca nefesek kişand ku dojeh ji ber wê şewitî». Ez hana xwe ji Xwedê ra dibim ji ber wê, ku cihê ezab e û ji ber germayê şikayet bike û dojeh ji ber nefes kişandina wê bişewite.

Em nikarin di vê dinyayê da bi dijwariya germî ya agirê axretê bihesin, çiko sebebên îxtilafa dijwarî û kêmî ya ezab, yek jê kêmî ya îdrakê ye; çiqas ku mudrik qewîtir û mîdrak tamtir be, pirtir bi derd û êşê dihese.

Yek jî îxtilafa wan mewada ye ku his di qebûla germiyê da xwe bi wê ragirtiye. Çiko mewad di qebûla germayê da muxtelif in. Ji bo nimûne: Zêr û hêsin ji lehîm û risas pirtir germayê di xwe da digirin û lehîm û risas jî ji dar û rejiyê pirtir germ dibin û ew jî ji

goşt û çerm pirtir germayê di xwe da digirin.

Yek dî, dijwarî ya pêwenda quwe ya îdrakê ye bi cihê qabil ve. Mesela: Mêjiyê serê mirov her çend kêmtir ji hestiyan germayê di xwe da digire, lê dîsa jî eser lê bûna wê pirtir e; çiko hêza îdrakê di wê da pirtir e.

Yek dî, neqs û kemala germayê bi xwe ye. Eger germa sed derece be, ji pêncî derecê pirtir diêşîne.

Yek dî, îxtilafa madda faîle ya germayê ye di madda qabile ya wê da. Mesela eger agir bi dest ve be an nêzîkê dest be, di şewitandinê da ferq dike.

Ev her pênc sebeb ku hatin gotin di vê alemê da gelek kêm û naqis in û di wê alemê da di kemala quwet û temamiyetê da ne. Îdrakatên me hemû di vê alemê da kêm û naqis û perdekirî ne, bi gelek perdan ku, jê axiftina wê, xeberdanê dirêj dike û ne munasibê vêderê ne.

Îro çavê me, melaîket, bihişt û dojehê nabîne, guhê me dengê ecêbê berzex, berzexiyan, qiyamet û ehlê wê guh lê nabe û hisa me bi germaya wê nahese -ev ji ber wê kêmasiyê ye ku di van da heye. Der heqê vê çendê da hem gelek ayet û riwayet hene hem jî di cihê xwe da hatiye ku gel burhan û delîlê rêk ketî ye. Lê bedena mirov di vê alemê da qabiliyeta şewatê nîne, eger saetekî di nav vî agirê sarê dinyayê da bişewite, wê bibe xwelî, lê Xwedayê Qadir evê bedenê di qiyametê da welê lê dike ku ji heruher ra di agirê dojehê da dimîne, nahele û xilas nabe -ew jî ew agirê ku ser gotina Cebraîlê Emîn eger helqeyek ji zincîra wê ya hefte zira'î ya ehlê dojehê bînin ser vê dinyayê, wê çiya hemû ji ber germa wê bihelin.(1) Nexwe qabiliyeta bedena mirov jî di qiyametê da gel vê alemê nayê qiyas kirin.

Pêwend û girêdana nefsê jî gel bedenê di vê alemê da gelek zeîf û

1- Tefsîra Burhan, sûretê Haqqe, ayeta 32-ê.

lawaz e, di vê alemê da nefs bi xwe bi xwe eşkere nabe û naxweyhê; lê ew alem, alema eşkere û zahirbûnê ye û nisbeta nefs û bedenê, nisbeta failiyet û xaliqiyetê ye, çawa ku di cihê xwe da sabit bûye.[1] Û ev nisbet, nisbeta tam ya nisbet û girêdan û pêwenda ye.

Agirê vê alemê jî agirek kêmcan û sar e û tevlî tiştên ne xalis in, lê agirê dojehê xalis û xwerî ye; cewherek serbixwe, sax û xweyê îrade ye ku bi zanîn ehlê xwe dişewitîne û çiqas ku emrê wê hatibe kirin, tengiyê ji ehlê xwe ra çêdike. Te der heqê wê da gotina sadiqê musediq, Cebraîlê Emîn guh lê bû û der heqê wesfê wê da Quran û exbarên enbiya tijî ne.

Pêwenda agirê dojehê û pê ve girhana wê bi bedenê ve jî di vê alemê da wêneyek jê ra nîne. Agirê vê alemê hemû eger bedenê ber xwe bigirin, ji eşkereyê bedenê pê ve ber xwe nagirin, lê agirê dojehê bi awayekî eşkere, navde û pê vegirêdayên wan ber xwe digire. Ew, ew agir e ku dil, ruh, hêz û quwan dişewitîne û gel wan dibe yek û bi wan ve digire, ku di vê alemê da nezîr û wêne jê ra nîne.

Nexwe kifş bû ku di vê alemê da sebebên ezab ne hazir in; ne mewadên vêderê layiqê qebûl, ne faîlê germiyê tammul failiyet û ne jî îdrak temam e. Agirê ku cehennem ji ber nefesa wê bişewite, em nikarin pê bihesin kanê çi ye û em nikarin îdrak bikin, îlla ku Xwedê nekirî, em bibin ji mutekebiran û hêca me ev exlaqê pîs durist nekirî, em ji vê dinyayê biçin û em ewê bibînin.[2]

**Vebir: Der heqê hinek ji sebebên tekeburê da ye**

Bizane ku ji sebebên tekeburê, yek jê kêmî ya mêjî û lawazî ya qabiliyet û kêmasî ya di hewselê da ye, bi kurtî em dikarin bêjin

---

1- Esfar Erbe'e, c. 8, p. 137, 143, 154, 155

2- Nehl/29: "Di deriyên cehnemê da dakevin û têda bimînin, vêca çi pîs e cihê xwemezinkeran".

ji ber piçûkiya dil e ku dema hema kemalekî di xwe da dibîne û ji xwe ra bi seratiyekî dihese, goman dike ku xweyê derece û mertebeyekî ye, halhale eger bi însaf berê xwe bide wê zanîna ku di tiştekî da heyî, an wê kemala ku di xwe da dibîne, dê fêhm bike ku ew tişta ku goman kirî kemal e û, bi wê fexr û tekebur kirî, an ji xwe ne kemal bûye û eger kemal be jî li beranberê kemalên xelkê da ne tiştek e. Rebenî hîla xwe li xwe kiriye: «Îstesmene za werem» (Yê werimiyî qelew hesibandiye. Feraidul Ereb). Mesela arifê ku ji ber îrfana xwe bi çavê heqaret û kêmiyê li xelkê dinhêre û tekeburê dike, gelo ewî xêncî ji hinek mefhûman ku hemû perde ne, ji mearifên îlahiye çi hene? Ew mearif gelek ji Xwedênasî û ilmê bi esma û ewsafan dûr in. Mearif sifetê dil in. Û gorekî fêhma nivîser, ev zanistên he amelî ne, ne ku tenê zanîna hinek mefhûm û çêkirina îstilahan. Me di vî omrê kurt da û agahî ya kêm di nav van arifên îstilahî û di nav zanayên zanistên dî da hinek kes dîtin ku ez bi îrfan û ilmê sond dixwum, evan îstilahan di dilê wan da eser nekiriye û belkî esera bervajî hebûye!

Ey ezîz! Ser gotina te, îrfana billah dil dike cihê ronahî ya esma, sifetan û cihê sultanê heqîqî ku eseran mehw dike û rengrengiyê ji nav dibe û te'eyyunata jê dibe.(1)

Dil dike ehedî û ehmedî, nexwe çima dilê te di cemala xwe da noqî nekiriye! Telwîn û rengrengî û te'eyyunat zêde kirine! Tu ji Heq Teala û teceliyatên esmaî yên wî bêxeber kirî, dilê te kiriye cihê sekina şeytan û bendeyên xalis ên dergahê Heq li ber çavê te kêm kirine! Ne xwezika halê te yê arif, ku halê te ji yê her kesî xirabtir û delîl ser te temamtir e. Tu tekeburê ser Xwedê dikî!

Ey ew ê li pey mefhûman! Ey ew ê heqîqet winda kirine! Hinekî bifikire, bibîne te ji mearifan çi heye? Ji Xwedê Teala û sifetên wî da tu çi eserê di xwe da dibînî? Zanista muzîk û îqa'ê belkî

---

1- Neml/34: Gotina Bilqîsê ye: "Bi rastî dema paşa dikevin di welata da, ewa xirab dikin û ezîzên wê zelîl dikin".

ji ilmê te deqîqtir be? Heyet, mekanîk û zanistên tebî'î yên dî û riyazî di îstilah û diqetê da wek zanista te ye, wek çawa ew îrfana billah nayinin, zanista te jî heta ku bi perda îstilah û mefahîm û îtibaratan perdekirî ye ji wê, ne kêfiyetek tê dest û ne jî hal. Belkî jî di şerî'etê da zanistên tebî'î û riyazî ji zanista te baştir e, çiko ew desthat û netîca xwe dide, lê ya te bê netîce ye an netîceyek bervajî dide! Muhendis netîca hendesê û zêrker netîca sen'etê xwe dibe, lê tu ji desthata dinyayî paşde mayî û negihayî netîca mearifan jî, em dikarin vê jî bêjin ku perda te hêj stûrtir e. Dema xeberdana ehediyetê tê pêş, hûn tarîtiyek bê binî didin fikra xwe, dema ji hezretê esma û sifetan hûn gotinekî guh lê dibin kesretek la yetenahî (zêdahiyekî bê binî) dikeve hizrê hewe! Nexwe eve bi van îstilahan hewe nekarî hûn bigehên heqîqet û mearifan, mearifên ku tarîtiya dil zêde bikin ew ne mearif in. Ne xwezika wan mearifan ku dûmahîka wan ew bê xweyê xwe bikin mîratberê şeytan; kibr ji exlaqê dorûberiyên şeytan e. Ewî quretî ser bavê te Adem kir û ji dergeh hat avêtin, nexwe tu jî ku kibr û quretiya xwe dikî ser xelkê, tu jî metrûd û avêtî yî, ji vê yekê halê zanistên dî bizane. Hekîm, eger hekîm be û nisbeta Xwedê gel mexlûq û ya xwe gel Xwedê fêhm kiribe, wê xwe mezinkirin ji dilê wî derkeve û durist bibe. Lê rebenê xweyê wan mefahîm û îstilahan goman kiriye ku hikmet ev in û hekîmetî pê va ye. Carna sifetên Xwedê ji xwe ra datîne û dibêje: «Hekîm» ji sifetên Xwedê ye. Carna jî xwe di nav koma pêxemberan da dihesibîne: «Yu'ellimuhumel kitabe wel hikmete», tîlawet dike û dilê wî ne agah e ji hikmetê û gelek ji başî û hikmetê dûr e.

Hekîmê Xwedayî û feylesofê mezin ê Îslamê cenabê «Muheqiqê Damad»[1] (r.a) dibêje: «Hekîm, ew e ku beden ji wî ra wek cilik

---

1- Mîr Muhemmed Baqir, meşhûr bûyî bi nasnavê Mîrdamad (-1041 h,) li Îsfehanê hatiye dinyayê û qebrê wî li Necefê ye. Ew seydayê Molla Sedra û di hella hinek muşkilên fiqhî û hedîsî da bê emsal bûye. Qebesat, Teqdîsat, Sidretul Munteha, haşiya Men la Yehzurhul Feqîh, ji nivîsên wî ne.

t.me/caferilikcom

https://t.me/caferilikcom

www.caferilik.com

û lîbas be ku kengê bixwaze ewê berde». Ew çi dibêje û em çi dibêjin! Ewî ji hikmetê çi fêhm kiriye û me çi jê fêhm kiriye! Nexwe kifş bû eva he ku tu ji ber çend mefhûm û hinek îstilahan, xwe ser xelkê mezin dikî û fexra xwe dikî, ev ji ber dilê piçûk û kêm hewseleyî û kêm qabiliyetê ye.

Ew rebenê ku xwe rênimûn û rê rastkerê xelkê dihesibîne û ketiye cihê destgirî û tesewufê da, halê wî ji van herduka xirabtir e. Îstilahên van du koman diziye û meta'ê xwe xemilandiye û dilê bendeyên Xwedê ji heq zivirandiye û daye xwe û gomana wî rebenê saf û sade der heqê aliman û xelkê da xirab kiriye û ji germkirina bazara xwe ra bi zanîn û nezanîn hinek îstilahên xweş kirine di mêjiyê reben û jaran da û goman kiriye bi gotina: «Meczûb Alîşah»  an «Mehbûb Alîşah» wê bigehê hub û cezebê! Ey peyketê dinyayê û dizê mefhûman! Ev karê te jî, ewqas ne cihê tekebur û fexrê ye.

Jarê reben, carna ji ber dil û ser piçûkî tê xapandin û xwe, xweyê meqam û mertebe zane. Huba nefs û dinyayê tevlî mefhûmên hatine dizîn û îzafat û îtibaratan dibe û tiştek ne rêkûpêk jê derdikeve û ji kombûna wan hevîrek ecîb û xerîb pêk tê! Û xwe digel van hemû eyb û kêmasiyan murşidê xelayiq û rê rastkerê necatderê umetê û xweyê sirra şerî'etê zane û carna bêşermiyê digehîne axer û xwe, xweyê wîlayeta kulliye dihesibîne! Ev jî ji ber kêm qabiliyetî û tengî ya sing û dil e.

Tu yê li pey fiqih û hedîs û zanistên dî yên şer'î, di merteba zanistê da xêncî ji hinek îstilahên ku di usûl û hedîsê da bi kar hatine nizanî. Eger ev zanist ku hemû bi amel ve girêdayî ne, tiştek li te zêde nekiribe û tu durist nekiribe û şûna wê da tu pîs exlaq û pîs amel kiribe, halê te ji zanayên zanistên dî û belkî ji hemû xelkên dî xirabtir e. Ev mefahîmên ereziye û me'nên herfiye û munaqişeyên bê feyde ku gelek ji wan qet girêdan bi dînê Xwedê ve nîne û ji ilm û zanistan jî hesab nabin ku, vêca tu bêjî fêkiyê ilmî jê ra heye, evqas tekebur û şahî têda nîne. Xwedê şahid e û

Ew ji şahidiyê ra bes e, eger netîce û desthata ilm û zanistê hema ev be û te hîdayet neke û xirabiyên exlaqî û ilmî ji te nebe pîstirînê kara ji wê baştir e; çiko ew zûka netîce didin û mefasidên dinyewî û uxrewî yê wê kêmtir in û tu yê reben xêncî ji ozr û webalê tiştekî dest xwe naxî û ji bilî mefasidên exlaqî û amelên ne rêkûpêk tu hasilekî hilnayinî. Nexwe zanîna te jî, ji nezer îtibara ilmî ve ne cihê tekeburê ye. Lê çiko fikra te kurt e, tu bi tevhev kirina çend îstilahekî xwe alim û zana dibînî û xelkê cahil û nezan dihesibînî û perên melaîketên muqereb bin piyê xwe da pehn dikî û cihê xelkê di civatan da û rêkê li ber evdên Xwedê teng dikî, û tu zanist û zanayên wî ji nav dibî û tu kêmasiyê ji hevcinsê xwe ra çêdikî.

Ji van hemûyan bê qîmetir û kêmtir, keseke ku vêca bi mal û zarok, heyî û qebîlê tekeburê bike. Rebenê jar, ji hemû exlaq û adabên însanî dûr e û vala ye ji hemû zanist û mearifan; lê çiko cilê wî ji hiriya pez e û bavê wî filan kes e, xwe ser xelkê ra digire! Çiqas fikrek piçûk û dilek teng û tarî heye ku ji nav kemalatan, bi lîbasê sipehî û ji nav hemû rindî û sipehîtahiyan bi şaşik û qeban xwe têr dike! Rebenî bi meqamê heywanî behreyek heywanî biriye û ji nav hemû meqamên însanî qenaet kiriye bi sûretek valayê ji mêjî û şiklê valayê ji heqîqetê û digel vê jî, xwe xweyê mertebe û meqam dihesibîne. Ewqas kêm û ne layiq e ku eger kesek bi mertebeyek dinyayî ser wî ra be, wisa muamlê gel wî dike heçweku xulam ketî beranberê mezinê xwe da. Helbet kesê ku xemek xêncî ji dinyayê nebe ebdê dinyayê û ehlê wê ye û zelîl e bal wa yên me'bûdên wan bal wan.

Di herhal û karî da yek ji sebebên bihêzên tekeburê, piçûkî ya ufuqa fikrî û kêmasî ya qabiliyetê ye, ji ber vê tiştên ku ne kemal in an ne kemala layiq e, eserek dijwar di wî da datîne û ewî bi aliyê ucb û tekeburê ve dibe û çiqas huba nefs û dinyayê di wî da pirtir be, evên he di wî da kartêkertir in.

**Vebir: Der heqê dermanê tekeburê da ye**

Niha ku te mefsedên kibrê zanî, li derman kirina wê bigere, bixebite ku tu dil, pak bikî ji van reşatiyan û tozê ji ayna dil bibî. Eger tu qewînefs û dilfireh î û hezkirina dinyayê û xemla wê di dilê te da cih negirtiye, hema vebira derbas bûyî baştirîn rêka dermankirina ilmî ye. Û eger tu ne di vê mertebê da yî, hinekî der heqê xwe da fikir bike; belkî; belkî, hişyarî ji dilê te ra çêbe. Ey mirovê ku tu ji ewil ve ne tiştek bûyî, ma tiştek ji nebûnê kêmtir heye? Vêca piştî ku îradeya Heq Teala ser wê sekinî ku tu hebî, ji ber ku tu kêm û kêm qabiliyet bûyî û te ne dikariya tu feyzê bigirî, tu ji heyûla alemê ku ji lawaziyê pê ve ne tiştek dî bû, tu anî ser şiklê cismiye û unsuriye ku exesê mewcûdata û kêmtirînê kaînata ye. Piştî wê tu kirî dilopek menî, ku eger destê te lê bikeve her çend bi zehmet be jî tu dê xwe ji wê paqij bikî, di pey ra tu danî di ciyek teng û tarî da, ku hêlkê bav e. Û ji cihê mîz ve di halek bêmerês tu danî di rehma dayikê da û tu danî di ciyekî da ku tu ji bîranîna wê dikirhênî. Û li wêderê tu xistî ser şiklê eleqe û muzxê û bi xwarinekî tu mezin kirî ku tu ji bihîstina wê dibizdî û gereke tu şerm bikî; lê çiko hemû pêkve bi vê pêkê ne, şerm ji halê rabûye, çiko dema bela hemûyanî û giştî dibe, xweş dibe. Tu di van hemû hal û guherînan da ji rezîltirîn û zelîltirînê mewcûdan bûyî. Ji hemû îdrakên eşkere û navdeyî bêbehr bûyî û dûr bûyî ji hemû kemalatan. Vêca piştî ku Xwedê ji rehmet û kerema xwe tu kirî layiqê heyat û jiyanê, jiyan wisa kêm di te da eşkere bû, ji ber ku nuqsana qabiliyetê, tu ji kurmekî jî kêmtir bû, bi rehmeta xwe kêm kêm jiyan û tiştên bi jiyanê ve girêdayî di te da zêde kir, heta tu bi kêr hatî ku bêyî ser erdê. Ji bê qîmetirîn rêkê ve û di bê qîmetirîn hala da tu anî vêderê, ew jî di halekî da ku di hemû halên xwe da tu lawaztir bûyî ji têjikên hemû heywanata. Vêca piştî ku bi qudreta temam ya xwe quwet û hêzên eşkere û navdeyî dan te, dîsa jî tu ewqas zeîf û lawaz û kêm î ku qet tu hêz û quwetên te, ne di îxtiyara te da ne; tu nikarî selametiya xwe biparêzî, tu nikarî hêz û jiyana xwe xweyî kî û bihêlî, tu nikarî

cemal û ciwaniya xwe biparêzî, eger afet an nexweşiyek ser te da bêt, tu nikarî berevaniyê ji xwe bikî. Kurtê gotinê ev e ku çi yek ji lazimiyên jiyanê, ne di destê te da ne. Eger rojekî tu birçî bibî tu dê hazir bibî ji xwarina goştê her mirarekî ra û eger tu têhn bibî û têhnîşkê tu girtî, tu wê razî bibî bi vexwarina her avek bêhno û genî. Her weha di hemû tiştî da tu koleyek zelîl û rezîl î ku qet tiştek ji te nayê. Û eger tu behra xwe ji kemalatan qiyas bikî gel mewcûdên dî, tu dê bibînî ku tu û erdê girover û belkî ziviroka rojî pêkve di beranberê alema cismanî da ku kêmtirînê alema ye, qet tiştek ne hesab e.

Ezîzê min, te ji xwe pê ve tiştek nedît û ewa te dît jî te bi çavê îtibar û li berhev girtinê nedît. xwe û hemû jiyana xwe qiyas bike gel bajarê xwe û bajarê xwe digel welatê xwe û ew ê digel welatên dî û welatan digel erdê û erdê gel ziviroka rojî û kurratên dî yên berfireh ku ji wê ne û ziviroka rojî pêkve ku ji fikra min û te der e, gel ziviriokên dî ku roja me digel hemû pê ve girêdayên xwe, yek ji zivirokên yek ji wa ye... Evên he hemû ji alema cismanî ne, ku hema xaliqê wan tenê pê zane û keşfa kaşifan ji kêmekî pê ve nîşan nedane. Û alema ecsaman pêkve di beranberê alema mawerayê tebîet da qet ne tişteke û li wêderê ew alem hene ku di fikra beşerî da cih nagire. Eva he jiyan û behra min û te ye ji vê alema wucûdê. Û piştî ku îrada Heq Teala ser wê sekinî ku te ji vê dinyayê bibe, wê destûrê bide hemû quwa û hêzên te ku berew kêmasî biçin û wê fermanê bide hemû îdrakên te ku ji kar bikevin û wê karxana wucûda te ji kar bixe, wê bihîstin, dîtin, quwet û hêza te bigire û tu dê bibî bê canek ku piştî çend rojekî xelk ji ber bêhna te ya genî bikevin tengî û xelk ji ber şiklê te bibizdin û birevin, hemû piç û endamên te piştî demekî ji hev belav bibin. Ev halê cism û bedena te ye, halê mal, minal û zarok... ji xwe kifş û ronahî ye.

Lê vêca eger te xwe durist nekiribe û tu biçî, halê te yê berzexê jî, Xwedê zane kanê bi çi şikl û hal e. Ehlê vê alemê nikarin ewê bibînin û bibihîzin û bêhn bikin. Der heqê tarîtî, bizdan û tengî

ya qebrê da, tu çi guh lê bibî tu gel tarîtî, bizdan û tengiyên vê alemê qiyas dikî, halhale qiyasek pûç e. Der heqê wê ya me bi bijartina xwe, ji xwe ra bijartî, em hana xwe ji Xwedê ra dibin. ezabê qebrê ku nimûneyeke ji ezabê axretê û gorekî hinek riwayetan şefaet jî li wêderê nîne, hema Xwedê zane çi ezab e! Halê me yê axretê ji hemû halên me yên pêşda xirabtir e û pirtir cihê bizdanê ye; roja derketina heqîqeta ye, roja eşkerebûna xefa ye, roja tecesuma amel û exlaqa ye, roja hesab û kitaba ye, roja zelîlî ya di sekingehan da ye, ev jî halê qiyametê.

Lê vêca halê dojehê, ku piştî qiyametê ye, ew jî kifş e. Tu ji dojehê guh lê dibî! ezabê dojehê, ne hema agirê wê ye, wê dergehek bizdêner ji wê, ber çavê te vebe, ku eger li vê alemê vebe, wê xelk hemû ji tirsan bimirin û ji nav biçin; her weha wê deriyek yê wê li guhê te vebe û yek wê li difin û pozê te vebe, ku heryek ji wan eger li ehlê vê alemê vebe, wê ji ber ezabê wê li helakê biçin. Yek ji zanayên axretî dibêje, çawa ku germiya dojehê dijwar e, serma wê jî dijwar e. Xwedê kara ye ji wê çendê ra ku, germa û sermayê li hev kom bike. Ev jî halê axretê.

Nexwe kesê ku destpêka wî ‘edema xeyrê mutenahî ye û dema dikeve di alema wucûdê da jî, hemû guherînên wî bêmerês û kirêt e û hemû halên ku serda tên, cihê şermê ye û dinya, berzex û axreta wî, heryek ji ya dî xirabtir e; gelo bi çi tiştî tekeburê dike? Bi çi kemal û cemalê fexra xwe dike?

Nexwe ev derket meydanê ku tekebur, hema ji cehl û nezaniyê ye, kesê nezaniya wî pirtir be û aqilê wî kêmtir be, tekebura wî pirtir e. Û kesê zanatir be û dil firehtir be, nefs sivikiya wî pirtir e. Resûlê Xwedê (s.a.a) ku ilm û zanîna wî ji wehya îlahî hatibû girtin, ruhê wî ewqas mezin bû ku, bi tenêkî ser ruhiyatên milyon milyon kesan ket -hemû adetên cahilî û dînên pûç binpîkirin û kitêb nesxkirin û bû xatemê pêxemberan û bi îzna Xwedê bû sultanê dinya, axretê û kartêker di hemû aleman da- nefs sivikiya wî gel ebdên Xwedê ji ya hemû kesî pirtir bû. Lê nexweş bû ku, ji

qedrgirtinê ra sehabe ji ber ve rabin. Dema biçûya civatê, li aliyê binî rûdinişta. Ser erdê nan dixwara û ser erdê rûdinişta û digota: «Ez ebdek im, wek ebdan dixwum û wek ebdan rûdinêm». Ji Îmam Sadiq (a.s) neqil bûye ku: Pêxemberê Xwedê (s.a.a) hez dikira li kerê bêkurtan siwar bibe û di cihek bê qîmet da gel ebdên Xwedê nan bixwe û bi herdu destê xwe dane gel feqîran bike. Ew giranqedr, li kerê siwar dibûya û kûlê xwe an hinek dî li ber xwe siwar dikira.

Di sîreta wî hezretî da hatiye ku di karûbarê malê da alîkariya maliyan dikira û, bi destê xwe yê mubarek pez didota, cil û sola xwe didirûta û gel xizmetkarê xwe destar ba dida û hevîr dikira û behra xwe dibira û gel feqîr û jaran civat digirta û xwarin dixwara. Ev û tiştên wek van, sîreta wî giranqedrî ye û nefs sivikya wî. Halhale xêncî ji meqamat û mertebên me'newî yên wî, riyaset û padişahiya wî ya eşkere jî di dereca tam û kemal da bû. Her weha Alî bin Ebû Talib (a.s) ew ji xwe ra kiriye serpêş û muqteda û rêka Resûlê Xwedê daye ber xwe û bi wê rêkê ve çûye. Nexwe ey ezîz, eger tekebur bi kemala me'newî ye, ewan ji hemûya pirtir ew kemal hebûye, û eger bi padişahî û reîsetiyê ye, dîsa ewan hebûye; lê di vî halî da jî nefs sivikiya wan ji ya her kesî pirtir bûye. Nexwe bizane ku nefs sivikî jêderê ilm û zanînê ye, û kibr û hêçî, jêderê cehl û nezaniyê ye. Evê şerma nezaniyê û 'ara kêmfikriyê ji xwe dûr bike û sifetên pêxemberan di xwe da çêke û sifetên şeytan ji xwe bavêje û di rizayê kibriyaiyê Xwedê da, gel wî nekeve xirecir û berberekaniyê; çiko kesê gel Heq bikeve xirecirê, wê xezeba wî ewî bin bixe û wê serserkî bikeve di agir da.

Eger tu li duristkirina nefsê bigerî, rêka wê ya amelî jî, bi piçek hay jê manê rehet û hêsan e. Û di vê rêkê da, eger tu bi mêranî û azadfikrî biçî, çi xeter ji te ra nayên pêş. Rêka serketina ser nefsa emmare û şeytan, rêka xilasiyê, hema tenê ev e ku tu bervajiyê fikra wan amel bikî. Ji serkutkirina nefsê ra çi rêk ji vê baştir nîne ku, tu xwe wek nefs sivikan lê bikî û gorekî rêk û sîreta wan bi'e-

milî. Tu di kîj merteba kibrê da bî û xweyê kîjan çiqê ilmî û amelî bî, qasekî bervajiyê xwesta nefsê amel bike û tenbîhatên ilmî bîne bîr û di netîca dinyayî û axretî ya wê da bifikire, hêvî ew e rêk rehet û hêsan bibe û tu netîceyek baş bigirî. Eger nefsê ji te xwest ku li serê civatê rûnêyî û pêş yên wek xwe bikevî, tu bervajiyê xwesta wê bike. Eger xwe paşda dide ji civata gel feqîr û jaran, tu pozê wê bi axê ve bîne û gel wan civat bigire û xwarinê bi xwe û bibe hevsefer û bileyize. Weheye nefs, gel te bikeve xeberdanê û bêje: Te meqam û mertebe heye û lazim e tu ji parastina şerî'etê ra hay ji meqam û merteba xwe hebî, rûniştina te ya gel feqîr û jaran wê te ji dilê xelkê bixe û leyiztina gel wa yên bin xwe ra, te bê qîmet dike û bi rûniştina binê civatê, merteba te tê xwarê û vêca hingê êdî tu nikarî wezîfe û berpirsiyarî ya xwe ya şer'î pêk bînî; bizane ev hemû davên şeytan û hîlên nefsê ne. Meqam û merteba Resûlê Xwedê (s.a.a) di dinyayê da ji nezer serokatî û riyasetê ve, ji ya te pirtir bû û rêk û sîreta wî, ew bû ku te dît. Min bi xwe di nav alimên zemanê xwe da ew kes dîtine ku riyaseta tamme ya memleketekî û serokatiya şiîyan hebûne, ku tam gorekî sîreta Resûlê Xwedê amel dikirin. Cenabê seydayê hêjayî feqîhê giranqedr «Hac Şêx Abdulkerîmê Hairî yê Yezdî»[1] ku ji sala 1340 heta 1355 riyaseta tamme û merceiyeta şiîyan bi hêviyê ve bû, me hemûyan dît ku sîreta wî çawa bû; gel xulamê xwe bi sefer diçûya û xwarin dixwara, ser erdê rûdiniştа, gel feqiyên piçûk yarî dikira û dileyizita. Vê paşiyê ra ku nexweş bû, piştî mexrêbê, bê cilkê ser ve, kefiyek li dora serê xwe dipêça û diçûya digerha û di dilan da pirtir cih digirta û leke nedihata ser meqam

---

1- Ayetullah Hairî ( 1276 - 1355 h q) ji feqîh û merce'ên peyrewên Ehlê Beytê ye. Di destpêkê da çû Necef û Samirrayê û li bal seydayên giranqedr: Mîrzayê Şîrazî û Axondê Xorasanî û Seyyid Kazimê Yezdî û Seyyidê Fişarekî ders xwend. Di sala 1332 yê h.q zivirî hat Erakê û li sala 1340-ê da hat Qumê û ewder kir cihê sekina xwe û binêşe û binyata hewzeya ilmiyye ya Qumê danî. Ewî feqiyên bi nav û deng gihandin, ku yek ji wan Îmam Xumêynî ye. Kitêbên jêrî ji nivîsên wî ne: Durerul Fewaid, es-Selat, en-Nikah...

û merteba wî. Xêncî ji wî merhûmî jî, gelek ji alimên giranqedrê bajarê «Qum»ê hebûn ku dûr bûn ji van qeyd û bendên ku şeytan ji hewe ra çêdike. Ewa bi xwe tiştûmişt dikiriyan û ji avenbaran ji mala xwe ra av dianîna û di mal da dişixulîna, pêşketin û paşda çûn û ser û binê civatan ji wan ra wek hev bû, ewqas nefs sivik bûn ku, mirov di amêniya ecêbmayî û di wî halî da jî mertebe û meqamê wan parastî bû û di dilê xelkê da cih girtibûn.

Welhasil, sifetê pêxemberê giraneqedr (s.a.a) û Alîyê kurê Ebû Talib (a.s) mirovan piçûk nakin. Lê gereke dema te muxalefeta nefsê kir, tu hay ji hîlên wê hebî, çiko carna dava xwe vedide û ji aliyek dî ve te li erdê dide; mesela tu dibînî hinek li xwarê civatê rûdinên û bi vî karî dixwazin bêjin ku meqamê me bilindtirê ji vê ye, lê em nefs sivik in! An tu dibînî dema kesek ku ne kifş e ku ser wî ra ye, pêş xwe bixe; kesek dî ku kifş e ji wî kêmtir e, pêş xwe têxe; da me'lûm bike ewê dî jî ne ser wî ra bû û pêşxistina wî ji ber nefs sivikî û tewazu'ê bû! Ev û bi sedan tiştên wek vê, ji hîle û xapînokên şeytan in, ku kibr û riya û durûyî jî, ser ve zêde dike.

Gereke bi niyetek xalis mirov bikeve mucahide û xebatê, hingê nefs durist dibe. Hemû sifetên nefsanî çêdibe ku durist bibin, lêbelê di despêkê da hinekî zehmetî jê ra heye; lê piştî destpêkirina duristkirinê, rehet û hêsan dibe. Ya muhim ew e mirov bikeve di fikra çêkirin û duristkirinê da û ji xew hişyar bibe. Menzila yekê ya însaniyetê «yeqze» ye û ew, hişyarbûna ji xewa xefletê ye û rabûna ji serxweşiya tebîetê ye û ev e ku mirov fêhm bike ku, rêwîngî ye û ji her rêwîngî ra zad û merkeb lazim e. Zad û merkeba mirov, xesletên mirov in. Merkeba vê sefera bi tirs û xeter, vê rêka tarî, zirav û sirata tûjtir ji şûr û ziravtir ji mû, himeta mêrane ye. Ronahiya vê rêka tarî, îman û xesletên hêjayî ne. Eger pelîşokî û sistiyê bike, nikare ji vê rêkê derbas bibe û wê deverû bikeve nav agir da û zelîl bibe. Û kesê nekaribe ji vê rêkê derbas bibe, nikare ji sirat û rêka axretê jî derbas bibe.

Ey ezîz! Himet bike û perda cehl û nezaniyê bidirîne û xwe ji vê

mehlekê xilas bike. Hezretê mewlayê muteqiyan Alî (a.s) salikê vê rêkê û rênimûnê heqîqî, di mizgeftê da dikira hewar; bi awayekî ku cîranên mizgeftê guh lê dibûna: «Tecehhezû rehimekumullah feqed nûdiye fîkum birrehîl– Rehmel baba, hazir bibin; çiko bi rastî gaziya barkirinê bilind bûye»(1) çi tişt xêncî xwe hazirkirin ji kemalatên nefsanî ra û teqwatiya dil û karên qenc û sefaya batin û bê eyb bûnê pê ve feydê nagihîne hewe.

Fereza ku, tu ehlê îmana naqis û sûrî bî, gereke tu ji van ne xalisiyan pak bibî, heta tu bikevî nav koma bextewer û qencan da. Rakirina nexalisiyan bi agirê tewbe û poşmaniyê çêdibe, pê wê çêdibe ku tu nefsê, bi îtab û loman bihelînî û poşman bikî û berê wê bidî Xwedê. Tu bi xwe di vê cîhanê da evî karî bike, eger ne wê di çala ezabê îlahî û «narullahil mûqede»(2) da dilê te bihelînin û Xwedê zane ka ev duristbûn, wê çiqas dewam bike û di çend sedsalên axretî da çêbe. Paqijbûna di vê cîhanê da, sehl û hêsan e; guherîn li vêderê zûka çêdibin; lê di wê alemê da guherîn bi awayek dî ye û ji navçûna melekeyekî ji melekatên nefsê, bi sedan sal dirêjî jê ra heye. Nexwe ey bira, heta ku te omr, ciwanî, quwet û îxtiyar heye, nefsa xwe durist bike. Eva meqam û merteban paş guhê xwe ve bavêje; eva îtibaratan bin pî bike. Tu zade yê Ademî, sifetê şeytan ji xwe bavêje. Çêdibe ku şeytan ji hemû rezîlên dî evê rezîlê muhimtir bigire, û çiko ev, sifetê wî bi xwe ye û bûye sebebê avêtina wî ji dergahê îlahî, dixwaze arif, 'amî, alim û cahilan bike hevsilkê xwe. Û dema tu bi vê rezîlê ve di wê alemê da gel wî rû bi rû bibî, wê ew loman li te bike û bêje te: Ey zarokê Adem! Ma pêxemberan negotin te, ji ber tekebura ser bavê te, ez ji dergahê Heq hatim avêtin, û ji ber ku min meqamê Adem kêm zanî û merteba xwe mezin kir, ez mel'ûn bûm, çima te ev rezîle li xwe kir bela? Hingê li wêderê xêncî ku tu wê ezab û poşmaniyek ji qamê der bibînî, wê zelîltirînê mexlûqatan û rezîl-

---

1- Nehcul Belaxe, x. 195

2- Humeze / 6- 7

tirînê mewcûdatan jî lome û îtaban li te bike! Şeytan kibra xwe ser Xwedê nekir, belkî ser Adem kibr kir ku mexlûqê wî bû, got: «Te ez ji agir çêkirime û ew ji heriyê».[1] Xwe mezin kir û Adem piçûk zanî. Tu jî ademîzadan piçûk zanî û xwe mezin dikî, tu jî bêemriya Xwedê dikî; kerem kiriye nefs sivik be, li beranberê bende yên Xwedê da xwe bişikine, lê tu tekeburê dikî û xwe ser wan ra digirî. Nexwe çima tu lanetê li şeytan tenê dikî? Nefsa xwe ya xebîs jî bike şirîkê lanetê, çawa ku tu di vê rezîlê da şirîkê wî yî. Tu ji mezahirê şeytan î, mîzan di şiklê axretî da melekatên nefsê ne, çêdibe ku tu hem di şiklê şeytan da bî û hem ser şiklê mêrûyê bî, mîzanen axretî gel vêderê ferq in.

**Vebir: Carna hesed destpêka tekeburê ye**

Evê jî bizane, carna çêdibe yê kemal neyî, tekeburê bike ser yê kemal heyî. Mesela: Feqîr ser dewlemend û cahil ser alim. Gereke ev jî bêt zanîn, çawa ku carna ucb destpêka tekeburê ye, carna hesed jî sebeb e ji tekeburê ra. Çêdibe dema ku mirov kemalekî di kesekî da bibîne, ku di wî bi xwe da tunebe, hesedê pê bibe û bibe sebeb ku tekeburê bike, û çiqas bikare ewî çine hesab bike û xwe lê ba bide. Di Kafî ya şerîf da hatiye: «Pêxemberê Xwedê (s.a.a) di kolanek ya Medînê ra diboriya ku reşejinekî, sergîn kom dikiran, gotinê: Xwe ji ser rêka Resûlê Xwedê bide paş, ew ê got: Rêk fireh e. Hinek ji yên gel wî, xwe ne wekirî kirin, pêxember (s.a.a) kerem kir: «Bela xwe jê vekin, ew mutekebir e». Di pey ra ji Îmam Sadiq (a.s) hatiye gêran ku kerem kir: «Carna kibr di nav eşrafê xelkê da ji her qismî tê dîtin».

Carna ev sifet di hinek ji ehlê ilmê da peyda dibe û ozrê xwe tîne û dibêje: Nefs sivikî di beranberê dewlemenda da nebaş e, nefsa emmare dibêjiyê: Nefs sivikî di beranberê dewlemenda da kêmasiyê têxe îmanê. Rebenî nikarê ferqê bêxe navbeyna xwe şikandina li beranberê heyî ya dewlemendan û xeyrê wê da, car

---

1- E'raf / 12 û Sad / 76

heye ku rezîla hezkirina dinyayê û peyketina mezinahiyê, mirov bi aliyê nefs sivikiyê ve dikêşe, ev exlaq ne nefs sivikî ye, ev devnermî û xwe şêrînkirin e û ji rezîlên nefsanî ye. Xweyê vî exlaqî nefs sivik nîne di beranberê feqîr û jaran da, îlla ku timahiyek di wan da hebe, an pariyekî ji wan dest xwe bêxe.

Car heye exlaqê dilnizmiyê, mirov hay bide ji qedrgirtin û tewazu'ê ra, dewlemend be an jî feqîr, feydeyek jê ra hebe an jî tunebe. Yanî nefs sivikî ya wî xwerî ye, ruhê wî pak û paqij e, ev nefs sivikî ji feqîra ra baş e û ji dewlemenda ra jî baş e. Gereke ji her kesî ra gorekî halê wî qîmet jê ra bêt dayîn. Lê ev bê qîmetkirina te û tekebura te, ne ji ber wê ye ku tu ne mutemeliq î, belkî ji ber wê ye ku tu hesûd î û tu pê nahesî. Ji ber vê yekê, eger ew, qîmet bide te, bi awayekî ku tu ne berhêvî bibî, tu dê li beranberê wî da nefs sivik bî û xwe bişikînî! Welhasil, xapandinên nefsê ewqas hûr in ku di beranberê wan da gereke mirov hana xwe ji Xwedê ra bibe. «Wel hemdu lillah ewwelen we axira».

## HEDÎSA PÊNCÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب عن عليّ بن إبراهيم، عن محمّد بن عيسي، عن يونس، عن داود الرّقّي، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال: قال رسول الله، صلّى الله عليه و آله:

**«قال الله عزّ و جلّ لُموسَي بنَ عِمْرانَ: يا ابنَ عِمْرانَ لا تَحْسُدَنّ النّاسَ على ما آتَيْتُهُمْ مِن فَضْلى، و لا تَمُدَّنَّ عَيْنَيْكَ إلى ذلك، و لا تتبعْهُ نَفسَك، فإنّ الحاسِدَ ساخِطٌ لِنِعَمى صَادٌّ لِقَسْمِيَ الّذى قَسَمْتُ بَينَ عبادى و مَن يَكُ كذلك فَلَسْتُ مِنْه و لَيْسَ مِنّي.»**

Dawûd ji Îmam Sadiq (a.s) digêre ku got: Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Xwedayê ezîz û celîl got Mûsayê kurê Îmran: Ey kurê Îmran, hesedê bi xelkê nebe ji ber wê ya min bi kerema xwe dayî xelkê, û çavê xwe bi wî aliyî ve nede û dilê xwe nebiyê. Çiko bi rastî ji ber qenciya min, kerbê hesedber tê û nerehet e ji wê qîsmet kirina ku em di nav bendeyên xwe da teqsîm dikin. Û kesê wereng be, ez ne ji wî me, û ew ne ji min e».[1]

### Şîrove:

Hesed, haletek nefsanî ye ku hesedber dixwaze kemal û xweşî ya ku ewî ji hineka ra goman kirî, ji dest wan derkeve, çi ew nîmet ji wî bi xwe ra hebe û çi ne, û çi bixwaze bigehê wî bi xwe û çi ne, ev jî tişteke xêncî ji xibteyê. Çiko xibte, ew e ku kesek xweşî ya ku di kesekî da goman kirî, ji xwe ra bixwaze bê wî qasî ku bixwaze

1- Usûla Kafî, c.2, p. 307

ew nîmet û xweşî ji dest wî kesî derkeve û zail bibe. Û eva he ku me got «kemal û xweşî ya hatî gomankirin» ev bend ji ber wê ye, çiko ne lazim e ew tişta hesûd, ji navçûna wê dixwaze, hema bi rastî kemal û nîmet be, çêdibe ku tiştek ji kêmasî û rezîlan be; lê hesûd goman bike kemal e û ji navçûna wê bixwaze. An tiştek ji kêmasiyên însanî û kemalatên heywanî be û hesûd çiko di hedê heywaniyetê da ye, ewê kemal goman bike û zewala wê bixwaze. Mesela: Hinek ji xelkê hene ku xûnrijiyê huner hesab dikin! Û eger kesek wereng be, hesedê pê dibin. An herzegoyî û tevzokiyê kemal hesab dikin û hesedê pê dibin. Nexwe di vê behsê da mîzan û pîvek tewehuma kemalê û gomana nîmet û xweşiyê ye; ne ew bi xwe. Mexsed ew e ku, eger di kesekî da nîmetek dît, çi hema bi rastî nîmet be û çi ne, vêca bixwaze ew ji destê wî derkeve, ew kesê weha be, jê ra tê gotin: Hesûd.

Bizane hesedê eqsam û derece hene; bi hesebê halê yê hesed pê tê birin û bi hesebê hesûd û bi hesebê hesedê bi xwe.

Bi hesebê halê yê hesed pê tê birin, ew tişt in yên wek: Kemalatên aqlî û sifetên hêjayî û kiryar, karên qenc, an tiştên ji derveyî, wek mal, minal, mezinahî, qedr û qîmet... An bi tiştên bervajiyê wan ku gomana kemalê têda hebe hesed tê birin.

Bi hesebê halê hesûd jî, wek çawa hesed ji ber dijminî û tekebur û tirs... çêdibe, ku em ê paşê jê xeber bidin.

Gorekî hesedê bi xwe jî, ku mirov dikare bêje derecat û teqsîma heqîqî ya hesedê bi hesebê vê ye, ne herdukên pêşda, ji vê ra jî ji aliyê dijwarî û lawaziyê ve, gorekî esbab û eseran gelek qisim hene. Bi hezkirina Xwedê em ê di çend vebiran da behsê ji xirabî û rêka dermankirina wê bikin. Û em alîkariyê ji wî dixwazin.

**Vebir: Der heqê hinek ji sebebên hesedê da ye**

Hesedê gelek sebeb hene ku giraniya wan dizivire bal zelîl dîtina nefsê ve; çawa ku di tekeburê da bi hesebê new', bervajiyê wê ye. Çawa ku dema kesek kemalekî di xwe da dibîne û ewê di yên dî

da nabîne, haletê xwe mezinkirin û bilind dîtin û hêçiyê di wî da peyda dibe û tekeburê dike; dema yên dî kamil dibîne, haletê binratî û şikestinê jê ra çêdibe, ku eger sebebên ji derveyî û meslehetên nefsanî nebe, hesed jê çêdibe. Û carna çêdibe ku şikesta xwe di hevjîniya yên dî digel xwe da dibîne, çawa ku xweyê kemal û nîmetê bi yek wek xwe hesedê dibe. Mirov dikare bêje, hesed hema ew halê şikestê ye ku, esera wê meyla zewala xweşî û kemalê ye ji yên dî ra. Hineka wek çawa Allameyê Meclisî (rehma Xwedê lê be) gêrayî, sebebên hesedê di heft tiştan da zanîne:

1- Dijminî;

2- Xwe mezinkirin; Bi vî awayî ku bizane, ewê hesed pê tê birin, ji ber nîmetekî tekeburê ser wî dike, vêca ew nekare kibr û fexra wî ragire, ji ber wê bixwaze ku, ew nîmet û xweşî ji dest wî derkeve.

3- Kibr; ew bi vî awayî ye ku hesûd bixwaze tekeburê ser xweyê xweşiyê bike, û eva he xêncî pê ji dest çûna nîmetê îmkan jê ra tunebe.

4- Te'ecub; dimînê ecêbmayî ku çawa evî mirovî ev başiya mezin heye. Çawa ku Xwedayê Teala der heqê gelên pêşiyê da neqil dike ku gotin: «Ma entum îlla beşerun misluna».[1] Û gotin: «Enu'minu li beşereyni mislena».[2] Ketin ecêban, ji ber ku yek wek wan giha dereca risalet û wehyê, vêca hesed pê birin.

5- Tirs; tirsa wî ji wê yekê hebe ku, xweyê xweşiyê astenga ji gihana mexsedê ra jê ra çêke.

6- Huba riyaset û mezinahiyê; ev hingê ye ku mezinahiya wî bi wê be ku, kes di xweşî û nîmetan da beranberê wî nebe.

7- Sirûşt û tebîetê pîs û xebîs; ku nekare xweşiya kesî bibîne. Xeberdana wî xilas.

---

1- Yasîn / 15

2- Muminûn / 47

Lê gorekî gotina nivîser çawa îşare pê hat kirin, zêdetir û belkî ev hemû dizivirin bal şikestî dîtina nefsê ve. Û sebebê bê vebirê hesedê ew e -gorekî me'na meşhûr ya hesedê- û gorekî gotina me, ji xwe hema ew hesed bi xwe ye. Welhasil gotûbêja vê der heqê da, ne ji mexseda vê kitêbê ye.

**Vebir: Der heqê hinek xirabiyên hesedê da ye**

Bizane hesed, yek ji nexweşiyên ji navberên dil e; vêca gelek ji nexweşiyên dî yên dilî jî wek kibr û mefasidên amelî yên paşveder, ku her yek ji helaketa însan ra sebebek musteqil û serbixwe ye, ji wê çêdibin. Em ê ji hineka ku xirabiya wan eşkere ye, biaxivin.

Xirabiyên wê; vê der heqê da ewa sadiqê musediq gotî bes e, ku di Sehîha Muawiyeyê kurê Weheb da hatiye, dibêje: «Afeta dîn, hesed û ucb û fexrkirin e». Û di hedîsa sehîh ya Muhemmedê Muslim da ji Îmam Baqir (a.s) neqil bûye: «Çêdibe ku her xirabiyek ji mirov efû bibe. Û bi rastî hesed îmanê dixwe wek çawa agir dara dixwe».

Kifş e, îman ronahiyek îlahî ye, ku dil ronahî dike bi teceliyatên Heq; çawa ku di hedîsa qudsî da hatî: «Erd û ezmanê Min, nikarin min di xwe da bigirin; lê dilê bendeyê min yê bawerdar, min di xwe da digire». Ev ronahî ya me'newî, ku dil firehtir dike ji hemû mewcûdatan, dijatî heye gel vê tarîtî û tengiya ku ji qirêja vê rezîlê peyda dibe. Ev sifetê xebîs û kirêt, wisa dil digire û teng dike ku, esera wê di temamê memleketê zahir û batin da dixweyihê; dil, kol û xemdar dibe; sing, teng û tarî dibe û rû diqemite. Helbet ev halet, îmanê pûç dike û dil dimirîne û çiqas xurt û zêde bibe, nûra îmanê zeîf û lawaz dibe.

Hemû wesfên me'newî û sûrî yên bawerdaran, dijatî heye digel eserên eşkere û navdeyî yên hesedê; bawerdar xweşbîn e nisbet bi Xwedê û teqsîma wî di nav evdên wî da; lê kerbê hesûd ji Xwedê Teala tê û nerehet e ji teqdîratên wî; çawa ku di hedîsa şerîf da hatiye ku: «Bawerdar xirabiya bawerdaran naxwaze û qedr,

qîmet dide wan; lê hesûd, bervajiyê wê ye; hezkirina dinyayê serî ji bawerdar nastîne; lê hesûd, ji ber dinyaxaziya zehfî ketiye nav vî exlaqê rezîl ra; bawerdar xêncî ji Xwedê û axretê, tirs û xemek tunehin; lê tirs û xema hesûd li dor û berê mehsûd (ewê/a hesed pê tê birin) dizivire; bawerdar enî geş e û devken; hesûd, madê xwe kirî û rû qemtî ye; bawerdar nefs sivik e; lê hesûd, pir mutekebir e. Nexwe hesed afeta îmanê ye û ewê dixwe, wek çawa agir daran dixwe û ji nav dibe. Der heqê pîsatiya vî exlaqê rezîl da, hema ev bes e ku, îmanê ji mirov digire û ewî jar dike, ew îmana ku sermaya xilasiya axretê û saxiya dil e.

Yek ji mefasidên ku daim digel hesedê ye, xezeba ji Xaliq û xweyê başiyan, û teqdîratên wî ye. Îro perdên zulmanî yên tebîetê û mijûlbûna bi wê ve, îdrakatên me nixûmandine û çav û guhê me kor û ker in, em pê nahesin ku kerbê me ji Malikul Mulûk tê û me berê xwe jê zivirandiye; û em nizanîn ku şiklê vê xezeb û berzivirandinê di melekût û cihê mana me ya eslî da çawan e. Hema ev ji devê Îmam Sadiq (a.s) digehê guhê me ku: «... Kesê berê xwe ji min bizivirîne û kerbê wî ji min be, ne ez ji wî me û ne ew ji min». Em fêhm nakin ku ev beraet û xwe dûrkirina Heq Teala ji me, çi musîbet e, û çi tişt bin da heye. Kesê ku ji bin serokatiya Heq derkeve û ewî ji bin alaya Erhemur Rahimîn derînin, êdî berhêviya xilasiyê jê ra nîne û şefaeta şefaetkaran nabe behra wî. «Men zellezî yeşfe'u 'indehu îlla bi iznih - Kî ye li bal wî şefaet û mehderê bike, bê îzna wî».[1] Kesê kerbê wî ji Xwedê tê û ji welayeta wî derketiye û werîsê pêwenda di nav wî û xweyê wî da qetiyaye, wê kî şefaetê jê ra bike? Wey rûreşiyê, wey poşmaniyê, der heqê wê ya me bi xwe anî serê xwe! Çiqas ku pêxember û ewliyankirin hawar, da me ji xew hişyar bikin, roj roj ser bêxeberiya me ve zêde bû û em bextreştir bûn.

Ji xirabiyên vî exlaqî, ser gotina zanayên axretî, guvaştin û tarîtî ya qebrê ye, ew dibêjin şiklê berzexî yê vî exlaqê pîs, ku tengî ya

---

1- Beqere / 255

ruh û tarîtî ya dil têda heye, guvaştin û tarîtî ya qebrê ye. Firehî û tengiya qebrê, bi dil firehî û dil nefirehiyê ye.

Ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) di rakirina cenaze yê Se'd da şirîkatî kir (Se'd ew e yê heftêh hezar melaîketan di rakirina cenaze yê wî da şirîkatî kirî), Resûlê Xwedê (s.a.a) berê xwe da ezmana û got: «Gelo, yên wek Se'd tên guvaştin?» Rawî got Îmam: Ez gorî, ji me ra gotine ku Se'd îstixfafa di bewlê da dikira, kerem kir: «Haşa, tenê tiştek ya wî hebû, ku gel ehlê mala xwe nexweş exlaq bû».

Tengî, tengavî, kudûret û tarîtiya ku ji ber hesedê di dil da peyda dibe, di exlaqên xirab yên dî da kêmtir tê dîtin. Welhasil xweyê vî exlaqî, hem di dinyayê da di ezab û tengiyê da ye û hem di gorê da nav tarîtiyê da ye û tê guvaştin, hem di axretê da pir bela û belengaz e. Ev xirabî yên hesedê bi xwe ne, helbet eger exlaqek xirab û an karek dî yê xirab di pey ra neyê; lê kêm caran çêdibe ku, ew nebe sebebê xirabiyek dî; çiko exlaq û karên xirab jê çêdibin, wek tekebur, xeybet, tuhmet, xebergêran, dijûn û eziyet..., ku heryek ji wan bi xwe paşveder û ji navber in.

Vêca lazim e mirovê aqil, baş bixebite û xwe ji vê şerm û arê dûr bike û îmana xwe ji vî agirî û vê afeta dijwar necat bide û xwe ji vê tengiya fikrî di vê cîhanê da, ku bi xwe ezabek berdewam e, û ji guvaştin û tarîtiên qebrê di alema berzexê da û ji xezeba Xwedê Teala, xilas bike. Piçekî bifikire, tişta ku evqas xirabî pê ve tê, gereke bêt dermankirin û ev di halekî da ye ku heseda te çi zererê nagehîne mehsûd (yê hesed pê tê birin), bi heseda te xweşiya wî ji nav naçe, belkî jî feyda dinyewî û uxrewî ji wî ra di vê da hebe; çiko ev têketina te, ku tu hesûd û dijminê wî yî û nexweşî û xema te bi xwe ji wî ra menfeateke, dibîne ew bi xwe nav xweşiyê ra ye û tu ji ber xweşiya wî nav ezab û nexweşiyê da yî, eva he bi xwe dikare jê ra xweşî be. Eger vêca te ji vê xweşiya duwê jî, xeber hebe, li ser nexweşî û tengaviya te ve zêde dibe, û eva he jî jê ra xweşiyeke û her bi vî awayî ye; nexwe tu

daim di nexweşî, kul, xem û tengaviyê da yî û ew di xweşî û şahî û firehiyê da ye. Di axretê da jî heseda te feydê digehîniyê, nexasima eger hesed bûbe sebebê xeybet, tuhmet, eziyet û azarên dî, ku wê başiyên te bidin wî û tu dê jar û muflis bibî; dîsa xweşî û mezinahî ji wî ra ye. Eger tu hinekî vê der heqê da bifikirî, helbet tu wê xwe ji vî exlaqê pîs paşde bidî, paqij bikî û nefsa xwe ji vê mehlekê xilas kî.

Goman neke ku mirov nikare exlaqên pîs ên ruhî ji nav bibe, ev ji xeyalekî pê ve ne tiştek dî ye, ku nefsa emmare û şeytan têxe dilê te; dixwaze te ji rêka duristkirina axretê paşda bide. Heta ku mirov di vê alemê da ye, ku cihê guherînê ye, çêdibe ku di hemû ewsaf û exlaqan da guherîn jê ra çêbe, melekat çiqas ku xurt û qewî bin jî, ji navbirina wan di vê cîhanê da mumkin e, her çend gorekî dijwarî û zeîfiyê zehmetê wê ferq e; di wextê destpêka peydabûna sifetekî di nefsê da, bi piçek zehmetê mirov dikare ewê ji nav bibe, wek dara nû hatî çandin, ku hêca rehên xwe di erdê da nekirî xwarê; lê piştî ku ew sifet di nefsê da cih girt û bû meleka cihgirtî, dîsa jî zewala wê mumkin e, lê hinekî zehmet jê ra divê, wek wê dara çendîn sale, ku reyên xwe di erdê da kirine û ji hilkirina wê ra zehmetek pirtir lazim e. Tu çiqas derengtir dest bavêjî hilkirina pîsî yên ruh, ewqas zehmetê te zêdetir dibe.

Ey ezîz, ji xwe nehêle ku xirabiyên exlaqî û kiryarî, bikeve di memleketê te yê eşkere û navdeyî de, eva he hêsantir e ji wê ku piştî daketinê em jê derînin, wek çawa eger tu nehêlî dijmin bikeve welat da û dakeve di kelhan da, ev rehet û hêsantir e ji wê yekê ku piştî daketinê û girtina burc û qel'an tu ewa derînî. Û eger ket têda çiqas tu derengtir dest bi deranîna wan bikî ewqas zehmetê te zêdetir dibe û hêza navdeyî berew zeîfî û lawazî diçe. Seydayê giranqedr, arifê mezin Şahabadî (ruhî fidah) kerem kir: «Heta ku hêz, quweta ciwanî, xortîniyê û neşata wê heye, mirov baştir dikare di beranberê mefasidên exlaqî da rabe û berpirsiyariya xwe ya însanî baştir pêk bîne». Ji hingê ra nehêlin ku ev quwet nemîne û demê pîriyê be, ku di wî halî da serketin zehmet e; eger serke-

tin çêbe jî, zehmeta duristkirinê gelek zêde ye. Vêca eger mirovê aqil di xirabiyên tiştekî da fikir kir, eger neketiye navê, bi aliyê wê ve naçe û xwe pê wê naherimîne û eger Xwedê nekirî kete navê jî, zûtir wê li duristkirinê bigere û nahêle rehê xwe bavêje û eger Xwedê nekirî rehê xwe avêt jî, bi çi zehmetê hebe wê rehê wê hilke û derîne, da newebe zemanê fêkî dana wê ya berzexî û axretî bigehê; çiko eger pê vî exlaqê fasid û xirab ji vê alemê ku cihê tebedula heyûlayî û guherîna maddî ye, bêt guhaztin, êdî hilkirina wê ji dest wî derdikeve, û heta ku di axretê an di berzexê da xulqek ji exlaqên nefsanî be, guherîn waweyla ye!

Di hedîsa Resûlê Xwedê da (s.a.a) hatiye ku: «Heryek ji ehlê bihişt û dojehê ji ber niyetên xwe di wê da dimînin». Niyetên fasid û xirab, ku jêderê exlaqên rezîl in ji nav naçin, ne heta koka wan ji nav biçe. Di wê cîhanê da melekat ewqas xurt û dijwar derdikevin meydanê ku, ji navbirina wan ne mumkin e -hingê mirov daim di dojehê da dimînê- û eger bi tengî, zehmet û agir ji nav biçe jî, belkî piştî sedan salê axretî, ji nav biçe.

Nexwe ey aqil, tişta ku çêdibe tu di mehekî an salekî da, bi zehmetek kêm yê dinyayî bi îxtiyar û viyana xwe durist bikî û xwe ji nexweşiya dinya û axretê xilas bikî, nehêle bimîne û te helak bike û ji nav bibe.

**Vebir: Der heqê reh û rîşe ya fesadên exlaqî da ye**

Pêşda me got, îman ku behra dil e, tişteke xêncî ji ilmê ku behra aqil e. Hemû mefasidên exlaqî û amelî ji vê ye ku dil ji îmanê bêxeber e û ewa ku aqil bi rêka burhana aqlî an gotina pêxemberan ve îdrak kirî, negihandiye dil û dil jê bêxeber e. Yek ji zanînên ku hekîm û mutekelim û xelkên muteşeri' qebûl kirine û qet şik têda nîne, ew e ku ewa bi rêka hekîmê mutleq ve hatî deynan û sabit bûyî: ji wucûda kemalatan û dana nîmetan û teqsîma ecel û rizq, sipehîtirîn sîstem e û rêketî ye gel meslehên tamme û kamiltirîn sîstim e. Û heryekî bi zimanê xwe û îstilaha xwe ya taybet,

behs ji vê lutf û hikmeta kamile ya îlahî kiriye; arif dibêje: Zilla (sîbera) cemîla alel itlaq, cemîla alel itlaq e.

Hekîm dibêje: Nizama eynî mutabiqê nizama ilmî, vala ye ji kêmasî û şurûran; şurûrên cuz'iye yê mutewehime jî, ji wê çendê ra ye ku mewcûdatan bigehînin kemala wan ya layiqê wan. Mutekelim û ehlê şerayi' jî dibêjin: Ef'alê hekîm bi hikmet û selah çêdibin, aqilên cuz'iye yê mehdûde yê beşer jî, nikare bi meslehên teqdîratên îlahî bihese. Ev gotin, ser zimanê hemûyan diherike û heryekî gorekî zanîn û aqilê xwe delîl jê ra aniye; lê çiko ji heddê qîl û qalê derbas nebûye û negihaye merteba dil û hal, zimanê îtirazê vekiriye û her kesî behra îmanî nîne û bi awayekî gotin û, burhana xwe tekzîb dike. Fesadên exlaqî jî, bi vê pêkê ne: Kesê hesûd, ku dixwaze xweşî ji xelkê bêt girtin û kîna yê di xweşî da, di dilê wî da ye; bila bizane ku ewî îman tune bi vê yekê ku Heq Teala ji ber meslehetek temam ev xweşî daye wî ku em fêhm nakin û tênagehin û bila bizane ku bawerî bi edaleta Xwedayê Teala nîne û teqsîmatê adilane nizane. Tu di behsa baweriyan da dibêjî Xwedê adil e, lê ev ji gotinekî pê ve ne tiştek dî ye. Îmana bi edaletê, dijatî heye gel hesedê. Eger tu wî adil zanî, teqsîma wî jî adilane bizane. Çawa ku di hedîsa şerîf da gotiye: «Xwedayê Teala kerem dike: Hesûd, nerehet e ji wî qîsmetê ku min nav bendeyên xwe da teqsîm kirî û kerbê wî ji teqsîmkirina min tê». Dil di fitret û sirûşta xwe da, di beranberê teqsîma adilane da şikestî ye û ji zulm û neheqiyê birev û mutenefir e. Ji fitret û sirûştên îlahî, ku di canê mirov da cih girtiye û rûniştiye, hezkirin û şikestîbûna di beranberê edaletê da û kerb hatina ji zulmê û teslîm nebûna di beranberê wê da ye; eger bervajiyê wê dît, bila bizane ku kêmasiyek di wê da heye. Eger kerbê wî ji nîmetê hat û ji teqsîmê nerehet bû, ji ber wê ye ku ewê adilane û durist nizane û -penah ji Xwedê ra- ewê zalimane dihesibîne, ne ku evê teqsîmê adilane zane û jê nexweş e û ne ku evî karî rêketî gel sîstema kamil û mesleheta tamme dibîne û kerbê wî jê tê. Ne; ne, îmana me kêmasî têda heye û gorekî aqil û burhanê ji heddê aqil û îdrakê

derbas nebûye û negihaye heddê dil. Îman ne bi gotin, bihîstin, xwendin, gotûbêjê, qîl û qalê ye, xulûsa niyetê jê ra lazim e. Ew ê li pey Xwedê, wê wî peyda bike, ewê zanînê bixwaze, wê bigehê wê. «Men kane fî hazihî e'ma – Kesê di vê dinyayê da kor be, wê li wê li axretê jî kor û li rê windatir be» û Kesê Xwedê ronahiyê nediyê, vêca qet ronahî jê ra nîne. (Nûr / 40)

**Vebir: Der heqê dermankirina amelî ya hesedê da ye**

Xêncî ji îlac û dermanê ilmî û zanistî, ku hinek jê hat gotin; îlac û dermanê amelî jî ji vê rezîla qebîh û pîs ra jî heye, ew jî ev e ku tu bi zehmet hejêkirina wî yê tu hesedê pê dibî, bêxî dilê xwe û fêkiyê vê hezkirinê bi xweyhênî û niyeta te jî ji vê yekê dermankirin û îlaca evê nexweşiya dilî, yanî hesedê be. Nefsê te hay dide ku, tu wî bizecirênî û eziyet bikî û dijminiyê gel wî bikî; xirabiyên wî dide ber çavê te, vêca tu bervajiyê meyla nefsê dilovaniyê gel wî bike, qîmet û hêjanê bidiyê û zimanê xwe mecbûr bike ku başiya wî bêje; ji xwe û xelkê ra behsa qencî yên wî bike û sifetên wî yên baş û qenciyên wî bide bîra xwe. Her çend ev karên tu bikî, di destpêkê da dijwar û zehmet e û mecaz û newaqi'î ye; lê çiko mexsed duristkirina nefsê û rakirina evê kêmasiyê û exlaqê rezîl e, paşîra wê nêzîkê heqîqet û duristiyê bibe û kêm kêm wê zehmetî rabe û nefs bikeve ser adeta xwe û duristiyek jê ra peyda bibe. Kêmê kêm bêje nefsê û pê bide fêhmkirin ku: Ew kes bende û evdê Xwedê ye û belkî Xwedê xwestibe merhemet û dilovaniyekî gel bike û ev xweşî ya taybet dayiyê. Nexasima eger mehsûd (yê hesed pê tê birin) ehlê ilm û diyanetê be û hesed ji ber wan tiştan be; çiko hema bi rastî hesedbirina ji ber wan, pîstir û aqibeta wê xirabtir e. Gereke bi nefsê bêt fêhmandin ku ev bendeyên taybet ên Xwedê ne, û tewfîqa Xwedê şamilê halê wan bûye û ev başiya mezin û girîng daye wan. Û gereke ev başî û nîmet nisbet bi xweyê wan muhabet û hejêkirinê çêke û gereke mirov qedr û hêjanê bidiyê; vêca eger dît tiştên gereke bibe sebebê hezkirinê, bervajiyê wê di nefsê da xuya kir, gereke pê bihese

ku bextreşî ya wî pir û zehf bûye û tarîtiyê, navdeyê wî perde kiriye û, nixûmandiye, û muheqeq bila bi rêka ilmî û amelî ve dest bavêje duristkirinê. Û bila bizane eger bi rêka çêkirina hezkirin û muhabetê ve biçe, wê serkeve; çiko ronahiya muhabetê ser tarîtiya kudûretê ra ye û Xwedayê Teala soz daye ku xebatker û mucahidan hîdayet û rêrast bike û bi lutfa xwe alîkariya wan bike û serketinê bike behra wan. «Înnehu weliyyut tewfîq wel hîdaye».

**Vebir: Der heqê hedîsa ref' da ye**

Bizane di hinek hedîsan da pêxemberê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «Neh tişt ji ser umeta min rabûne, ku yek ji wan hesedeke ku bi dest an ziman eşkere nebûbe û ne xuya be». Ronahî ye ku çênabe ev û yên wek wê bibin pêşîgirê xebatek cidî ji binbirkirina vê dara xebîs di nefsê da û ji pak kirina ruh ji vî agirê îmansoj û afeta dîn. Çiko kêm peyda dibe ku ev madda fesadê gava xwe bavêje di nefsê da û xirabiyên zehfî di nefsê da çêneke û qet esera wê eşkere nebe û îman parastî bimîne. Halhale di hedîsên şerîf da hatiye ku, ew îmanê dixwe û afeta îmanê ye. Û Xwedê Teala, xwe ji xweyê hesedê dûr û berî kiriye û gotiye «Ne ew ji min e û ne ez ji wî me». Nexwe ev mesela muhim û girîng û xirabiya ku bi rêka wê ve hemû tiştên mirov têxe xeterê, çênabe mirov ji ber hedîsa ref'ê, xwe jê bêxeber bike û serxwe biçe. Tu bixebite û çiqên wê jêke û li duristkirinê bigere û nehêle tiştek jê bi xweyhê û derkeve ji derve, hingê wê reh û rîşa wê sist bibe û ji xurtbûnê paş bikeve. Û eger di vî halê duristkirina nefsê da, mirin bigehê, wê rehmeta îlahî şamilê halê te be û bi vê rehmeta berfireh û ruhaniyeta Resûlê Ekrem (s.a.a) tu dê ber efû û lêborînê bikevî, û eger hinek ji wê mabe jî, wê birûska vê rehmetê, ewê bişewitîne û nefsê pak û paqij bike.

Lê ewa di riwayeta Hemze yê kurê Hemran da hatiye, ji Îmam Sadiq (a.s) ku kerem dike: «Sê tişt hene ku pêxemberan û xelkên dî jê xilas nebûne: Fikra di weswesa afirandinê da, tiyere û hesed. Heyhê, mumin heseda xwe bi kar neyne». Eva he an ji mubalixe

ra ye û mexsed ji wê ew e ku mirov zehf dikevitê. An pir ji mirov ra tê pêş, û mexsed ne mefhûmê ristê bi xwe ye. An jî bi mecaz, hesed dagir û li berxwegirê xibtê ye jî. An xwesta ji navçûna hinek ji nîmetên kafiran ku ji bona terwîc û pêşxistina hedef û dînê xwe yê batil bikar dibin, nav kirine bi hesed. Qey ne, hesed bi me'na wê ya heqîqî ji enbiya û ewliyan (a.s) dûr e û ew ji wê paqij in. Dilê ku exlaqên pîs û qirêja batinî hebe, nikare bibe cihê wehy û îlhama îlahî û nabe cihê ronahî dana zat û sifetên Heq. Nexwe gereke bi awayên jorî an bi awayek dî, riwayet bêt me'nakirin, an jî gereke bêt gotin: Zanîna wê bal bêjerê wê ye (a.s). Di ewil û axir da hemd û sipas ji Xwedê ra ne.

## HEDÎSA ŞEŞÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد، عن ابن محبوب، عن عبد الله بن سنان و عبد العزيز العبدى، عن عبد الله بن أبى يعفور، عن أبى عبد الله، عليه السلام، قال:

**«مَنْ أَصْبَحَ و أَمْسَى و الدّنيا أَكْبَرُ هَمِّه، جَعَلَ الله الْفَقْرَ بَينَ عَيْنَيْهِ وَ شَتَّتْ أَمْرُه، و لَم يَنَلْ مِنَ الدّنيا إلاّ ما قُسِّمَ لَه. و مَنْ أَصْبَحَ و أَمْسَى والآخرةُ أَكْبَرُ هَمِّه، جَعَلَ الله الْغِنَي فى قَلبِه و جَمَعَ له أَمْرَه.»**

Ibn Ebî Ye'fûr dibêje, Îmam Sadiq (a.s) got: «Kesê sibeh û êvar serda bên û mezintirîn hemm û xema wî dinya be, wê Xwedê feqîretiyê deyne nav du çavên wî da û karê wî têk bide û xêncî ji wê ya jê ra hatiye veqetandin jî, dest wî nakeve. Û kesê lê bibe sibeh û êvar û mezintirîn hemm û xema wî axret be, wê Xwedê dewlemendiyê bixe di dilê wî da û karûbarê wî li hev bîne».[1]

### Şîrove:

Bizane ku ehlê zanînê der heqê dinya û axretê da hinek gotin hene û li vêderê mexseda me, ne ev e ku em der heqê heqîqeta wê da bi hesebê îstilahên wan yên ilmî da xeber bidin, mijûlbûna fêhmkirin a îstilahat, red, qebûl, îrad û duristkirina wan yê peyar ji rêkê paşve dide.[2] Tişta li vêderê muhim, ew e ku dinya mez-

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 319, h. 15, behsa "Îman û kufr" û "hejêkirina dinya"yê.

2- Xwabê nûşîn bamdadê rehîl, baz dared piyade ra zi sebîl.

mûm bêt naskirin, da eger mirovê li pey axretê bixwaze desta jê bikêşe bi agahî û xubret dest jê bikêşe. Her weha naskirina wan tişta ye ku di vê rêka xilasiyê da ji mirov ra dibin alîkar. Bi hezkirina Xwedê em ê di çend vebiran da jê biaxivin. Di pê ve çûna vê rêkê da em tewfîqê ji Xwedê dixwazin.

**Vebir: Gotina Meclisî der heqê heqîqeta dinya xirab da**

Cenabê muheqiqê xebîr û muhedisê bê wêne, mewlana Meclisî (rehmet lê be) dibêje: «Bizane gorekî wê ya me ji ayet û riwayetan fêhm kirî, dinya xirab û mezmûm, pêk hatiye ji wan tiştan ku mirovan paşda bide ji guhdan û dostiya Xwedê û dest ve anîna axretê. Nexwe dinya û axret li ber hev in; tişta bibe sebebê razîbûn û nêzîkiya Xwedê, ji axretê ye; her çend gorekî zahir ji dinyayê be, wek ticaret û çandinahî û sen'et ku mexsed jê xweyîkirina eyal û zarokan be, ji bona taetê Xwedê û xerckirina di rêka xêr û başiyê da û alîkariya muhtacan û sedeqe dan û muhtac nebûn û nexwestina ji xelkê..., ev hemû ji axretê ne; gerçî xelk ewê ji dinyayê dihesibînin. Û riyazeta mubtedi'e û kiryarên riyayî, her çend hev rê be gel zuhd û zehmetê jî, ji dinyayê ye; çiko sebebê duriya ji Xwedê ye û nabe sebebê nêzîkî ya bal wî ve, wek kiryarên kafir û muxalifan. Gotina wî xilas.

Ji lêkolekî neqil dike ku: Dinya û axreta te du halet in ji halên dil û qelbê te: Ewa nêzîk e û pêş mirinê da ye, navê wê dinya ye. Û ya paş wê tê û piştî mirinê, navê wê axret e. Vê gorekê pêş mirinê da çi behr, nesîb û xweşiya ku tu bibî, ew dinya te ye».

Ez ê feqîr dibêjim, mirov dikare bêje ku carna dinya ji wê neş'eta nazile ra tê gotin, ku guherîn dikeviyê. Û axret zivirîna ji vê neş'etê ye bal melekût û batinê xwe ve, ku mala subût, man û qerarê ye. Û ev neş'et ji her nefs û şexsekî ra muheqeq e. Bi kurtî, gotin ev e ku, ji her mewcûdekî ra meqamê zuhûr û mulk û şuhûdê heye û ew, merteba nazile ya dinyewiye ya wê ye; meqamê butûn, melekût û xeybî jî heye û ew neş'eta sa'ide ya uxrewiye ya

wê ye. Ev neş'eta nazile ya dinyewiye gerçî di zatê xwe da naqis û exîreyê meratibê wucûd e; lêbelê çiko cihê terbiyeta mirovên pak û mala dest ve anîna mertebên bilind û zeviya axretê ye, ji baştirîn meşahidên wucûdî ye û giranqedrtirîn neşe'atan û muxtenemtirînê ewalima ye li bal ewliya û ehlê rêka axretê. Û eger ev mewadên mulkiye û guherîn û herekatên tebî'iye û îradiye nebûna û, Xwedê Teala guherîn û teserufat ser vê neşê xurt nekiribûna, qet çi nefsên naqis nedihatin heddê kemal, subat, qirara xwe û wê kêmasiyek giştî di mulk û melekûtê da çêbûba. Û ewa ser zimanê Quran û hedîsê der heqê mezemet û xirabiya vê alemê da hatiye gotin, di heqîqet da bi aliyê wê bi xwe ve nazivire, bi hesebê new' û ekseriyet, belkî dizivire bal tewecuh û nêrîna wê û hezkirina qelbî ya wê.

Vê gorekê kifş bû ku ji mirov ra du dinya hene: Dinya baş û ya xirab. Ya baş ew e ku ev neş'e darut terbiye ye û cihê dest ve anînan û ticaretê ye; û dest ve anîna kemalatan û hazirkirina jiyanek bextewerane ya ebedî ku bê hatina vêderê ne mumkin bû. Çawa ku hezretê Mîrê bawerdaran û mewlayê muwehidan Îmam Alî (a.s) dema guh lê bû kesek xirabiya dinyayê dibêje, di xutbeyek ya xwe da kerem kir: «Dinya cihê rastiyê ye ji wî ra yê ewê rast derîne û cihê selametiyê ye ji wî ra yê jê fêhm bike, û cihê dewlemendiyê ye ji wî ra yê jê hilîne û cihê we'z girtinê ye ji wî ra yê pê bêt şîretkirin. Secdegeha hejêkirî yên Xwedê û mêjgeha melaîketên Xwedê û cihê hatina wehya îlahî û ticaretgeha welî yên Xwedê ye. Ew li wêderê rehmetê dest xwe têxin û li wêderê ji bo cennetê kar dikin...»[1] û gotina Xwedê Teala: «Çi xweş cih e, cihê xweparêzan»[2] gorekî riwayeta Eyyaşî ku ji Îmam Baqir (a.s) gêrayî, bi dinyayê hatiye tefsîrkirin. Nexwe alema mulk, ku mezhera cemal û celalê ye; bi me'nayekî qet xirabî û mezemet jê ra nîne û ewa ku xirab e, dinya mirov bi xwe ye; bi vê me'nê ku

1- Nehcul Belaxe, h. 1

2- Nehl / 30

dil bi tebîet ve bigirhê û berê xwe bidiyê û hejê bike; ku eva he destpêka hemû xirabiya ye. Çawa ku di Kafî ya şerîf da ji Îmam Sadiq (a.s) hatiye: «Re’su kulli xetîe hubud dunya» «Hezkirina dinyayê, serê hemû guneha ye». Û ji Ebû Cafer (a.s) neqil bûye ku: «Zerera du goriyên har, ku heryekî ji aliyekî ve bikevin nav keriyê pezê bê şivan, ne pirtir e ji zerera ku hejêkirina mal û mezinahiyê dide mumin, di dînê wî da. Nexwe dinya ya mezmûm û xirab, pê ve girhana dil û hejêkirina dinyayê ye. Û çiqas ku dil pê ve girêdayîtir be, perdeya ku di navbeyna mirov û hêjana wî û navbeyna dil û Heq da, stûrtir dibe. Û ewa ku di hinek hedîsan da hatiye ku, Xwedê heftêh hezar perdeyên nûr û zulmetê hene, hicab û perdên tarî û zulmanî, çêdibe hema pê ve girhana dil be ji dinyayê ra. Û çiqas pê ve girhan pirtir bibe, perde jî pirtir dibin. Û çiqas pê ve girhan dijwartir be, hicab stûrtir û dirandina wê zehmetir dibe.

**Vebir: Sebebên zêdebûna huba dinyayê**

Bizane çiko mirov jêderê vê alema tebîet e û, ev dinya dayika wî ye û zarokê vê av û vê axê ye, hezkirina dinyayê ji ewil ve di dilê wî da hatiye çandin û çiqas mezintir bibe jî, ev hezkirin û muhabet, di dilê wî da zêde dike. Û ji ber vê quweya şehewî û wesîlên xweşîbirinê, ku Xwedayê Teala ji parastina şexs û new'ê ra bi merhemeta xwe dayiyê, hezkirina wî rojbirojê zêde dike û berew zêdahî ye. Û çiko ew, dinya û alemê cihê kêf û jiyanê hesab dike û mirinê sebebê jêvebûna ji wê dihesibîne û eger ji ber burhana hekîman û xeberê pêxemberan (a.s) bawerî bi axretê û jiyana wê û kemalatên wê anî be jî, dîsa jî dilê wî jê bêxeber e û qebûl nekiriye, vêca çi bigehê dereca îtmînan û dilrehetiyê, ji ber vê yekê huba wî ji vê dinya û alemê ra zêde dibe.

Her weha çiko fitreta mirov, mayînê dixwaze û fena û ji navçûnê naxwaze û jê mutenefir e û goman dike ku mirin, fena û ji navçûn e, her çend aqilê wî tesdîq bike ku ev alem cihê têra/navra derbasbûnê ye û ew alem cihê mayînê ye; lê ya muhim, daketina

di dil da ye û belkî merteba kemala wê îtmînan e; çawa ku hezretê Îbrahîmê Xelîlur Rehman (a.s) merteba îtmînanê ji Heq Teala xwest û Xwedê ew mertebe dayê.[1] Nexwe çiko dilan an bawerî bi axretê nînin, wek dilên me, her çend tesdîqa aqlî hene, an jî îtmînan pê nînin, ji ber wê, hez dikin di vê alemê da bimînin û ji mirinê û derketina ji vê alemê hez nakin. Û eger dil pê bihese ku alema dinyayê kêmtirîn alem e û mala fena û ji navçûn, guherîn û alema helak û neqsê ye, alemên dî ku di pey mirinê ra tên, heryek baqî û ebedî û mala kemal, subat, jiyan, kêf û şahiyê ye, gorekî fitreta heyî, wê hej wê alemê bikira û ji vê alemê birev biketa. Û eger ev meqam biçe jorê û bigehê dereca şuhûd û wucdanê û şiklê navdeyî yê vê alemê û wê alemê, bibîne, wê ev alem ji wî ra zehmet û nexweş bibe û wê hez bike ji xilasbûna ji vê zindana tarî, zulmanî û zincîrên zeman û guherînên wê. Çawa ku di axiftinên weliyan da îşare pê hatiye kirin.

Îmam Alî (a.s) kerem dike: «Sond bi Xwedê, kurê Ebû Talib ji meyla zarok ji çiçkê diya xwe ra, pirtir meyla wî bal mirinê ve heye».[2] Çiko ewî hezretî bi çavê wîlayetê heqîqeta vê alemê muşahide kiribû, cîrantî û cewara rehmeta Heq, bi herdu aleman nedida. Û eger ne ji ber hinek meslehetan bûya, tebîetê nefsa wan ya pak, bêhnekî jî di vê zêndana tarî da nedisekiniya. Û ketina wan di neş’eta zuhûrê da û mijûliya bi teybîra mulkî û belkî te’yîdên melekûtî ji muhibbîn û meczûbîna ra, derd û zehmeteke ku em ji xwe nikarin têbigehin. Zêdetirîn nalenala weliyan, êşa firaq û cudahiya ji mehbûb û kerametên wî ye, çawa ku di munacatên xwe da îşare pê kirine.[3] Digel wê yekê ku ewan îhticabatên mulkî û melekûtî tunebûn û ji dojeha tebîet derbas bibûn û ew ji

1- Îşare ye bal: Beqere / 260

2- Nehcul Belaxe, x. 5-ê.

3- Dua Kumeyl: “[Ya Reb] Belkî ez bikarim xwe li ber ezabê te ragirim, lê vêca ez ê ji ber cudahiya ji te çawa bikarim taqet û tebatî bînim?”

wan ra temiriye û ne geş e[1] û te'elluqatên alemê di wan da nîne, û dilê wan xetiya tebî'î nebûye; lêbelê hatina di alema tebîet da bi xwe behrek tebî'î ye; û lezeta tebî'î ku di mulk da pêk dihata ji wan ra her çend gelek kêm jî be, esbabê hicabê bûye. Çawa ku ji Resûlê Ekrem hatiye gêran: «Carna dilê min dinixûmê û ez her roj heftêh caran daxwaza lêborînê ji Xwedê dikim». Û belkî xetî'a hezretê Adem Ebul Beşer, hema ev tewecuha qehrî be, bi tedbîra mulk û îhtiyaca qehrî be, bi genim û tiştên dî yên tebî'î; eva he ji ewliyayên Xwedê û meczûbînan ra xetî'e ye. Û eger hezretê Adem (a.s) di wê cezbeya îlahiye da bimaniya û waridê di mulk da nebûya, ev rehmet hemû di dinya û axretê da pêk nedihata. Ez ji vî meqamî derbas bibim, ev qasê me gotî jî gorekî behsa van wereqan, zêde bû.

**Vebir: Esera behrên dinyewî di dil da û xirabiyên wê**

Bizane ku nefs, çiqas behreyekî ji vê alemê bibe, eserek ji wê dikeve di dil da ku, ew jî esergirtina ji mulk û tebîet e, û dibe sebebê girêdan a bi dinyayê ve. Û lezet çiqas pirtir be, dil pirtir dikeve bin tesîra wê da û, te'elluq û hezkirina wê pirtir dibe, heta ku berê dil bi temamî bikeve dinyayê û xemla wê. Û eva he dibe sebebê xirabî yên zehfî. Hemû xeta, guneh û nebaşiyên mirov, ji ber vê hezkirin, muhabet û elaqê ye. Çawa ku di hedîsa Kafiyê da derbas bû.

Ji xirabî yên wê yên gelek mezin, çawa ku şêxê me yê arif (ez gorî bim) digota, ew e ku: «Eger hezkirina dinyayê bibe sûretê dilê mirov û dil pê vehiya wê dijwar bibe, di wextê mirinê da ku jê ra eşkere dibe, Xwedê dixwaze ewî ji mehbûbê wî cuda bike û ewî û xweziyên wî ji hev veke, hingê kerbê wî ji Xwedê tên û di wî halî da ji dinyayê diçe. Ev gotina wî, gereke ji mirov ra gelek hişyarker be ku hay ji dilê xwe hebe û ewê biparêze. Xwedê neke ku

---

1- Îşare ye bal hedîsa ku di tefsîra sûretê Meryem ayeta 71 da hatî: "Ji îmaman der heqê me'na wê da pirsîn, cewab dan: "Em têra derbas bûn, temirî bû". Ilmul Yeqîn, c. 2, p. 971

mirov ji xweyê nîmetê xwe û Malikul Mulûkê heqîqî xezebgirtî be û kerbê mirov jê bên, çiko şiklê vê xezeb û dijminiyê xêncî ji Xwedê kes dî nizane.

Her weha seydayê me yê mezin Xwedê ewî biparêze, ji bavê xwe yê hêjayî digêra ku, di axirîka omrê xwe da ji ber hezkirina ji yek ji kurên xwe gelek ecêb bû û piştî qederekî riyazetê, ji wê hezkirinê rehet bû û kêfxweş munteqilê mala şahiyê bû, (r.a).

Îmam Sadiq kerem kir: «Mesela dinyayê, wek ava behrê ye, çiqas mirovê têhn jê vexwê, têhnîşka wî zêde dike, heta wî bikujê. Hezkirina dinyayê mirov li helakê dibe û maddeya têketina hemû guneh û pîsatiyên xef û eşkere ye».

Ji hezretê Resûlê Ekrem neqil bûye ku: «Dirhem û dînaran, yên pêş hewe da kuştin, kujerên hewe jî hema ew [dirhem û dînaran] in».

Fereza ku mirov nekeve nav gunehên dî ra -her çend gelek dûr e, belkî mehalê addî ye-, hema mubtelabûna bi dinyayê û hezkirina wê, sebebê belayê ye; belkî jî mîzan û pîvek di dirêjbûna alema qebrê û berzexê da, hema ev te’elluqat in. Çiqas ew kêmtir bin, berzex û qebra mirov ronahîtir û firehtir e û, man û mijûliya mirov li wêderê kêmtir e; ji ber vê yekê alema qebrê ji ewliyayên Xwedê ra ji sê rojan pirtir nîne -gorekî gotina hinek ji riwayetan- ew jî ji ber wê elaqa tebî'î û te’elluqa cibillî ye.

Ji xirabiyên huba dinyayê û girêdana bi wê ve, ew e ku mirov ji mirinê ditirsîne. Û ev tirs ku ji huba dinyayê û te’elluqa bi wê peyda dibe, gelek xirab e; eva he ne ew tirsa ji qiyamet û qebrê ye, ku ji sifetê mumina ye. Û dijwartirîn dijwariya mirinê, hema tengaviya rakirina van te’elluqatan û, tirsa ji mirinê bi xwe ye. Cenabê muheqiqê xweparêz û tîjbînê mezin ê Îslamê, Seyyidê Damad di kitêba Qebesatê da -ku di babetê xwe da yek ji kitêbên kêm emsal e- dibêje: «Bila mirin, te netirsîne, çiko tehliya wê di tirsa ji wê da ye».[1]

---

1- Qebesat, p. 479. Bihar, c. 67, p. 191

Yek ji xirabiyên mezinê hub a dinyayê jî ew e ku, mirov paşda dide ji riyazeta şer'î, îbadet, kar û amel; aliyê tebîet bihêz têxe û tebîet neguhdariya ruh dike û teslîmê wê nabe û ezm û biryara mirov sist dike û îradeyê zeîf dike. Halhale yek ji sirrên mezin ên îbadet û riyazetên şer'î ew e ku, beden û hêzên tebî'î û aliyê mulkî bikeve pey ruh û biryara nefsê, û ew tesîrê deyne ser, û melekûta nefsê ser mulk bikeve; û bi awayek wereng ruh bibe xweyê qudret û serketinê; ku hema dema biryarek da, di cih da beden guhdariyê jê bike û bikeve kar û amel, ewê ji çi karî paşda bide, di cih da jê paş bikeve; mulkê beden û quwayê zahiriye yê mulkiye bikeve pey melekûtê û meqhûrê wê bibe; bi awayek wereng ku çi karî jê bixwaze pêk bîne. Û yek ji seratî û sirrên îbadetê bi zehmet, ev e ku ev mexsed di wan da pirtir tê cih, mirov bi rêka wan ve dibe xweyê biryarê û ser tebîet dikeve û mulk bindest dike. Û eger îrade temam bibe û biryar qewî û muhkem bibe, wê mulkê bedenê û quwayên zahirî û batinî yê wê, bibe wek melaîketên Xwedê ku, qet ne guhdarî ji wan çênabe û çi fermana ji wan ra be, guhdarî dikin û ji çi tiştî bên nehykirin, xwe jê vedidin, bê wî qasî ku bikevin zehmetê. Quwayê mulkê însan jî, eger bin emrê ruh bibin, wê tekeluf û zehmet ji nav biçe û, cihê xwe biguhêze bi rehetî û hêsaniyê û wê eqalîmên seb'e yên mulk teslîmê melekûtê bibin û hemû hêz, wê bibin karkerên wê.

Ey ezîz! Biryar û îrada qewî di wê alemê da gelek bi kêr tê. Mîzan û pîveka yek ji meratibên bihiştê, ku ji baştirîn bihişta ye; biryar û îrade ye ku heta mirov nebe xweyê îrada xurt û biryara bihêz, nabe ehlê wê bihiştê û, merteba wê ya bilind. Di hedîsê da hatiye ku dema ehlê bihiştê têda cih girtin, nivîsokek ji aliyê Xwedayê Mezin ve bi vê naverokê tê rê kirin ku: «Ev nivîsok, ji aliyê xurtê her daim heyî ve ye; Ez wereng im ku bêjim çi tiştî çêbe, çêdibe. Îro min tu jî welê kirî ku, tu bêjî çi tiştî çêbe, çêbe».

Binhêre ev çi meqam û padişahî ye; ev çi qudretek îlahî ye ku îrada wî dibe mezherê îrada îlahî: Tiştên ku ne yê lîbasê hebûnê ye, dike di ber da. Ev qudret û îradeya kartêker, ji hemû bihiştên

cismanî baştir û seratir e. Û kifş e ku, ev nivîsok ne ji xwe da û ne berhewa ye. Û kesê îradeya wî li pey xwestên heywanî bin û biryar mirî û temirî be, nagehê vê mertebê. Karên Heq Teala ne bêhûde ne: Di vê alemê da gorekî sîstema esbab û musebebata ye, di wê alemê da jî wereng e. Belkî ew alem hêj munasibtirê sîstema esbab û musebebata ye. Temamê alema axretê li ser munasibat û esbaban ava bûye: Nufûza îradê gereke ji vê alemê peyda bibe. Dinya mezre’e û zevî ya axretê ye û maddeya hemû xweşiyên bihiştî û nexweşiyên dojehê ye.

Nexwe di heryek ji îbadet û menasikên şer'îye da, xêncî ji wî qasî ku ewê bi xwe şikl û sûretek axretî ya melekûtî heye ku, pê wê bihişta cismanî û qesrên wê ava dibin û xizmetkar û hûrî tên hazirkirin -çawa ku rêketî ye digel burhan û hedîsan jî-, her weha heryek ji îbadetan eserekî di nefsê da çêdikin û kêm kêm îrada nefsê qewî û kamil dibe. Ji ber vê, îbadet çiqas bi zehmet bin jî, baş in û: «Efdelul e'mal ehmezuha - baştirînê karan, bi zehmetirînê wa ne». Mesela di zivistana sar da, dest kêşana ji xewê û mijûl bûna bi îbadetê Xwedê ve, ruh ser bedenê xurt dike û îradê qewî dike. Eva he eger di despêkê da hinekî zehmet û nexweş be jî, kêm kêm piştî despêkirinê, zehmet kêm dibe û guhdana bedenê ji nefsê zêde dibe, çawa ku em dibînîn ehlê wê bê zehmet evî karî dikin. Û eger em tenbeliyê dikin û ji me ra zehmet û girane ji ber wê ye ku em dest pê nakin, eger em çend carekî evî karî bikin, wê ji me ra rehet û xweş bibe. Ev jî heye ku ehlê wê pirtir ji xweşiya ku em ji lezetên dinyayî dibîn, xweşiyê ji wê dibin. Nexwe pê destpêkirinê me'mûlî dibe.

Evî îbadetî gelek fêkî û feyde hene: Yek eve ku şiklê wî îbadetî di wê alemê da ewqas sipehî ye ku nimûna wê di vê alemê da peyda nabe û em nikarîn tesewur bikin. Ya dî ev ku nefs dibe xweyê îrade û qudretê û evê bi xwe gelek netîce û desthat hene ku te yek ji wan guh lê bû. Û yek dî ew e ku kêm kêm mirov gel zikir û fikir û îbadet hevrê dike. Belkî mecaz, mirov nêzîkê heqîqetê bike û berê dil bide Malikul Mulûk û muhabeta bi ce-

mala mehbûbê heqîqî peyda bibe û hezkirina dil û girêdana wê bi dinya û axretê ve kêm bibe. Belkî eger cezeba rubûbî peyda bû û wez' û haletek hat pêş, nukta heqîqî ya îbadet û sirra waqi'î ya tezekur û tefekurê bêt dest û herdu alem ji çava bikevin û cilwe ya dûst tûza du bîniyê ji dil bibe. Û xêncî ji Xwedê kes nizane ka Xwedê wê gel bendeyê weha çi keramet û qencîhê bike. Çawa ku di riyazetên şer'iye û îbadet û menask û terka xwest û viyana da, biryar qewî dibe û mirov dibe xweyê îrade û biryarê, di bêemrî û gunehan da jî tebîet xurt dibe û kêmasî dikeve biryar û îrada mirov, çawa ku me hinekî jê xeber da.

**Vebir: Sirûşta kemalxwazî û işqa sirûştî bi cemalê**

Ji her xweyê wucdanekî ra ne veşartî ye ku mirov bi hesebê fitreta eslî û sirûşta zatî aşiqê kemala tam û mutleqe û dilê wî bi aliyê cemîl û kamilê tam ve ye, ev ji fitret û sirûştên îlahî ye ku Xwedê Teala new'ê mirovan ser wê yekê çêkiriye. Lê her kes gorekî hal û meqamê xwe kemalê di tiştekî da dibîne û berê dilê xwe bi wî alî ve dide: Ehlê axretê we zanîne ku kemal di meqamat û derecên axretê da ne û dil dayînê. Ehlullah di cemala heq da kemal û di kemala wî da cemal dîtine û dibêjin: «weccehtu wechiye lillezî feteressemawati wel erd»[1]. «we liye me'ellahî halun»[2] û huba wisal û işqa bi cemala wî hene. Û ehlê dinyayê çiko we fêhm kirine ku kemal di xweşiyên dinyayê da ne û cemala dinyayê di çavên wa da xemiliye, gorekî sirûştê berê xwe dane wê. Lê digel vê hemûyê çiko berê xwedana fitrî û işqa zatî bi kemala mutleq û reha ve girêdayê ye û pê ve girêdanên dî, erezî û ji pêka xeletiya di tetbîqê da ne, mirov çiqas bibe xweyê mulk û melekûtê û çiqas kemalatên nefsanî û xeznên dinyayî an padişahî û mezinahyê peyda bike, her daim şewqa wî zêde dike û agirê işqa wî geştir dibe. Mesela: mirovê xwest û viyan heyîn çiqas xweşî dest

---

1- En'am / 79

2- Erbeîna Meclisî, hedîsa 15-ê.

bikevin ewqas pirtir dilê wî diçê xweşiyên dî ku dest neketine û agirê şewqa wî ji gihana wan ra geştir dibe, her weha nefsa ku li pey riyaset û mezinahiyê ye, eger cihekî bindestê xwe bike berê wî dikeve cihek dî û eger erdê hemûyê bindestê xwe bike wê bixwaze ku berê xwe bide kurratên dî û bi aliyê wan ve bifire û ewan bindest bike. Lê rebenê jar, nizane berê fitretê li tiştek dî ye. Hemû hereketên cewherî û tebî'î û îradî û hemû berdanên dilî û meylên nefsî li cemala sipehî û rinda cemîlê mutleq û reha ye û ew bi xwe nizanin û evê muhabet û şewq û işqê ku buraqa mîracê û refirefa ûsûlê ye di cihek dî da bikar dibin û ne di cihê wê da ewê mehdûd û muqeyed dikin.

Welhasil, em ji mexsedê paşve man, mexsed ev e ku çiko mirov bi dilê xwe berê wî li kemala mutleq û bê qeyd e, çiqas ji xemla dinyayê berhev bike berê dilê wî pirtir dikeviyê. Û çiko wereng tê gihaye ku dinya û xemla wê kemale, hirs û viyana wî berew zêdehî diçe û işqa wî zêde dike û niyaza wî bi dinyayê zêde dibe. Bervajiyê ehlê axretê ku berê wan ji dinyayê dizivire û çiqas pirtir berê xwe bidin axretê xwest û meyla dilî ya wan ji vê alemê ra kêmtir dibe, heta ku ji dinyayê hemûyê bê îhtiyac dibin û dewlemendî di dilê wan da eşkere dibe û alema dinyayê û xemla wê qe bi tiştekî hesab nakin. Çawa ku ehlullah ji herdu aleman bê niyaz in û ji herduka paqijin û îhtiyaca wan bi dewlemend û ne muhtacê mutleqe û cilweya xenî yê bi zat bûye şikl û sûretê wan yê qelbî. afiyet be ji wan ra.

Nexwe naveroka hedîsa şerîf dikare îşare be bal wê ya me gotî ve, ku dibêje: «kesê sibeh û êvar serda bên û mezintirîn xema wî dinya be wê Xwedê feqîretiyê deyne nav du çavên wî da û karê wî têk bide û xêncî ji wê ya jê ra hatiye veqetandin jî dest wî nakeve. Û kesê lê bibe sibeh û êvar û mezintirîn xema wî axret be wê Xwedê dewlemendiyê bixe di dilê wî da».

Kifş e kesê ku berê dilê wî li axretê be wê meselên dinyayê karê wê yê dijwar ber çavê wî kêm û rehet bin û evê dinyayê cihê gu-

herîn û guhaztin û darut terbiya xwe bizane û guh nede xweşî û dijwariyên wê. Wê îhtiyacên wî kêm bibin ji dinyayê û ehlê wê. Belkî wê bigehê merteba bê îhtiyacîhê, vêca wê kar û barê wî ser hevda bên û serast bibin û dewlemendî ya zatî di dilê wî da çêbe. Nexwe çiqas tu bi çavê mezinahî û hezkirinê binhêrî vê alemê û dilê te pê ve bigirhê, gorekî merteba hezkirinê, wê îhtiyac û niyaz zêde bibin û feqîrî di zahir û batinê te da eşkere bibe û kar û barê te serheve neyê û têk biçe û dilê te bikeve qeleq, tezelzul, tirs, xemê û bi wî awayê tu dixwazî karên te pêşve necin, xwest û arzûyên te roj bi roj zêde bibin û xem û hesret ser te xurt bibe û bêhêvîbûn û şaşî bikeve dilê te. Çawa ku di hedîsa şerîf da îşare kiriye bal hinek ji van me'neya ve.

Ji Îmam Sadiq riwayet bûye: «kesê pê ve girêdana wî bi dinyayê ve zêde bibe, wê di wextê cudahiya ji wê da xem û hesreta wî zêde bibe».

Ebî Ye'fûr dibêje, min ji Îmam Sadiq guh lê bû got: «kesê dilê wî bi dinyayê ve bigirhê, wê sê tişt bimînin bi dilê wî ve: xemek bê xilasî; arzûyek ku nayê dest û hêvîdariyek ku qet nagihêtê».

Lê vêca ehlê axretê çiqas nêzîktirê axretê bibin dilxweş û geş dibin û berê wan ji dinyayê û ma fîha (ewa têda) dizivire. Û ser gotina hezretê Alî (a.s), eger Xwedê Teala ji bona wan ecel nedanîban bêhnekî jî di vê dinyayê da nediman.[1] Nexwe ew wek ehlê dinyayê di zehmet û nexweşiyê da nînin û di axretê da jî li nav behra rehmeta Xwedê da ne. Hêvî ew e Xwedê me û hewe di nav wan deyne.

Nexwe ey ezîz, niha ku te ev zanî ku ev hezkirin mirov ji nav dibe û îmana wî jê digire, dinya û axreta mirov pûç dike, baş bixebite û çiqas tu bikarî dilgirêdana bi vê dinyayê kêm bike û reh û rîşa hezkirinê sist bike û vê jiyana çend rojê bi tiştekî hesab neke û evan xweşiyên tevlî nexweşî, derd û belan kêm bizane û

---

1- Nehcul Belaxe, x. Hemmam.

alîkariyê ji Xwedê bixwaze ku alî te bike û te ji vê bela û nexweşiyê xilas kê û dilê te bi aliyê mala xwe ya hêjayî ve bide. «ewa li bal Xwedê baştir û xweragirtir e».[1]

1- Qeses / 60 û Şûra / 36

## HEDÎSA HEFTÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب عن عليّ بن إبراهيم، عن محمّد بن عيسي، عن يونس، عن داود بن فرقد قال: قال أبو عبد الله، عليه السّلام:

**«الغَضَبُ مِفتاحُ كُلِّ شَرٍّ. »**

Dawûdê kurê Ferqed dibêje, Îmam Sadiq (a.s) got: «Kerb û xezeb, kilîda hemû xirabiya ye»[1].

### Şîrove:

Lêkolê mezin Ehmedê kurê Muhemmed, navbangê bi Ibn Miskiweyh[2] di kitêba hêja ya «Teharetul E'raq» da gotinek heye ku naveroka wê ev e:

### Gotara Ibn Miskiweyh di te’rîfa xezebê da

Xezeb, di heqîqet da hereketek nefsanî ye ku pê wê, xûna dil ji tolgirtinê ra dikele; vêca dema ev hereket dijwar bibe, agirê xezebê geş dike û xûnê di qelb da dikelîne û reyên xûn û mêjiyê tijî dû û dûman dike, û ji ber wê aqil zeîf dibe. Û ser gotina hekîman

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 303

2- Navê wî Ehmed e û kurê Muhemmed e. Di salên 330-421-ê h. da jiyaye. Ew di hemû ilman da zana bûye, nexasima di tib û exlaqê da. Tertîbus Se'ade, Tehzîbul Exlaq, Tethîrul E'raq, Cawîdanxired, Adabul Furis wel Hind, Tecarubul Umem... ji kitêbên wî ne.

meseleya mirov di vî halî da wek şikeftekî ye ku li ber derê wê agir hilkin ku, dûyek tevlî agir ewê tijî bike û ji ber geşî û guriyê fîzfîz jê biçe ezmana, û vêca çare nemînê û temirandina wê bi zehmet bikeve. Û wisa lê be ku çi tiştî bavêjin ser da, bitemirînin; ew jî bibe maddeyek ji şewatê ra û ser agirê wê ve zêde bike. Di vî halî da, mirov ji duristiyê kor dibe û ji bihîstina şîret û we'zê ker dibe û di wî halî da heta we'z û şîret dibe sebebê zêdebûna xezebê û keliyana wê, di vî halî da mirov bêçare dimînê. Piştî wê dibêje: Buqrat[1] gotiye: Hêviya min ji gemiya ketiye ber tûfana dijwar, ku pêlên behrê yên wek çiyan ew girtine ber xwe, pirtir e ji wî yê xezeba wî fûriyî, çiko bi çi awayê heyî gemîvan wê gemiyê di vî halî da bisekinînin, lê dema nefs bikeve vî halê xezebê, qet çi çare jê ra nînin; çiko tu çiqas çarekî wek we'z û şîret, xweşikandin û zariyê bi kar bînî, her ser pêt û guriya agirê wê ve zêde dibe. Gotina wî xilas.[2]

**Vebir: Der heqê feydên quwe ya xezebiye da ye**

Bizane hêza xezebê, yek ji qenciyên mezinê Xwedê ye; ku bi rêka wê ve dinya û axret ava dibin û pê wê mirov û sîstema ayileyê tê parastin; her weha eserek girîng heye di şikl girtina medîne ya fazile û hevgirtina komê da. Eger ev hêza hêjayî, di heywana da nebûya, ji ber nexweşiyên tebîet, berevanî ji xwe nedikira û wê ji nav biçûya. Û eger di mirovan da tunebûya, xêncî ji vê, wê ji gelek pêşketin û kemalatan paşde bimaniya. Çawa ku kêmasî ya di qeydê da jî, ji exlaqên nebaş û kêmasî ya melekatan hesab dibe ku xirabiyên zehfî pê ve tên, wek: Tirs, sistî, tenbelî, teme', kêmtaqetî û xweragirî ya kêm -di cihên lazim da- û rehetîxazî, bêhalî û çûna bin barê zulm û rezîletiyê da, ku ji wî an ayileya wî

---

1- Buqrat di salên 460-377-ê pêşiya mîlada hezretê Îsa jiyaye. Ew di cezîra Kûs ya Yûnanê da hatiye dinyayê. Ji meşhûrtirîn feylesof û doktorê kevn e. Baweriya wî ew bû ku nexweşiyan du serkanî hene: Av û hewa.

2- Tethîrul E'raq, p. 162.

ra tên pêş û bê xîretî û sist himetî. Xwedê di sifetê bawerdaran da kerem dike: «Eşeddu alel kuffar, ruhemau beynehum».[1]

Emrê bi me’rûf û nehya ji munker û cih anîna hudûd û te'zîratan û umûrên dî yên dînî û aqlî, hema tenê li ber sîbera vê quwe ya hêja ya xezebiye pêk tên. Nexwe ew ên goman kirine temirandina quwe ya xezebiye û kuştina wê ji kemalat û me'aricên nefsê ye, ketine xeletek mezin û ji hedê kemal û îtidalê bêxeber in. Rebenan nizanin ku Xwedayê Teala ev hêza hêjayî di hemû heywanatan da bêhûde çênekiriye û ev hêz û quwe di benîadem da kiriye sermaya jiyana mulkî û melekûtî û kiriye kilîda xêr û bereketan. Cîhada digel dijminên dîn û parastina ayilê û berevaniya can, mal, namûsê û cîhada gel nefsê ku ji dijmintirînê dijminê mirova ye[2] xêncî pê vê hêza hêjayî çênabe. Pêşîgirtina ji hedderiyê û parastina hed û sînoran û dûrkirina eziyet û azarê ji kom û komel û şexsan, pê vê hêzê çêdibe. Ji ber vê yekê ye ku hekîman ji netemirîn û bêhal nebûna wê ra hinek derman peyda kirine. Û ji hişyarkirin û bizava wê ra hinek dermanên ilmî û amelî hene, wek: Kirina karên girîng û bi xeter û çûna meydana ceng, şer û cîhada gel dijminê Xwedê, dema wextê wê bêt. Heta der heqê hinek mutefelsifan da gotine ku: Diçûya cihên tirsê û li wêderê dima û xwe davêta cihên pir xeter û di wextê telatum û hêçî ya behrê da siwarê gemiyê dibûya, da ji tirşe, pelîşokî û sistiyê xilas bibe.[3] Welhasil hêza xezebiye di zatê mirov da hatiye danîn, her çend di hinekan da temirî û bêhal e, wek agirê di bin xweliyê ve. Eger mirov di xwe da halê sistî û bê xîretiyê îhsas kir, gereke pê bikarbirina dijê wê, li dermankirinê bigere û ji wî halî derkeve û nefsa xwe mutedil bike, ku ew cesaret û şucaet e û ji melekatên baş û sifetên qenc e. Em ê di pey ra jê biaxivin.

---

1- Feth / 29: “Ji kafirin ra dijwar û nav bi xwe da dilovan in”.

2- Îşare ye bal hedîsa: “E'da 'eduwwuke nefsuk elletî beyne cenbeyk”.

3- Tehzîbul Exlaq, Ibn Miskiweyh, p. 172

**Vebir: Der heqê xirabiya zêdegavî ya di xezebê da ye**

Wek çawa halê tefrît û kêmasî ya di îtidalê da ji sifetên rezîl û sebebê xirabiyên zehfî ye, ku te hinek jê guh lê bû, bi wî awayî hedê îfrat û zêdegaviya ji hedê îtidalê jî ji exlaqên rezîl e û xirabî pê ve tên. Der heqê xirabiya wê da, ev hedîsa şerîfa Kafiyê bes e ku Îmam Sadiq (a.s) ji Resûlê Xwedê (s.a.a) neqil dike ku got: «Çawa ku sirke hingivê xirab dike, her wereng, xezeb jî îmanê xirab dike».

Çêdibe ku xezeb mirov bigirê û ewqas dijwar bibe ku berê xwe ji dînê Xwedê bizivirîne û ronahiya îmanê bitemirîne û agirê wê baweriyên durist bişewitîne û bikeve nav kufrê ra û li helakê biçe û hingê hişyar bibe ku êdî poşmanî feydê nedê. Û xezeb, hema dikare ew bizûtka agir be di dil da, ku Îmam Baqir (a.s) kerem dike: «Ev xezeb, bizûtkek ji agirê şeytan e ku di qelbê ademî da hildibe». Yanî çêdibe şiklê wê di wê alemê da şiklê xezeba îlahî be. Çawa ku Îmam Baqir (a.s) di hedîsa şerîfa Kafiyê da dibêje: «Di Tewratê da di nav wan sirrên ku Xwedayê ezîz û celîl ji Mûsa ra gotine, hatiye ku: Xezeba xwe ragire der heqê wî yê min tu ser wî xurt kirî, da ez jî xezeba xwe ji te bidim paş». Bizane çi agirek ji agirê xezeba îlahî dijwartir nîne. Çawa ku di hedîsê da ji hezretê Îsa kurê Meryemê (selam li herduka bin) hatiye gêran: Hewariyan jê pirsîn: Ji her tiştî dijwartir çi ye? Kerem kir: «Xezeba Xwedê ye». Gotinê: Em çawa xwe jê biparêzin? Got: «Pê xezeb nekirinê».

Nexwe me'lûm bû ku xezeba Xwedê ji her tiştî dijwartir e û agirê xezeba wî bi şewatir e û sûretê xezebê di vê alemê da sûretê xezeba îlahî ye di wê alemê da. Û çawa ku xezeb ji dil dertê, belkî agirê xezeba Xwedê jî ji navde ve dest pê bike û pêta wê ya dijwar di çav ,guh û ziman... ra derkeve. Belkî jî çav, guh û ziman... dergeh bin bi aliyê dojehê ve, vedibin û agirê dojeh a amelan eşkereyê beden a mirov li ber xwe bigirin û berew navde biçin. Nexwe mirov nav van du dojehan da di tengî û ezab da ye,

ku yek ji batin dest pê dibe û pêta wê bi rêka mêjî ve dikeve nav bedenê; û ya dî şiklê karên pîs û tecesuma amela ye û ji zahir bi aliyê batin ve diçe. Û Xwedê zane kanê ew çi tengî û zehmet e! Tu goman dikî xurtbûna dojehê û dagîrkirina wê, wek wê ye ku tu fikir dikî? Dagîrkirina vêderê hema ya zahirî û eşkere ye, lê dagîrkirina wêderê hem di zahir û hem batin da ye. Û eger Xwedê nekirî, şiklê xezebê di mirov da bibe melekeyek cihgirtî, êdî di vê alemê da tiştek wek wê, ji xwe nayê dîtin; çiko hingê dirindahiya mirov gel ya tu yek ji dirindeyan nayê qiyas kirin. Çawa ku ji aliyê kemalê ve çi mewcûdek hemberê vî mewcûdê ecêb nabe [însan], ji aliyê kêmasî û wesfên xirab û rezîl ve jî çi mewcûdek gel wî [însan] nayê qiyas kirin. «Ulaike kel en'am…».[1] Der heqê wî da hatiye û der heqê dilreqiya dil ê beşer da ye: «Fe hiye kel hicareti ew eşeddu qesweh».[2]

Eva te guh lê bû, xirabiya xezebê ye, hingê ku fesad, guneh û xirabiyên dî jê çênebin. Lê gelek dûr e û gorekî adetê çênabe ku di halê dijwariya xezebê da, mirov ji guneh û mehlekên dî xilasiyê peyda bike.

Mumkin e ku ji ber deqîqeyekî xezebê û dijwariya agirê vê bizûtka şeytanî, mirov bikeve mehleka ji navçûnê; Xwedê nekirî, xirabiya muqedesatan bêje; nefsekî mezlûm bikujê û bê qîmetiyekî bike û dinya û axreta xwe pûç bike. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da Îmam Sadiq (a.s) ji bavê xwe neqil kiriye ku got: «Çi tişt ji xezebê dijwartir e? Xezeb mirov digire, vêca nefsa ku Xwedê ew muhterem kiriye, dikuje û tuhmeta li jina muhsine û pak dide».

Pirtirîn karên mezin û ecêb, ji ber xezeb û guriya agirê wê qewimîne. Dema mirov di halê selametiya xwe da ye, gereke ji ber halê xezeba xwe bitirsê û eger ev agirê bi şewat pê ra heye, gereke ji dûrbûna ji wê ra çarekî bibîne û ewê derman bike. Bila

1- E'raf / 179: "Ew wek dewara ne, belkî li rê windatir".

2- Beqere / 74: "Piştî wê, dilê hewe req bû; wek koç lê hat, belkî hêj reqtir".

bifikire ku ew hêza ku Xwedê Teala ji parastina sîstem a alemê ra û mana new' û şexs, terbiyet û hevgirtina ayilê û ji parastina hed û huqûqan ra merhemet kiriye û pê wê gereke sîstema zahir, batin, alema xeyb û şehadeyê durist bibe; eger mirov bervajiyê wê û di dijê xwesta Heq Teala da bi kar bibe, çiqas xiyanet kiriye û musteheqê çi lome û cezayê ye! Û çiqas zalim û nezan e ku, ne hema emanetê Heq Teala li cihê wê nezivirandiye, belkî ew di rêka dijminî û xezebê da bi kar biriye. Kifş e ku mirovê weha, ji ber xezeba îlahî xilasî jê ra nîne. Piştî wê bila di xirabiyên exlaqî û amelî yên ku ji xezebê dertên da, bifikire û eserên evî exlaqê nedurist bide ber çav, ku çêdibe heryek ji wan, mirov di dinyayê da bixe zehmetê û di axretê da ezab ser mirov da bîne.

Lê vêca xirabiyên exlaqî, wek rik û kîn hildana ji bendeyên Xwedê, ku jêderê vî exlaqî ye, carna jî dibe sebebê kîn hildana ji enbiya û ewliyan, carna jî pê wê, kîneya ji xweyê nîmetan, Xwedayê Teala dikeve dil! Pîsatiya wê me'lûm e ka çiqas e. Em ji ber xirabiya vê nefsa hêç ku eger bêhnekî serî lê bêt berdan, xweyê xwe zelîl dike, hana xwe ji Xwedê ra dibin.

Û wek hesedê, ku di şerha hedîsa pêncê da te hinek ji pîsatiyên wê guh lê bû, û xirabiyên dî jî.

Xirabiyên amelî, ji xwe nayên jimartin; belkî di wî halî da kufriyekî bêje, an ne'uzu billah sebba enbiya û ewliyan bike, an hetika hurmetekî bibe û nefsek pak û paqij bikuje, an binemal û ayileyekî xirab bike, an xefekî eşkere bike û perdeyekî bidirîne; û gelek ji xirabiyên dî, ku di halê geşbûna vî agirê malwêranker da, ji mirov çêdibin. Nexwe mirov dikare ji vî exlaqî ra bêje: Koka nexweşiyên nefsanî û kilîda hemû xirabiyan. Û di beranberê wê da jî daxwarina xezebê ye, ku komgeha hêjan û başiya ye, çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatiye:

Îmam Sadiq (a.s) dibêje, min ji bavê xwe bihîst got: «Mirovek çolî, hat bal Pêxember (s.a.a) û gotê: Ez li çolê rûdinêm, vêca xeberdanek kurt û pirme'ne ji min ra bêje. Pêxember (s.a.a) gotê:

«Ez emrê te dikim ku xezeb te negire». Mêrikê çolî, sê caran ev gotin ji Resûlê Xwedê ra ducare kir û piştî hingê guhê xwe ser xwe dada û ji xwe ra got êdî ez jê napirsim, Pêxemberê Xwedê ji başiya min pê ve naxwaze». Îmam Sadiq (a.s) dibêje, bavê min her weha digota: «Çi tişt ji xezebê dijwartir e? Xezeb mirov digire, vêca kesekî dikujê ku rijandina xûna wî heram e û buxtanê li jina paqij dide».

Piştî ku mirovê aqil di halê sukûneta nefsê û temirîbûna xezebê da, xirabiyên xezebê û başiya daxwarina xezebê, da aqilê xwe, lazim e ji bona xwe qet'î bike ku bi çi kol û halê heyî, bi çi zehmetê be, agirê xezeba xwe bitemirîne û, ji dilê xwe hilke, û dil ji vê tarîtî û qirêjê bişo. Ev kar, pê hinekî xebata bervajiyê xwesta nefsê, û fikirîna di aqibeta karan da û şîretkirina nefsê çêdibe. Çawa ku mirov dikare hemû melekatên xirab û exlaqên pîs ji nefsê bişo û derîne, û hemû exlaqên qenc û melekatên hesene di dil da deyne û bixe nav ruh ra û pê wan ruh bixemilîne.

**Vebir: Der heqê îlac û derman kirina xezebê da ye**

Ji dermankirina xezebê di halê fûrînê da jî, çareya ilmî û amelî heye. Rêka ilmî ew e ku mirov di wa tiştên hatine gotin da, bifikire ku, ew bi xwe jî ji rêkên dermankirina amelî ye di vî halî da. Emma îlaca amelî: Ya muhim berzivirandina nefsê ye di destpêka peydabûn a wê da; çiko ev hêz jî, wek agir kêm kêm xweş û geş dibe, heta berew zêdahî diçe û tenûra wê germ dibe û pêta wê xweş dibe û îxtiyarê ji mirov digire û ronahiya aqil û îmanê û çira ya duristiyê ditemirîne û mirov bêçare û zelîl dike. Gereke mirov hay jê hebe, heta pêta wê geş nebûyî, bi awayekî berê wê bizivirîne. An çûna ji wî cihê ku bûyî sebebê çêbûna xezebê û an jî pê guherandina wî halê ku ew têda; mesela, eger runiştiye, rabe û eger li piya ye, rûnê, an jî bi zikrê Xwedê ve mijûl bibe -hinekan zikrê Xwedê di halê xezebê da ferz zanin- an jî xwe bi karên dî ve mijûl bike. Di her hal û karî da, di destpêkê da pêşîgirtina li wê, sehl û rehet e. Û ev, du desthat jê ra hene:

Yek ev e ku, di wê bêhnê da, nefsê sakin û rehet dike û pêta xezebê ditemirîne; ya dî ew e ku dibe sebebê mu’alice û dermankirina binyatî ya nefsê. Eger demekî mirov hay ji xwe bimîne û gel nefsê bi vî awayî muamele bike, bi temamî wê hal bêt guherîn û berew îtidalê biçe. Di hedîsa şerîfa Kafiyê da, bi hinek ji van me'na îşaret hatiye kirin. Îmam Baqir (a.s) kerem kir: «Bi rastî ev xezeb, bizûtkek agir e ji şeytan; ku di dilê ademî da hildibe; dema xezeb, yek ji hewe digire, çavê wî sor dibin û reyên stûyê wî diwerimin û şeytan dikeve têda. Vêca eger kesek ji hewe der heqê xwe da ji wê yekê tirsiya, bila rûnê ser erdê, çiko hingê pîsatiya şeytan ji wî diçe».

Rawî dibêje li bal hezretê Baqir (a.s) behsa xezebê hat kirin, ewî kerem kir: «Xezeb, kesekî digire, vêca razî nabe heta biçe dojehê (yanî xezeba wî nasekine heta ewî bibe dojehê). Vêca heçî kesê ji hineka ket xezebê, eger rawestayî ye, bila di cih da rûnê; çiko ew kar, pîsatiya şeytan ji nav dibe. Û heçî kesê ji mirovê xwe xezebgirtî bû, bila xwe nêzîkê wî bike û destê xwe pê ve bîne; çiko dema mirovê mirov, desta ser mirov da bîne, rehet dibe».

Ji vê hedîsa şerîf, du dermanên ilmî ji demê eşkerebûna xezebê ra tên dest: Yek giştî, yanî rûniştin û guhaztin û guherîna hal, çawa di hedîsa dî da hatiye, eger rûniştî xezebê girt, bila rabe. Û bi rêka ammeyê ve riwayet bûye: Dema Resûlê Xwedê (s.a.a) xezebê digirta, eger ser piya bûya, rûdinişta û eger rûniştî bûya, xwe ser piştê dirêj dikira û kerba wî dataniya. Û ya dî, îlaca taybet der heqê erham û eqreban da, ku eger eqrebayek der heqê mirovê xwe da xezebê girt, bila destê xwe pê ve bîne, wê xezeba wî dakeve. Ev mu'alica xezebgirtî ye ji wî bi xwe ra.

Lê vêca eger hinek dî bixwazin di halê xezebê da ewî mu’alice û derman bikin, eger di destpêkê da be, bi awayek ilmî an amelî yê hatiye gotin, çêdibe çare jê ra bêt dîtin, lê eger dijwar û pêta wê geş bû, şîretkirin netîceyek bervajî dide. Û îlaca wê di vî halî da gelek zehmet e, îlla bi tirsandina kesekî ku hesabê jê dibe û

jê ditirse. Çiko eşkerebûna xezebê di beranberê wa kesan da ye ku mirov xwe ji wan xurtir bibîne an kêmê kêm xurtiya xwe qasî wan bibîne, lê di beranberê yê ji xwe xurtir da, xezeb eşkere nabe, belkî keliyana xûnê di dil da dibe sebebê guriyek navdeyî û di batin da dimîne û tê zindankirin û dibe kul, xem û di dil da dimîne. Nexwe îlaca halê dijwariya xezebê û fûrîna wê, karek gelek bi zehmet û dijwar e. Xwedê me jê biparêze.

**Vebir: Der heqê îlaca xezebê da ye bi rakirina sebeban**

Ji mu'aliceyên esasî yên xezebê, hilkirin û deranîna madda wê ye; bi rakirina sebebên ku ewê geş dikin. Û ew gelek in ku em ê ji hineka biaxivin ku munasibê vê kitêbê ne.

Yek ji wan huba nefsê ye, ku ji hezkirina mal, meqam, mezinahî û berfirehkirina qudretê çêdibe, bi awayek giştî evên he dibin sebebê geşkirina agirê xezebê. Çiko ev, li bal xelkê gelek muhim in û di dilê wan da cih girtine, vêca eger piçekî raber bibin an îhtimala rabûn û raberiyê bêt dayîn, xezeb tê wî digire û êdî nikare xwe kontrol bike û teme', kulbûtî, hirs û xirabiyên dî ku ji hezkirina nefs û meqam çêdibin, di dilê wî da cih digire û hefsar ji dest wî dertîne û karê nefsê ji destê aqil û şer'ê distîne. Lê eger hezkirina wî, ne dijwar be, kêmtir ehemiyetê didiyê û nefs, sakin û rehet dibe û mirov bê zehmet li beranberê nexweşiyan da sebir dike û bê cih û zêdeyê ji hed nakeve xezebê. Û eger hezkirina dinyayê ji dilê wî hat hilkirin û ev madda fasid kokbir bû, wê hemû mefasid û xirabî ji dil derkevin û koç bikin û hemû exlaqên qenc û baş bikevin nav memleketê ruh da û cih bigirin.

Sebebek dî ku xezebê hiltêxe, ew e ku mirov xezebê û xirabiyên wê, ku ji mezintirîn pîsatî û rezîletiya ye, ji ber cehl û nezaniyê kemal hesab bike û goman bike ku ji başiya ye. Çawa ku hinek nezan ewê, cesaret û şuca'et, şehamet û mezinahî hesab dikin û pesnê xwe didin û medhê xwe dikin ku me weha weha kir. Û şuca'et û cesaretê, ku ji mezintirîn sifetê bawerdara ye û ji sifetên baş e, gel vî sifetê muhlik û pîs têkel dikin.

Niha gereke bêt zanîn ku cesaret tişteke xêncî ji wê; mûcibat û mebadî û eser û taybetî yên wê, ji yên vê rezîlê cuda ne. Mebde û jêderê şuca'etê, quweta nefs û sukûneta wê, îtidal û îman, kêm zanîna dinyayê û xemla wê ye. Lê xezeb ji zeîfiya nefsê û qeleq û tezelzula wê û sistiya îmanê û neduristiya mezaca ruh û hezkirina ji dinyayê û muhim zanîna wê û tirsa ji dest dana xweşiyên nefsanî çêdibe. Ji ber vê yekê, ev exlaqê pîs, ji zilama pirtir di jinan da heye. Û şuca'et û cesaret bervajiyê wê ye. Û kesên exlaqpîs ji yên başexlaq zûtir dikevin xezebê; çawa ku tê dîtin bexîl ji yên dî zûtir xezebgirtî dibe û xezeba wî dijwartir e; eger mal û menalê wî bikeve ber te'eruzê.

Ev der heqê sebeb û mebadiyên şuca'et û xezebê. Vêca di eseran da jî ne wek hev in: Mirovê xezebgirtî di halê dijwariya xezebê da wek dînên hêç û heywanên dirinde û har, bê mulaheza di karan da û bê fikirkirin, hucûm û hêrişê dibe, kar û amelên bê usûl û pîs jê çêdibin, hay ji ziman, dest, pî û endamên xwe nîne; ewqas çav, lêv û devê xwe bêmerês, kirêt dike û miqamoka ji xwe çêdike ku, eger di wî halî da aynekî bidin dest wî û ew wî halê xwe bibîne, wê ji ber kirêtiya rûyê xwe xecl û şermende bibe. Hinek ji yên ev exlaqê rezîl di wan da heyî, ji heywanên bê şu'ûr, heta ji tiştên bê can jî dikevin xezebê û eger kar û barên ne li ser meyla wan bên pêş, dijûn û xeberên pîs dibêjin hewa, erd, berf, ba, baranê û hemû tiştî. Carna ji qelem, kitab, kase û cerik di'enirin û kerbê wan tê û ewa dişkînin û qetqet dikin.

Lê mirovê cesûr û şuca, di van karan hemûyan da bervajiyê wî ye û karên wî bi fikir û bi pîveka aqil û sukûneta nefsê ne; di cihê xezebê da xezeb ewî digire û di cihê nermiyê da nerm e, ne werenge ku hertiştek ewî rake ser hêlîpepana û xezebî bike. Di wextê xezebê da qasê lazim xezebê dike, tolgirtin û heyf hildana wî, gorekî aqil û ji hev qetandinê ye. Zane ka wê heyfê ji kî hilîne, qeyde, qas û çawaniya tolgirtinê zane; fêhm dike ka gereke çi kesî efû bike û lêbibore. Di wextê xezebê da hefsarê aqil ji dest wî dernakeve, xeber û karên pîs û ne di cih da jê çênabin. Û hemû

karên wî bi mîzan, pîvek û kêşeka aqil, şer'î, edl û însafê ne. Bi awayek wereng dike ku paşî ra poşman nebe.

Nexwe mirovê fêhma, çênabe ku ferqê nexe navbera van herdu exlaqan da û xelet bibe, ku yek ji wan, exlaq û wesfê enbiya û ewliya û bawerdara ye û ji kemalatên hêjayî yê nefsanî ye û ya dî ji sifetên şeytanî û weswesa xennas û rezîlên nefsanî û kêmasiyên dilî ye. Lê perda cehl, nezanî û hicaba huba dinyayê û nefsê, çav û guhê mirov kor û ker dike û mirova li helakê dibe.

Ji xezebê ra sebebên dî jî gotine, wek: Ucb, fexr, kibr, xirecir, cirekêş, leyistok û yarî... ku jê xeberdana wan, wê bibe sebebê dirêjiya gotin û melaleta hal. Û belkî zêdetir an hemûyê wan bi wasite an bê wasite li van du gotinên ku me gotin bizivirin.

## HEDÎSA HEŞTÊ

بسندى المتّصل إلى محمّد بن يعقوب عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن النّوفلى، عن السّكونى، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال: قال رسول الله صلّي الله عليه و آله:

**«مَنْ كانَ فى قَلبِه حَبّةٌ مِن خَرْدَلٍ مِنْ عَصَبِيَّةٍ، بَعَثَهُ الله يَومَ القِيامَةِ مَعَ أعْرابِ الجاهِلِيَّةِ.»**

Sekûnî ji Îmam Sadiq (a.s) neqil kiriye ku got: Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «Kesê qas liba xerdelê esebiyet di dilê wî da hebe, roja qiyametê wê Xwedê ewî gel Erebên cahilî rake».[1]

### Şerh û şîrove:

Di Farsiya kevin da ji xerdelê ra ispendan gotine û niha jê ra dibêjin xerdel. Ew dermanek meşhûr e ku gelek xasiyet jê ra hene. Meşme'êjêçêdikin.[2]

Esebî keseke ku li ser zulm û neheqiyê alîkariya mirovên xwe bike. Û usbe, mirovên ji aliyê bav ve ne, çiko ew li dora wî ne û ew bi wan xurt dibe. Esebiyet û te'esub, piştîvanî û alîkirin û berevanîkirin e. Eva hatî gotin xeberdanên ehlê luxet bûn.

Ez ê jar dibêjim: Esebiyet yek ji exlaqên batinî yê nefsaniye ye ku esera wê piştvanî û berevaniya ji famîl û eqreba ye û ew ên pêwend û bi vegirêdanek ya wan heyî, çi pêwenda dînî û mezhe-

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 308

2- Pîneyek tenik ji penbû ku hinek zemq pêra didin û dermanekî lê dikin ku li ber germayek kêm, xasiyeta zeliqîna bi çerm ve peyda dike.

bî û meslekî, çi jî pêwend û girêdana welatî, av, axî û çi xêncî wê, wek girêdana hevkariyê, seydatî û feqatiyê..., ev ji exlaqên fasid û ji melekatên rezîl e, ku gelek exlaq û karên xirab jê çêdibin. Ew bi xwe jî tiştek nebaş e, eger çi ji heqiyê ra be an di karê dînî da be û mexsed ne eşkerekirina heqiyê be, belkî mexsed serketina ser xelkê be. Lê eşkerekirina heqiyê û berfirehkirina heqîqetê û sabitkirina gotinên durist û piştîvaniya ji wê, ne esebiyet e an jî ne esebiyeta kirêt û xirab e. Mîzan û pîvek ji hev qetandina xerez û mexsedan da qedema nefse, şeytan, heq û Rehman e. Bi gotinek dî: Mirov di esebiyetên xwe û di berevaniyên xwe da, ku ji mirovên wî ra jê çêdibin, an mexseda wî hema tenê serxistina heqiyê û mirandina batil e, ev esebiyeta memdûh e û berevaniya ji heq û heqîqetê ye û ji baştirîn sifetên kemala însanî û ji exlaqê pêxembera û weliya ye, nîşana wê jî ew e ku heq li kîjan alî be, berevaniyê ji wî alî bike, gerçî pêwend û girêdanek bi wî ve tunebe û heta dijminê wî be. Kesê weha be, ew berevanê heqîqetê ye û di nav koma lagirên qencîhê û piştîvanê medîneya fazile da tê hesabê û endamê salihê komelê, avaker û duristkerê xirabî yên cemaetê ye. Û eger nefsaniyet û qewmiyetê ew rakir û bizivand ku, eger neduristiyek ji mirovên xwe dît, gel wan hevrê bibe û piştîvaniyê ji wan bike, ew ê weha, xweyê wê meleka xebîse ya esebiyeta cahiliyetê ye û ji endamên fasidê komelê ye û di nav koma Erebên cahilî da tê hesabê -ew komek bûn ji Erebên çolî yên pêş Îslamê da, di zemanê tarîtî, cehl û nezaniyê da û ev exlaqê pîs di wan da bihêz bû, belkî jî ev exlaq di nav qebîlên Ereban da pirtir hebû xêncî ji wa yên nûra hîdayetê peyda kirin ji qebîle yên dî-. Çawa ku di hedîsa şerîf da ji Îmam Alî (a.s) hatiye gêran ku: «Xwedê Teala wê şeş koman ji ber şeş tiştan ezab bide: Ereban bi esebiyetê, dihqanan bi kibrê, emîran bi zulmê, feqîhan bi hesedê, taciran bi xiyanetê û ehlê ristaqê bi nezaniyê».

### Vebir: Mefsedeyên esebiyetê

Ji hedîsên Ehlê Beyt a pak û paqij, tê fêhmê ku exlaqê esebiyetê ji muhlikat û mûbiqata ye û dibe sebebê aqibeta xirab û derketina

ji îmanê; û ew, ji exlaqên pîs ên şeytan e. Di Kafiyê da ji Îmam Sadiq (a.s) hatiye ku: «Kesê te'esubê bike an te'esub jê ra bêt kirin, bê şik toqa îmanê ji stûyê wî vebûye». Yanî wê ji îmanê derkeve û jê cuda bibe. We diyar e ku şirîkatiya wî yê ku te'esub jê ra tê kirin, gel wî yê te'esubê dike di cezadanê da ji ber wê ye ku pê razî ye. Çawa ku di hedîsê da hatiye: «Ew ê bi karê komekî razî be, ji wan hesab dibe»[1]. Lê eger pê ne razî be û ji exlaqê wan mutenefir be, nakeve ber hedîsê.

Ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye ku got: «Kesê te'esubê bike, wê Xwedê agir bi serê wî da bike».

Hezretê Îmam Alî yê kurê Husêyn (a.s) got: «Xêncî ji hemiyet û piştîvaniya Hemze yê kurê Ebû Talib hemiyetek naçe bihiştê û ew hingê bû ku Îslam qebûl kir û ji bona berevanî ji pêxember, xezebgirtî bû». Behsa musilmanbûna Hemze bi çend awayan hatiye gêran, ku niha ji mexseda me der e.[2]

Welhasil, kifş e ku îman; nûra îlahî û xel'eta xeybiye ya Heq Teala ye ji bendeyên xalis û muxlis ra, dijatî heye gel evî exlaqê ku heq û heqîqetê pêpez û binpî dike, rastî û duristiyê têxe bin simên cehl û nezaniyê da. Eger xwexwazî û famîlperestî û esebiyeta bê cih ya cahilê ayneya dil tarî û perde bike, ronahiya îmanê di wê da şewq û ronahî nade û ew dil wê nebe xelwetgeha taybet ya Xwedê. Dilê wî kesî dikeve ber ronahiya îman, zanînê û werîsê qahîmê îmanê dikeve destê wî kesî ku li pey heqîqet û zanîna ye û xwe bi çarçovên dînî û qanûnên aqlî girtiye. Û bi aqil û şer'ê bikeve bizavê û çi adet û exlaqek ewî ji rêka durist xwehr neke. Hingê mirov dikare de'wa Îslam û îmanê bike ku teslîmê heqîqetan be û li ber wan şikestî be û mexseda wî her çiqas mezin be jî, fena bike di mexsedên xweyê nîmetê da û xwe û îradeya xwe fedayê îradeya mewlayê heqîqî bike. Bê goman ew ê weha be,

1- Nehcul Belaxe, h. 146

2- Binhêrin: Usdul Xabe c. 2, p. 146 û Îstî'ab, c. 1, p. 271

wê ji esebiyeta cahilî xilas bibe û berê dilê wî bikeve heqîqetan û perdên stûr ên nezanî û berevaniya ne heq nakevin ber çavê wî. Û di meqamê pêkanîn û gotina heqiyê da, wê hemû girêdanên xwe binpî bike û wê hemû mirovaniyan û adetan li ber weliyê nîmet, bike qurban. Û eger esebiyeta Îslamî bikeve ber esebiyeta cahilî, wê esebiyeta Îslamî û heqxaziyê pêş bixe.

Mirovê gel heqîqetan nas, zane ku hemû te'esub, pêwend û girêdan umûrên 'erezî yên zaile ne, xêncî wê girêdan û pêwenda ku di navbeyna xaliq û mexlûq da û usbeya heqîqiye ku emrê zatî yê xeyrê qabilê zewal e û ji hemû pêwenda qewîtir û ji hemû heseb û neseban seratir e. Di hedîsê da hatiye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Roja qiyametê hemû heseb û neseb xêncî ji heseb û neseba min tên birîn». Kifş e ku heseb û neseba wî hezretî ruhanî ye û dimîne û ji hemû esebiyetê cahilî dûr e. Ew heseb û neseb a ruhanî di wê alemê da eşkeretir û kemala wê ronahîtir e. Ev pêwendên cismanî yên mulkî ku gorekî adetên beşerî ne, bi tiştek kêm tên birin, qutkirin û qet çi yek ji wan di alemên dî da qîmet jê ra nîne, xêncî ku pêwend di bin sîstema melekûtî ya îlahî da û bi mîzana şer'î û aqlî be, ku êdî ewê qet birîn û qutbûn nîne.

**Vebir: Der heqê sûretê melekûtî yê esebiyetê da ye**

Di şîrovekirina hinek ji hedîsên borî da hat gotin ku: Mîzan di sûretên melekûtî û berzexî û qiyametê da melekat in. Û ew alem cihê eşkerebûna sultanê nefsê ye û beden ne guhdariya wê nake. Çêdibe di wê alemê da mirov ser şiklê heywanatan an bi şiklê şeytan mehşûr bibe. Û çêdibe ev hedîsa şerîfa ku me şerh kir, îşare be bal vê me'nê ve: «Kesê qas liba xerdelê esebiyet di dilê wî da hebe, Xwedê wê ewî gel Erebên cahilî rake ber heşrê».

Mirovê xweyê vê rezîlê, dema ji vê alemê bar bike, belkî xwe bi şiklê yek ji Erebên cahilî bibîne ku ne îman bi Xwedê Teala heye, ne bawerî bi pêxemberî û risaletê heye. Çêdibe ew bi xwe nezane ku di dinyayê da xwe bi eqîda heq nav dida û di silkê umeta

Resûlê Xatem da bûye. Çawa ku di hedîsê da hatiye: «Ehlê dojehê navê Resûlê Xwedê ji bîr dikin û nikarin xwe bidin naskirin, xêncî dema Xwedê bixwaze ewa xilas bike». Gorekî hinek hedîsan, çiko ev exlaq taybetê şeytan e, belkî Erebên cahilî û mirovên ku esebiyeta cahilî heyîn, ser şiklê şeytan bên heşirkirin. Di hedîsa Usûla Kafiyê da Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Melaîketa goman dikira şeytan ji wa ye, di ilmê Xwedê da ew bû ku ne ji wa ye. Vêca bi hemiyet û esebiyetê, ewa di dilê wî da deranî û got: Te ez ji agir çêkirim û Adem ji heriyê».

Nexwe ey ezîz, bizane ev exlaqê xebîs û pîs ji şeytan e û qiyasa batila wî mel'ûnî ji ber vê perda stûr bû; ev perde heqîqetan hemûyan li ber mirov winda dike û hemû pîsatiyan sipehî dike û qencî yên xelkê li ber mirov kirêt dike û me'lûm e ku karê mirovê ku tiştan wek çawa heyîn nebîne, wê bigehê kûderê. Xêncî ji wê jî, hema ev rezîlahe bi xwe, mirov li helakê dibe û serkaniya gelek ji rezailên nefsanî û mefasidên exlaqî û kiryarî ne, ku behsa ji wan melaletê tîne.

Nexwe mirovê aqil, ku ev mefsede ji vî exlaqê fasid dîtin û bi şahidiya Resûlê Ekrem û binemala wî zanî ku, xweyê vî exlaqê pîs dojehî ye, gereke li rêka derman û îlacê bigere û eger Xwedê nekirî, qas liba xerdelê ji vî exlaqê pîs di dilê wî da heye bila ji xwe bibe û xwe jê paqij bike, da ku di demê koçkirina ji vê alemê û çûna alema axretê, pak be û bi nefsa zelal cihê xwe biguhêze. Û gereke bizane ku mecal kêm e û wext teng e; çiko mirov nizane demê barkirinê kengê ye.

Ey nefsa xebîs a nivîser! Belkî hema niha ku tu mijûlê nivîsînê, ecel bigehê û te gel van hemû rezailan bibe alemekî ku êdî zivirîn ji wêderê nîne.

Ey ezîz, ey ewê tu van kaxizan dixwînî, dersê bigire ji vî nivîserî ku niha di bin axê da di alemek dî da di belaya kar û exlaqê xwe yê nedurist da ye û heta ku derfet jê ra hebû omrê xwe bi betalî û bayê dil ve borand û sermaya îlahî pûç kir, tu hay ji xwe hebe ku

rojek wek ya me, ji te ra jî heye û tu nizanî ew çi roj e, belkî hema vê gavê bê ku tu mijûlê xwendinê yî. Eger tu xwe sist bikî wê firsend û derfet ji dest derkeve. Birayê min! Van karan paş neêxe, ku ne ya paşxistinê ye. Çiqa kes ji nişkê ve ji vê dinyayê çûne û em nizanin ka çi hat serê wan?! Nexwe firsendê ji dest nede û her bêhnekî ji xwe ra xenîmet bizane; çiko kar gelek muhim e û sefer pir xeter. Eger destê te ji vê alemê kurt bibe, ku zeviya axretê ye, êdî tu nikarî xirabiyan durist bikî û xêncî ji xem û şaşî û ezab û zelîliyê tiştek dî ji te ra nîne. Weliyên Xwedê bêhnekê rehet nebûne û ji fikra vê sefera pirxeter derneketine. Halatên Alî bin Husêyn (a.s) mirov şaş dihêlê, nalenala Mîrê bawerdaran (a.s) mirov dibizdênê. Çi bûye ji me, ku em evqas xafil û bêxeber în? Xêncî şeytan kî êmnahî daye me ku em karê îro ji sibehî ra paş têxîn?! Ew dixwaze alîkar û ensarê xwe zêde bike û me pê exlaqê xwe û di nav koma xwe da mehşûr bike. Ew lanetî daim karê axretê ji me ra sehl nîşan dide û dixwaze pê soza rehmeta îlahî û şefaeta mehderkaran me xafil bike. Lê mixabin ev viyanek kazib û ji dav û hîlepîlên wî mel'ûnî ne.

Niha rehmeta Xwedê tu li ber xwe girtî; rehmeta selametî, jiyan, êmnahî, hîdayet, aqil, firsend û rênimûniya duristkirin a nefsê. Tu di nav hezaran rehmetên îlahî da xwe digevizînî û tu behrê jê nagirî û guhê xwe didî şeytan! Eger tu di vê alemê da ji van rehmetan behrê negirî, bizane di wê alemê da jî tu ji rehmetên bê xilasekên Xwedê bêbehr î û tu wê ji şefaeta şefaetkeran jî bêbehr bî. Cilweya şefaeta şafian di vê alemê da hîdayeta wa ye û di wê alemê da batinê hîdayetê, şefaet e; eger tu ji hîdayetê bêbehr bî, tu ji şefaetê jî bêbehr î, tu çiqas hîdayet bibî tu wê ewqas şefaetê bibînî. Şefaeta Resûlê Ekrem (s.a.a) wek rehmeta Heq, mutleq û reha ye, mehelê qabil gereke jê îstifade bike. Eger Xwedê nekirî, şeytan bi van rêkan ve îman ji te stand û ji dest te deranî, êdî tu ji rehmet û şefaetê ra ne qabil î. Belê, herdu dinya tijî ne ji rehmeta Heq, eger tu li pey rehmetê yî, çima tu behremend nabî ji van rehmetên ku di vê alemê da li pey hev tên û tovê rehmeta alemên

dî ne. Evqas enbiya û ewliyayên Xwedê tu gazî kirin bi vê ziyafet û mêvanxaneya nîmet ên îlahî, te qebûl nekir û bi wesweseyek ya xennas û gotinek şeytanî te hemû avêtin.

**Vebir: Der heqê esebiyetên ehlê ilmê da ye**

Yek ji esebiyetên cahilî di behsa ilmî da, berevaniya ji gotina xwe an seyda û şêxê xwe ye, ne ji bo cihkirina heqiyê û pûçkirina ne heqiyê. Diyar e ku ev esebiyet ji hinek aliyan ve pîstir û xirabtir e ji esebiyetên dî: Yek ji nezer muteesib ve. Çiko ehlê ilmê ku gereke murebî û duristkerê mirovan bin û ji çiq û belgên dara nubûwet û wîlayetê ne, û muhimiya meselê û dûvhata exlaqên fasid dizanin, eger Xwedê nekirî ew bi xwe xweyê vî exlaqê şeytanî bin, hucet û delîl ser wan temamtir e û pirtir li wan tê girtin.

Kesê xwe bi çiraya hîdayetê nav bide, eger gotin û amelê wî hev negirin, nav ehlê riya û nifaqê da hesab dibe û ji zanayên pîs û alimên bê amel e ku cezayê wî pirtir û ezabê wî dijwartir e. Quranê bi vî awayî behsa wan kiriye: «Çi pîs e mesela wa yên înkara ayetê Xwedê kirine û Xwedê koma zaliman rêrast nake». (Cum'e / 5) Nexwe lazim e ji ehlê ilmê ra ku, hay ji van tiştan hebin û xwe ji van mefsedan paqij bikin, da hem ew bi xwe durist bibin û hem komel durist bibe û hem we'z û şîreta wan eser bike. Fesada alim, dibe sebebê fesada umetê û me'lûm e fesada ku madda fesadên dî bin û gunehê ku gunehên dî jê çêdibin li bal weliyê nîmetê mezintir e ji fesadên cuzî ku fesadên dî jê çênabin.

Ya dî ev e ku esebiyeta ehlê ilmê xiyanet e li zanistê. Û kesê ku ev emanet rakir û lîbasê ilmê kir ber xwe, gereke hurmeta wê xweyî ke û durist û bêkêmasî teslîmê cihê wê bike û eger bi awayê cahilî bikeve esebiyetê, bê şik ewî xiyanet, zulm û zêdegavî kiriye û eva he bi xwe gunehek mezin e.

Qebaheta wê ya dî ji aliyê yê muqabil ve ye, çiko muqabilê wî di behsa ilmî da alim e ku ji emanetên îlahî ye û hurmeta wî lazim e û hetika hurmeta wî ji karên heram û ji mûbiqatên mezin e. Û

carna teesubên cahilî dibin sebebê hetikbirina ehlê ilmê. Ji ber vî gunehê mezin ez hana xwe ji Xwedê ra dibim.

Ya dî ji aliyê muteesib ve ye ku seyda û şêxê mirov e û helbet dibe sebebê ji navbirina heq. Çiko seydayên giranqedr Xwedê rûyê wan sipî bike, dixwazin lagiriya heq bikin û ji batil hez nakin û kerbê wan tê ji wê çendê ku ji ber esebiyeta cahilî heqek ji nav biçe û batil cih bigire. Bê şik ne heqiya ruhanî mezintir e ji ne heqiya cismanî û heqê wîladeta ruhanî ser heqê wîladeta cismanî ra ye.

Nexwe ji ehlê ilmê ra (Xwedê ser mezinahiya wan ve zêde bike) lazim e ku xwe ji mefasidên exlaqî û kiryarî dûr bikin û xwe bi amel û exlaqên qenc bixemilînin û xwe ji meqamê hêjayî yê Xwedê dayî wan, nexin; ku xêncî ji Xwedê kes ziyana wê nizane.

## HEDÎSA NEHÊ

بالسّند المتّصل إلى ثقه الإسلام محمّد بن يعقوب الكليني، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد بن عيسي، عن محمّد بن سنان، عن عون القلانسي، عن ابن أبي يعفور، عن أبي عبد الله، عليه السّلام، قال:

**«مَنْ لَقِيَ الْمُسلِمينَ بِوَجْهَيْنِ و لِسانَيْنِ، جاءَ يَومَ الْقيامَةِ و لَهُ لِسانانِ مِنْ نارٍ. »**

Îmam Sadiq (a.s) kerem kir: «Kesê bi durû û duzimana raberê musilmana bibe, wê di roja qiyametê bi duzimanên agirî ve be».

### Şîrove:

Durûyî ya nav musilmanan da ew e ku, eşkereyê xwe bi awayekî nîşa wan bide ku dilê wî bervajiyê wê be. Mesela, di zahirê xwe da nîşan bide ku ez hej te dikim û ji te ra xalis im; lê di dil da ne wereng be, li bal wan muamelea dostînî û mehebetê bike û pişt wan ve ne wereng be. Me'na duzimaniyê ew e ku, raberê kî bibe medh û pesnê wî bide an ji dostînî û hezkirinê biaxive û paş wî ve înkara wî bike û ne başiya wî bêje.

Gorekî vê şîrovê ya yekê nifaqa amelî, ya duwê nifaqa qewlî ye. Belkî çiko ev du sifet ji eşkeretirîn taybetiyên minafiqa ne, bi taybet behsa wan kiriye. Nifaq yek ji rezîlên nefsanî û melekatên xebîsê ye ku ev eserên wê ne. Ew ê derece hene ku di çend vebiran da em ê behsa mefasidên wê û rêka îlaca wê bikin.

**Vebir: Der heqê meratibên nifaqê da ye**

Bizane ji nifaq û durûyiyê ra wek melekatên xebîse û şerîfeyên dî, ji nezer dijwarî û lawaziyê ve derece û mertebe hene. Heryek ji sifetên rezîl, ku mirov derman neke, berew zêdahî diçin. Û meratibên dijwarî ya rezailan wek başiyan bê sînor in. Eger mirov nefsa emmare serberedayî bike, ji ber meyla zatî ya wê ji xirabiyê ra û musaideta şeytan û weswasê xennas, wê bi aliyê xirabiyê ve biçe û roj bi roj wê zêde bike, heta ew rezîla ku peyrewî jê kiriye bibe sûret û şiklê cewherî yê nefsê û temamê memleketê zahir û batin bikeve bin hukmê wê da. Vêca eger ew rezîle, rezîla şeytaniye be, wek nifaq û durûyiyê ku ji taybetiyên wî mel'ûnî ne -çawa ku Quran ji devê wî dibêje: Ji Adem û Hewayê ra sond xwar ku ez xêrxwazê hewe me»[1] halhale ne we bû- wê memleket teslîmê şeytan bibe û axirîn sûretê nefs e, batin, zat û cewhera wê, wê bibe sûretê şeytan, sûretê eşkereyê wî jî di wê dinyayê da çêdibe ku sûretê şeytan be, her çend sûret û şikl li vêderê însanî be.

Nexwe eger mirov pêşiya vî sifetî negire di demek kurt da wê hemû xem û hemma wî bi wî alî ve biçe û gel her kesî wê bi durûyî û duzimanî raber bibe û daim wê bi qirêja nifaqê ve muameleyê gel xelkê bike û xêncî ji nef'a şexsî û xwexwazî û xweperestiyê tiştek nayê hizra wî û wê sedaqet, semîmiyet, himmet û camêriyê pêpez bike û durengî wê bikeve hemû kar, herekat, sekenatên wî û xwe ji çi weqahet, qebahet û xirabiyan venade. Mirovê weha ji nav koma beşer der e û wê di nav koma şeytanan da bêt heşir kirin. Eva he bi hesebê şidet û ze'fa cewherê nifaqê bi xwe bû, lê nisbet bi muteeliqê fesadê jî ferq heye. Çiko carna nifaqê di dînê Xwedê da dike û carna di melekatên qenc û exlaqên hêjayî da, carna jî di amelan û menasikên îlahiye da, carna jî di kar û barê orfî û adetî da. Her weha carna gel Resûlê Xwedê (s.a.a) û îmamên pak nifaqê dike, carna jî gel weliyên Xwedê, alim, bawerdaran, musilmanan û dîtir bendeyên Xwedê ji dînên

---

1- E'raf / 21

dî. Helbet ku ev pîsî, qebahet û weqahet pîstir in, her çend di eslê pîsiyê da şirîkê hev in û hemû ji çiq û belgên yek darê ne.

**Vebir: Şiklê melekûtî yê nifaqê**

Durûyî xêncî ji vê ku bi xwe sifetek pîs û kirêt e; ku mirovê şerîf qet tu caran ev sifet têda çênabe û xweyê vî sifetî ji nav koma mirovan der e û heta ne ser tu heywanakî ve ye jî, di vê alemê da sebebêşermezarî û serşûriyê ye di nav emsal û eqrana da û di wê alemê da jî sebebê zilet û ezabê dijwar e. Û gorekî di hedîsê da hatiye, di wê alemê da bi rûyekî ku duziman ji agir di dev da ne, wê mehşûr bibe û li bal Xwedê, enbiya û melekên muqereb bikeve şermê. Û ji vê riwayetê, dijwariya ezab jî tê fêhmê; çiko eger cewhera bedenê bû cewhera agir, his dijwartir dibe û êş zehftir. Em hewara xwe ji Xwedê ra dibin.

Di hedîsek dî da hatiye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Roja qiyametê mirovê durû, di halekî da tê ku zimanekê wî ji pişt ve û yek ji pêşve derketiye û herdu ziman û hemû bedena wî bûye agir. Û gazîker gazî dike ku: Ev, ew e yê di dinyayê da durû û duziman bû. Û roja qiyametê bi vî awayî tê nas kirin». Û ew meşmûlê vê ayeta şerîfê ye ku kerem dike: «Ya Xwedê emrê bi pêwenda digel wan kirî, ewa qut kir û birî; û xirabî di erdê da çêkirin. Laneta Xwedê û pîs cih ji wan ra ye».[1] Nifaq serkaniya gelek mefasid û xirabiya ye, ku heryek dikare dinya û axreta mirov kavil û wêran bike, wek: Fitne çêkirinê, ku Quran ewê ji qetlê mezintir zane[2], nemîmet û xeber gerandinê ku gorekî hedîsê, bihişt ser wan heram bûye û xeybet, ku gorekî hedîs, ji zinayê dijwartir e û eziyet û azara mumina û seb û hetikbirin û eşkerekirina sir û xefa wî... ku heryek ji wan ji bo ji navbirina mirov ra sebebek serbixwe ye.

---

1- Re'd / 25

2- Beqere / 191

Bizane, ew kinaye, îşare, xemz û lemzên ku hinek der heqê hinekan da ji xwe nîşan didin, di halekî da ku li ber wan dostî û hezkirinê ji xwe nîşan didin, ji nifaq û durûyiyê ye. Divê mirov gelek hay ji xwe hebe, çiko hîle pîlên nefsê û davên şeytan gelek deqîq û hûr in û kêm kes hene ku bikarin jê bifetilin. Çêdibe mirov bi îşare an kinayeyekî ne di cih da, bibe ji minafiqan. Û çêdibe mirov heta xilaseka omr bi vî exlaqê rezîl ra be û mirov xwe pak û paqijê ji wê bihesibîne. Nexwe gereke mirov wek doktorek zana û emîn, daim hay ji haletên nefsî û amelên xwe hebe û di wê da qet kêmasiyê neke û gereke bizane ku çi nexweşî ji nexweşiyên dilî xeftir û kujendetir nînin û kes ji mirov ra dilsoztir û dilovantir ji mirov bi xwe nîne.

**Vebir: Dermanê nifaqê**

Îlac û dermanê vî gunehê mezin û vê kêmasiya girîng du tişt e: Yek, fikirkirina di xirabiyên vî exlaqê rezîl da. Çiko di vê dinyayê da eger mirov bi vî exlaqî bêt naskirin, wê ji çavê xelkê bikeve û hetika wî biçe û bê rûmet bibe li bal hemû eqran û emsalan; wê ji civatên xwe derînin û wê ji dest ve anîna kemalatan û gihana mexsedan paşve bimîne. Û mirovê xweyê şeref gereke xwe ji vê şerma ku hêjanan ji nav dibe bişo, da nekeve vê zelîliyê. Di wê alemê da jî ku alema keşfa esrara ye û tişta ku di vê alemê da te ji xelkê veşartibû, li wêderê nayê veşartin. Û li wêderê wê bi du zimanên ji agir bêt heşir kirin û gel minafiq û şeytanan bêt ezab dan. Nexwe mirovê aqil dema van xirabiyan bibîne û xêncî ji pîsatî û kirêtiyê ji vî exlaqî nebîne, gereke ser xwe lazim bibîne ku evî exlaqî ji xwe bişo û bikeve di merhela amel da, ku rêkek dî ye ji îlac û dermankirina nefsê ra. Ew jî ev e ku demekî hay ji herekat û sekenatên xwe hebe û di kar û barê xwe da hûr bibe û bervajiyê xwest û viyana nefsê amel bike û dewamê bide xebata xwe û kiryar û gotinên xwe di eşkere û xefê da baş bike û xwe nîşandan û hîle pîlan bavêje û ber van karan ra jî alîkarî û tewfîqê ji Xwedê bixwaze, ewî ser nefsa emmare û bayê dil bixe û di rêka dermankirin û îlaca vê nexweşiyê da digel wî be. Rehmet û di-

lovaniya Xwedê ji bendan ra bê xilasek e û her kes bi aliyê wî ve biçe û dest bavêje duristkirina xwe, alîkariya wî dike û destê wî digire. Eger demekî bi vî awayî be, hêvî ew e nefs, sefayekî peyda bike û qirêja nifaq û durûyiyê jê biçe û ayîneya dil û navdeyê wî ji vê rezîlê pak bibe û bikeve ber dilovaniya mewlayê heqîqî. Çiko hem delîl heye û hem bi tecrubê sabit bûye ku nefs, heta ku di vê alemê da ye dikeve bin tesîra amel û kiryarên xwe da, çi kiryarên qenc û çi jî yên xirab, ji ber her amel û kiryarekî di nefsê da eserek peyda dibe: Eger kar û amel qenc û baş be, esera nûranî û kemalî tê dest û eger bervajiyê wê be, eserek tarî û zulmanî di wê da çêdibe, heta ku dil bi temamî an ronahî bibe û an zulmanî û bikeve nav bira bexteweran, an bextreşan da. Nexwe heta ku em di vê mala amel û cihê çandinê da ne, bi îxtiyara xwe em dikarin dil bi aliyê xweşbextî an bextreşiyê ve bibin û em rehîna amel û kiryarên xwe ne. «Fe men ye’mel misqale zeretin xeyren yereh..» (Zilzal- 7- 8)

**Vebir: Hinek qismên nifaqê**

Ey ezîz, bizane yek ji mertebên durûyî û duzimanî û nifaqê, nifaqa digel Xwedayê Teala ye; durûyiya gel weliyê nîmetê Malikul Mulûk, ku di vê alemê da em mubtelayê wê bûne û em jê bêxeber in û perdên stûrên nezaniyê û hicabên zulmanî yên xwexwazî û hezkirina dinyayê û huba nefsê bi awayek wereng ew li ber me nixûmandine ku we dixweyhê heta keşfa xefan û rabûna perdan û koçkirina ji vê alema tebîet û barkirina ji mala xapandin û bêxeberiyê, em lê hişyar nebin. Niha em di xewa xefletê da ne û ketine di serxweşiya tebîet û bayê dil da û hemû kirêtî û exlaq û kiryarên pîs ber çavê me sipehî û rind in. Û dema em ji xew hişyar bibin û ji vê serxweşî û mijûlahiyê derkevin, hingê êdî derfet fewitiye û em bi du zimanên ji agir an durûyên kirêt ketine nav bira minafiq û durû û duzimanan da. Û çiqas em bikin hawar: «Ya Reb, me bizivirîne»[1], qet cewab nayê dayîn.

1- Muminûn / 99

Ev durûyî werenge ku ez û tu di temamê omrê xwe da îzhara kelîma tewhîd, Îslam, îmanê, muhabet û mehbûbiyetê dikin û ya dilê me dixwaze em dibêjin: Eger em ji xelkê me'mûlî ne, em de'wa Îslam û îmanê an zuhd û xulûsê dikin û eger ehlê ilmê ne û feqîh in, de'wa kemal, îxlas, welayet û xîlafeta Resûl dikin û gotina ku ji hezretê Resûl (s.a.a) hatiye gêran, didin ber çavan ku: «Allahumme irhem xulefaî» û her weha gotina Sahibul Emr (ez gorî wî bim): «Înnehum hucetî» û gotinên dî ku ji îmamên hîdayetê der heqê aliman da neqil bûne. Û eger em ehlê ulûmê aqiliye ne, em de'wa îmana heqîqî ya ser esasê burhan û delîlê dikin û xwe xweyê ilmul yeqîn û ‘eynul yeqîn û heqqul yeqînê zanîn û xelkên dî naqisul ilmê wel îman hesab dikin û ayetên Quranê û hedîsên şerîf der heqê hêjana xwe da dixwînin. Û eger em ji ehlê îrfan û tesewufê ne, em de'wa mearif, cezebe, muhabet, fena fillah, beqa billah û welayeta emr dikin û çi gotin û wêjeyên xweş heyîn, em dibejin. Her weha her taife û birek ji me bi zimanê qal û zuhûra hal ji xwe ra de'wa mertebeyekî dike. Vêca eger zahir û batin muwafiqê hev bûn û xef û eşkere gel hev rêketin û di vê de’wayê da sadiq û rastgo be, «henîen lehu». An ne, eger wek vî nivîserê rûreş be, bila bizane ku di nav bir û koma minafiqan û di silkê durû û duzimana da ye, vêca bila li dermankirina xwe bigere û heta derfet û firsend ji dest neçûye, bila bikeve fikra halê bextreşî û roja zilet û zulmeta xwe û jê ra çarekî bibîne.

Ey ezîzê mude'î yê Îslamê, di hedîsa şerîf a Kafiyê da ji hezretê Resûl (s.a.a) neqil bûye: «Musilman ew e ku musilman ji dest û zimanê wî rehet bin». Çi bûye ji min û te ku çiqas ji me be, em eziyet û azara yê bin xwe ra dikin û em qet xwe ji ne heqî û zulma der heqê wa nadin paş, eger me bi dest nekarî wan eziyet bikin, bi kêra tûj û birra ya ziman em di halê haziriya wan da ewa azar didin û eger ne, em pişt wan ve hetika wan dibin û perdan didirînin û xefan eşkere dikin û dest davêjin xeybet û tuhmetan. Nexwe em in yên ku musilman ji ber dest û zimanê me, ne di

emanê da ne, de'wa me ya musilmanetiyê muxalif e gel heqîqetê û dilê me dijatî heye gel ya eşkere, nexwe em di nav koma minafiq û durûyan da ne.

Ey mude'iyê îman û huzûra dil, eger der heqê Zulcelal da, te bawerî bi kelîmeya tewhîdê heye û dilê te yekperest û yekxwaz e û tu xudatiyê xêncî ji Xwedê ra nizanî, eger dilê te rêketî ye gel ya eşkere, û navdeyê te muwafiqê de'wa te ye, çi bûye ku ji ehlê dinyayê ra dilê te evqas şikestî ye? Çima tu ewa diperestî? Ma xêncî ji vê ye ku tu wan xweyê tesîr zanî di vê alemê da? Ewa ku tu wê di vê alemê da bê eser zanî, hema îradeya Heq Teala ye. Tu li ber hemû esbabên zahirî şikestî yî û ji eserkerê heqîqî û musebibê hemû esbaban [Xwedê] xafil û bêxeber; bi vî halî tu bi kelîmeya tewhîdê de'wa îmanê dikî! Nexwe tu jî der î ji nav koma muminan û di silkê duziman û minafiqan da yî.

Ey mude'iyê zuhd û îxlasê! Eger tu muxlis î û ji Xwedê ra û ji axreta wî ra xwe ji xwestên dinyayî dûr dikî, çi bûye ji te ku bi medh û pesindana xelkê ku: Filan kes ehlê selah û sedadê ye, tu evqas şahî û kêfxweş dibî û di dil da tu delaliyên xwe dikî! Tu ji civata gel ehlê dinyayê ra can didî û difirî, ji jar û feqîran direvî! Nexwe bizane ev, ne zuhd û îxlasa heqîqî ye; zuhd e ji dinyayê ji bona dinyayê û dilê te ji Heq ra ne xalis e û tu di de'wa xwe da kazib û derewker î û ji durû û minafiqa yî.

Ey mude'iyê wîlayetê ji layê welî yê Xwedê û ey mude'iyê xîlafetê ji aliyê Resûlê Xwedê ve, eger tu gel hedîsa Îhticacê mutabiq î: «Sainen li nefsih hafizen li dînih muxalifen li hewah mutî'en li emri mewlah». Û eger tu çiq û belgê wîlayet û risaletê yî û ji dinyayê ra ne mayil î û tu naxwazî xwe nêzîkê paşa û mezinan bikî û ji civata feqîr û jaran nakirhênî, nav û navdeyê te li hev tên û tu ji delîlên îlahî yî nav xelkê da; eger ne, tu ji zanayên xirab î û nav koma minafiqan da yî û tu ji birên me behsa wan kirî xirabtir î û zanîna te pîstir û halê te pîstir e, çiko delîl ser aliman temamtir e.

Ey mude'iyê hikmeta îlahî û ilmê heqîqetan û mebde û me'adê! Eger te heqîqet û esbab û musebebat zanîne û tu alimê bi şiklên berzexî û halê bihişt û dojehê yî, lazim e tu rehet bî û mayiyê omrê xwe di avakirina alema baqî da mesref bikî û berê xwe ji vê alemê û xweşiyên wê bizivirînî. Tu zanî ka çi bela û musîbet pêşda hene û çi tarîtî û ezabên giran li berahiyê ne, nexwe çima tu ji hicaba elfaz û mefahîman gavekî paşda nehatî û delîl û burhana qas çengê mêşekî eser li dilê te nekiriye? Bizane bi vî halî tu der î ji rêza mumin, hekîman û tu wê di nav koma minafiqan da heşir bibî. Wey li halê wî yê omrek di ilmên mabe'dê tebîetê da borandî û sekreta tebîet nehêlayî heta yek ji heqîqetan jî di dilê wî da cih bigire.

Ey mude'iyê marifet, cezebe, sulûk, muhabet û fenayê, eger rastî tu ehlê Xwedê û eshabê dil û ehlê sabiqa husna yî, afiyet be ji te ra! Lê evqas şetehiyat[1], telwînat[2] û de'wên beredayî ku nîşan e ji huba nefsê û weswesa şeytanî, muxalifê muhabet û cezebê ye: «Înne ewliyaî tehte qubabî la ye'rifuhum xeyrî».[3] Eger tu welî yî û ji muhib û meczûba yî, Xwedê zane, evqas behsa meqam û merteba xwe neke û evqas dilê bendeyên zeîf ji Xaliq nede alî û berê wê nede mexlûq. Bizane ev bendeyên Xwedê, ezîz in û dilê wan pirqîmet e ku gereke di muhabeta Xwedê da serf bibe, yari-

---

1- Tacul 'Erûs, c.2, p. 172, dibêje: Kelîma «şetehiyat» nav sûfiyan da meşhûr bûye. Me'na wê li bal wan, ew xeberdan û gotinên ku di halê ji xweçûn, cezebe û şuhûda Heq da ji wan çêdibin. Lê Îmam Xumêynî di Misbahê da dibêje: "Ew ji kêmasiya salik û sulûkê ye".

2- Telwîn, yanî bende ji halekî bi halek dî bêt guhaztin. Quşeyrî dibêje: "Telwîn sifetê halê erbabê ehwala ye û temkîn sifetê ehlê heqayiq. Nixwe çiqa ebd bi rê ve ye, ew xweyê telwîn e". Ferhengê Îstilahat, p. 257. Kaşanî dibêje: "Telwîn, li bal pirtirê xelkê neqs e; lê li bal me kamiltirînê meqamata ye". Şêx Muhyeddîn jî vê gotinê li ehwalê sûfiyeyê da dibêje. Lê Îmam Xumêynî, telwînê neqs û kêmasî hesab dike ne kemal.

3- "Weliyên min li bin qubba min da ne, ji min pê ve kes wan nas nake". Esraruş Şerî'e, p. 197. Misbahul Hidaye, p. 387. Mirsadul Îbad, p. 127.

ya bi mala Xwedê neke û destê xwe dirêjê namûsa wî neke: «Fe inne lil beyti rebb - evê malê xweyek heye».[1]

Vêca eger tu di de’wayê da ne sadiq î, tu di nav durû û ehlê nifaqê da yî.

Ey nefsa rûreşa nivîser ku tu dibêjî gereke ji roja reş û tarî ra fikrek bêt kirin, eger tu rast dibêjî û dil û zimanê te yek e, çima tu evqas xafil û dilreş î û bayê dil li te xurt bûye û tu qet ne li fikra sefera pir xetera mirinê da yî. Omrê te borî û te dest ji bayê dil nekêşa; te omrek di şehwet, xeflet û şeqawetê da borand û ji nêzîk ve wê ecel bigehê û hêj tu bi kar û exlaqê xwe yê kirêt ve yî. Tu ji wan wa'iza yî ku we’zê nagirî û di nav minafiqan da yî û tirsa wê heye ku eger tu bi vî halî ve biçî, tu bi du ziman û du rûyên agirî heşir bibî.

Xwedêya, me ji vê xewa dirêj hişyar ke û bi ronahiya îmanê sefayê bide dilê me û rehmê bi me bibe û em ne mêrê vê meydanê ne. Tu bi xwe destê me bigire û me ji çengê şeytan û hewayê nefsê xilas bike. «Biheqqi ewliyaik Muhemmedin we alihî ettahirîn selewatullah aleyhim ecme’în».

---

1- Xeberdana Abdulmuttelib di cewaba Ebrehe da, ku ji xirabikirna Ke'bê ra hatibû. Sîreya Ibn Hişam, c. 1, p. 65

## HEDÎSA DEHÊ

بالأسناد المتّصلة إلى رئيس المحدّثين، محمّد بن يعقوب، رضوان الله عليه، عن الحسين بن محمّد، عن معلّي بن محمّد، عن الوشّاء عن عاصم بن حميد، عن أبي حمزة، عن يحيي بن عقيل قال: قال أمير المؤمنين، عليه السّلام:

**«إِنّما أَخافُ عليكُم اثنتينِ: اتّباعَ الهَوى، و طُولَ الأَمَلِ. أمّا اتّباعُ الْهَوى فانّه يَصُدّ عن الحقّ وأمّا طولُ الأمل، فإنّه يُنْسيِ الآخرةَ.»**

Yehyayê kurê Eqîl got, Mîrê bawerdaran (a.s) kerem kir: «Ez der heqê hewe da hema ji du tiştan ditirsim: Ketina pey bayê dil û hêviya dûr û dirêj. Bayê dil, pêşîyê li heq digire; û hêviya dûr û dirêj, axiretê dide ji bîr kirin».[1]

### Şîrove:

Hewa, bi hesebê luxet hezkirin e. Di muteeliq da ferq nake, çi tiştek baş be û çi jî kirêt. Lê zêdetirê bi kar birina wê di viyanên kirêt da ye; an ji ber wê ye çiko xalib nefs li pey viyanên mezmûm e, an jî ji ber wê ye ku eger nefs bi aqil û şer'ê neyê kontrol kirin, tebî'etê wê mayil e bal viyanên pûç ve.

Sed, bi me'na pêşîgir, destkêşan û berzivirîn hatiye û hemû jî munasib in. Lê li vêderê bi me'na pêşîgir û berzivirîn e.

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 335, b. "Îman û Kufr"ê, h. 3-ê.

Em ê behsa xirabiya van du xesletan bikîn û bêjin ka çewa ya yekê pêşîyê li heq digire û ya dî axiretê ji bîr dibe.

## Meqamê yêkê: Zemma peyketina hewayê nefsê

### Vebira yekê: Di despêkê da însan heywanê bilfiîl e

Bizane ku nefsa însanî bi yek me'nê ku xeberdana ji wê niha ne ji mexseda me ye, meftûr e li ser tewhîdê û belkî li ser hemû baweriyên heq, lê ewil ku tê vê alemê dabi meylên nefsanî û şehewatên heywanî li xwe zêde dike, xêncî ji wî yê ji aliyê Xwedê ve parêzerê qudsî hebe. Û çiko evê he ji newadirê wucûdê ye, naye hesabê, behsa me jî der heqê giştê da ye.

Di cihê xwe da delîl ser vê yekê heye ku însan di destpêka çêbûnê da piştî derbaskirina hinek menazilan, heywanek zeîf e ku xêncî ji qabiliyeta însanî seratiyek li ser heywanên dî nîne. Û ew qabiliyet ne mîzana însaniyet a fiîlî ye.

Nexwe însan di destpêka hatina di vê alemê da, heywanek bilfiîl e û xêncî ji qanûna heywanan ku îdareya şehwet û xezebê ye li bin çi mîzanek dî da nîne. Û çiko ev ucûbeya dehrê, zatê cami' an qabilê cem'ê ye, ji ber wê ji bona îdareya van du sifetên şeytanî, derew û hîle û nifaq û nemîme û şeytenetên dî bi kar dibe û bi van sê hêzan ku stûnên xirabiya ne, pêşve diçe. Û eger ne di bin terbiyeta seydayekî da be, piştî gihana hedê bulûx û ruşdê, wê bibe heywanek ecêb û xerîb ku di heryek ji wan meseleyên hatine gotin da, wê nîşanka sibqetê ji hemû heywan û şeytanan bistîne û di meqamê şeytenetê da wê pêş hemûyan bikeve. Û eger karê wî bi vî awayî pêşve biçe û hema di wan sê şuûna da bikeve pey bayê dil, qet çi yek ji mearifên îlahî, exlaqên qenc û amelên salih jê xuya nakin û wê hemû ronahiyên wî yên fitretî jî bitemirin.

Vêca hemû mertebên heq ku ne der e ji sê meqamên hatine gotin, yanî: zanînên îlahiye, exlaqên hêjayî û amelên qenc, wê di bin piyê hewayên nefsanî da bên perçiqandin û peyketina bayê dil û xwe-

şiyên heywanî wê nehêle ronahiya çi mertebeyek ji heqîyê bikeve dilê wî û wê tarîtiya hewayê nefsê nûra aqil û îmana wî binixûmîne û wîladeta duwê ku wîladeta însanî ye, êdî jê ra nayê pêş û wê di wî halî da bimîne û bibe pêşîgirê heq û heqîqetê, heta ku bi vî halî ji vê alemê biçe. Û di wê alemê da wê xwe li ser şiklê heywan û şeytanan bibîne û qet nekeve di fikra însan û însaniyetê da û heta Xwedê bixwaze wê di nav tarîtî û tirs û ezabê da bimîne.

Nexwe ev hal, peyketina tam û temam e ji hewayê nefsê, ku bi temamî pêşîgirê heqîyê ye. Û ji vêderê mirov dikare pê bihese ku kêşeka paşketina ji heqîyê peyketina hewayê nefsê ye û qasê paşketinê jî girêdayî ye bi miqdar û qasê peyketinê ve. Mesela: Eger ev mirovê he, ku di ewilê wîladetê da hevrê bûye gel van sê quwan û bi tereqiya wan, ewî jî tereqî kiriye, kêm kêm ket bin tesîra terbiyeta enbiya û alim û terbiyekeran da, çêdibe di demek ne dirêj da quweya wî ya însanî ku bi awayê qabîliyet û îstidad têda hatiye danîn, bigehê fiîliyetê û têda eşker bibe û hemû hêzên memleket bi aliyê însaniyetê ve bizivirin û şeytan ser destê wî îmanê bîne (çewa ku bi destê Resûlê Xwedê (s.a.a) îman anî. Kerem dike: «Şeytanê min ser destê min îman aniye»). Û meqamê wî yê heywanî teslîmê meqamê wî yê însanî bibe, ku bibe merkeba rehwana alema kemalê û buraqa rêka axiretê ku êdî qet serserîtî jê çênebin û hêç nebe. Û piştî teslîmbûna şehwet û xezebê li beraberê edalet û şerî'etê da, wê edalet di memleketê wî da bixweyhê û hikûmeta adila heqe pêk bêt, kartêker û hakimê ser wê hema wê heqîqet û qanûnên heq bin û bervajiyê heqîyê gavek di wê da nayê avêtin û bi temamî wê ji pûçî û zulmê vala bibe.

Nexwe çewa ku mîzan di pêşîgirtina heqîyê da, peyketina hewayê nefsê ye; mîzan û kêşek di dest ve anîna heqîyê da jî, peyketina şer' û aqilê ye. Navbera van du menzilan, ku yek, peyrewiya temam ji nefsê û ya dî, peyrewiya kamil ji aqilê ye, menazilên bê nihayet in. Bi awayekî ku her guhdaneka nefsê pêşîgirtinek e li heqîyê û hicabek e ji heqîqetê ra, ku ronahiya kemala însanî pê

tê perde kirin; vêca bervajiyê wê jî çiqas gavek xilafê meyla nefsê bêt avêtin, wê gorekê, perde tên rakirin û ronahiya heq di memleket da ronahîyê dide.

**Vebira duwê: Zemma peyketin a bayê dil**

Xwedê Teala di zemma peyketin a nefsê û hewayê wê da dibêje: «Nekeve pey bayê dil ku vêca te ji rêka Xwedê winda bike» (Sad / 26). Û dibêje: «Kî ye li rê windatir ji wî kesê bikeve pey bayê dil bê rênimûnekî ji aliyê Xweda ve» (Qeses / 50).

Pêxember (s.a.a) dibêje, Xwedê kerem kiriye: «Sond be bi izet, celal, kibriya û bilindiya min, tu bendeyek nîne ku bayê dilê xwe ser xwesta min ra bigire, îlla ku wê kar û barê wî têk biçin û dinya wê dilê wî binixûmîne û dilê wî bi wê ve bêt girêdan, di wî halî da jî xêncî wê ya min jê ra teqdîr kiriye, ez nadime. Û sond be bi quwet, mezinahî, celal, nûr û bilindiya meqam ê min, ku dema ebd xwesta min ser bayê dilê xwe ra bigire, wê melaîketên min wî biparêzin, wê erd û ezman rizqê wî li xwe bigirin û di ticareta gel her tacirekî da ez piştîvanê wî me. Û bi zorî be jî, wê dinya bi aliyê wî ve be.»[1] Yanî: Her çend dilê wî ne ser dinyayê be, dîsa wê dinya berê xwe bidiyê, vêca wê zelîl û şikestî li bal wî be. Û ev hedîsa şerîf ji hedîsên qewî ye û naveroka wê nîşan dide ku ji serkaniya zelala ilmê Xwedê derketiye. Heçku hatiye gotin seneda wê zeîf e, niha em ne li meqamê behsa ji wê da ne.

Xêncî ji vê hedîsa me şerh kirî, ji Mîrê bawerdaran (a.s) jî neql bûye dibêje: «Tirsa pitir ya min der heqê hewe da du tişt in: Peyketina bayê dil...».[2] Û ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye ku: «Çewa hûn ji dijminê xwe ditirsin, wereng ji hewayê nefsa xwe bitirsin. Çiko tiştek dijmintir nîne ji wan ra ji hewayê nefsê û du rûyiyê zimanê wan».[3] Yanî: Ewa ku zimanê wan dest wan ve tîne.

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 335, behsa "Îman û Kufr"ê, b. "Îttiba'a Hewa"yê, h. 2.

2- Nehcul Belaxe, Feyzul Îslam, x. 28-ê.

3- Usûla Kafî, c. 2, p. 335, h. 1-ê.

Ey ezîz, bizane xwestên nefsê xilasî jê ra nîne. Eger mirov gavekî li pey wê bavêje, wê mecbûr bibe çend gavek dî jî li pey biçe û eger bikeve pey bayeka wê, neçar e pey çend dî jî bikeve. Eger tu deriyekî li ber vekî, gereke tu deriyên dî jî lê vekî. Çêdibe ji ber vekirina deriyekî li bayê dil, gelek xirabî ser te da bên û tu bikevî nav hezaran kendalên kujer da; heta Xwedê nekirî, di demên dûmahîkê da hemû rêkên heq li ber te bigire, çewa ku Xwedê di Quranê da gotiye.[1] Mîrê bawerdaran û mewlayê hidayetker jî, tirsa wî ji vê ye. Ruhê mukeremê Resûl ê Ekrem û îmamên hidayetê (a.s) ji vê yekê di tirsê da ne ku, newebe belgên dara nubûwet û welayetê biweşin û birijin. Ew hezret kerem dike: «Bizewicin, da hûn zaroka bînîn, bi rastî ez bi hewe fexra xwe dikim ser umetên dî; her çend bi zarokê ji ber çûyî». Kifş e ku eger mirov bikeve di vê rêka tirsê û ser vî kendalê ji navçûnê û huqûqê walidê heqîqî, yanî Resûlê Ekrem ji nav bibe û ew serwer, ku rehmet e ji alemê ra, kerbê wî ji mirov be, çiqas bextreşî û musîbet wê jê ra hebin. Nexwe eger tu gel Resûlê Ekrem nas î û muhabeta Mîrê bawerdaran di dilê te da heye û tu hej zarokên wî yên pak dikî, dilê mubarekê wan ji vê tirsê derîne.

Di ayeta 112 ji sûretê Hûd da hatiye: «Festeqim kema umirte we men tabe me'ek» «Çewa emrê te hatiye kirin, tu û ew ên gel te tewbe kirine, xwe ragirin». Di hedîsê da hatiye ku hezretê Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Sûretê Hûd, ji ber vê ayetê, ez pîr kirim». Seydayê me yê arifê kamil Şahabadî (ez gorî bim) kerem kir: Ev ayet di sûretê Şûra da jî hatiye (ayeta 15); lê li wê derê «we men tabe me'ek – ew ên gel te tewbe kirine» nehatiye, ji ber wî qasî hezret behsa ayeta Hûd tenê kiriye; çiko Xwedê Teala îstîqamet û xwe ragirtina umetê jî jê xwestiye, vêca tirsa wî hezretî ji wê bû ku memûriyet neyê cih; eger ne wî hezretî bi xwe îstîqamet û xweragirî hebû. Ew hezret mezherê ismê hekîm ê edl e.

Vêca ey bira, eger tu xwe ji peyrewên wî heya dikî û berê gotina zatê eqdes li te ye, were û nehêle ew giranqedr di vê memûri-

1- Casiye / 23 , Rûm / 10 û binhêrin: Qeses / 50 jî.

yetê da ji ber karê te yê nedurist û kirêt bikeve şermê. Tu bi xwe melheze bike eger ewlad û mirovên te karên pîs û ne munasibê te bikin, tu wê çiqas li bal xelkê bikevî şermê, bizane ku Resûlê Ekrem (s.a.a) û Mîrê bawerdaran (a.s) bavê heqîqî yê vê umetê ne. Ewî hezretî bi xwe kerem kiriye: «Ez û Alî bavên umetê ne». Û eger di huzûra rubûbî da di muqabilê wan hêjayan da hesabê gel me bibînin û di nameya amelê me da, xêncî ji xirabî û pîsîyê tunebe, wê ji wan ra dijwar be û li beranberê Xweda, melaîketan û enbiyan, ji wan ra wê nexweş be. Vêca me çi zulmek mezin li wan kiriye û em ketine çi musîbetî û wê Xwedê çi muameleyê gel me bike? Nexwe ey mirovê zelûm û cehûl, tu zulmê li xwe û li xweyê qencîyê dikî ku can, mal û rehetiya xwe fedayê hidayeta te kirine. Û bi nexweştirîn hala da hatine kuştin û jin zarokên wan esîr bûn; hemû di rêka hidayet û necata te da, şûna wî qasî da ku tu ji ber zehmetê wan teşekurê ji wan bikî, tu vê zulma eşkere dikî û gomana te ew e ku hema te zulm li xwe tenê kiriye? Hinekî ji xewa xefletê hişyar bibe û ji xwe şerm bike û bihêle hema dijmin zulmê bikin û tu ku de'wa dostîyê dikî, zulmê li wan neke; çiko zulma dost û mudeî, pîstir û nexweştir e.

**Vebira sisê: Der heqê jimara hewa yên nefsê da ye**

Gereke bêt zanîn ku bi heseb mertebe û muteeliqatan, bayên dil zehf zêde û reng reng in. Carna ewqas hûr û deqîq in ku, heta hişyariyê ji mirov ra çênekin, mirov pê nahese ku hîleyên şeytan û nefsê ne. Û digel vê rengarengîyê, hemû bi heve rêbirê heqîyê û pêşîgirê rêka Xwedê ne, her çend di merteba xwe da ferq dikin; xweyên xwestên nefsanî yên pûç. ku zêr û zîvan ji xwe re dikin îlah, bi awayekî ji Xwedê dûr dikevin «Efe re'eyte men ittexeze ilahehu hewah - gelo te dîtiye ew ê bayê dilê xwe dike îlahê xwe?» (Casiye / 23). Û ehlê bayên dil û peyketên şeytan û, baweriyên nedurist û exlaqên fasid jî, bi awayek dî ji heq paşda dimînin. Û ehlê gunehên kebîre û sexîre, mûbiqat û muhlikatan jî heryek gorekî dereca xwe bi awayekî ji rêka heq paşda dimînin. Peyrewên bayê dil û yên li pey xwestên nefsanî yên helal, ku

himmeta xwe têda berdidin; bi awayek dî ji heqîqetê paş dikevin. Ehlê îbadetê sûrî [zahirî] jî ji avakirina axireta xwe ra û temîna xwestên xwe yên nefsî û gihana dereceyan an xilasiya ji ezab, bi awayek dî tên perde kirin. Xweyên tezhîba nefsê jî, ji zuhûra qudreta nefsê û gihana bihişta sifetan bi awayekî ji heq û liqaya wî mehcûb dibin. Her weha ehlê mearif, sulûk, cezbe û meqamatên arifan ku nêrînek xêncî liqaya Heq û gihana meqamê qurbê nînin, bi awayek dî ji heq û teceliyatên xas mehcûb û mehrûm dibin, çiko di wan da jî hêj telwîn maye. Meratibên dî jî hene ku behsa wan ne munasibê vê meqamê ye.

Vêca heryek ji xweyên van meratiban, gereke binhêrin xwe û xwe ji hewayên nefsanî pak bikin; da ji rêka heq paşda nemînin û ji rêka sulûka heq winda nebin û di çi meqamî da bin, derîyên rehmetê li ber wan vebe. “Wellahu weliyyul hidayeti wet tewfîq».

## Meqamê duwê: Dirêjiya Emelê

### Vebir: Arzûyên dirêj, axretê ji bîr dibin

Bizane gorekî gotina seydayên ehlê sulûkê, di menazilên salikan da, menzila yekê ya însaniyetê, hişyarî ye. Ser gotina seydayê mezin Şahabadî evê menzilê deh beyt hene ku niha me ne li ber e em ewan bijimêrin. Ya niha lazim e em bêjin, ev e ku heta mirov lê hişyar nebe ku rêwîngî ye û mexsedek heye û lazim e bi aliyê mexsedê ve bikeve rê û hereket bike û çêdibe bigehê mexsedê, ezm û biryar jê ra çênabe û nabe xweyê îradê. Û heryek ji van tiştan ronahî kirinek jê ra heye ku eger em jê biaxivin wê dirêj bibe.

Gereke bêt zanîn yek ji pêşîgirên girîng û mezinê vê hişyariyê, ku mexsed û seyrê dide ji bîr kirin û biryarê dimirîne, ew e ku mirov goman bike wextê pêveçûnê fireh e; eger îro neçe wê sibe bikeve rê, eger vê mehê neçe wê mehek dî biçe. Û ev halê dirêjiya emelê û dirêjiya hêvîyê û gomana manê û hêvîdariya ji jiyanê û recaa berfirehiya dem û wext, mirovan ji eslê mexsedê, ku axiret e û

lazimiya bizavê bi wî alî ve û lazimiya dîtina heval û hazirkirina qût û zad paşda didê û mirov bi temamî axiretê ji bîr dike û mexsed ji fikra mirov derdikeve. Û Xwedê neke ku seferek dûr û dirêj li pêşiya mirov hebe û wext teng be, zad û heval jê ra lazim be û tiştek tunebe û digel vê jî ji fikra mexsedê derkeve. Û kifş e eger bêt ji bîr kirin, êdî wê ne di fikra zad û qûtê da be û lazimiyên seferê hazir nake, vêca dema sefer pêş hat, wê bêçare bibe û di rêkê da ji nav biçe û nagehê çi deran.

#### Vebir: Sefera pirxeter û lazimiya zad û rahilê

Nexwe ey ezîz, bizane seferek pirxeter li pêş e û zad û merkeba wê jî ilm û amelê nafi’ e, wextê seferê jî ne kifş e kengê ye û çêdibe wext pir teng be û firsend ji dest derkeve. Ev arzûya dirêja ku min û te heyî, ku ji huba nefsê û hîleyên şeytan ê mel'ûn e; bi awayek wereng em paşda dane ji berêxwedana axretê, ku em qet ne di fikra kirina tu kara da ne. Û eger me xeterên rê û pêşîgirên bizavê hebin, em bi tewbe, poşmanî û li xwe zivirînê, li duristkirina wan nagerin û me ne li ber e em zad û merkebê hazir bikin, vêca ji nişka ve wê ecel bigehê û bê zad û merkeb wê me bixe rê; me ne amelek salih heye û ne zanîn û ilmek xweyê feyde, halhale rizqê wê alemê li dora van herdu meselan dizivire û me qet tu yek ji wan hazir nekirine. Eger me karek jî kiribe, xalis û xwerî nebûye, eger me zanînek dest xwe ve anî be, zanînek bê hasil û netîce bûye, an bi xwe pûç e û an pêşîgirê axretê bûye. Eger ev ilm û amelê me nafi’ û xweyê feyde bûya, gereke eserek di me da danîbûya û ferqek biketa exlaq û hereketên me. Çi bûye ji me ku ilm û amelê me yê pêncî sal e eserek bervajî daniye û dilê me ji kuçê req jî reqtir kiriye? Me ji nimêjê ku mîraca mumina ye çi dest xwe ve aniye? Kanê ew xewf û xeşiyeta ku digel ilmê ye? Eger Xwedê nekirî me bi vî halî bixin rê, em ketine ziyanek mezin û gelek kul û xem li pêş me da ji me ra hene ku ji nav naçin.

Nexwe Mîrê bawerdaran heq heye der heqê me da bitirse, ku ji ber hêviyên dirêj em axretê ji bîr bikin; çiko ew zanê ev sefer çiqas

xeter û tehlûke ye. Û mirovê ku gereke qet bêhnekî jî rehetî jê ra nebe û daim di halê hazirkirina lazimiyên seferê da be, eger ew alem ji bîr kir û xew ve çû û nezanî alemek weha jî heye û rêwîngiyek weha heye, wê çi bêt serê wî û wê bikeve nav çi bextreşiyekî ra?!. Baş e ku em hinekî halê wî hezretî û hezretê Resûlê Ekrem (s.a.a) ku eşrefê mexlûqa ye û berî ye ji hemû xeta, nisyan, şimitîn û tuxyanan, bidin hizra xwe û pê bihesin ka em li çi halî da ne û ew li çi halî da bûn. Zanîna wan der heqê giringiya seferê û xetera wê da rehetî ji wan biribû û cehla me ji me ra ji bîrkirin aniye. Hezretê xetmî mertebet (s.a.a) ewqas ji îbadetê Heq ra rawesta, heta piyê wî yê mubarek werimîn û ji aliyê Xwedayê ezîz û celîl ve ayet hat ku: «Taha * Ma enzelna ‘eleykel Qurane li teşqa». (Taha / 1-2). Mîrê bawerdaran (a.s) ku halat û îbadat û xewfa wî ji Heq Teala kifş e. Nexwe bizane xetera vê seferê zehf e û ev ji bîrkirin ku di me da heye ji hîle pîlên nefs û şeytan in, ev berhêvîtî û arzûyên dirêj ji davên îblîs û hîleyên nefsê ne. Nexwe ji vê xewê rabe û hişyar bibe û bizane tu rêwî yî û te mexsedek heye. Mexsed û cihê ku berê te lê, alema dîtir e, çi bixwazî û çi ne, wê te ji vê alemê bibin. Eger te xwe hazir kiribe û lazimiyên seferê berhev kiribin, di vê rêkê da tu jar û belengaz nabî, eger ne tu dê reben, jar û bêçare bibî. Û tu dê bi aliyê wê bextreşîyê ve biçî ku qet bextewerî têda nîne; ziletek bê izet û nedariyek bê dewlemendî û ezabê bê rehetî û agirê bê temirîn û guvaştinek berdewam û kul û xemên bê şahîbûn û mereq û poşmaniyek bê xilasek.

Ey ezîz, binhêre mewla Alî (a.s) di dua Kumeylê da, di munacata xwe da çi dibêje Xweda Teala: «Ente te'lemu ze'fî 'en qelîlin min belaid dunya we 'uqûbatiha... We haza ma la teqûmu lehus semawat wel erd - ey Rebbî! Tu agah î ji zeîfiya min li beranberê piçek ji belaya dinyayê û nexweşiyên ku li ser ehlê wê da tên... Û eva he tiştek e ku ezman û erd nikarin ewê ragirin...». Ev çi ezabek e ku erd û ezman nikarin ragirin û ji te ra hatiye hazirkirin û dîsa tu hişyar nabî û xewa te ya xefletê roj bi roj zêde dibe.

Ey dilê xafil! Ji xew rabe û xwe ji sefera axretê ra hazir bike; hawa-

ra: «Dê rabin, bar bikin», bilind e. Berdestkên hezretê Ezraîl mijûl in û te hay didin ji alema axretê ra, lê dîsa bêxeber û nezan î.

Ya Rebbî! Min dûr bike ji mala xapandinê û min nêzîkê mala daimî bike û hêj firsend ji dest neçûyî, haziriya mirinê di min da çêke.

## HEDÎSA YAZDEHÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد، عن ابن محبوب، عن عليّ بن رئاب، عن زرارة، قال: سألت أبا عبد الله، عليه السّلام، عن قول الله عزّ و جلّ: «فِطْرَتَ الله الّتى فَطَرَ النّاسَ عَلَيْها.» قال:

**«فَطَرَهُم جَمِيعًا عَلى التَّوحِيدِ.»**

Zurare dibêje min der heqê ayeta: «Fitretellah elletî feteren nase aleyha» ji Îmam Sadiq (a.s) pirsyar kir, ewî got, yanî: «Mexlûq hemû li ser tewhîd û yekperestiyê xuliqandin».[1]

### Şîrove:

Ehlê luxet û tefsîrê dibêjin: Fitret, bi me'na afirandin û çêkirin e. Çêdibe eva he hema ew fitret be ku bi me'na şeqkirin e; çiko xilqet heçweku perdeya ‘edem û veşartîyê şeq dike. Îftara rojîgir jî bi vê me'nê ye, heçweku perda xwe vedana ji xwarin û vexwarinê tê dirandin. Welhasil, behsa luxetî ji mexseda me der e.

Hedîsa şerîf îşare ye bal ayeta sûretê Rûm/30 ve: «Fe eqim wecheke lid dîni henîfen fitretellah elletî feteren nase aleyha... Berê xwe bide aliyê dînê Îslamê yê durist; sirûşta Xwedê ya mirov li ser wê danîn. Guherîn di afirandina Xweda da nîne, eha ew e dînê xweragir, lê pirtirê xelkê nizanin». Bi hezkirina Xwedê emê di çend vebir û meqaman da behsa vê fitret û çawaniya wê û ka çewa xelk ser fitreta tewhîdê ne, bikin.

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 12

**Vebir: Der heqê me'na fitretê da ye**

Bizane ku mexsed ji fitretullahê ku Xweda xelk bi wî awayî çêkirine, halet û heyetek e ku Xwedê, mexlûq bi wî awayî çêkirine, ku ji lewazimê wucûda wa ye û ji wan tişta ye ku di eslê xilqetê da mexlûq bi wî awayî hatiye hevîr kirin. Û fitreta îlahî çewa ku wê me'lûm bibe, ji taybetiyên mirov e ku Xwedê Teala ji nav hemû mexlûqan kiriye mexsûsê wî. Û mewcûdên dî an ji xwe ji binî ve ne xweyê vê fitretê ne, an jî behrek kêm ji wê hene.

Gereke bêt zanîn ku, her çend di vê hedîsê û hinek hedîsên dî da fitret bi tewhîdê hatiye me'na kirin, lê ev ji pêka ronahîkirina nimûne û misdaqê ye, an jî tefsîra bi eşrefê ecza ye. Çewa ku pirtirê tefsîrên ji Ehlê Beytê (s.e) hatine, bi vî awayî ne. Û dema bi munasibetekî gotinek çêbe, nezan, goman dike dijatiyek heye. Delîla ser wê li vêderê ev e: Di ayeta şerîfe da, dîn ji fitreta Xwedê hesab bûye û dîn, tewhîd û zanînên dî li ber xwe digire. Di hedîsa sehîha Abdullahê Senan da bi Îslamê hatiye tefsir kirin; di hedîsa hesen ya Zurare da, bi «marîfet» hatiye tefsir kirin. Û di hedîsa meşhûra «Kullu mewlûdin yûledu alel fitret»ê da li beranberê cihûtî, filetî û mecûsiyetê da hatiye me'na kirin. Û hezretê Ebû Cafer (a.s) hedîsa fitretê hema di hedîsa Zurare da bi «marîfet» tefsîr kiriye. Nexwe ji vê gotina hatî gotin, kifş bû ku fitret, ne taybet bi me'na tewhîd e. Belkî hemû mearifên heqe ji wan tişta ne ku Heq Teala ebd li ser wê meftûr kirine.

**Vebir: Der heqê pê hesana hukmên fitretê da ye**

Gereke bêt zanîn ku hukmên fitretê, çiko ji lewazimê wucûdê ye û di nav hevîr û tîneta xilqetê da cih girtiye, qet tu kes têda nakeve îxtilaf û dijatîyê; alim, cahil, kûvî, şaristanî û mutemedin, şehrî û çolî, hemû li ser wê mutefiq in. Û tu rêk, terîqet û mezheb, nikare jê ra valahî û xeletiyekî çêke. Çiqas ku îxtilafa bilad, bayê dil, me'nûsat, bîr, hizr û adetan di her tiştekî da dibe sebebê îxtilafê, heta di meselên aqlî da jî; lê çi yek ji wan eserê ser tiştên fitrî nakin; îxtilafa di fêhmê da û ze'f û quweta îdrakê xirabiyekî

nayine ser. Eger tiştek ne bi wî awayî be, ew ne ji hukmên fitretê ye û gereke ji nav fitriyatan bêt deranîn. Ji ber vê yekê ayeta şerîfe kerem dike: «Feteren nas aleyha». Yanî ne taybetê kom û tayifekî ye. Û kerem kiriye: «La tebdîle li xelqillah», yanî tiştek ewê naguherîne, wek tiştên dî ku gorekî adet û tiştên wereng guherîn dikeviyê. Lê ya ecêb ev e ku her çend di fitriyatan da qet tu kes ne muxalif e gel yê dî, lê dîsa bi awayek giştî xelk ji vê tifaq û hevgirtinê bêxeber û xafil e û goman dike muxalif e gel yê dî, îlla ku bên hişyar kirin, ji nû fêhm dikin ku ne muxalif bûne, çawa ku bi hezkirina Xwedê em ê vê meselê ronahî bikin. Li binê ayetê da jî îşare bi vê yekê hatiye kirin ku kerem dike: Welakin ekserennasi la ye’lemûn; yanî: Lêbelê pirtirê xelkê nizanin.

Ji vê ya hatiye gotin, kifş bû ku hukmên fitrî ji hemû bedîhîyan bedîhîtir in. Çiko di tu yek ji ehkamên aqlî da çênebûye ku kes neketibe îxtilafê û îxtilaf têda neyê kirin. Û me'lûm e ku tiştek weha ji ronahîtirîn û bedîhîtirîn tişta ye û lazimên wê jî nexwe ji bedîhiya ye. Vê gorekê, eger tewhîd an mearif û zanînên dî ji hukmên fitretê an ji lewazimên wê bin, gereke ji ronahîtirînê ronahiya bin, welakin ekserennasi la ye’lemûn; lêbelê pirtirê xelkê nizanin.

**Vebir: Îşareyek giştî bal hukmên fitretê ve**

Bizane ku mufesiran heryekî gorekî xwe, behsa fitrî bûna dîn an tewhîdê kirine. Lê em ê di van kaxizan da ne gorekî wan pê ve biçin, di vê meselê da em ê wê gorekî xeber bidin ku, me ji şêxê xwe yê arif û kamil Şahabadî îstifade kiriye, ku di behsa ji vê meselê da gotinek taybetê xwe heye. Her çend hinek ji wan gotina bi awayê remz û îşare di kitêbên lêkolan da heye û hinek jî ji min ê bê zêhn e.

Vêca lazim e bêt zanîn ku yek ji fitretên îlahî, fitreta eslê hebûna mebde û destpêka muqedes e; yek dî fitret û sirûşta ser tewhîdê ye; yekî dî ew sirûşt e ku, ew zatê muqedes xweyê hemû kemala

ye; yek dî sirûşta li ser roja zivirîn û qiyametê ye; ya dî sirûşt û fitreta ser nubûwetê ye; yek jî sirûşta li ser hebûna melaîket, ruhanîn, hatina kitêban û nîşandana rêkên hidayetê ye, ku hinek ji va yên hatine gotin ji hukmên sirûştî ne û hinek jî ji lewazimên wê ne. Û îmana bi Xwedê Teala, melaîketû kutub, rusûl û yewmul qiyametê, di hemû dewranên jiyana beşer da, ji dînê qahîmê muhkemê musteqîmê Heq bûye. Li vêderê em ê îşare bikin bal hinek ji wan ve, ku munasibê vê hedîsa şerîf in û em tewfîqê ji Xwedê Teala dixwazin.

## Meqamê yekê

### Eslê hebûna mebdeeê mute'al ji fitriyatê ye

Eva he, bi hişyariya li tiştekî kifş dibe, ew jî ev e: Yek ji fitretan ku beşer hemû bi wê gorekê hatiye hevîr kirin û kesê ku gel wê rêk neketibe, nehatiye dîtin û çi meslek, mezheb, exlaq û adetan bervajiyê wê gava xwe neavêtine: Fitreta eşqa ji kemalê ra ye.

Eger tu li hemû dewranên jiyana beşer da bigerî û hemû milet û gelan bidî xeberdan, tu wê bibînî ku ev eşq û hezkirin, havênê hevîrê wa ye û dilê wan berew kemalê ye. Belkî ev jî heye ku hema ev eşq û evîna kemalê ye ku, ewa têxe rê û hay dide ji peyketina kar û şuxlan ra û hemû herekat û sekenatên wan ji ber wê ye. Eger çi eva he ku kanê kemal di çi da ye û mehbûb û meşûq li kû ye, îxtilafek temam û kemal hene. Heryek evîna xwe di tiştekî da dîtiye, ke'beya amal û arzu ya xwe di tiştekî da goman kiriye û berê xwe dayiyê û bi dil û can ewê dixwaze. Ehlê dinya û xemla wê, kemal di mal û heyiyê da goman kiriye û ewê meşûqa xwe zane û di rêka dest ve anîna wê da bi can û dil dixebite. Yên dî heryek çi dixwaze û evîndarê çi be, çiko ewê kemal dihesibînin, dilê wan bi wî alî ve ye.

Her weha ehlê ilm û sen'etan heryek gorekî mezinahî ya mêjiyê xwe tiştekî kemal zanin û ewê ji xwe re dikin evîn. Û ehlê axret û zikr û fikrê, ji xwe re tiştek dî zanin. Welhasil, berê hemûyan li

kemalê ye û dema ewê di tiştekî da dibînin an xeyal dikin xwe pê ve mijûl dikin. Lêbelê digel vê yekê jî, eşqa wan û ke’beya amal û arzû ya wan, ne ew e ku goman kirine; çiko heçî kesê berê xwe bidê fitret û sirûşta xwe, wê bibînê ku dilê wî bal çi ve be, eger mertebeyek bilindtir ji wê dît, wê berê dilê wî ji wê bizivire û bikeve ber ya dî ku kamiltir e; û dema giha wê ya kamiltir, wê berê xwe bide ya hêj ji wê jî kamiltir û belkî roj bi roj evîna wî wê zêde bike û dilê wî di çi derece û merteban da nasekine. Mesela: Eger tu evîndarê cemal, sipehîtî û rûyê rind î, dema tu ewê li bal dilberekî dibînî, dilê te bi wî alî ve diçe; eger tu rindtir ji wê bibînî û pê bihesî ku xweşiktir û rindtir e, wê berê te bikeve wê, an tu wê herduka bixwazî; dîsa agirê evînê natemire û zimanê te yê hel û lisanê sirûşt û fitreta te, ew e ku:

«Çîzîm nîst vegerne xerîdarê her şeşem».[1] Belkî jî tu bikirê her rind û bedewekî yî. Mimkun e tu bi îhtimalê jî evîndar bibî: Eger tu îhtimal bidî rindek dilbertir ji va yên te dîtîn û heyîn li cihek dî heye, wê dilê te bi wî alî ve bikeve rê û tu wê bêjî:

«Men miyanê cem'em û dilem cayê dîger est».[2]

Bi vê pêkê eger tu wesfê bihiştê û wan rûxweşên dilkêş bibihîzî (eger çi Xwedê nekirî, te bawerî jî pê nebe) sirûşta te wê bêje: xwezika tiştek wereng hebûya û mehbûbek dilber bibûya nesîbê min.

Ew ên ku kemalê di padişahî û qudret û berfirehkirina welat da dibînin û muştaqê wê ne, halê wan jî bi vê pêkê ye. Eger padişahî ya welatekî bidinê, wê berê wî bikeve memleketek dî û eger qeteka dinyayê bidinê wê dilê wî bifire bal qeta dî û eger erdê hemûyê bidinê û ew îhtimal bidiyê ku cihek dî jî heye, wê dilê wî bêje: Xwezika min bikariya ez bi wî alî ve bifirim û wêderê bindest bikim. Halê ehlê zanîn û sen’etan jî bi vê pêkê ye.

---

1- Hafizê Şîrazî: “Bajareke tijî nasdar û hûrî ji şeş aliyan ve, [lê] min ti tiştek nîne, eger ne ez bikirê her şeşa me”.

2- Se’dî: “Ez nav komê da me û dilê min li cihek dî ye”.

Welhasil, her kes di çi rêkê û mertebê da be, dilê wî dixwaze ku ya kamiltir dest xwe bixe û qet di vê rêkê da agirê evînê natemire û roj bi roj lê zêde dibe. Vê gorekê ronahiya vê sirûştê nîşana me kir ku dilê temamê silsileya beşer, ji welatên Afrîkayî bigire heta bi ehlê memalikên xweyê şaristaniyetên alemê û ji tebî'iyan (Xweda nenasan) bigire heta bi ehlê dîn û diyanetan, bilfitret dilê hemûyan bi aliyê kemalek bêkêmasî ve ye û evîndarê wê cemal û kemalê ne ku, eyb û xirabî têda nebe; û ew ê zanînê dixwazin ku cehl têda nebe. Wê qudretê dixwazin ku nekarîn digel neyî û jiyana bê mirin dixwazin; welhasil, kemala mutleq û reha daxwaz û evîna hemûya ye. Hemû mewcûd û binemala beşerî, yekdil û yekziman dibêjin: Em aşiqê kemala mutleq in, em hej cemal û celala mutleq dikin, em li pey qudret û ilmê mutleq in. Gelo di hemû silsila heyîyan da û di alema zihn û xeyalê da, di tecwîzatên aqlî û îtibarî da tiştek ku xweyê kemal û cemala mutleqê be, xêncî ji Zatê Eqdes (c.c), destpêka alemê heye û hûn pê zanîn? Gelo cemîlê alel itlaq ku bêkêmasî be, xêncî ji wî mehbûbê mutleq, kes heye?

Gelî şaşên dûlêr a heyretê û windabûyên çol a rêxwehriyê, ne; belkî ey perwane [perperok] yên mûma cemalê cemîlê mutleq; ey evîndarên mehbûbê bê eyb û zewal, hinkî binhêre kitêba sirûşt, fitretê û rûpelên kitêba xwe bixwe biqulibîne û bibîne ku qelema qudreta fitreta îlahî di wê da nivîsiye: «Înnî weccehtu wechiye lillezî feteres semawati wel erd». Gelo: «Fitretellah elletî feteren nas aleyha» fitreta tewecuha bi mehbûbê mutleq e? Gelo ew sirûşta ku guherîn jê ra neyî «la tebdîle li xelqillah» sirûşta marîfetê ye? Heta kengê hûnê bi xeyalên batil, vê evîna Xwedadayî ya fitrî li vî û yê dî ve mesref bikin? Eger evîna hewe, ev cemalên xweyê kêmasî û ev kemalên sînorkirî bin, çima dema hûn digehînê, pêta îştiyaqê gurtir dibe? Dê vêca ji xewa xefletê hişyar bibin û şahî bin bi wê ku hewe mehbûbek bê zewal heye, hewe meşûqek heye ku kêmasî jê ra nîne, hewe metlûbek bê eyb heye, hewe menzûrek heye ku nûra tel’eta wî ye: «Allahu nûrus

semawati wel erd». Hewe mehbûbek heye û li ber xwe girtina wî, ewqas berfireh e ku eger hûn bi werîsekî di kûratiya erdê da bên berdan, dîsa hûnê bigehin wî.

Nexwe ev evîna hewe ya fiîlî, meşûqek fiîlî jê ra lazim e û çênabe ew mewhûm û xeyal be, çiko mewhûm naqis e û berê sirûştê li kemalê ye. Vê gorekê, aşiq û eşqa fiîlî, bê meşûq nabe û xêncî ji zatê kamil meşûqek nîne ku sirûşt berê xwe bidiyê. Nexwe lazima eşqa bi kemala mutleq, hebûna kamilê mutleq e. Pêşiya niha da jî, kifş bû ku hukmên sirûşt û lazimî yên wê, ji hemû ronahiyan ronahîtir in: «E fillahî şekkun fatiris semawati wel erd».(1)

## Meqamê duwê

### Tewhîda Xwedê û sifetên wî yên dî sirûştî ne

Tewhîda Xwedê Teala û eva he ku xweyê hemû kemalata ye, ji meselên fitrî û sirûştî ye. Ev yekê, bi gotina ku me di meqamê yekê da gotî sabit bû, lê li vêderê em ê bi xeberdanek dî wê sabit bikin.

Yek ji sirûştên ku di mirov da hatiye danîn, sirûşta dûrî ya ji neqs û kêmasîyê ye. Û çiqas mirov ji tiştekî nefret hebe û jê bireve, ji ber wê ye ku ji neqs û kêmasîyê nefret heye û jê dûr dikeve. Nexwe sirûşt ji eyb û kêmasîyê direve û bervajiyê wê vêca berê wî li kemala mutleq e.

Vê gorekê ew ê berê sirûştê lê ye, gereke yek û tek be; çiko her gelekî û murekebek xweyê kêmasî ye û gelekî, bê sînor nabe û sirûşt ji tişta naqis direve, ne ku berê wê lê be, nexwe bi van du sirûştan, bi wî qasî ku sirûşt ji kêmasîyê direve û berê wê li kemalê ye, tewhîd sabit dibe.

Xêncî ji tewhîdê, ev jî sabit dibe ku hemû kemal di Xwedê da hene û ji hemû kêmasiyan dûr û berî ye. Sûretê mubarekê «Tewhîd»ê

1- Îbrahîm / 10: "Ma di Xwedê, çêkerê erd û ezmana da şik û şubhe heye?".

jî ku ser gotina ez gorî, seydayê me, nisbeta Heq Teala beyan dike, ji huwiyet û hebûna mutleqe ku berê sirûştê lê ye û di destpêka sûret da bi kelîma «huwe - ew» îşare pê hatiye kirin, burhan û delîl e ji şeş sifetan ra, ku di pey ra hatine. Çiko zatê wî yê muqedes huwiyeta mutleq e û huwiyeta mutleq gereke xweyê kemala mutleq be; eger ne, wê kemala sînorkirî be, vê gorê, ew xweyê hemû kemala ye; nexwe: Allah e.

Di halê hebûna hemû kemalatan da jî, Ew «besît» e, eger newebe, wê ne xweyê «huwiyeta mutleq» be; nexwe tek û ehed e, lazima tekî û ehediyetê, wahidiyet û yekbûn e.

Çiko huwiyeta mutleqe ya komkerê hemû kemalatan, ji kêmasiyên ku li mahiyetê dizivirin dûr û berî ye, nexwe zatê wî yê muqedes «semed – bê niyaz» e û valahî têda nîne.

Çiko huwiyeta mutleqe ye, tiştek ji wî tewlîd nabe, çênabe û ew jî ji tiştekî cuda nabe; belkî ew bê cudahî ku mustelzimê nuqsanê ye, destpêk û zivirîngeha hemû tiştî ye.

Huwiyeta mutleqe jî, bê şirîk û bê hember e; çiko di serfa kemalê da, tekrar nayê tesewur kirin. Nexwe ev sûretê mubarek ji hukmên sirûştê û nisbeta Heq Teala ye.

## Meqamê sisê

### Mead ji meseleyên sirûştî ye

Ev gotin der heqê wê da ye ku, roja qiyametê ji meselên fitrî ye; ku bûye ji havênê hevîrê beşer. Ev jî wek du meqamên borî bi awayên sirûştî sabit dibe, ku li vêderê em ê îşare bikin bal hinekan ve.

Yek ji meselên sirûştî, ku di fitret û sirûşta beşer da hatiye çandin, sirûşta viyana rehetîyê ye. Tu ji kî bipirsî, di hemû dewrana da çi zana, çi nezan, çi bajarî û çi çolî, ku evqas zehmet û eziyet ji ber çiye û çima hûn xwe davêjin tengîyê, wê pêkve, yekdil û

yekziman bi zimanê deqe deqê sirûştê bêjin: Em çi bikin û çi bixwazin, em ji rehetî ya xwe ra dixwazin. Mexseda nihayî û xilaseka hêvî û arzûyê, rehetiya mutleq û îstiraheta bê zehmet û eziyet e. Û çiko ev rehetiya bê zehmet û bê dijwarî û nexweşiyê, meşûqê hemûya ye û her kes ew ê di tiştekî da goman dike û dibîne, ji ber wê, ewê xwesta xwe di çi da goman bike, jê hez dike. Her çend di vê alemê da, ev rehetiya bi vî awayî peyda nabe û ev îstiraheta xwerî û bê nexweşî, ne mumkin e. Hemû başiyên vê alemê tevlî zehmetê ne û hemû xweşiyên wê têkel derd û nexweşiya ne; derd, te'b û zehmet, kul û xeman seranserê vê alemê li ber xwe girtiye.

Di nav beşer da, di hemû dewranên jiyanê da tu nikarî kesekî bibînî ku xweşî û nexweşiyên wî beranber bin, heta vêca kesek bêt dîtin ku xwerî di nav xweşiyan ra be û nexweşî qet ser da neyên. Nexwe meşûqê mirov li vê dinyayê da peyda nabe; eşqa fitrî ya sirûştî ya fiîlî; ew jî di nav hemû mirovan da bê meşûqê fiîlî, ne mumkin e. Nexwe gereke di alema îmkanê da alemek hebe ku xweşiya wê tevlî nexweşiyê nebe, îstirahetek ne tevlî zehmetê jê ra hebe, xweşî û lezetek xwerî û xalis, bê kul, xem û mereq li wêderê jê ra hebe. Û ew cih û mal jî mala axretê ye.

Mirov dikare wê alemê bi sirûşta azadî û kartêkerî ya îradê jî ku di sirûşta beşerî da hatiye çandin, sabit bike. Çiko mewadên vê aleme, hal û wez'ê dinyayê û tengiya wê, gel azadî û kartêkeriya îrada beşer rêk nakeve, nexwe gereke alemek hebe ku îrade di wê da kartêker be û mewadên wê di beranberê kartêkirina îradê da hêç nebin û mirov li wê alemê da fealê ma yeşa [heçî tişta bivê, bike û dest ve bîne] be û hakim be li ser wê ya îrade dike, çawa ku daxwaza sirûştê ye.

Nexwe çengê eşqa rehetîyê û eşqa azadîyê du çeng û per in ku gorekî sirûşta îlahî ya ku guherîn têda neyî, di însan da hatiye danîn; da mirov bi wan bi aliyê alema melekûtê e'la û qurba îlahî ve bifire.

Di vî meqamî da hinek gotinên dî jî hene, lê ne munasibê vê kitêbê ne. Ji îsbata zanînên Heq yên wek pêxemberî û rêkirina kitêban ra jî hinek sirûşt hene. Bi heryek ji sirûştên ku hatine gotin, mirov dikare hemû mearifan sabit bike, lê me bi vî qasî bes kir ku em zehftir ji meqsûdê dûr nekevin û welê neyê ku şîroveya hedîsê ne munasib bibe.

Heta bi vêderê kifş bû ku: Ilmê bi mebde (destpêk), kemalat, wehdet û ilmê bi roja zivirîn û alema axretê, ji tiştên sirûştî ye. Hemd ji Xweda ra.

## HEDÎSA DUWAZDEHÊ

بسندی المتّصل إلی محمّد بن يعقوب، رضوان الله عليه، عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن النّوفلی، عن السّكونی، عن أبی عبد الله، عليه السّلام، قال: كان أمير المؤمنين [عليه السّلام] يقول:

**«نَبِّه بِالتفكُّرِ قَلبَكَ، و جَافِ عَنِ اللَّيلِ جَنبَكَ، وَاتَّقِ الله ربَّك.»**

Îmam Sadiq (a.s) dibêje, Mîrê bawerdaran digota: «Bi fikirkirinê, dilê xwe hişyar bike; şev, kêleka xwe ji erdê dûr bike; hay ji navbeyna xwe û Xwedayê xwe hebe».[1]

### Şîrove:

Ewa ji «kane yeqûl - digota» tê fêhmê, ne wek «qale - got» û «yeqûl - dibêje» ye. Çiko ji wê, dewam û îstimrar tê fêhmkirin. Nexwe kifş dibe ku ewî hezretî, ev xeberdan berdewam gotiye.

Tenbîh, deranîna ji bêxeberiyê û hişyarkirina ji xewê ye. Li vêderê herdu me'ne jî munasib in; çiko dil, pêş fikirînê da di bêxeberiyê û di xew da ye û bi tenbîhê, xeberdar û ji xew hişyar dibe. Xew, hişyarî, xeflet û hişyariya mülk ê bedenê û melekûta nefsê, gel hev muxtelif in: Çêdibe çavê eşkere û cenba mulk hişyar be, lê çavê batin û besîret di xew da be û cenba melekût a nefsê di xeflet û bê hişiyê da be.

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 54, h. 1

Tefekur, bikarbirin û şuxulandina bîr û hizr û fikrê ye. Bi vê me'nê ku, mirov tiştên me'lûm û kifş, bide ber hev, da tiştên mechûl me'lûm bibin. Ew berfirehtir e ji tefekura meqamatên salikan, çiko «Xaceyê Ensarî»[1] weha behsê jê dike: «Tefekur, ew e ku besîret bikeve pey daxwazê, da ewê peyda bike».[2] Kifş e ku daxwaza dil, mearif û zanîn in. Ji ber vê di hedîsa şerîf da jî mexsed ji tefekurê, taybeta dil û jiyana wê ye.

Dil û qelb, ev jî kelîmeyek e ku gelek me'ne û îstilah jê ra hene: Li bal doktor û xelkê, ji wî goştî ra tê gotin ku bi qutqutîn û vebûn û dadanê, xûnê di rehên bedenê da diherikîne û di wê da ruhê heywanî peyda dike. Li bal hekîman, ji hinek meqamatên nefsê ra tê gotin. Yên îrfanî jê ra hinek meqamatên mir'atî zanin, ku noqîbûna di îstilahên wa da, wê me ji mexsedê dûr bike. Di Qurana pîroz û hedîsên şerîf da, di cihên muxtelif da hatiye, hem di me'na ku xelk jê ra dibêjin, hem jî di me'na xas û taybet da. Çawa ku: «Izil qulûbu ledel henaciri kazimîn»[3] bi me'na mutearefa doktoran hatiye. «Lehum qulûbun la yefqehûne biha»[4] bi me'na di nav hekîman da hatiye. «Înne fî zalike le zikira limen kane lehu qelb...»[5] gorekî îstilaha arifan bi kar hatiye. Di hedîsa şerîf da jî bi munasebeta «tefekur»ê bi me'na ku hukema dibêjin, hatiye. Qelb, di hedîsê da bi me'na ku arif dibêjin, bê munasebet e; nexasima hinek ji meratibên wê me'nê, çawa ku ehlê îstilahê vê meselê baş zanin.

Gotina: «Cafi 'enil leylî cenbek»: Cefa, bi me'na be'ûde ye. Hasilê

---

1- Xwace Abdullahê kurê Muhemmedê Ensariyê Herewî (396-481 h.) ji muheddis û arifên mezin û murîdê Şêx Ebulhesenê Xirqanî bûye û piştî mirina wî bûye cihgirê wî. Menazilus Salikîn, Zadul Arifîn û risaleya Dilûcan ji eserên wî ne.

2- Menazilus Salikîn, p. 13, qismê "Bedayat", babê "Tefekkur".

3- Mumin / 18

4- E'raf / 179

5- Qaf / 37

vê ristê, kinaye ye ji wê çendê ku mirov bi şev ji nav cihkê xewê derkeve û ji îbadet ra rabe.

Li  vêderê em ê di çend vebiran da me'na hedîsê ronahî bikin.

**Vebir: Der heqê başiya tefekurê da ye**

Bizane ku ji tefekurê ra başiyên zehfî hene. Tefekur, kilîda deriyê zanînan û xizneyên kemalatan û zanista ye û pêşekiya lazim ji sulûka însaniyetê ra ye. Di Qurana şerîf û hedîsên pîroz da gelek qedr û qîmet jê ra hatine gotin û yê ewê terk bide, kêmasî jê ra hatiye çêkirin û hatiye avêtin. Di Kafî ya şerîf da, sened gihaye Îmam Sadiq (a.s) ku kerem dike: «Fikra mudam der heqê Xwedê û qudreta wî da, baştirîn îbadet e". Em ê paşê hinekî ji vê hedîsê biaxivin. Di hedîsek dî da dibêje: «Bêhnekî fikir kirin, ji îbadetê şevekî baştir e». Û di hedîsa Nebewî (s.a.a) da hatiye ku: «Bêhnekî fikir kirin, baştir e ji îbadetê salekî». Û di hedîsek dî da şêst sal. Û di ya dî da heftêh sal hatiye. Û ji hinek zanayên fiqih û hedîsê, hezar sal jî neqil bûye. Di her hal û karî da, tefekur derece û mertebe hene û ji her mertebekî ra jî netîce an netîceyan hene ku em ê hinek ji wan bêjin:

Ya yekê, tefekur der heqê esma, sifet û kemalatên Xwedê da ye, netîca wê jî peydakirina zanînê der heqê hebûna wî û tecelliyatên wî da ye, vêca ji wê, zanista bi eyan û mezahiran peyda dibe. Û eva he baştirîn merteba fikrê û qewîtirîn merteba burhanê ye; çiko bi nezera li zatê illetê û tefekura di sebebê mutleq da, ilmê bi wî û musebebat û me'lûlatan peyda dibe. Û ev nexşê tecelliyatê dilê sidîqîna ye, û ji ber vê yekê jê ra gotine: «Burhana sidîqîn»; çiko sidîqîn, bi muşahida zat, şuhûda esma û sifetan ji wan ra çêdibe û di ayna ezman (navan) da nisbet bi eyan û mezahiran ji wan ra şuhûd çêdibe. Ji vî qismê burhanê ra ku dibêjin burhana sidîqan, ji ber wê ye ku eger sidîqek bixwaze muşahidatên xwe bîne ser şiklê burhan û delîlê, ew tişta ku şuhûd kirî bixe di qalibê gotin û peyvan da, wê weha lê be. Ne bi vê me'nê ye ku, her

kes pê vê burhanê bigehê ilmê bi zat û tecelliyatan, ew tenê ji sidîqan ra ye; an ku mearifên sidîqan ji qismê burhanê ye; lê burhana taybet. Heyhat ku ulûmên wan ji cinsê tefekurê bin, an muşahidatên wan muşabih bin gel burhanê û pêşekiyên wê. Heta ku qelb di hicaba burhanê da ye û qedema wî qedema tefekurê, negihaye ewilîn merteba sidîqan jî. Û dema ji hicaba stûra burhanê xilas bû, êdî şol bi tefekurê nîne û bê navgînî û wasita burhanê û belkî bê wasita tiştekî jî di axirîka kar û dûmahîka sulûkê da wê bigehê muşahida cemala Cemîlê Mutleq û bigehê lezeta daim û ji alemê û heçî ya di wê da, xilas bibe û di bin qubaba kibriyaî da bi fena kullî bimîne û ji wî ism û resmek nemînê û bibe mechûlê mutleq; îlla ku înayeta Heq, wî li ber xwe bigire û ewî li memleketê wî bizivirîne û di vê zivirînê da keşfa sebuhatên cemal û celalê ji wî ra çêbe û di ayna zat da esma û sifetan muşahide bike û ji wê bigehê şuhûda eynê xwe yê sabit û heçî ya di bin sîbera himayeta wî da ye; û kêfiyeta sulûka mezahiran û zivirîna li eşkereyê ji qelbê wî ra kifş bibe; vêca muftexer bibe bi xel’eta nubûwetê. Û îxtilafa meqamatên pêxemberan di vî meqamî da eşkere dibe; qasê firehî û tengî ya daira risaletê, di vî meqamî da ji wan ra derdikeve meydanê. Û pir xeberdan di vê behsê da gel vê kitêbê munasebet tunehin, vêca me ji wê û ji burhana sidîqan dest kêşa, çiko ewê hinek pêşekî hene ku xeberdana ji wê, dibe sebebê dirêjiya gotinê.

**Tetmîm, tefekura erîtî û nerîtî di zatê Xwedê da**

Gereke bêt zanîn eva he ku me der heqê tefekura di zat, esma û sifetan da gotî, çêdibe yê cahil goman bike tefekura di zat da bi heseb riwayetan memnû’ e û nezane ku tefekura memnû' ew e ya ku der heqê kunh û çawaniya zat da ye, çawa ku ji riwayetên şerîfe tê fêhmê. Carna jî yên ne ehl paşde dane ji nêrîna hinek mearifan ku pêşekiyên deqîq hebûne, çawa ku hukema jî di herdu meqaman da muwafiq in. Îstilaha kunha zat jî, bi burhanê di kitêbên wan da hatiye û men’a tefekura di wê da jî li bal hemû-

yan muselem û diyar e. Der heqê şertên ketina di van zanîna da û hîn nekirina ne ehlan jî, di kitêbên wan da hatiye û tewsiya wan ya vê der heqê da di ewil an axirîkê da hatiye nivîsîn, çawa ku du feylesofên mezinê Îslamê, pêşwayên vê fennê, «Şêx Ebû Alî Sîna» û «Sedrul Muteellihîn»(1) di axirê Îşaratê û destpêka Esfarê da şîreta xwe ya vê der heqê da gelek ronahî gotine. Berê xwe bide wan.

Lê vêca nêrîna li zat, ji bona îsbata wucûdê, tewhîd, tenzîh û teqdîsa wî, axirîn xwesta enbiya û arifan bûye. Qurana pîroz û hedîsên şerîf jî tijî ye ji ilmê bi zat, kemalat, esma û sifetê zatê muqedes; Heq Teala nebaşiya mulhid ên ezman gotiye. Û çi kitêbek ji kitêbên hukema zêdetir ji kitêba pîroza Xwedê û kitêbên pêbawerê exbaran, xwe di kûratiya îsbata zat, esma û sifetan da bernedaye. Û ferqa ku navbeyna gotinên pêxembera û kitêbên hukemayan da heyî, ne di me'nayê da ye; belkî di îstilahan û di kurtî (îcmal) û dirêjiyê (tefsîl) da ye; çawa ku ferqa fiqih û exbarên fiqhî jî di îstilah, kurtî û dirêjî ya xeberdanê da ye. Lê musîbeta mezin ew e ku, hinek nezanen di lîbasê uleman da, vê paşiyê ra peyda bûne ku bê kêşek, nezanî û dûrê ji Quran û sunetê, cehl û nezaniya xwe kirine delîla betalî ya ilmê bi mebde (destpêk) û me'adê (axirîk) û ji germkirina bazara xwe ra, nêrîna li mearifan ku mexseda nihayî ya enbiya û ewliya ye (a.s) û kitê-

1- Muhemmedê kurê Îbrahîmê Şîrazî (979-1050 h.) nasnavê wî «Sedrud Dîn» û «Sedrul Muteellihîn» e. Navdeng bûye bi Molla Sedra û ji hukemayên Îslamî yên mezin e. Ew danerê «hikmeta mutealiye» ye û di felsefê da fikrên wî yên nû û taze hene. Mekteba felsefî ya Sedrul Muteellihîn piştî wî ser mektebên felsefî yên dî ket û zêdetirê hukemayên Îslamî piştî wî ji peyrewên mekteba wî ne. Esfarê Erbe'e ku fikrên wî yên felsefî di xwe da girtine, ji muhimtirînê eserên wî ne. Ew ji feqiyên Muheqiqê Damad û Mîrfindiriskî û Şêxê Behaî ye. Mela Muhsinê Feyz û Abdurrezaqê Lahîcî jî ji feqiyên wî ne. Tefsîra Quranê, şerha Usûla Kafî, Mebde û Mead, Mefatîhul Xeyb, Şewahidur Rubûbiyye, Esrarul Ayat, haşiya ser Şifayê, ji eserên wî yên nivîsandî ne.

ba Xwedê û riwayetên Ehlê Beytê (a.s) ji wê tijî ne, heram nîşan didin û xwe ji gotina çi xeberên xirab venadin û berê dilê evdan ji ilmê mebde û me'adê dizivirînin û bûne sebebê îxtilafa navbeyn a musilmana da. Û eger jê bêt pirsîn ku, ev hemû tekfîr û tefsîq ji ber çi ye? Hedîsa «La tetefekkeru fî zatillah»ê dibêjin. Rebenê nezan, ji du aliyan ve ketiye nezanî û xeletiyê; yek ev ku goman kiriye hukema di zat da tefekurê dikin, halhale ew pêşîgir in li tefekura zat da û ev yek ji meselên xweyê delîl e di vî ilmî da. Ya dî jî ew e ku me'na hedîsê nezanîne û goman kirine qey qet gereke navek ji zatê muqedes neyê birin.

Niha em ê hinek hedîsa bînîn û gorekî fikra xwe ya kurt û qasir, em ê navbera wan cem bikin û însafê bikin hekem. Her çend hinekî ji behsa me ya vêderê der e, lê belkî ji rakirina şubhê û ibtala batil ra lazim be.

Ji Ebû Cafer (a.s) riwayet bûye: «Der heqê mexlûqê Xwedê da biaxivin û der heqê Xwedê da, ne. Çiko xeberdana der heqê Xwedê da, ji şaşiyê pê ve li xweyê xwe zêde nake». Ev hedîsa şerîf bi xwe gorekî sebebê di axirîka hedîsê da hatiye, delîl e ji wê çendê ra ku der heqê kunhê zat û çawanî ya wê xeberdan çênebe. Çiko xeberdana der heqê sabitkirina zat, kemalatan, tewhîd û tenzîha wî, nabe sebebê heyret û şaşiyê. Û çêdibe ku nehy be ji wî kesî ra ku xeberdan di vî meqamî da jî bibe sebebê şaşiya wî. Rehmetî muhedisê «Meclisî», herdu îhtimal jî durist zanîne, lê ne wek ronahîkirina me; ya yekê bihêz xistiye.

Riwayetek dî dibêje: «Der heqê her tiştî da biaxivin, lê der heqê zatê Xwedê da neaxivin». Û bi vî mefhûmî û bi vê naverokê riwayetên dî jî hene.

Riwayet e ku: «Newebe hûn di Xwedê da fikir bikin, lê dema hewe xwest hûn li mezinahiya wî binhêrin, berê xwe bidin mezinahî û giringiya mexlûq û afirandina wî». Eşkere yê vê jî nehya ji fikra di kunhê zatê wî da ye. Çiko di axirîkê da hatiye: «Lê dema hewe xwest hûn li mezinahiya wî binhêrin, berê xwe bidin mezi-

nahî û giringiya mexlûq û afirandina wî». Û ewê ji xwe ra bikin delîl. Û ev ji nimûne û misalê ye ji xelkê ra, ku rêka zanista wan, fikirkirina di afirandinê da ye.

Eva riwayetan û hedîsên dî yên wek wan hedîsên ku ji tekelum û tefekura vê der heqê da nehy dikin, delîl in ji gotina me ra.

Tişta ku gotinê ronahîtir dike hedîsa şerîfa Kafiyê ye, ku Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Tefekura daim der heqê Xwedê û qudreta wî da baştirîn îbadet e». Nexwe fikir kirin der heqê Xwedê û sabit kirina zat û tefekura der heqê qudret, esma û sifetên dî da nehema nehy jê nehatiye kirin, belkî baştirîn îbadet e.

Her weha ji hezretê Alî kurê Husêyn (selamên Xwedê li wan bê), riwayet bûye ku dema der heqê tewhîdê da pirsiyar jê kirin, got: «Xwedayê ezîz û celîl, zaniya wê di axir zeman da hinek peyda bibin ku xwe di tişta da berdidin, ji ber wê «Qul huwellahu ehed» û ayetên sûretê Hedîd, heta «Alîmun bizatis sudûr» rê kirin. Vêca kesê ji wê zêdetir bixwaze, wê ji nav biçe». Eger ev ayetên şerîf vê der heqê da ji tîjfikran ra hatine, ma dîsa wê bêjin fikra di Xwedê da heram e? Ma kîjan arif û hekîmî pirtir ji wê ya di ayetê da hatî gotiye? Nihayeta zanîn a wan gihana vê ye ku: «Sebbehe lillah ma fîs semawat wel erd». Ma ji ayeta «Huwel ewwelu wel axiru wez zahiru wel batin we huwe bi kulli şeyin ‘elîm» di tewsîfa Xwedê û celewatên zatê muqedes da, kî ronahîkirinek baştir heye? Sond bi canê dost, eger ji vê pê ve di kitêba kerîm da tunebûya ji ehlê dil ra bes bû. Piçekî binhêrin kitêba Xwedê û xutbe û asar û exbarên Resûlê Xwedê (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) û cihgirên wî yên pak û paqij û bibînin ku di her behsekî ji van behsa da kîjan hekîm û arifî gotinek ji ya wan pirtir heye. Xeberdana wan tijî ye ji behsa wesfê Heq Teala û delîl anîna ji zat û sifetên wî zatê muqedes ra, bi awayek wereng ku her kes gorekî xwe dikare jê hilîne.

Nexwe ji van riwayetan tê dest ku, tefekura di zat da bi awayê fikirkirina di kunhê zat û çawaniyê da memnû’ e, çawa ku di

hedîsê da hatiye: «Ji nav çûye kesê di çawaniya Xwedê da hizir bike». An jî ji bona li hev anîna riwayetên vê der heqê da heyîn, mirov dikare weha bêje: Ew koma ku dilê wan nikare delîlê ragire û qabiliyeta wan ji bihîstina van behsan ra nîne, bila nekevin nav van xeberdana ra, şahidê vê li hev anîne, di riwayetan bi xwe da heye. Lê yên ehlê wê, ji bona wan, ev baştir û belkî sertir ji hemû îbadeta ye.

Welhasil em ji mexsedê derketin, lê xêncî ji wê çare nebû; çiko vê dûmahîkê ra xeberên nexweş û tuhmet zehf bûne û belkî gotin di hinek dilan da eser bike û eger yek mirov evê gotinê qebûl bike ji min ra bes e. «Wel hemdu lillah we ileyhil muşteka».

**Vebir: Der heqê fikirkirina di aferîde da ye**

Yek dî ji derecên fikrê, fikra di xilqetê da ye ku çiqas hûr û deqîq û cihgirtî hatiye çêkirin, desthata wê jî ew e ku mirov pê dihese ku, destpêk kamil û çêker hekîm e. Û ev vajeyê burhana sidîqîna ye. Çiko destpêka burhanê di wî meqamî da Heq Teala ye û ji wê, ilmê bi tecelliyat û ayetan tê dest, lê di vî meqamî da destpêka burhan ê mexlûq e, û bi wan zanîna bi mebde û xaliq tê dest û hasil dibe. Ev delîl û burhan ji xelkê me'mûlî ra ye ku, behr di burhana sidîqîna da tunehin. Û ji ber vê belkî gelek evê înkar bikin ku nêrîna li Heq bibe destpêka ilmê bi wî, vêca ilmê bi mebdeê bibe sebebê ilmê bi mexlûqan.

Welhasil, fikir kirina di alema xilqetê da ji ilm û zanistên pirfeyde ye û ji karên qencên dilî û ji seratirîn îbadeta ye, çiko netîce û desthata wê hêjatirînê desthata ye. Her çend netîca alî, remz û raza waqiî ya hemû îbadetan, hema dest ve anîna mearif û zanîna ye; lê ev dest me ve nayê û ji wê ra ehlek heye ku her îbadetek di wan da tovê muşahidê an muşahidatan direşîne. Di her halî da, heta niha remz û raza xilqetê bi duristî ji beşer ra eşkere nebûye. Binyata wê ewqas deqîq, muhkem û cihgirtî ye û sîstema wê cemîl û li ser uslûba kemalê ye, mewcûdek her çend kêm û piçûk tê dîtin, eger beşer bi zanîna xwe ya sedan sale lê binhêre

ji hezar behran ji behrekî jî agahiyê peyda nake, heta vêca çi dor bigehê zanînek deqîq û hûr, der heqê vê alemê da.

Em ê berê hewe bidin yek ji deqaiqên xilqetê ku berfirêhtir e, vêca tu ji vê ya kurt, bi berfirehiya wê bihesî.

Ey ezîz, binhêre vê nisbeta di navbeyna roj û erdê da heyî; bi mesafetek me'lûm, bizav û hereketek taybet li dora xwe û rojê dizivire; bi awayekî wereng dizivire ku şev û roj û feslên salê çêdibin; çiqas bi hikmet û bine cih hatiye çêkirin ku eger ne bi vê tertîbê bûya, yanî roj nêzîktir an dûrtir bûya, ji ber germayê di şiklê yekê da û ji ber sar û sermayê di şiklê duwê da qet tiştek ji maden, giya û heywana di erdê da çênedibûna. Û eger pê vê nisbetê bûya, lê sakin û sekinî, roj û şev, feslên salê çênedibûna û pirtir an erd hemû, wê tiştek têda çênedibûya. Ne hema ev tenê, belkî zêdetirîn dûrî ya erdê ji rojê ketiye aliyê şomalê (bakûr), da ku germa zêde nebe û zerer negihê meknûnatan. Û nêzîktirînê wê ji rojê ra jî ketiye aliyê cunûbê (başûr), da ku serma zererê negihîne mexlûqê ser rûyê erdê. Bi vê jî bes nebûye, vêca heyv ku di gihandina tiştên erdî da eser heye, di gerhana digel erdê da muxtelif kiriye, bi awayek wereng ku dema roj di şomalê erdê da ye, heyv di cunûbê da ye û bervajiyê wê vêca dema ew di menteqa cunûbî da ye, eva he di şomalê da ye, da mewcûdên erdî feydê jê bibînin. Ev, yek ji wan tişta ye ku mirov bi başî pê dihesihê, lê vêca pê hesana hemû wan hûriyan ku di xilqetê da heyîn, tişteke ku hema tenê xaliqê wê pê zane û bes.

Çima em evqas dûr çûn, eger kesek qas zanîna ku heye di afirandina xwe da bifikire, wê bibîne ku ji aliyekî ve ew hêzên pê hesan û derk kirinê di mirov da danîne ku, heryek bi awayek ecêb bi hinek tiştan dihese. Û tiştên me'newî vêca ku bi hisên zahirî îdrak nabin, hisên batinî û navdeyî jê ra danîne ku wezîfa vê pê hesanê, bi hêviya wan ve ye.

Tu desta bikêşe ji zanista ruh û hêzên ruhaniye yên nefsê, ku mirov jê bêbehr e, binhêre zanista bedenî û taybetiyên heryek ji endamên eşkere û navdeyî bide ber çav û têda fikir bike, vêca

bibîne çi sîstemek ecêb û xerîb e; digel wê yekê ku însan digel vî ilmê xwe yê sedan sale, bi hezaryeka wê nehesaye û hemû zana gelek eşkere kêmasiya zanîn a xwe vê der heqê da dibêjin û digel vê yekê ku bedena mirov li beranberê tiştên dî da zereyek jî hesab nabe, erd û mewcûdatên wê hemû vêca di beranberê sîstema rojî da tiştek qabil hesab nabe û ev sîstema rojî vêca di beranberê sîstmên rojî yên dî da ne qabil e. Û ev sîstemên giştî [umûmî] û piçî [cuz'î], bi tertîbek hevgirtî û sîstemek mureteb ava bûne ku qas zerekî kes nikare xirabiyê bîne ser, her weha aqilê beşer di beranberê wê da heyirî û şaş maye. Gelo piştî vê hemûyê ku tu bidî fikra xwe, tu ji tiştek dî ra muhtac î bo vê çendê ku pê bihesî û îqrar bikî ku yekî zana û hekîm ku tiştek wek wî nîne, ev alem bi vî awayê hekîmane û sîstem û tertîbek binecih afirandiye? «E fillahî şekkun fatiris semawatî wel erd».

Ev hemû ku beşer nikare fêhm bike û bizane bi xwe bi xwe çênebûye. Kor be çavê wî dilê ku Xwedê nebîne û cemala cemîl a wî di van tiştan da muşahide neke. Bimire ewê digel van hemû nişan, eser û dewsan dîsa di şik û dudiliyê da be. Lê çi bike mirovê reben ku di nav ewhaman ra ye? Eger tu tizbîyê xwe nîşa bikî û bêjî ev tizbe bê ku kesekî bi benk ve kiribe, ew bi xwe wereng e, wê xelk hemû li aqilê te bikenin. Musîbet ew e ku eger tu saeta xwe derînî û evê de'wa ku te ji tizbeyê xwe ra kirî, tu dîsa bînî ser ziman, gelo wê te ji nav aqilan derînin û hemû aqilên alemê wê te di nav bira dînan da deynin? Eger ji wî ra ku vê hevgirtina piçûk ji dewra illet û esbaban derêne, jê ra bêt gotin: Dîno! ji nav koma aqilmendan derkeve, wê ji wî ra ku bêje ev alem û ev mirov bi xwe çêbûye, çi bêt gotin? Gereke ew di nav koma aqilan da bêt hesab kirin? Gelo kîjan bê aqil ji wî bê aqiltir e? «Qutilel însan ma ekfereh». Bimire ewê bi zanînê sax nabe û noqî bûye di deryaya rêwindabûnê da.

#### Vebir: Der heqê fikirkirina di ehwalê nefsê da ye

Yek dî ji derecên tefekurê, fikir kirina di ehwalê nefsê da ye, ku netîceyên zehfî û gelek zanîn ji wê tên dest. Vê gavê çavê me li

dû desthata ye: Yek ilmê bi roja qiyametê; ya dî ilmê bi rêkirina pêxember û hinartina kitêban; yanî: Nubûweta amme û şerî'eta Heq. Yek ji haletên nefsê, halê teceruda wê ye.

Kêmtir mesele hene ku hukemayan evqas muhim girtibin û delîl li ser anîbin û ronahî kiribin. Vê gavê, me ne li ber e ku bi dirêjî em ji teceruda wê biaxivin, ji ber wê em ê hinek mebadiyên kêmzehmet bînin û di pey ra em ê ji mexsedê biaxivin.

Gorekî gotina hemû doktorên beden nas, piç û endamên mirov pêkve, ji mêjî bigire heta bê qîmetirîn piçên bedenê ji 35 an 30 saliyê li kêmê didin û berew lawazî û zeîfbûn û sistiyê diçin û me bi xwe jî tecrube kiriye ku lawazî û sistî di hemû hêzên bedenê da xuya dikin. Lê vêca hema ji vî temenî yanî sî - çil saliyê pê ve, hêz û quweyên ruhanî û îdrakatên aqlî kamiltir û berew zêdahî ne. Eva he vê netîcê dide ku quweyê îdrakiye yê aqliye, ne cismanî ye; çiko eger cismanî bûya wê wek hêzên dî yên cismanî berew zeîfî biçûya. Mirov nikare bêje ku ji ber bikarbirina zêde û tecrubê, hêza aqlî xurt bûye, çiko hemû hêzên cismanî pê bikarbirina zêde û zehfî li kêmê didin û berew zewalê diçin, ne ku xurt û qewî dibin. Û eva he delîla cism û cismanî nebûna hêza aqlî ye.

Ji bo ji navbirina wê ya me got, pêşkêşana vê meselê ku halê pîratiyê ku hêza fikrî jî di wî halî da kêm dibe, ne di cih da ye, çiko çi yek ji hêzên cismanî heta temenê pîratiyê berew zêdahî nînin, heta bêt gotin ku filan qetê cism cihê îdrakatên aqlî ye û heta omrê pîriyê li xwe zêde kiriye û niha ku zeîf bûye hêza fikrê jî zeîf bûye. Ev yek; ya duwê: Ew halê zeîfî ya di zemanê pîriyê da jî der heqê wê fikrê wa ye ku muhtacê hêza cismanî ye; lê vêca îdrakatên xwerî [xalis] û melekatên baş û xirab hingê jî ji pêşda xurtir in, her çend xweyhan û xweyhandina wan kêmtir e. Bi kurtî em bêjin ku: Ji îsbata mude'a me ra hema xurtî ya îdrakê di omrê çil saliyê da bes û kafî ye.

Lê bi gotinek dirêjtir eger em ji îşkala jorî biaxivin, gotin dibe ev ku: Çiko nefs, hêzên xwe ji mulkê bedenê dertîne û hêzên wî li

https://t.me/caferilikcom

www.caferilik.com

batin û navdeyê wî dizivirin, heçî hêza nêzîktirê alema cism û cismaniyetê be, zûtir berew zeîfî û sistiyê diçê û heçî ya dûrtir be, derengtir zeîf û sist dibe. Lê hêzên alema tecerud û melekûtê, qewîtir û xurtir dibe; ev delîl e ji wê yekê ra ku nefs, ne cism û cismanî ye.

Her weha taybetî, xasiyet, eser û kiryarên nefsê, dijatî hene gel xasiyet, eser û kiryarên cisman; ev, delîla cism nebûna nefsê ye. Mesela: Em zanîn ku cism, ji yek sûretê pê ve qebûl nake, eger bixwaze sûretek dî bigire gereke sûretê ewil ji nav biçe, heta sûretê duwê jê ra çêbe. Wek kêşana şiklekî li ser şiklek dî ku gereke şiklê ewil ji nav biçe, heta şiklê duwê bêt kêşan, ev hukmê aqil e ku di hemû cisman da carî ye û diherike. Lê nefs, eger sûretek di wê da hatibe kêşan, sûret û şiklên dij û muxalifê wê jî çêdibe ku li ser bêt kêşan, bê wê yekê ku sûret û şiklê ewil jê biçe.

Her weha her cismek şiklê wê, nihayet jê ra heye; lê şiklên nefsê bê nihayet û dawî ne; ji ber vê yekê ser umûrên namutenahî hukm dike.

Her weha cismê ku sûretek jê biçe, êdî ew sûret, bê sebebek nû di wê da çênabe; lê sûretên ku ji nefsê xef dibin bê sebebek taze, lê dizivirin. Vê gorekê, kifş bû ku nefs di xasiyet, eser û kiryarên xwe da digel hemû cisman dij e; ew mucered e û ne ji qismê cism û cismaniya ye û xirabî di muceredata da çênabe -çawa ku di cihê wê da delîl jê ra anîne- çiko xirabûn bê maddeya qabile çênabe û mucered maddeya qabile jê ra tunehin; çiko ew ji lazimên cisma ye. Nexwe xirabûn jê ra nîne.

Desthat bû ev ku, nefs bi xirabûna bedenê û cudabûna ji wê xirab nabe, belkî di alemek dî da, her dimîne û ji navçûn û fena jê ra nîne. Û eva he me'ada ruhanî ye ji nefs û ruhan ra, ku pêşiya qiyametê da ji wan ra heye, heta ku Xwedê îrade bike ewan li bedenê bizivirîne. Û niha me li ber e li beranberê munkirê me'adê da em ewê sabit bikin û eva he pê wê ya me gotî ronahî bû.

Gereke bêt zanîn ku, selametî, nexweşî, başî, xirabî, bextewerî û bextreşî ji ruh û nefsê ra heye; ku agahiya hûrhûr bi hemû çiq û belgên wê û zanîna temam, ji zatê eqdesê îlah pê ve, li bal kes dî nîne [zanîna wê hema tenê li bal Xwedê ye]. Di vê sîstema kamil da, ku xaliqê wê hekîm e û bi her tiştî zane, çênabe ku rêka hînkirina rêka seadet, şeqawet, hîdayetê û rêka baş û xirab, bêt îhmal kirin û muhim neyê zanîn; çiko îhmal û dilxavîkirina wê, an ji ber kêmasiya di zanînê an di qudret û karînê da ye û an ji ber buxl û zulmê ye. Kifş bû ku zatê muqedes ji van hemûyan dûr û berî ye; Ew kamilê bêkêmasî û xêrderê kamil e. Û îhmala nîşandana rêka seadet û şeqawetê xirabiyek mezin tîne ser hikmetê, nexwe lazim e ev rêk bên nîşandan, heta bi vêderê du desthatên ronahî, ketin dest: Yek, şerî'et ku nusxa selametiya ji nexweşiyên nefsî ye, xêncî ji Xwedê, ne li bal kesek dî ye; ya dî ev ku, muheqeq Xwedê ewê radigehîne û dibêje. Û me'lûm e ku ev tişta girîng, ku zanîna wê hema li bal wî tenê ye, gereke bi rêka wehy û îlhamê ve bêt cih; yanî gereke Xwedê ewê bide hîn kirin. Eva he jî ronahî ye ku, mirov pêkve ne qabil in ji vê yekê ra û qabiliyeta vî meqamî û pêkanîna vê wezîfe û berpirsiyariyê nînin û di her çend sedsala da hema çêdibe yekî xweyê vê qabiliyetê peyda bibe û evê berpirsiyariyê pêk bîne. Vêca Xwedê ewî rê dike ku rêkên bextewerî û bextreşiyê nîşan bide û xelkê ji wê ya xêra wan têda ye, agah û xeberdar bike. Û dibêjin vê, nubûweta amme.

Wekî xeberdan giha vêderê, bi munasebet ez gotinekî bedîhî bêjim, ew jî ev e ku: Dema me zanî hatina şerî'etê ji aliyê Xwedê ve lazim e û em berê xwe bidin şerî'etên ku di nav xelkê da heyîn -ku girîngê wan sê ne, şerî'eta Cihû [Yehûdî] û ya Filan [Mesîhî] û şerî'eta Îslamê- em dibînin ku şerî'eta Îslamê di sê meqaman da ku esasê şerî'etê ne -yek, der heqê eqîde û bawerî yên heq da, ku zanînên der heqê Xwedê, qiyametê, melaîketan û pakiya pêxemberan (a.s) li ber xwe digire. Ya dî der heqê xesletên qenc û duristkirina nefsê û exlaqên baş da ye. Û ya sisê der heqê kiryarên ferdî, îctimaî û siyasî... da ye- ji yên dî kamiltir e. Û belkî

eger her xweyê însafek, bê xerez lê binhêre, wê bibîne ku gel wan nayê qiyas kirin. Û di hemû dewranên jiyana beşer da qanûn û şerî'etek weha cihgirtî, binecih û di hemû merhelên dinyayî û axretî da kamil û temam, tunebûye. Û eva he bi xwe mezintirîn delîl e li ser heqaniyeta wê.

Kurtê gotinê ev e ku: Piştî îsbata nubûweta amme û eva he ku Xwedê şerî'etek ji beşer ra daniye û bi rêka hîdayetê hesandine û ew di bin nezm û nizamekî da danîne, îsbata heqaniyeta dînê Îslamê, ne muhtacê çi pêşekiya ye; xêncî ji vê ku mirov berê xwe bide wê û ewê di tiştên ji mirov ra lazim –eqîde, exlaq û amel- qiyas bike gel dîn û şerî'etên dî. Û ev, yek ji me'nên vê hedîsa şerîf e ku kerem dike: «Îslam bilind e û tiştek ser wê nakeve». Çiko çiqas aqilê beşerî pêş bikeve û bi tiştan bihesin, dema berê xwe bidin delîl û burhanên Îslamê, wê xwe li beranberê ronahî ya hîdayeta wê da bişikînin û tu delîlek di alemê da ser wê nakevin.

Hasilê delil a me ji sabitkirina pêxemberî ya Xatemun Nebiyîn ra (selewat û selamê Xwedê li ser wî û alê wî bin) bû ev: Çawa binecih bûna afirandinê nîşana me dike ku, ewê çêkerek heye û zanîna wî her tişt li ber xwe girtiye, bi wî awayî binecih bûna şerî'etekî ku bi baştirîn şikl îhtiyac û niyaza beşer bi hemû aliyên wê ve radike, nîşana me dide ku danerê wê, ilm û zanînek berfireh û hemû alî heye û her tişt li ber xwe girtiye. Û çiko bi hukmê aqil em pê dihesin ku ji beşerekî nayê, ew jî ders nexwendî û li cihekî ku xelkê wê ji kemalatan dûr bûne, ku vê sîstema kamil, tam û temam ji bal xwe bîne. Veca em fêhm dikin ku ev şerî'et ji rêkek xeybî û mawerayê tebîet hatiye danîn û bi rêka wehy û îlhamê ve gihaye wî hezretî. Û hemd ji Xwedê ra ji ber ronahî bûna delîlê.

Min dixwesta ez behsa meqamek dî yê tefekurê jî bikim. Fikra di alema mulk da, ku netîca wê jî zuhd e; lê çiko di meqamê pêştir da kontrola qelemê ji dest min derket û gotin dirêj bû û em ji behsê derketin, ji ber wê min dest jê kêşa.

**Vebir: Başiya hişyarî ya di şevê da**

Du behsên dî ji hedîsa şerîf mane ku gereke em jê biaxivin. Hezretê Mîrê bawerdaran (a.s) di vî gotina xwe da: Rabûna di şevê û cudakirina kêlekê ji cihkê xewê, mijûl bûna bi amelê dilî û fikra hişyarker û teqwa îlahî hevrê kiriye digel îbadet, eva he delîla ser muhimiya wê ye. Çawa ku di hedîsên şerîf da ev amelê gelek hêjayî zanîne; ku hay jê mana wê, sîreta pêşkarên rêrastker, seyda û alimên mezin bûye, belkî hema ne ji îbadet ra jî hay jê mane ku di axirîka şevê da hişyar bimînin. Di kitêba Wesailê da ku ji kitêbên berketî yên îmamiyeya ye û alim û feqîh daim behrê jê digirin, çil û yek hedîs der heqê hêjana wê da û çendîn hedîs der heqê keraheta terk a wê da anîne, her weha dibêje di behsên dî da jî hedîs der heqê wê da hene. Hedîsên di kitêbên dua da jî heyîn ji xwe nayên jimartin, ku ji teberuk re em ê çendeka bînin:

Muawiye kurê Emmar dibêje, min ji Îmam Sadiq (a.s) guh lê bû, digota: «Di wesiyeta Pêxember (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) da ji Alî (a.s) ra hatiye ku: «Ey Alî, ez ê çend xesleta ji te ra bêjim, tu jî ewa ji xwe ra bigire». Paşê got: «Ya Rebbî, Tu alîkarê wî be...» di dewamê da dibêje: «Hay ji nimêja şevê û tehecudan hebe». Û sê caran evê gotinê tekrar dike. Ji ser û binê hedîsê, muhimiya tehecudan bi başî tê fêhmê.

Ji Îmam Sadiq (a.s) dîsa riwayet bûye ku: Hezretê Resûl got Cebraîl, şîretan li min bike; vêca wî got: «Ey Muhemmed! Te çiqas bivê bijî, lê tu wê her bimirî; tişta tu bixwazî hejê bike, lê paşî ra tu dê jê biqetî; çiqas te bivê amel bike, çiko muheqeq tu dê raberê wê bibî. Bizane hêjana bawerdar di rabûna wî ya şevê da ye; qîmetê wî di wê da ye ku xwe ji bêavrû kirina xelkê paşda bide». Eva he ku Cebraîl (a.s) di halê şîretkirina Pêxember (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) da evê dibêje, muhimiya wê nîşan dide. Û eger wî tişek ji wê muhimtir bizaniya wê bigota.

Ibn Abbas (r.a) dibêje, Pêxember (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) di xeberdanek ya xwe da kerem kir: «Jin an zi-

lamê ku nimêja şevê bibe behra wî, xalis û xwerî ji Xwedê ra rabe; vêca baş destnimêj bigire û bi niyetek durist û dilek teslîm bûyî û bedenek şikestî û çavê tijî rondik ji Xwedê ra nimêj bike, wê Xwedê heft rêzên melaîketan li pey wî deyne, ku jimara her rêzekê ji Xwedê pê ve kes nizane. Aliyekê rêza wan li rojhelatê ye û yek li rojavayê. Vêca dema ji nimêjê xilas bû, Xwedê bi qas jimara wan (melaîketan) jê ra xêr dinivîsê».

Enes dibêje, min ji Resûlê Xwedê (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) bihîst ku got: «Du rikat nimêj di nîvê şevê da li bal min xweştir e ji dinyayê û tişta di wê da».

Di gelek hedîsan da jî hatiye ku: «Tehecud, şerefa bawerdar e û xemla axretê ye; çawa ku mal û zarok xemla dinyayê ne».

Cabir kurê Abdullahê Ensarî dibêje, min ji Resûlê Xwedê (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) bihîst ku got: «Xwedê Teala hema ji ber wî qasî Îbrahîm (selam li ser wî bin) ji xwe re kir dost, çiko nander bû [înfaq dikira] û dema xelk di xew da, ew mijûlê tehecuda bû». Eger nimêja şevê ji wê (dostiyê) pê ve çi seratî tunebûna jî, ev jê ra bes bû; lê ji ehlê wê ra, ku ew, ne yên wek min in. Em nikarin fêhm bikin ku lîbasê dostiyê çi lîbas e û kanê eva he çi mertebe ye ku Xwedê kesekî ji xwe ra bike dost; aqil hemû ji têgihana wê nekar in. Eger bihiştan hemûyan bidin xelîl û dost, ji xwe berê xwe nadiyê. Eger te jî mehbûbek ezîz an dostek mehbûb hebe û bêt bal te, tu wê berê xwe ji hemû xweşiyan bizivirînî û bi cemala mehbûb û liqaya dost ve mijûl bibî, halhale ev misal gelek ne munasib e û ferqa wê beynel meşriqeyn e.

Seneda hedîsê digehê Îmam Sadiq ku kerem dike: «Xêncî ji tehecudan, heçî karê baş ê ebd dike, xêra wê di Quranê da hatiye nivîsîn, lê Xwedê Teala ji ber hêjan û giringî ya wê li bal wî, behsa xêra wê nekiriye. Weha dibêje: «Tetecafî cunûbuhum 'enil mezaci' yed'ûne rebbehum xewfen we teme'n» (Secde / 16). Vêca kes wê şahî û xweşiya ji ber karê kirine, ji wan ra xef mayî nizane.

Gelo ev şahî û xweşiya ku Xwedê ji wan ra zexîre kirî û veşartî, ku kesî agahî jê nîne, çi ye? Eger ji qismê rû û rûbarên diherikin û qesrên bilind û xweşên bihiştî bûya, wê Xwedê bigota, çawa ku ji kar û amelên dî ra beyan kirî û gotiye, melaîketan xeber jê heyî. Nexwe me'lûm dibe ku ne ji sinx û cinsê wan nîmeta ye û girîngtir e ji wî qasî ku kesek bikare bibihîze, nexasima ehlê vê alemê. Xweşiyên wê alemê gel yên vê alemê qiyas neke, goman neke ku bihişt û cenneta wêderê wek bax û bostanên dinyayê ne, lê hinekî firehtir û mezintir in. Wêderê mala kerameta Heq û mêvanxane ya îlahî ye. Ev dinya pêkve beranber nabe gel tayek mûyê hûrul eynekî jî. Di vî halî da jî Xwedê Teala kirh û ucreta nimêj a şevê, ne ji wan daniye û mezintir girtiye ji wan, wek çawa hat gotin. Lê, heyhat ku îmana me sist e û em ne ji ehlê yeqînê ne, eger ne çênabûya ku em evqas di bêxeberiyê da biborînin û heta sibehî hevalatiya xewê bikin. Eger mirov, hişyariya şevê nas bike, gel heqîqeta remz û razên nimêjê û bi zikir û fikra Heq bêhnfireh bibe û şev, bibin merkeba mîraca nêzîkiya wî, hingê êdî ji cemala cemîl a Xwedê pê ve tiştek dî nikare bibe kirh û ucreta wî.

Wey li halê me yên xafil, ku heta axirê omr û temenan ji xew hişyar nabin û di sekret û serxweşiya tebîet da dimînin û roj bi roj ser xeflet û serxweşiya me ve zêde dibe. Ji meqamê heywaniyet û ji xwarin, vexwarin û şehweta cinsî ya wan pê ve tiştek dî fêhm nakin. Em çi bikin, heta eger ji sinxê îbadet be jî, em ji îdarekirina zik û binzikê xwe ra dikin. Tu goman dikî nimêja Xelîlur Rehman wek nimêja me bûye? Xelîl, muhtacî û niyaza xwe ji Cebraîlê emîn ra negot û xwe muhtacê wî nekir, lê eger em bizanin şeytan jî wê îhtiyaca me biqetîne, em ê xwe muhtacê wî bikîn û niyaza xwe ber ve bavêjin! Lê dîsa jî bêhêvî bûn çênabe û gerek em bê umîd nebin. Çêdibe piştî demekî hişyariya şevê û bêhnfirehiya bi îbadet, kêm kêm Xwedê Teala destê te bigire û lîbasê lutfa xwe bi te da bike. Lêbelê tu ji remz û raza îbadet xafil û bêxeber nebe û hema tenê bi tecwîd û xwendina durist ya eşkere ve mijûl nebe. Eger tu nikarî muxlis bibî, qet nebe, ji wê şahî û xweşiya veşartî

ra bixebite û eger te xwest evî feqîrê heywansîret ku ji nav hemû merteban bi heywaniyetê qenaet kiriye, bîne bîra xwe. Û ji dil û bi niyetek xalis bêje: Ya Rebbî! Min dûr bike ji mala xapandinê û min nêzîkê mala daimî bike û hêj firsend ji dest neçûyî, haziriya mirinê di min da çêke.

**Vebir: Der heqê teqwayê da ye**

Bizane, teqwa ji «weqaye»yê ye, bi me'na parastin. Û di orf û zimanê riwayetan da, parastina nefsê ye ji bêemriya Xwedê, peyketina razîbûn a wî ye. Gelek caran di xweparastina temam ya nefsê da bi kar tê birin, bi awayekî ku xwe ji muştebihata jî vede. «Men exeze biş şubehat weqe'e fîl muherremat...».

Gereke ev jî bêt zanîn ku, her çend teqwatî, ne ji medaricê kemal û meqamata ye, lê bê wê jî dest ve anîna meqaman çênabe. Çiko çiqas nefs tevlî heraman bibe, nakeve di dergehê însaniyetê da û pê ve çûye rêka wê hesab nabe. Û çiqas ku li pey xwest û lezetên nefsê be, meqamê ewilê însaniyetê jê ra nayê pêş. Û heta hezkirina ji dinyayê di dilê wî da ye, nagehê meqamê navincî û zahidan. Û heta huba nefsê di wî da hebe, nagêhe meqamê muxlisîn û muhibîna; heta ku zêdahiyên mulk û melekût di dil û eşkereyê wî da hebin, nagêhe meqamê meczûbîna; heta ku zêdahiyên esma di batin û navdeyê wî da dibiriqin, nagêhe fenaa kullî. Û heta ku berê dil li meqamata ye, nagehê meqamê fenaa kemalê. Û heta telwîn heye nagehê meqamê temkînê û zat bi meqamê ismê zatî di xefiya wî da birqînek ezelî û ebedî nade. Nexwe teqwaya giştî, ji muheremata ye û ya taybet û xas, ji muştebehata ye; zahid, ji girêdana bi dinyayê ve; muxlis, ji huba nefsê; meczûb, ji eşkereyiya zêdahî yên kiryarî; fanî ji zêdahiyên esmaî; wasil ji berdana fenayê; mutemekin ji telwînatan: «Festeqim kema umirt».

Îstilah û mana di bin perdên mefahîman da ji yên wek me ra bê netîce ye, ji her meydanekî ra ehlek heye. Niha jî em ê hinekî ji teqwaya destpêkî biaxivin ku ji giştê ra muhim e.

**Vebir: Der heqê teqwaya giştî da ye**

Ezîz, bizane çawa ku ji bedenê ra selametî û nexweşî, derman û dermankerek heye, ji ruhê mirov ra jî selametî û nexweşî, derman û dermankerek heye. Sihet û selametiya wê rawestana ser rêka însaniyetê ye. Derd û nexweşiya wê jî xwehrbûna ji rêka însaniyetê ye. Û muhimiya nexweşî yên nefsî hezaran caran pirtir e ji nexweşiya cismî. Çiko xilaseka nexweşî yên cismî digehê mirinê û dema mirin bigehê û ruh ji bedenê derkeve, hemû nexweşiyên cismî xilas dibin. Lê Xwedê nekirî, eger nexweşiyên ruhî û derdên nefsî hebin, destpêka derketina ruh ji bedenê dibe destpêka derd û nexweşiyan.

Meseleya berêxwedana dinyayê û pê ve girêdana wê, wek wan ji halbera ye ku mirov ji xwe bêxeber dike; û selba girêdana ruh bi dinya bedenê ve dibe sebebê hişyariyê û bi xwe ve hatinê û dema bi xwe ve bêt; êş, derd û nexweşî yên navdeyî êrişê tînin ser û ew hemû wek geşbûna agirê bin xweliyê ve, eşkere dibin. Vêca ew derd û nexweşî an wê daim digel bimînin, an jî piştî hezaran salan zehmetî, tengî, agir, kewandin û daxkirinan jê diçin. Xwedê Teala kerem dike: «Yewme yuhma aleyha fî nari cehenneme fe tukwa biha cibahuhum we cunûbuhum we zuhûrihim».[1]

Pêxemberan (a.s) şûna doktor û tebîbên dilsoj in, ku bi dilsojî gorekî her kesî dermanê wî jê ra anîne û rêka rast nîşa wan kirine. Û kiryarên ruhî, dilî û kiryarên eşkere û bedenî, şûna dermanê nexweşiyê da ye, wek çawa teqwatî di her mertebeyeka xwe da wek wê ye heçweku mirovê nexweş xwe ji tiştên zerer têda heyî vedê; heta parêz nebe nexweşî cihê xwe naguhêze bi selametiyê û dermanên tebîb bê feyde dimînin.

Di nexweşiyên cismî da, carna çêdibe neparêziyek kêm bibe jî, lê dîsa derman û tebîet ser bikeve û selametî li mirov bizivire, lê-

---

1- Tewbe / 35: "Roja ku ew [zêr û zîv] li ser agirê cehennemê tên germkirin, vêca ehnî û tenişt û pişta wan pê wa bên daxkirin..."

belê di nexweşiyên nefsî da mesele hûrtir û deqîqtir e; çiko tebîet hema ji ewil ve ser nefsê dikeve û nefs berew xirabî diçe: «Înnen nefse le emmaretun bissû».[1] Ji ber vê yekê bi piçekî neparêziyê, nexweşî zêde dike heta bi temamî selametiyê jê digire.

Nexwe kesê dilê wî bi wî ve be û selametiya xwe bixwaze, zane ku xilasiya ji ezabê dijwar, girêdayî ye bi guhdan û amelkirina bi gotina pêxemberan ve; destûrên wan jî bi du tiştan ve girêdayî ne: Yek, bi cih anîna tiştên ji selametiya nefsê ra lazim û ya dî xwe vedana ji tiştên zerer têda heyî. Û kifş e ku zerera tiştên heram ji xirabkirina nefsê ra ji her tiştî pirtir e û ji ber vê yekê heram bûne û wacib ji her tiştî baştirin lewmanê ferz û wacib bûne. Û ev herdu ji her tiştî baştir û seratir in û pêş her mexsedekî da ne û ev herdu pêşekiyên medaric ên însaniyetê ne û eger kesek hay ji wan herduka bimîne, ehlê bextewerî û xilasiyê ye. Û muhimtirînê van herdukan xwe vedana ji herama ye -ehlê sulûkê jî evî meqamî ser meqamê ewil ra zanin û bi lê nêrîna li riwayetan û xutbên Nehcul Belaxê jî, mirov pê dihese ku ewa jî ev merhele muhimtir zanîne-. Nexwe ey ezîz, tu jî evê merhelê muhim bizane û hay jê bimîne ku, eger tu gava yekê durist bavêjî û vî esasî qewî bikî, hêvî ew e tu bigehî meqamên dî jî, eger ne gihana meqamên dî dest ve nayê û xilasî gelek zehmet e.

Cenabê arif seydayê me yê giranqedr digota: Xwendina ayetên dûmahîka sûretê Heşr, di pey nimêjan ra û nexasima di axirîka şevê da ku dil vala ye û fikirkirina di me'na wan da ji durist kirina nefsê ra gelek baş e. Her weha ji pêşîgirtina xirabiya nefs û şeytan ra şîreta destnimêja berdewam dikira û digota: Destnimêj şûna lîbasê esker da ye. Welhasil daim tewfîqê ji Xwedê bixwaze û wê ew di peydabûna meleka teqwayê da alî te bike.

Evê jî bizane ku di despêkê da, hinekî zehmet û giran e, lê piştî demekî ku tu hay jê bimînî, wê rehet bibe û zehmetî cihê xwe

---

1- Yûsuf / 53: “Bi rastî nefs fermanderê bi pîsîyê ye”.

biguhêze bi rehetiyê. Ne hema ew, belkî wê lezet û xweşiyek ruhaniya xalis dest ve bêt, ku ehlê wê ewê ji hemû xweşiyan xweştir hesab dikin. Û weheye bi hezkirina Xwedê, piştî hay jê manê û teqwatiyek temam, ji vî meqamî tu bilind bibî bal meqamê teqwatî ya xewasan ve, ku ji lezetberên nefsê ye. Çiko dema tu lezeta ruhanî tam bikî, kêm kêm wê berê te ji xweşiyên cismanî bizivire û tu wê xwe ji wan vedî. Veca wê rêk ji te ra sehl û hêsan bibe û paşî ra tu wê xweşiyên fanî yên nefsê bi tiştekî hesab nekî. Xeml û zîneta dinyayê wê li ber çavê te bêmerês bibe. Û tu dê pêbihesî ku ji ber heryek ji lezetên dinyayê leke û piniyek reş di dil da peyda dibe ku dibe sebebê dilpê vehiya zêdetir ya vê aleme. Û eva he dibe hegera meyla dinyayê û di wextê sekeratê da wê cihê xwe biguhere bi zilet, dijwarî, zehmet û tengiyê. Çiko wek çawa pêşda me gotî, dijwartirîn halê sekeratê û cudahiya ruh ji bedenê, hema di hezkirina ji dinyayê da ye. Û dema dinya ji çavê mirov ket, ev tereqî ye ji meqamê duwê bona meqamê sisê ya teqwayê. Vêca hingê rêka sulûka bi aliyê Xwedê ve, rehet û hêsan dibe û rêka însaniyetê wê jê ra fireh û ronahî bibe û kêm kêm wê qedema wî bibe qedema Heq û wê di xwe da eşqa Heq bibîne û bi soza hûr û qesran qani' nabe û wê xwest û viyanek dî hebe û wê ji xwebînî û xwexwaziyê bireve. Nexwe teqwa, ewî ji huba nefsê vedike û eva he meqamek pirbilind e û merteba ewila peydabûna bêhna xweş a wîlayetê ye. Û wê Heq Teala ewî bike nav lutf û dilovaniya xwe ra û destê wî bigire. Û ewa piştî vê, dest salik ve tê, ji sînorê vê nivîsînê der e.

## HEDÎSA SÊZDEHÊ

بالسّند المتّصل إلى الشّيخ الجليل، ثقة الإسلام، محمّد بن يعقوب، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد بن خالد، عن غير واحد، عن عليّ بن أسباط، عن أحمد بن عمر الحّلال، عن عليّ بن سويد، عن أبي الحسن الأوّل، عليه السّلام، قال: سألته عن قول الله عزّ و جلّ: «وَ مَنْ يَتَوَكَّلْ عَلَى الله فَهُوَ حَسْبُهُ». فقال:

**«التَّوكُّلُ عَلَى الله دَرَجاتٌ. منها أن تَتَوكَّلَ على الله في أمورِك كلِّها، فَما فَعلَ بك كُنتَ عنه راضيًا، تَعلَمُ أنّه لا يَألُوك خيرا و فَضلاً، و تعلم أنّ الحُكمَ في ذلك له، فتَوَكَّل عَلَى الله بِتَفويضِ ذلك إليه وثِق بِه فيها و فِي غَيرِها. »**

Kurê Suweyd dibêje, min ji Îmam Mûsa bin Cafer (a.s) der heqê vê ayetê da «Kesê tewekula xwe bide ser Xwedê, Ew jê ra bes e» (Telaq / 3) pirsiyar kir, vêca ewî got: «Tewekula ser Xwedê, gelek derece hene; yek ji wan ew e tu di hemû kar û barê xwe da tewekula Xwedê bikî, Ew çi gel te bike tu jê razî bî û bizanî ku qet xêr û başiyê ji te venagire û tu bizanî ku di wê da hukm û fermana wî ye, vêca tu karan bisipêrî wî û di hemû karan da tu pişta xwe pêgirêbidî».[1]

### Şîrove:

Hellal, ew e yê «hell»ê yanî rûnê kuncî difiroşe. Ebul Hesenê ewil, Îmam Mûsa Kazim e (a.s) Ebul Hesenê mutleq jî ew e. Ebul

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 65

Hesenê duwê Îmam Riza ye û Ebul Hesenê sisê jî Îmam Hadî ye (a.s).

Tewekul, bi heseb luxet nekarî û paldana ser xêr e. Hesb, bi me'na bes û kafî ye. Yelûk, bi me'na kêmasî û teqsîr e. Hineka gotiye: Eger xweyê du mef'ûlan be, hingê me'na pêşîgirî û men' dide. Bi vê me'nê, ne xirab e û me'ne xweştir e, her çend eger ne wisa be, tiştek nabe û gel me'na kêmasî jî rêk dikeve, ji Sihahê jî xilafê wê tê fêhmê, çiko gotiye: Ela yelû, bi me'na qusûr e û di dewamê da misalekî tîne ku nîşan dide bi du mef'ûlan jî hema bi wê me'nê ye. Tewekul xêncî ji tefwîzê ye û ew herdu jî xêncî ji rizayê û wusûqê ne. Em ê di pey ra behsê jê bikin.

Em ê di çend vebiran da qasê lazim hedîsa şerîf ronahî bikin.

**Vebir: Der heqê me'na tewekulê û dereceyên wê da ye**

Bizane tewekulê bi heseb rêkên muxtelif gelek me'ne hene:

Xweyê kitêba Menazilus Sairînê dibêje: «Sipartina hemû kara ye ji xweyê wê ra û piştgirêdana bi vê sipartinê ye»[1] yanî hêzên bedenî di fermana Xwedê da ne û dexalet neke di wa karên sipartine Xwedê. Û hineka gotine: Tewekul ew e ku di hemû kara da hêviya xwe ji xelkê bibire û bi temamî xwe bisipêre Xwedê Teala.

Welhasil, me'nên hatine gotin, nêzîkê hev in û ne lazim e ser mefhûm xeberdan çêbe. Ya gotinê ew e ku bi hesebê newekyekî ya meqamatên evdan derecên wê jî muxtelif in û çiko pê hesana tewekulê girêdayî ye bi zanîna meqamê bendan ve, der heqê nasîna Xwedê Teala da, em mecbûr in hinekî jê xeber bidin.

Vêca bizane yek ji esasên marîfetan ku meqamên salikan bê wê nayin dest, naskirina Xwedê û malikiyeta Heq Teala û çawaniya dexalet a wî ye di karan da. Em ji nezer ilmî ve nakevin nav vê behsê ra. Çiko ew girêdayî ye bi mesela cebr û tefwîzê ve û ew ne

1- Risaleya Quşeyriye, p. 468

munasibê van wereq û kaxiza ye, hema tenê em ê ji derecên xelkê di zanînê da biaxivin.

Gotin ev e ku, xelk di nasîna rubûbiyeta zatê muqedes da, gelek muxtelif in. Muwehidên me'mûlî, Xwedê Teala xaliqê mebadî yê karan û kulliyatê cewahir û unsurên tiştan zanin û dexalet û teserufa wî di karan da, sînorkirî zanin; ne ku di her tiştî da û berxwegirê hemû tiştî. Evên he carna zimanê wan leqleq dike û dibêjin: Xwedê, tişt muqeder kirine û hemû tişt di bin emrê wî da ne û çi tişt bê îradeya wî ya muqedes çênabin. Lê di ilm û îman, şuhûd û dilê xwe da, ne ehlê vî meqamî ne. Ev deste ji xelkê, heçweku em bi xwe jî di nav wan da ne, ilmê bi rubûbiyeta Xwedê tunehin û tewhîda wan kêmasî têda heye û ji ber ilel û esbabên eşkere, rubûbiyet û padişahiya wî li ber wan perdekirî ye û ji gotin û de’wayê pê ve, ne xweyê meqamê tewekulê ne; ku niha xeberdan der heqê wê da ye. Ji ber vê yekê di kar û barê dinyayê da qet Xwedê ji xwe ra nakin palgeh û baweriyê pê naynin û ji esbabên eşkere û tesîrên kewnî [tekwînî] pê ve, xwe bi tiştekî nagirin. Eger carna berê xwe bidin Xwedê û tiştekî jê bixwazin jî, an ji ber çavlêkirin û teqlîdê ye û an ji ber hay ji xwe manê, çiko di wê xwestinê da fikra zererê nakin û îhtimala feydê didin, di vî halî da bêhna tewekulê hildidin. Lê eger esbabên eşkere ji xwe ra rêketî bibînin [û karûbarê wan biherike], hema di carekî da ji Xwedê Teala û karê wî xafil dibin. Û eva he ku dibêjin tewekulê dijatî gel kar û amel nîne, gotinek durist e û rêketî ye gel burhan û riwayetan jî. Lê îhticaba ji Xwedê û teserufa wî, serbixwe zanîna esbaban, dijê tewekulê ye. Ev deste ji xelkê, ku di karên dinyayî da xwe bi Xwedê nagirin û tewekulê nadin ser, der heqê karên axretî da tewekulê gelek tînin ser ziman! Dema der heqê ilm, marîfet û temîzkirina exlaq û îbadet da, sistî û tenbelî ji wan çêbe, hema di cih da behsa piştgirêdana bi Xwedê, qencî û kerema wî û tewekulê dikin. Ew dixwazin bê kar, xebat û amel, hema bi gotina «Xwedê mezin e. Û me pişta xwe bi kerema Xwedê girêdaye», derece û mertebên axretê dest xwe ve bînin! Di

karên dinyayî da dibêjin: Xebat, kar û amel dijatî tune digel pişt girêdana Xwedê da, lê di karên axretî da kar û xebatê dijê pêgirtina kerema Xwedê tewekula ser wî hesab dikin. Eva he ji hîleyên nefs û şeytan pê ve, ne tiştek dî ye. Çiko evên he tewekulê nadin ser Xwedê ne di karên dinyayî da û ne di karên axretî da, qet di çi tiştî da pişta xwe bi Xwedê girênedane, lê çiko meselên dinyayî muhim zanin, xwe bi esbaban digirin û pişta xwe bi Xwedê girênadin. Û bervajî; çiko karên axretê ji wan ra ne muhim e û îmana durist û berfireh bi roja qiyametê nînin, jê ra ozr çêdikin; carna dibêjin: Xwedê mezin e, carna dibêjin me pişta xwe bi Xwedê û şefaeta şefaetkeran girêdaye, eva he hemû ji leqleqa ziman û şiklê bê me'ne pê ve, ne tiştek dî ye û heqîqet jê ra nîne.

Bira duwê, ew in yên bi burhanê an bi neqil û riwayetê bawerî anîne û tesdîq kirine ku Xwedê Teala muqedirê karan û musebibe esbaban û muesir e di alemê da, karîn û teserufa wî ne sînorkirî ye bi hedekî. Evên he di merteba aqil da tewekula wan ser Xwedê heye, yanî stûnên tewekulê gorekî aqil û neqlê li bal wan temam e û ji ber vê, ew xwe ji mutewekilan hesab dikin û delîlê jî tînin ku gereke tewekul bêt kirin. Çiko erkan û stûnên tewekulê sabit kirine û ew çend tişt in: Yek ev e ku Xwedê Teala niyaz û îhtiyaciya evdan zane. Ya dî ew e ku ewî karîn heye ji rakirina îhtiyaca wan ra. Ya dî ew e ku Xwedê ne bexîl e. Ya dî ew e ku ji evdan ra xodan rehmet û dilovan e. Nexwe tewekul, xwesipartin û piştgirêdana bi zanayê karayê ne bexîlê dilovan, lazim e; çiko ew meslehet û başiya wan dixwaze û ji dest çûna başiyekî naxwaze, her çend ew bi xwe mesalih [başiyan] û mefasidan [nebaşiyan] ji hev neqetînin. Ev deste, her çend zanayên mutewekil in, lê negihane merteba îmanê û ji ber vê jî ew di qeleq û tezelzulê da ne. Û di navbeyna qelb û aqilê wan da xirecir heye û paşî ra aqilê wan dişkê; çiko dilê wan bi esbaban ve girêdayî ye û hatiye perdekirin ji teserufa Heq.

Koma sisê, ew in ku teserufa Xwedê di tiştên heyîn da gihandine dil û qelb. Û dilê wan îman aniye bi vê ku, Xwedê Teala muqe-

dirê karûbara ye û ew e paşa û xweyê her tiştî. Û bi qelema aqilê esasên tewekulê ser lewha dil nivîsîne; evên he ne, yên xweyê meqamê tewekulê. Lê ev bir jî, di mertebên îmanê û derecên wê da gelek muxtelif in. Heta ku bigehin dereca kamila îtmînanê, wê demê dereca kamila tewekulê di dilê wan da dixweyhê û êdî dilê wan ne li ser esbaba ye û dilê wan bi meqamê rubûbî ve digirhê û îtmînan û baweriyê pê tînin. Çawa ku ewî arifî bi vî awayî ji tewekulê axift: «Beden di îbadet da be û dil bi Xwedê ve bigirhe».

Ev gotinên he hingê ne ku, dil di meqamê zêdahî ya ef'alî da be; eger ne, wê ji meqamê tewekulê derbas bibe û ji mexsedê derkeve.

Nexwe kifş bû ku, tewekulê derece hene û belkî dereca ku di hedîsa şerîf da hatiye, tewekula deste ya duwê be, çiko binyatên wê ilm [û bawerî] zaniye. Belkî jî îşare be bal derecên dî ve bi awayek dî. Çiko ji tewekulê ra gorekî teqsîmek dî, derecên dî jê ra hene. Ew bi wî awayî ye: Mesela, di derecên sulûka eshabê îrfanê da çawa kêm kêm ji meqamê zêdahiyê digehin wehdetê û fenaya mutleqa ef'alî di carekî da çênabe, belkî bi tedrîc û hêdî hêdî çêdibe -ewil di meqamê xwe da û paşê di mewcûdên dî da muşahide dibe- dest ve hatina tewekul, razîbûn, teslîm û meqamên dî jî kêm kêm çêdibin; çêdibe cara yekê di hinek karan da û di esbabên xefiye û veşartî da tewekul bike û piştî hingê kêm kêm bigehê meqamê mutleq, çi esbabên eşkere û ronahî hebin an jî esbabên navdeyî yên xef û çi di karên wî bi xwe da be û çi jî di karê mirov û pê ve girêdayên wî. Ji ber vê yekê di hedîsa şerîf da got: Yek ji derecên wê ew e ku, di hemû karan da tewekul bike.

#### Vebir: Der heqê ferqa tewekul û razîbûnê da ye

Bizane ku meqamê razîbûnê xêncî ji meqamê tewekulê ye û belkî ji wê bilindtir û girîngtir e. Çiko yê tewekulê dike li pey xêr û xweşiya xwe ye û Xwedê Teala ku pêkînerê başiyê ye, dike wekîlê xwe ji dest ve anîna başî û xweşiyê ra. Lê yê razî, îradeya xwe di

îradeya Xwedê da fanî kiriye û heqê bijartinê ji xwe ra nehêlaye. Çawa ku ji hinek yên ehlê sulûkê pirsîne: Tu çi dixwazî? Cewab da: «Urîdu en la urîd - ez ne xwestinê dixwazim»,[1] xwesta wî meqamê razîbûnê bû.

Di hedîsa şerîf da ku got: Vêca ewa Xwedê gel te bike, tu jê razî bî. Mexsed ji wê, ne meqamê rizayê ye. Lewmane di pey ra got: Û tu bizanî ku Xwedê çi gel te bike, başî û xêra te di wê da ye. Heçweku ewî hezretî xwestibe behsa meqamê tewekulê bike, ji ber wê jê ra hinek pêşekî danîne: Ewil gotiye: Tu bizanî ku çi başî û xweşiyê ji te nadê paş. Piştî wê gotiye: Tu vê jî bizanî ku di wê da hukm, hukmê wî ye. Helbet kesê ku bizane Xwedê Teala qadir e û dikare her tiştî bike, xêr û başiya wî jî jê nagire, wê bigehê meqamê tewekulê. Çiko ew herdu, rukn û stûnên mezinê tewekulê ne. Û ji ber ku du an sê rukn û stûnên dî eşkere û ronahî ne, di hedîsê da behs jê nehatiye kirin.

Vê gorekê netîca pêşekî yên hatine gotin ev e ku, heçî ya Xwedê Teala bike, sebebê şahî û razîbûnê ye. Çiko xêr û başî di wê da ye. Nexwe meqamê tewekulê çêdibe, ji ber wê di pey ra dibêje: «Fe tewekkel alellah".

**Vebir: Ferqa tefwîz, tewekul û pê baweriyê**

Bizane ku tefwîz jî xêncî ji tewekulê ye, û pê bawerî jî xêncî ji herduka ye. Ji ber vê yekê ewan di meqamatên salikan da cuda hesab dikin. Xace dibêje: Tefwîz, ji tewekulê hûrtir û deqîqtir e û me'na wê berfirehtir e. Tewekul çiqek yê wê ye. Çiko tefwîz ew e ku evd hêz û quwetê ji xwe nabîne, teserufa xwe di çi tiştî da nabîne û Xwedê muteserif zane. Lê di tewekulê da wereng nîne, çiko mutewekil Xwedê di teseruf û dest ve anîna xêr û başiyê da di şûna xwe da datîne.

Lê tefwîz, firehtir e û tewekul çiqeke ji wê; çiko tewekul di me-

1- Kelam ji Bayezîd neqil bûye. Şerha Menazilus Sairîn.

saliha da ye, lê tefwîz di hemû karan da ye. Her weha tewekul piştî çêbûna sebeb -yanî ew tişta di wê da tewekula xwe dide ser Xwedê- peyda dibe, wek tewekula Pêxember (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) û eshaban ser Xwedê ji parastina ji muşrikan, hingê ku ji wan ra hat gotin: «Xelk di dijê hewe da berhev bûne, ji wan bitirsin, vêca îmana wan zêde kir û gotin: Xwedê besê me ye û çi xweş wekîl e» (Alê Îmran/ 173). Lê tefwîz, pêşiya çêbûna sebeb e, çawa ku di dua Pêxember (selewat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) da hatiye: «Allahumme innî eslmtu nefsî ileyke... We fewweztu emrî ileyk».[1] Carna jî pêşiya çêbûna sebeb da ye, wek tefwîza muminê alê Fir'ewn. Eva hatiye gotin, kurteyek bû digel piçekî ferqê, ji tercuma şerha arifê me'rûf, Abdurezaqê Kaşanî[2] ji kelamê cenabê arifê kamil Xace Abdullah. Gotina Xace jî delalet dike ser wê.

Lêbelê melheze heye di vê yekê da, ku tewekul çiqek be ji tefwîzê û musamiheyek eşkere heye di vê yekê da ku, tefwîz ji tewekulê giştîtir e. Her weha eva he ku tewekul piştî çêbûna sebebê ye, bê delîl e. Çiko tewekul di herdu ciyan da jî heye. Di hedîsa şerîf da ku got: «Fetewekkel alellah bi tefwîzî...» Ev çêdibe ji ber wê be çiko, xêncî bi ruyeta teseruf a xwe tewekul çênab. Ji ber wê der heqê wî karê ku di bara xwe da zane, ji xwe ra wekîl digire, hezret viyaye ewî tereqî bidê ji meqamê tewekulê bona tefwîzê û pê bide zanîn ku, Xwedê di teserufê da ne di cihê te da ye, belkî muteserifê mulkê xwe û malikê memleketê xwe bi xwe ye. Xace jî di Menazilus Sairînê di dereca sisê ya tewekulê, vê der heqê da hişyariyek daye.

---

1- "Ey Xweda! Min nefsa xwe teslîmê te kiriye û pişta xwe bi te girêdaye û karê xwe spartiye te".

2- Mela Abdurrezzaq kurê Celal Cemaluddînê Îshaqê Kaşanî yê Semerqendî, kunya wî Ebulxenaim e û nasnavê wî Kemaluddîn e. Ji meşahîrên arifên sedê heştê yê hicrî ye û ji şirovekerên mezinê kitêba Fusûsul Hikemê ye. Sala 730 an 735-ê hicrî wefat kiriye. Îstilahatus Sûfiye, Tewîlul Ayat, şerha Fusûsul Hikem, şerha Menazilus Sairîn, ji kitêbên wî ne.

Siqe; cihê bawerî û xwe pê girêdane jî, xêncî ji tewekul û tefwîzê ye, çawa ku Xace gotiye: Siqe, bi bûka çavê tewekulê û niqta daireya tefwîzê û kanûna dilê teslîmê ye. Yanî sê meqam bê wê çênabin û belkî ruhê wan meqamatan bi baweriya bi Xwedê Teala ye û heta evd baweriya xwe bi Xwedê neyine, ew dest wî ve nayin.

## HEDÎSA ÇARDEHÊ

بسندي المتّصل إلى محمّد بن يعقوب، ثقة الإسلام و عماد المسلمين، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد، عن عليّ بن حديد، عن منصور بن يونس، عن الحارث بن المغيرة، أو أبيه، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال قلت له: ما [كان] فى وصيّة لقمان؟ قال:

**«كانَ فيها الأَعاجيبُ، و كانَ أعجب ما كانَ فيها أن قال لابنه: خَفِ الله عزّ و جلّ خِيفةً لَو جِئتَهُ بِبرِّ الثَّقَلين لَعَذَّبَك، و ارجُ الله رَجاءً لَو جِئتَهُ بِذُنُوبِ الثّقلَينِ لَرَحِمَك.»**

ثمّ قال أبو عبد الله، عليه السّلام، كان أبى يقول:

**«إنّه ليس من عبد مؤمن إلاّ و فى قلبه نوران: نورُ خِيفَةٍ، و نورُ رَجاءٍ، لَو وُزِنَ هذا لم يزد على هذا، و لو وُزِنَ هذا لَم يَزِد على هذا.»**

Rawî dibêje, min ji Îmam Sadiq (a.s) pirsî: Şîreta Loqman çi bû? Kerem kir: «Tiştên ecêb têda hebûn û ya ecêbtir ku di nav şîretê xwe da got kurê xwe, ev bû: Bi awayek wereng ji Xwedê bitirse ku eger tu qenciyên cin û însa jî bikî, te ezab bide. Û hêvîdariyek wereng ji Xwedê hebe, ku eger tu gunehên cin û însa jî bikî, rehmetê li te bike». Îmam Sadiq (a.s) pey ra kerem kir: «Bavê min digota: Bendeyê bawerdar du nûr di dilê wî da hene: Nûra tirsê û nûra hêvîdariyê. Eger ev li ber wê bêt kêşan jê zêde nabe û eger ew li ber vê bêt kêşan, jê zêde nabe».[1]

1- Usûla Kafî, c.2, p. 67

## Şîrove:

Cewherî[1] di Sihahê da dibêje: Heçweku «e'acîb», cem'a ucûbe-yê be, çawa ku ehadîs cem'a hudûseyê ye. Hineka gotiye ucûbe, ew e ya sipehîtahî an kirêtiya wê mirov ecêbgirtî bike. Û di vê hedîsê da mexseda yekê ye. Di eslê xwe da ji wê tiştê ra tê gotin ku sipehîtahî û rindiya wê ecêb be, gerçî di bikarbirinê da ji rindî û kirêtiyê herdu tê bi kar birin.

Berr, guhdarbûn e, bervajiyê ne guhdarî û uqûq da tê bi kar birin. «Seqelan» jî bi me'na cin û îns e.

Ev hedîs dide fêhmê ku, tirs û hêvî gereke di hedê kemalê da bin, û bêhêvîtiya ji rehmetê û êmnahiya ji belaya îlahî bi giştî memnû' e, çawa ku hedîsên zehfî delîla vê gotinê ne. Qurana pîroz jî behsê jê dike.[2] Yek jî ev e ku gereke yek ji ya dî, ne zêdetir be.

### Vebir: Mirovê arif du nêrîn hene

Bizane ku mirovên heqîqetnas û agah, ji nisbeta navbeyna Xwedê û mexlûq da, du nêrîn û nezer hene: Yek, nêrîna li kêmasiyên xwe û hemû mexlûqa ye; mirov pê bihese û bizane ku pêkve bi awayek ezelî û ebedî di nav kêmasî, feqr, îhtiyac û niyazê ra ye û qet tiştek ji xwe tune û qet ne tişteke û naqisê alel itlaq e, belkî heta ev gotin jî der heqê wî da nayê gotin û eger hat gotin jî ji ber wê ye ku kêmasî di kelîme û wajeyan da heye, eger ne kêmasî, feqr û niyaz, ji çiqên tiştîniyê ne û cemî'ê mumkinat û mexlûqan pêkve, ji xwe tiştek nînin. Bi vê menzer û nêrînê, eger mirov hemû itaet û îbadetan û hemû ewarif û mearifan bibe huzûra rubûbî, ji şerm, xeclet, zilet û serşûriyê pê ve tiştek dî nîne. Çi taet û

---

1- Îsmaîlê kurê Hemmadê Cewherî (332- 393 an 398 h.) pêşkarê luxet û edebiyatê ye û di ilmê kelam û usûlê da jî pir zana bûye. Ew ji feqiyên Ebû Aliyê Farsî û Ebû Seîdê Seyrafî ye. Ji muhimtirîn eserên wî «es-Sihah» e ku di luxet û wajeyên Erebî da hatiye nivîsîn.

2- E'raf / 99. Yûsuf / 87. Zumer / 53. Hicr / 56

îbadet? Ji kî bo kî? Pesn û mehamid hemû li wî bi xwe dizivirin, ji mumkin zêde ye teserufê têda bike, belkî ji xwe ji teserufa mumkin neqs û kêmasî bikeve pesindan û mehamidên Heq, ku niha em ê berê qelemê jê bizivirînin. Û di vî meqamî da kerem dike:

«Ma esabeke min hesenetin fe minellah we ma esabeke min seyyietin fe min nefsik».[1] Çawa ku di meqamê yekê da dibêje: «Qul kullun min 'indillah».[2] Yekî di vî meqamî da gotiye:

Pîrê ma goft xeta ber qelemê sun' nereft

Aferîn ber nezerê xeta pûşeş bad[3]

Gotina pîr, der heqê meqamê duwê, û gotina bêjer jî, der heqê meqamê yekê da ye. Nexwe di vê nêrîn û berêxwedanê da xewf, xem, şerm û tirs, mirovan li ber xwe digire.

Nêrîn û nezera dî li kemala Xwedê û firehiya rehmet û berfirehiya lutf û dilovaniya wî ye. Ku evê kerem, rehmet û dilovaniya wî ya her kes û her tişt li ber xwe girtiye, dibine. Dergehên lutfa wî bê ku musteheq bin, li ber wan vekirî ye. Bê xwestin dide wan, çawa ku hezretê Seyyidus Sacidîn, Îmam Zeynul Abidîn (a.s) di duayên Sehîfeya Seccadiye[4] û di cihên dî da îşare pê kiriye. Vêca hingê reca, ber hêvîbûn û hêvîdariya wî bihêz dikeve, qewî dibe û umîda wî bi rehmeta Heq çêdibe. Ew kerîmê ku kerema wî hema ji ber rehmet û dilovaniya wî ye û bê wî qasî ku jê bêt xwestin, ewqas lutf kirine ku aqil di nasîna piçek ji wê da şaş û heyirî ne. Ne guhdariya neguhdaran kêmasiyê di hukûmet û mulkê wî da çênake û guhdariya guhdaran tiştekî ser ve zêde nake. Ewî ku rêkên guhdanê nîşan dane û nehy kiriye ji ne guhdariyê, ji ber

1- Nisa / 79: "Çi başiya bigehê te, ji Xwedê ye û çi xirabiya bigehê te, ji te bi xwe ye".

2- Nisa / 78: "Bêje, hemû ji aliyê Xwedê ve ye".

3- Beytika şiîrê ji Hafizê Şîrazî ye: "Pîrê me got: Xeletî nayê ser qelema afirandinê. Aferim bo nêrîna xeletveşariya wî ra".

4- Dua 12-ê.

wê ye ku kerema xwe zêdetir, rehmet û xweşiyên xwe berfirehtir bike û ji wî qasî ra ye ku mirov bigehin kemalê û bi pey stêrka kemalê ve biçin jorê û ji neqs, kêmasî, pîsî û kirêtiyê dûr bikevin.

Nexwe eger em berew dergehê izz, celal, rehmet û dilovaniya wî biçin û gazî bikin: Îlahî, te em çêkirin û hemû wesîleyên jiyan û rehetiyê dan me û hemû rêkên durist nîşa me kirin. Ev hemû ji duristkirina me bi xwe ra û ji bona berfirehkirina nîmet û xweşiyan bû. Niha em bi vî barê giranê gunehan ve berew mala kerameta te hatine, di halekî da ku gunehê gunehkaran zererek negihandiye padişahiya te û kîmasiyek têda çênekiriye. Ji rehmet û dilovanyê pê ve tu wê çi bikî gel vê kulma axê? Gelo xêncî ji rehmetê ber hêviya tiştek dî ji te heye?

Nexwe daim gereke mirov di nav van herdu nêrîna da be: Di evdîniyê da, xwe bêkêmasî, qusûr û teqsîr nebine. Her weha çavê xwe negire ji berfirehiya rehmet û dilovanî û lutfa Xwedê Teala.

**Vebir: Qusûra mexlûq ji îbadetê Xwedê ra**

Ezîz, bizane xewf û recayê gorekî hal, zanîn û nasîna evd û bendeyan, mertebe û derece hene. Çawa ku tirsa gişt û umûmê ji ezab e û tirsa taybet û xewasan ji lome û îtabê û tirsa xewasên taybet jî ji îhticab û perdekirinê ye. Niha me ne li ber e em ji wê xeber bidin. Em ê bi gotinek dî dewamê bidin behsa xeberdana pêşiyê da. Vêca bizane ku tu ebdekî nikare çawa heqê wê, îbadet bike. Çiko îbadet pesindana wî zatê muqedes e û pesnê her kesî çiqek ji nasîna wî ye. Û çiko evd nikarin wek heqê wê, ewî nas bikin, nexwe nikarin pesn, senaya celal û cemala wî jî bidin. Çawa ku eşrefê mexlûqan û zanatirînê mewcûdan îtirafê bi qusûra xwe dike û dibêje: «Wek çawa heqê wê, me îbadetê te nekiriye û bi duristî me tu nas nekirî». Rista duwê şûna te'lîlê (sebeb anînê) ye ji rista yekê ra. Û gotiye: «Tu wereng î, çawa te bi xwe pesnê xwe dayî». Nexwe qusûra zatî, heqê mexlûq e û bilindiya zatî taybetê zatê kibriyayî ye (c.c).

Çiko bende nikarin pesnê Xwedê bidin û îbadetê wî bikin û bê nasîn û îbadet, tu yek ji evdan nikarin bigehin meqamên kemalî yên uxrewî -çawa ku di cihê wê da li bal zanayên uxrewî delîl jê ra heye - Xwedê Teala bi lutfa xwe ya zehfî û rehmeta xwe ya berfireh bi rêka wehy û îlhamê ve, bi melaîket û pêxemberan dergehek ji wan ra vekir -dergehê îbadet û marîfetê- û rêkên îbadetê xwe hînê evdan kir û rêkek ji zanîn û nasînê li ber wan vekir. Da qasê mumkin evê kêmasiyê ji holê rakê û dest ve anîna kemalê mumkin bike. Û li ber tîrojên nûra evdîtiyê hîdayet bibin û rêka alema kerameta Heq bibînin û bigehin rewh, rîhan û cenneta ne'îm. Û belkî bigehin razîbûna mezina Xwedê. Nexwe vebûna dergehê îbadet û bendetiyê, yek ji qenciyên mezin e ku hemû mewcûd di giruwa wê da ne û nikarin şukrê wê bi cih bînin. Her şukret, vebûna deriyê kerametekî ye ku, nikarin şukrê wê jî bi cih bînin. Vêca eger mirov ev zanî û dilê wî jê xeberdar bû, wê bi texsîra xwe bihese û eger îbadetê cin û însa jî ji wî ra bên hesabê, dîsa wê xwe texsîrkar bibîne û di halê tirsê da be. Her weha bendeyên arifê Heq û ewliyayên xasên wî ku dilê wan bi nûra marîfetê ronahî bûye, dilê wan wereng ji ber xewf û tirsê dilerizê ku, eger berê hemû kemalatan li wan be û kilîda hemû zanînan di destê wan da be û qelbê wan tijî û serrêj be ji tecelliyatan, qas zerekî tirsa wan kêm nabe û kêmasî nakeve tezelzula wan. Çawa ku yek ji wan dibêje: «Hemû ji dûmahîka kar ditirsin û ez ji destpêkê». Subhanellah we la hewle we la quwwete îlla billah. Em hawara xwe ji Xwedê ra dibin. Xwedê zane gereke qelbê mirov ji ber vê xeberdanê biperite û dilê mirov bihele û li çolê bikeve. Mirov çiqas hay ji xwe neyî ye!

Ya dî ew e ku me di şîrovekirina hedîsek ya borî da got: Hemû îbadet û taetên me, ji dest ve anîna xwestên me ra ne. Û huba nefsê ye ku me têxe bizav û hereketê û di rastiyê da zuhda ji dinyayê ji bona axretê ye û ew li bal yên aza, wek zuhda dinyayê ye ji dinyayê ra. Nexwe eger em îbadetê cin û însa bibin huzûra Xwedê Teala, xêncî dûriya ji saheta qudsa wî, em ne musteheqê

tiştek dî ne. Xwedê Teala em gazî kirine ji nêzîkiya xwe ra û kerem kiriye: «Min tu ji xwe ra afirand» û nasîna xwe kiriye xayet û nihayeta xilqetê û rêka marîfet û bendetiyê nîşa me kiriye, lê dîsa em ji avakirina zik û binzik pê ve, ne mijûlê tiştek dî ne û xêncî ji xwexwazî û ji xwe ra xwestine, me çi mexsed dî nînin.

Vêca ey reben, îbadet û karê te, te ji wî dûr dike û dibe sebebê îtab û îqabê, te pişta xwe bi çi girêdaye? Û çima tirsa ji dijwariya ezabê Xwedê, tu ranekirî ser hêlîpepana û kezeba te nehelandiye? Gelo te palgehek heye? Gelo pişta te bi amel û kiryarên te germ e? Eger we ye, way li halê te û li wî awayê te xwe û Malikul Mulûk nas kirî! Û eger te bawerî bi kerema Xwedê û rehmeta wî ya berfireh heye, ev hêvî û umîda te gelek bi cih e û te pişta xwe bi tiştek baş girêdaye û hana xwe ji hanberek qewî ra biriye.

Ey Xwedê, em jar in û dizanîn ku kêmasî di me da heye û em ne tiştek in û me tiştek layiqê dergahê te nînin. Em ji ser heta pî eyb û kêmasî ne û qirêja gunehan eşkere û navdeyê me qirêj kiriye, em çi ne ku bikarin pesn û senayê te bidin! Halhale weliyên te dibêjin: «Ma ez bi vî zimanê xwe yê lal pesnê te bidim». Û gazî dikin ku em zeîf in û kêmasî di me da heye. Eger ew, we dibêjin, nexwe em ên gunehkar û perdebûyî ji deyzana [dergah] wî çi bêjin! Em tenê dikarin vê bêjin ku: Hêvî û rica me ji rehmeta te ye û umîd û baweriya me bi kerem û lêborîna te ye, çawa weliyên te gotine.

Ji Îmam Baqir (a.s) neqil bûye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) got: «Xwedê Teala dibêje: Bila amelker, karê ku ji dest ve anîna xêrê ra dikin, ji xwe re nekin palgeh. Çiko eger ew di hemû omrê xwe da îbadet bikin û xwe bixin tengiyê, wê di îbadet kirina ji min ra texsîrkar bin û nikarin bigehin kûratiya wê û pê wê keramet û xweşiyên bihişta min û derecên bilind li bal min dest xwe ve naynin. Nexwe vêca bila pişta xwe bi rehmeta min girêbidin û hêvîdarê kerema min bin û bila bi xweş gomaniya ji min êmnahiyê bixwazin. Çiko hingê ye ku wê rehmeta min wan li ber xwe

bigire û dana min, wê wan bigehîne razîbûnê û wê lêborîna min ewan binixûmîne. Hema ez im Xwedayê rehman ê dilovan û ez bi vî navî hatime nav kirin.

Ji wan tiştên tirsê çêdikin, yek jî ew e ku mirov fikir bike di dijwariya ezabê Xwedê da û hay jê mana rêka axretê û xeterên ji mirov ra tên pêş, di wextê jiyan û mirinê da û dijwariyên berzexî qiyametê û munaqişeya hesab û mîzan e. Ji aliyê dî ve vêca melheza di soz û we'da îlahî da, hêvîdariyê çêdike. Hatiye gotin ku di qiyametê da Xwedê Teala ewqas rehmetek berfireh heye ku heta bi şeytan jî berhêvîtiya lêborînê dide. Nexwe xweş goman be der heqê Xwedê Teala da û baweriya xwe bi kerema wî bîne: «Xwedê hemû gunehan dibexşe û jê dibore»[1] û hemûyan noqî dike di behra dan û dilovaniya xwe da. Çênebûn di we'da Xwedê da nîne, her çend di «we'îd»ê da mumkin e û çêdibe gelek biqewime. Vêca dilê xwe bi rehmeta kamil ya wî xweş bike, eger rehmeta Heq şamilê te nebûya, tu nedihatî çêkirin. Her mexlûqek merhûm [rehmet lê bûyî] e.

**Vebir: Der heqê ferqa reca û xurûrê da ye**

Lê ey ezîz, multefit be ku tu, hêvîdarî û serxweçûnê ji hev biqetînî. Çêdibe tu serxweçûyî bî û goman bikî ehlê recayê yî. Qetandina wan ji hev, ji mebadiyên wê tê dest; binhêre kanê ew halê di te da peyda bûyî û pê wê tu xwe hêvîdar dihesibînî ji ber sistiya di emrê Xwedê da û kêm zanîna Heq û destûrên wî ye. An ji ber baweriya bi rehmeta wî ya berfireh û mezinahiya wî zatê muqedes e? Eger ji hev qetandina wan jî zehmet be, bi eseran veqetandina wan sehl e: Eger mezinahiya Xwedê di dil da be û rehmeta Xwedê dilê mumin li ber xwe girtibe, hingê wê îbadet û bendetiyê bike. Çiko mezin ragirtin û îbadetê xweyê nîmet ji karên sirûştî û fitrî ye. Nexwe eger te dît tu xebata xwe di îbadet da bi tiştekî hesab nakî û hêvîdarê rehmet a Xwedê bî û ji ber kiryarên

1- Zumer / 53

xwe tu xwe musteheqê lome û îtabê bizanî û palgeha te rehmet û kerema Xwedê Teala be. Hingê tu xweyê meqamê «reca»yê yî û şukrê Xwedê bike û jê bixwaze ku ewê di dilê te da qahîm bike û meqamê bilindtirê wê bide te. Lê eger Xwedê nekirî, te dît tu fermanên Heq Teala sivik digirî, emr û destûrên wî muhim nizanî. Bizane ew xurûr [serxweçûn] e ku ji ber hîleyên nefs û şeytan di dilê te da peyda bûye. Eger te bawerî bi rehmeta berfireh a Xwedê hebûya, wê esera wê di dilê te da peyda bibûya. Mude'iyê ku gotin û kiryarên wî hev negirin, ew bi xwe derewînkerê xwe ye. Şahidê vê gotinê di gelek hedîsên cihê baweriyê da hene: Rawî dibêje min ji Îmam Sadiq (a.s) pirsî: Hinek hene gunehan dikin û dibêjin: Em ricakar û hêvîdar in! Hema her di vî halî da ne, heta mirina wan bê. Vêca ewî hezretî kerem kir: «Ew komek in ku meyla wan li ser arzû û xweziya ye; ewa derew kiriye, ew ne hêvîdar û ricakar in. Kesê hêvîdarê tiştekî be, pê dikeve; û kesê ji tiştekî bitirse jê direve».

Di hedîsek dî da hatiye: Rawî dibêje min ji Îmam Sadiq (a.s) bihîst digota: «Mumin, ne mumin e, heta ku bi tirs û ricakar nebe. Û ne di tirs û hêvîdariyê da ye, heta ku gorekî tirs û hêvîdariyê nekeve kar û amel neke». Hineka gotiye: Mesela kesê amel neke û ricakar be, wek mesela wî ye yê bê haziriya sebeban hêviya musebeb be. Wek wî cotyarê ku ne tov reşandî û ne hay ji zeviyê mayî û ne avdan kiriye. Veca hêviya dirûna zeviyê be, ji yê weha ra ricakar nayê gotin, belkî jê ra tê gotin: Ehmeqê bê mêjî. Û mesela wî yê exlaqê xwe durist nekirî û xwe ji gunehan venedê, mesela wî ye yê tovê xwe di erdek şorîn da bireşîne. Kifş e ku ev çandinahî, hasilek dilxwaz nadê. Nexwe hêvîdariya durist, ew e ku mirov haziriya xwe bike û ew tiştên destûr pê hatiye dayîn bi cih bîne û piştî wê, ber hêvî û ricakar be ku Xwedê Teala wan tiştên ne di îxtiyara wî da, jê ra bîne pêş û xirabiyan ji nav bibe.

Vê gorekê eger evd, erdê dil ji stirî û giyayê herze yê exlaqê xirab û ji kevir û kuçên gunehan paqij bike û tovê amel lê bireşîne û bi ava zelal a zanîn a bi feyde û îmana xalis û xwerî av bide û ji

xirabiyên wek ucb û riya... ku wek giyayê herze ne, temîz bike, di pey ra jî hêviya rehmet a Xwedê be, ku ewî qahîm û aqibet bi xêr bike, ev hêvîdarî û rica ya qenc û baş e. Çawa ku Xwedê kerem dike: «Bi rastî ew ên îman anîn û ew ên hicret kirine û di rêka Xwedê da cîhad kirine, ew hêvîdarê rehmet a Xwedê ne».

**Vebir: Der heqê muwazina xewf û recayê da ye**

Di dûmahîka vê hedîsa şerîf da hatiye ku: Çênabe xewf û reca yek ji ya dî zêde be, çawa ku di riwayeta Ibn Ebû Umeyr da jî ji Îmam Sadiq (a.s) ev me'ne hatiye. Dema mirov kêmasiya xwe di îbadet da melheze bike û der heqê tengiya rêka axretê da bifikire, wê tirsek temam di wî da çêbe. Û dema gunehên xwe ber çav girt û di halê wan kesa da fikirî ku aqibet bê îman û bê amelê qenc ji dinyayê çûn, halhale ewil baş bûn, tirsa wî zêde dike. Di hedîsê da ji Îmam Sadiq (a.s) hatiye ku got: «Bawerdar nav du tirsan da ye: Gunehê derbas bûyî ku nizane wê Xwedê der heqê wê da çi bike; omrê mayî ku nizane di wê da wê çi bela ser wî da bên. Vêca sibeh ser wî da tê û ew di tirsê da ye û ji tirsê pê ve çi tişt ewî durist nake». Bi vê me'nayê, ji xeberdana Hz. Resûl (s.a.a) jî, bi neqla Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye. Kurtê gotinê ev e ku: Ew [mirov], di kemala texsîr û kêmasiyê da ye û Heq Teala di kemala mezinahî û celaletê da ye û rehmeta wî berfireh e û dana wî pir zêde. Û evd daim bi van du nêrîna di halekî da ye ku xewf û reca wekhev têda heye. Û çiko esmaên celaliye û cemaliye di dilê salik da wek hev ronahî dide, tirs û hêvîdarî ji hev zêde nabin.

Hineka gotiye carna feydeya tirsê ji mirov ra pirtir e, wek halê selametiyê, da ku mirov ji dest ve anîna karê qenc ra bikeve xebat û şuxl. Û di hinek halan da hêvîdarî baştir e, wek wî halî ku nîşanên mirinê peyda dibin, da mirov di halekî da liqayê Xwedayê xwe bibe ku pirtir jê hez dike. Ev gotin, gel gotina borî û hedîsên hatine gotin rêk nakevê. Çiko recaya mehbûb jî sebebê amel û dest ve anîna axretê ye û tirsa ji Xwedê jî her baş e û dijatî gel reca ya baş nîne.

Hineka gotiye: Di alema axretê da tirs ne ji başiyên nefsî û kemalatên aqlî ye, ya heyî ev e ku ew di dinyayê da ku cihê kar û amel e, ji tiştên xweyê feyde ye ku dibe sebebê kirina karê qenc û terka gunehan û piştî mirinê bê feyde ye, bervajiyê hêvîdariyê ku berdewam e û di axretê da jî heye. Çiko çiqas rehmeta Xwedê ser mirov da be, ewqas timahiya mirov ji wê ra zêde dibe, ji ber ku rehmeta wî xilasek jê ra nîne, nexwe xewf tê birîn û reca dimîne. Hedîsgêrê lêkol, cenabê Meclisî dibêje: «Duristiya meselê ev e ku: Çiqa mirov di dinyayê da ye, xewf û reca herdu lazim in. Lê dema mirov raberê axretê bû, hingê yek, li ser ya dî ra tê girtin».

Nivîser dibêje: Ewa der heqê zêdahiya xewf û recayê di alema axretê da hat gotin, rêk nakeve gel wê ya me der heqê recayê da gotî. Û eger durist be jî, der heqê wa kesên navincî da ye ku xewf û reca ya wan der heqê xêr û cezadanê da ye. Lê halê yên taybet û weliyan xêncî ji wê ya gotin e; çiko xewf û reca ya ji muşahida mezinahî û celal û tecelliya esma ê lutf û cemalê di dil da peyda dibe, bi dîtina meselên axretî ji nav naçe û zêdahî ji yekî ra çênabe û belkî eserên celal, mezinahî û tecelliyatên cemal û lutfê di alema axretê da pirtir in û tirsa ku ji ber mezinahiya Xwedê peyda dibe ji lezet û xweşiyên ruhanî ye. Û dijatî gel ayeta pîroz nîne ku kerem dike: «Ela inne ewliyaellah la xewfun aleyhim we la hum yehzenûn».[1] Eva he bi piçek melheze eşkere dibe. Û ewa hatî gotin ku: Xewf ne ji başiyên nefsanî ye, ne xewfa ji celal û mezinahiyê ye, çiko ew kemal e.

---

1- Yûnus / 62: “Heyhê, weliyên Xwedê ne tirs ji wan ra heye û ne jî xemgîn dibin”.

## HEDÎSA PANZDEHÊ

بسندنا المتّصل إلى سلطان المحدّثين، محمّد بن يعقوب الكلينيّ رضوان الله عليه، عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن ابن محبوب، عن سماعة، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال إنّ فى كتاب عليّ، عليه السّلام:

**«إنّ أشدَّ النّاسِ بَلاءً النَّبِيُّونَ، ثُمَّ الوَصِيُّونَ، ثُمَّ الْأَمْثَل فَالأمثَلُ. و إنّما يبتلي المؤمنُ عَلي قَدر أعمالِه الحَسَنَةِ، فَمَنْ صَحَّ دينُهُ و حَسُنَ عَملُه، اشْتَدَّ بَلاؤُه. و ذلك أنّ الله تعالى لم يَجعَلِ الدّنيا ثَوابا لِمُؤمنٍ و لا عُقُوبةً لِكافر. و مَن سَخفَ دينُه و ضَعُفَ عقلُه قَلّ بلاؤُه. و إنّ البلاءَ أَسْرَعُ إلى المؤمنِ التّقيِّ مِنَ المَطَرِ إلى قَرارِ الأرضِ.»**

Sema'e ji Îmam Sadiq (a.s) digêre ku got: Di kitêba Îmam Alî (a.s) da hatiye: «Ji nav xelkê, belaya pêxemberan dijwartir e û pey ra ya cihgirên wan û pey ra yê baştir. Mirovê bawerdar jî gora amelê xwe yê qenc, tê ceribandin; vêca yê dîndurist û qenckar be, belaya wî dijwartir dibe. Û ev ji ber wê ye ku Xwedê Teala dinya nekiriye cihê xêrdarkirina bawerdaran û cezadana kafiran. Û kesê dînsist û kêmaqil, belaya wî kêm e. Rastî ev e ku belaya ku bi aliyê mumin da tê, leztir e ji baranê ku di erdê da cih digire».[1]

### Şîrove:

Hineka gotiye: Mexsed ji «nas» di hedîsên wek vê da, hêjayên kamil in, wek pêxember, welî û wesiyan. Û di heqîqet da, ew nas in. Û xelkê dî, nisnas. Çawa ku di riwayetê da hatî. Lê ne gotinek

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 259, h. 29

cihgirtî ye. Belkî ji xwe munasibê meqam ew e ku xelk hemû bin. Û ji hedîsên Kafiyê di vî babetî jî ev tê fêhmê. Û eger di hedîsekî da jî hatibe ku «nas» yên kamil in, ne ew e ku hema li kuderê kelîma «nas» hatibê mexsed ew bin.

Bela, ser gotina ehlê luxet bi me'na ceribandin û îmtihan e û di başî û xirabiyê da bi kar hatiye.

Di Quranê da (Enfal/ 17) hatiye: «Belaen hesena». Welhasil, ew tişta Xwedê Teala pê wê evdên xwe îmtihan bike û biceribîne, jê ra bela û îbtila tê gotin, çi ji qismê nexweşî, nedarî û piştdana dinyayê be, çi jî bervajiyê wan. Çiko gelek caran tê pêş ku mirov bi seratiyê û zêdahiya qudret, mal, minal, riyaset û mezinahiyê îmtihan bibe. Lê dema «bela» an «beliyye» an «îbtila», bê qeyd û bend bêt gotin, qismê yekê tê fêhmê.

#### Vebir: Îmtihan û çawaniya nisbeta wê bal Xwedê Teala

Bizane ruh di destpêkê da, ku dikeve di bedenê da, di hemû zanîn û nasîn, melekên qenc û xirab da, belkî di hemû îdrakat û fiîliyata da, bilquwe ye. Û kêm kêm bi înayeta Heq Teala berew fiîliyetê diçê. Ewil piçên îdraka zeîf, wek îhsas, lems û hewasên eşkere yên dî di wî da peyda dibin û di pey ra îdrakên batinî û navdeyî bi rêzê ve têda çêdibin. Lê di hemû melekata da dîsa bilquwe ye û eger eser lê neyekirin bi hesebê giştî, melekatên xebîse di wî da xurt dibin û meyl dide bal kirêtî û pîsiyê ve. Çiko da'iyên navdeyî wek şehwet û xezeb... bi awayek tebî'î ewî bi aliyê fucûr, zêdegavî û zulmê ve gazî dikin û piştî ku gaziya wan qebûl bike di demek kurt da, dibe heywanek ecêb û xerîb. Û çiko ji ezel ve rehmeta Heq benî Adem li ber xwe girtiye, du perwerdeker di wî da danîne ku şûna du çeng û pera da ne, da bi wan bifire û xwe ji cehl, nezanî, neqs, pîsî û bextreşiyê xilas bike û xwe bigehîne zanîn, nasîn, kemal, cemal, bexteweriyê û xwe ji tengiya tebîet derîne û bigehê berfirehiya melekûtê e'la û bilind. Ev herdu perwerdeker, yek navdeyî ye ku quwe û hêza aqil û

ji hev qetandinê ye. Ya dî pêxember û rênîşanderên bextewerî û bextreşiyê ne. Û ev herdu bê ya dî, nagehênin mexsedê; çiko aqil bi serê xwe nikare rêkên bextewerî û bextreşiyê kifş bike û rê peyda bike bi aliyê alema xeyb û axretê ve, hîdayet û rênimûniya pêxemberan jî bêhêza ji hev qetandin û îdraka aqlî eserê nadînê. Nexwe Heq Teala ev herdu hêz danîne, da bi wan, hemû hêzên xiznebûyî û qabiliyetên veşartiyên ruh, bigehin fiîliyetê. Xwedê ev herdu nîmetên mezin, ji îmtihan û ceribandina beşer ra danîne. Çiko bi van herduka beşer ji yên dî tên qetandin, her weha seîd [bextewer] û şeqî [bextreş], guhdar û neguhdar, kamil û naqis ji hev cuda dibin. Çawa ku Îmam Alî (a.s) dibêje: «Wellezî be'esehu bil heq le tebelbelunne belbele we le texerbelunne xerbele».[1]

Di Kafiya şerîf, di behsa îmtihanê da, Ibn Ebû Ye'fûr ji Îmam Sadiq (a.s) neqil dike ku got: «Gereke xelk bên îmtihan kirin û xalis bibin û ji hev veqetin û bên bêjingkirin û gelek ji xelkê ji bêjingê derkevin».

Kerem kir: «Ey Mensûr! Ev mesele (qiyama qaim) çênabe heta hûn bêhêvî bibin û ji hev bên cudakirin, xalis bibin û ewê bextreş, bextreş bibe û yê bextewer, bextewer bibe».

Di hedîsek dî da ji Hezretê Ebul Hesen riwayet bûye ku: «Wê xalis û xwerî bibin, çawa ku zêr xwerî dibe».

Di Kafiyê da sened digehê Îmam Sadiq (a.s) ku got: «Çi dan û standina heyî, Xwedê di wê da meşiyet, hukm û îmtihanek heye».

Hedîsek dî ji wî hezretî, dibêje: «Çi dan û standinek heyî ku Xwedê emr pê kiribe an nehy kiribê, Xwedayê ezîz û celîl di wê da ceribandin û hukmek heye». Vê gorekê her dan û berfirehî û emr, nehy û teklîfek, ji îmtihan û ceribandinê ra ye.

---

1 - Nehcul Belaxe, x. 16: "Ez bi wî kim, ew ê Pêxember (s.a.a) bi heqî hinartiye, hûn ê welê bên tevhevkirin û wisa bên bêjing kirin..."

Nexwe kifş bû ku, rêkirina pêxemberan û kitêbên ezmanî -hemû ji bo ji hev cudabûna beşer ra ye- bo ji hev qetana guhdar û neguhdara ye. Û me'na îmtihan û tecruba Heq Teala, hema ev cudakirin û qetandina beşer e ji hevûdu, ne ilmê bi vê qetandinê. Çiko ilmê Xwedê ezelî ye û her tişt di xwe da girtiye. Hekîman der heqê îmtihan û îbtilayê da gelek xeberdan hene ku jê xeberdana wê ji qeydê der e.

Nexwe netîca îmtihanê -ku herdukên hatin gotin ji mezintirînê wan e- cudakirina bextreş û bextewera ye ji hevûdu. Di vê îmtihanê da delîla Xwedê ser xelkê temam e û helaket, şeqawet, seadet û jiyana her kesî gorekî delîlê diqewimê û rêk ji qebûl nekirinê ra namîne. Kesê bextewerî û jiyana ebedî peyda dike bi hîdayeta Xwedê ye. Çiko hemû wesîleyên wê dane. Û kesê bextreşiyê dest xwe ve bîne û berew ji nav çûnê biçe û bikeve pey bayê dil û şeytan, di halekî da ku rêkên hîdayetê vekirî bûn û esbabên dest ve anîna seadetê hemû hebûn. Ewî bi îxtiyar û bijartin, xwe xistiye helaket û bextreşiyê, delîl û huceta Xwedê li ser wî temam e: «Leha ma kesebet we aleyha mektesebet» «Ya bi dest ve anî ji wî ra ye û [nebaşî] ya bi dest ve anî li dijê wî da ye» (Beqere / 286).

**Vebir: Dijwariya îmtihana pêxember, wesî û muminan**

Pêşda hat gotin ku, heçî karê mirov dike û belkî heçî tişta di mulkê bedenê da pêk tê û bibe muteeliqê îdraka nefsê, çi kiryarên baş bin an xirab, eserek ji wê dikeve ser nefsê, ku di riwayetan da ji wê eserê ra niqteya spî û niqteya reş tê gotin. Û ferq nake çi ji sinx û cinsê xweşiyan be an ji nexweşiyan. Mesela, çi xweşiya mirov ji xwarin, vexwarin, şehwetê... bibe, ew eserekî di nefsê da datîne û di navdeyê ruh da pêwend û girêdanek jê ra çêdibe û meyla nefsê ji wê ra zêde dibe. Û çiqas di nav xweşiyên pirtir da xwe bigevizîne, xwest û girêdana nefsê bi vê alemê ve zêdetir û dijwartir dibe û nefs terbiyet dibe û adet dike bi girêdana dinyayê ve û çiqas lezet û xweşiyê pirtir tam bike ewqas rehên hezkirinê pirtir

dibin. Û çiqas berê mirov pirtir bikeve dinyayê, ewqas berê wî ji alema axretê dizivire. Û eger berê nefsê bi temamî ket madiyat û dinyayê, hingê bi temamî berê wî ji Xwedê Teala û alema kerametê dizivirê û dibêje: «Exlede ilel erdi we etbe'e hewahu».[1]

Nexwe noqîbûna di behra lezetan da, hezkirina dinyayê tîne. Û ev hezkirin dibe sebebê tenefura ji xeyrî wê û berê xwe dana mulk, sebebê bêxeberî ya ji melekût e. Û bervajî, vêca eger mirov ji tiştekî xirabî dît û tiştên ne ser meyla dil ji wê çêbû, şiklê wê îdrakê di nefsê da tenefurê çêdike. Û çiqas ew sûret û şikl qewîtir be, tenefura navdeyî xurtir dibe. Wek çawa eger kesek di bajarekî da nexweş bibe û bikeve tengiyê, nexweşî û zehmetî jê ra çêbin, wê ji wêderê mutenefir bibe û biçe. Û çiqas nexweşî pirtir bin, wê nehezî pirtir bibe. Û eger bajarek baştir nas bike, wê biçe wêderê û eger nekare biçe wêderê jî, wê dilê wî bi wê ve be û dilê xwe bibe wêderê.

Nexwe çiqas mirov ji vê alemê xirabiyê bibîne û nexweşî ser da bên, wê ji dilê wî bikeve û jê birevê û baweriya xwe pê neyîne. Û eger baweriya wî bi alemek dî hebe ku vala ye ji bela û nexweşiyan, wê biçe wêderê û eger nekare bi seferek cismanî biçe wê seferek ruhanî bike û dilê xwe bibe wêderê. Û gelek ronahî ye ku hemû xirabiyên ruhanî, exlaqî û kiryarî ji huba dinyayê û bêxeberiya ji Xwedê û axretê çêdibe. Û huba dinyayê serkaniya hemû guneha ye. Her weha hemû duristiyên ruhî, exlaqî û kiryarî ji berêxwedana Xwedê û alema axretê û bê meyliya bal dinyayê û xemla wê çêdibin.

Nexwe ji vê pêşekiyê ku rehmeta Xwedê li ser kî pirtir be, ewî ji her kesî pirtir ji vê dinyayê û xemla wê paşde dide û pêlên bela û îmtihanê pirtir ser wî da dide, heta ku ruhê wî ji vê dinyayê û xemla wê bireve û nerehet bibe û qas îmana xwe berê xwe bide alema axretê û dilê xwe bibe wêderê. Û eger ragirtina

1- E'raf / 176: "Ewî xwe di erdê da (di dinyayê da) berda û ket pey bayê dil".

dijwariya îbtilaê hema ji ber vê tenê bûya jî, bes bû. Û di hedîsên şerîf da îşare bi vê me'nê hatiye kirin: Îmam Baqir (a.s) dibêje: «Wek çawa ew ê ji seferê tê û pê hediyekî kêfa maliyê xwe xweş dike, bi wî awayî Xwedê jî ewî karî bi bela û îmtihanê gel mumin dike. Û ewî der heqê dinyayê da têxe parêzê, wek çawa doktor, yê nexweş dixe parêzê».

Di hedîsek dî da, ev me'ne hatiye. Û bila neyê gomanê ku haşa muhabeta Xwedê ji hineka ra bê delîl û ji xwe da ye; çiqas mirovê bawerdar gavekî bi aliyê Xwedê ve bavêje, berê Xwedê dikeve wî û qas zira'ekî Heq Teala nêzîkê wî dibe. Mesela derecên îmanê û hazirkirina wesîlên tewfîqê, mesela mirovekî ye ku bi çirayekî di rêkek tarî da rê ve biçe, çiqas gavekî bavêje, pêş wî ronahî dibe û ji gav avêtinek dî ra ewî rênimûn dike. Heçî gava mirov berew axretê bavêjê, rêk ronahîtir dibe û pirtir berê Xwedê dikeve wî û wesîlên berêxwedana axretê pirtir dibin. Û înayeta Heq Teala gel pêxemberan û weliyan ji ber wê zanîna ezelî ye ku dizaniya di zemanê teklîfê da wê guhdar bin. Çawa ku eger te du zarok hebin û tu di zemanê zarokiya wan da pê bihesî ku yek wê şahiyê ji te ra çêke û yê dî wê te bîne xezebê û nerehet bike, bê şik wê ji ewil ve berê te pirtir li yê guhdar be.

Sebebek dî der heqê dijwariya îbtila a evdên taybet û xas, ev e ku ji ber van tengî û nexweşiyan Xwedê bînin bîra xwe û li ber dergahê Xwedê, dua û zarî bikin û bi fikir û zikrê wî, dilxweş bibin. Tebîetê benî Adem ew e ku di wextê belan da ji xilasiya xwe ra çi tişta dest wan bikeve, xwe pê bigirin û di wextê selametî û rehetiyê da jî dikevin xefletê. Lê çiko xewasan rukn û stûnek ku xwe pê bigirin xêncî ji Xwedê nas nakin, berê xwe didin wî û xwe bi wî digirin û Xwedê ji ber ku hej wan dike, berê wan dide xwe. Her çend ev nukte, belkî nukteya pêş wê da jî, der heqê pêxember û weliyan da, nedurist be. Çiko dilê wan ji wê hindê paqijtir û qewîtir e ku bi van tişta dilê wan bi dinyayê ve bêt girêdan an di tewecuh û berdana Xwedê da ji wan ra ferq bike.

Mirov dikare bêje, çiko enbiya û ewliyaên giranqedr bi ronahiya navdeyî û mukaşifeya ruhanî pê hesane ku dinya û xemla wê li bal Xwedê Teala kêm û bê qîmet e, ji ber wê şûna dewlemendiyê da nedarî û şûna rehetiyê da îbtila bijartin, çawa ku di hedîsan da îşare heye bal vê me'nê ve. Di hedîsê da hatiye ku: «Cebraîl kilîdên xizne yên erdê anîn huzûra Pêxemberê Xatem (a.s) û gotê: Eger tu ewa bixwazî kêmasî nakeve mertebên te yên axretî jî, lê ewî ji ber şikestîbûna li beranberê Xwedê da ew qebûl nekir û feqr ji xwe ra bijart. Û di Kafiyê da sened digehê Îmam Sadiq (a.s) ku got: «Kafir, ewqas li bal Xwedê bê qîmet e ku eger dinyayê hemûyê jî bixwaze, wê Xwedê bidiyê». Û ev ji ber bê qîmetiya dinyayê ye di nêrîna Heq Teala da. Û di hedîsê da hatiye ku: «Ji wî wextî ve ku Heq Teala alema ecsaman çêkirî, bi çavê lutfê berê xwe nedaye wê».

Nukteyek dî vê der heqê da ku riwayetan îşare pê kiriye, ev e ku: Bawerdaran hinek derece hene ku xêncî bi rêka bela û nexweşiyan ve nagehînê. Çêdibe ev derece, şiklê ber zivirandina ji dinyayê û berê xwe dana Xwedê be. Çêdibe jî ku ji van belayan bi xwe ra şiklek melekûtî hebe ku gihana wê hingê çêdibe ku di vê alemê da pêk be. Çawa di hedîsa şerîfa Kafiyê da ji Îmam Sadiq (a.s) hatî, dibêje: «Bende, li bal Xwedê cihek heye ku xêncî bi du tiştan nagihêtê: An malê wî biçe an nexweşiyek ser kelaşê wî da be». Û di behsa Seyyiduş Şuheda (a.s) da hatiye ku ewî Resûlê Xwedê (s.a.a) di xew da dît, Pêxember (s.a.a) gotê: «Ji te ra dereceyek di bihiştê da heye ku xêncî pê şehîdbûnê tu nagihiyê». Helbet çawa di ilmên alî da delîl jî jê ra anîn, şiklê melekûtî yê şehîdbûna di rêka Xwedê da çênabe îlla ku di dinyayê da biqewime. Di xeberên mutewatir da hatiye ku her karekî di alema dî da şiklek jê ra heye.

Di Kafiyê da ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye ku: «Xêra mezin digel belaya mezin e. Û heçî yê Xwedê hejê bike, ewî beladar dike». Û hedîs bi vê me'nê zehf in.

**Vebir: Nexweşiyên cismanî yên pêxemberan (a.s)**

Muhedisê mezin, Meclisî (rehma Xwedê lê be) dibêje: Ev hedîs (hedîsên îbtila ya enbiya) delîlên ronahî ne ji wê ra ku pêxember û wesî jî di nexweşî û belayên bedenî da wek yên dî ne û belkî ji bilindiya derece û mertebê ra, ew di vê yekê da pêştir in ji yên dî. Û ev ne dij e gel mertebe û meqamê wan. Û eger bela ser wan da neyin, halhale mucîze ser destê wan pêk tên, wê der heqê wan da ew bêt gotin ku filan der heqê pêxemberê xwe da gotine. Û ev te'lîl di riwayetan da hatiye.

Lêkolê hûrbîn û hekîmê mezinê Xwedêyî, Tûsî[1] (Xwedê gora wî bêhnxweş bike) di kitêba Tecrîd da di behsa wan tişta da ku gereke ji pêxemberan dûr bin, dibêje: Û heçî tişta xelk jê birevin û tenefur pê çêbe. Û allameyê zana yên Îslamê (Xwedê jê razî) di şerha wê da dibêje: Gereke paqij û dûr be ji wan nexweşiyên ku nefret jê çêdibin, wek: Seles, cuzam û beresê. Çiko ev tenefurê çêdikin û dijatî hene gel hedefa rêkirina pêxemberan.

Nivîser dibêje: Gerçî meqamê nubûwetê bi kemalatên nefsanî û derecên ruhî ye û girêdan bi meqamê cismî ve nîne û nexweşî û kêmasiyên bedenî eger meqamê wan bilindtir neke, her kêmasiyê ji meqamê wan yê ruhanî ra çênake. Lêbelê ewa ku van du lêkolan gotî jî, ne ji beredayî ye. Çiko giştiya xelkê nikarin ferqê bixin navbeyna meqamat û derecan da û goman dikin ku kêmasiya bedenî hema kêmasiya ruhî ye jî. Û ew gel hev in û hinek kêmasiyan jî dijê meqam û mezinahî û mertebê zanin. Ji ber wê yekê Xwedê wereng xwestiye nexweşiyên ku xelk jê direvin û tenefura wan jê heyî, nede pêxemberên hatine hinartin ku

---

1- Muhemmed kurê Hesenê Tûsî meşhûr bûyî bi nasnavê Xace Nesîr û Muheqiqê Tûsî (597-672 h.) ji hekîm û zanayên meşhûrê Îslamê ye. Di felsefe, kelam û riyaziyat û heyetê da pir zana bûye. Allameyê Hillî û Qutbuddînê Şîrazî û Seyyid Abdulkerîm bin Tawûs ji feqiyên wî bûne. Eserên hêjayî ji wî di cih da mane, wek: Şerha Îşarat, Tecrîd, Tehrîr Eqlîdus, Exlaqê Nasirî.

xweyên şerî'etê ne. Nexwe mubtela nebûna wan, ne ji ber wê ye ku kêmasî ye di meqamê nubûwetê da, belkî ji ber temamkirina feydeya teblîx û ragihandinê ye. Vê gorê, tişt nabe eger hinek ji wa yên ne xweyê şerî'etê û weliyên mezin û bawerdar ev belayên weha ser wan da bên. Wek çawa hezretê Eyyûb û cenabê Hebîbê Neccar, ji wî qismê belayan ser wan da hatî. Û der heqê belaya hezretê Eyyûb da gelek xeber jî hene.

Yek ji wan ew e ku di tefsîra Alî b. Îbrahîm da hatiye û kurtê wê ev e: Xêncî ji aqil û du çavên wî, nexweşî ket hemû bedena wî, vêca Îblîs pif kirê û ji serî heta piyan bû kulik. Zemanek dirêj bi vî awayî ma, hemd û şukrê Xwedê dikira. Kurm ketin bedenê, carna ji bedena wî derdiketan û ewî dîsa ew datanîna ser cihê wan... bêhn ket bedena wî, heta xelkê gund ew ji gund deranîn û avêtin ser sergoyekî ji derve yê gund.

Di Kafiyê da hatiye, Ebû Besîr ji Îmam Sadiq (a.s) der heqê ayeta 98-99 ya sûretê Nehl dipirsê: «Fe iza qere'tel Qurane festeiz billah mineş şeytanir recîm...» Hezret dibêje: «Sond bi Xwedê, wî ser bedena bawerdar xurt dike, lê xurt nake ser dînê wî; ew ser Eyyûb xurt kir ku cismê wî guherand...».

Vê der heqê da hedîsên dî jî hene ku gel van rêk nakevin û dirêjkirina xeberdanê vê der heqê da ne pir feyde ye.

Welhasil, nexweşiyên weha zererê nagihîne halê bawerdaran û ji wan û ji pêxemberan ra (a.s) ne kêmasî ye, belkî bilindiya meqam, derece û mertebê ye. «Wellahu Teala e'lem bissewab».

**Vebir: Dinya ne cihê xêr û cezadana Xwedê Teala ye**

Bizane ku alema dinyayê ku tijî neqs û kêmasî ye, ne cihê xêrdan û ne cihê ezab û îqaba îlahî ye. Çiko mala kerameta îlahî xweşiyên wê zelal û xwerî ne û rehetiya wê ne tevlî zehmetê ye. Û di vê alemê da xweşiyek wereng çênabe û di beranberê her xweşi-

yekî da çendîn zehmet û nexweşî hene. Heta ku hekîman gotine: Lezeta vê alemê dûrkirina derd û elema ye. Heta mirov dikare bêje: Lezeta wê, sebebê elem û derda ye. Çiko li vêderê pey her xweşiyekî ra zehmet û nexweşiyek heye. Her weha ezab, zehmet û nexweşiya vê alemê jî ne xwerî ye; belkî her zehmet û derdek têkel e digel xweşî û xweşiyan. Û cihê ezab û îqaba Xwedê ceheke ku ezab û îqabê wê xwerî be û ne tevlî xweşiyan. Nexweşiyên wê alemê ne wek yên vê alemê ne ku ser qetekî da bêt û qeta dî di rehetiyê da be, endamek di nexweşiyê da be û ya dî selamet be. Û di vê hedîsa me şerh kirî da, îşare kiriye bal hinek ji wê ya me gotî, li wêderê ku dibêje: Xwedê dinya nekiriye cihê dana xêrê ji bawerdaran ra, ne jî cihê ezabdana kafiran. Vêderê cihê teklîfê û zevî ya axretê û alema kesb û kar e û cihê cezadan û xêrdanê, hema alema axretê ye. Ew ên berhêviyê vê yekê ku kesê di vê dinyayê da guneh kir û pîsatî jê çêbû, zulm û neheqî kir di cih da Xwedê pêşiyê lê bigirê û destê wî bibirê û ji nav bibe, bêxeber in ji wê yekê ku ev muxalifê tertîb û muxalifê suneta îlahî ye. Ev alema kiryarê ye, ne cihê eşkerebûna netîca amel û melekatan. Û eger kêm caran Xwedê bela zalimekî bidiyê jî, mirov dikare bêje ji înayeta Xwedê ye ji bona wî zalimî. Eger ehlê guneh û zulmê di halê wan da bihêle, ew «istidrac» e, çawa ku Xwedê kerem dike: «Se nestedricuhum...».[1] Yanî: «Ji nêzîk ve em ê kêm kêm xweşiyê bidin wan ji aliyekî ve ku ew pê nizanin û em ê muhletê bidin wan. Bi rastî girtina min dijwar e». Û kerem dike: «Kesên ketine kufrê, bila we goman nekin ku muhletdana me bo wan ji wan ra baş e, tenê em ji vê çendê ra muhletê didin wan, da ser guneh [ên xwe] ve zêde bikin, û ji wan ra ye ezabek rezîlker». Di Mecmeul Beyanê da ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet dike ku: «Dema evd gunehekî bike, xweşiyek jê ra nû û taze dibe, vêca xwestina lêborînê paşda dide, hema ew istidrac e».

---

1- Qelem / 44-45

**Vebir: Dijwariya bela yên ruhî gorekî têgihanê ye**

Ji axirîka hedîsê tê fêhmê ku, bela hem cismanî ne û hem ruhanî. Çiko mirovên aqilê wan zeîf gora zeîfiya aqilê xwe ji nexweşiyên ruhanî û aqlî di emanê da ne. Bervajiyê wa yên aqilê wan temam û fêhma wan tîj, ku gora kemala xwe ya aqlî û tîjatiya fêhma xwe, beliyatên wan yên ruhî zêde dibin. Û çiqas ew xurt be, ev jî xurt dibe. Çêdibe gotina Resûlê Xwedê (s.a.a): «Tu pêxemberekî qasî min eziyet nedîtiye». Li vê me'nê bizivire. Çiko kesê pirtir û baştir Xwedê nas bike, pirtir ji ber neguhdariya evdan dikeve tengî û eziyet dibe, her weha heçî kesê dilovanî û merhemeta wan nisbet bi bende û evdên Xwedê pirtir be, ewqas pirtir ji xwehrî û bextreşiya wan diêşê û eziyet dibe. Helbet Resûlê Xatem (s.a.a) di van meqaman û di derecên kemalî yên dî da, ser enbiya û ewliya û dîtir benî beşeran ra ye; nexwe eziyeta wî pirtir bûye û gelektir eser lê hatiye kirin. Ev bi awayek dî jî hatiye me'ne kirin; lê ev der, ne cihê gotina wê ye. “Wellahul alim we lehul hemd”.

## HEDÎSA ŞAZDEHÊ

بإسنادنا المتّصلة إلى ثقة الإسلام و المسلمين، فخر الطائفة الحقّة و مقدّمهم، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، رضى الله عنه، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد بن خالد، عن أبيه، عن علىّ بن النّعمان، عن عبد الله بن مسكان، عن أبى بصير، قال سمعت أبا عبد الله، عليه السّلام يقول:

**«إنّ الحُرّ حرٌّ علي جميعِ أحوالِه، إن نابَتْهُ نائِبةٌ، صَبَر لَها، و إن تَداكّتْ عليه المَصائِبُ، لم تَكسِرْهُ و إن اُسِر و قُهِر و استبدلَ باليُسْرِ عُسْرًا، كما كان يوسفُ الصّدّيقُ الأمينُ لم يضرر حريّته أن استُعْبِد و قُهِر و اُسِر، و لم تضرره ظلمةُ الجُبّ و وحشتُه و ما نالَه، أن منّ الله عليه فجَعَلَ الجبّارَ العاتيَ له عبدا بعد إذ كان [له] مالكًا، فأرسَلَه و رَحِمَ به أمّةً. و كذلك الصّبر يُعقّبُ خيرا. فاصبِروا و وطّنوا أنفسَكم علي الصّبرِ تُوجَّروا.»**

Ebû besîr dibêje, min ji Îmam Sadiq (a.s) bihîst ku digota: «Mirovê azad, di hemû ehwalê xwe da azad ye, eger nexweşiyek serda bêt, sebrê li ser dike û eger musîbet lê bibarin, ewî naşikînin, her çend esîr bibe û xurtî lê bêtkirin û rehetiya wî cihê xwe biguhêze bi zehmetiyê. Wek çawa bi serê Yûsufê Sidîqê emîn da hatî, ku benîtî û binketin û esaretê zerer negihand azadiya wî, her weha tarîtiya çalê û tirsa wê û ewa serda hatî jî zerer nedayê. Heta ku Xwedê pir qencî lê kir, vêca xweyê wî yê zorgo yê mutekebir kir xulamê wî û ew bi pêxemberî hinart û bi wî rehmeta xwe ser umet û komekî da rijand. Eha bi vî awayî xêr û xweşî di pey sebir

û xweragirtinê ra tê. Nexwe sebir bikin û sebrê di xwe da cihgir bikin, da hûn xêrdar bibin û kirha hewe bêt dayîn».[1]

**Vebir: Esareta şehwetê serçavka hemû esareta ye**

Bizane, eger mirov ket bin sulteya şehweta xwe û bayê dil, wê bendîtî û zilet qasî binketina wî ya nefsê çêbe. Û me'na wê ew e ku wê guhdarê wê bibe. Û mirovê guhdar ê şehwetê û mexlûbê nefs a emmare, bendeyê guhdar û mutî' e ji wan ra û ew çi destûrê bidinê, wê ewê pêk bîne. Heta mesele bigehê wê derê ku guhdana wan pêş guhdana xaliqê erd û ezmana bêxe û şûna bendetiya malikê heqîqî da, bibe bendeyê wan. Hingê ye ku wê izet û huriyet û azadmêrî ji dil derkeve û toza zilet, feqr û koletiyê dil binixûmîne û li beranberê ehlê dinyayê da şikestîbe û dilê wan li ber mezinahiya ehlê dinyayê bitewe û biçe secde û di rêka têrkirina zik û binzik da zelîl bibe û minetê ragire. Heta ku ew esîrê şehwet û nefsê ye, qet xwe ji tiştên xilafê şerefê û xilafê camêrî û azadiyê venade û wê bikeve bin barê her kesî da û hema dema goman bike wê xwesta wî bêt dest, wê biçe bin barê mineta hemû kesî da, her çend ew kes rezîltirînê xelkê be û îhtimala dest ve hatinê jî mewhûm be. Û dibêjin «wehm» di babetê teme'ê da hucet e. Koleyên dinya, şehwetê û ew ên li pey bayê dil, her kesê dinyayê li balê bibînin an îhtimal bidin, wê koletiyê jê ra bikin û xwe jê ra bişikînin. Û eger bi serê ziman, xwe mezin û paqij nîşan jî bidin, ew pêkve tedlîs û hîle ye, amel û gotarên wan wê xeberdanê derewîn dikin. Ev koletî û esaret ji wan tişta ye ku daim mirov têxin zehmet û eziyetê. Û mirovê hêja û xweyê şeref, gereke bi çi kol û halê heyî, xwe ji wê bişo û paqij bike. Û bi dermankirin û mu'alica ruh û nefsê ye ku, mirov dikare xwe ji vê qirêjê xilas bike û paqij bibe, ew jî bi ilm û amelê bi feyde çêdibe.

Rêka amelî ew e ku mirov bi karên şer'î ve mijûl bibe û muxale-

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 69, h. 6

feta nefsê bike; demekî nefsê ji hezkirina zêde ya dinyayê û peyketina xwest û viyanên wê û bayê dil paşde bide, heta ku bikeve ser adeta kemalat û başiyan.

Rêka ilmî jî bi vî awayî ye ku bi nefsê bide fêhmê û bixe dilê xwe ku mexlûqên dî jî, wek wî zeîf û muhtac û feqîr in. Ew jî muhtacê Xwedayê qadir ê muteal in û ew ne qabil in ji rakirina hacet û niyazê ra û piçûktir in ji wê çendê ku mirov berê xwe bide wan û xwe ji wan ra bişikîne. Ew Qadirê her tişt jê tê, ku mezinahî, şeref, mal û minal dayî wan, dikare bide wî jî.

Hema bi rastî mirov şerm dike ku ji zik an binzikê xwe ra evqas xwe zelîl bike, bişikîne û mineta vî mexlûqê bê hemû tişt û nedarên bê dest û pî, zelîlên bê zanîn û fikir, ragire. Eger tu diçî bin barê minetê da, qet ne here bin mineta dewlemendê bê qeyd û bend, xaliqê erd û ezmana da. Eger tu berê xwe bidî wî û dilê te di beranberê wî da şikestî be, tu wê ji herdu aleman vebî û toqa koletî ya mexlûqan wê ji stûwê te derkeve; bendetiya Xwedê cewhereke ku navdeyê wê azadî û perwerdetî ye. Bi rêka bendetiya Xwedê ve û nêrîna li niqta wahide ya merkezî û danîna hemû hêzan di bin selteneta îlahî da, haletek qelbî û ruhek wereng peyda dike ku ji Xwedê pê ve ji kes dî ra serê xwe naçemîne. Û eger ji ber pêşhata zeman bikeve bin sulteya kesekî da jî, serxwebûn û azadiya ruhî parastî dimîne. Çawa ku koletiya berçavî ya hezretê Yûsuf û hezretê Loqman zerer negihand azadiya wan ya dil û qelbî. Çiqa hene ew ên li ber çavan qudretmend û xweyê padişahiyê ne, lê bêhna huriyet û azadî ya ruhî jî bêhn nekirine, bende û koleyê nefsa xwe ne û ji ber wê ji bendeyan ku netiştek in jî, xwesta xwe dixwazin. Îmam Seccad dibêje: «Ez şerm dikim dinyayê ji xaliqê wê bixwazim, vêca çawa ez ê ji mexlûqek wek xwe bixwazim!».

Ey ezîz, eger tu ji xwestina dinyayê şerm nakî, qet ne ji mexlûqek wek xwe bêhêz nexwaze. Bizane ku mexlûq nikare dinya te ava bike. Hema eger te bi hezar minetan ew razî kir jî, îrada wî di

mulkê heq da bê feyde ye û kes nikare dexalet bike di mulkê Malikul Mulûk da. Nexwe ji şehweta çend rojê ya vê dinyayê ra evqas xwe ji xelkê feqîr û nedar ra neşikîne û ji Xwedayê xwe ne bêxeber be û huriyet û azadiya xwe xweyî ke û xwe ji toqa esaretê derîne û di hemû halan da azade be, çawa ku hedîsê gotî.

Bizane ku dewlemendî bi dewlemendî ya dil e û bê niyazî ji haletên ruh e. Min bi xwe di nav maldaran da dît ew ên ku qet tu nedarê avrûmend wereng naxwaze û mirov diketa şermê ji ber xeberdana wan! Ew jarê ku toza jarî û belengaziyê dilê wî nixûmandibû. Xelkê cihû digel wê ku nisbet bi xwe maldartirînê xelkê ne, dîsa jî zilet, jarî, feqr û neçarî ji ser û rûyê wan dibarê û di temamê omrê xwe da bi zehmet û zelîlî diborînin. Ev, hema feqîriya dil û zelîliya ruh e. Me di nav zahidan da ew dîtine ku dilê wan ewqas dewlemend e ku di nêrîna xwe da berê wan ne li dinyayê ye û xêncî ji Xwedê kesî layiqê wê nizanin ku niyaz û haceta xwe jê bixwazin. Tu bi xwe binhêre dinyaxwaz û wayên li pey mezinahiyê binhêre û bibîne ku zelîliya wan û xwesta wan ji xelkê ji her kesî pirtir e, her weha ev ku xwe dişikînin. Perwerdekerên murîdan û mude'iyên îrşadê çiqas xwe zelîl dikin û îradetê ji xwe dixweyhênin ku çend rojekî zik û binzikê xwe xweyî bikin. Dilê muradê talib li bal murîd şikestîtir e ji dilê murîd li bal wî, digel vê jî di sinxê van herdu îradetan da ferq hene: Îradeta murîd ruhanî û îlahî ye; her çend xelet be. Lê îradeta murad, dinyayî û şeytanî ye. Evên hatine gotin xirabî û zelîliya dinyayê ye.

Eger perde rabe û kifş bibe ku şiklê evê esareta nefs û bayê dil çi şikl e! Belkî ev zincîra heftêh zira'î ku Xwedê behsê jê dike û ew zindan û kelhana ji me ra heyî, hema şiklê vê esareta me ya di bin fermana şehwet û xezebê da be. Xwedê Teala kerem dike: «Tişta kirîn li bal xwe hazir dibînin».[1] Kerem dike: «Heçî tişta dest xwe ve bîne çi baş û çi xirab, ji wî ra ye».[2] Ewa li wê alemê da ji me ra

1- Kehf / 49

2- Beqere / 286

heyî hema şikl û sûretê amelê me bi xwe ye.

Zincîrên şehwet û bayê dil biqetîne û dil ji esîriyê derîne û di vê cîhanê da azadane bijî, da di wê cîhanê da tu azad bî, eger ne tu wê şiklê vê esîriyê li wêderê hazir bibînî. Bizane ku ew ji qama te der e. Weliyên Xwedê her çend ji esîrî û koletiyê xilas bûne û azadiyek temam hebûn, dîsa jî dilê wan dileriziya û ji ber dûmahîka kar, wereng nalenal û zarî dikiran ku aqilê mirov şaş dimîne.

**Vebir: Peyketina şehwetê pêşîgirê me'newiyetê ye**

Her çend gotinên di vê kitêbê da heyîn giştî û tekrar tên hesabê, lê bîranîn û dubarekirina heqiyê tiştek baş e û ji ber vê ye ku di zikr, ewrad û îbadetan da tekrar tiştek xweşdivê ye. Û nukta wê ya eslî ew e ku, nefs adet bike, nexwe ey ezîz ji tekrarê neweste û bizane çiqas mirov esîrê nefs û şehwetê be. Zincîrên dirêj ên şehwet û xezebê li stûwê wî weriane û nagihe tu yek ji meqamatên me'newî, ruhanî û padişahiya navdeyî ya nefsê û îradeya wê eşkere nabe û meqamê serxwebûna nefsê û izeta wê ku ji mezintirîn meqamatên ruhanî ye dest ve nayê û ev esaret dibe sebeb ku, qet ji guhdana nefsê xilas nebe.

Dema nefsa emmare û şeytan di navdeyê mirov da xurt bûn, êdî mirov bi kirina gunehan tenê razî nabe, kêm kêm mirov ji gunehên piçûk bi aliyê gunehên mezintir ve diçê û ji wê bi aliyê sistiya baweriyan ve diçê û pê ra fikra mirov tarî dibe û ji wê mirov digehê astenga înkar û cuhûdê û ji wêderê mirov bi aliyê kerb hatin û dijminiya pêxember û weliyan ve dikişe û nefs ku di esareta wan da ye, nikare neguhdariya wan bike. Nexwe dûmahîka vê esaretê gelek xeter e û çêdibe mirovan bi aliyê cihên pir xeter ve bikişîne. Mirovê aqilê dilê wî bi wî dişewitê gereke çawa hebe, xwe ji vê esaretê derîne û heta firsend û derfet jê ra heye, hêz û quweta wî heye, jiyan û ciwanî berdewam e û bi temamî hêzên wî guhdarê bayê dil nebûne, di beranberê wê da rabe. Veca demekî hay ji xwe bimîne û der heqê xwe da fikir bike û di halê boriyan û aqibeta wan ya xirab da bifikire û bi dilê xwe

bide fêhmê ku ev çend rojên dinyayê wê xilas bibin û dilê xwe li gotina Resûlê Xwedê (s.a.a) hişyar bike ku kerem kiriye: «eddunya mezre'etul axiret» «Dinya zeviya axretê ye». Eger em van çend rojan neçênîn û karê qenc nekin, wê firsend ji dest biçe û alema dî bigehê û mirin ser me da bêt û êdî kar û amel feyde nake û hêvî wê bêt birîn. Û Xwedê nekirî, di halê koletiya şehwetê û esareta nefs û bayê dil da, eger melekê mewtê bêt, weheye şeytan bigehê mexseda xwe ya paşî û îmanê jî ji mirov bigire û di halê dijminiya enbiya û ewliyan da mirov ji dinyayê biçe. Xwedê zane kanê pişt vê perdê da çi bextreşî, zulmet û wehşet heye.

Ey nefsa xebîs û dilê xafil! Ji xew rabe û li beranberê vî dijminî raweste, ku eve salên sale tu ji rê deranî û esîr kirî û bi kuderê ve bixwaze te dibe û amelên kirêt bi te didekirin û te bal hemû exlaqên pîs ve dikişîne, evan qeyd û bendan bişikîne, veke. Azad be û desta ji zelîliyê bikêşe û bibe bendeyê Heq Teala ku hingê tu wê ji hemû koletî û ebdîniyan xilas bibî û bigehî padişahiya îlahî ya du aleman. Ey ezîz, her çend ev alem ne cihê kirh û cezaya îlahî ye. Zindana mumin e, lê eger tu ji esareta nefsê derkevî û bibî bende û ebdê Xwedê, dil muwehid bikî û jenga dubîniyê ji ayna dil bibî û berê dil bidî merkeza kemala mutleq, tu dê hema di vê alemê da eserên wê bibînî. Û firehiyek wereng ji dil ra çêbe ku bibe mezhera hikûmeta tamme ya îlahî û berfirehiya wê ji hemû aleman zêdetirbe, çawa ku gotî: «Erd û ezmanê min, min di xwe da nagire, lê dilê evdê min yê bawerdar, min di xwe da digire». Û wê welê dewlemend bibe ku temamê mulkê zahir û batin bi tiştekî ne hesibîne û ewqas wê îrade qahîm bibe ku, bi mulk û melekût ve negirihê û du aleman jî layiqê xwe nezane.

Te ji wî yê li pey şehwetê firîn dîtiye? Ji wî halî derkeve ku tu firîna mirovan bibînî.[1]

**Vebir: Me'na sebrê**

Sebr, netîca azadî ya ji qeyd û bendên nefsê ye.

---

1- Se'dî: "Teyeranê murx dîdî tu zi paybendê şehwet bider ay, ta bibînî teyeranê ademiyyet".

Ji netîcên mezinên huriyet û azadî ya ji koletiya nefsê, sebra ser bela û nexweşiya ye. Li vêderê gereke em hinekî behsa sebrê û qisim û fêkiyên wê û girêdana wê digel huriyet û azadiyê bikin.

Sebr, çawa ku lêkolê qudsî yê firqa heqe, kamilê di ilm û amel da, Nesîruddînê Tûsî dibêje: «Xweyî kirina nefsê ye ji bê tebatî û hedarê di wextê ser da hatina nexweşiyê». Û arifê muheqiqê meşhûr di Menazilus Sairînê da dibêje: «Sebr, parastina nefsê ye ji şikayeta li ser bê hedarî ya veşartî».

Bizane ku sebir, ji meqamatên navinciyan hesibandine. Çiko çiqas nefs, bela û musîbetan, nexweş bizane û ji ber wan bê hedariya navdeyî hebe, meqamê nasîn û marîfeta wî kêmasî têda heye û naqis e. Çawa ku meqamê riza û şahî ya bi hatina belan, meqam û mertebeyek seratir e. Çiko eger kesek bi heqîqeta îbadet bihese û bawerî hebe bi şikl û sûretê wê yê rind ê berzexî, her weha bawerî hebe bi şiklê berzexî yê bizdênerê gunehan, di vî meqamî da sebir jê ra bê me'ne ye. Belkî mesele bervajî ye; eger xweşiyek jê ra bêt pêş an karê wî bibe sebebê terka îbadetekî an kirina gunehekî, wê li wan nexweş be û bê hedariya wî ya navdeyî wê pirtir be ji bêtabiya ehlê sebrê li ser bela û musîbetan. Ji ebdê salihê arifê xweyê meqamat û keramatan, Alî bin Tawûs (qeddesellah nefseh),[1] neqil bûye ku di roja ewil ya teklîfa xwe da dikira şahî û ji xwe re cejn û eyd dihesibanda. Çiko di wê rojê da Xwedê fexr dayiyê ji ber ku îzna wî daye, da îbadet bike. Gelo ji vî ruhê nazik ra gereke kirina îbadet sebra li ser nexweşiya veşartî bêt hesab kirin? Em li ku û ew bendeyên guhdarê Heq li ku! Dîsa em goman dikin Heq Teala barek li me kiriye; em teklîfê ji zehmet û «kulfet»ê zanîn. Eger yek ji me xwe bide zehmetê û

1- Reziyuddîn Alî bin Mûsa bin Cafer (589-664 h.) bi nav û dengê Ibn Tawûs. Alimek abid, zahid û xweyê meqamat û keramata ye. Ji nêzîkên hezretê Mehdî bûye di dewrana xeybeta suxra da. Kitêbên pir qîmet ji wî di dest me da hene, di gelek ilman da nexasima der heqê exlaq û îbadetan da. ji wa ne: Mehcud De'ewat, Îqbal, Cemalul Usbû', Keşful Mehecce, el-Yeqîn, Felahus Sail.

ferza xwe di ewilê wextê da bi cih bîne, te dît got: Gereke mirov di ewilê wextê da nimêja xwe bi cih bîne û xwe rehet bike! Hemû bextreşiya me ji cehl, nezanî, kêmasî û nebûna îmanê ye.

Welhasil, heqîqet ev e ku sebir, parastina nefsê ye; ku ji ber bê hedariya veşartî şikayet neke. Û sebra der heqê îmamên hîdayetê û pêxemberên giranqedr da gotine, çêdibe sebra li ser êşa nexweşiyên bedenî be, ku di tebîetê beşerî da eser jê ra heye, an jî sebra li ser firaqa mehbûb be, ku ji meqamatên mezinê muhibîna ye -di pey ra em ê hinekî jê xeber bidin- weger ne, sebra li ser îbadet, guneh û bela, xêncî ji ya hatiye gotin, der heqê wan da û belkî peyrewên wan da bê me'ne ye.

Arifê me'rûf, Kemaluddîn Abdurrezzaqê Kaşanî di şerha «Menazil»ê da dibêje: Şêx ku dibêje, sebir xwe vedana ji şikayetkirinê ye, mexsed şikayetbirina bal xelkê ye. Lêbelê eva he ku mirov şikayeta hal bibe ber dergahê îlahî, dijatî gel sebrê nîne. Çawa ku hezretê Eyyûb şikayeta halê xwe bir bal Xwedê: «Ey reb, şeytan ez xistime zehmet û ezabê».[1] Ev di halekî da ye ku Xwedê Teala pesnê wî dide: «Me ew sebirdar dît, ew xweş bende bû, bi rastî daim berê wî li Xwedê bû».[2] Û hezretê Ye'qûb dibêje: «Ez şikayeta kul û xema xwe ji Xwedê ra dibim».[3] Halhale ew ji sebirdaran bû.[4]

Ji sîreta pêxember ên giranqedr û îmamên pak jî wereng xuya dike ku her çend meqamê wan bilindtir bû ji meqamê sebir û riza û teslîmê, lê dîsa jî li ber dergahê Xwedayê xwe, xwe ji şikandin û dua û zarîkirinê venadan û hacetên xwe ji Heq Teala dixwestan. Û ev ne dijê meqamatên ruhanî ye, belkî bîranîna Xwedê, tenêbûn û bêhnfirehiya bi mehbûb û eşkerekirina bendetî û zelîliya li ber dergahê Xwedayê Teala, xayeta amala arifan û netîca sulûk a salika ye.

---

1- Sad / 41

2- Sad / 44

3- Yûsuf / 86

4- Şerha Menazilus Sairîn, p. 85, behsa "Sebr"ê.

**Vebir: Desthatên sebrê**

Bizane ku sebir, gelek desthat û netîce hene; ku yek ji wan perwerdekirin û terbiyeta nefsê ye. Eger kesek ji ber emr û fermana Xweda yê xweyê nîmetan, demekî sebir bike û xwe ragire li ser bela, musîbetan û zehmetiya îbadetan û tehliya terka xweşi yên nefsanî, kêm kêm wê nefs bielime û adet bike. Ji hêçiyê derkeve û dijwariya ragirtina zehmetî û nexweşiyan wê jê ra rehet û hêsan bib. Wê ji nefsê ra meleka nûraniye ya qewî peyda bibe û pê wê, ji meqamê sebrê, wê bi aliyê meqamên bilindtir ve biçe û bigehê dereceyên bilindtir. Sebra ji gunehan teqwatiyê çêdike; sebra di guhdan û taet da, uns û bêhnfirehiya bi Heq Teala tîne. Û razîbûna bi qeza û qedera îlahî jî, bi sebra li ser belan ve tê. Û evên he ji meqamatên bilind ên ehlê îmanê û belkî ehlê îrfanê ne. Û di hedîsan da gelek pesn û medhê sebrê hatiye kirin. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da sened digehê Îmam Sadiq (a.s) ku dibêje:

«Sebr ji îmanê ra şûna serî ye ji bedenê ra; vêca dema serî biçe, beden jî diçe. Her wereng dema sebir jî biçe, îman diçe».

Di hedîsek dî da, sened digehê Îmam Seccad (a.s) ku dibêje: «Sebr ji îmanê ra wek serî ye ji bedenê ra, û kesê sebir neyî ewî îman nîne». Hedîs vê der heqê da zehf in, ku di vê behsê da em ê bi munasibet hinek ji wan bînin.

Sebr, kilîdên dergehên bextewerî û xilasiyê ne. Sebr, belayan sivik, îrade û biryarê qewî û memleketê ruh musteqil dike. Bê hedarî û bê tebatî xêncî ji wê ku şerma di wê bi xwe da heyî, nîşanê zeîfi ya nefsê ye. Bi vî awayî mirovan bê qerar dike û biryarê zeîf û aqil sist dike. Muheqiqê xebîr Xace Nesîr dibêje: Sebr navdeyê mirov ji bê hedariyê û ziman ji şikayetê û endaman ji qeleqên ne adetî diparêze. Vêca bervajiyê wê jî heye, yê bê sebir, ne dilrehet e, û di navdeyê xwe da perîşan e. û eva he bi xwe belayek mezin e û nexweştirîn musîbet e û ehetiyê ji mirov digire. Lê sebir, musîbetê sivik dike, dil û biryarê ser belayê têxe. Her weha yê bê sebir, şikayeta halê xwe dibe bal her kesî, eva he xêncî ji bê'arî û hetikçûna di nav alemê da, dibe sebebê bê qerarî û bê

qîmetî ya li bal xelkê û melaîketên îlahî. Kesê nekaribe belayeka Xweda yê xweyê qenciyan, ku daim li bin qenciyên wî da ye, ragire û şikayeta xwe bibe bal mexlûq, ewî çi îman û çi teslîmiyet heye li beranberê Heq Teala da? Nexwe dema tê gotin, yê sebir neyî, îman nîne; durist e. Eger te bawerî bi Reb hebe û tu bizanî ku her tişt û her qewimîn bi emrê Xwedê çêdibin û kes dî di umuran da ne muteserif e, muheqeq tu ji ber belayê, şikayeta hal nabî bal xêncî Xwedê Teala, belkî tu wê wan bi can û dil bikirî û şukrê xweyê nîmetê bikî.

Nexwe ew qeleqa dil û şikayeta ziman û ew bizav û qeleqên kirêt û bêmerês, pêkve şahidiya nebûna îmanê didin. Heta ku xweşî heye, em şiklek seresere şukir dikin; ew jî belkî ji wî qasî ra ye ku zêdetir bide me. Lê dema belayek ser me da bêt, an êş û nexweşiyek ser me da bêt, em şikayeta Xwedê dibin bal xelkê û zimanê me yê nerehetiyê li bal baş û xiraban li gazindan vedibe. Kêm kêm ev şikayet, zarî û bê hedarî wê tovê kîn û buxza ji Heq Teala di dil da bireşîne û wê kêm kêm şîn bibe û xurt bibe. Heta ku ji mirov ra bibe meleke û belkî Xwedê nekirî şiklê navdeyî yê mirov, şiklê xezeba bi teqdîra Heq Teala bi xwe bigire. Vêca hingê ye ku kontrola hal û xeyal, zahir û batin ji dest mirov derkeve û mirov bibe dijminê Heq û bi wê buxz û kîna xwe ve ji vê alemê derkeve û bibe bextreşê her û her. Û em ji ber aqibeta xirab, hana xwe ji Xwedê ra dibin. Nexwe durist e ku kerem kirî: Dema sebir biçe îman diçe.

Ey ezîz, nexwe mesele muhim û rêk xeter e. Ji dil bixebite û di beranberê qewimîna da xweragir û sebirdar be. Û di beranberê belan da wek zilaman rabe û bi nefsê bide fêhmê ku bê hedarî û ceze' xêncî ji wê ku ew bi xwe şermek mezin e, ji rakirina musîbetan û ji navbirina bela ra jî qet feydê nade û şikayeta teqdîra îlahî li bal mexlûqê zeîfê bêhêz, bê feyde ye. Çawa ku di hedîsa şerîf a Kafiyê da îşare pê hatiye kirin:

Sema'e dibêje Îmam Kazim (a.s) got min: «Çi bû tu neçûyî Hecê?» min got: «Ez gorî, ez gelek deyndar bûme û malê min ji dest

çûye; û ew deynê li ser min gelektir e ji wî malê min yê çûyî. Eger ne hevalakî me bûya ku ez deranîm, qet min nedikariya ez derkevim». Vêca ewî got min: «Eger tu sebir bikî wê xelk bêje xwezika em şûna wî da buna. Û eger tu sebir nekî jî, wê Xwedê teqdîratên xwe bîne cih, çi tu bixwazî û çi nexwazî».

Nexwe bê hedarî û ceze'ê feyde nîne û belkî zererên zehfî û îmanber di pey ra hene. Û xweragirî û sebrê jî gelek xêr û sewab jê ra heye û şiklê wê yê berzexî jî gelek rind û sipehî ye. Çawa ku di axirîka hedîsa ku em şîrove dikin da hatiye: «Eha bi vî awayî xêr û xweşî di pey sebir û xweragirtinê ra tê. Nexwe sebir bikin û sebrê di xwe da cihgir bikin, da hûn xêrdar bibin û kirha hewe bêt dayîn». Nexwe dûmahîka sebrê di vê alemê da baş û xêr e. çawa ku di hedîsê da meseleya hezretê Yûsuf (a.s) hatiye berçav kirin; û sebebê xêra axretî ye jî.

Îmam Sadiq (a.s) kerem kiriye: «Kesê belayek ser da bêt, vêca sebir bike, xêra hezar şehîdan jê ra heye».

Hedîsên zehfî vê der heqê da hene ku em ê hineka di vebira hêjbê da bînin. Lê vê der heqê da ku, şiklê berzexî yê sebrê gelek ciwan û rind e, xêncî ji vê ku rêketî ye digel qismek ji burhanê, hedîs jî wê der heqê da hene. Çawa ku ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûyî: «Dema bawerdar diçe di gorê da, nimêj di rastê wî da ye û zekat li çepê wî da. Û qencî li raserê wî ye û sebir li kêlekê da. Veca dema du melekên pirsiyar û cewabê tên balê, sebir dibêje nimêj, zekat û qencîhê: Hay ji xweyê xwe hebin, vêca eger hewe nekarî, ez piştîvanê wî me».

**Vebir: Dereceyên sebrê**

Gorekî wê ya ji hedîsan tê dest, sebir, derece hene û xêr û sewaba wê gora derecên wê ferq dikin. Di Kafiya şerîf da senedê digehîne hezretê Mîrê bawerdaran Îmam Alî (a.s) dibêje, Resûlê Xwedê kerem kiriye: «Sê sebir hene: Sebra di wextê belayê da, sebra ser taet û îbadet, sebra ji guneh. Vêca kesê di demê belan da sebir

bike heta dijwariya belayê biborîne, Xwedê sêsed derecan didiyê ku navbera her derecekî heta dereca dî qas navbeyna erd û ezmana ye. Û kesê ser taet û îbadetê sebir bike, Xwedê şeşsed derecan jê ra dinivîse ku navbera heryekî qas navbera kûratiya erdê ye heta bi erş. Û kesê ji ber jêvebûna guneh sebir bike, Xwedê nehsed derecan didiyê ku navbera derecekî heta dereca dî ji binê erdê heta xilaseka erş e». Ji vê hedîsa şerîf kifş dibe ku, sebra ji ber vebûna ji guneh seratir e ji mertebên dî yên sebrê. Çiko hem derecên wê û hem navbera wan pirtir e. Her weha me'lûm dibe firehiya bihiştê gelektir e ji wê ya di fikra me yên hatine nixûmandin ra derbas dibe. Û ewa der heqê sînorkirina bihiştê da: «firehiya wê, qas firehiya erd û ezmana ye» hatî, belkî der heqê bihişta kar û amelan da be. Û eva he ku di hedîsa şerîf da hatiye, bihişta exlaq e, kêşek û mîzan di bihişta exlaq da, xurtî û kemala biryarê ye û çênabe ew bêt sînor kirin. Hineka gotiye, di hedîsa jorî da mexsed bilindahî ye û di ayetê da «‘erz - firehî» hatiye, dijatî li vir nîne. Çêdibe di firehiyê da beranber û di bilindahiyê da muxtelif bin. Lê ev gotinek dûr e. Çiko we xuya dike ku mexsed ji firehiyê berfirehî ye, ne firehiya li beranberê dirêjiyê da. Çawa ku erd û ezmana, bi me'na orfî û luxewî dirêjî û firehî tunehin, her çend erz, bi me'na bu'da duwê di îstilaha erdnasan da heye, lê kitêba Xwedê gora îstilahan nehatiye.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje, Resûlê Xwedê (s.a.a) gotiye: «Wê zemanek ser xelkê da bêt, ku eger ne bi kuştin û zordariyê be, mirov nagihê hukûmetê; ne bi bexîlî û girtina bi xurtî be, nagihê dewlemendiyê. Û xêncî bi derketina ji dîn û peyketina bayê dil mirov nikare hezkirinê çêke. Vêca kesê giha wî zemanî û li ser feqîrî û nedariyê sebir kir, halhale dikariya dewlemend bibe. Û ser xezeba xelkê sebir kir, halhale dikariya hezkirina wan bi aliyê xwe ve bikêşe. Û sebir kir ser bê kesiyê, halhale dikariya xurt be, wê Xwedê xêra pêncî sidîqan ji wan ên tesdîqa min kirine, bidiyê». Nêzîkê vê me'nê hedîsek ji Mîrê bawerdaran jî riwayet bûye. Welhasil, vê der heqê da hedîs pir in; lê me bi qasê borî bes kir.

**Vebir: Der heqê dereceyên sebra ehlê marîfetê da ye**

Qasê heta niha hatiye gotin der heqê hal û wez'ê giştê û navinciyan bû. Çawa ku me di destpêkê da gotî: Sebir, ji meqamatên navinciyan hesab kirine. Lê sebrê, hinek derecên dî jî hene ku der heqê ehlê sulûk û weliyên bijare da ne, «sebra fillah» ji wa ye. Û ew, subata di mucahideyê da û terka me’lûfat û me’nûsata ye. Belkî jî terka xwe bi xwe ye di rêka mehbûb da. Û ev der heqê ehlê sulûkê da ye. Mertebeyek dî «sebra me’ellah» e; ew jî, der heqê ehlê huzûr û muşahida cemalê ye di wextê derketina ji cilbabê beşerî da û muceredê ji melabisê ef'al û sifetan û ronahîbûna dil pê tecellî ya esma û sifetan, tewaruda waridatên uns, heybetê û parastina nefsê ji telewwunatan û xeybeta ji meqamê uns û şuhûdê. Derek dî «sebir ‘enillah» e. Ew jî, ji dereceyên 'uşşaq û muştaqa ye ji ehlê şuhûd û ‘eyanê. Hingê ku li alema xwe bizivire û bizivirin bi alema zêdahî û sehwê. Eva he zehmetirîn mertebên sebrê ye û muşkiltirînê meqamatan. Mewlayê salikan û pêşewayê kamilan Mîrê bawerdaran (a.s) di duaya «Kumeyl» da îşare kiriye bal vê mertebê ve: «Ey îlahî û ey seyyid, mewla û ey Rebbê min! Belkî ez bikarim xwe li ber ezabê te ragirim, lê vêca ji ber cudahiya ji te, çawa wê hedar û tebata min bêt?»

Dereca dî «sebra billah» e; ew jî, ya ehlê temkîn û îstîqametê ye. Ku piştî meqamê «sehw» û «beqaê billah» e û piştî muxeleqiya bi «exlaqullah» ji wan ra peyda dibe. Û xêncî ji wa yên jorî, hemû kes ji wê bêbehr in. Û çiko em ji van merteban bê nesîb in, ji ber wê, der heqê wan da xeberdan bi berfirehî di van kaxizan da nehat.

## HEDÎSA HIVDEHÊ

بالسّند المتّصل إلى الإمام الأقدم، حجّة الفرقة و رئيس الأمّة، محمّد بن يعقوب الكلينى، رضي الله عنه، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد بن عيسي، عن الحسن بن محبوب، عن معاوية بن وهب، قال سمعت أبا عبد الله، عليه السلام، يقول:

**«إذا تاب العبدُ تَوبَةً نَصُوحا، أحبّه لله، فسَتَرَ عليه فى الدّنيا و الآخرةِ. فقُلتُ: و كيف يَسْتُر عليه؟ قال: يُنْسى مَلَكَيْهِ ما كَتَبا عليه من الذّنوب، ثمّ يوحى إلى جوارحِه: أُكتُمى عليه ذنوبَه. و يُوحِي إلى بِقاعِ الأرضِ، أُكْتُمى عليه ما كان يَعْمَلُ عليكَ من الذّنوب. فَيَلْقَي لله حينَ يَلقاهُ و ليس شىءٌ يَشْهَدُ عليه بشىءٍ مِنَ الذُّنُوبِ.»**

Muawiye bin Weheb dibêje, min ji Îmam Sadiq (a.s) bihîst digota: «Dema ebd, xalis (û ji dil) tewbe bike, Xwedê wê hejê bike û xirabiyên wî di dinya û axretê da veşêre». Rawî dibêje: Wê çawa veşêre? Kerem kir: «Ew gunehên wî yên ku du melaîketa nivîsî, wê bi wan bide ji bîr kirin, vêca wê ji endamên wî ra wehy bike ku: Gunehên wî kitman bikin [bêjin ku tu guneh nekiriye]. Û wê erdê tê bigehîne ku: Ew gunehên li ser te hatiye kirin, veşêre. Vêca dema raberê Xwedayê xwe dibe, qet piçek ji gunehan jî li sernînin».[1]

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 430

**Heqîqeta tewbê**

Bizane ku tewbe, yek ji menzilên muhim û muşkil e. Û ew zivirîna tebîet e bal ruhaniyeta nefsê ve. Piştî ku ji ber neguhdarî û qirêja gunehan ronahiya sirûştê bi tarîtiya tebîet hatiye nixûmandin.

Xeberdana berfirehtir vê der heqê da ev e ku: Nefs di destpêka çêbûnê da vala ye ji hemû awayên kemal, cemal û ronahiyê, her weha ji muqabilatên wan jî vala ye. Heçweku perek spî be, ku qet xetik û nexşek li ser nehatibin kêşan; ne kemala ruhanî heye, ne jî bervajiyê wê. Lê nûra qabiliyetê ji dest ve anîna meqamatan ra têda hatiye danîn. Û dema gunehan dike, ji ber wê, tarîtiyek di dilê wî da peyda dibe û çiqas guneh zehftir bên kirin, ewqas zulmet û tarîtî jî zêde dibe, heta dil pêkve reş û tarî dibe û nûra sirûştê ditemire û ew digehê bextreşiya daimî. Eger vê navberê da pêşiya ku dil pêkve reş û tarî bibe, ji xewa xefletê hişyar bibe û piştî hişyariyê tewbe bike û şert û mercên wê pêk bîne, wê haletê tarîtî û reşiya tebîet bizivire bi halê ronahiya sirûşt a eslî û ruhaniyeta xwe ya zatî. Heçweku dîsa dibe sefheyek valayê ji kemalat û dijên wê. Çawa ku di hedîsa şerîfa meşhûr da hatî: «Etta'ib minez zenb kemen la zenbe lehu» «Tewbekarê ji guneh, wek wî ye, yê guneh nekirî».

Nexwe kifş bû ku heqîqeta tewbê zivirîna ji peyhatên tebîetê ye bi aliyê ruhaniyet û sirûştê ve. Çawa ku heqîqeta «inabe»yê jî zivirîna ji sirûşt û ruhaniyetê ye bi aliyê Xwedê ve, sefer û koçkirina ji mala nefsê ye bi aliyê sekingeha meqsûd ve. Nexwe tewbe, pêş inabeyê da ye. Çawa ku em ê bêjin, tewba kamil û durist ku şert û mercên wê pêk bên, ji karên giran in û kêmtir kes digehin mexsedê; heta kirina gunehan nexasima kebair, dibin sebeb ku bi temamî mirov ji tewbê xafil bibe. Û eger dara gunehan rehê xwe bavêje di zeviya dilê mirov da û stûr bibe, netîcên gelek xirab hene, yek ji wan ew e ku mirov ji tewbê paşve dide, eger carna bêt bîrê jî, roj roj û meh meh ewê paşda dide û ji xwe ra dibêje:

Ez ê di axirîka omr û demê pîriyê tewbeyek baş bikim. Lê bêxeber e ji vê yekê ku ev hîlekirina li Xwedê ye, lê: «Wellah xeyrul makirîn» e.

Goman neke eger reh û rîşeyê guneh qahîm bû, mirov bikare tewbe bike an şert û mercê wê pêk bîne. Bihara tewbê demê ciwanî û xortîniyê ye ku barê gunehan siviktir û reşatiya dil kêmtir û şertên tewbê hêsantir in. Hirs û teme' û hezkirina ji mal, meqam û arzûyên dûr û dirêj di demê pîriyê da pirtir in. Ev hem hatiye tecrubekirin û hem hedîsa nebewî şahidê ser wê ye. Fereza ku di demê pîriyê da mirov bikare evê yekê bike, ji ku me'lûm e ku mirov bigehê pîriyê û ecel di wextê ciwaniyê û mijûlbûna bi guneh ve, ser mirov da neyê? Kêmiya pîran delîl e ku, mirin ji ciwana ra nêzîktir e. Mirov di bajarek pêncî hezar neferî da, pêncî pîrên heftêh salî nabîne.

Ezîz! Ji hîle pîlên şeytan bitirse û hay ji xwe hebe. Û gel Xwedayê xwe hîlan neke ku, ez ê pêncî salekî li pey bayê dil bim û li ber mirinê bi îstixfarekî ez ê ya borî telafî bikim. Ev xeyalên pûç û nepijayî ne. Eger te di hedîsê da dîtiye ku Xwedê Teala gel vê umetê kerem kiriye û heta demê dîtina eserên mirinê û an demê mirinê bi xwe tewba wan qebûl dike, durist e; lê gelek dûr e ku mirov di wî wextî da tewbe bike. Qey tewbe hema bi gotinê ye? Rabûna ji tewbê ra zehmet jê ra lazim e; ji zivirîn û biryardana nezivirîna li guneh ra temrîna ilmî û amelî lazim e. Kêm caran çêdibe ku hema mirov nişka ve bikeve fikra tewbê û tewbe dest ve be, eger dest ve be jî, zehmet e ku bikare şertên qebûl û duristiya wê an şertên kemala wê bi cih bîne. Car heye pêş fikra tewbê da an pêş tewbekirinê da ecel muhletê nedê û mirov bi barê giranê guneha ve ji vêderê bibe. Hingê Xwedê zane ku wê mirov bikeve çi bextreşî û zehmetê. Fereza eger aqibet, mirov di wê alemê da ehlê xilasiyê be jî, telafi kirina karê gunehan ne tiştek sehl û hêsan e. Di pey ra, tengî, zehmet, sotin û şewitîn heye heta mirov bibe layiq ku şefaet ji mirov ra bêt kirin û rehmeta Erhemur Rahmîn ser mirov da be.

Nexwe ey ezîz, zûtir xwe pêk bîne û biryar û îradê qewî bike û heta tu xurt û ciwan î û di dinyayê da dijî, ji gunehan tewbe bike û nehêle firsenda Xwedê dayî ji dest biçe û guh nede xemilandinên şeytan û hîleyên nefs a emmarê.

## Nukteyek muhim û girîng

Gereke nukteyek muhim bêt zanîn, ew jî ev e ku, mirovê tewbe kirî, zelaliya navdeyî û ruhanî, ronahiya xalis a sirûştî jê ra namîne. Çawa ku eger kaxizekî reş bikin û vêca bixwazin ewê reşatiyê jê bibin, helbet nazivire ser haletê cela û zelaliya xwe ya ewil. An eger firaqek şikestî bixwazin durist bikin, zehmet e ku bizivire ser halê xwe yê cara ewil. Gelek ferq heye navbeyna wî dostî da ku ji ewil ve dostî kirî û wî yê carekî xiyanet kirî û ozrê xwe xwestî. Xêncî ji vê jî kêm kes hene ku bikarin bi duristî berpirsiyariya xwe ya piştî tewbê pêk bînin. Nexwe heta çêbe gereke mirov gunehan neke û bêemrî jê çênebin. Çiko duristkirina nefsê piştî xirabiyê ji karên pir zehmet e. Û eger Xwedê nekirî ket nav xirabiyê, çiqas zûtir, bila durist bike; çiko xirabiya kêm zûtir û baştir durist dibe.

Ezîz! Zû û seresere jê derbas nebe. Di hal û aqibeta xwe da bifikire û bide aqilê xwe û binhêre kitêba Xwedê û hedîsên hezretê Resûl (s.a.a) û îmamên hîdayetê (a.s) û xeberdanên zanayên umetê û bi aliyê hukmê aqil ve bizivire û evî dergehî li ber xwe veke, ku gelek deriyên dî jî li te vebin. Bikeve vê menzilê ku, nisbet bi halê me ji girîngtirîn menzilên însanî ye. Ewê muhim bizane û hay jê bimîne. Tewfîqê ji Xwedê bixwaze û alîkariyê ji ruhaniyeta Resûlê Ekrem (s.a.a) û îmamên hîdayetê bigire û hana xwe ji weliyê emr û Îmamê Esr ra (Xwedê zuhûra wî nêzîk bike) bibe, helbet ew hezret destê jar û belengazan digire û li hana rebena tê.

### Vebir: Der heqê erkanê tewbê da ye

Bizane tewbeya kamil, erkan û şert jê ra hene, heta ku ew pêk neyin, tewbeya durist jî çênabe. Em ê ji wayên lazim biaxivin:

Yek ji wan, ku ruknê wê yê binyatî ye, nedamet û poşmanî ye ji texsîr û gunehên derbas bûyî.

Yek dî, ew e biryar bide ku qet lê nezivire. Ev herdu, esl û esasê tewbê ne, ku tewbe bi wan çêdibe. Ew bi wî awayî çêdibe ku mirov esera gunehan di ruh da û peyhatên wê di alema berzex û qiyametê da bide bîra xwe û ji aliyê maqûl û menqûlê ve li ser bifikire. Li bal zanayan delîl jê ra heye û di exbarên Ehlê Beyta pak da (a.s) hatiye ku di alema berzex û qiyametê da gunehan munasibê xwe, şikl û şemal hene, ku li wêderê xweyê jiyan û îrade ne û mirovan li wêderê bi zanîn û îrade didin ezabê. Çawa ku agirê dojehê jî bi zanîn û viyan, mirovan dişewitîne, çiko ew alem alema jiyanê ye. Nexwe di wê alemê da amelên me yên qenc û xirab, şikl û şemalek ji wan ra heye û gel me tên heşir kirin. Di hedîsên şerîf û Qurana Kerîm da bi awayên muxtelif ji vê yekê hatiye xeberdan, her weha rêketî ye gel mesleka hukemayên Îşraq û muşahidatên ehlê sulûk û îrfanê. Her weha her gunehek eserekî datîne ser ruh ku di hedîsan da jê ra hatiye gotin «niqteya reş» û ew, tarîtiyeke ku di ruh û dil da çêdibe û kêm kêm zêde dike, heta mirov digehîne kufr û zindîqiyê, bextreşî ya ebedî dike behra mirov, çawa ku pêşda me behs jê kir.

Dema mirovê aqil eva he zanî û guh da gotina enbiya û ewliya û zana û arif û hekîman, wê xwe ji gunehan vede û li dora wan nazivire. Û eger Xwedê nekirî murtekib bû [û dilê xwe bi gunehan qirêj kir], wê gelek zû jê bireve û ji dil poşman bibe, ku netîca vê poşmaniyê gelek girîng e û eserên wê gelek rind in. Û biryara li ser nekirina guneh ji ber poşmaniyê, tê dest. Û dema ev du rukn çêbûn, karê salikê rêka axretê rehet dibe û tewfîqa îlahî ewî li ber xwe digire û gorekî gotina Quranê: «Xwedê hej tewbekaran dike» û gora vê hedîsê ew dibe mehbûbê Xwedê, eger xas û taybet be di vê tewba xwe da.

Gereke mirov bi ilm û amel û fikir kirinek lazim û layiq di xalis kirina tewbê da bixebite û bizane ku sûretê huba Heq di wê alemê

da nayê mîzana hesabê û Xwedê zane ku nûra wê ya me'newî çi nûrek kamil e û wê Xwedê gel mehbûbê xwe çi muameleyê bike.

Ey însan, tu çiqas zelûm û cehûl î û qedrê xweyê nîmetê nizanî, evqas sal e tu di bêemrî ya wî da yî û ew hemû wesîlên rehetî û jiyana te dide te, bê wî qasî ku feydeyek jê ra hebe, te bêşermî û hetika hurmetê gihand axirîkê. Niha ku tu poşman bûyî û ziviriyî û te tewbe kir, Heq Teala tu kirî mehbûbê xwe, ev çiqas nîmet û qenciyek mezin û berfireh e.

Ey Xwedê, ji me nayê em şukrê li ser qenciyên te bikin, zimanê me û heyî bi temamî lal e ji pesindana te ra. Ji vê pê ve me çare nîne ku em serê xwe bidin ber xwe û ozrê xwe vexwazin. Em çi ne ku layiqê rehmetên te bûn, lê berfirehiya rehmeta te nayê hesabê.

Her weha gereke bixebite heta şiklê poşmaniyê di dil da qahîm bike, da ku bi hezkirina Xwedê biçe di mala «ihtiraq»ê ve. Û ew werenge ku ji ber fikirkirina di peyhat û eserên gunehan da poşmaniyê di dil da qahîm bike û nimûna: «Narullahil mûqede»yê ew bi xwe û bi bijartina xwe di dil da hilke û dil bi agirê poşmaniyê bişewitîne, heta ku hemû guneh bi wî agirî bişewitin û qirêja dil jê biçe. Û bizane eger ew vî agirî di vê alemê da ji xwe ra bernediyê û deriyê vî agirî ku dergehê bihiştê bi xwe ye, li ber xwe veneke. Dema cihê wî ji vê alemê bêt guhaztin, wê di wê alemê da agirek bi şewat jê ra bêt hazir kirin û deriyên dojehê li ber wî vebin û deriyên bihiştê li ber wî bên girtin.

Ey Xwedê, singek bi şewat bike behra me û pêta poşmaniyê ji agirê nedametê di qelbê me da hilke û ewê bi vî agirê dinyayî bişewitîne û tarîtiya dilê me ji nav bibe û me bê peyhatên gunehan ji vê alemê bibe.

**Vebir: Der heqê şertên tewbê da ye**

Ewa ku di vebira borî da hat gotin, ruknên tewbê bûn. Ew ên, şertên qebûl û şertên kemalê hene ku bi rêzê ve em ê jê biaxivin.

Girîngiya şertên qebûlê û her weha kemalê du tişt in. Vê der heqê da em ê gotina hêja û pir kakila Mîrê bawerdaran bînin û jê biaxivin:

Seyyidê celîlulqedr û bihagiran Rezî[1] di Nehcul Belaxê da (hikmeta 417) neqil kiriye ku Mîrê bawerdaran Îmam Alî (a.s) ev gotin ji kesekî ra gotiye ku li bal wî got: «Estexfirullah», Kerem kir: «Hey, dayika te di şîna te da bigirî, gelo tu zanî «îstixfar» çi ye? Îstixfar, merteba wayên bilind mertebe ye, ew yek kelîme ye, lê şeş me'na û merheleyên wê hene.

Ya ewil, poşmanî ya ji ber zemanê borî.

---

1- Seyyidê Rezî Ebulhesen Muhemmedê kurê Husêyn, sala 359 hicrî li Bexdayê hatiye dinyayê, 6-ê Muherrema sala 406-ê h.heyvî di temenê 47 salîyê da wefat kiriye û bedenê wî di mala wî da li mehela «kerx»a Bexdayê hatiye veşartin. Neseba wî li pênc bavika da digehê Îmamê heft ê Ehlê Beyta Pêxember, Îmam Musayê Kazim. Piştî Şêxê Mufîd, rêberiya ilmî ya peyrewên Ehlê Beytê bi hêviya wî ve bû. Bin 10 salîyê ra des avêtiye xwendinê, hêca balix nebûyî, ilmên li wê herêmê dihatan xwendin xilas kirin. Li deh salîyê da şiîr vehûnane û niha ew şiîrên wî hene. Li 17 saliya xwe da, dest avêtiye dersdanê. Di 21 salîyê da (380-ê h.) bûye xweyê sê meqamên mezin: Niqabet, serpêşiya hecî yên mala Xwedê û çavdêriya li ser dîwana girtina heqê mezlûman. Di sala 403-ê da jî bû «Neqîb en-Nuqeba». Navê 14 seydayên wî nivîsîne, wek: Seyrafî, Merzbanî, Ibn Cinniyê Musilî, Abdurrehîmê kurê Nebate, alimê malikî mezheb, Ebû Îshaqê Teberî, Şêxê Mufîd... Ewî gelek feqî jî gihandine, yên wek: Şêxê Tûsî, Ibn Quddame, Seyyid Abdullahê Curcanî, Ebûbekrê Nîşabûrî, Seyyid Ebulhesenê bin Bendar... Medresa Darul ilm, yek ji eserên wî ye û 150 sala paş wefata wî jî hebûye. Eserên wî yên nivîsarî jî navê wî li nav komgeha ilmî da sax hiştiye û nav navan da wek stêrê dibiriqe. 19 eserên wî yên edebî, tarîxî, riwayî û Quranî hene, wek: Mecazatu Asar en-Nebewiyye, Muteşabihatut Tenzîl, Me'anîl Quran, Resail, dîwana şiîran û Nehcul Belaxe. Ibn Ebî Hedîd di şerha wê da dibêje: «Ev kitêb, bin kelamê Xwedê û ser kelamê beşer ra ye». Wî ev kitêba hedîsî, îtiqadî, exlaqî û edebiyatî li sê qismeta da ji kelamê Îmam Alî (a.s) berhev kiriye. Qismê ewil: 241 xutbe û axiftinên Mîrê bawerdara ne. Qismê duwê: 79 name û nivîsok in. Qismê sisêyê: 480 gotinên kurt û bi hikmet in.

Ya duwê, biryardan li ser vê çendê ku êdî qet lê nezivire.

Ya sisê, ew e ku tu heqê xelkê eda bikî, da tu dûrê ji her gunehekî raberê Xwedayê xwe bibî.

Ya çarê, ew e ku heçî ferza di stûwê te da û te nekirî, bi cih bînî.

Ya pêncê, ew e ku ew goştê ji gunehan di te da çêbûyî, tu bi xem û kolan bihelînî, heta ku çermê te bimîne bi hestiyên te ve û di navbeyna çerm û hestiyan da goştek nû û taze çêbe.

Ya şeşê, ew e tu bedena xwe di taetê da bixî zehmetê, wek çawa te şêrîniya guneha pê dayî tamkirin, vêca hingê tu wê bêjî: «Estexfirullah».

Vê hedîsa şerîf du ruknên tewbê li ber xwe girtine yanî: Poşmanî û biryara nezivirîna li guneh. Piştî hingê behsa du şertên qebûlê dike, yanî: Zivirandina huqûqê mexlûqan û yê xaliq. Hema bi gotina: «Min tewbe ye», tewbe nayê qebûl kirin. Tewbekar ew e yê çi tişta bineheqî ji xelkê girtî li wan bizivirîne, eger heqê kesekî li stûwê wî da heye gereke qas îmkanê pê rabe, heq bide an xweyê heq razî bike. Heqên Xwedê yên pêk neaniyîn qeza bike û pêk bîne. Eger nikare hemûyan bi cih bîne, qet ne qas îmkanê bike. Divê bizane ku divê van heq û huqûqan pêk bîne, eger ne wê li alema dî da bi dijwartirîn şikl jê bixwazin û bigirin. Û di wê alemê da ji vê pê ve ku barê gunehê yên dî hilgire an xêrên xwe bide, tu rêkek dî yên eda kirinê jê ra nîne. Vêca hingê ye ku wê bextreş bibe û tu rêkek xilasiyê jê ra nîne.

Ezîz, newebe ku şeytan û nefsa emmare ewî karî li ber te giran û mezin bikin heta te ji tewbê paşve bidin û te ji nav bibin. Bizane ku gav avêtina li van kara da, her çend kêm û hindik be, her baş e. Eger rojî û nimêjên fewitiyî û keffare û heq huqûqê xaliq û mexlûq pir li ser te hene û guneh ser hev da kurisîne û xeletî ser hevda hatine jî, dîsa ji rehmet û lutfa Xwedê bêhêvî nebe, eger qasê ji te tê, tu dest bavêjiyê wê rêkê ji te ra rehet û hêsan bike û rêka xilasiyê nîşana te bide. Bizane ku bêhêvî bûn mezintirîn

guneh e ku ez goman nakim gunehek dî pirtir ji wê eserê di nefsê da deyne. Mirovê bêhêvî ji rehmeta Xwedê, tarîtiyek wisa dikeve dilê wî û ewqas hêç û serserî dibe ku bi çi tiştî êdî durist nabe. Neku tu ji rehma Xwedê bê umîd bibî û gunehên te û peyhatên wan li ber te mezin bibin! Rehmeta Xwedê ji her tiştî mezintir e û her tiştî li ber xwe digire. Qabiliyet ne şert e ji dana Xwedê ra. Tu ji ewil ve çi bûyî? Tu di nav tarîtî û zulmeta 'edem û nebûnê da bûyî, Xwedê Teala bê wê çendê ku te heq hebe an qabiliyet û bê xwestin û duaya te, qencî gel te kir û tu çêkirî û kemalat dan te û ji rehmet û kerema xwe ya berfireh tu behremend kirî, hemû tişt bindestê te kir. Xwedê soza rehmet û lêborînê daye, tu gavekî bi aliyê wî ve bavêje, çawa hebe wê ew destê te bigire. Û eger te nekarî tu huqûqê wî eda bikî wê ji heqê xwe bibore. Û eger te nekarî tu heqê yên dî bidî, wê ew bi xwe çarekî bibîne û cubran bike. Te meseleya ciwanê nebaş di zemanê Resûlê Ekrem da (s.a.a) guh lê bûye.

Ey ezîz, rêka Xwedê rehet û hêsan e. Lê berêxwedanek jê ra lazim e, gereke mirov bikeve rê, bi paşdedan û teswîfa karan û roj roj zêdekirina gunehan mesele zehmetir dibe. Lê dest avêtin û iqdam û biryara ji duristkirina nefsê ra hêsaniyê çêdike. Tu tewbe bike û qederekî pêra be, eger netîce da, ji xwe wê duristiya gotinê ji te ra ronahî bibe, eger xêncî ji wê bû, ji xwe rêka xirabiyê vekiriye û destê te yê gunehkar dirêj.

Du tiştên dî yên ku wî hezretî gotîn, şertên tewba kamil in; ne ku tewbe bê wan çênabe an qebûl nabe, belkî tewbe bê wan ne temam û ne kamil e.

Evê bizane ku ji her menzilek ya salikan ra mertebe hene ku gora halê dilê wan ferq dike. Eger tewbekar bixwaze bigehê merteba kemala wê, gereke wek çawa ya berdanê berda, wereng xweşiya nefsanî ya di wextê guneh da dest ve hatî jî berbide. (Eger tedaruka turûkan kir, gereke tedaruka huzûzan jî bike). Ew jî bi vî awayî çêdibe ku: Eserên bedenî û ruhî, ku ji ber gunehan jê ra

çêbûbûne, gereke bixebite ewan ji nav bibe, da nefs li zelalî û ronahiya xwe ya ewila ruhanî bizivire û xwerî [xalis] bibe. Çawa ku te zaniye ku ji ber her gunehekî û lezetekî ve eserek dikeve ser ruh û hêzek ji cismê ra çêdibe. Nexwe gereke tewbekar wek zilam û xweşmêran rabe û ewan eseran bi temamî ji nav bibe, çawa ku Hezretê Mewla (a.s) destûr dayî.

Nexwe gereke bi vedana cism ji xweşî û lezetan û bi girtina rojiyên sunet û eger ferz hebin bi girtina roji yên ferz, goştê ku bi gunehan di wextê gunehkirinê da şîn bûyî û çêbûyî bihelîne. Û bi adetdana ruh û îbadet, behra tebîet bidiyê. Çiko zaiqa ruh hema şiklê lezetên tebî'î ne, heta ku ew şikl hene, nefs meyla wan dike û dil evîndarê wa ye û tirsa wî qasî heye ku Xwedê nekirî dîsa nefs hêç bibe û kontrol ji dest derkeve. Nexwe gereke mirovê salik tama îbadet bi ruh bide tamkirin û eger şevekî di nav guneh da borandiye, bi şevekî îbadet ewê cubran bike û eger rojekî mijûlê lezet û şahîkirina nefsê bûye, bi rojî girtin û îbadetên munasib ewê cubran bike. heta ku nefs bi temamî ji eser û qirêja wê bêt şûştin û paqij bibe. Helbet hingê wê tewbe kamiltir bibe û ronahiya sirûştî wê li nefsê bizivire. Û daim bila der heqê pîsatiya gunehan û dijwariya ezabê Xwedê da bifikire, hêvî ew e ku piştî vê fikirînê, nefs ji gunehan bireve û jê tenefur bike û der heqê tewba xwe da bigehê desthatek baş û tewba wî kamil û temam bibe.

Nexwe ev temamkerên tewbê ne; lê bila tewbekar goman neke dema ket tewbê, axirîn mertebeya tewbe jê hatiye xwestin, da vêca ev kar jê ra bi zehmet bikeve û terka wê bike. Çiqas di xwe ra bibîne ewqas baş e. Vêca dema ket rê, wê Xwedê rêkê jê ra rehet bike. Çênabe dijwariya rê, mirov ji mexsedê paşve bihêle, çiko mexsed gelek muhim e. Eger em bi girîngiya mexsedê bihesin, her zehmetek di wê rêkê da rehet dibe. Ma çi mexsed ji xilasiya daimî, rewh û reyhanên her û her bilindtir e û çi xeterek ji bextreşiya daimî mezintir e? Bi paşdadan û terka tewbê, we heye mirov bikeve nav bextreşiyên daimî da, her weha bi ketina

di rêka tewbê da jî, çêdibe mirov bibe ji mehbûbên Xwedê û seîd û bextewerê daimî. Nexwe eger mexsed evqas mezin e, çi lê nayê çend rojekî mirov zehmetê bibîne.

Evê jî bizane, hereket û bizav her çend kêm be jî, her mufîd e. Hema karê axretê jî gel yê dinyayê qiyas bike, tu dibînî eger aqilmend nekarin bigehin mexseda xwe ya bilind jî, desta ji mexseda xwe ya piçûk nakeşin, her weha eger xwesta xwe ya temam, nekarin destê xwe ve bînin jî, desta ji xwesta kêm û naqis nakeşin. Tu jî wereng, eger tu nekarî bigehî temam û kemala wê, ji eslê mexsedê paşve nemîne û çiqas tu bikarî ji dest ve anîna wê ra bixebite.

## Netîceya îstixfarê

Ji wan tiştên ji bona tewbekar lazim, ew e ku hana xwe ji meqamê xefariyet û lêborîna Xwedê ra bibe û haletê îstixfarê destê xwe ve bîne. Û bi girî, zarî, bi xef û eşkere ji Xwedê bixwaze ku gunehên wî û peyhatên wê lê bisitirîne û veşêre. Helbet meqamê xefariyet û setariyet a Xwedê, perdekirina kêmasiyan û xufrana peyhatên wê dike lazimê xwe. Û heryek ji mewcûdatan ku ji halê mirov xeberdar dibin, çi melaîket û çi kitab û sehîfên ceraiman, çi jî zeman, mekan û endamên mirov bi xwe, ewa gunehan li ber wan dinixûmîne û bi wan dide ji bîr kirin. Çawa ku di hedîsa şerîf da derbas bû: «Gunehên ku wan du melaîketan nivîsîn, bi wan [melaîktena] dide ji bîr kirin». Û çêdibe wehya Xwedê Teala ji endam û erdê ra ku dibêje wan, gunehên wî kitman bikin [û binixûmînin], çawa ku di hedîsê da derbas bû, hema ev be ku bi wan dide ji bîr kirin, çêdibe jî fermandan be ji şehdeyî nedanê ra. Belkî jî mexsed ew be ku esera gunehan ji ser endaman hiltîne ku pê wê şehadeta tekwînî çêdibe, çawa ku eger tewbe neke, heryek ji endamên bedena wî mumkin e di her halî da bi zimanê qal an hal şehdeyiyê ser kiryarên wî bidin. Çawa ku xefariyet û setariyet a Xwedê kiriye lazimê xwe ku di vê alemê da endamên şehdeyiyê li ser kiryarên me nedin, zeman û mekan amelên me

veşêrin, hema bi wî awayî di alema dî da jî amelên me veşêrin, eger em bi tewbeyek durist û îstixfarek zelal ji vê dinyayê biçin; an ji xwe bi temamî amel û kirinên me li ber wan veşartî ne. Belkî jî Xwedê Teala bi kerema xwe, bîne pêş ku tewbekar li bal kesî şermezar nebe û serê wî nekeve ber wî.

## Me'na tewbe ya nesûh

Der heqê me'na tewbe ya nesûh da hinek îxtilaf hene, jê xeberdana wê bi kurtî li vêderê munasib e. Em ê li vêderê bi anîna kelamê muheqiqê celîl, Şêx Behaî bes bikin.

Muhedisê xebîr Meclisî dibêje, Şêx Behaî kerem kiriye: Di me'na tewb a nesûh da çend gotin hene: Yek ev e ku mexsed tewbeyeke ku xelk pê şîret bibin, yanî pê wê xelkê gazî bikin ji eserên qenc û sipehî ra. An xweyê xwe şîret dike ku gunehan ji binî ve hilkê û êdî qet lê nezivire.

Yek dî ew e ku “nesûh” tewbeyeke ku xalis ji Xwedê ra be, çawa ku ji hingivê ku ji mûmê derketî ra dibêjin, eselê nesûh – hingivê nesûh. Û xulûs ew e ku ji ber kirêtiya gunehan an çiko Xwedê pê nerazî ye ji gunehkirinê poşman bibe, ne ku ji tirsa agir.

Cenabê Muheqiqê Tûsî di kitêba Tecrîdê da hukum daye ku eger poşmanî ya ji gunehan ji ber tirsana ji agir be, ew ne tewbe ye.

Gotinek dî ew e ku “nesûh” ji nesahetê bi me'na dirûn hatiye girtin. Çiko tewbe ew dirandina ku ji ber guneh di dîn da çêbûyî didirû. An jî tewbekar, welî û mehbûbên Xwedê li hev kom dike, wek çawa bi dirûnê, qetên pîna li hev kom dibin.

Yek dî ev e ku “nesûh” wesfê tewbekar e û îsnada wê bal tewbê ve ji qismê îsnada mecazî ye. Yanî ew tewbeyeke ku cih înerên wê pê wê xwe şîret dikin ku tewbe bikin û heqê tewbê bidinê; da ku esera gunehan bi temamî ji dil paqij bikin. Û ew werenge ku nefsê bi kul, xeman û tarîtiya xirabiyan bi ronahiya başiyan pûç bikin û ji nav bibin.

## Xilasek: Hemû tiştî zanîn û jiyan heye

Bizane ku tewbê hinek heqayiq, letayif, remz û raz hene. Û heryek ji ehlê sulûkê ra tewbeyek taybet heye ku taybetê meqamê wa ye. Û çiko em ji wan meqamatan bêbehr in, mijûliya bi wan ve gelek ne munasibê van ewraqa ye. Nexwe ya baş ew e em bi nukteyekî ku di hedîsa şerîf da hatiye gotin û rêketî ye digel Qurana Kerîm û hedîsên zehfî, bi dûmahî bînin. Ew jî ev e ku: Heryek ji mewcûdên alemê xweyê zanîn, jiyan û şu'ûrê ye; hemû mewcûd nasyar in gel meqamê muqedesê Heq Teala. Çawa ku wehy tê ji endam û cihcihên erdê ra ku kitman bikin û ew ji fermana îlahî ra guhdar in. Her weha hemû tişt tesbîhê Xwedê didin, çawa ku Quran dibêje.[1] Û gelek hedîs jî vê der heqê da hene. Ev hemû nîşan didin ku ewan zanîn û pê hesan û jiyan heye û belkî jî delîl e li ser girêdana navbeyna xaliq û mexlûq da, ku ji Xwedê Teala û ew ên ew pê razî, pê ve kesî agahî jê nîne.[2] Eva he yek ji mearif û zanîna ye ku Quran û hedîsan ber guhê benî Adem ve avêtine. Û rêketî ye gel burhana hekîman û zewqa arifan û muşahida erbabên sulûkê.

Di ulûmê alî yê maqeblet tebî'e da sabit bûye ku wucûd, hema kemala esma û sifetan bi xwe ye û di her merhelekî da ku zahir bibe û di aynekî da tecellî peyda bike digel hemû şuûn û kemalatan, wek zanîn, jiyan û ummehatên heftane, zahir û mutecellî dibe. Û her yek ji merahilê tecellî ya heqîqeta wucûdê û meratibê tenezulatê nûra cemala kamila me'bûd rebtek taybet bi meqamê ehediyetê ve heye û marîfeta kamine ya xefiye ye bi meqamê rubûbiyetê ve. Çawa ku di ayeta şerîfe da kerem dike: «Ma min dabbetin îlla huwe axizun bi nasiyetih».[3] Dibêjin: «Hu» îşare ye bal meqamê xeyb a huwiyetê ve, «exza nasiye» jî hema rebta eslê xeybî ya wucûdî ye, ku ji marîfeta wê ra rê ji çi mewcûdekî ra nîne.

---

1- Îşare ye bal Îsra / 44

2- Îşare ye bal Cinn / 26-27

3- Hûd / 56: "Çi civok nînin, îlla ku karê wî bi hêviya Xweda ve ye".

## HEDÎSA HIJDEHÊ

بالسّند المتّصل إلى فخر الطّائفة و ذخرها، محمّد بن يعقوب الكلينى، رضوان الله عليه، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد بن عيسي، عن ابن محبوب، عن عبد الله بن سنان، عن أبى حمزة الثمالى، عن أبى جعفر، عليه السّلام، قال:

**«مَكْتوبٌ فى التّوراة الّتى لم تُغَيَّرْ أنَّ موسي [عليه السّلام] سأل ربَّه فقال: يا ربِّ، أَ قَريبٌ أنتَ منّى فَأُناجيكَ، أم بعيدٌ فأُنادِيك؟ فأوحي الله عزّ و جلّ إليه، يا موسي، أنا جَليسُ مَنْ ذَكَرَنى. فقال موسي، فمن فى سترِك يوم لا سِترَ إلاّ سترُك؟ فقال: الّذينَ يَذكرُونَنى فَأَذْكُرهم و يَتَحابّون فىّ فَأُحِبّهم، فأولئك الّذين إذا أردت أن أُصِيبَ أهلَ الأرضِ بسُوءٍ، ذَكرتُهم فدفعتُ عنهم بهم.»**

Ebû Hemzeyê Somalî ji Îmam Baqir (a.s) neqil dike ku got: «Di Tewrata nehatî guherîn da hatiye nivîsîn, ku Hezretê Mûsa (a.s) gazî Xwedê kir û got: Ya Rebbî, gelo tu nêzîkê min î, da ez gel te munacat bikim (hêdîka û bêdeng gel te baxivim) an Tu dûr î, da ez gazî te bikim? Vêca Xwedayê ezîz û celîl wehy jê ra rêkir ku: Ey Mûsa, ez hevcivatiyê wî me, yê min bîne bîra xwe. Vêca hezretê Mûsa got: Roja ku çi sitirandin (hewandin) xêncî ji sitirandina te neyî, tu wê kî bihewinî? Kerem kir: Ew ên min bînin bîra xwe, ez ê jî wan bînim bîra xwe; ew ên ji ber xatirê min hej hev bikin, ez ê jî hej wan bikim. Evên he ew in yên dema ez bixwazim nexweşiyekî ser ehlê erdê da rêkim, ez fikra wan dikim û ewê nexweşiyê ji ber wan paşda didim».[1]

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 496

**Şîrove:**

Ji vê hedîsa şerîf eşkere dibe ku Tewrata di nav cihûyan (yehûdiyan) da heyî nedurist e û guherîn ketiyê. Û zanîna Tewrata durist li bal Ehlê Beytê ye (a.s). Û ji gotinên Tewrat û Încîla di nav xelkê da heyî ev tê dest ku eva he ne gotina kesek me'mûlî ye jî, belkî ji ewham û gomanên hinek ji ehlê şehwet û bayê dil pêk hatine.

Hedîsgêrê lêkol Meclisî dibêje, heçweku mexseda Hezretê Mûsa (a.s) ji vê xwestê ew bûye ku adabên duayê bipirsê, digel wê jî ilm û zanîn hebûye bi vê yekê ku Xwedê ji reyê dil nêzîktirê mirov e. Yanî: Gelo tu hez dikî ez wek yê nêzîk hêdîka dua bikim û biaxivim. An wek yê dûr bi dengê bilind gazî te bikim. Bi gotinek dî: Dema ez berê xwe didim te, tu ji hemû nêzîka nêzîktir î; dema ez li xwe dinêrim, ez xwe gelek dûr dibinim. Veca ez nizanim di dua da ez hay ji halê xwe bimînim an halê te berçav bigirim. Ev jî heye ku we heye ev pirsiyar wek xwesta dîtinê ji hinek dî be, an ji ber hinek dî ve be.

**Qeyûmiyeta Xwedê Teala**

Weheye Hezretê Mûsa (a.s) xwestibê halê aciziya xwe ji çawaniya gazîkirinê ra beyan bike. Dibêje: Ey Xwedê tu munezeh û dûr î, ji wesfê dûrî û nêzîkiyê, da vêca ez wek yên dûr an nêzîk gazî te bikim. Veca ez şaş mame û ez qet çi gazî û duayê layiqê celal û meqamê te nizanim. Tu bi xwe min têbigehîne ku ez çawa dua bikim û gazîkirina te bi çi awayî be. Û tu bi xwe wê ya layiqê xwe ji min ra bêje. Vêca ji aliyê Heq Teala ve cewab hat ku: Hazirbûna min di her cih û demî da haziriyek qeyûmî ye û alem hemû mehzera min e. Ez hevcivatiyê wa me, yên min bînin bîr. Helbet ew zatê muqedes bi dûrî û nêzîkiyê nayê wesfkirin, ew ê ku hemû cih dagîr kiriye. Lê vêca ew nêzîkî ya ku Qurana pîroz jê ra dibêje bi awayekî mecaz û isti'are ye: «We îza seeleke 'ibadî 'ennî, fe innî qerîb».[1] «Eqrebu ileyhî min heblil werîd».[2] Û Xwedê Teala

---

1- Beqere / 186: "Dema bendên min der heqê min da ji te pirsîn, ez nêzîk im".

2- Qaf / 16: "Û em ji rehê stûwê wî nêzîktirê wî ne".

bilindtir e, ji wê yekê ku qurb û bu'da hisî û me'newî jê ra hebe. Çiko eva he dibe sebebê awayek yê sînorkirin û teşbîhê, Xwedê ji wê munezeh e. Hazirbûna hemû mewcûdan pêkve di bargaha qudsa wî da hazirbûnek teelluqî ye û dagîrkirina wî zatê muqedes, ku hemû zeratên kainata û silsila mewcûdatan dagîr kiriye, îhate û dagîr kirinek qeyûmî ye û ew tişteke ne ji sinxê huzûra hisî û me'newî û dagîrkirina eşkere û navdeyî.

Baştiriya zikrê xef û îstihbaba zikrê bi dil jî, ji vê hedîsa şerîf tê fêhmê. Çawa ku di ayeta pîroz da jî hatî: «Wezkur rebbeke fî nefsik tezerru'en we xufyen».(1) Û di hedîsa şerîf da hatiye ku: «Ji ber mezinahiya vî zikrî, ji Xwedê pê ve kes xêra wê nizane». Lê di hinek halat û meqaman da car heye eşkerekirina wê baştir e, wek zikrê li bal ehlê xefletê ji hişyarkirina wan ra. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafî da hatî: «Zikrê Xwedayê ezîz û celîl di nav xafilan da wek şerê şervan e, di nav dijminan da». Û ji 'Uddetud Da'î (pelê 189) ya cenabê Ibn Fehd(2) neqil bûye ku Pêxember (s.a.a) gotiye: «Kesê li sûkê, dema ku ehlê wê di xefletê da ne û bi karê xwe ve mijûl in, bi îxlas zikrê Xwedê bide, Xwedê hezar xêran jê ra dinivîsê û roja qiyametê wê bi awayek wereng lê biborê ku di dilê kesî ra derbas nebûbe». Her weha di bang û xutban da eşkere gotina zikrê, musteheb e.

### Vebir: Xwedê bîne bîr, da Xwedê jî te bîne bîr

Ji vê hedîsê tê fêhmê ku zikrê Xwedê û dostî ya ji Xwedê ra çend xeslet û başî jê ra hene. Yek ji wan ku ji yên dî mezintir e, ew e ku dema ebd zikrê Xwedê bide, Xwedê jî ewî tîne bîra Xwe. Hedîsên

---

1- E'raf / 205: "Tu sibeh û êvar bi dilek şikestî û bi tirs û bê dengê bilind, di dilê xwe da Xwedayê xwe bîne bîr û nebe ji bêxeberan".

2- Ehmed kurê Muhemmed kurê Fehdê Esediyê Hillî (841-756 h.) ji feqîh û muheddis û abid û arifên sedê nehê hicrî ye. Mezinên wek Muheqiqê Korekî, Ibn Ebî Cumhûrê Îhsan û Şêx Alî bin Talibî ji mehzera wî behre birine. Eserên jêrî ji nivîsînên wî ne: Îddetud Da'î, Esrarus Selat, et-Tehrîr, el-Muqteser fî Şerhil Îrşad...

dî jî vê der heqê da hene. Û ev bîranîn li beranberê wê ji bîr kirinê da ye ku Quran der heqê ji bîrkerê ayetan da dibêje: «Belê werenge, ayetên me ji te ra hatin, vêca te ji bîr kirin, hema bi wî awayî îro ew (jibîrker) tê ji bîr kirin».[1]

Çawa ku ji bîr kirina ayetan û koriya batinî û nedîtina mezahirên cemal û celal a Heq, sebebê koriya di axretê da ye, her weha bîranîna ayet, esma, sifetan û bîranîna Xwedê, cemal û celal a wî, besîret û dîtinê bihêz têxe û qas quweta bîranînê û ronahiya wê, perdan radike. Çawa ku tezekura ayetên Heq û melekebûna wê, besîret û dîtina navdeyî û batin xurt dike û bihêz têxe ku ronahiya cemal a Heq di nîşan û ayetan da bibîne. Û tezekura esma û sifetan dibe sebeb ku, Xwedê di ronahî ya esmaiye û sifetiye da şuhûd bike. Û tezekura zat, bê perda ayat, esma û sifetan hemû perdan radike û yar bê perde tecellî dike. Ev yek ji tewcîhat û tewîlatên futûhatên sêyane ye ku qurretul ‘eyna arif û weliya ye: «Fetha Qerîb», «Fetha Mubîn» û «Fetha Mutleq» ku fethul futûh e.

Bi wî awayî ku tezekurên sêyane, rakerê sê perda ne, hej hev kirina di rêka Xwedê da jî dibe sebebê hub û hezkirina Xwedê. Û netîca vê hubê jî rabûna perda ye, çawa ku arifên giranqedr we dibêjin. Kifş e, ku vê mehbûbiyetê jî meratib û derece hene, çawa ku huba fillah jî ji aliyê şêlûtî û zelaliyê ve meratib hene, xulûs û zelaliya temam, ew e, ku şêlûtiya zêdahiyên esmaî û sifetî jî tunebe û eva he sebebê huba tam û temam e. Û di şerî’eta evînê da mehbûbê mutleq ji wisalê naqetê û navbeyna wî û mehbûbê wî da perdeyek namîne. Û pê vê beyanê mirov dikare girêdanê çêke navbeyna du pirsiyarên Hezretê Mûsa da (a.s) çiko dema bihîst ku Xwedê got: Ez hevcivatiyê zakir im, we'da wisal û usûla cemalê ku di dil da hebû ji mehbûb guh lê bû. Veca xwest lêkolînê der heqê xweyê wisalê da bike, da ku bi temamî wezîfa xwe pêk bîne, got: «Roja ku ji parastina te pê ve çi paraztin nînin, tu wê kî biparêzî? Xwedê got: Du bir û koman: Ew ên min tînin bîra

---

1- Taha / 126

xwe û yên ji ber min û di rêka min da hej hev dikin, ku ew bi xwe jî hema bîranîna min e. Evên he di bin parastina min da ne û ew hevcivatiyê min in û ez hevcivatiyê wa me». Nexwe kifş bû ku evê birê xesletek mezin hene û netîca wê jî pir mezin e. Çiko Heq Teala ewa tîne bîr û ew dibin mehbûbê Xwedê. Netîca wê jî ew e ku, wê ji aliyê Xwedê ve bên hewandin û parastin, roja ku ji hewandin û sitirandin û parastina Xwedê pê ve, tu hewandin neyîn û wê Heq Teala bibe hevcivatiyê wan. Xesletek dî ev e, ku Xwedê ji ber wan belayê ji ser yên dî radike, yanî heta ew di nav bendeyan da ne, Xwedê ezab û belan rê nake.

**Vebir: Der heqê ferqa tefekur û tezekurê da ye**

Bizane tezekur ji netîceyên tefekurê ye, ji ber wê, menzila wê pêş tezekurê da danîne. Cenabê Xace Abdullah dibêje: Tezekur, ser tefekurê ra ye. Çiko tefekur ew e, mirov li pey be û tezekur, dest ve anîn e. Heta ku mirov bi lê gerhanê ve mijûl be, mirov cuda ye ji xwesta xwe û negihayiyê. Dema mirov giha xwesta xwe, hingê mirov ji zehmetiya dest ve anînê xilas bûye. Û quwet û kemala tezekurê bi quwet û kemala tefekurê ve girêdayî ye. Û ew tefekura ku netîca wê tezekura temam ya me'bûd be, di seratiyê da gel tu amelekî nayê qiyas kirin û bi terazûya amelên dî nayê kêşan. Çawa di hedîsên şerîf da hatiye ku tefekura bêhnekî, ji îbadetê yek sal, şêst sal û heftêh salan baştir e. Ji xwe kifş e, çiko nihayet û fêkiyê hemû îbadetan dest ve hatina nasîn û bîrhatina me'bûd e û ev halet û xasiyet, pirtir ji fikirkirina durist dest ve tê. Belkî fikirkirina bêhnekî gelek dergehên zanîn û nasînê li ber salik vekê ku îbadetê heftêh salan nekare evê yekê bike, an ewqas mehbûb bîne bîra mirov ku bi meşeqet û zehmetê çendîn û çend sale çênebe.

Bizane ey ezîz, bîranîna mehbûb û jiyana hevrê gel zikrê me'bûd, netîce û desthatên zehfî ji her kesî ra hene: Ji welî û arifên bilind mertebe ra, ku ji xwe nihayeta daxwaza wa ye, li ber sih û sîbera wê digehin cemala mehbûb ê xwe. Lê ji xelkê û navinciyan ra,

baştirîn tişt e, ji duristkirina exlaq û karên eşkere û veşartî ra. Kesê daim Xwedê di bîra wî da be û xwe di huzûra wî da bibîne, helbet wê xwe vede ji karên ku ew pê nerazî ye û wê pêşiya nefsê ji hêçiyê bigire. Ev musîbet û xirabiyên ku nefsa emmare û şeytan bi mirov didin kirin. Hemû ji ber bîrneanîna Xwedê û bêxeberiya ji ezab û îqabê wî ye. Xefleta ji Xwedê qirêja dil zehf dike, nefs û şeytan ser mirov xurt dike û xirabiyan zêde dike. Lê vêca bîranîna Xwedê dil safî dike û qelb ronahî dike, ruh zelal dike û ji bela nefsê xilas dike û hezkirina dinyayê ku serê hemû guneha ye, ji dil dertîne. Her weha kol û xemê hemûyê dike yek xem û dil ji daketina xweyê malê ra temîz û pak û paqij dike.

Nexwe ey ezîz, di vê rêkê da tu çi bikî te kêm kiriye. Dil hîn bike ku bikeve fikra mehbûb, da belkî bi hezkirina Xwedê şiklê dil bibe şikl û sûretê zikrê Heq Teala û kelîma paqij a «la îlahe îllellah» bibe şiklê paşîn yê nefsa te, ku ji vî qût û zadî baştir dest ve nayê û ji rakirina eyb û kêmasiyên nefsê ra ji wê qenctir nayê dîtin.

**Vebir: Zikrê tam ew e, ku hukmê wê di bedenê hemûyê da cih girtibe**

Her çend bîr anîna Xwedê ji wesfê dil e û eger dil mutezekir bibe hemû feydên zikir tên cih. Lêbelê ya baştir ew e, di pey zikrê qelbî, zikrê zimanî jî hebe. Zikrê kamil û temam ew e, ku di zahir, batin, xef û eşkereyê da carî û sarî be û biherike; Heq Teala di xefgehên mirov da meşhûd be û şiklê navdeyî yê dil û ruh şiklê tezekura mehbûb be û deriyên eqalîmên seb’e ji zikrê Heq ra vekirî bin û amelên qelbî û qalibî hemû hevrê bin gel zikr û bîrhatinê. Eger heqîqeta zikr bû şikl û sûretê qelb û memleketê dil bi wê hat vegirtin, wê hukmê wê di memleket û eqalîmên dî da biherike, wê bizav, sekin, çav, ziman, dest, pî û kiryarên hemû endaman hevrê bin gel zikr û bîra Heq Teala û qet çi karan bervajiyê mesûliyeta xwe nakin. Û wê di temamê memleketê wî da eserê danê û şiklê wî wê bibe şiklê navê mezinê Xwedê, ku

ev xilaseka xwesta ehlê Xwedê ye. Çiqas kêmasî di vê da hebe, ewqas ji kemala însanî kêm dibe û kêmasiya xef û eşkere heryekî eserê datîne ser ya dî. Çiko halat û endamên mirov girêdan bi heve hene û eserê li hev dikin. Û ji vêderê tê fêhmê ku zikrê zimanî û gotarî jî ku kêmtirîn mertebe jê ra heye, her feyde têda heye. Çiko her çend qalibek bêruh be jî, ziman wezîfa xwe pêk aniye. Ya dî jî ev e, ku vebûna ziman li zikr, çêdibe zimanê dil jî li zikrê veke. Seydayê ez gorî, arifê kamil Şahabadî, digota: Mirovê zakir gereke wek wî zikir bike, ewê dixwaze zarokê hêj nizane xeber bide, bielimînê kelîman, ku dubare û tekrar dike heta ew zarok dest xeberdanê dike û wê kelîmê dibêje. Veca dema zarok ew kelîme anî ser ziman, muelim jî dîsa pey wî ra, kelîmê dibêje û westhana tekrarkirinê ji nav diçê û tu dibêjî qey ewî zarokî alîkariya wî kir. Bi vî awayî zikirgo gereke dilê xwe ku hêca zimanê wê li zikr venebûye, hîn bike û bielimîne. Nukta tekrara zikir, ew e ku zimanê dil li zikr vebe. Û nîşana vebûna zimanê dil, ew e ku ziman bikeve pey dil û zehmetê ducarkirin û tekrarê rabe. Ewil ziman zikirker e û bi alîkarî û hînkirina wî dil jî dibe zakir û piştî vebûna zimanê dil, ziman dikeve pey wê û bi alîkariya wî an mededa xeybî mutezekir dibe.

Gereke bêt zanîn ku kiryarên zahirî bê alîkariya ruhanî ya dil ku jê ra heyat û jiyanê çêdike, ne layiqê meqamê xeyb û heşra di melekûtê da ne. Nefxeya ruhî ku niyeta xalis şiklê wê ye, şûna ruh û batin da ye, ku di pey ra cesed jî liyaqeta mehşûrbûna di melekûtê da peyda dike. Ji ber vê ye ku di riwayeta da hatiye: «Qebûliya kar û amela qas îqbal û berdana dil e». Lê di her hal û karî da zikrê zimanî jî baş e û paşî ra mirov digehîne heqîqetê û ji ber vê ye ku hedîsan pesnê wê daye û kêm babet hene ku qas babetê zikrê hedîs têda hatibin. Di Quranê da jî gelek başiya wê hatiye gotin.[1] Eger çi zêdetir behsa zikr û bîrhatina dil û ruh e, lê bîranîna Xwedê bi hemû şiklên xwe ve, mehbûb û baş e. Bi çend hedîsan ji teberuk ra em ê gotina xwe bi dûmahî bînin.

---

1- Re'd / 28. Enkebût / 45. Hedîd / 16. Beqere / 220. Ehzab / 41 û.

**Vebir: Hinek hedîs der heqê başiya zikir da**

Îmam Sadiq gotiye: «Çi civata ku baş û xirab têda hebin û bê zikrê Xwedê rabin û ji hev belav bibin. Muheqeq ew, wê roja qiyametê ji wan ra bibe xem û hesret». Kifş e, ku dema roja qiyametê netîce û desthata mezina zikrê Xwedê derket meydanê û ewî xwe jê bêbehre û mehrûm dît û zanî ku çi nîmet û xweşî ji dest dane û êdî nikarê cubran bike, wê bikeve poşmanî, xem û hesretan. Nexwe çiqas ku derfet ji mirov ra heye gereke firsendê ji xwe re xenîmet bibîne û civatên xwe ji zikrê Xwedê vala nehêle.

Hezretê Ebû Cafer (a.s) dibêje: «Kesê ku bixwaze Xwedê Teala xêra wî bêkêmasî bidiyê, dema xwest ji civatê rabe, bila bêje: Subhane rebbike rebbil 'izze 'emma yesifûn* we selamun alel murselîn * wel hemdu lillah rebbil alemîn».

Neqil bûye ji Îmam Sadiq (a.s) ku: Mîrê bawerdaran (a.s) gotiye: «Kesê bixwaze roja qiyametê pîveka wî ji xêran tijî be, bila di pey her nimêjekî ra van ayetan bixwune: Subhane rebbike rebbil 'izzeti 'emma yesifûn* we selamun alel murselîn * wel hemdu lillah rebbil alemîn». (Saffat / 180 - 182) Ji Îmam Sadiq (a.s) neqil bûye ku: «Xwendina van ayetan di wextê rabûna ji civatê, kefara guneha ye».

Xwedayê ezîz û celîl got Hezretê Îsa (a.s) «Tu di dilê xwe da min bîne bîr, ez ê jî te bînim bîr, di nav cemaeta xwe da min bîne bîr, ez ê jî di nav cemaeta baştirê cemaet a mirovan te bînim bîr. Ey Îsa, dilê xwe ji min ra nerm bike û di xelwetê da pir min bîne bîra xwe û bizane razîbûna min di wê da ye ku pir ji min bixwazî. Di wê da sax be û ne ji miriya be». Mexsed ji saxiyê haziriya dil e di zikrê da.

Ji Îmam Sadiq: «Xwedayê ezîz û celîl dibêje: Kesê ji ber zikrê min, paşda mabe ji xwestina ji min, ez ê zêdetirê ji wê ya didim yê xwestî, bidim wî».

Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «Bizanin, baştirîn amelê hewe

û paqijtirînê wan ku dereca hewe bilindtir dike û baştir e ji heçiya roj lê dide, zikrê Xwedê ye. Çiko Xwedê Teala gotiye: Ez hevcivatiyê wî me, yê min bîne bîra xwe û zikrê min bide».

Hedîs der heqê başî, çawanî, adab û şertên wê da pir zehf in, ku em nikarin hemûyan li vêderê bînin.

## HEDÎSA NOZDEHÊ

بسندی المتّصل إلی ثقة الإسلام و المسلمین، محمّد بن یعقوب الکلینی، رضوان الله تعالی علیه، عن علیّ بن إبراهیم، عن أبیه، عن النّوفلیّ، عن السّکونیّ، عن أبی عبد الله، علیه السّلام، قال قال رسول الله، صلّي الله علیه و آله:

**«الغِیبَةُ أَسْرَعُ فی دینِ الرّجُلِ المُسلِمِ مِنَ الْأَکْلَة فی جَوفِه.»**

قال و قال رسول الله، صلّي الله علیه و آله:

**«الجُلوس فی المسجدِ انتظارَ الصَّلاةِ عِبادةٌ ما لَمْ یُحدِث. قیل: یا رسول الله و ما یُحدِث. قال: الاغتِیاب.»**

Sekûnî ji Îmam Sadiq (a.s) neqil dike ku Pêxemberê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Xeybet ji nexweşiya “ekle” zûtir dînê mirov ê musilman ji nav dibe».

Her weha kerem kir: «Rûniştina li mizgeftê da ji bona kirina nimêjê îbadet e; heta ku hedesek jê çênebûbe». Gotin: Ey Resûlê Xwedê! Hedes çi ye? Kerem kir: «Xeybet e».

### Şîrove:

Gora luxet dibêje: Xeybet, mesderê «xab» û ismê mesderê «ixtiyab»ê ye. Ser gotina Cewherî, xeybet ew e; mirov pişt kesekî ve gotinekî bêje ku eger ew guh lê bibe nerehet bibe. Eger ew xeber-

dan rast be, dibêjinê xeybet; eger derew be, dibêjinê buxtan.

Lêkolê hedîsgêr cenabê Meclisî (rehma Xwedê lê be) dibêje: Eva he me'na luxetî ye. Lê ya eşkere ev e, ku xweyê Sihahê me'na îstilahî gotiye, ne me'na luxewî; çiko me'na luxetî ya «xabe» û «ixtab»ê ne ev e, belkî me'na wê ya giştî ev e. Û ehlê luxet carna me'na îstilahî an şer'î di kitêbên xwe de dinivîsin.

Ji xweyê Qamûsê neqil bûye ku «xab» bi me'na «'ab» e. Di Misbahul Munîrê de weha hatiye: «Xeybeta wî kir, hingê tê gotin ku dema eybên wî ku ew pê nerehet bibe bêje, heq jî ev e».

Gomana nivîser ev e, ku tu yek ji gotinên jorî ne me'na luxetî ye; belkî di heryekî da hinek bend hene ku tevlî me'na îstilahî bûye. Welhasil xeberdan ji behsa me'na luxetî feydeyek zehfî têda nîne. Ya muhim dest ve anîna behsa wê ya şer'î ye ku bi teklîfê ve girêdan heye. Wisa dixweyhê ku evê behsê hinek bendên şer'î hene xaricê ji fêhma orfî û me'na luxetî. Em ê paşê hinekî jê xeber bidin.

Ekele, êşek e, ku li endama da peyda dibe û jê dixwê. Çawa ku di Qamûs û kitêbên dî da hatî. Carna «ekle» tê xwendin; yanî ew êşa ku ji goşt dixwê. Ya ewil gel luxet pirtir rêk dikeve.

Di her hal û karî da mexsed ew e, çawa ku ev nexweşî dema di endam da peyda dibe, nexasima endamên letîfên batin, ewê lez û bez dixwê û ji nav dibe. Xeybet, dînê xelkê ji wê leztir dixwe û ji nav dibe û fanî dike. Ma lem yehdus, ji babê îf'al e û zemîra mustetira di wê de li «calis» dizivire. Û ixtiyab mensûb e û mef'ûlê fiîla muqeder e, ku ji xeberdana pirsiyarker tê fêhmê. Û di hinek nusxa da şûna: Ma yehdes, melhedes hatiye nivîsîn. Vê gorekê ixtiyab merfû' e, çiko dibe xeber.

**Vebir: Der heqê te'rîfa xeybetê da ye**

Bizane ku feqîhan (Xwedê ji wan razî be), ji bona xeybetê gelek te'rîf anîne ku behsa hemûya û xirecira wan li ser meselê, ne ji berpirsiyariya vê kitêbê ye îlla ku em bi kurtî jê xeber bidin.

Şêxê lêkol Seîdê Şehîd di kitêba «Keşfur Reybe» da dibêje: «Xeybetê du te’rîf hene: Ya ewil ku nav feqîhan da meşhûr e, ev e ku: Xeybet ew e, mirov kêmasiyekî bi mexseda kêmkirin û xirabî gotinê nisbet bide bal kesekî ve ku ewî pê nexweş be. Ya duwê ew e, ku mirov agahdariyê çêke bi tiştekî ku kêmasî têda heye» te’rîfa duwê ji ya ewil giştîtir e. Mefhûmê hedîsa jî ewa herdu te’rîfa rast dertîne; yekî ji wan ev e ku Hz. Ebûzer dibêje: «Min got ey Resûlê Xwedê xeybet çi ye? Kerem kir: «Xeybet ew e, tu tiştek nebaş der heqê birayê xwe de bêjî». Min got: Ey Resûlê Xwedê, eger ew tişta hatiye gotin di wî da hebe, xeybet e? Kerem kir: «Eger têda hebe xeybet e û eger tunebe tuhmet û buxtan e».

Di hedîsa meşhûrê nebewî da hatiye: «Hûn zanin xeybet çi ye? Gotin: Xwedê û Pêxemberê wî baştir zanin. Vêca kerem kir: Ew e, tu bi nebaşî ji birayê xwe xeber bidî».

Li vê hedîsê da behsa hazir nebûna mirov nekiriye. Çiko ji mefhûmê «xeybet»ê me'lûm e, ku îhtiyac bi gotinê tunebûye. Bira jî me'lûm e, ku mexsed jê, birayê îmanî ye, ne nesebî.

Ma yekreh: Ew tiştên ku gorekî orfê neqs û kêmasî hesab dibin.

Qest bi mexseda kêmkirin û xirab gotinê, her çend di hedîsa şerîfa Ebûzer û hedîsa dî da nehatiye, lêbelê ji xeberdanê tê fêhmê; belkî jî destpêka riwayeta Ebûzer delalet dike li ser wê. Çiko di destpêkê de weha hatiye ku «xeybet ji zinayê dijwartir e». Min got: Çima ya Resûlellah? Kerem kir: «Çiko mirov zinayê dike, vêca tewbe dike û Xwedê tewba wî qebûl dike; lêbelê heta ew ê xeybeta wî hatîkirin efû neke, xeybet nayê efûkirin…» paşê kerem kir: «Xwarina goştê wî (ew ê xeybeta wî hatî kirin) ji bêemrî ya Xwedê ye».

Ji van du rista der heqê xeybetê da kişf dibe ku xeberdan gereke bi mexseda kêmkirinê bê gotin; lê eger ji leystok ve an ji ber dil pê vemanê behsa yekî bêt kirin, bêemrî nehatiyekirin heta muhtacê efûkirinê be û nexwarina goştê wî ye.

Eva he ku xeybet ne tenê pê ziman û gotinê ye, ji riwayeta Aîşe kişf dibe; ew dibêje: Jinikek hat bal me, vêca dema pişta xwe da me, min pê destê xwe îşare kir ku jinek kin e. Vêca Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Te xeybeta wê kir».

Ev jî heye ku orf ji hedîsên behsa xeybetê dike, taybetiya xeberdanê fêhm nake; yanî eva he ku di te'rîfê da kelîmeya "gotin" hat, ne ji ber wê ye ku ewê xasiyetek hebe. Belkî çiko zêdetir xeybet bi gotinê çêdibe ne bi hereketa.

Yek gotin ma, ew jî ev e, ku ji gelek hedîsa me'lûm dibe ku eşkerekirina xefa bawerdaran heram e. Yanî eyb û kêmasiyên bawerdara ku veşartî û xef in, çi xelqî an xulqî an amelî be, heram e, ku ew eşkere bibe û bêt gotin. Çi xweyê wê xefê razî be çi nebe. Çi mexseda kêmkirinê hebe û çi tunebe. Lêbelê bi berçavgirtina wa hedîsa hemûya, îstifade dibe ku qesta kêmasî çêkirinê an kêmkirinê eser heye di herambûnê da; îlla ku ew kar bi xwe ji wa tişta be ku gotin û belavkirina wê di şerî'etê da hatibe heramkirin. Wek: Wa bêemriyên Xwedê ku gunehkar bi xwe jî nikare ewa bêje, çiko eva he ji belavkirina pîsatiyê tê hesabê. Û eva he ne girêdayî ye bi herambûna xeybetê ve. Û ne dûr e, ku eşkerekirina xefên bawerdara eger ew nerazî jî nebin heram be, heta eger mexseda kêmkirinê jî li holê nebe. Vê der heqê da zêdetirê ji hevqasî me ji mexsedê dûr dike.

**Vebir: Der heqê mezinahiya gunehê xeybetê da ye**

Bizane tifaqê li ser herambûna xeybetê heye û ji zerûriyatên fiqhê ye û ji kebair û mubaqata ye. Lê xeberdana berfireh der heqê wê da ji wezîfa vê kitêbê der e. Ya lazim li vêderê bêt gotin hişyarkirina der heqê xirabî û pîsatî ya wê da ye. Da bi hezkirina Xwedê bi fikirkirina wê der heqê da em nekevin bin barê wê da. An eger Xwedê nekirî me xeybet kir jî, lez û bez em li xwe bizivirin û tewbe bikin, da newebe em pê wê qirêjê û pê vî gunehê kebîre yê îmankuj ji vê alemê derkevin. Çiko evî gunehê kebîre di alema

xeybê û piştî perda melekûtê da sûret û şiklek pir pîs heye û xêncî ji pîsatiya wê, dibe sebebêşermezariya di meleê e'la û huzûra pêxembera û melaîketên muqereb da. Şiklê wê yê melekûtî hema ew e, ku Xwedê Teala li kitêba xwe ya pîroz da gotiye; hedîsa jî deqedeq an bi îşare jê xeber daye. Xwedayê ezîz û celîl kerem dike: «Xeybeta hevûdu nekin, ma gelo hûn hez dikin goştê mirarê birayê xwe bixwun, vêca hûn jê nexweş bin!?».[1]

Em bêxeber in, ji vê yekê ku amelê me li ser şiklên munasibê xwe di wê alemê da li me bizivirin. Em nizanin ku ev amel şiklê xwarina mirar e. Xweyê vî karî wek çawa sayên har bedenê mirovan didirînin û goştê wa dixwun di dojehê de jî wê sûretê amelî yê vî karî li wan bizivire.

Di riwayetekî da hatiye ku dema Pêxember (s.a.a) kesek zinakar recm kirî, yekî got hevalê xwe, ev mirovê he wek sa (kuçik) hat kuştin. Vêca Pêxember (s.a.a) gel wa herduwa ber mirarekî ra derbas bû, vêca got wa herin bi didanê xwe qeta jê vekin. Ewa gotin ey Resûlê Xwedê em pê didanê xwe qeta ji mirar vekin!? Kerem kir: «Ewa ku ji birayê hewe gihayî hewe genîtiya wê zêdetir e, ji ya vê».

Belê, Resûlê Xwedê (s.a.a) bi hêza besîretê amelê wa dît ku genîtiya wê ji mirar pirtir e û şiklê wê pîstir. Di riwayetek dî da hatiye, yê xeybetê dike roja qiyametê wê goştê xwe bixwe. Mîrê bawerdaran di şîretên xwe ji Nûfê Bekalî ra weha kerem dike: «Xwe ji xeybetê vede; çiko ew, xwarina sayên agir e (dojehê)», paşê got: «Ey Nûf! Derew kiriye ew ê goman bike bi helalî welidiye halhale bi xeybetê goştê xelkê dixwe».

Dijatî nav wan riwayetên şerîfe da nîne, ev tiştên he hemû we heye ku çêbin: Hem goştê mirar bixwe hem ji goştê xwe bixwe û hem li ser şiklê sa (kuçik) be. Hem xwarina wî ji mirar be û hem ew bi xwe li ser şiklê mirar be û xwarina sa yê dojehê be. Li wê-

1- Hucurat / 12.

derê şikl, tabi'ê cihetên failî ne û mewcûdek dikare çend şikl jê ra hebin. Çawa ku li cihê xwe da jê hatiye axiftin. Ji Resûlê Xwedê (s.a.a) hatiye neqil kirin: «Kesê xeybeta birayê xwe bike û li pey eşkerekirina xef û kêmasiyên wî be, ewilîn gav e, ku davêjê di dojehê da û Xwedê wê xefa wî nav xelkê de eşkere bike». Eva he halê wî yê roja qiyamet û dojehê ye, ku Xwedê bi vî awayî li nav xelkê û melekûtiya da hetika wî dibe.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «... Kesê ku xeybeta mirovê musilman bike, rojî û destnimêja wî dişikê û roja qiyametê wê di halekî da be ku bêhna devê wî ji bêhna mirar genîtir e û ehlê mehşerê ji ber bêhna devê wî dikevin eziyetê. Û eger pêş tewbe da bimire, di halekî da miriye ku heramê Xwedê helal kiriye». Ev jî halê wî yê pêşiya çûna dojehê ku şermezar dibe û di nav kafira da ye. Çiko ew kesê heramê Xwedê helal bike, kafir e.

Enesê kurê Malik dibêje: Resûlê Xwedê (s.a.a) got: «Di şeva mîracê da ez ber komekî ra derbas bûm ku rûyê xwe bi xermîşka dixerişandan, min ji Cebraîl pirsî ev kî ne? Got: Ev, ew in, yên xeybeta xelkê dikiran, şerm û avrûya wan dibiran».

Nexwe me'lûm bû ku xeybetker di berzexê da hetika wî çûye û di mehşerê da şermezar e û di dojehê da riswa ye. Û di vê alemê da jî şermezariya wî di hinek merteba da derdikeve, çawa ku di hedîsa şerîfa Kafî da hatiye: Îmam Sadiq (a.s) ji Resûlê Xwedê (s.a.a) neqil dike ku got: «Ey koma ku bi ziman musilman bûyîn û îman negihaye dilê wan! Xirabiya musilmana nebêjin û nekevin pey xef û veşartiyê wan. Çiko bi rastî kesê bikeve pey xefên wan, Xwedê jî wê bikeve pey xefê wî û kesê Xwedê bikeve pey xefên wî, wê hetika wî bibe, heta eger li mala xwe da be». Xwedê Teala xeyûr e û eşkerekirina xef û veşartiyê bawerdara hetika namûsa îlahî ye. Eger mirov bêşermî ji qeydê borand û hurmetên îlahî ji nav birin. Xwedayê xeyûr, ku xefên wî bi setariyeta xwe xef hiştibûn, wê eşkere bike û li vê alemê di nav xelkê da û di wê

alemê da bal melaîket û enbiya û ewliya wê hetika wî bibe.

Îmam Baqir (a.s) dibêje: «Pêxember (s.a.a) di mîracê de got: Ey Xwedê, halê bawerdara bal te çawan e? Cewab hat: Ey Muhemmed! Kesê dostek yê min bêqîmet bike, ewî xwe li ber şerê min vedaye û ez gelek lez alîkariya dostê xwe dikim».

Hezretê Sadiq (a.s) di nav gotineka xwe da got: «Kesê xeybeta wî bike, digel wê ya têda heyî (kesê ku di eşkereyê da guneh nekiriye, her çend gunehên wî yên xef hebin) ew ji dostiya Xwedê Teala der e û ketiye bin wîlayeta şeytan». Me'lûm e, kesê ku ji wîlayeta Xwedê derkeve û bikeve di wîlayeta şeytan da, ne ji ehlê îman û xilasiyê ye. Çawa li hedîsa borî da jî derbas bû, îslama xeybetker zimanî ye û îman neketiye dilê wî. Û kifş e, kesê ku bawerî bi Xwedê hebe û musediqê roja ceza be û mu'teqid be ku wê bigehê amelê xwe yê xirab, gunehek weha mezin nake ku di alema xeybê, şehade, dinya, berzex û axretê da şermezar bibe û bi pîstirîn şikl ewî bavêjin dojehê û ji wîlayeta Heq derkeve û bikeve bin wîlayeta şeytan, ew guneh nake. Eger em ewî karê pir pîs bikin, gereke em bizanin ku destpêka xirabiyê ye û heqîqeta îmanê neketiye dilê me. Eger îman bikeve dil, kar durist dibin: Eserên wê kartêker dibin di hemû zahir û batin, xef û eşkereyê da. Nexwe gereke em navdeyê xwe derman bikin û ji nexweşiya dilê xwe ra îlacekî bibînîn. Ji hedîsan eşkere dibe çawa ku sistiya îmanê û nebûna îxlasê dibe sebebê xirabûna exlaq û amelan, ev fasida he jî dibe sebebê kêmasiya îmanê, belkî jî sebebê ji navbirina wê. Eva he rêketî ye, digel awayek yê burhanê, çawa ku li cihê xwe da jê hatiye axiftin.

Bizane, ew gunehê he ji aliyek dî ve jî ji guneha dijwartir û peyhatên wê pirtir in. Di wê da hem hequllah heye hem hequnnas û heta ew ê xeybeta wî hatiyekirin xeybetkar efû neke, Xwedê jî ewî efû nake. Çawa ku bi çend rêka ve hedîsa şerîf bi vê me'nê riwayet bûye. Resûlê Xwedê (s.a.a) di nav şîretên xwe ji cenabê Ebûzer re (r.a) weha dibêje: «Ey Ebûzer! Newebe tu xeybet bikî,

çiko bi rastî xeybet ji zinayê dijwartir e». Min got: Ji ber çi ey Resûlê Xwedê? Kerem kir: «Çiko mirov, zinayê dike, vêca tewbe dike û Xwedê tewba wî qebûl dike; lê xeybet, heta ew ê xeybeta wî hatiyekirin lê nebore, tewba xeybetker nayê qebûl kirin».

Di kitêba Ilel û Xisal û Mecmeul Beyan û Musadiqetul Îxwan da bi vê naverokê hedîs hene. Û eger Xwedê nekirî, mirov ji dinyayê biçe û heqê xelkê li ser mirov hebe, karê wî gelek zehmet e. Di huqûqê îlahî da mirov rû bi rû dibe digel kerîm û rehîm ku di zatê wî yê muqedes da buxz, kîn û dijminî nîne. Lê eger mirov raber be digel ebdan, çêdibe rast kesekî bikeve ku ew exlaq têda hebin ku zû bi zû desta ji mirov nekêşe û ji mirov razî nebin. Nexwe gereke mirov pir hay ji xwe hebe, ku mesele pir xeter e û kar gelek bi zehmet.

Hedîs, der heqê xeybetê da gelek dijwar û zehf in, ku anîna wan ji qeyda van pelan der e. Lê em ê bi kurtî hineka bêjin.

Riwayet bûye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) rojekî xitabeyek da, behsa ribayê kir, vêca got: «Yek dirhemê ribayê ku kesek dest xwe ve bîne, girtir e, ji şêst û sê zinayan; dijwartirîn riba, hetikbirina mirovê musilman e».

Dîsa Pêxember (s.a.a) kerem kiriye: «Qasê agir lez bi darikên hişk ve diçe, eva he ne leztir e, ji wî qasî ku xeybet qencîyên evdan ji nav dibin».

Dîsa ji Pêxember (s.a.a) riwayet bûye ku: «Roja qiyametê yekî li mehşerê da hazir dikin û nama amelê wî didinê, lê ew qenciyên xwe têda nabîne, vêca dibêje: Ey Xwedê! Eva he ne nama amelê min e; çiko ez xêrên xwe têda nabînim. Jê ra tê gotin: Hema bi rastî Xwedayê te ji rê dernayê û ji bîr nake, amelê te ji ber xeybetkirina xelkê ve ji dest te çûye. Paşê yek dî tînin, nama amelî wî didinê, vêca di wê da taet û îbadetên zehfî dibîne; dibêje: Ey Xwedê! Ev ne nama amelê min e! Çiko bi rastî min ev îbadetên henê pêk neanîne. Veca dibêjinê: Filan kes xeybeta te kiriye û qenciyên wî dane te».

Ji Pêxember (s.a.a) riwayet bûye ku kerem kir: «Yekemîn dereca kufrê ev e, ku mirov gotinekî ji birayê xwe seh bike û ewî biparêze heta rojekî pê wê hetika wî bibe. Ev mirovên he, bêbehr û bênesîb in».

Eva he kurteyek bû ji hedîsên vê babetê; babetên dî jî hene ku behsa xeybetê û gunehê wê û xirabiyên wê têda hatine kirin. Wek: Bêqîmet kirina bawerdar, zelîlkirin, kêmkirin û biha nedana wî; kêmasî çêkirina ji wî ra...

**Vebir: Der heqê zererên civakî yên xeybetê da ye**

Çawa ku ev gunehê kebîre û mezin ji têkder û xirabkerên îman, exlaq, zahir û batin e, di dinya û axretê da mirov têxe şermê û avrûya mirov dibe, çawa ku te di vebira borî da dît. Her weha evê rezîlê mefsedên îctimaî jî hene û ji ber vê yekê ji gelek gunehên dî pîstir û xirabiya wê pirtir e.

Yek ji mexseda şerî'et û pêxemberan (a.s) tewhîda kelîme û tewhîda baweriyê û hevgirtina di meselên girîng û pêşî girtina li zêdegaviyên zalima ye, ku li xirabkirina mirova û medîna fazile digerin, eva he xêncî ku bi xwe mexsedek serbixwe ye, wesîleyeke ji pêşvebirina mexsedên mezin ra û eserek temam heye di çêkirina medîna fazile da. Ev mexseda mezin ku duristkerê kom û ferda ye; xêncî bi yekbûn û hevgirtin, biratî û duristiya dil û sefaya zahir û batin çênabe. Ev mexsed hingê tê cih, ku mirovên komelê wisa lê bên heçweku hemû yek kes bin û cemaet hemû yek mirov be û ferd şûna endam û piça bin, xebat hemû li dora mexseda mezin a îlahî û muhimên aqlî bizivirin ku mesleheta kom û ferda di wê da ye. Eger hezkirin û biratiyek weha di nav kom û desteyekî da peyda bibe wê ser hemû yên ne weha bikeve. Çawa ku nêrîna li tarîxê nexasima tarîxa ceng ên Îslamê û vegirtinên mezin, gotinê bi başî ronahî dike, di serî da ku ev qanûna îlahî hat ji ber ku hinek ji vê hevgirtin û wehdetê nav musilmana da hebû û niyet xalis bûn, di zemanek kêm da çi vegirtinên

mezin çêbûn û di wextek kurt da ser padişahiyên mezin wek Îran û Rûmê ketin û bi jimarek kêm leşkerên giran şikandin. Û Resûlê Xwedê (s.a.a) di destpêkê da destebiratî nav musilmana da danî û gora ayeta: «Bawerdar bira ne». Biratî nav mumina da hat danîn.

Hezretê Sadiq (a.s) digota hevalên xwe: «Teqwatiyê bikin û digel hev wek birayên xweşmuamele bin, di rêka Xwedê da alîkarê hev bin û gel hev bin û dostînyê gel hev bikin, sera hev bidin û behsa karûbarê me bikin û ewê sax ragirin».

Her weha digota: «Heq e, musilman pişta hev bigirin û alî hev bikin û hej hev bikin û niyaza muhtacan biqedînin. Ji hev ra dilovan bin û wereng bin ku Xwedê Teala behsa wan kirî ku: «Bawerdar digel hev bi rehm in».

Dîsa dibêje: «Bila hewe gel hev girêdan û pêwend hebe û dilovan û birayên qenc bin, çawa ku Xwedê emrê hewe kiriye».

Musilman memûr in, ji dostî, hevgirtin û qencîkirina gel hev û biratî û uxuwetê ra. Û kifş e, tişta bibe sebebê zêdebûna van tiştan, ew baş û xweşdivê ye û ya evê biratiyê û hevgirtinê xirab bike û tefriqê bixe nav cemaetê da kerbê xweyê şerî'etê jê tê û dijê mexsedên mezin e. Û kifş e, ku ev pîsa he, eger nav komekî da çêbe, wê bibe sebebê kîn û hesed, xezeb û dijminiyê û wê rehên xirabiyê û dara nifaq û durûyiyê di nav wan da qahîm bike. Hevgirtin û wehdetê rake û stûnên diyanetê sist bike û ji vî alî ve ser pîsatî û xirabiya wê ve zêde dike.

Nexwe gereke her musilmanê dîndar ji parastina xwe ji xirabiyê û parastina ehlê dîn ji nifaqê û ji bona parastina musilmana û hay jê mana wehdet û yekîtiyê û qewîkirina biratiyê, xwe ji vê rezîlê paşda bide û wan jî nehy bike ji vî karê rezîl. Û Xwedê nekirî, eger heta niha bi vî karê rezîl ve ye, jê tewbe bike û eger îmkan hebe û xirabî jê çênebe, bila helaliyetê bixwaze û eger îmkan tunebe bila jê ra dua bike û evî gunehî terk bike. Reh û rîşê sedaqet,

wehdet û îtihadê di dilê xwe da biçêne; da ku ji endamên qencên komelê bêt hesabê û di zivirandina çerxa Îslamê da alîkarî hebe. “Wellahul hadî ila sebîlir reşad».

**Vebir: Der heqê derman kirina xeybetê da ye**

Bizane dermanê vî gunehê mezin jî wek gunehên dî bi ilmê nafi’ û amel çêdibe.

bi ilm, weha ye ku mirov di feyda wê da fikir bike û ewê bide ber netîce û desthata xirab û pîs ku bi wê ve tê, û ewê deyne di mîzana aqilê da û ji vê rêkê behrê bigire. Helbet mirov gel xwe ne dijmin e, hemû guneh û bêemrî ji cehalet û nezanî û bêxeberiya ji netîca wê tên kirin. Hindek e, feyda xeyalî ya di xeybetê da heyî ew e ku çend deqîqekî pêşiya bayê dil berdide ku mijûlê gotina xirabiyên xelkê dibe û kêmasiyên wan eşkere dike û bi tevzokan ku rêketî ye digel tebîetê heywanî û şeytanî civatê germ bike û dilê xwe rehet bike.

Vêca eserên wê yên pîs, te hinek guh lê bû û hinek dî jî guh lê bibe û dersê bigire û deyne di mîzana qiyasê da. Evê liberhevgirtinê desthatên baş jê ra hene. Eserên wê di vê alemê da ew e, ku mirov ji çavê xelkê dikeve û baweriya wan bi wî namîne. Tebi'ên xelkê bi awayek sirûştî li ser hezkirina ji kemal, qencî û başiyê hatiye danîn û revketî ye ji kêmasî û pîsî û nebaşiyê. Û ferqê datînin navbeyna wa yên xwe ji hetikbirin û bêavrûkirina xelkê didin paş û yên ne wereng. Heta xeybetker bi xwe jî, wa yên xwe ji van tiştan paşda dide, gora sirûşt û aqil, ewan ser xwe ra zane. Eger xeybetker ji hed deranî û avrûya xelkê bir, wê Xwedê hetika wî di vê dinyayê bi xwe da bibe. Çawa ku di riwayeta Îshaqê Emmar da ku borî eva he hat gotin. Û gereke mirov bitirse ji wê hetik birina îlahî ku êdî cebirandin jê ra nîne. Ez ji ber xezeba Helîm hawara xwe ji Xwedê ra dibim. Ev çêdibe ku hetik birina bawerdaran û eşkere kirina xefên mirovan bibe sebebê xirab bûna aqibet û dûmahîkê, çiko eger ev kar di mirov da bû mele-

ke, hinek tesîran datîne ser nefsê ku yek ji wan ev e: Nisbet bi xweyê wê kîn û dijminiyê çêdike û kêm kêm zêde dibe, çêdibe ev kîn û dijminî di demê mirinê da, dema hinek perdeyên melekûtê rabin, ku başî û hêjana wan li bal Xwedê dibîne, bibe sebeb ku kînê ji Xwedê jî hilîne û bibe dijminê wî. Bi awayekî mirov dijminê dostê dijmin û neheze ji hezkiriyê nehez; vêca bi dijminiya ji Xwedê û melaîketên wî ji vê alemê derkeve û bibe xwelîserê her û her, bigehê bextreşiya daimî.

Ezîzê min, dostiyê bike gel bendeyên Xwedê, ku Xwedê rehmet û qencî li wan kiriye û lîbasê Îslam û îmanê kiriye ber wan da û bi dil hej wan bike. Newebe ku tu dijminê mehbûbê Heq bî, çiko Heq Teala dijminê, dijminê mehbûbê xwe ye û wê te ji rehmeta xwe dûr bike. Bendeyên xasên Xwedê, nav bendên wî yên dî da ne û çêdibe ev dijminî û hetik birin û eşkere kirina xefa evî bawerdarî karek be ku tu digel Xwedê Teala bi xwe dikî. Muminîn ewliyayên Xwedê ne, dostiya gel wan dostiya gel Xwedê ye. Dijminiya wan dijminiya Xwedê bi xwe ye. Bitirse ji xezeba Xwedê û dijminiya şefaetkarên roja cezayê –ne xwezika wî yê mehderkarên wî dijminê wî bin-. Hinekî der heqê netîca dinyayî û uxrewî ya vî gunehî da bifikire û hinekî aqilê xwe bide şuxul der heqê wan şiklên bizdênerên qebr, berzex û roja qiyametê. Binhêre kitêbên muteber û gotinên ku ji îmamên hîdayetê gihayîn destê me (a.s) ku heqîqetek piştşikên in.

Vêca muqayese bike navbeyna çarêkek tevz kirinê û bayê xeyalî yê dil û hezaran salan bela û nexweşiyê. Ew jî eger tu ehlê xilasiyê bî û ser îmanê ji vê alemê biçî, eger ne ewê qiyas bike gel mana her û her di dojehê û ezabê daimî yê dijwar. Xwedê me jê biparêze. Xêncî ji vê eger tu dijminê kesekî bî jî û te îman bi hedîsan hebe, lazim e tu dîsa xeybeta wî nekî. Çiko hedîs dibêjin: «Gunehên mirovê xeybeta wî hatîkirin di nivîsoka yê xeybet kirî da tê nivîsîn û her weha xêrên xeybetker diçin ji yê xeybeta wî hatîkirin ra. Nexwe eger tu bixwazî dijminiyê gel wî bikî te

dijminî gel xwe kiriye».[1] Evê jî bizane ku tu nikarî şerê Xwedê bikî. Xwedê dikare hema pê vê xeybeta te ewî mirovî li ber çavê Xwedê biqedr û ezîz bike û te jî pê wê zelîl û bêqîmet bike. Di huzûra kerrubiyan da jî ewê muameleyê bike: Nama amelê te ji guneh û xirabiyan tijî bike û hetika te bibe û nivîsoka amelê wî jî tijî xêr û qencî bike, qedr û qîmet bidiyê. Nexwe bizane ku tu ketî beranberê kî da û ji dijminiya wî bitirse.

Rêka amelî ya derman kirina xeybetê jî weha ye ku: Demekî bi çi kul û zehmetê heyî pêşiya nefsê ji vî karî bigirî û hefsarê nefsê dest xwe bigirî û baş baş hay ji xwe bimînî û soz bidî xwe ku demekî evî karî nekî û hesabê gel xwe bibînî. Hêvî ew e, ji Xwedê, piştî demekî tu durist bibî û koka wê derînî. Û kêm kêm wê kar ser te sivik bibe û piştî zemanekî tu wê bi xwe bihesî ku qet ew li te xweş nayê û tu jê direvî, vêca tu wê rehetiya dil û xweşiyê di terka wê da bibînî.

**Vebir: Dema xeybet caiz e jî, xeybet nekirin baştir e**

Bizane zana û feqîhan Xwedê ji wan razî be hinek tişt ji bin hukmê heram bûna xeybetê deranîne. Hineka di jimarê da gotine ew deh cih ne. Niha me ne li ber e, em yek yek bijimêrin. Çiko ev kitêb ne behs kirina ji behsên fiqhî ye. Ya lazimê gotinê ev e ku gereke di çi ciyan da mirov ji hîle pîlên nefsê piştrast nebe û di bizava xwe da bi awayek temam hay ji xwe hebe û ne li ber be ku yek ji van ciyan peyda bike, vêca bi kêmasî çêkirin û tevzokan xwe mijûl bike.

Hîlên nefsê pir hûr in. Çêdibe ku rêka şerî'etê li ber mirov tarî bike, vêca hîla xwe bikar bîne û mirov ji nav bibe. Mesela: Xeybeta wî yê fisq û ji rêderiya wî eşkere, her çend çi lê nayê û caiz

---

1- Hezretê Alî di hikmeta 296 da ji kesekî ra ku dixebitiya zererê bigehîne dijminê xwe, lê zerer li xwe dida, got: "Tu wek wî yî ku rimê di singê xwe ra dike, da siwarê li piş xwe bikujê. (Wergêr).

e. Belkî jî dema bibe sebebê pêşvedana wî, wacib e û ji derecên nehya ji munker hesab dibe, lê lazim e mirov melheze bike ku gelo ewa wî ji vê xeybetê ra hay dide, hema mesela şer'î û îlahî ye, an şeytan û nefs ketiye nav meselê ra? Eger sebeb îlahî ye, ji îbadet hesab dibe, belkî jî xeybet ji xwe bi niyeta duristkirina gunehkarê eşkere ji baştirîn nimûnên qencîkirinê ye li wî kesî, eger çi ew bi xwe jî nezane. Lê eger tevlî bayê dil û hewayê nefsê ye, bila bixebitê ku niyeta xwe xalis bike û bê niyetek durist xwe têkel avrûya xelkê neke. Ev jî heye ku adet dana nefsê ji xeybet kirinê ra di cihên caiz da jî, jê ra zerer e. Çiko meyla nefsê li ser xirabî û pîsatiya ye. Çêdibe eger di cihên caiz da xwe jê venedê, kêm kêm bigehê dereceyekî ku heram e. Çawa ku her çend bi kêr tê mirov bikeve nav cihên ku şubhe heyî ra, lê ne qenc e; çiko ew sînorên herama ne û we heye bi çûna wêderê mirov bikeve nav heramê ra. Çiqas çêbe gereke mirov xwe ji van cihan vedê û xwe ji wan tiştên we heye bibe sebebê hêçbûna nefsê paşda bide.

Belê, li wan cihên xeybet ferz dibe: Wek ya hatî gotin û cihên dî yên aliman gotine, lazim e mirov pêra be, lê gereke niyet ji bayê dil û peyketina şeytan paqij bibe. Lêbelê di cihên caiz da, ya baştir ew e mirov xwe jê bide paş. Çênabe mirov hemû karên caiz bike, nexasima li van ciyan da ku hîla hewayê nefsê û şeytan kartêker e.

Di riwayetê da hatiye ku Hezretê Îsa (a.s) gel heval û hewariyên xwe ber seyek sekitî ra borîn, hewariyan gotin: Çiqas bêhnek pîs ji vî sekitiyî tê! Lê hezretê Îsa (a.s) kerem kir: «Didanê wî çiqas spî ne!»; eha perwerdeyê beşer gereke mirovên weha bin. Razî nebû ku ji çêkiriyê Xwedê Teala bi nebaşî bêt xeberdan; ewan kêmasiya wê dît, lê wî hezretî kemala wê ber guhê wan ve avêt. Min bihîst di hedîsê da heye ku Hezretê Îsa (a.s) got: «Bila berê hewe ne li eyb û kêmasiyên xelkê be; wek mêşê ku diçê ser cihên qirêj rûdinê».

Ji hezretê Resûlê Ekrem riwayet bûye ku kerem kir: «Xwezika kesê ku mijûlbûna bi kêmasiyên wî ve, ewî ji mijûliya xelkê bide

paş». Çawa ku mirov li pey eyb û kêmasiyên xelkê ye, ya baş ew e ku hinekî bikeve pey eyb û kêmasiyên xwe. Çiqas kirêt û pîs e mirovê ku hezaran eyb û kêmasî têda heyîn, kêmasiyên xwe paş guhê xwe ve bavêjê û li kêmasiyên xelkê bigere û ewê jî bike serbarê kêmasiyên xwe. Gereke mirov geranekî di nav wez' û hal, exlaq û kiryarên xwe da bike û ewa durist bike, hingê wê kar û barê wî durist bibin. Eger kêmasiyan di xwe da nebînê, eva he ji cehl û nezaniya wî ya temam e. Û çi kêmasî ji wê mezintir nînin ku mirov bi kêmasiyên xwe nehese û jê bêxeber be û digel wê yekê ku ew bi xwe xweyê komeke ji kêmasiyan, li eyb û kêmasiyên xelkê bigere.

**Vebir: Guhdana xeybetê heram e**

Çawa ku xeybet heram e, guhdana wê jî di heramiyê da hevalê wê ye. Ji hinek riwayetan jî tê fêhmê ku guhder wek xeybetker e, di her tiştî da, heta di lazimiya helalî xwestinê û di vê yekê da ku ji gunehên kebîre ye. Wek hedîsa ji Pêxember (s.a.a) neqil bûyî ku: «Guhdêrê xeybetê, yek ji xeybetkera ye». Bi vê me'nê ji Hz. Alî (a.s) jî riwayet bûye. Ji gelek riwayetan jî tê fêhmê ku red û zivirandina xeybetê ferz e: Resûlê Xwedê (s.a.a) ji xeybetê û guhdana wê nehy kir û got: «Heyhê! Kesê xeybetekî der heqê birayê xwe da di civatekî da bibihîze, vêca jê red bike û bêje ne weha ye, wê Xwedê hezar dergehên xirabiyê di dinya û axretê da li ber bigire, vêca eger bikare û jê nede paş, gunehê wî qas heftêh car gunehê wî kesî ye ku xeybeta wî kirî». Hezretê Sadiq (a.s) der heqê wesiyeta Resûlê Xwedê (s.a.a) ku ji Îmam Alî (a.s) ra dibêje, kerem kir: «Ey Alî, kesê xeybeta birayê wî yê musilman li balê bêt kirin, vêca ew bikare alî wî bike lê alî neke, wê Xwedê ewî zelîl bike di dinya û axretê da». Her weha ewî (s.a.a) kerem kiriye: «Kesê xeybeta birayê xwe di civatekî da bibihîze û jê bide paş, wê Xwedê hezar xirabiyan di dinya û axretê da jê bide paş. Lê eger xwe jê ra şahî bike û xeybetê jê nede paş, qas gunehê xeybetker ji wî ra jî heye».

Allameyê alimên muteexir, lêkolê mezin û xweyê ilm û amel, Şêx Ensarî Xwedê jê razî dibêje: "We xuya dike ku red li vêderê, ne bi me'na nehykirina ji xeybetê ye, belkî mexsed ew e, ku bi gotinên munasib alîkariya wî ye, yê xeybeta wî hatıye kirin; mesela: Eger kêmasiya dinyewî ye, bi vî awayî alî wî bike ku: Eyb û kêmasî ew e ku, Xwedê Teala kêmasî hesab bike, wek gunehan, ku mezintir e, ji xeybeta te der heqê wî da, ku ji xwe Xwedê ew kêmasî hesab nekiriye. Lê eger xeybet dînî be, bila ewî li wê yekê hişyar bike ku ji guneh derkeve. Û eger tişteke ku jê nayê paşde dan, bi vî awayî alî wî bike ku: Carna bawerdar guneh jê çêdibin, nexwe ya baş ew e, ku daxwaza lêborînê jê ra bêt kirin, ne ku nebaşiya wî bêt gotin. Belkî nebaşî gotina te li bal Xwedê mezintir be ji gunehê wî". Carna jî guhderê xeybetê ne hema redda xeybetê nake, ku ferz e, belkî gel wî re dikeve û bi car û bar gotina: "Eceb, eceb", an eger ji duristan tê hesabê, bi car car gotina: "Subhanellah" û "estexfirullah" û gotinên wereng ku wesîlên şeytanî ne, xeybetker li xeybetê germ dike. Çêdibe bêt gotin hedîsa ku gotî: "Gunehê guhdêr heftêh beranberê gunehê xeybetker e", der heqê van kesa da be. Xwedê me jê biparêze.

**Tetmîm: Gotina Şehîdê Duwê**

Seydayê biqîmet û lêkolê hêjayî, Seîdê şehîdê (Xwedê jê razî) gotinek heye ku pê wê em ê gotina xwe jî bi dûmahî bînin. Dibêje:

"Ji pîstirîn qismên xeybetê, ew xeybet e, ku hinekên ehlê riyayê di şiklê ehlê ilmê da dikin. Çiko ew di şiklê ehlê selah û teqwayê da mexseda xwe didin fêhmê. Ew, xeybetê dikin û we nîşan didin ku em ne xeybetker in. Lê nizanin ku du karên pîs di xwe da kom kirine: Yek riya û ya dî xeybet. Wek vê ku behsa yekî li bal mirov bêtkirin û ew bêje: Hemd ji Xwedê ra ku ez ne li pey mezinahiyê me; an ez ne ji dinyaheza me; an filan sifet di min da nîne; an bêje: Xwedê me bêheya neke; an Xwedê tewfîqê ji me negire. An Xwedê me ji filan karî biparêze. Carna hema gotina: Hemd ji Xwedê ra, dibe xeybet, eger pê wê kêmasiya kesekî bêt fêhmê,

lê xeybeteke ku di şiklê ehlê selahê da qewimiye. Evî xwestiye ku bi awayek riyayî xeybetê bike û dixwaze kêmasiyê ji xwe dûr bike, di halekî da ku kêmasî di wî bi xwe da heye û belkî hê ji wê mezintir di wî da heye. Yek ji rêkên xeybetê ew e, ku carna dixwaze xeybeta kesekî bike, lê di serî da pesnê wî dide, mesela dibêje: Filan kes çi wez' û halek baş heye! Kêmasiyê naxe îbadetan, lê ji ber bêhntengiyê ku em hemû wereng in, di îbadet da sistiyê dike. Ew xirabiya xwe dibêje, lê mexsed xirabiya wî ye! Û dixwaze pesnê xwe bide lê pê xirabî gotina xwe ku xwe wek ehlê selahê nîşan bide. Evî jî sê pîsatî di xwe da kom kirine: Xeybet, riya û tezkiya nefsê. Û goman dike ku ji saliha ye û xwe ji xeybetê paşda dide! Ev cahil û nezanen ku mijûlê ilm û amel in. Çiko xwe di rêkê da qahîm nekirine şeytan bi wan dileyize û bi hîle pîlên xwe, wê amelên wan pûç bike û li wan bikene.

Ji vê pêkê ye kesê dema di civatekî da xeybetek têkirin û hineka guhê wan ne lê ye û ew dixwaze berê wan bide xeybetê, te dît got: "Subhanellah çiqas ecêb e!" Evê he zikrê Xwedê dike wesîla pêkhatina pîsatî û xirabiya xwe, gel vê yekê jî bi vî zikrî mineta xwe li Xwedê dike. Ev hema cehl û nezaniyê ye.

Ji vê pêkê ye eva he ku bêje: "Filan kes an filan heval filan tişt bi serê wî da hat an filan kar kir, Xwedê me û wî efû ke". Ev jî xeybetê dike, lê bi dua û dilpêveman û dostîniyê. Xwedê hay ji xubsa [qirêja] wî ya navdeyî û xirabiya niyeta wî heye. Û ew, ji ber nezaniya xwe nizane ku eşkere xeybetê dike û pirtir xezeba Xwedê ser wî ye.

Ji qismên xefî yên xeybetê, guhdana wê ye bi awayê ecêbgirtî. Çiko ew, xwe dihêle ecêbmayî da xeybetker li xeybetê germ bibe. Mesela dibêje: "Ev xeberdan ji min ra gelek ecêb e. Heta niha min nebihîstibû! Min nedizanî filanî jî van karan dike!". Ew dixwaze bi van xeberdana alî xeybetker bike û bi awayekî jê bixwaze ku pirtir beje. Halhale tesdîqa xeybetê xeybet e û guhdana wê, belkî bêdengiya di wextê bihîstinê da jî xeybet e.

Car heye hinek tişt ser xeybetê ve zêde dibin û pîsatî û kirêtî û ezabê wê pirtir dikin, wek vê ku xeybetker li berahiyayê xeybeta wî dike, da dostî û hezkirinê ji xwe bixweyhêne û pesnê wî bide. Eva he ji meratibên nifaq û durûyî û duzimaniyê ye, ku di hedîsan da gelek dijwar pîsatiya wê hatiye gotin. Çawa ku Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: "Kesê bi durû û duzimananan raberê musilmana bibe, roja qiyametê bi duzimanên ji agir, hazir dibe".

Eva he şiklê vî amelê pîs û netîca nifaqê di alema axretê da ye. Ji ber xirabiya ziman û nefsa xwe ya emmare hana xwe ji Xwedê ra dibim. Û di serî û xilasekê da hemd û pesn ji Xwedê ra bin.

## HEDÎSA BÎSTÊ

بالسّند المتّصل إلى الشّيخ الثّقة الجليل، محمّد بن يعقوب الكلينى، قدّس سرّه، عن عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن القاسم بن محمّد، عن المنقريّ، عن سفيان بن عيينة، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، فى قول الله تعالى: «لِيَبْلُوَكُمْ أَيُّكُم أَحْسَنُ عَمَلاً.» قال:

**«لَيس يَعنى أَكثرَكُم عَملاً، و لكن أَصْوَبَكمْ عملاً. و إنّما الإصابةُ خَشْيَةُ الله و النِّيّةُ الصادقةُ و الخَشْيَةُ.»**

**ثمّ قال: الإبْقاءُ علي العملِ حتّي يخلص أشدُّ من العملِ. و العَمَلُ الخالصُ، الّذى لا تُريدُ أنْ يَحْمِدَك عليه أَحَدٌ إلاّ الله تعالى، و النّيّةُ أفْضَلُ منَ العملِ. ألَا، و إنّ النّيّةَ هي العملُ. ثمّ تَلا قولَه عزّ و جلّ: «قُلْ كُلٌّ يَعْمَلُ عَلي شاكِلَتِهِ» يعنى علي نيّتِه.**

Sufyan ji Îmam Sadiq (a.s) der heqê vê ayetê da «Da hewe biceribîne ka kî ji hewe baştir amel dike»[1] neqil dike ku got: «Mexsed jê ne ev e, ku pir amel bikin; belkî mexsed ev e ku, baştir amel bikin. Ev baştiriya he jî tirs û xeşiyeta Xwedê û niyeta durista digel tirsê ye». Paşê got: «Hay jê mana amel heta xalis bibe zehmetir e ji kar û amel bi xwe. Amel û karê xalis jî ew e, ku tu nexwazî ji Xwedê pê ve kes dî ji ber wê, pesnê te bide û medhê te bike. Niyet jî baştir e ji amel; heyhê! Niyet hema amel e», pey ra ayet xwend ku: «Bêje her kes bi şiklê xwe amel dike»[2] yanî gora niyeta xwe.

---

1- Mulk / 2

2- Îsra / 84

## Şîrove:

Bela, bi me'na îmtihan û tecrubê ye. Çawa ku Cewherî jî gotiye. «Eyyukum», mef'ûlê duwê yê «liyebluwekum»ê ye. Û gora gotina Meclisî, me'na ilm di xwe da girtiye, lê ev nedurist e; çiko «eyy» istifhamî ye û fiîlê ji amel paşda dide. Ya durist ew e ku rista: «Eyyukum ehsenu amela», mubteda û xeber e û di me'na mef'ûlê fiîla «belwa»yê da ye. Û eger «eyy» mewsûle be, ji gotina Meclisî ra rêyek peyda dibe, lê ya eşkeretir ew e, ku istifhamî be.

Sewab, bervajiyê xeta û xeletiyê ye. (Yanî durist û rast).

Xeşiyeta duwê, ser gotina Meclisî, di hinek nusxan da nîne.

Ibqaa ser amel bi me'na hayjêmana wê ye.

Şakile, bi me'na rêk, şikl, rex û alî ye. Di Qamûsê da ev me'ne û me'na, niyet jî jê ra hatine gotin.

Bi hezkirina Xwedê em ê di çend vebiran da qasê lazim der heqê vê hedîsa şerîf da biaxivin.

### Vebir

«Li yebluwekum», îşare ye bal gotina Xwedê ve ku kerem dike: «Tebareke ellezî biyedihil mulk... Pir xêr û bereket e yê xweyê hikûmetê û her tiştî dikare bike; ewê mirin û saxî afirandî, da hewe biceribîne ka kî ji hewe di kar û amel da baştir e».

Muheqiqê Meclisî (q.s) dibêje: “Ev ayet delalet e li ser wê yekê ku: Mirin, ji tiştên wucûdî ye. Û mexsed ji wê an ew mirin e, ku ser jiyanê da tê an ‘edema eslî ye”.

Hingê ayet delîl e ser wê ku xelq bi xwe bi wê ve girêdayî be. Lê eger bi ‘erez girêdayê bi wê ve be, ji vê gotinê ra nabe delîl, çawa ku ehlê lêkolînê dibêjin. Eger delalet jî bike îhtimala vê yekê ku mirin (mewt) ‘edemê eslî be, ne di cih da ye. Çiko wucûdî bûna ‘edemê eslî, kombûna du neqîza ye. ji aliye dî ve jî eva he ku mirin bi me'na ‘edemê eslî bêt zanîn, di zatê xwe da tiştek durist nayê dîtin.

Ya durist, bi gotinek kurt eger em bêjin, ev e ku: Mirin guhaztina ji cihê eşkere (dinyayê) ye bi alema batinî ya melekût. An: Mirin saxiya melekûtî ya duwê ye, piştî saxiya serekî ya mulkî. Û bi her şiklî be, karek wucûdî ye. Û belkî temamtir e ji wucûda mulkî. Çiko saxiya mulkî ya dinyewî tevlî mewadên tebî'î yê mirî ye û saxiya wan 'erezê zayil e, bervajiyê saxiya zatî ya melekûtî ku li wêderê serxwebûn ji nefsê ra peyda dibe. Û ew cih, cihê jiyan û lazimiyên jiyanê ye û ebdanê misalî yê berzexî qiyamê sudûrî bi nefsê ve hene. Çawa ku di cihê munasibê xwe da hatiye nivîsîn. Hasil ev e, ku jiyana melekûtî [ku em jê ra dibêjin mirin, da li bihîseran giran neyê] girêdayî ye bi afirandin û çêkirinê ve û di bin qudreta zatê Xwedê da ye.

**Îşare bi çawaniya nisbeta îbtilaê bal Xwedê Teala ve**

Me'na ixtibar û îmtihan û çawaniya nisbeta wê bal Xwedayê ezîz û celîl ve, me di şiroveya hinek hedîsan da jê xeber da. Bi awayek wereng ku nezanî neyê nisbetdan bal zatê eqdes ve. Û kurtê wê em ê li vêderê bînin: Ew jî ev e, ku nefsên mirov di serekiya çêkirinê da ji qabiliyet û îstidadê pê ve, ne tiştek dî ye û çi fiîliyeta bextreşî û bexteweriyê têda nîne, lê piştî ku dikeve di îxtiyara bizavên tebî'î yên cewherî û fiîliyên îxtiyarî da, îstidad û qabiliyet tê guhaztin bi fiîl, û ji hev diqetin. Nexwe bi vî awayî ji hev cudabûna seîd û şeqî, baş û nebaş di vê jiyana mulkî [dinyayî] da çêdibe û pêk tê. Û nihayeta afirandina jînê ji hev cudabûn û ceribandina nefsa ye, vê gorekê kifş bû ku xelk gereke bêt ceribandin. Lê vêca afirandina mirinê jî dexîl e, di vê cudahiyê da û belkî piça paşîn ya illetê ye, çiko kêşeka cudabûnê, şiklê paşî ne ku, mirov pê wî şiklî întiqalê cihê dî dibe. Yanî mîzana îmtiyaz û cudabûnê şikl û sûretê paşîn yê melekûtî ye. Û dest ve hatina wan pê bizavên cewherî û îxtiyarî yên dinyayî yê mulkiye ye. Nexwe teretuba îmtihan û ceribandinê ji çêkirina mewt û heyatê kifş bû. Û hingê vê der heqê da bi temamî mirov ji işkalê xilas dibe ku ilmê «zatî» yê pêş çêkirinê da û ilmê «fiîlî» yê di wextê çêkirinê da ronahî bibe, ew jî ji hewsela vê kitêbê der e.

Eva he ku gotî: «Eyyukum ehsenu amela», û îmtihan û ceribandin bi baştiriyê ve girêdayî, gora vê hedîsa şerîf, ew jî dizivirê bal vê me'nê ve ku hat gotin, çiko «ehsen» bi «esweb»ê tefsîr kiriye û «esweb» jî bi aliyê «xeşiyet» û «niyeta sadiq û durist» ve daye, evên he jî sûretên batinî yên nefsê û ji hevcudakerên heqîqî yên ruha ne. An jî mezahirên îmtiyazên xeybiye yên zatiye ne. Belkî jî gorekî wê esera ku di dil û batin da datînin, ji amelên zahirî ne, çawa ku pêşda hat gotin. Ev îmtiyaz jî pê amelan tên cih, nexwe tecruba amelan, tecrube û îmtihana zatiya ye jî.

Eger bê melhezeya me'nekirina îmam jî, em ayetê gorekî zahir me'ne bikin, dîsa dibe ewa me gotî. Çiko hema peydabûn bi xwe di dinyayê da û afirandina mirin û saxiyê dibe sebebê ji hev vebûna amelên baş û xirab: Afirandina saxiyê ji xwe kifş e, ya mirinê jî ji ber wê ye. Çiko dema mirov zane ev dinya namînê û mirov wê ji vê dinyayê derkeve û biçê cihek dî, eva he dibe sebeb ku kar û amelê mirov ferq bike û îmtiyaz bikevitê.

### Vebir: Xeşiyet û niyeta rast dibe sebebê duristiya kar û amel

Bizane di vê hedîsa şerîf da duristî û başiya amel, bi du stûnên hêjayî ve girêdaye û ev herdu esl û stûn kirine mîzana kemal û temamiya amelan: Yek, tirs û xeşiyeta ji Xwedê Teala, ya dî niyeta durist û îradeya paqij. Û gereke li vêderê em girêdana van du eslan gel temambûna amel û duristiya wê ronahî bikin. Gotin vê der heqê da ev e ku:

Tirsa ji Xwedê Teala dibe sebebê teqwatî û xweparêziya nefsan, hema ew jî dibe sebeb ku esera amelan li ser xwe pirtir ragire û qebûl bike. Dirêjiya vê gotinê ew e, ya me di şiroveya hinek hedîsên borî da gotî ku: Heryek ji kar û amelên qenc an xirab eserekî di nefsê da datîne, vêca eger ew kar û amel ji sinx û qismê îbadetan be, esera wê ew e, ku hêz û quwayên tebî'î di beranberê hêza aqlî da bişikîne û aliyê melekûta nefsî ser ya mulkî bêxe û tebîet teslîmê ruhaniyetê bike. Heta bigehê wê derecê ku ceze-

batên ruhî çêbin û bigehê mexseda eslî. Û heçî amelê evê tesîrê pirtir bike û baştir evê xizmetê bi cih bîne, ew duristir e û pirtir pê wê gihana mexsedê çêdibe û heçî tişta di vê eserê da kartêkertir be, barê duristiya amel ser pişta wê ye. Zêdetirê caran eva he mîzan û kêşek e, ji kar û amelan ra. Mirov dikare hedîsa meşhûra: «Baştirînê karan dijwartirînê wa ye» ser vê nuktê biherikîne û carî bike.

Piştî vê pêşekiyê gereke bêt zanîn ku teqwatî, nefsê paqij û temîz dike ji qirêj û reşatiyan. Helbet eger sefha dil ji guneh û reşatiyê vala be, wê karên qenc pirtir eserê danin û mirov wê baştir bigehê mexsedê û remz û raza îbadet ku serxistina melekûtê ye li ser mulk û qewîkirina îradeya nefsê ye, wê baştir cih bigire. Nexwe xeşiyeta ji Xwedê Teala ku eserek temam di parastina nefsê da heye, yek ji amil û sebebên girîng e, di duristkirina nefsê da. Gereke yek ji wan tişta bêt hesabê ku mudaxele heye di duristî, qencî û kemala amelan da. Çiko teqwa digel wê yekê ku bi xwe ji duristkerên nefsê ye, eser heye di amelên qelbî û qalibî yên mirov da û dibe sebebê qebûlî ya wan. Çawa ku Xwedayê Teala dibêje: «Xwedê ji ehlê teqwayê tenê qebûl dike».

Amil û sebebê duwê yê duristî û kemala kar û amelan ku di heqîqet da şûna quweya faile da ye, (çawa ku xeşiyet û teqwa ya ji wê tê dest, şûna şertên tesîrê ye û di heqîqet da tesfiya qabil dike û pêşîgir û mani'an radike) niyeta durist û îradeya paqij e, ku kemal û kêmasî, duristî û neduristiya îbadetan bi wê ve girêdayî ye û çiqas îbadet ji şêlûtiya niyetê dûrtir û pak û paqijtir û xwerîtir bin, wê gorekê kamiltir in. Û tiştek di îbadetan da qasî niyet û paqijî ya wê nîne. Çiko nisbeta niyetê ji îbadetan ra wek nisbeta ruh ji bedenê ra û nefsê ji cesedê ra ye; wek çawa ew ji meqamê mulkê nefsê û bedenê çêdibin û niyet û ruhê wan ji aliyê batinê nefsê û meqamê dil peyda dibe [û qet çi îbadetek bê niyeta xalis û ne dûrê ji riya û şirkê, li dergahê îlahî nayê qebûlkirin] ew riya ya ku feqîhan (Xwedê ji wan razî) gotî sebebê betaliyê ye û zahirê wê jî nehatiye cih. Lê eger ne xwerî be, her çend bi hesebê

eşkereyê şerî'etê û hukmê fiqhî durist e, tê cih. Lê bi hesebê batinê şer'ê û heqîqet û remz û raza îbadet, nedurist e û li dergahê qudsê îlahî nayê qebûlkirin. Nexwe mulazime nîne navbeyna duristî ya îbadet û qebûlbûna wê da. Çawa ku di exbaran da jî ev gotin gelek hatiye.

Te'rîfa temam ya şirka di îbadet da, ku hemû aliyên wê ber xwe digire, ew e, ku mirov razîbûna xêncî ji Xwedê bêxe nav ra. Çi razîbûna wî bi xwe, çi jî razîbûna yên dî. Eva he jê der ku razîbûna xêncî ji wî ji xelkê be; eger razîbûna wî bi xwe be, ev şirka xefî ya batinî ye, ku di nezera ehlê marîfetê da betal e. Û tiştek nayê hesabê û li bal Xwedê nayê qebûlkirin. Mesela: Eger kesek tehecudê bike ji zêdebûna rizq û berfirehiya jiyanê ra, an ji def'a bela ra sedeqê bide, an ji zêdebûna mal ra zekatê bide, yanî van kara ji Xwedê ra bike û ji qenciya wî eva tişta jî bixwaze, her çend durist û muczî ye û şertên şer'î yên van esera jî tê cih; lêbelê ne îbadetê Heq Teala ye û niyeta sadiq û îrada xalis gel wê nîne, belkî ev îbadet, ji avakirina dinyayê ra û gihana mexsedên dinyayî ye. Nexwe karê wî ne musab e. Her wekî eger ji tirsa dojehê û çûna bihiştê ra îbadet bêt kirin, dîsa xwerî û xalis ji Xwedê ra nîne û niyetek sadiq vê ra nîne. Belkî jî bêt gotin ev îbadet xwerî û xalis tenê ji nefsê û şeytan ra ye û mirovên ku bi vî awayî îbadet dikin, qet razîbûna Xwedê di wan da nîne, heta ku bêt gotin tiştek dî têda kiriye şirîk, belkî hema pût û senemê mezin perestiye. Ma ka pût û seneman, putê nefsa hewe ye.

Xwedayê Teala îbadetên bi vî awayî ji ber zeîfî û lawaziya me û rehmet û kerema xwe ya zêde di derecekî da qebûl kiriye. Yanî hinek eser jê ra danîne û eger mirov şertên wan yên zahirî û îqbala qelb û haziriya dil û şertên qebûliya wan bi cih bîne, ew eser hemû wê pê ve bên û hemû soz û we'de wê bên cih.

Ev halê îbadetê van ebd û bendan. Lê vêca îbadetê yên azade û hur, ku îbadetê wan ji bona hezkirin û huba Heq Teala û gihana zatê muqedes pêk tê, ne tirsa ji dojehê û ne şewqa bihiştê ewa ji

wê ra radike, meqamê yekê yê welî û azaya ye. Wan meqam û derecên dî jî hene ku evder ne cihê gotina wa ye. Çiqas ku berê nefsê li îbadet û abid û me'bûd be, ne xwerî û xalis e. Gereke dil ji xeyrî Xwedê vala bibe û ji Heq Teala pê ve têda nebe heta xalis bibe. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatî:

Sufyanê kurê Uyeyne dibêje: Min der heqê ayeta behsa roja qiyametê da ji Îmam Sadiq (a.s) pirsiyar kir. Ev ayet ku dibêje: «Roja ku qet mal û ewlad feydê nadin mirov, ya feydê dide ew e, ku mirov bi dilê salim ve bêt bal Xwedê»(1) kerem kir: «Qelbê selîm, ew e di halekî da liqayê Xwedayê xwe bibe ku ji Xwedê pê ve di dilê wî da nebe». Her weha got: «Heçî dilê şirk û şik têda hebe ew avêtî ye. Û ji ber wê yekê zuhda di dinyayê da xwestiye ta dilê wan ji axretê ra vala bibe».

Helbet dilên xêncî ji Xwedê rêkek têda hebin û ketibin şirk û şikê, çi şirka xefî û veşartî û çi ya celî û ronahî, ew di mehzera qudsa îlahî da ji îtibar ketiye. Û îtimada li ser esbaban û meyla bal xêncî Xwedê ve ji şirka xefî ye. Heta ku di riwayeta da hatiye: «Cih bi cihkirina gostîrkê ji bîrmana tiştekî ra ji şirka xefî ye». Û eger xêncî ji Xwedê tiştek di dil da hebe ji şirka xefî ye. Û îxlasa niyetê ew e, ku mirov ji Heq pê ve ji sekingeha wî zatê muqedes [qelb û dil] derîne. Çawa ku şikê jî derece hene, hinek şika xefî û hinek şika celî hesab dibin ku ji zeîfiya yeqînê û kêmasiya baweriyê çêdibin. Pala ku ser xêncî Xwedê bi her awayî be, ji lawaziya yeqînê û kêmasiya îmanê ye. Çawa ku tezelzul jî wereng e. Û merteba ixfaa şikê, haletê telwînê û nerawestana bi tewhîdê ye, nexwe tewhîda heqîqî avêtina îzafat û te’eyyunat û zêdahiya ye, heta bi zêdahiyên esmaî û sifetî jî, rawestana di wê da jî, xilasbûna ji şikê ye. Dile salim - qelbê selîm jî dil û qelbeke ku vala be ji hemû qismên şirk û şikê.

Di vê hedîsa şerîf da ku kerem kir «zuhd xwestiye...» îşare ye bal wê ve ku nihayeta zuhda di dinyayê da ew e, kêm kêm berê dil jê vebe û jê bireve û berê wê bikeve mexsed û xwesta heqîqî.

---

1- Şu'era / 88-89

Ji destpêka hedîsê jî tê fêhmê ku mexsed ji axretê xilaseka daira wucûdê ye. Nexwe dinya temamê daira eşkere ye û lazimê zuhda di wê da valahiya dil e, ji xêncî Heq Teala. Nexwe heçî kesê xêncî ji Xwedê di dilê wî da hebe û berê wî li exyara be, çi ji tiştên mulkî û maddî û çi me'newî, çi jî uxrewî an kemalat, welhasil çi ya ji Xwedê pê ve, ew ji ehlê dinyayê ye û ne zahid di dinyayê da; ew mehrûm e, ji axreta heqîqî û bihişta liqayê ku bilindtirîn merteba bihiştê ye. Her çend di derecên dî da behremend be ji kemalên me'newî û mertebên bilindên bihiştî. Çawa ku ehlê dinyayê di mal û meqamên dinyayî da muxtelif in.

**Vebir: Der heqê îxlasê da ye**

Bi çend awayan ji îxlasê xeberdane û em ê bi kurtî behsê ji wan xeberdana bikin ku di nav ehlê sulûk û mearifan da heye.

Arifê hekîmê salik Xace Abdullahê Ensarî dibêje: “Îxlas zelal kirina amela ye, ji hemû şêlûtiyan. Ev hem şêlûtiya bi razîbûna xwe digire ber, hem jî şêlûtiya bi razîbûna xelkên dî”.

Ji seydayê hêjayî, Bihaî neqil kirine ku: “Ehlê dil çend te’rîf jê ra anîne, hineka gotiye: Paqij kirina amel e. Bi vî awayî ku ji Xwedê pê ve kesî behr jê nebe”. Eva he wek te’rîfa pêşda ye. Ev jî hatiye gotin: “Ew ê kar û amel dike ji ber amelê xwe ve, kirih û berjewendiyek di du cîhana da nexwaze. Ji xweyê Xeraibul Beyanê jî neqil bûye: “Muxlis ew in, yên bi awayekî îbadetê Xwedê bikin ku di bendetiyê da ne xwe bibînin ne jî alem û ehlê wê. Ji muşahida rubûbî ra ji hed û sînorê bendetiyê dernekevin”. Nexwe dema evd lezet û parên axê heta erş ji xwe avêtin, hingê bi rêka dînî ve çûye. Û ew rêkek ya bendetiyê ya wereng e, ku xalis be ji dîtina qewimîna bi wasita şuhûda ruhê cemala Reb. Eve ew dînê ku Xwedê ji xwe ra bijartî û gotî: «Heyhê, dînê xalis ji Xwedê ra ye...»[1]

1- Zumer / 3

Ji seydayê muheqiq Muhyiddînê Erebî[1] neqil e, ku gotiye: "Bizane dema dîn ji xeyriyet û xwexwaziyê paqij bû, hingê ji Xwedê ra ye. Çiko bi fenaya kullî ya te di zatê Heq da, êdî ji te ra zat û sifet û fiîl û rêçik namîne. Eger newebe, dîn bi awayek durist xalis nabe. Veca hingê ne ji Xwedê ra ye". Heta ku ubudiyet, xeyriyet û enaniyet hebe û behsa abid, me'bûd, îbadet û îxlas û dîn di holê da be, şêlûtiya xeyriyet û enaniyetê wê hebe. Eva he jî li bal erbabê mearifan şirk tê hesabê. Îbadetê ehlê îxlasê nexşê tecelliya mehbûb e û di dilê wan da ji zatê wahidê Heq pê ve tiştek dî tune. Di gel wê ku ufuqa «îmkan»ê bi «wucûb» ve girhaye û «tedelliya zatî» û «dunuwwa mutleq a heqîqî» ji wan ra peyda bûye û rusûmên xeyriyetê bi temamî rabûne, dîsa jî hemû wezîfeyên bendetî ya xwe bi cih tînin. Ubûdiyeta wan bi «rewiyye» û «tefekur» nîne, belkî bi tecelliyê ye. Çawa ku nimêja şeva mîraca Pêxember (s.a.a) îşare ye bal vê me'nayê ve.

**Vebir: Der heqê îxlasa piştî amelê da ye**

El-Îbqau alel 'emel... Ku di hedîsa şerîf da derbas bû, mirov hay dide ji wê yekê ra ku hay ji amelê ku dike hebe, çi di wextê kirinê da û çi paş hingê. Çiko çêdibe carna mirov di demê kirinê da baş û bêkêmasî bike, lêbelê piştî hingê bi behsa ji wê bikeve riyayê. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatî:

Îmam Baqir (a.s) dibêje: «Hayjêmana kar û amel, ji amel bi xwe zehmetir e». Rawî dibêje hayjêmana amel çi ye? Kerem dike:

---

1- Muhemmed bin Alî bin Muhemmedê Erebî (560-634 an 7 an 8) mezintirîn arifê qernê 7. Ew bi «Ibn Erebî, Muhyeddîn, Şêxê Ekber» meşhûr bûye. Eserên muhim yên wî ji kevinda cihê nêrîna ehlê tehqîqê bûye û dersa wê tê xwendin. Fêhmkirina kitêbên wî nexasima «Fusûs» gelek zehmet e û di her zemanekî da hinek taybet gihane fêhma wê. Dora 200 eseran hatiye nisbetdan bal wî ve ku muhimtirînê wan ev in: Futûhatê Mekkiyye, Fusûsul Hikem, Tecelliyatê Îlahiyye, Înşaud Dewair, tefsîra Quranê. Fusûs ji kitêbên muhim yên dersa îrfanê hesab dibe ku geleka ew haşiye û şerh kirine, yek ji wan jî Îmam Xumêynî ye.

«Kesek xêr û danekî ji Xwedayê wahidê bêşerîk ra dike (riya nav karê wî ra nîne). Veca ew amel jê ra xef tê nivîsîn û xêra dana xef jê ra tê nivîsîn, di pey ra behsa wê dike, vêca ew nivîsîn paqij dibe û jê ra xêra eşkereyê wê tê nivîsîn. Di pey ra dîsa jê xeber dide û behsa wê dike, vê carê pûç dibe û di şûnê da amelê riyayî jê ra tê nivîsîn».

Mirov, heta axirê omrê xwe qet ji xirabiya şeytan û nefsê ne êmin e. Bila goman neke ku eger amelek ji razîbûna Xwedê ra pêk anî û razîbûna xelkê tevlî nekir, êdî hatiye paraztin ji xirabiya nefsa xebîs. Eger hay jê nemînê çêdibe ku nefs ewî mecbûrê gotina wê bike, we heye carna bi îşare an kinaye behsa wê bike. Mesela tehecudên xwe bêxe çavê xelkê ra; binve binve behsa hewayê xweş an nexweşê beyanî û fecrê an munacat û banga hinekan bike û bi hîlên veşartî yên nefsê amelê xwe pûç bike û ji dereca îtibarê bêxe. Mirov gereke wek tebîb û doktorên dilovan hay ji wez' û halê xwe bimîne û hefsarê nefsa hêç û har bigire û bernede ku bi kêmek xefletê wê hefsar ji desta derê û mirov zelîl bibe. Di her hal û karî da gereke mirov ji ber şerê şeytan û nefsa emmare han û hawara xwe ji Xwedayê Teala ra bibe. «Bi rastî eger ne rehmeta Xwedayê min be, nefs pir fermana xirabiyê dide».[1]

Gereke bêt zanîn ku xaliskirina niyetê ji şirk û riya û xeyrê wê û hay jê man û dewama ser wê ji karên gelek zehmet û muhim e û belkî hinek ji derecên wê xêncî ji weliyên xalis ên Xwedê ra rêk nakeve. Çiko niyet ew e, ku mirov ji kar û amel ra radike û ew li pey xayetên paşî ne, çawa ev xayet jî li pey melekatên nefsanî ne ku batinê mirov pê wan çêbûye. Kesê ku hej meqam û riyasetê dike, ev hub û hezkirin meleka nefsanî ye û di nav ruhê wî da cih girtiye û xayeta mexseda wî gihana wê ye û karên dike li pey wê xayetê ye û tişta ewî têxe hereket û bizavê hema ew xwesta nefsanî ye û kar û amelên wî ji gihana wê mexsedê ra jê çêdibin. Heta ku ev hezkirin di dilê wî da heye kar û amelên wî nikarin xalis bibin.

---

1- Yûsuf / 53

Û kesê ku huba nefsê û xwexwazî meleke û pêkînerê nefsa wî ye, xayeta mexsedê û nihayeta xwesta wî gihana bayê dil û xweşiyên nefsanî ye û tişta wî têxe bizav û hereketê hema ev mexsed e. Çi karên wî ji gihana xwestên dinyayî ra bê çi jî xwestên axretî ra, wek dest ve anîna hûr û qesr û bihiştên pir nîmetên wê dinyayê. Belkî jî heta enaniyet û xwexwazî û xwebînî heye.

Eger ji dest ve anîna mearif û kemalên ruhî jî gavekî bavêje, ew ji xwe û nefsa xwe ra evî karî dike. Nexwe ew jî xwexwazî ye, ne Xwedêxazî. Û kifş e, ku xwexwazî û Xwedêxazî berhevê cihekî nabin. Eger ew, Xwedê bixwaze, ji xwe ra dixwaze û xayeta mexsedê û nihayeta xwestê, ew bi xwe û nefsa wî ye.

Eve kifş bû ku xaliskirina nefsê ji hemû awayên şirkê karek pir mezin e û ji her kesî nayê ewê bike û kemal û neqsa amelan bi kemal û noqsaniyeta ye. Çiko niyet şikl û sûretê fiîlî û layê melekûtî yê amel e, çawa ku me îşare kir balê ve. Û di hedîsa şerîf da jî îşare dike bal vê gotinê ve li wêderê ku dibêje: «Niyet baştir e, ji amel».

Niyet baştir e, ji amel, û niyet heqîqeta amel e. Eva he ne ji qismê mubalixê ye. Çawa ku hineka ew îhtimal daye, belkî heqîqet e. Çiko niyet şiklê kamilê amel û fesla muhesela wê ye û duristî û neduristî û kemal û kêmasiya amelan bi wê ye. Çawa ku yek amel carna mezinkirin e û carna sivik kirin û carna temam û carna naqis e û carna ji sinxê melekûtê e'la ye û şiklek sipehî heye. Carna jî ji melekûtê esfel e û şiklek bizdêner heye. Eşkereyê nimêja Alî kurê Ebûtalib (a.s) digel mêja filan minafiqî di şert û mercan da ferqek gel hev nînin. Lê yek pê wî amelî bi aliyê Xwedê ve bilind dibe û şikl û sûretê wê melekûtê e'la ye û yê dî pê wî amelî dikeve di dojehê da û şiklê wê melekûtê esfel e û ji ber reşatiya zêde wêne jê ra nînin. Bi çend tûtik nanê ceh ku ew binemala pak (selam li wa bin) di rêka Xwedê da didin. Xwedê çendîn ayetan der heqê wan da rê dike.[1] Cahil goman dike du sê

1- Dehr / 5-22

rojan birçîbûn û dana xwarina xwe ji feqîran ra, ewqas muhim e, halhale ev şikl û sûretê danê ji her kesî mumkin e çêbe û ne tiştek girîng e. Muhimiya wê di qesta xalis û niyeta durist da ye. Rûhê amel, qewî û letîf e û ji dilek selîm û zelal derketiye ku evqas muhim hatiye dîtin. Şiklê eşkere yê Resûlê Ekrem (s.a.a) û xelkê ferqek gel hev nebû. Lewmane dema Erebek xerîb bihata balê û ew hezret di nav komekî da rûniştî bûya, dipirsiya Pêxember kîjan ji hewe ye? Tişta ku Pêxember ji xelkê vediqetîne, ruhê qewî û letîfê wî serwerî ye, ne ku cismê wî yê mubarek û bedena wî ya şerîf. Û di ilmên aqliye da hatiye ku: "Tiştbûna tiştan bi şikl û sûretê wê ye, ne bi maddeya wê ye". Belkî tehdîda bi feslê heddê tam e û bi cins û feslê naqis e. Çiko ixtilata bi xerayib û ecaniban û nasandina bi munafiyê tiştê, zererê digehîne heqîqet û te'rîf û temamiyeta wê, madde û cins jî nisbet bi heqîqeta tiştê, ji xerayib û ecaniba ye. Çiko heqîqeta tiştan sûret û fesl e.

Nexwe hemû heqîqeta amelan hema şiklê amela û layê wan yê melekûtî ye, ku ew jî niyet e. Ji vê ronahîkirinê me'lûm bû ku di vê hedîsa şerîf da cara yekê der heqê sûretên amelan û mewadên wan da gotiye û kerem kiriye: «Cuz'ê sûrî seratir e ji cuz'ê maddî û niyet seratir e, ji amel; çawa ku em dibêjin ruh ser bedenê ra ye. Û lazimê vê gotinê ne ew e, ku em bêjin amelê bêniyet durist e û bedena bêruh beden e, belkî bi girêdana niyetê bi amel ve û ruh bi bedenê ve, ew dibe amel û ev dibe beden. Û ev hevîrê têkelbûyî ji niyet û amel, ruh û bedenê, cuz'ê sûrî yê melekûtî, her yekî seratir e, ji cuz'ê maddî yê mulkî. Û ev e, me'na hedîsa meşhûra: «Niyyetul mumin xeyrun min 'emelih» «Niyeta bawerdar baştir e, ji amelê wî». Bo cara duwê nêrîna wî hezretî li ser fenaya amel di niyetê da û mulk di melekût da û mezher di zahir da bûye û kerem kiriye: «Heyhê! Niyet hema amel e» û ji niyetê pê ve tiştek li holê nîne û amel hemû fanî ne di niyetan da û serxwebûnek ji xwe nînin. Piştî wê delîl ji gotina Xwedê anî ku: "Her kes gora şakila xwe amel dike û kiryar li pey şakila nefsê ne". Û şakila nefsê her çend heyeta batinî ya ruh û melekatên tevlî wê ne, lê niyat şakila zahirî ya nefsê ne. Çêdibe bêt gotin ku: Melekat

şakila ewilî ya nefsê û niyat şakila duwê ya nefsê ne û amel pey wan ra tên û tabi'ê wa ne, çawa ku Hezret gotî: "Şakil e niyet e". Û ji vêderê xuya dike ku rêka xaliskirina amelan ji hemû mertebên şirk, riya û xeyrî wan, hema tenê bi duristkirina nefsê û melekatên wê ve girêdayî ye. Ku ew serkaniya hemû duristiyan û jêdera hemû bilindbûn û kemalata ye. Çawa ku eger mirov huba dinyayê bi rêka ilm û amel ve ji dil derîne, êdî mexseda wî ya paşîn nabe dinya û amelên wî wê ji şirka mezintir ku ew e, berê ehlê dinyayê bikeftê û bi çavê mezinahiyê lê binhêrin, xalis û paqij bibe û celwet û xelwet û sir û 'elenê wî, wê wekhev lê be.

Eger bi riyazetên nefsanî bikare hezkirina nefsê ji dil derîne, çiqas ku dil ji xwexwaziyê vala bibe wê gorê wê bibe Xwedêxaz û kar û amelên wî, wê ji şirka xefî jî xalis bibe. Û çiqas hezkirina nefsê di dilê wî da hebe û mirov di mala tarî ya nefsê da bijî, ne musafirê bi aliyê Xwedê ve ye. Belkî ji wa ye, yên xwe di erdê da berdayîn. Û ewilîn gava ku di sefera rêwîngî ya bi aliyê Xwedê ve tê avêtin terka huba nefsê ye û ew e ku mirov enaniyet (xwebînî) û xwexwaziyê binpî bike, mîzan di seferê da ev e. Hinek dibêjin me'na ayeta şerîfe ku dibêje: «Kesê di rêka Xwedê da ji mala xwe derkeve û bi aliyê Xwedê û Pêxemberê wî da biçe, di pey ra mirin serda bêt, xêr û kirha wî ketiye ser Xwedê» (nisa/100), ev e: Kesê ji mala nefsê derkeve û bi seferek me'newî bi aliyê Heq Teala ve bikeve rê, vêca di pey ra fena ya tam gihayê, xêra wî ser Xwedê Teala ye. Û kifş e, ji vî rêwîngî ra ji muşahida zatê muqedes û ûsûla bi fena ya hezretê wî pê ve xêrek dî ne layiq e. Çawa ku gorekî gotina wan hatiye gotin:

"Ji dost pê ve kes di dilê me da cih nagire

Du alema bide dijmin, çiko ji me ra dost bes e".

## HEDÎSA BÎST Û YEKÊ

بالسّند المتّصل إلى حجّة الفرقة و إمامهم، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، كرّم الله وجهه، عن حميد بن زياد، عن الحسن بن محمّد بن سماعة، عن وهيب بن حفص، عن أبى بصير، عن أبى جعفر، عليه السلام، قال:

**«كان رسولُ الله، صلّي الله عليه و آله، عندَ عائشةَ لَيْلَتِها، فقالت: يا رسولَ الله لَمْ تُتْعِبْ نفسَك و قَد غَفَرَ الله لكَ مَا تَقَدَّمَ مِنْ ذَنْبِكَ و مَا تَأَخَّرَ؟ فقال: يا عائشةُ، أَلَا أَكُونُ عَبْدًا شَكُورا؟»**

**قال: و كان رسول الله، صلّي الله عليه و آله، يَقُوم عَلي أَطْرافِ أَصابِعِ رِجْلَيْهِ، فَأَنْزَلَ الله سبحانه و تعالى: «طه. ما أَنْزَلْنا عَلَيْكَ الْقُرْآنَ لِتَشقي.»**

Ebû Besîr ji Îmam Sadiq (a.s) neqil dike: "Şevekî ku Resûlê Xwedê (s.a.a) li mala xêzana xwe Aîşe bû, ewê gotê: Ey Resûlê Xwedê, çima tu xwe têxî zehmet û eziyetê, halhale Xwedê gunehên te yên borî û hêjbên hemû efû kirine. Ewî kerem kir: «Ey Aîşe, ma bila ez ne ji bendeyên şukurdar bim?».

Her weha Îmam Baqir (a.s) dibêje: "Resûlê Xwedê (s.a.a) ser aliyê tiliyên du pî yên xwe radiwesta, vêca Xwedê ev ayet hinart: «Taha * Ma enzelna 'eleykel qurane li teşqa»[1] «Taha, me Quran ser te da neşandiye ku tu bikevî zehmetê»".[2]

---

1- Taha / 1 û 2

2- Kafî, c. 2, p. 95, behsa "îman û kufr"ê, babetê "şukr"ê, hedîsa 6

**Şîrove:**

«Xeferellahu lek», îşare ye bal ayeta sûretê «Feth» ve ku kerem dike: «Înna fetehna leke fethen mubîna * Li yexfire lekellahu ma teqeddeme min zenbike we ma teexxer» «Me vekirin û fethek eşkere da te, da li gunehê te yê borî û hêjbê biborê».[1]

Bizane aliman (Xwedê ji wan razî be) bi çend awayan ayet me'ne kirine, da nebe dijê me'sûmiyeta Pêxember (s.a.a) li vir em ê hinek ji wê ya Allameyê Meclisî gêrayî bêjin, di pey ra jî em ê ji wê ya ehlê marîfetê bi hesebê mesleka xwe gotine, biaxivin. Rehmetiyê Meclisî dibêje: Şîeyan di tewîla vê ayetê da hinek gotin hene: Yek ew e, ku mexsed ji guneh, gunehê umetê ye ku wê bi şefaeta wî hezretî bêt efûkirin, nisbeta gunehên umetê ji wî hezretî ra jî ji ber wê girêdanê ye ku navbeyna wî hezretî û umetê da heye. Pişteka vê gotinê jî riwayeta Mufezzelê kurê Omer e, ji Îmam Sadiq (a.s) ku dibêje: «Wellahî, ewî qet gunehek jî nebûye, lê pê vê gotinê Xwedê li xwe girtiye ku gunehên borî û hêjbê yên peyrewên Alî (a.s) bibexşe».

Omerê kurê Yezîd jî ji Îmam Sadiq (a.s) neqil dike ku got: «Ewî çi guneh nebûn û qesta çi gunehan nekir. Lê Xwedayê Teala barê gunehên peyrewê wî lê kir û di pey ra jî lêborî û efû kir». Nivîser dibêje, di meşreba arifan da ji vê gotinê ra wechek wecîh heye ku jê xeberdana wê bi kurtî, ne bêfeyde ye. Gereke bêt zanîn ku di cihê xwe da hatiye nivîsîn: Eynê sabitê însanê kamil mezherê ismê e'zemê Xwedê ye, ku îmamê eîmmeyê esmaa ye. Û e'yanê mewcûdatên dî di bin sîbera însanê kamil da di ilm û alema e'yana da muqerer û di ‘eyn û alema tehequqê da mewcûd e. Nexwe e'yanê cemî'ê daira wucûdê mezherê ‘eynê însanê kamil e, di alema e'yana da; hemû mewcûdat mezahirê cemal û celala wî ne, di alema eşkerebûnê da. Ji ber vê çi neqsa ku di alema tehequqê da çêbe û heçî gunehê ji eva he ra derkeve çi gunehê tekwînî û çi teş-

---

1- Feth / 1 û 2

rî'î, bi hukmê zahir û mezher, bi awayê heqîqî û bê şaiba mecazê, mensûb e, bal zahir ve. Her çend: «Ma esabeke min seyyi'etin femin nefsik»[1] lê tu bêje: «Kullun min îndîllah».[2] Di exbaran da gelek îşare hene bo vê gotinê, kerem dike: «Nehnus sabiqûn el-axirûn. Û « Adem we min dunih tehte liwaî yewmel qiyame». Û «Ewwelu ma xeleqellah ruhî», an: «nûrî». Û «sebbihna fesebbe-hetil melaike, qeddisna feqeddesetil melaike».[3] Û «Lewlana ma erefellah». Û kerem dike: «Lewla lema xeleqtul eflak». Û «Nehnu wechullah». Di hedîsekî da jî hatiye ku Pêxember (s.a.a), şûna qurmê darê; û îmamên hîdayetê, şûna çiqên wê; peyrewên wan, şûna pelê darê da ne. Nexwe zînet û xemla şecere ya paka wîla-yetê bi mezahira ye û her yek ji mezahiran ku kêmasiyek bike-vitê, ew kêmasî dikeve di şecera pak da. Nexwe gunehê hemû mewcûdan gunehê welî yê mutleq e û Heq Teala bi rehmeta xwe ya temam û xufrana xwe ya berfireh rehmet li Nebiyê Ekrem kir û kerem dike: "Ew gunehên ji yên pêşiyê û ew gunehên hêj bên wê bikevin bin mexfireta tamme da û bi şefaeta te wê temamê daira tehequqê bigehê seadeta xwe ya temam"; «we axiru men yeşfe'erhemurrahimîn».[4]

Gorekî vê meslekê wek vê ayetê ye, ayeta: «Paşê Xwedayê te wê ewqas bide te vêca tu wê razî bibî».[5] Ku gotine ev umîddertirîn ayet e, di Quranê da.[6] Û gorekî vê pêveçûnê çêdibe ku mexsed ji gunehên pêşî, gunehên umetên pêşda bin, çiko umem cem'a umeta vî zatê pak e û de'weta hemû pêxemberan gazîkirina bi aliyê şerî'eta paşîn û mezahirê welî yê mutleq ve ye. Û Adem û yên di pey wî ra hemû ji pelên dara wîlayetê ne.

1- Nisa / 79: Nexweşiya ku bigehê te, ew ji te bixwe ye.

2- Nisa / 78: Hemû ji aliyê Xweda ve ye.

3- Uyûnu Exbarir Riza, c. 1, p. 263

4- Şefaetkerê paşîn, dilovantirînê dilovana ye. Ilmul Yeqîn, c. 2, p. 1086

5- Duha / 5

6- Mecmeul Beyan, tefsîra sûretê Duha / ayeta 5-ê.

Me'na duwê ew e, ku Seyyidê Murteza[1] (Xwedê jê razî) gotiye, ew jî ev e ku: «Zenb» mesder e. Û çêdibe hem bal fail û hem bal mef'ûl ve bêt îzafekirin, li vêderê îzafe bûye bal mef'ûl ve, yanî gunehê wan ku nedihêlan tu biçî Mekke û Mescidul Heramê. Û me'na mexfîretê gora vê tewîlê, ji navçûna dijminiya muşrika ye digel wî hezretî, me'ne dibe ev: Xwedê di wextê fethê da wê ewê dijminiyê ji nav bibe ewa ku pêşiya Fethê da hebûn û wê bi girtina Mekkê, halê pêşda biguherîne. Vêca di nêz da tu wê biçî di Mekkê da. Û ji ber vê ye ku xufran, kiriye kirha cîhadê û feydeya fethê.[2]

Seyyidê rehmetî gotiye: "Eger mexsed lêborîna gunehan be, me'neyek maqûl ji ayetê ra peyda nabe. Çiko lêborîna gunehan girêdanek bi fethê ve nîne û nabe feyda wê. Her weha «ma teqeddeme we ma teexer» çilê nayê mexsed ev be ku yanî ew nebaşiya di zemanê pêşda gel te û hevalên te kirine".

Me'na sisê ev e, yanî: Eger te pêşda û piştî vê, gunehek hebe jî, eve min tu bexşî û xefirandî, qeziyeya şertiye jî ne mustelzimê çêbûna herdu aliya ye.

Ya çarê ev e, ku mexsed ji guneh terka sunetan be. Çiko ewî hezretî ferz û wacib terk nekirine. Û ji ber seratî û bilindiya meqam û merteba wî hezretî çêdibe tişta ji xelkê ra ne guneh ji wî hezretî ra guneh bêt hesabê.

Ya pêncê ew e, ku ev ayet di cihê mezinkirin û qîmetdana wî hezretî da ye di meqamê husna xitamê da, wek çawa tu dibêjî: «Xeferellah lek».

---

1- Alî bin Husêyn bin Mûsa, meşhûr bûyî bi navê Seyyidê Murteza û 'Elemul Huda (355 - 436 h.q) ji zanayên mezinê Îslamê ye. Ew cami'ê ulûmên aqlî û neqlî û gelek hêja û berketî bûye, pir zana bûye di kelam, fiqh, usûl, tefsir, rical û edebiyata Erebî da. Ew riwayetê ji Şêxê Mufîd û Husêyn bin Aliyê Babiweyh digêre û geleka li balê xwendiye ku Şêxê Tûsî yek ji wa ye. Eserên ku ji wî dest me da heyîn gelek in ku: Emalî, Zerî'e ila Usûliş Şerî'e, Nasirîyyat, Întisar û Şafî ji wa ne.

2- Tenzîhul Enbiya, p. 115 - 118

Alî kurê Muhemmedê Cehm dibêje: “Ez di civata Memûn da bûm û Îmam Riza jî (a.s) li wêderê bû. Memûn gotê ey kurê Pêxember, ma tu nabêjî Pêxember parastî ne [me’sûm in]? Got: Belê. Memûn got: Nexwe me'na vê ayetê çi ye ku dibêje: «Da gunehên te yên pêşiyê û paşê efû bike?», ewî (a.s) kerem kir: «Li bal muşrikên Mekkê gunehê kesî qasî yê Resûlê Xwedê (s.a.a) ne mezin bû. Çiko ewa şûna Xwedê da ji sêsed û şêst pûtan ra îbadet dikiran. Veca dema Resûlê Xwedê bi kelîma îxlasê ve hat bal wan, ser wan giran bû û li wan nexweş hat û gotin: «Ma wî Xwedê hemû pêkve kirine Xwedêyek tenê, eva he tiştek ecêb e», «ev ji kîsê xwe çêkirinê pê ve ne tiştek dî ye».[1] Vêca dema Xwedê Teala Mekkê ser destê Pêxemberê xwe (s.a.a) da vegirtin, gotê: «Ey Muhemmed, bi rastî me feth û vegirtinek eşkere destê te ve anî, da Xwedê li gunehê te yên pêş û paş bibore. Ew gunehê te yê muşrikên ehlê Mekkê ji ber gazîkirina te bal tewhîdê ve ser te digotan; hem yên pêşda û hem yên piştî hingê». Çiko muşrikên Mekkê, hinek musilman bûn û hinek ji Mekkê derketin, ew ên di Mekkê da mayîn jî nikariyan di beranberê gaziya wî ya tewhîdî da bisekinin û înkar bikin. Vêca bi serketina wî li ser wan, ew gunehê wan ser wî digotan hat bexşîn û efûkirin. Vêca Memûn got: «Lillahî derruke ya eba Hesen».”

Nivîser dibêje, ev me'na şeşê ye ji ayetê ku hedîsa şerîf îşare kir balê ve. Hasilê wê jî ew e, ku mexsed ji guneh, ew guneh e ku li ser goman û fikra muşrikan ji wî hezretî ra (s.a.a) çêdikiran.

**Vebir: Me'na îrfanî ya ayeta pîroz**

Bizane gorekî meşreba ehlê îrfan û pêveçûna ehlê dil, ayeta pîroz me'neyek dî heye. Ji ronahîkirina wê ra lazim e, ji «sê futûhan» ku di nav wan da heye, bêt xeberdan.

Feth, gorekî melheza wan, vebûna deriyên mearif û ewarif û zanist û mukaşifa ye, ji layê Heq Teala ve, piştî ku ew derî li ber

---

1- Sad / 5 – 7

wan girtî bûn. Heta ku mirov di mala tarî û zulmanî ya nefsê da ye û girêdayî ye bi bayê dil ve, hemû deriyên mearif û mukaşifa li ber wî girtî ne, lê vêca dema bi hêza xebat û riyazetê û ronahî ya hîdayetê ji vî xaniyê tarî derket û berew menazilê nefsê ve pêlil çû, wê deriyê dil li ber wî bêt vekirin û nasîn û mearif wê bikevin dilê wî û wê bigehê meqamê qelb. Dibêjin vê fethê, fetha qerîb û nêzîk, çiko ev yekemîn feth û vegirtin û nêzîktirînê wa ye. Û dibêjin gotina Xwedê: «Nesrun minellah we fethun qerîb» «Arîkarî ji Xwedê ye û vegirtin nêzîk e»[1] îşare ye bal vê fethê ve. Helbet pê alîkariya Xwedê û nûra hîdayet û cezeba wî zatê muqedes, ev feth û fethên dî çêdibin û pêk tên. Û çiqas ku salik di cîhana dil da ye û rusûm û te'eyyunatên dil ser wî hukum dikin, deriyê esma û sifetan li ber wî girtî ye.

Piştî ku pê ronahîbûna esmaî û sifetî rusûmên cîhana dil û qelb fanî bûn û ewê ronahiyê sifetê dil û kemalên wê fena kirin «fetha mubîn» yanî vegirtina eşkere, çêdibe û deriyê esmaî û sifetî li ber wî vedibe û rusûmên nefsî yên pêş da û rusûmên qelbî yên hêjbên fanî û pûç dibin û di bin xeffariyet û settariyeta esmaî da mexfûr dibin û tên nixûmandin. Dibêjin ayeta pîroza: «Înna fetehna leke fethen mubîna * Li yexfire lekellahu ma teqeddeme min zenbike we ma teexxer - me serketin û fethek eşkere da te, da li gunehê te yê borî û hêjbê biborê», îşare ye bal vê fethê ve; me fetha eşkere ya esma û sifetan li ber te vekir da zunûbên nefsaniye yên pêş da û qelbiye yên paşê li bin xeffariyeta esmaê îlahî da bixefirin. Û ev feth, deriyê wîlayetê ye.

Çiqas ku salik li bin perda zêdahiya esmaî û te'eyyunatên sifetî da ye, deriyên tecelliyatên zatiye li ber wî girtî ne. Vêca dema tecelliyatên zatî yê ehediye li ber wî vebin û hemû xelqiye û emiye ji nav bibe û evd noqî bike di 'eynê cem' da, dibe «fetha mutleq û reha», û gunehê mutleq tê xefirandin. Û bi tecelliya ehedî gunehê zatî ku destpêka hemû guneha ye, tê veşartin û nixûman-

1- Sef / 13

din: «Hebûna te bi xwe guneheke ku gel tu gunehek nayê qiyaskirin». Û dibêjin îşare dike bal vê fethê ve, gotina pîroza Xwedê: «Îza cae nesrullah wel feth».[1]

Nexwe bi fetha qerîb deriyên mearifên qelbî vedibin û gunehên nefsiye tên xefirandin; û bi fetha mubîn deriyên wîlayet û tecellî yên îlahiye vedibin û mayî yên gunehên nefsî yên borî û gunehên qelbî yên hêjbên dixefirin; û bi fetha mutleq, tecelliyatên zatî yê ehedê çêdibin û gunehê mutleq yên zatî dixefirin.

Gereke ev jî bêt zanînin ku fetha qerîb û fetha mubîn ji hemû ewliya, enbiya û ehlê marîfetê ra heye, lê fetha mutleq tenê ya Pêxemberê Xatem e û eger ji hinek dî ra jî hebe tebe'î ye û bi navcîtî û şefaeta wî çêdibe.

Ji vê ronahîkirinê eşkere bû ku gunehan mertebe û derece hene û hinek ji wan hesenatên ebraran hesab dibin û hinek jî ji xullesa ra guneh hesab in. Û dibêjin ku Resûlê Ekrem (s.a.a) kerem kiriye: «Carna jengek dilê min digire, hema bi rastî ez rojê heftêh caran daxwaza lêborînê ji Xwedê dikim». Eva he çêdibe tewecuha bi zêdahiyê be, lê bi awayê xewatir bûye ku zûka ji nav çûye. Her weha di hedîsê da ye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) heta bîst û pênc caran îstixfar nekira ji tu civat û meclisek dernediketa.[2]

Ji vê hedîsê me'lûm dibe ku îstixfar ne ji wan gunehan tenê ra ye ku dijê îsmetê ne û «mexfiret» û «zenb - guneh» ne bi îstilaha orfa giştî ye. Nexwe evê ayeta şerîf munafat gel meqamê me'newî nîne û belkî muekkedê wê ye. Çiko ji lazimiyên sulûka me'newî û derbasbûna ji medarican û gihana kemala însanî lêborîna guneha ye û eva he ji lazimiyên meqamat û medarica ye. Çiko her tiştek di vê alemê da ji madda cismaniye çêbûye û hemû şuûnê mulkî, heywanî, beşerî û însanî têda heye; hinek bilquwwe û hinek bilfiîl, vê gorê eger bixwaze ji vê alemê biçe bi alemek dî û ji

---

1- Nesr / 1: Dema alîkariya Xwedê û (pê ve) vegirtin hat.

2- Mekarimul Exlaq, p. 313

wêderê jî sefer bike bi aliyê qurba mutleq ve, divê bi van medarican ve biçe û ji menazilên navincî koç bike, bigehê kîjan menzilê gereke gunehên menzila pêş da bixefirin û efû bibin heta ku li bin tecelliyatên zatiye yên ehediye da hemû guneh bixefirin û gunehê wucûdî ku destpêk û serçavka hemû guneha ye, di bin sîbera kibriyaî ya ehedî da bên veşartin. Eva he nihayeta 'urûca kemala mewcûd e. Û di vî meqamî da mewt û fenaya tam peyda dibe. Ji ber vê ye ku dema ayeta şerîfe ya: «Îza cae nesrullahi wel feth», nazil bû, Resûlê Ekrem (s.a.a) kerem kir: «Ev sûret xeberê ji mirina min dide».[1] «Wellahu e'lem».

**Vebir: Der heqê heqîqeta şukrê da ye**

Bizane ku şukir, bihadana qencî ya xweyê qencîhê ye, esera vê bihadanê di dil da bi awayekî xuya dike û bi ziman bi awayek dî û di fiîl û amel da jî bi awayek dîtir dixweyhê. Di dil da ji pêka xwe şikandin û xuşû' û muhabet û tirs... ê ye û bi ziman bi şiklê pesindan û medhkirinê ye. Û bi endaman bi guhdarbûnê ye ku endaman di xizmeta razîkirina xweyê qencîhê da têxe kar... Ji Raxib[2] neqil bûye ku dibêje: «Şukir, melhezekirina nîmetê û eşkerekirina wê ye". Hatiye gotin ku şukir meqlûbê "keşr"ê bi me'na kifşkirin e. Dijê wê jî "kufr" e, ku bi me'na ji bîr kirin û xefkirina nîmet û qencîhê ye. Dabbe yê şekûr ew e, ku bi qelewiya xwe qenciya xweyê xwe eşkere bike. Gotine ku eslê wê ji "'eyn şekra" ye; yanî ya hatî tijîkirin. Nexwe vê gorekê "şukir" tijîbûn ji bîranîna xweyê nîmet û qencîhê ye. Û şukir bi sê qisma ye:

Şukrê dil, ku melhezekirina qencîhê ye;

Şukrê bi ziman, ew jî pesindan û başî gotina xweyê qencîhê ye;

---

1- Mecmeul Beyan, tefsîra sûretê Nesr.

2- Raxibê Îsfehanî, Husêyn bin Muhemmed bin Mufezzel, wefatkiriyê sala 565 an 502-ê h.q, di luxet û şiîr û ulûmên Quranê da pir zana bûye. Gelek eser hene ku hinek ji wan ev in: el-Mufredat fî Xerîbil Quran, Zerî'e ila Mekarimiş Şerî'e, Tehqîqul Beyan fî Te'wîlil Quran.

Şukrê bi endamên dî, ew jî dagirtina şûna qencîhê ye, gora qenciya hatî kirin.

Arifê muheqiq Xace Ensarî dibêje: “Şukir naveke ji bona naskirina nîmetê. Çiko ew rêka nasîna xweyê nîmetê ye”. Şîrovekerê muheqiq dibêje: “Melhezekirina qenciyan ji xweyê qencîhê û zanîna vê yekê ku ew qencî ji wî ye, hema ew şukir bi xwe ye. Çawa ku ji hezretê Dawûd (a.s) riwayet bûye ku got: «Ey Xwedê! Ez çawa bikarim şukrê te bikim halhale şukir bi xwe nîmeteke û jê ra şukrek lazim e!» Xwedê Teala wehy jê ra şand ku ey Dawûd, dema tu pê hesayî û te zanî heçî başiya gel te hatî kirin, ji min e, te şukrê min kiriye”.

Nivîser dibêje: Ewa ji van muheqiqan hatiye neqilkirin musamihe ye. Çiko şukir, ne marîfeta bi dil û eşkerekirina bi ziman û amelkirina bi endama ye. Belkî haletek nefsanî ye, ku ew halet bi xwe esera marîfeta mun'im (xweyê qencî û nîmetê) û nîmetê û vê yekê ye ku ew nîmet ji mun'im e. Fêkiyê vî haletî jî amel û kiryarên qelbî û qalibî ne. Her çend hinek ji lêkolan gotinek nêzîkê vê gotine, lê ew jî ne valayê ji musamihê ye. Wiha gotiye: Bizane ku şukir, beranberkirina nîmetê ye bi gotin û kiryar û niyetê. Û ewê sê rukn hene:

Ya yekê, naskirina mun'im û sifetên layiqê wî; naskirina nîmetê bi awayekî ku bizane ew nîmet ji wî ye. Ev marîfet û zanîn temam nabe heta bizane ku hemû nîmetên xef û eşkere ji Xwedê Teala ne û zatê Heq Teala nîmetderê heqîqî ye û hemû wesait û wesîle teslîmê emrê wî û musexerê fermana wî ne.

Du: Haleteke ku fêkî û jêderê vê zanîn û marîfetê ye, ew jî xwe şikandin û şahîbûna bi nîmet û qencîhê ye ji ber vê yekê ku delîla berêxwedana mun'im e, ji wî ra. Û nîşan e, ji wê ra ku şahî nebe bi tiştekî xêncî ji wê ya dibe sebebê qurb û nêzîkiya Heq Teala.

Sê: Kar û ameleke ku fêkiyê vî haletî ye. Çiko dema ev halet di dil da peyda bû, haletê kêf û şahiyê di dil da ji bona amel peyda

dibe û ew amel girêdayî ye bi dil û ziman û endamên dî ve. Kar û amelê dil ew e, ku mezin ragirtin, pesn û medhê mun'im qest bike û fikir bike di eserên lutfa wî da û qest bike ku xêr û başiyê bike gel hemû evd û bendên wî. Kar û amelê ziman jî ew e, ku ewê mexsedê eşkere bike û bîne ser ziman û pesnê wî bide û medh û hemdê wî bike û tesbîh û tehlîlan bide û emrê bi qencîhê û nehya ji neqencîhê bike... Lê vêca kar û amelê endam û cewarihan ew e, ku nîmet û qencî yên zahir û eşkere û batin û xef di rêka guhdan, itaet û îbadet da bêxe kar û ji wan alîkariyê bigire, da ji neguhdarî û gunehan paş bikeve; mesela, çavan bikar bîne di mutal'a sin'etê Xwedê da û ji xwendina kitêba wî ra û bîranîna zanînên pêxemberan û wesiyan (a.s) her weha dîtir endam.

**Vebir: Der heqê çawaniya şukrê da ye**

Bizane ku şukrê nîmet û qenciyên xef û eşkere yên Heq Teala, ji wezîfên lazim yên bendetiyê ye, ku her kes gorekî karîna xwe gereke pê rabe. Her çend kes nikare bi temamî evê wezîfê pêk bîne. Nihayeta şukrê ew e, ku mirov bizane biheq jê nayê ku evê yekê bi temamî bike. Wek çawa xayeta bendetiyê jî ew e, ku pê bihese nikare bi temamî û çawa heqê wê, îbadet bike. Çawa ku Resûlê Xwedê (s.a.a) îqrar û îtiraf kiriye bi vê yekê. Ev di halekî da ye ku çi yek ji alemiyan wek wî hezretî şukir û îbadet nekiriye. Çiko kemal û neqsa şukrê, tabi'ê kemal û neqsa marifet a mun'im û nasîna nîmeta ye. Ji ber vê, kes nikarê wek çawa heq, şukir bike.

Hingê ebd dibe şekûr ku girêdana mexlûq bi Xwedê ve û berfirehiya rehmeta Xwedê ji serê peydabûnê heta binî û girêdana nîmetan digel hev û destpêk û xilaseka hebûnê wek çawa heyî bizane. Û zanîn û marîfeta wê ji xullesê ewliya ra jî ku eşref û seratirînê wan Nebiyê Xatem e, (s.a.a) çênabe. Û xelkên dî vêca ji xwe gelek mertebên wê û belkî pirtirîn û zêdetirîn mertebên wê li ber wan xef û veşartî û perdekirî ne. Belkî heta di dilê bende da, ev heqîqet cih negire ku: «la muesire fîl wucûd illellah» û hêca tarîtiya şirk û şikê di dilê wî da hebe, nikare wek çawa heqê şu-

kirkirinê, şukrê Xwedê bike. Kesê ku berê wî li esbaba ye û esera mewcûdata serbixwe hesab dike û nîmetan nazivirênê bal xweyê nîmetan ve, ewî nîmetên Heq Teala kufran kiriye. Ewî pût çêkirine û ewa xweyê eser dibîne. Carna kar û amelan nisbet dide bal xwe ve û xwe di karan da xweyê eser dibîne, carna tebîetê alema kewnê xweyê eser dibîne, car heye nisbeta nîmetan dide bal wî ve yê di eşkereyê da ewê dike û Xwedê bê eser zane di wê da û destê Xwedê girêdayî dibîne.[1] Destê teserufa Xwedê vekiriye û temamê daira tehequqê di heqîqet da ji wî ye û kesê dî nikare xwe têkel bike, ne hema ew, belkî hemû alema zuhûrê qudret û nîmeta wî ye û rehmeta wî her tişt ber xwe girtiye. Hemû nîmet ji wî ne û kesî nîmetek nîne heta bibe xweyê nîmetê. Hebûna alemê ji wî ye û kes ne xweyê hebûnê ye, heta tiştek bêt nisbet dan bal wî ve, lê çav kor û guh ker û dil perdekirî ne... [2]

Çiqas û heta kengê wê ev dilên me yên mirî kufrana nîmetên Heq Teala bikin û wê bi alem û şexsan ve girêdayî bin? Ev berêxwedan û girêdan, kufrana nîmetên Xwedê ne û veşartina rehmeta wî ye. Hema ji vê tê fêhmê ku şukir ji her kesî nayê, çawa ku Xwedê Teala kerem dike: «Hindik ji ebdên min pir şukurdar in».[3] Kêmtir bendeyek heye wek çawa heq, nîmetên Heq Teala nas bike û ji ber vê ye ku kêmtir in bendeyên ku şukir bikin.

Gereke bêt zanîn wek çawa zanîn û nasînên bendeyên Xwedê muxtelif in, şukrê wan jî muxtelif e. Û ji aliyê dî ve meratibê şukrê jî muxtelif e. Çiko şukir, başî gotina ji wan nîmeta ye ku mun'im dane, vêca eger ew nîmet ji nîmetên zahirî û eşkere bin, şukrek jê ra heye û eger ji pêka nîmetên batinî bin, şukrê wê bi awayek dî ye. Eger ji qismê mearif û ulûman be, şukrê wê bi awayekî ye. Eger ji pêka tecelliyatên esmaî be, bi awayek dî ye. Eger ji pêka tecelliyatên zatî yê ehediye bin, bi awayek dîtir e. Çiko hemû me-

---

1- Maide / 64 : Destê wan girêdayî be û ji ber ya gotine, laneta Xweda li wan be.

2- Mewlewî: Dîde mîxahem sebeb sûrax kon, ta huceb ra berkened ez bîx û bon.

3- Sebe / 13

ratibên nîmetan tenê ji hinek evdan ra berhev dibin, pêkanîna hemû mertebên şukrê jî ji bona kêmek ji ebd û bendan çêdibe. Û ew weliyên xulles in, ku cami'ê cemî'ê hezerat û berzexa berazxan in û parêzerê hemû mertebên zahirî û batinî ne. Ji ber vê, şukrê wan bi hemû zimanên zahirî û batinî û sirriye ye.

Her çend gotine ku şukir ji meqamatên giştî ye. Çiko heçweku bi şukirkirinê kirha mun'im bêt dayîn û eva he ji bêedebiyê hesab dibe. Lê eva he ne ji bo weliya ye, nexasima ew ên li serê serî da ku cami'ê hezeratan û parêzerên meqamê zêdahî û wehdetê ne. Ji ber vê, şêxê arif, Xaceyê Ensarî digel wê yekê ku gotiye: "Şukir ji meqamatên giştî ye", ev jî gotiye ku: "Dereca sisê ya şukrê, ew e ku ji cemala mun'im pê ve tiştekî nebîne û noqî bibe di muşahida cemala wî da. Û ewê sê meqam hene: Ya ewil ew e, ku ewî bibîne wek dîtina koleyek kêm û zelîl ku mezinê xwe dibîne. Ku di wî halî da hay ji xwe nîne û noqî bûye di edeba huzûrê da û bihayekî ji xwe ra nabîne. Û eger xwe kêm bibîne ew qenciya digel wî tê kirin mezin dihesibîne û di beranberê wê da xwe kêm dike û xwe layiqê wê qencîhê nizane. Ya duwê wek wê ye ku dost, dost bibîne, vêca di wî halî da xerqê cemala mehbûb bibe û çi tişta jê bibîne lê xweş be û lezetê bibe, gerçî dijwarî û zehmet têda hebe. Ya sisê ew e, ku ewî bi tefrîd û bê te'eyyunatên esmaî zatê wî muşahide bike. Û di vî halî da ji xwe û ji yên dî bêxeber bibe û ji zatê Heq pê ve meşhûdê wî nîne; ne nîmetekî dibîne û ne dijwariyekî".

Nexwe kifş bû ku destpêka meqamatan di her yek ji meqamatên salikan da bi awayek giştî ye û di dûmahîka meqamatan da taybetê xullesa û belkî kamilê xullesa ye.

#### Tekmîle: Der heqê başî û seratiya şukrê da ye gorekî hedîsan

Em ê vî meqamî bi neqla hinek hedîsên şukrê temam bikin:

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: "Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «Xêra şukirkerê ne bi rojî, wek xêra wî rojîgirî ye, ku ji Xwedê ra rojî girtî. Û kesê di halê selametiyê da şukir dike, xêra wî wek

ya wî kesî ye, ku bela ser da hatî, veca sebir dike. Û kesê Xwedê dayiyê û dewlemend ku şukir dike xêra wî wek yê nedarê qani' û razî ye bi qasê Xwedê dayiyê."

Abdullahê kurê Welîd dibêje: "Min ji hezretê Sadiq (a.s) guh lê bû ku got: «Sê tişt digel hebûna wan tiştek zererê naghîne: Dua di wextê dijwariyê da; daxwaza lêborîna ji gunehan û şukrê di demê nîmetê da»."

Ebû Besîr dibêje, hezretê Sadiq (a.s) got: «Çêdibe kesek ji hewe çend qurt av vexwê, vêca Xwedê pê wê bihiştê bidiyê». Di pey ra got: «Ew şerbikê avê datînê ser devê xwe û navê Xwedê tîne û vedixwe; di pey ra ewê ji xwe dûr dike di halekî da ku hêca dilê wî diçiyê. Veca hemdê Xwedê dike, pê ra dîsa vedixwê û pey ra radike û hemdê Xwedê dike; paşê dîsa vedixwe û hemdê Xwedê dike. Veca pê vê yekê Xwedê bihiştê jê ra ferz dike».

Hemdê Xwedê wek şukrê ye, çawa ku di riwayetan da hatî: «Kesê bêje: Hemd ji Xwedê ra, ewî şukrê Xwedê kiriye». Çawa ku di Kafiya şerîf da hatî û senedê digehîne Omerê kurê Yezîd ku dibêje, min ji hezretê Sadiq guh lê bû ku got: «Şukrê her nîmetekî her çend mezin be, ew e ku tu hemdê Xwedayê ezîz û celîl bikî».

Îmam Sadiq (a.s) kerem kiriye: «Şukrê nîmetê dûriya ji herama ye, şukrê temam jî ew e, mirov bêje: Hemd ji Xwedayê xweykerê aleman ra be».

Hemadê kurê Osman dibêje: "Wextekî Îmam Sadiq (a.s) ji mizgeftê derket û dît dewara wî ya siwariyê birine, vêca got: «Eger dewara min li min bêt zivirandin ez ê wek çawa heqê wê, şukrê Xwedê bikim». Demek pê ve çû ku lê zivirandin, vêca got: «Hemd ji Xwedê ra». Yekî gotê: Ez gorî, ma te negot ez ê şukir bikim û heqê şukrê bidimê? Kerem kir: «Ma te ji min nebihîst ku min got: Elhemdulillah?

Ji vê riwayetê tê fêhmê ku hemdê Xwedê ji baştirîn şiklên şukrê zimanî ye. Û ji eserên şukrê, zêdebûna nîmetê ye, çawa ku di

kitêba pîroz da hatî: «Lein şekertum le ezîdennekum».[1] Di Kafiya şerîf da jî hatiye ku sened digehê Îmam Sadiq (a.s), ewî kerem kiriye: «Kesê edayê şukrê bike, wê lê bêt zêdekirin, çiko Xwedê kerem dike: Eger hûn şukurdar bin ez ê li hewe zêde bikim û pirtir bidim hewe».

## Tetmîm

Bizane ku Aîşê goman kiribû sir, remz û raza îbadet hema ji ber tirsa ji ezab an ji navbirina xirabiya ye û hizr kiribû ku îbadetê Nebiyê Mukerrem jî (s.a.a) wek îbadetê hemû xelkê ye. Ji ber vê yekê eva he got ku: "Çima tu evqas xwe didî zehmetê û têxî tengî". Ev goman ji ber wê bû ku meqamê îbadet û ubûdiyetê nas nekiribû. Çiko bi meqamê pêxemberiyê nehesa bû, nizaniya ku îbadetê ebîd û kirêgirtiyan dûr e, ji meqamê qudsî yê wî hezretî. Û mezinahiya xweykerê alemê û şukrê nîmetên bêxilasekê Xwedayê Teala, rehetî ji wî hezretî girtibû û hedara wî nedihata. Çiko îbadetên welî yên xulles, nexşê tecelliyatên bêbinî yên mehbûb e, çawa ku di nimêja Mi'racê[2] da behs jê hat kirin. ewliyayên giranqedr (a.s) her çend noqî ne di cemal û celalê û fanî ne di sifet û zat da, lê digel wê çendê jî qet ji çi yek ji merhelên bendetiyê xafil nabin. Bizava wan ya bedenî tabi'ê hereket û bizava wan ya aşiqane ya ruhaniye ye, ew jî tabi'ê çawaniya eşkerebûna cemala mehbûb e. Lê digel yek wek Aîşeyê ji cewabek iqna'î pê ve nayê dan: Yek ji mertebên xwarî jê ra got, da hema vî qasî bizane ku îbadetê wî ne ji bona van tiştên denî û xar e.

### Vebir

Alî bin Îbrahîm di tefsîra xwe da riwayet kiriye ku Îmam Baqir û Îmam Sadiq (a.s) gotine: «Resûlê Xwedê (s.a.a) dema nimêj dikira radibûya ser tiliyên piyê (pêçî) xwe heta diwerimiyan. Veca

---

1- Îbrahîm / 7 : Eger hûn şukrê Min bikin, Ez ê li hewe zêde bikim.

2- Îleluş Şerayi, c. 2, p. 312. Hedîsa nimêja mîracê dirêj e û di wê da behsa zikrê di secdê da jî hatiye kirin.

Xwedayê Tebarek û Teala ayet nazil kir: «Taha», ku di luxetê ehlê «Tey» da yanî: «Ey Muhemmed»...

Ji Îmam Sadiq (a.s) neqil bûye ku «Taha» naveke ji navên Pêxember (s.a.a) û me'na wê ev e yanî: «Ey ew ê li pey heqiyê û rênîşanderêwê».[1]

Ji Ibn Abbas[2] û hinek dî neqil bûye ku: «Taha», yanî ey zilam. Û ji hinek ammeyan neqil e ku: «Ta», îşare ye bal teharet û paqijya dilê Pêxember (s.a.a) ku ji Xwedê pê ve têda nîne. Û «Ha», îşare ye bal hîdayet bûn û duristiya dilê wî ve ku bi aliyê Xwedê ve ye. Her weha hatiye gotin ku: «Ta», tereb û şahiya bihiştiyan û «Ha», hewan û bêqîmetiya dojehiya ye.[3] Tebersîyê[4] rehmetî jî ji Hesen neqil kiriye ku ew «Te» xwendiye, eger eva he durist be hingê me'na wê yanî: Te-il erze bi qedemîk - erdê bike bin piyê xwe da».

Welhasil der heqê herfên muqette'e yên serê sûretan da gotin gelek in û îxtilaf dijwar e. Lê ewa pirtir bawerî pê tê kirin ev e ku: Ji pêka remz û raza navbeyna muhib û mehbûb da ye û kesî ji wê remz û razê xeber nîne. Tiştên mufesiran gorekî goman û texmîna xwe gotîn jî zêdetir hema texmînên rût e; rûtên bêserkanî ne.

---

1- Me'aniyul Exbar, p. 22

2- Abdullah bin Abbas di zarokatiya xwe da digel Pêxember bûye û ji yar û hevalên hezretê Alî mîrê bawerdara ye; mufessirên meşhûrên Quranê ji tabi'îyan feqî yên wî tên hesabê. Ew bi navên jêrî hatiye nav kirin û pesnê wî hatine dayîn: Tercumanul Quran, Farisul Quran, Sebra ummetê, Reîsê mufessiran û seydayê wan.

3- Camiul Ehkam, Qurtubî, c. 11, p. 166

4- Ebû Alî, Fezl bin Hesenê Tebersî (472 - 548 h.q) mufessir û feqîhê sede yê şeşê hicrî ye. Ji Şêx Ebû Alî kurê Şêxê Tûsî riwayet neqil kirine. Birek ji mezinên zanistê ji dersa wî behre birine, wek: Hesen Ebû Nesr xweyê kitêba Mekarimul Exlaqê û Ibn Şehaşûb û Şêx Muntecebuddîn xweyê Fihrestê û Qutbê Rawendî..., çend tefsîr hene ku meşhûrtirînê wan, Mecmeul Beyan e. Tefsîra Camiul Cewami, E'lamul Wera û Tacul Mewalîd ji eserên wî yên nivîsandî ne.

Di hedîsa Sufyanê Sewrî da jî îşare heye ku ew sir û remz û raz in. Qet nedûr e ku ew tişt bin yên ji fêhma beşer dûr in û Xwedayê Teala pê wan digel yên taybet û mexsûs xeber dabê, çawa ku hebûna muteşabihan ne ji her kesî ra ye, belkî hema ew me'na wê ya heqîqî zanin.

Şeqa û şeqawet, bervajiyê seadetê ye, bi me'na te'b û zehmet e. Cewherî jî hema weha gotiye.

Tebersîyê[1] rehmetî di kitêba Îhticacê da senedê digehîne Mîrê bawerdaran (a.s) ku got: «Resûlê Xwedê (s.a.a) deh salan ser pêçîyên xwe rawesta, heta herdu piyê wî werimîn û rengê rûyê wî zer bû. Di şevê hemûyê da îbadet dikira heta ku jê ra hat gotin: Taha, me Quran ji te ra neşandiye ku tu bikevî zehmetê, belkî me ji seadet û rehetiya te ra rê kiriye».[2]

Ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye ku «Resûlê Xwedê (s.a.a) di îbadet da piyekê xwe radikira da zehmetê wî zêde bibe, vêca Xwedê ev ayet rê kir».[3] Hinek ji ehlê tefsîrê jî gotine ku: Ev ayet cewaba muşrika ye, dema gotine: "Pêxember ji ber terkdana dînê me ketiye zehmet û meşeqetê". Hingê ev ayet hat xwarê.

Seydayê me yê arifê kamil, Şahabadî (Xwedê temenê wî dirêj bike) digota: Piştî ku ewê wucûda mubarek, demekî xelk gazîkirin û wek çawa ewî dixwesta eser nekir, ewî hezretî got we heye kêmasî di awayê de'wet û gaziya wî da be, vêca deh salan bi îbadet ve mijûl bû, heta piyên wî werimîn. Vêca hingê bû ku ayeta pîroz hat xwarê û got: Ewqas xwe nede zehmetê, tu tahir û hadî yî û kêmasî di te da nîne; belkî neqs û kêmasî ji xelkê ye. «Înneke la tehdî men ehbebte»."[4]

---

1- Tebersî, Ehmed bin Alî bin Ebû Talib ji feqîh û muheddis û tarîxnivîsên sede yê şeşê û destpêka sede yê heftê ye. Di sala 620-ê h.q da wefat kiriye. Mefaxir et- Talibiyye, Tarîxa Îmaman, Îhticac... ji eserên wî ne.

2- Îhticac, c. 1, p. 220 - 219. Îhticaca Mîrê bawerdaran di beraberê Yehûdiyek da.

3- Mecmeul Beyan, tefsîra sûretê Taha / 1

4- Qeses / 56 : Tu nikarî heçî yê tu bixwazî rêrast û hidayet bikî.

Di her hal û karî da ji ayetê tê dest ku wî hezretî xwe dida zehmet û eziyetê û eva he ji gotinên mufesiran jî tê fêhmê, her çend di çawaniya wê da îxtilaf heye. Eva he gereke ji umetê ra sermeşq û ders be, nexasima ji ehlê ilmê ra ku dixwazin bi aliyê Xwedê ve gazî bikin. Wê wucûda pak û paqij digel wê pakiya dil û kemala hebû, xwe dida zehmetê heta ayet ji aliyê Heq Teala ve hat xwarê, lê em pê vî barê gunehan û xeletiyan qet nakevin fikir û hizra ziviringeh û axreta xwe, tu dibêjî heçweku berata azadî û xilasiya ji dojehê û êmnahiya ezab hatiye. Eva he ji vê pê ve ne tiştek dî ye ku huba dinyayê penbû xistiye di guhê me ra ku êdî em dengê ewliya û enbiya guh lê nabin.

## HEDÎSA BÎST Û DUWÊ

بالسّند المتّصل إلى ركن الإسلام و ثقته، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد، عن بعض أصحابه، عن الحسن بن عليّ بن أبي عثمان، عن واصل، عن عبد الله بن سنان، عن أبي عبد الله، عليه السّلام، قال:

**«جاءَ رجُلٌ إلى أبي ذَرٍّ فقال: يا أبا ذَرّ، مَا لَنا نَكْرَهُ الْمَوْتَ؟ فقال: لِأَنَّكُمْ عَمَّرْتُمُ الدّنيا و أَخْرَبْتُمُ الآخِرةَ، فَتَكْرَهُونَ أنْ تَنْقُلُوا مِنْ عُمْرانٍ إلى خَرابٍ. فقال له: فكيف تَرَي قُدومَنا علي الله؟ فقال: أمّا المُحْسِنُ مِنكُم، فَكالغائبِ يَقْدمُ علي أهلِه، و أمّا المُسيءُ مِنكُم، فَكالآبقِ يُرَدُّ علي مولاه. قال: فكيف تَري حالَنا عندَ الله؟ قال: اَعْرِضُوا أعمالَكم علي الكتاب: إنّ الله يقول: «إِنَّ الْأَبْرَارَ لَفِي نَعِيمٍ. وَ إِنَّ الْفُجَّارَ لَفِي جَحِيمٍ. » قال: فقال الرّجل: فأَيْنَ رَحْمَة الله؟ قال «رَحْمَةُ اللهً قَرِيبٌ مِنَ الْمُحْسِنينَ.»**

قال أبو عبد الله، عليه السّلام:

**«و كتب رجل إلى أبي ذرّ، رضي الله عنه: يا أبا ذرّ، أَطْرِفْني بشيء من العِلم. فكتب إليه: إنّ العلْمَ كَثيرٌ، و لكن إنْ قَدُرتَ أَنْ لاَ تُسيءَ إلى مَنْ تُحِبُّهُ، فَافْعَل. فقال له الرّجل: و هل رأيتَ أحَدا يُسيءُ إلى مَنْ يُحِبُّه! فقال له: نَعَمْ، نَفْسُكَ أَحَبُّ الْأَنْفُسِ إليك، فإذا أنتَ عَصَيْتَ الله، فَقَدْ أَسَأتَ إليْها.»**

Îmam Sadiq (a.s) kerem kir: «Kesek hat bal Ebûzer û gotê: "Ebûzer! Çi bûye ku me ji mirinê nexweş e û em jê dikirhênîn?" Ebûzer got: "Çiko hewe dinya ava kiriye û axret xirab kiriye û têk daye, vêca hûn hez nakin ji cihê ava biçin bi cihê xirab bûyî". Pey

ra gotinê: “Tu çûna me ya bal Xwedê çawa dibînî?” Got: “Qencên hewe wereng e, heçku seferî bêt mala xwe û nav ehl û zarokê xwe da, xirabê hewe jî wereng e, heçweku koleyê ji bal xweyê xwe revî bînin bal xweyê wî”. Gotinê: “Vêca wê halê me li bal Xwedê çawa be?” Got: “Hûn bi xwe kar û amelê xwe li ber kitêba Xwedê raber bikin û bikêşin, Xwedê weha dibêje: «Bi rastî qenckar di nav nîmet û xweşiya da ne û pîsek û xirab jî nav agir da ne».[1] Yê pirsiyar dikira got: “Nexwe rehmeta Xwedê li kû ma?” Ebûzer got: “Rehmeta Xwedê nêzîkê başa ye”.

Îmam Sadiq (a.s) her weha kerem kir: «Yekî ji Ebûzer ra (r.a) nivîsî: “Bi hinek zanînê, min xelat bike”. Vêca wî weha jê ra nivîsî: “‘Ilm û zanist pir in, lê eger tu bikarî xirabiyê neke gel wî yê tu jê hez dikî”. Pirsiyarker gotê: “Ma te qet dîtiye mirov xirabî û nebaşiyê bike gel mehbûb û hejêkiriyê xwe!?” Gotê: “Belê, tu pirtir ji her kesî hej nefsa xwe dikî, vêca eger tu neguhdariya Xwedê bikî, te xirabî digel wê [nefsa xwe] kiriye”.

**Şîrove:**

Evê bizane ku xelk der heqê mirinê û tirs û nexweşiya ji wê muxtelif in û her weha tiştên dibin sebebê neheziya ji wê jî ne wekhev in. Û ewa hezretê Ebûzer (r.a) gotê, halê mirovên navincî ye. Û em ê bi kurtî behsên kamil û naqis bikin.

Gereke bêt zanîn ku em ên naqis û xweyê kêmasî, tirs û neheziya me ji mirinê, ji ber nukteyekî ye ku di şiroveya hinek hedîsên derbas bûyî da jê hat xeberdan. Û ew ev e, ku bi hesebê sirûşta Xwedê dayî û cibilleta eslî, mirov hez dike bimîne û bijî û ji fenabûn û mirinê nexweş e û jê direve. Û eva he girêdayî ye bi beqa û mana mutleq, reha, jiyan û saxiya daimî ve, yanî ew mana ku fena jê ra neyî û heyata bêzewal. Hinek ji mezinan hema pê vê fitret û sirûştê me'ad û roja qiyametê sabit dikiran ku gotina wê

1- Înfitar / 13 – 14

vêgavê ji mexseda me der e. Û çiko ev hub û hezkirina ji saxiyê û ew revîna ji mirin û zewalê di fitret û sirûşta mirov da heye, tişta ku mirov goman bike ku dewam û beqa jê ra heye û ew, hema alema man û beqa û saxiyê ye, nisbet bi wê hub û evîn û hezkirin peyda dike. Û ew tişta ku ne bi wî awayî bê û bervajiyê wê be, mirov jê direvê. Û çiko me îman û bawerî bi cîhana axretê nîne û em der heqê jiyana daimî û mana her û her ya wê cîhanê da, ne dilrehet in. Ji ber wê dilê me ser vê cîhanê ye û bi hesebê sirûştê, em ji mirinê direvin û me jê nexweş e. Pêşiyê da jî me got ku îdrak û qebûlkirina aqlî tişteke xêncî ji îman û baweriya bi dil. Em bi aqil û tesdîqa te'ebbudê qebûl dikin ku mewt û mirin heq e -mirin guhaztina cih e ji vê alema mulkî ya muzlime, bi alema nûranî ya baqî ya melekûtî ku cihê sax mayîna daimî û her û her e -lê dilê me ji vê heqîqetê bêpar û bêbehr e û jê bêxeber e-. Belkî dilê me bi erda tebî'î û mulkî ve hatiye girêdan û xwe bi wî awayî ve berdaye û hema vê saxî û jiyana nazil û heywanî û mulkî saxî hesab dike û ne qail e, bi mayîn û jiyana cîhana dî ku cîhana axretê û heyat û saxiyê ye. Û ji ber wê me dil daye vê cîhanê û em ji cîhana dî firarî ne û me jê nexweş e û em jê ditirsin. Ev bextreşiyên me hemû ji ber kêmasiya îmanê û nebûna dilrehetiyê ye der heqê wê da. Eger çawa dilê me li ser jiyana vê dinyayê û xweşiya wê ku me bawerî bi mayîna wê heye, qas dehyeka wê jî dilê me ser cîhana axretê bûya û me bawerî bi jiyana ebedî û daimî ya wê hebûya, wê pirtir dilê me bi wî alî ve bûya û bi wê ve girêdayî bûya û me wê hejê bikira û hinekî em ê bi avakirina wê ve mijûl bibûna. Lê mixabin serkaniya îmana me bê av e. Lewma em ji zewal û fenabûn û mirinê ditirsin û dibizdin. Derman û îlaca wê jî hema tenê ew e, ku em bi fikir û zikrê nafi' û ilm û amelê salih û qenc, îman û baweriyê bêxin di dil da.

Tirs û nexeweşiyên navincî jî, yanî ew ên bawerî bi cîhana axretê neyîn, ji ber wê ye ku berê dil û qelbê wan li avakirina dinyayê ye û xwe bêxeber kirine ji avakirina axretê. Ji ber wê naxwazin ji cihê ava biçin cihê xirab û ne ava, çawa ku hezretê Ebûzer kerem

kir. Eva he jî dîsa ji kêmasiya îman û baweriyê ye, eger ne, digel îmana kamil, çênabe mirov bi kar û barê rezîlê dinyayê ve mijûl bibe û xwe bêxeber bike ji avakirina axretê.

Welhasil, ev tirs û nexweşî û bizdan hemû ji ber kar û amelên nedurist û rêxwehrî û muxalefeta gel Mewla ye. Eger hesaba me durist bûya û me bi xwe xwe bikêşa hesabê, hingê em ji hesabê nedibizdan. Çiko hesaba wêderê adilane û durist e û yê hesabê dibîne jî adil e, vê gorê tirsa me ji hesabê ji ber xirabiya me û hîlebazî û diziya me bi xwe ye, ne ji ber hesab dîtina gel me.

Di Kafiya şerîf da senedê digehîne Îmam Mûsa bin Cafer (a.s) ku dibêje: «Ne ji me ye, kesê her roj hesabê gel nefsa xwe nebîne, vêca eger qencî kiribe ji Xwedê bixwaze ku ser qenciya wî ve zêde bike û eger neqencî kiribe, daxwaza lêborînê ji Xwedê bike û bi tewbê bi aliyê Xwedê ve bizivire».

Vêca eger te hesab gel xwe dît, êdî tu di hesaba heşrê da nakevî tengî û tirsa te ji wê namîne. Her weha mewaqif û mehalikên dî yên wê cîhanê jî tabi'ê kar û amelên vê cîhanê ne. Mesela eger te di vê cîhanê da gava xwe li ser rêka rasta pêxemberî û wîlayetê avêtibe û tu ji rêka wîlayeta Alî kurê Ebûtalib (a.s) xwehr nebî û neşimitî. Ji borîna ser siratê ra tirsek ji te ra nîne, çiko şikl û sûretê heqîqî yê siratê, şiklê batinî yê wîlayetê ye. Çawa ku di hedîsa da hatî: «Mîrê bawerdaran sirat e». Û di hedîsek dî da hatiye ku: «Em in sirata musteqîm». Û di ziyareta mubareka Cami'e da hatiye: «Rêka berfireh û sirata qahîm û cîhgirtî hûn in». Kesê bi duristî ser vê siratê gava xwe bavêje û dilê te neşimite û nelerize, ser wê siratê jî lerzîn nîne û tu dê wek berqa pirlez ser ra derbas bibî. Hema bi vî awayî eger exlaq û melekatên wî adilane û nûranî bin, ji bizdan û tirsan, zulmeta qebr, berzex û qiyametê di emanê da ye û ji wan cihan tirsek ser wî da nayê. Nexwe di vî meqamî da derd ji aliyê me bi xwe da ye û dermanê wê jî li bal me bi xwe ye. Çawa ku di şiîrên mensûbê bal Mîrê bawerdaran ve îşare pê hatiye kirin. Dibêje:

«Derdê te ji te bi xwe ye û tu nabînî û dermanê wê jî di te da ye û tu pê nahesî».

Di Kafîya şerîf da heye ku Îmam Sadiq (a.s) dibêje kesekî: «Tu bûyî tebîb û doktorê xwe bi xwe; derd ji te ra hatiye gotin û nîşanên selametiyê û dermanê wê ji te ra hatiye gotin. Veca binhêre ka, tu wê gel xwe çi bikî». Di te da kiryar û exlaq û baweriyên xirab û fasid hene û te nîşanên selametiyê ji eserên enbiya û nûra fitret û sirûşt û aqilê girtiye, dermana duristkirinê jî destpêkirina tesfiye û pak kirinê ye. Ev halê navinciya ye.

Halê bawerdarên ehlê yeqînê jî ew e, ku her çend der heqê mirinê tirs û bizdan hene lê kerahet û nexweşî ji mirinê nînin. Tirsa wan ji ‘ezemeta Heq Teala û mezinahiya zatê muqedes e. Çawa ku Resûlê Xwedê (s.a.a) digota: «Vêca bizdana roja hesabê wê çawa be». Hezretê Mîrê bawerdaran (a.s) di şeva nozdehê da tirs û bizdanek ecêb hebû, halhale digota: «Sond bi Xwedê, kurê Ebûtalib bi mirinê bêhnfirehtir dibe ji wî zarokî ku bi çiçikê diya xwe bêhnfireh dibe».[1] Bi kurtî em bêjin ku tirsa wan ji ber hinek tiştên dî ne, ne wek tirsa me yên girêdayî bi amal û arzûyan ve ye.

Dilê weliyan jî ne wekhev in û ji hev muxtelif in ku hemû nayê hêjmar û nivîsînê, lê em ê behsê ji hineka bikin:

Dilê weliyan di qebûla tecelliyat û ronahiya esma da muxtelif in; hinek dilên eşqî û şewqî ne û Heq Teala di wan da bi esmaê cemalê tecellî dike. Û ew tecellî, heybeta tevlî şewqê tîne û heybeta tirsê ji tecelliya ‘ezemetê pê hesana wê ye. Dilê aşiq di wextê mulaqatê da dike kut kut û ditirsihê û dibizdihê, lê ev bizdan û tirsan, ne tirsa me'mûlî ye.

Hinek dil jî tirsan û xemînin, ku Heq Teala bi esmaên celal û ‘ezemetê di wan da tecellî dike, ew tecellî heyman înerê tevlî tirsê ye, ku heyreta tevlî tirsê jê çêdibe. Di hedîsê da hatiye ku: «hezretê

---

1- Nehcul Belaxe, x. 5

yehiya (a.s) dît hezretê Îsa (a.s) dikene. Bi halê lome kirinê gotê: Heçweku tu ji bîr anîna Xwedê û ezabê wî êmin î! Hezretê Îsa (a.s) cewab da: Heçweku tu bêhêvî yî ji kerem û rehmeta Xwedê! Vêca Xwedê Teala wehyê şand ku: Kîjan ji hewe gomana wî der heqê min da baştir be, ew li bal min mehbûbtir û xweşdivêtir e».[1] Çiko Heq Teala bi esmaê celalê di dilê hezretê Yehya da (a.s) tecellî kiribû, daim di halê tirsê da bû ku lome li hezretê Îsa (a.s) kir, hezretê Îsa (a.s) jî gorekî tecelliyatên rehmetê bi wî awayî cewab da.

## Heqîqeta bihişt û dojehê

Bizane eşkereyê vê hedîsê ku dibêje: «hewe dinya ava kir û axret herifand û xirab kir», eve ku mala axret û bihiştê ava ye ku bi amelê me xirab dibe û diherife. Lê kifş e ku mexsed ji wê teşbiye û beranber kirina gotinê ye. Çiko ji dinyayê ra kelîma xirabkirin anî, ji ber wê munasibetê di beranberê wê da ji axretê ra jî kelîma texrîb û xirabkirin bi kar anî. Bihişt û dojeh jî her çend çêbûne û hatine xuliqandin, lê ava kirina mala bihiştê û maddên dojehê tabi'ê amel û kiryarên ehlê wê ne. Û di riwayetê da hatiye ku erdê bihiştê vala ye û maddên ava kirina wê amelê mirov e. Eva he jî rêketî ye gel burhan û keşfa ehlê mukaşifê. Çawa ku hinek ji lêkolên ehlê îrfanê gotine: Bizane -Xwedê me û hewe biparêze- dojeh ji mezintirîn mexlûqata ye, ew zindan û girtîxana Xwedê ye di axretê da. Ji ber kûratiya binê wê jê ra dojeh hatiye gotin, çawa ku ji bîra kûr ra dibêjin «cehennem». Di wê da germa û zemherîr heye. Germaya germ û germ; sermaya sar û seqem. Ji serî heta binê wê heftsed û pêncî sala rê ye. Xelk ne yek gotinin vê der heqê da kanê ew mexlûqe û çêbûye an çênebûye. Her weha der heqê çêbûna bihiştê da jî îxtilaf kirine. Lê gorekî fikra me û hevalan; ehlê mukaşife û marîfetê, ew mexlûq in û çêbûne.

---

1- Fî-hî ma Fîh, Mewlewî, p. 48

Eva he ku me got çêbûye, wek wê ye ku kesek avahiyekê çêke ku tenê dîwarê dora wê çêkiribe. Hingê tê gotin ku ev avahî ye, lê dema tu biçî têda ji dîwarê dor û ber pê ve tiştek dî nayê dîtin. Piştî hingê xanî û malan gorekî cihê yên têda çêdike, wek ode, qesr û mexzen...[1]

Di hedîsê da hatiye «dema Resûlê Xwedê (s.a.a) dema çûyî mîracê, hinek melaîket dîtin ku carna mijûlê xanî çêkirinê ne û carna jî disekinin. Sebebê wê ji Cebraîl (a.s) pirsî, ewî got: Zikrê umetê maddên çêkirina van xaniya ye, dema zikir dikin tiştek dest wan dikeve û dişixulin û bi kar ve mijûl dibin û dema zikir nakin ew jî kar nakin».

Welhasil şikl û sûretê bihişt û dojeha cismanî, hema şikl û sûretê kar û amelê qencan, xirabiyên benî adem in ku di wê cîhanê da wê li wan bizivirin. Çawa ku ayetên Qurana pîroz jî raste rast û bi îşare behs jê kirine, wek: «Û ya kirine li bal xwe hazir dibînin»[2] û «ew hema kar û amelê hewe bi xwe ye ku li hewe dizivirin». Çêdibe jî alema bihişt û dojehê di cihek serbixwe da bin ku benî adem bi bizavên xwe yên cewherî û ajotinên melekûtî û hereketên îradî yên amelî û xulqî bi aliyê wan ve sefer dike. Her çend par û behra her yek ji wan hema şikl û sûretê amelê wan bi xwe be.

Welhasil, alema melekûta e'la hema bihişt e, ku alemek serbixwe ye û mirovên seîd û bextewer bi wî alî ve tên birin. Û alema dojehê melekûta sufla ye, ku mirovên bextreş bi wî alî ve diçin. Lêbelê ewa di herdu cîhan da li wan dizivire hema şiklê baş û xweş an bi jan û nexweşê kar û amelê wan bi xwe ye. Pê vê ronahî kirinê cem dibe navbeyna eşkere yê kitêbê û exbaran da, ku bi hesebê zahir gel hev muxalif in. Her weha rêketî ye di gel burhan û mesleka ehlê marîfetê.

---

1- Futûhata Mekkiyye, c. 1, v. 1, b. 61

2- Kehf / 49 : We wecedû ma 'emilû hazira.

**Şeytan xelkê bi rehmeta berfireha îlahî hêç dike**

Kifş e ku gereke mirov hay ji vê gotina cihgirtî û cami’ ya hezretê Ebûzer hebe ku dibêje: «kar û amelê xwe raberê kitêba Xwedê bikin û li ber wê bipîvin». Û Xwedê dibêje: «xelk du birin, ebrar ku ew di ne'îmê da ne; û fuccar, ku di cehîmê da ne». Vêca ewê pirsiyar kirî bi axirîka ayetê girt û got: Nexwe rehma Xwedê li ku ma? Ewî got: Rehma Xwedê jî hema ne beredayî ye, belkî digehê qenckaran.

Bizane ku şeytanê mel'ûn û nefsa xebîsa emmare bi gelek rêka ve xelkê ji rê dertîne û ewa ji nav dibe û bextreş dike. Tîra wî ya paşîn jî hema hêvîdar kirina bi rehma Xwedê ye, ku pê vê hîlê mirova ji kar û amel paşda dide. Û ev paldana ser rehmeta Xwedê ji xapandinên şeytan in. Şahid û delîla wê jî ev e, ku di karê dinyayî da qet em rehmeta Xwedê ji xwe ra nakin palgeh û raste rast em esbabên tebî'î û eşkere serbixwe û xweyê eser zanin. Tu dibêjî qey di cîhanê da ji esbabê zahirî û eşkere pê ve çi tiştên eserê deynin nîne. Lê di kar û barê axretî da zêdetir em xwe bi rehma Xwedê digirîn û ji destûrên Xwedê û resûlê wî (s.a.a) bêxeber in, heçweku Xwedê karîna kar kirinê nedayî û rêka silametiyê nîşa nekirî. Welhasil di karê dinyayê da mesleka tefwîzî û di karê axretê da mesleka cebrê me girtiye ber xwe. Halhale ev herdu rêk jî xelet û nedurist in û xilafê emr û destûrên pêxemberan (s.a.a) û rêka îmamên hîdayetê û ewiliyayên muqereb in (a.s). Digel wî qasî ku ewa hemûyan bawerî bi rehma Xwedê hebûn û îmana wan ji ya hemûyan pirtir bû, lê dîsa heta bêhnekî jî ji cihanîna wezîfe û berpirsiyariya xwe xeflet nedikiran û deqîqekî jî ji xebatê nedisekiniyan. Ey bira, binhêre sehîfa amelên wan, berê xwe bide dua û munacatên seyidê sacdan Zeynul Abidîn (a.s) û melheze bike ku di meqamê bendetiyê da çi muameleyê dike û çawa wezîfa xwe ya bendetiyê bi cih tîne. Di gel vê jî dema berê xwe dide îbadet û amelê hezretê Mîrê bawerdaran, xema dixwê û nîşan dide ku nikare bigehê wî! Nexwe neûzu billah an gereke em înkara wan bikin û bêjîn: Qasî me, baweriya wan bi rehma

Xwedê nebûye, an jî gereke em tekzîba xwe bikin û bizanin ya em dibêjin ji xapandin û hîlên şeytan û nefsê ne ku dixwazin me ji rê derînin. Em ji ber xirandin û xirabiya wan hawara xwe ji Xwedê ra dibin.

Nexwe ey ezîz, çawa ku hezretê Ebûzer gotî wî yê pirsiyar jê kirî, ilm û zanist pirin, lê ilmê nafi' û bi feyde ji yên wek me ra ew e, ku em evqas xirabiyê gel xwe nekin û bizanin ku destûrên enbiya û ewiliya (a.s) eşkere kirina hinek heqîqeta ye, ku li ber me nixûmandî ne. Ew dizanin kanê şiklê van exlaqên pîs û amelên xirab çawane û çi pê ve tê; û ew in yên zanin ku karên qenc û exlaqên baş çi şiklên nûranî û melekûtî hene. Hemû gotin û derman, nexweşî û derd beyan kirin. Eger dilê te bi te dişewite lazime ber wan emr û fermana ra neborî û derdê xwe derman bikî û nexweşiya xwe mu'alice bikî. Xwedê zane eger em bi vî halî ve cihê xwe biguhêzin û biçin wê cîhanê, wê çi bêt serê me û çi musîbet û bela û nexweşî ser me da bên. «di her hal û karî da hemd ji Xwedê ra ye».

## HEDÎSA BÎST Û SISÊ

بالسّند المتّصل إلى حجّة الفرقة و ثقتها، محمّد بن يعقوب الكليني، رضى الله عنه، عن علي بن إبراهيم، رفعه إلى أبى عبد الله، عليه السّلام، قال:

**«طَلَبَةُ العِلم ثَلاثَةٌ. فَاعْرِفُهم بأعيانِهم و صفاتِهم: صِنْفٌ يَطْلُبُه للجَهلِ و المِراءِ، و صِنفٌ يطْلُبُه للاستِطالَة و الخَتْلِ، و صِنْفٌ يَطْلُبُه للفِقْهِ والعَقلِ. فصاحبُ الجَهلِ و المِراء مُوذٍ مُمارٍ مُتَعَرِّضٌ للمَقالِ فى أَنْدِيَةِ الرِّجالِ بتَذاكُرِ الْعِلْم و صِفَةِ الْحِلْم، قَدْ تَسَرْبَلَ بالخُشوعِ و تَخَلّي مِن الوَرع، فَدَقَّ الله مِن هذا خَيْشُومَه و قَطَعَ مِنه حَيْزُومَه. و صاحِبُ الاسْتِطالَةِ و الخَتْلِ ذُو خِبٍّ و مَلَقٍ، يَسْتَطيلُ علي مِثلِه مِن أشباهِه، و يَتَواضَع للأغنياءِ مِن دُونه، فَهُوَ لِحَلْوائِهِمْ هاضِمٌ و لِدِينِه حاطِمٌ، فَأَعْمَي الله علي هذا خُبْرَهُ و قَطَعَ مِن آثارِ العُلَماءِ أَثَرَه. و صاحِبُ الْفِقْهِ و العقلِ ذُو كَآبَةٍ و حَزَنٍ و سَهَرٍ، قَدْ تَحَنَّكَ فى بُرْنُسِهِ و قامَ اللّيلَ فى حِنْدِسِه، يَعْمَلُ و يَخْشي وَجِلاً، داعِيًا مُشْفِقًا مُقْبِلاً علي شأنِه، عارِفا بأهلِ زمانِه مُسْتَوْحِشًا مِن أَوْثَقِ إخْوانِه، فَشَدَّ الله مِنْ هذا أرْكانَه و أَعْطاهُ يَومَ الْقِيامَةِ أَمانَه.»**

قال الكلينىّ، رحمه الله: و حدّثنى به محمّد بن محمود، أبو عبد الله القزوينىّ، عن عدّة من أصحابنا، منهم جعفر بن احمد الصّيقل بقزوين، عن أحمد بن عيسي العلوىّ، عن عبّاد بن صهيب البصريّ، عن أبى عبد الله، عليه السّلام.

Îmam Sadiq (a.s) kerem kiriye: «Talib û peyketên zanînê sê ne; vêca bi kesatî û wesfên wan ewa nas bike. Qismek ji wan ji bo xirecir û cirekêşê pey zanînê dikeve, qismek ji mezinbûn û xapandinê ra , qismek jî ji bona zanîn û zanabûnê.

Vêca ew ê ji xirecirê ra pey zanînê ketî, nezane xirecir nexweş e, cirekêşê dike, nav koma xelkê da behsa zanîn û nerîmyê dike. Cilkê xuşû'ê ber kiriye lê vala ye ji teqwatiyê; vêca ji ber wê Xwedê ew li ser pozê wî xistiye û pişta wî şikandiye.

Xweyê xwe mezinkirin û hîlebaziyê jî, dixapîne û ziman hilû ye, xwe ser serê wa yên ji qismê xwe û wek xwe mezin dike û xwe ji dewlemendan ra dişikîne. Helewa wan digivirîne û dînê xwe dişikîne, vêca ji ber wê Xwedê bîr û hizra wî kor dike û dews û nîşana wî ji nav alim û zanayan radike.

Yê xweyê fêhm û aqilmend jî, nefs sivik û xemdar û ehlê şev hişyariyê ye; lefa şaşikê ser kum [kolav - şaşik]ê xwe ra gire dide û di tarîtiya şevê da radibe û bi tirsek ecêb îbadet dike û dua dike û hay ji xwe heye û dinhêre kesayetiya xwe. Nas e digel ehlê zemanê xwe û ji pê bawertirînê hevalên xwe di tirsê da ye. Vêca Xwedê ewî qahîm dike û roja qiyametê emanê didiyê».[1]

## Şîrove:

«Bi e'yanihim» di hedîsê da tekîd e ji zemîra «e'refehum»ê ra. Yanî: Ewa bi xwe nas bikî ku baş kifş bibin û tevlî hinek dî nebin, çawa tê gotin: «Reeytuhu bi ʼeynihî», an: «Kullu şeyin fîhi helalun we heram fe huwe leke helal hetta te'rifel helale el-heram bi ʼeynihî». Cenabê lêkolê hedîsvan, Meclisî yê rehmetî li vêderê hinek îhtimalat nivîsîne ku gelek dûr in ji duristiyê.

«We sifatihim», mexsed ji sifetan, ew wez' û hal in ku tabiʼê melekat û mexsedên van sê qisma ne. Wek azirandinê û xirecir kirinê... Nexwe bi van sifetan tên muʼerifîkirin û şexsê wan tên naskirin.

«Cehl» bervajiyê ilmê ye. Li vêderê çêdibe mexsed korî û xefkirina heqiyê, an jî tecahul û qebûl nekirina heqiyê be. Meclisî kerem kiriye: "Cehl, sefêkî û terka nermiyê ye". Bervajiyê aqil jî hatiye me'nekirin.

---

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 49; behsa "Fezla ilmê", b. "Newadir", h. 5

«Mira'», xirecira di gotûbêj û xeberdanê da ye. Hema ji vê maddê ye «cedel», ku yek ji "sena'atên xemse" yên ilmê mentiqê ye. Li vêderê îhtimalek dî jî heye ku em ê di vebirên hêjbên da jê biaxivin.

«Istitale», xwestina bilindî û qedr û qîmet e.

«Xetl», bi me'na hîle û xapandin e.

«Mu'terizun lil meqal», yanî eşkerekirina gotinê.

«Endiye», cem'a «nadiye" ye, ku cihê kombûna xelkê û civatgirtinê ye. lê dema ji hev belav bibin jê ra «nadiye» nayê gotin, «darun nedwe» ya Mekkê ji vê kelîmê hatiye girtin, ku ew çêkiribûn ji civat û meşweretê ra. «Nediy» ser wezna fe'îl û «nedwe» û «munteda» û «mutenedda» ser gotina Cewherî hema bi vê me'nayê ne.

«Tezakkura ilm»ê muteeliq e bi «meqal»ê ve, an bedel e ji wê, «we sifetul hilm», 'etf e ser wê. Mexsed ev e, ku gotûbêja ilmê dike, da xwe bi zanînê nav bide; behsa hilm û nermiyê dike, da xwe di nav wan da nîşan bide, halhale ne ji va ye.

«Sirbal», cilik e û teserbel e, yanî cilik ber dike.

«Were'», bi me'na xwe vedana temam e, ji heraman û tiştên şubhe tê heyî.

«Fe deqqellahu...» çêdibe ev riste û du ristên pey ra, dua bin, çêdibe jî behsa halê wan yê dinyayê an axretê be, an jî herdu cîhana. Deqq, bi me'na lêdan e, an ismê sewt [nida] e.

«Xeyşûm», jorê poz û difnê ye. Mexsed ji lêdana poz, zelîliya tam û temam e. Yanî Xwedê wê ji ber van xesletan ewa zelîl bike û bişikîne. Di pey ra em ê behsê jê bikin.

«Heyzum», cihê girêdana piştkê ye. Her weha bi me'na nîveka sing e... Lê di vî meqamî da me'na yekê munasibtir e, çiko nisbeta birînê dide balê ve.

«Xibb», bi me'na hîle û xapandin û xebîsiyê ye.

«Meleq», bi me'na zimanhilûtî û temelluq û çaplûsî ye.

«Li helwaihim - hulwanihim», Meclisî dibêje: Di hinek nusxan da bi nûnê hatiye, eger we be bi bera “h” û cezma lamê ye. Bi me'na kirha dellal û kahin û tiştên ji pêka rişwetê didin. Mexsed ew e, ku dewlemend di beranberê karê ku ew ji wan ra dikin û dînfiroşiya wan tiştekî didin wan.

«Hatim», şikandin e. Meclisî: “Ew şikandin e, ku xirabî pê ve tê”.

«X.B.R”, çêdibe bi bera «x» û sukûna «b» bi me'na xubret û besîret, çêdibe jî bi fetha wan herduka be. Bi munasebeta nisbeta fiîlê ji wî ra, me'na yekê munasibtir e, lê me'na duwê jî ji duristiyê vala nîne.

«Ke’be», xirabiya wez' û hal e û şikestî bûna ji ber kul û xeman.

«Tehenneke fî burnusih», yanî tehtul henek danî ser burnusê xwe. Burnus, kumek [kolav - şaşik] bilind e, ku ehlê îbadet di destpêka Îslamê da datanîna ser serê xwe. Çawa ku Cewherî di Sihahê da dibêje. Muheqiqê Meclisî dibêje: Eva he îşare ye bal sunetbûna berdana tehtul henekê di nimêjê da; lê işkal di vê gotinê da heye. Çiko tehennuk di lîbasê ku ehlê îbadet ber dikiran da delalet dike ser sunetbûna tehennukê di hemû halan da, ne tenê di wextê nimêjê da. Belê, eger burnus cilê taybetê nimêjê bûya hingê gotina wî durist bû.

«Hundus», ser gotina Cewherî, şeva pir tarî ye.

Li vêderê qasê ronahîkirina wê munasib be em ê di çend vebiran da jê biaxivin. «Û Xwedê palgeh e, ji me ra».

**Vebir: Ilm ji aliyê Xwedê ve ye û tehsîl ji mu’iddata ye**

Bizane, di cihê xwe da sabit e, ku muqedimatê qiyasê nisbet bi netîcên xwe, her weha delîl û burhan di her ilmekî da nisbet bi medlûlat û muberhenatên xwe, şûna «mu’iddata» da ne.

û serxwebûnek temam ji wan ra nîne û yek car jî bi wan ve negirêdayî nînin. Li vêderê du birên cebrî û tefwîzî xelet bûne û ji îtidalê dane alî û heryekî gora rêka xwe aliyek girtine. Ew yek dibêje: Muqedimat musteqil û serbixwe ne û eger deriyê ilm ê xeybê bêt girtin jî, mirov dikare bi muqedimatan ilmê bi netîcê dest xwe ve bîne. Yê dî dibêje: Muqedimat bi temamî ne girêdayî ne bi netîcan ve. Û suneta Xwedê li ser vê herikiye ku piştî pêşekî û muqedimatan netîce dikeve zihnê mirov û muqedimat bi awayek sûrî û şiklî bi netîcê ve girêdayî ye; lê di heqîqet da bê rebt û girêdan e.

Çiko rêka heryek ji van du biran li bal xweyên zanînê nedurist û dûr e, ji heqîqeta zanistê. Û heq ser gotina ehlê heqiyê ew e ku: Muqedimata girêdana i'dadî bi heve hene û mirov hazir dikin ji girtina zanînan, ji mebadiyên wê yên aliyeyên xeybî. Vê gavê me ne li ber e, ku em evê rêkê ronahî bikin û wan du rêkên dî ji nav bibin. Çiko ji mexseda me der e û behsa ji wê ji bona ronahîkirina gotinek dî ye, ew jî ev e: Piştî hat zanîn ku daketina zanîn û mearifan ji alemên xeybî ye û tabi’ê girêdan û îrtibata nefsê ye bi wê ve, çawa ku di hedîsê da hatiye: «Zanîn ne bi pirhînkirinê ye belkî ronahiyeke ku Xwedê têxe dilê wî kesê ku ew hez bike». Nexwe heçî nefsa ku girêdanê peyda bike bi melekûtê e'la û alema melaîketên muqereb ve, ew tiştên bikevin dilê wî, melekî ne û ew zanînên jê ra bên dayîn, zanînên heqîqî û ji alema melaîketa ye. Û heçî yê girêdanê gel alema melekûta esfel û cin û şeytan û nefsên xebîs peyda bike, ilqaatên wê ilqaa şeytanî û ji qismê cehlên murekeb û perdên tarî ne. Û ji ber vê ye ku ehlê mearif û zanînên heqîqî, şertê yekê di dest ve anîna zanînan ra nexasima zanînên heq û ilmên şer'î, evê zanin ku niyet xalis bibin û mexsed durist bibin; ew der heqê vê meselê da gelek şîretan li feqiyên xwe dikin. Çiko safkirina nefsê girêdana digel mebadiyên aliye, qewî û xurt dike. Û eva he ku Xwedayê ezîz û celîl hînkirina îlahî bi teqwayê ve girê dide: «Wettequllah we yu’ellimukumul-

lah»,[1] hema ji ber vê ye ku teqwatî nefsê temîz û zelal dike û ewê bi meqamê muqedesê xeybê ve gire dide. Veca hînkirina îlahî û ilqaa Rehmanê çêdibe. Çiko di mebadiyên aliye da bexîletî mehal e, lazim e bên dayîn. Çawa ku wacibul wucûd ji hemû aliyan ve bêniyaz e.

Eger nefs bi çavê avakirina xwe û haletê nefsanî ya xwe mijûlê zanînê bû û mexsed ne îlahî be, ilqaa ku jê ra çêbe wê ilqaa şeytanî be. Bi gomana min yek ji kêşek û pîvekên ferqa navbeyna ilqaatên şeytanî û rehmanî da, ku ehlê marîfetê jê xeber nedane, hema ev e ya me gotî, ku gelek caran mirov bi xwe pê dihese. Ewa ku ji vê nefsa neparêz ra ilqa dibe ji qismê cehla murekeb e. Çiko mîzan di zanînê da peydakirina mefhûmê kullî û îstilahên ilmî nîne; belkî mîzan, rakirina perdê ye ji ser çavê dil û vekirina deriyê marîfeta Xwedê ye. Û ilmê heqîqî ew e ku ji mirov ra çiraya hîdayeta melekût û sirata musteqîma teqeruba Heq be. Û heçiya ne weha be, her çend di alema mulk da û hêj perdên tebîet ranebûyîn, ser şiklê ilma ye û ehlê wê di nav aliman da tên hesab kirin. Lê piştî rabûna perdan û vebûna çavê dil û hişyarbûna ji xewa dinyayê, wê kifş bibe ku perda wê ji hemû perdan stûrtir bûye û em jê bêxeber bûne.

«Mirov hemû di xew da ne, vêca dema bimirin, hişyar dibin». Û şermezariya me wê me'lûm bibe ku kêm û zêde piştî pêncî salan tehsîlê em bi xwe hêj nav xeletiyê ra ne. Û carna jî em goman dikin ku tehsîla me ji Xwedê ra ye û em bêxeber in ji hîlên şeytan û nefsê, çiko huba nefsê perdeyek stûr e, ku eyb û kêmasiyên me ji ber me veşartine. Ji ber vê ye ku ewliyayên pak ji bona fêhmandina me bi xwe, hinek nîşan ji veqetandinê ra ji me ra gotine ku em bi wan nîşana xwe nas bikin û bêhûde der heqê xwe da xweşgoman nebin.

Nexwe kifş bû ku talibên zanînê gorekî teqsîma yekê, du bir in: Yek ku mexseda wan îlahî ye û ya dî ku mexseda wan nefsanî ye.

---

1- Beqere / 282: Teqwatiya Xwedê bikin û Xwedê hewe dielimîne.

Mirov dikare bêje ev deste, xilaseka mexseda wan cehl e. Çiko ilmên sûrî ku dest wan ve tê, gora heqîqetê, cehla murekeb û perdên melekûtî ne. Ev du destên yekê ku di hedîsa Îmam Sadiq (a.s) da hatiye gotin. Yanî ew ên xweyê xirecirê û yên ehlê xwe mezinkirinê di vê mexseda hatiye gotin da şirîk in. Çiko herdu deste jî ehlê nezanî û rê windakirinê ne. Ji ber vê yekê ew cehla ku gotî nîşanê desta yekê ne, we heye ne ew be ya orf jê fêhm dike, belkî mexsed ji wê tarîkirina tiştan û cahilkirina xelkê be. An jî mexsed tecahul û qebûlnekirina heqiyê be. Çawa ku ev herdu jî ji xasiyetên ehlê xirecirê ne. Ew, heq û heqîqeta înkar dikin û ji germkirina bazara xwe ra bi nezanîn xeber didin.

Hedîsê, sê qisim gotin -halhale çawa hat gotin gora teqsîmekî du qisim in. Îlahî û nefsî. Û gorekî teqsîmek dî ji sê qisman pirtir invê der heqê da mirov dikare bêje: Ev ji ber wê ye ku wî hezretî xwestiye behsa du komên mezin bike ku zêdetirê cahil û li rê windayan berê xwe didin wan. Û ji ber vê ye ku di hedîsek dî da behsa du destan tenê kiriye dibêje: «Kesê xeberdanê bixwaze ji feyda dinyayê ra, ewî behre li axretê da nîne. Lê kesê ewê ji feyda axretê ra bixwaze, Xwedê xêra dinya û axretê didiyê».

**Vebir: Der heqê xirabiya xirecirê**

Me pêşda behs ji xirabiya xirecirê kir.[1] Lê çiko munasebet çêbû, em ê hinek dî jê xeber bidin.

Di Kafiya şerîf da senedê digehîne Îmam Sadiq (a.s) ku dibêje: «Mîrê bawerdaran got: Newebe hûn xirecir û cirekêşê bikin; çiko ew, dilan ji hevalan nexweş dike û minafiqî pê ve tê».

Dîsa dibêje: «Nekevin cirekêşê; çiko ew, dil mijûl dike û dibe sebebê minafiqiyê û kînê di dil da çêdike».

Her weha dibêje: «Cebraîl (a.s) got Pêxember (s.a.a), hay jê hebe bi xirecir gel xelkê xeber nede».

---

1- Hedîsa 2 ya vê kitêbê.

Der heqê vê yekê da ku cidal û xirecir, dil nexweş dike û mirov ji dosta nerehet dike û minafiqî li ser wê şîn dibe, sebeb ew e ku pêşda hat gotin[1] ku: Kiryar û amelên zahirî û eşkere di dil û batin da eserên munasibê wê çêdikin. Veca niha jî em dibêjin ku kar û amelên xirab û nebaş esera wan di dil da zûtir û dijwartir e. Çiko mirov jêderê tebîet e û hêz û quweyên şehwet û xezeb û şeytenetê digel wî ne û eserê lê dikin -çawa ku di hedîsê da hatiye: Şeytan wek herikîna xûnê ye di benî Adem da.-[2] Ji ber vê yekê berê dil li tiştên fasid û xirab û rêketî digel tebîet e, bi alîkariyek hindik, çi ji endamên mirov û çi tiştek dî wek hevalê pîs û exlaq nebaş, eserek dijwar di dil da peyda dibe. Çawa di hedîsan da hatiye ku hevalatiya wan nekin.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Mîrê bawerdaran got: Ne layiqê mirovê musilman e ku hevalatiya faciran bike. Çiko ew [facir], karê wî jê ra dixemilîne û hez dike ew jî wek wî lê be. Û ser karê dinyayî û axretî alîkariya wî nake, her weha hatin û çûna wî jê ra şerm û ar e».

Hedîsek dî ji Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Ne layiqê musilman e, ku hevalatiya facir û ehmeq û virkeran bike».

Nukta muhima nehya ji rûniştina gel ehlê gunehan an civata di meclisên ku guneh têda tên kirin. Nehya ji têkeliya digel dijminên Xwedê, di vê da ye ku exlaq, wez', hal û kiryarên wan eserê li mirov dikin. Û ji wê muhimtir ew e, ku amelê mirov eserek pirtir datînin ser dilê mirov, bi piçek dewamdanê ser xirabiyê, bi awayek cidî eserê li dil dike ku bi salên dirêj jî êdî dil temîz û paqij nabe.

Nexwe kifş bû ku eger mirov bi xirecir û cidalê ve mijûl bibe, tarîtiyek ecêb di dil da peyda dibe û dijminiya zimanî dibe sebebê dijminiya batinî û dil. Veca hema ev bi xwe dibe sebebê nifaq û durengî û durûyiyê. Vê gorekê nexwe hema minafiqî bi

1- Hedîsa 1 û 6 ji vê kitêbê.

2- Musneda Ehmedê Henbel, p. 156

xwe jî ji xirabiyên xirecir û cidalê ye. Û me pêşiyê da behsa xirabî û fesadên minafiqiyê kir[1] û niha êdî ne hewce ye em ducar bikin.

Îmam Sadiq (a.s) hinek nîşan ji ehlê cehl û xirecirê ra gotin ku yek ji wan eziyetkirin û nexweş muameletî ye di gel ehlê civatê, ku ew bi xwe ji wan tiştên xirab e û sebebek serbixwe ye ji helaketa mirov ra. Û di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatiye ku: «Kesê dostekî min eziyet bike û nexweşiyê jê ra çêke, ewî ez gazî kirime ji şerê xwe ra». Yanî eziyetkirina bawerdaran şerê digel Heq Teala hesibandiye. Û gotiye ew dijminiya wî zatê muqedes e. Hedîs vê der heqê da gelek in.

Nîşanek dî ew e, ku gotinê eşkere dibêjin û ilmî xeber didin, da xwe ser bixin û seratiya xwe nîşan bidin. Eva he ku «mira» kiriye nîşanê «mira»ê, çêdibe bêt gotin ku: Miraa yekê sifetê dil û meleka xebîse ya qelb be, lê ya kirî nîşan û elamet, eser û nîşana eşkere û zahirî be.

Yek dî ji nîşanan ew e, ku her çend ne helîm û nerm be, lê wesfê xwe bi helîmî û nerîmyê dide. Û hema ev bi xwe minafiqî, durûyî, riya û şirk e. Wek çawa nefs sivikiya valayê ji teqwatî û were'ê jî ji nimûnên eşkere yên şirk, riya, nifaq û durûyiyê ye.

Nexwe kifş bû ku ev sifet, xirabiyên zehf mezin pê ve tên û gereke bi çi zehmetê heyî mirov xwe ji vî sifetê dilxirabker û îmankuj xilas bike û dil ji vê qirêj û tarîtiyê derînê û dil, bi xaliskirina niyetê û sidqa batin bixemilîne û zelal bike.

Nukteyek li vêderê heye ku eger mirov têda bifikirê piştşikên e, ew jî ev e, ku Îmam Sadiq (a.s) got: «Wê Xwedê li ser pozê wî bide û pişta wî bişikîne». Ev gotin an xeberdan e, an jî nifrîn. Di her hal û karî da wê pêk be, çiko eger xeber gihandin û ixbar be, ji xwe gotina sadiq ê rastgo ye. Eger nifrîn be jî, ji xwe nifrîn û duayê pak û paqij û weliyê Xwedê ye û meqbûl e. Eva he jî kinaye ye ji zelîlî û şermezariyê û belkî mirov di du cîhana da

1- Hedîsa 9 ji vê kitêbê.

zelîl û şermezar bibe. Di vê cîhanê da li bal wa yên dixwesta li bal wan bi rûmet bibe. Lê ji ber xwenîşandan û xwemezinkirinê, bervajiyê wê ya dixwesta çêbe û şerma wî biçe û zelîlê wan bibe ew ên dixwesta ser wan bikeve. Û di wê alemê da jî di huzûra melaîketên muqereb û nebiyên mursel û weliyên pak û evdên qenc da zelîl û şermende û bêqîmet bibe.

Vêca nexwezika me yên ehlê xirecir û cidal û ehlê bayê dil û dijminiyê, ku em çawa ketine nav destê vê nefsa xebîsa bêrehm, da ku dest ji me nakeşê heta me ji nav bibe di hemû aleman da. Em qet li duristkirina wê nagerin û me pembûyê xefletê kiriye di guhê xwe ra û em ji xewa girana tebîet hişyar nabin.

Ey Xwedê, tu duristkerê ebdan û xweyê dila yî. Hebûna hemû mexlûqa di destê qudreta te da ye û hemû dil li bin xwest û îrada te da ne. Em ne xweyê xwe û ne xweyê feyde û zerer û mirin û jiyana xwe ne. Hema tu tarîtiya dilê me bi nûra xwe ronahî bike û xirabiyên me bi kerema xwe durist bike û destê van feqîr û jaran bigire.

**Vebir: Nîşanên xwexwazan**

Çawa ku di rista yekê ya vê hedîsa şerîf da, me der heqê merteba batinî û meleke ya nefsanî ya xirecirê behs kir. Û her weha ji merteba eşkere ya wê axift ku jêderê merteba batin e û nîşan e ji wê ra, der heqê rista duwê da jî em wê gotinê dibêjîn ku: Ji xwemezinkirin û hîle û xapandinê ra jî merteba xef û batin heye ku meleka wê ye, mertebeyek eşkere jî heye ku netîce û desthata wê melekeyê ye. Çawa ku di pirtirê amel û karan da dil jî behr û parek heye ku carna digehê merteba meleke. Carna jî merteba hal, ku kar û amel netîca wê ne. Nexwe ew ên meleka xwemezinkirin û xapandinê di wan da heyî, hinek elamet û nîşanên eşkere jî hene ku Îmam Sadiq (a.s) hinek ji wan gotine. Yek ji wan ew e, ku di zahir da, xwe ji avaker û duristkeran nîşan bide, halhale di navdeyê xwe da ne wereng be û bi vî awayî xelkê bixapîne. Evên he guriyên di çermê mihê da û şeytanên di şiklê mirovan da ne û pîstirîn mexlûqên Xwedê ne û zerera wan ji dînê xelkê ra pirtir e, ji leşkerê muxalifan.

Nîşanek wan ya dî ew e, ku ji mirovên hêviyek di wan da heyî ra xwe pir dişikînin û zimanê xwe hilû dikin û dava tedlîs û temelluqê vedidin ku xelkê bêxin dava xwe û ji helewa wan ya şêrîn û hezkirin û qîmetdana wan ya dinyayî behrê bibin. Veca di beranberê wê da dîn û îmana xwe bidin û ji dinya wan behremend bibin. Ev deste ji wan e, ku di hedîsê da hatiye: «Bihiştî wan dibînin û dibêjin wan: Çi bû ku em bi gotinên hewe çûn bihiştê û hûn bi xwe bûn dojehî? Ew dibêjin, me bi gotina xwe amel nekir».

Yek dî ji nîşanên wan ew e: Ji emsalên xwe ra ku hêviyek dinyayî ji wan nînin û ewa stiriyê ser rêka xwe dihesibînin, li beranberê wan da xwe mezin dikin û xwe ser wan ra digirin; çiqas bikarin bi gotin û amelê xwe, ewa dişikînin û kêm dikin. Çiko tirsa wan ji wê ye eger şirîkek ji wan ra çêbe we heye ji îtibar û mezinahiya wan kêm bibe.

Gereke bêt zanîn ku ji dijwartirîn karan, dîndarî ya di lîbasê ehlê ilm û zuhd û teqwatiyê da ye û ew e ku di vê rêkê da dil bêt parastin. Ji ber vê ye eger kesek ji vê destê bi wezîfên xwe amel bike û bi niyetek zelal bikeve di vê merhelê da û piştî duristkirina xwe ji duristkirina xelkê ra bixebite û xweyitiyê bike li eytamên Alê Resûl (s.a.a) kesê weha ji muqereb û pêşkaran hesab dibe. Çawa ku hezretê Sadiq (a.s) der heqê çar yarên Îmam Baqir da (a.s) weha gotiye: «Zurare, Muhemmed bin Muslim, Ebû Besîr û Bureyd ji wan kesa ne, yên Xwedê der heqê wan da gotî: Pêşî stînen pêşî, ew in yên muqereb».

Hedîs vê der heqê da pir in û başiya ehlê ilmê pirtir e, ji wî qasî ku em jê xeber bidin. Der heqê wan da ev hedîsa hezretê Resûl (s.a.a) bes e ku kerem dike: «Kesê li pey zanînê be ku Îslamê pê wê sax bike, vêca mirin serda bêt, di navbeyna wan û pêxemberan di bihiştê da dereceyek tenê heye».[1]

Em ê der heqê başî û seratiya wan da pirtir xeber bidin. Lê eger Xwedê nekirî ji xulûsê dûr bû û ket ser rêka nedurist, hingê ji

---

1- Sunena Darimî, c. 1, p. 100

alimên xirab hesab dibin ku pîstirînê xelqullah her ew in, ku der heqê wan da hedîsên dijwar û gotinên xerîb hene. Û telebe û ehlê ilmê gereke ber xwendina xwe ra pir ji duristkirina xwe ra xemê bixwun û çiqas ji wan be evê meselê ser her tiştekî ra bigirin, ku ev mesele ji hemû lazimiyên aqlî û ferzên şer'î lazimtir û zehmetir e.

Ey talibên ilm û zanîn û kemal û mearifan, ji xew rabin û bizanin ku hucet û delîla Xwedê ser hewe temamtir e û wê Xwedê pirtir ji hewe bipirse, mîzana amelê hewe ji ya xelkê ferq e û sirata hewe ziravtir e û munaqişa di hesaba hewe da zehftir e. Wey li halê wî talibê zanînê, ew ê zanistê di dilê wî da tarîtî çêkiribe, çawa ku em ewê di xwe da dibînîn, eger em çend kelîmeyekî elimîbûn jî, em ji rêka heq paşda mane û şeytan û nefs ser me xurt bûn û em ji rêka însaniyet û hîdayetê paşda dan û hema ev mefhûmên he bûne perde û hicab ji me ra û me ji vê pê ve, tu çarekî nînin ku em hawara xwe ji zatê muqedesê Heq Teala ra bibin.

Ey Xwedê, em îqrar dikin ku me kêmasî heye û em gunehkar in, me ne gavek di rêka razîkirina te da avêtiye û ne jî me taet û îbadetek xalis û zelal ji te ra kiriye. Tu bi xwe birehm û kerema xwe gel me muameleyê bike. Çawa ku te di vê dinyayê da eyb û xirabiyên me veşartine di wê alemê da jî xef bike ku em li wêderê ji sitirandin û xufrana te ra muhtactir in.

Li vêderê jî lazim e, çawa me di rista yekê da gotî, gotinekî bînin bîra hewe, ew jî ev e ku: Hezret dibêje: «Xwedê wê besîret û dîtina wî ya bi dil, kor bike û eserên wî di deftera aliman da ji nav bibe». Ev çi ixbar be û çi nifrîn, wê her biqewime. Û mirov gereke hay ji xwe hebe der heqê ji navçûna besîretê û kûratiya dil da, ku hemû bextreşî bi wê ve tên. Her weha mehrûmbûna ji aliman û derketina ji nav wan, xêncî ji mehrûmbûnê, hema şermezariya di huzûra pakan û xasan da li roja qiyametê ewqas mezin e ku mirov nikarê melheze jî bike.

**Vebir: Nîşanên aqilmend û têgehiştiyan**

Ji bona ehlê aqil û fêhmê ra jî, yanî ew ên xilaseka mexseda wan ji xwendin û tehsîlê, zanabûna di dîn da û pê hesana heqîqeta ye; hinek nîşan û elamet hene ku çendek ji wan hat gotin.

Yek ew e, ku bi rêka zanînê ve, kul û xem û nefs sivikî di dilê wan da cih girtiye û ev haletên he, ne ji bo kar û barê kêmê dinyayî ye. Belkî ji ber tirsa qiyametê û kêmasiya di wezîfa îbadet da ye. Ev kul û xem xêncî ji wê ku dil ronahî û zelal dike, dibe destpêka duristkirin a nefsê û bi cih anîna wezîfa bendetiyê. Û nûra ilmê, wê dilê wî ji cih rake û gel Xwedê û cihê kerameta wî bide naskirin; wê ji munacata Heq Teala gelek lezetê bibe û wê şevan hişyar bimîne û wezîfa xwe ya bendetiyê bi cih bîne. Çawa ku got: «... Lefa şaşikê ser kumê xwe ra gire dide û di tarîtiya şevê da radibe û bi tirsek ecêb îbadet dike û dua dike...»

Ji nîşanên vî alimê rebbanî, ew e ku her çend bi başî wezîfa xwe ya îbadet bi cih tîne, lê dîsa ditirsê û ronahiya zanînê nîşa wî dike ku çiqas wezîfa xwe bi cih bîne, her dîsa qasir e û kêmasî têda heye û nekariye şukrê nîmetê û heqê îbadet bi cih bîne. Veca dilê wî tijî dibe ji xeşiyet û tirsê. Xwedê der heqê wan da gotiye: «Ji nav bendên Xwedê hema tenê alim jê ditirsin».[1] Ronahiya zanînê tirs û xem pê ve tê, xweyê wê jî her çend li duristkirina xwe dixebite, lê ji tirsa zivirîngeha axretê dilrehetî jê ra nîne û duristiya xwe ji Xwedê dixwaze. Ji mijûlbûna bi xêncî ji Xwedê ve ditirsê û ji ehlê zeman direve. Ji ber ku ditirse ku newebe ew, wî ji rêka Xwedê û sefera axretî paşda bidin û dinyayê û xweşiyên wê bidin ber. Vêca Xwedê mirovê weha xurt û qahîm dike û stûnên wucûda wî bi cih dike û emana roja qiyametê didiyê. «Xwezika em digel wan buna. Veca bi awayek baş em xilas bibûyan».

1- Fatir / 28

## HEDÎSA BÎST Û ÇARÊ

بالسّند المتّصل إلى أفضل المحدّثين و أقدمهم، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، رضوان الله عليه، عن محمّد بن الحسن و عليّ بن محمّد، عن سهل بن زياد، عن محمّد بن عيسي، عن عبيد الله بن عبد الله الدّهقان، عن درست الواسطى، عن إبراهيم بن عبد الحميد، عن أبى الحسن موسي، عليه السّلام، قال:

**«دَخَلَ رسولُ الله، صلّي الله عليه و آله، المسجدَ فاذا جَماعَةٌ قَد أَطافُوا برجُلٍ. فقال: ما هذا؟ فقيل: عَلاّمَةٌ. فقال: و ما العَلاّمةُ؟ فقالوا له: أَعْلَمُ النّاسِ بِأَنْسابِ الْعَرَبِ و وَقائِعَها و أيّامَ الجاهليّةِ و الأَشْعارَ العَربيّةَ. قال: فقال النّبيُّ، صلّي الله عليه و آله: ذاك عِلْمٌ لا يَضُرُّ مَنْ جَهِلَهُ و لا يَنْفَعُ مَن عَلِمَهُ. ثمّ قال النّبيُّ، صلّي الله عليه و آله: إنّما العِلْمُ ثَلاثةٌ: آيَةٌ مُحْكَمَةٌ، أوْ فَريضَةٌ عادِلَةٌ، أو سُنَّةٌ قائمةٌ، و مَا خَلاَهُنّ فَهُوَ فَضْلٌ.»**

Hezretê Mûsa bin Cafer (a.s) dibêje: «Resûlê Xwedê (s.a.a) çû mizgeftê, wekî dît cemaetek ji xelkê li kesekî civiyane. Kerem kir: “Ev çi ye?” Gotin: “Allame ye; pir zana ye”. Kerem kir: “Çawa allame ye?” Gotin: “Zanatirînê xelkê ye der heqê neseba Ereban û qewimînên zemanê cahiliyetê û şiîrên Erebî”. Pêxember (s.a.a) kerem kir: “Ew zanîneke ku yê nezane çi zerer lê nabe û yê bizane jî çi feyde lê naqewime”. Paşê got: “‘Ilm û zanist hema sê ne: Ayeta muhkem û ferîza adile û suneta qaime (nîşana qahîm, an ferz û waciba durist û an suneta cih bûyî) û ji van pê ve zêdahî ye».

## Şîrove:

Di hinek nusxan da şûna «ma haza»yê da «men haza» hatiye. Ma haza, ji kêmkirinê ra gotiye.

Allame, mubalixe ye, û herfa «e» jî, ji mubalixe ra ye, yanî pir gelek zana. Di mentiqê da hatiye ku «men» ji bona pirsiyara der heqê şexs da ye. «Ma» jî ji pirsiyara heqîqeta heyî an şiroveya ismê mefhûm e. Çiko ji Resûlê Xwedê (s.a.a) ra gotin: “Ev allame ye”, wî hezretî xwest mefhûmê me'na allame, gorekî fikra wan bizane. Ji ber vê yekê bi kelîma «ma» pirsiyar kir. Çiko çêdibe carna bi wesfên serekî ji zatê tiştekî bêt pirsîn, wek vê ku heqîqeta wesf bêt zanîn, lê ewê xweyê wesfê nas neke, hingê bi kelîma «men» tê pirsîn: «Men el-allame?» Û eger şexs nas bikin, lê wesfê wî nezanin û an mexsed hema zanîna wesf be. Hingê bi kelîma «ma» tê pirsîn, di vî halî da pirsiyar ji zanîna wesf ra ye. Ne wesf digel mewsûf û ne jî mewsûfê tenê. Di vê hedîsa şerîf da jî çiko hat gotin filan kes allame ye, Pêxember (s.a.a) xwest heqîqeta wî wesfî di gomana wan da bizane. Vêca kerem kir: “Allame çi ye?” negot: “Allame kî ye?”. An “çima allame ye?”. Eva hat gotin ronahîtir e, ji wê ya lêkolê felsefî ya û feylesofê lêkol, Sedrul Muteellihîn qeddesellahu nefseh gotî. Ku jê xeberdana wê ne ji mexseda me ye.

### Vebir: Zanînên munasib

Pêşda hat gotin[1] ku bi awayê kullî mirov sê alem û meqam hene: Yek: alema axretê û cîhana xeybê û meqamê ruhaniyet û aqil. Du: Alema berzexê û navbera du aleman û meqamê xeyalê. Sê: Cîhana dinyayê û meqamê mulk û alema şehadeyê. Ji bona heryek ji van ra kemal û perwerdekirinek taybet û xas heye û ji heryekî ra amelek munasibê alem û meqamê xwe heye. Pêxemberan jî (a.s) emr û fermana wan kar û amelan li xwe girtine. Nexwe hemû

1- Destpêka şîroveya hedîsa yekê ya vê kitêbê.

ilm û zanistên nafi' û xweyê feyde bi van sê qisman teqsîm dibin, yanî: Ilm û zanista girêdayî bi kemalên aqlî û wezîfên ruhî ve; zanînên girêdayî bi amelên qelbî û wezîfên dilî ve; ilmê girêdayî bi amel û kiryarên qalibî û wezîfên cîhana eşkere ya nefsê ve.

Zanistên ku dibin sebebê xurtkirin û perwerdekirina alem û ruh û aqilê mucered, ilmê bi zatê muqedesê Heq Teala û marîfeta wesfên wî yên cemal û celalê; nasîna alemên xeybiye yê tecerudî ye. wek melaîket û eqsamên wan, ji bilindtirîn mertebên ceberûtê e'la û ji melekûtê e'la bigire heta biniya melekûtê esfel û melaîketên erdî û leşkerê Xwedê Teala. Û nasîna enbiya û ewliya û derece û meqamên wan; ilmê bi kitêbên nazilbûyî û çawaniya hatina wehyê û hatina melaîket û ruh; ilmê bi axretê û çawaniya zivirîna mewcûdatan bi alema xeybê û heqîqeta alema berzexê û qiyametê. Welhasil, ilmê bi destpêk û mebdeê û heqîqeta meratibên wê. Piştî Pêxember û ewliyan (a.s), yê ev ilm li bal wan, hema feylesof û hekîmên giranqedr û ehlê marîfet û îrfanê ne.

Zanînên ku der heqê terbiyet û perwerdekirina dil û karên dilî da ye, ilmê bi muhlikat û munciyatên exlaqî, yanî ilmê bi exlaqên qenc û baş, wek: Sebr, şukir, şerm, heya, nefs sivikî û razîbûn, cesaret, zuhd, were', teqwa û dîtir exlaqên baş. Her weha ilmê bi çawaniya dest ve anîna wan û mebadî û şert û mercên wê, her weha zanista exlaqên pîs, ji pêka: Hesed, tekebur, riya, xapandin û hezkirina ji mezinahî û meqam û huba dinyayê û bayê dil... Û zanista bi mebadiyên çêbûn a wan û ilmê çawaniya paqijbûn a ji wan. Ew ên piştî Pêxember û wesiyan (a.s) ev zanîn bi hêviya wan ve mayî, alimên exlaq û ehlê riyazet û mearifa ne. Û ilmên girêdayî bi terbiyet û perwerdekirina zahirî û eşkere ve, ku zanîna şerî'etê û ilm û adabê mu'aşiretê û teybîra malê û rêvebirina kar û barê bajar û welatan. Piştî enbiya û ewsiya (a.s) bi hêviya alim û feqîh û ehlê hedîsê ve maye.

Gereke bêt zanîn ku ev her sê ilm û zanîn, bi awayek wereng bi heve girêdayî ne, ku heryek eserê li ya dî dike, hem ji aliyê ke-

malê ve, hem jî ji aliyê neqs û kêmasiyê ve. Mesela: Eger kesek bi başî wek çawa pêxemberan gotî, wezîfa xwe ya îbadetî pêk bîne, pê bi cih anîna vê wezîfe û berpirsiyariyê eserek di dil û canê wî da çêdibe ku exlaq û baweriyên wî bi aliyê kemalê ve diherikîne. Her weha eger kesek hay ji temîzkirina exlaq û paqij kirina navdeyê xwe bimîne, wê di alema dî da eserê deynê. Çawa ku kemala îmanê û qewîkirina baweriyan eserê datîne ser mertebe û meqamê pêretir. Eva he ji ber wê ye ku navbeyna meqamat û merteban da girêdan û pêwendek dijwar û şidiyayî heye. Heta ku bikarbirina kelîma «pêwend û girêdan» jî ji ber wê ye ku kelîmeyek dî baştir ji wê di nav xelkê da nîne. Eger ne, ji xwe gereke bihata gotin ku: Ew yek heqîqet e, ku mezahir û mecal jê ra hene. Hema bi vî awayî kemalên meqamên sêyane, girêdayî ye bi kemala heryekî ve. Bila kesek goman neke ku bê amelên eşkere û îbadetê qalibî dikare bigehê îmana kamil û exlaqê bijartî; an eger exlaqek nedurist û ne hêjayî hebe, berhêvî be ku bigehê îmana kamil û amelên wî tam û temam bi cih bên; an goman bike bê îmana di dil da amelên wî yên eşkere temam û exlaqê wî kamil bibe. Dema kêmasî ket amelên qalibî û gora destûra pêxemberan (a.s) bi cih nehat, perde dikevin ser dil û tarîtiyek di ruh da çêdibe ku pêşiyê li ronahiya îman û yeqînê digire. Exlaqê pîs û rezîl jî bi vî awayî ye, ku eger hebe pêşiyê li nûra îmanê digire.

Nexwe ji rêwîngiyê axretê ra lazim e, ku pir baş hay ji van hersêka bimîne û durist bike û ji çi yek ji kemalatên ilmî û amelî paş nekeve. Bila goman neke ku hema qewîbûna yekî tenê ji exlaqên qenc an baweriyên qewî û an eşkereyê şerî'etê jê ra bes e, çawa ku hinek ji zanayên heryek ji wan, we goman dikin.

Bo nimûne, Şêxê Îşraq[1] di destpêka «Hikmetul Îşraq»ê da teqsîmek heye der heqê: Kamilê di ilm û amel da; kamilê di amel da;

---

1- Şêxê Îşraq, Yehya kurê Hebeş (Şehabuddînê Suhrewerdî) ji hekîmên sedê şeşê hicrî ye, ku bi nav û dengê Şêxê Meqtûl û Hekîmê Meqtûl jî tê nas kirin. Ew danerê mekteba Îşraqê ye û li sala 581-ê h.q temenê 36 salîyê da hat kuştin. Kitêbên jêrî ji wî ne: Hikmetul Îşraq, Bustanul Qulûb, el-Bariqatul Îlahiyye, el-Burûc, Şerha Îşarat, Awazê perê Cibraîl.

kamilê di ilmê da. Ji wê îstifade dibe ku: Kemala ilmî digel kêmasiya di amel da û bervajiyê wê çêdibe. Û ehlê kemala ilmî ji ehlê bextewerî û mutexellesê bo alema xeybê û tecerudê zaniye û ew di silkê illiyîn û ruhanîna da hesibandiye.[1] Hinek ji alimên exlaq jî serkaniya hemû kemalatan di duristkirina exlaq û paqijkirina dil da zanîne û heqîqetên dî yên heyîn qet bi tiştekî jî hesab nakin û belkî stiriyê ser rêka sulûkê dihesibînin. Her weha hinek ji zanayên zanînên zahirî, ilmên aqlî û batinî û mearifên îlahî, kufr û zendeqe dihesibînin û dikevin rikê digel zana û muhesilên wê.

Mertebên ruhê însanî li ber van hersê birên ser vê fikir û hizra nedurist hatiye perdekirin û nixûmandin û di ilm û zanînên pêxemeberan û weliyan da durist fikir nekirine. Ji ber wê yekê daim di nav wan da nexweşî û ji hevrevîn hebûye û pîjkan di hev ra dikin û wî batil û pûç zanin. Eva he di halekî da ye ku sînor çêkirina di merteban da, nedurist e. Bi gotinek dî, weha lê tê ku: Hersê di derewînkirina hevûdu da durist dibêjin, ne ji vî cihetî ve ku bi temamî ilm an amelê wan batil be, belkî ji ber vî cihetî ye ku sînorkirina mertebên însanî bi van hed û sînorên zanîn û kemalatan ku ew dibêjin, gotinekî ne rêketî ye di gel ya durist.

Resûlê Xwedê (s.a.a) di vê hedîsa şerîf da zanînan dike sê qisim. Qet şik têda nîne ku ev sê, der heqê van sê mertebên însanî da ne. Her weku ilmên di kitêbên îlahiyan da û di sunen û exbarên pakan da (a.s) hatine, şahid in ser vê gotinê. Çiko ulûmên wan hema par dibin ser van sê pişkan:

Yek ilm û zanîna bi Xwedê, melaîket, kitêb, pêxemberan û roja qiyametê, ku kitêbên asmanî nexasima Qurana Kerîm tijî ye ji gotinên vê der heqê da. Heta mirov dikare bêje gotinên der heqê vî ilmî da di Quranê da ji her tiştekî pirtir e. Her weha gazîkirina ji mebde û me'adê ra ku bi delîla durist û ronahîkirinek temam jê xeber dide û lêkolan behs jê kirine. Hedîsên

---

1- Şerha Hikmetul Îşraq, s. 22 - 25

îmamên hîdayetê jî (a.s) vê der heqê da ji hedê hêjmarê der in, ku bi muraci'a kitêbên cihê baweriyê wek Kafiya şerîf û Tewhîda Sedûq... gotin ronahî dibe.

Her weha der heqê temîz û paqijkirina batin û navdeyî; duristkirina exlaq da di kitêba Xwedê û exbarên Ehlê Beytê da pir gotin hene. Lê vêca ev kitêb û exbar li bal me, ew ên hatine nixûmandin û perdekirin, ji ber çav û nêrîna me dûr û mehcûr in; wê rojek bêt ku Xwedê wê hesaba wê digel me bibîne û ji me bixwaze û wê (ne'uzu billah) îmamên pak me ji xwe dûr bikin ji ber vê ku me xwe ji hedîs û ilmên wan dûr girtiye. Em hewara xwe ji Xwedê ra dibin ji ber aqibeta xirab û roja nexweşa qiyametê. Ne lazim e, ji xwe em li vêderê behsa hedîsên fiqih û amelê zahirî jî bikin. Çiko hemû kitêba bi awayek berfireh jê xeber dane.

Nexwe kifş bû ku ilmên şerî'etê hema ev sê qisim in, ku gora niyaza beşer û mertebên sêyane yên însanî ne. Û çi yek ji zanayên van zanînên heq, ne mu'teriz e li ser yên dî. Ne lazim e ku eger mirov zanînek tunebe, înkara wê bike û pîsatiya ji xweyê wê ra çêke. Li bal aqilê selîm çawa ku tesdîqa bêfikir ji nebaşî û exlaqên pîs e, tekzîb û înkarkirina bêfikir jî her wereng e, belkî jî hêj pîstir e. Eger Xwedê Teala ji me bipirse ku: Mesela: Hewe me'na «wehdeta wucûd»ê gora fikra hekîman nizaniya û hewe ji alimên wê fennê zanîn negirtbû û hewe ew zanîn û pêşekiyên wê hîn nekiribû, nexwe çima korkorane û bêfikir hewe buxtan li wan kir û kufra wan got? Hingê li huzûra Heq Teala da xêncî ku em ji şerman serê xwe bidin ber xwe, me çi cewab heye em bidinê. Helbet ev ozr jê nayê qebûlkirin ku bêje: Gomana min ew bû! Her ilmekî mebadî û pêşekî hene ku heta mirov ewa pêşekiyan nezane mirov nikare netîcê bizane. Nexasima meseleyek weha hûr û kûr ku piştî omr û temenekî zehmetê jî dîsa mirov heqîqeta wê fêhm nake û kakilê wê nikare dest xwe ve bîne. Tiştek ku feylesof û hekîman çend hezar salan li ser xeber dane û vejenîne, tu dixwazî bi xwendina kitêbekî an şiîrek ya Mewlewî, bi aqilê xwe yê kêm, fêhm bikî! Helbet tu nikarî fêhm bikî. «Rehma Xwedê

li wî yê qeyda xwe bizane û gava xwe zêdetir nevêje» (Xurerul Hikem, p. 408).

Her weha eger ji hekîmek mutefelsif û ji arifek mutekelif bêt pirsîn ku: Ji ber çi delîla dînî, te alimên fiqhê kêmkirin û ew înkar û derewîn kirin? Û bi kîjan delîla aqlî û şer'î te buxtankirina li zana û feqîhan caiz zanî? Di huzûra hezretê Heq da xêncî ku ji şerma serê xwe bide ber xwe, çi cewabek heye? Di her hal û karî da em ji vê biborin, çiko bi rastî tiştek nexweş e.

**Vebir: Zanînên sêyane; bawerî, exlaq û fiqih**

Piştî ku me'lûm bû sê ilm û zanînên Resûlê Xwedê (s.a.a) gotine, hema ew sê zanist bûn ku jê hat xeberdan, gereke bêt zanîn ku heryek ji van sê serekiyan kîjan zanîn û ilmê li ber xwe digire? Ev mesele her çend ne muhim e û ya muhim fêhma kok û binyata wan sê ilman û amelkirina bi wa ye, lêbelê ji ronahîkirina hedîsa şerîf ra lazim e em tiliya xwe bal vê meselê ve jî bikin.

Alimên mezin (Xwedê ji wan razî be) ku ev hedîsa şerîf şîrove kirine, ketine îxtilafê ku xeberdana ji wê dibe sebebê dirêjbûnê. Lê ewa tê fikra min a kurt, bi şahidên ku nehatine gotin em ê bêjin. Pey ra jî em ê îşare bikin bal nukteyekî ve ku şêx û seydayê me yê giranqedr, Şahabadî (temenê wî dirêj be) digota. Vêca bizane ku:

Ayeta muhkem, ilmên aqlî û baweriyên heq û zanînên îlahî ne.

Ferîza adile, ilmê exlaq û zelalkirin û safîkirina dil û qelb e.

Suneta qaim, ilmê zahirî û zanîn û adabên eşkere û qalibî ne.

Delîla ser vê tertîbê jî ev e: «Ayet» ku bi me'na nîşan e, munasib e, gel zanînên aqlî û baweriyê û gel wan rêk dikeve. çiko ew ilm û zanist nîşanên zat û esma û sifet û mearifên dî ne, pêşek û sabiqe jî tunebûye ku di zanînên dî da gotina ayet û nîşanê bi kar be. Bo nimûne, di gelek cihên Qurana pîroz da dema delîlê li ser hebûna Xwedê Teala an nav û sifetên wî zatê muqedes dike, an behsa hebûna qiyametê û çawaniya wê û alema xeyb û berzexê

dike, pey ra dibêje: «Ev ayet û nîşan in ji ehlê fikrê û aqilmendan ra».[1] Ev gotin der heqê van zanîn û mearifan da gelek bi kar tê birin. Di vî halî da eger pey hukmek piçûk yê şerî'etê an eslek ji eslên exlaqî ra ev gotin bêt, nexweş e. Her wereng «muhkem e» jî di gel van zanînan rêk dikeve. Çiko ev ilm û zanîn di bin mîzana aqilê û delîla muhkem û qewî da pêk tên û ilmên dî gorekî new' û awayê delîlê ne xurt û qahîm in.

Lê vêca delîla ser vê yekê ku «ferîza adile» der heqê ilm û zanista exlaq da ye, anîna sifetê «adile» yê ye ji «ferîze»yê ra. Çiko exlaqê qenc, çawa ku di wî ilmî da hatî: Derketina ji heddê kêmasî û zêdegaviyê (îfrat tefrît) ye, ku heryek ji du aliyên zêdegavî û kêmasiyê, ne baş in. Ya baş edalet û duristahî ye ku heddê navbera herduka ye. Mesela: Şuca'et, ku yek ji usûl û erkanên exlaqê hesene û melekên qenc e. Ew hema haletê navincî di navbera zêdegavî (îfrat) û kêmasiyê da ye (tefrît). Haletê zêdegaviya di şuca'etê da, jê ra tê gotin: «Tehewwur»; ew, hingê ye ku di cihê tirsê da jî netirse. Halê kêmasiya di şuca'etê da jî, jê ra tê gotin «cubn»; ew jî, hingê ye ku ne di cihê tirsê da bitirse. Her weha hikmet, ku yek ji erkanên exlaqê qenc e, wez' û halê navinciyê zêdahî û kêmê ye, yanî: Heddê navbera «sefeh» û «beleh»ê ye. Sefeh, ku jê ra curbuze tê gotin, bikarbirina fikir û hizrê ye ne di cihê wê da. Beleh jî, jikarxistina bîr û hizr û fikrê ye di wan ciha da ku gereke fikir bêt kirin. Ji vê pêkê ye: Îffet ku navincî û navbera "şereh û xumûd"ê ye û sexawet, ku navincî û navbera "îsraf û buxl"ê ye. Nexwe «adile»bûna «ferîze»yê delîl e ji vê ra ku mexsed ji wê ilmê exlaq e. Her weku kelîma «ferîze» bi xwe jî bi awayekî ji vê ra dibe delîl. Çiko ferîze -ku ketiye beranberê «sunet»ê da û ji qismê sisê ye- ew e ku ji fêhmkirina wê ra aqil, rêkek hebe û bikare têbigehê, çawa ku ilmê exlaq wereng e, bervajiyê sunetê ku te'ebbud û guhdana xwerî û xalis e û aqil bi xwe bi xwe nikarin têbigehin û fêhm bikin. Ji ber vê yekê jî em dibêjin

---

1- Beqere / 164, En'am / 98, Rûm / 21 - 24

ku: «Suneta qaime» der heqê zanînên teebudî û adabên şer'î da ye ku jê ra «sunet» hatiye gotin. Û aqil bi xwe bi xwe nikarin fêhm bikin û rêka sabitkirin û fêhmkirina wan tiştan hema sunet e. Çawa ku wesfdana sunetê bi «qaime»yê jî hema munasibê wacibên şer'î ne. Çiko «îqame - ragirtin» û pêkanîna wacibatan û ragirtin (îqame) û bi cih anîna nimêj û zekatê... Te'bîrek me'mûl û di cih da ye. Her weha ev kelîme di herdu ilmên dî da bi kar nayê û bi vê kelîmê nedurist e behsa wan bêt kirin. Eva he ew tişt e ku gora munasebetê mirov dikare bêje. «Û zanîn hema ew e li bal Xwedê».

**Vebir: Ayet û nîşan pîveka zanînê ye**

Niha bû dora gotina wê nukta ku me soza wê dayî. Ew jî ev e ku di hedîsa şerîf da bi kelîma «ayet» ji ilmê eqîde û mearifan hat xeberdan. Ayet, bi me'na elamet û nîşan e û nukta di wê da heyî ev e ku ilmên aqlî û heqîqetên eqîdetî eger hema ji bona fêhmkirina wan bi xwe be û hemû mefhûm û îstilah û terkîb û kelîme û teslîmkirina wan ji aqilên me yên zeîf ra ji bona dest ve anîna meqamat û mertebên dinyayê be, jê ra nayê gotin «ayetên muhkem» belkî hingê gereke jê ra bêt gotin: Perdên stûr û xeyalên pûç. Çiko eger mexseda mirov ji dest ve anîna zanînê, ne gihana Xwedayê Teala be û ne ew be ku exlaqê xwe bike Xwedêyî, hingê çiqas zanînekî bigire wê heryek bibe çalek jê ra û bibe perdeyek tarîker ji dilê wî ra û çavê dilê wî tarî bike û bikeve ber vê ayeta Quranê: «Kesê berê xwe ji bîranîna min bizivirîne, muheqeq ji wî ra jiyan û borandinek teng heye û di roja qiyametê da jî em ê wî kor bînin ber heşrê» (Taha / 124). Vêca di wê alemê da wê xwe kor bibîne û bêje Heq Teala: Ez di dinyayê da ne kor bûm, çima li vêderê te ez kor kirime! Cewab jê ra tê ku: Tu hema di wê alemê da kor bû. Çiko te ayet û nîşanên me nedîtin û te ew bi xwe dan ji bîr kirin. Pîvek di bînayî ya alema axretê da dîtina bi dil û besîretê ye. Beden û hêzên wê bi temamî li pey dil û qelb in û tabi'ê wê ne. Bila alimên mefhûman û zanayên îstilahan û jiberkerên

kitêb û mesfûran goman nekin ku zanayên Xwedêyî û melaîketî û axretî ne. Eger ilm û zanîna wan nîşan û elamet e, çima eser li qelbê wan nekiriye û dilê wan ronahî nekiriye, ne hema ew, belkî dilê wan tarî kiriye û ser xirabiya exlaq û amelê wan ve zêde jî kiriye! Di Quranê da behsa pîvek û mîzana aliman hatiye, li wêderê ku kerem dike: «Ji nav evdên Xwedê hema tenê zana jê ditirsin» (Fatir / 28). Tirs û xeşiyeta ji Xwedê Teala ji taybetmendî yên alim û zanaya ye. Kesê ev sifet têda neyî ji navbera aliman der e. Gelo dews û eserek ji xeşiyetê di dilê me da heye? Eger heye nexwe çima di eşkereyê da xuya nake û ne diyar e.

Ebû Besîr ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet kiriye ku Mîrê bawerdaran (a.s) digota: «Ey kesê li pey ilm û zanînê, zanînê gelek başî hene: Serê wê nefs sivikî ye; çavê wê dûrketina ji hesedê ye; guhê wê fêhmkirin e; zimanê wê rastî û duristî ye; parastina wê lêgeran e; dilê wê niyeta baş e; aqilê wê nasîna tişta û kar û bara ye; destê wê dilovanî û merhemet e; piyê wê ziyareta alim û zanaya ye; himeta wê selametî ye; hostahî ya wê xwevedana ji guneh û nebaşiya ye; sekingeha wê xilasî û necat e; serpêşê wê afiyet û selametî ye; merkeba wê wefa û duristî ye; çek û silahê wê xeberdana nerm e; şûrê wê razîbûn e; kevana wê borandin e; leşkerê wê gotûbêj û têkeliya alim û zanaya ye; mal û heyî ya wê edeb e; zexîra wê, xwe paşdedana ji guneha ye; qûtê wê, qencî kirin e; avdana wê hevrêkî; rênasê wê hîdayet û duristî; hevalê wê jî hezkirina ji qenca ye».

Ev tiştên Mîrê bawerdaran (a.s) gotine nîşanên alima û eserên zanînê ne. Nexwe eger kesekî ilmên resmî destê xwe ve anîn, lêbelê ji van tişta xel û xalî be, bila bizane ku tu behrek ji zanînê nebiriye, belkî ji cahil û rêşaşa ye û roja qiyametê xema wî ji hemû kul û xeman mezintir e. Vê gorê ilm û zanîn ew e ku nîşan û elamet be û nefs û bayê dil di wê da tunebe, neku bibe sebebê xwemezinkirin û xwenîşandan û tekeburê.

Eva he ku gotiye: Muhkem, ji ber wê ye, çiko zanîna durist ew e ku ronahiya wê di dil da bibe sebebê ji navçûna şik û dudiliyê.

Çêdibe ku mirov di temamê omrê xwe, nav delîl û muqediman da noqî bibe û ji mearifên îlahî ra pir delîlan bîne û di wextê xirecir û gotûbêjê da ser eqran û hevalan bikeve, lê wê ilm û zanînê qet eser lê nekiribe û dilrehetiyek jê ra çênekiribe, şûnê da jî ser şik û dudilî û şubha wî ve zêde kiribe. Nexwe hema komkirina mefhûman û serhevda kurisandina îstilahan qet çi feyde jê ra nîne û dil bi xêncî Xwedê ve mijûl dike û berê wê ji zatê Heq Teala dide paş û jê bêxeber dike.

Ey ezîz! Derman û îlac pêkve di vê da ye, ku eger mirov bixwaze zanîna wî Xwedêyî be, xwe bi çi zanînê ve mijûl kir, bila niyeta xwe xalis bike. Serçavka xilasiyê û serkaniya jorda hatina rehmetê hema xwerîkirina niyetê, û niyeta xalis e.

Kesê çil rojan xwe ji Xwedê ra berde [dilê xwe xalis bike ji Xwedê ra], wê serkaniyên hikmetê ji dilê wî biherikin ser zimanê wî. Belê, eser û feydeyên îxlas a çilroje ev in. Nexwe eva he ku çil salan an zêdetir tu di nav ehlê îstilahên her ilmekî da xebitî û tu xwe di zanîna da allame dizanî û xwe ji leşkerê Xwedê dihesibînî, lê di dilê xwe da tu qet eserekî ji hikmetê û di zimanê xwe da dilopekî ji wê nabînî. Bizane ku xebat, tehsîl û zehmeta te, zelal û bi îxlas nebûye, belkî tu ji şeytan û bayê dil ra xebitî. Vêca niha ku te dît ji van zanînan wez' û halek durist nehat pêş, qederekî hema ji ceribandin ra be jî dest bavêje xaliskirina niyetê û zelalkirina dil û qelb, eger eserek jê xweyha, hingê pirtir bikeve pey. Her çend eger deriyê ceribandinê vebe deriyê îxlasê tê girtin. Lê dîsa belkî pencere û zeraqeyek jê vebe û ronahiya wê te hîdayet bike.

Ezîz! Tu di her halî da û di hemû aleman da muhtacê zanînên heqe yên îlahî û exlaqên baş û amelên qenc î. Tu di çi derecê da bî, bixebite û îxlasa xwe zêde bike û xeyalatên nefsî û weswesên şeytanî ji dil bibe. Helbet hingê wê netîce bide û tu wê rêkekî bi aliyê heqîqetê ve bibînî; wê rêka hîdayetê ji te ra vebe û wê Xwedê destê te bigire. Xwedê zane eger em bi vî wez' û halê xirab ve û bi vê dilreşiyê biçin wê alemê, wê çi bela û musîbet ser me da

bên. Çi asteng wê li pêşiya me hebin û ev ilm û exlaqên xirab wê çi zulmet û bizdan û çi agirî ji me ra berhev bikin.

**Vebir: Ev hedîs gora lêkolîna feylesofê mezin**

Lêkolê feylesofan, sedrul hukema yên Xwedêyî (qeddesellahu sirreh) di şerha Usûla Kafî da ji Şêxê Xezalî[1] gotinekî digêre ku di wê da ilm teqsîm kirine bi ilmên dinyayî û axretî. Ewî di wê gotinê da ilmê fiqhê ji ilmên dinyayî hesab kiriye, ilmê axretî jî teqsîm kiriye bi ilmê mukaşife û muameleyê. Û gotiye ilmê muamelê ilmê ehwalê dil e, gotiye: "'Ilmê mukaşifê jî ronahiyeke ku piştî paqijiya dil û zelalbûna wê ji pîsatiyan têda peyda dibe, ku pê wê ronahiyê heqîqet eşkere dibin heta ku heqîqeta zat, esma, sifet û heqîqetên dî tên dest û ronahî dibin". Çiko lêkol bi vê gotinê razî bûye di şerha vê hedîsê da ku xeberdan li ser e, gotiye: "Heçweku teqsîma Hezretê Resûl (s.a.a) ku hema ilm kirin sê qisim, der heqê ilmên muamelê da be, çiko ev ilm in ku zêdetirê xelkê feydê jê dibin. Lê ilmê mukaşifê di hinek kêm ji xelkê da peyda dibe ku gelek hêjayî ne. Çawa ku hedîsên behsa kufr û îmanê jî şahid in ser vê gotinê". Gotina wî bi kurtî ew bû ku hat gotin.

Nivîserê vê kitêbê dibêje: Xeletî tê ser gotina Şêxê Xezalî. Ser ferza duristiyê vêca xeletiyek dî tê ser gotina rehmetiyê Axond.

Eger gotina Xezalî bêt selimandin, hingê xeletiya tê ser gotina wî

---

1- Xezalî, Ebû Hamid Muhemmed bin Muhemmed (450 - 505 h) leqeba wî Huccetul Îslam e, ji mezintirîn feqîhên şafi'îyan e û di eqîdê da Eşarî bûye. Li Nîşabûrê ket nav feqiyên Îmamul Heremeyn Cuweynî da û ji wî gelek qedr û qîmet dît. Wezîrê Nizam-ul Mulkê Tûsî ji ber qedr û qîmetê wî, medresa pir muhim ya Nizamiyye ya Bexdayê sipart destê wî. Xezalî piştî demekî ji ber guherînek mezin ya rûhî, ku têda peyda bû ji ilmên resmî dest kişand û rêka tesewufê ji xwe ra bijart. Eserên jêrî hinek ji kitêbên wî ne: el-Wesît û el-Besît, di ilmê fiqhê da; Îhyau Ulûmid Dîn; el-Mustesfa, di ilmê usûlê da; Mi'yarul ilm; Tehafutul Felasife.

ev e ku: Ewî ilmê muamelatan; ilmê bi ehwalê dil ji xilaskeran, wek: Sebr, şukr, xewf û recaê... Û ji muhlikatan, wek: Kîn, hesed, xell û xeş... zaniye, vê gorê ew sê ilmên Resûlê Xwedê (s.a.a) gotine nikare bibe ji ilmên muamelatan, ji qismekî pê ve, yanî «ferîza adile» ku jê hat xeberdan.

Lê vêca der heqê gotina Şêx Xezalî da du xeletî tên ser: Yek ev ku ilmê fiqhê ji ilmên dinyayî hesab kiriye û feqîh ji alimên dinyayî hesibandine, eva he di halekî da ye ku ev ilm ji hêjatirîn ilmên axretî ye. Eva he ji huba nefsê û hezkirina ji wê ya bi gomana xwe ehlê wê ye, derdikeve meydanê. Yanî ilmê exlaq bi me'na mute'arefa resmî, hema ji ber vê ye ku ilmên dî, heta ilmê aqliye jî derewîn kirine. Xeletiya dî ev e, ku mukaşifat di nav ilman da daniye û ev bervajiyê rastiyê ye. Belkî heq ew e, ku em ewa ku bikeve di pîveka fikir, bîr, hizr û burhanê da, ilm bizanin. Halhale mukaşifat û muşahidat carna netîce û desthata ilmên heqîqî ne, carna jî netîca amelên dil û qelbî ne. Welhasil gereke muşahidat û mukaşifat nav teqsîma ilman da neyin û ji wan hesab nebin, çiko mukaşife tişteke û ilm tiştek dî.

**Vebir: Gelek ji zanistan dikevin bin van sê zanistan**

Evê jî bizane ku gelek ilm bi awayekî dikevin bin yek ji van sê qismên ilmê da, ku Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir. Wek: Ilmê tib, doktorî, nucûm û heyet... Lê ew hingê ye ku em bi çavê nîşan û elamet lê binhêrin û berê xwe bidinê. Her weha ilmê tarîxê eger em bi çavê îbret û şîretbûnê lê binhêrin. Hingê ew di bin «ayeta muhkeme» da cih digirin, ku bi rêka wan ve zanîna der heqê Xwedê û roja qiyametê da peyda dibe, an zêde dike. Carna zanîna wan dikeve bin serekiya «ferîza adile» carna jî «suneta qaime» da. Lê eger dest ve anîna wan ji wan bi xwe ra be an ji îstifadeyek dî, hingê eger me ji ilmên axretî paşda bidin, ji ber vê paşda dane, ne di zatê xwe da belkî ji ber paşda dane, ne hez in; eger ne, bêzerer û bênef' in. Çawa ku hezretê Resûl (s.a.a) kerem kir. Nexwe ilm hemû sê ne: Yek ew ku li alemên dî da feydê digehîne

mirov ku gihana wa hedefa afirandinê ye. Ev hema ew e ku wî hezretî kiriye sê qisim. Yek dî ew ku zererê li mirov dike û ewî ji pêkanîna wezîfe û berpirsiyariyên wî paşda dide. Ev qismê zanînan nebaş e û gereke mirov li dora wan nezivire, wek: Zanista sihrê... Ya sisê jî ew e ku feyde û zerer jê neyê û mirov wextê xwe yê zêde bi wan ve biborîne, wek hesab û hendese û heyet... Eger mirov bikare eva ilma rêk bêxe gel yek ji ilmên sêyane gelek baş e, eger ne, çiqas mumkin be mirov xwe jê bide paş, baştir e. Çiko dema mirov pê hesiya ku bi vî omr û temenê kurt û kin nikare hemû zanîna bi destê xwe ve bîne, gereke fikir bike ku kîjan jê ra pir feydetir e, xwe bi wê ve mijûl bike û li kamilkirina wê bigere. Helbet di nav zanîna da ewa ku bibe sebebê xweşî ya jiyana daimî û ebedî, ew baştir e û muhimtir e. Ew jî ilm û zanîneke ku pêxemberên Xwedê (a.s) û ewliyan destûr pê dane û şewq bi wî alî ve çêkirine, ew jî wek çawa hat gotin hema ev sê ilm in. «Wel hemdu lillah te'ala».

## HEDÎSA BÎST Û PÊNCÊ

بسندي المتّصل إلى شيخ المحدّثين و أفضلهم، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، رحمه الله تعالى، عن محمّد بن يحيى، عن أحمد بن محمّد، عن ابن محبوب، عن عبد الله بن سنان، قال:

**«ذَكَرْتُ لأبي عبد الله، عليه السّلام، رجُلاً مُبْتَلي بالوضُوءِ و الصّلاةِ، و قلتُ: هُوَ رَجُلٌ عاقِلٌ. فقال أبو عبد الله، عليه السّلام: و أيُّ عَقْلٍ لَهُ و هُوَ يُطيعُ الشّيطانَ؟ فقلتُ لَهُ: و كيفَ يُطيعُ الشّيطانَ! فقال: سَلْهُ هذا الّذي يأتيه من أيّ شيء هو، فإنّه يقول لك: مِنْ عَمَلِ الشّيطانِ.»**

Abdullahê kurê Senan dibêje: «Min ji Îmam Sadiq (a.s) ra behsa yekî kir ku di destnimêj û nimêjê da weswese hebû, min ev jî got ku: "Mirovek aqil e jî". Vêca Îmam Sadiq (a.s) got: "Çi aqil heye, halhale guhdariya şeytan dike?" Min gotê: "Çawa guhdariya şeytan dike?" Kerem kir: "Hema ji wî bi xwe bipirse ku: Ew karê dike çi ye û ji kî ve hatiye. Wê bêje: Ji karên şeytanê ye".»[1]

### Şîrove:

Bizane ku weswese û şik û tezelzul û şirk ji xeterên şeytanî û ji karên îblîsî ne ku têxe dilê xelkê. Vêca bervajiyê wê, dilrehetî, yeqîn, xweragirî û xulûs... Ji danên rehmanî û ilqaatên melekî ne.

Kurtê gotinê vê der heqê da em dikarin weha bêjin ku: Qelbê mirov letîfeyeke navbeyna mulk û melekût û dinya û axretê da.

---

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 12

Berê wê ji aliyekî ve li alema dinyayê ye û bi wî awayî evê alemê ava dike. Aliyê dî yê wê ber li alema axret û melekût û xeybê ye, pê wê jî axretê û alema melekût ava dike. Nexwe dil wek ayna dualî ye ku berê aliyekî li alema xeybê ye û aliyê dî jî berê wê li alema dinya û şehadê ye ku sûretên mulkiye yên dunyewiye têda xuya dikin. Û suwerê dunyewiye ji medarikên hisiye yê zahirî û hinek medarikên batinî, wek wehm û xeyalê di wê da dixweyhin. Suwerên uxrewiye ji batin aqil û xefiya dil, di wê da xuya dikin. Û eger wecheya dunyewiye ya dil xurt bû û berê wê bi temamî ket avakirina dinyayê û xema wê bû dinya û di xweşiyên zik û binzik... Da noqî bû ji ber vê berêxwedana batilê xeyalê digel melekûtê sufla munasebetek peyda dibe ku di şûna sîbera tarî ya alema mulk û tebîet û alema cin û şeytan û nufûsên xebîse da. Û ji ber vê munasebetê ilqaên ku di wê da çêdibin, ilqaên şeytanî ne û dibin jêdera xeyalên batil û ewhamên xebîs. Û çiko berê nefsê li dinyayê ye, meyla bi wê xeyalên batil çêdike û îrade û biryar jî dibe tabi'ê wê û hemû amelên qelbî û qalibî pêkve dibin ji pêka amelên şeytanî, wek weswese û şik û dudilî û ewham û xeyalên batil, gora wê, biryaran di mulkê bedenê da eserê datînin. Û amelên bedenî jî gel suwerên batinî yê qelb rêk dikevin. Çiko amel, şikl û wêneyê îradê ne û ew jî şikl û sûretê ewhaman, ewham jî şikl û ber dana dil in. Nexwe çiko berê dil li alema şeytana bûye, tiştên ku di wê da peyda dibin, rengê cehlên murekebên şeytanî bi xwe digirin, vêca netîca wê ji batin bi şiklê: Weswese, şik, şirk û dudiliyê derdikeve meydanê û mulkê bedenê li ber xwe digire.

Gorekî ya hatî gotin, eger berê dil li avakirina axretê be û berê xwe bide alema xeyb û veşartî, bi awayekî dibe munasibê melekûtê e'la ku alema melaîketan û nefsên pak û paqij û bextewer in û di şûna sîbera nûranî ya alema tebîet da ye, hingê zanînên wê dibin ji qismê zanînên rehmanî û baweriyên durist û tişta dikeve dil da, ji qismê tiştên îlahî ye û ji şik û şirkê paqij dibe û halek yê xweragirî û baweriyê di nefsê da çêdibe. Veca meyl û

viyanên wê jî dibin ji wê pêkê û îrade gorekî viyanên wî lê tên. Welhasil, amelên qelbî û qalibî û eşkere û navdeyî gora pîvek û kêşeka aqil û hostahî û şehrezatiyê pêk tên.

Ev tiştên dikevin dila, çi şeytanî û çi jî rehmanî, derece û mertebe jê ra hene. Lê vê gavê xeberdana berfireh wê der heqê da ne munasib e.

Hinek exbarên şerîf jî delîl in ji gotina hatî gotin ra, wek riwayeta ku Mecmeul Beyan ji Eyaşî[1] riwayet dike:

Îmam Sadiq (a.s) dibêje "Pêxember (s.a.a) kerem kiriye: "Dilê di singê her bawerdarekî da du guh jê ra hene. Di guhekî da melaîket pif dike û di guhê dî da şeytanê weswas çêker pif dike. Xwedê, bawerdar bi melaîket xurt dike û bihêz têxe. Ev hema ew e ku Xwedê kerem dike: «Û ewa bi ruhekî ji aliyê xwe ve xurt û qewî kir»."

Hedîsek dî di Mecmeul Behreynê da hatiye dibêje: «Şeytan pozê xwe datîne ser dilê mirov, xurtûmek wek xurtûma biraz bi pozê wî ve ye, vêca weswesê ji mirov ra çêdike ku berê xwe bide dinyayê û wan tiştên ku Xwedê helal nezanî. Lê dema mirov Xwedê bîne bîra xwe, şeytan baz dide û direve». Hedîsên dî jî vê der heqê da hene.

**Vebir: Çawaniya tehareta pakan**

Piştî ku bi rêka ehlê zanînê ve eşkere bû ku weswese ji karên şeytanî ye -çawa ku di hedîsan da borî- lazim e, em bi awayek dî jê xeber bidin ku her kes fêhm bike. Her çend gotina pêşiyê da li bal ehlê wê, gorekî kêşekên aqlî û qalibê burhanî û rêketî bû digel hizra ehlê marifet, muşahidat û ehlê dilan. Lê çiko ronahîkirina wê girêdayî ye bi hinek binyat û qaliban ve ku evder ne cihê gotina wa ye, me dest jê kêşa.

---

1- Eyaşî, Muhemmed bin Mes'ûd bin Eyaşê Silmî yê Semerqendî, Ji rawîyên tebeqa heştê yê sedê sisê ye. Siqe ye û pir hedîszan bûye. Jê ra dused tesnîf gotine ku meşhûrtirînê wan tefsîra Quranê ye bi navê: Tefsîra Eyaşî.

Vêca gotin ev e: Şahidê vê yekê ku weswese ji karên şeytan e û sebebê dînî û îmanî jê ra nînin -her çend gora xeyala pûça xweyê wê hebe jî- ev e ku: Weswese dij e, digel ehkamên şerî'etê û riwayet û eserên Ehlê Beytê. Bo nimûne, di hedîsên mutewatir da ji Ehlê Beyta paqij (a.s) gihaye me ku destnimêja Pêxember (s.a.a) bi yek car av pêdakirina li ser endamên destnimêjê bû. Û di şerî'etê da hatiye ku çengek av ji rû şûştinê ra û yek ji destê rastê ra û yek ji destê çepê ra bes e. Lê îxtilaf heye der heqê du çeng av û ducar şûştinê da, heçku ji gotina xweyê kitêba «Wesail»ê tê fêhmê ku ji xwe ne caiz e. An jî kême kêm mirov der heqê caiz nebûna wê da têxe melhezê. Hinek dî xilafê wê gotine, eger çi caizbûna ducare jî cihê melhezekirinê ye û şohretek girîng û riwayetên zehfî delalet dikin ser sunet bûna wê. Lêbelê ne dûr e ku yek şûştin; şûştunek baş, baştir be. Lê bi sê şûştina, bi awayekî ku di her sê şûştina da bi temamî av ser temamê endaman da biherike, bid'e û heram e û eger bi zêdahiya wê meseh bike destnimêj jî betal e. Di exbarên Ehlê Beytê da jî hatiye ku «şûştina sisê bid'e ye û her bid'eyek di agir da ye».

Vê gorekê ew cahilê weswasî ku ji deh caran zêdetir endamên destnimêjê dişo û her car avê ser hemûyê da diherikîne, mirov dikare li ber kîjan pîvekê bipîve? Gelo gel kîjan hedîs û fetwayê rêk dikeve? Evî bextreşî bîst salan an zêdetir pê vê destnimêja batil nimêj kiriye û ew durist û muqedes jî zaniye! Şeytan ewî dixapîne û nefsa emmare hîlê lê dike. Lê dîsa jî ew xeletiyê tîne ser xelkê û xwe durist zane. Gelo tişta ku muxalifê hedîsê û gotina alima ye, gereke ji şeytan bêt hesabkirin an ji nîşanê pakiya dil û teqwayê? Eger ji teqwayê û îhtiyata di dîn da ye, nexwe çi bûye ku gelek ji van weswasiyan di wa cihên ku îhtiyat baş e û lazim e, qet îhtiyat nakin? Heta niha hewe kengê guh lê bûye ku kesekî der heqê mal da weswas hebe? Heta niha kîjan weswasî şûna carekî zekat û xumsdanê da du caran daye? Û şûna carekî hecê da çend caran çûbe? Û xwe ji xwarina şubhe têda heyî parastibe? Çi

bûye ku «îsaletul hilliyye»[1] cih girtiye, lê «îsaletut teharet»[2] bê eser bûye? Halhale di babetê hilliyetê da xwe vedana ji ya şubhe têda heyî, pêştir e. Hedîsên şerîf jî wek hedîsa «teslîs»ê delîla wê ye, lê di babetê teharetê da bervajiyê wê ye. Yek ji îmamên pak dema diçûya destnimêjê, bi destê xwe yê mubarek av li ranê xwe direşanda da ku eger tereşuh kir kifş nebe. Lê ev rebenê he ku xwe ji peyrewê wî îmamî zane û dînê xwe ji wî digire, di mesela mal da xwe ji tiştekî venade! Piştî xwarina ku bi paldana ser îsaleta teharetê xwarî, dev û destê xwe dişo û pak dike! Demê xwarinê xwe bi îsaleta teharetê digire, piştî xwarinê dibêje hemû tişt necis e! Eger bi gomana xwe ji ehlê ilmê be jî, dibêje ez dixwazim bi destnimêjek waqi'î nimêj bikim. Eva he di halekî da ye ku seratiya nimêja bi destnimêja waqi'î kifş nebûye û me navek ji wê ji şerî'etzana guh lê nebûye! Eger tu ehlê destnimêja waqi'î yî, çima tu ne ehlê hilliyeta waqi'î yî? Fereza tu dixwazî teharetek waqi'î dest ve bînî, vêca şûştina dehcare ya di ava quleteyn û carî da çi ye û ji çira ye? Halhale yek car şûştin bes e û ser gotina hemûyan du car şûştin ji xwe her bes e. Nexwe şûştina çendîn û çend care ji karê şeytanî û xemilandina nefsê pê ve ne tiştek dî ye. Û çiko sermayeyek pûç e, ewê dikin wesîla xwe muqedeskirinê.

Vêca hêj ji vê jî xirabtir, weswesa di niyet û tekbîra destpêka nimêjê da ye. Çiko di wê da dikevin nav çendîn gunehan ra û xwe pak û paqij dihesibînin. Bi vî karî ji xwe ra seratiyekî dibînin! Di vê niyetê da ku lazimê hemû amelên îxtiyarî ye û mirov nikare yek ji karên îbadî û neîbadî bê wê bi cih bîne, gora îxtilafa şeyteneta wan û xurtbûna şeytan ser wan, ji saetekî heta bi çend saetan bi cih anîna vî karê lazim ra mijûl dibin û paşîra jî nayê cih! Gelo gereke eva he ji karên şeytanî û amelên îblîsê le'în bêt

---

1- Qa'ideyek ya fiqhê ye bi vê me'nê ku heta heram bûna tiştekî sabit nebe, ew helal e.

2- Qaîdeyek ya fiqhê ye, gora vê qaîdê her tiştek ku şik di pakî ya wê da hebe, heta ku necisbûna wê sabit nebe, pak û paqij tê hesabê.

hesibandin ku ev jarê he hefsar kiriye û ev karê lazim li ber veşartiye û kiriye di nav gunehan ra, wek: Nîvcû hiştina nimêjê û terka wê û borandina demê nimêjê, an gereke ji pakî û paqijiya dil û batin û teqwayê hesab bibe?

Yek ji peyhatên weswesê nimêj nekirina pey wan kesa ye ku gorekî şerî'etê adil in û eşkereyê wan durist e. Û hay ji amelên xwe yên şer'î hene, navdeyê wan jî Xwedê pê dizane û teftêşa wê ne lazim e û belkî ne caiz e. Lê dîsa şeytan mirovê weswasî gem û lixab dike û dibe kuncê mizgeftê û ji cemaeta musilmana cuda dike û tenêkî, ne bi cemaet nimêja xwe dike! Vêca delîla xwe jî dike ev ku: Min şubhe heye, ne ser dilê min e û di dilê min da rûnanê! Lê vêca ji pêşnimêjiyê ra hazir e û xwe qet jê nadê paş! Halhale karê pêşnimêj dijwartir e û pirtir cihê şubhekirinê ye. Lê çiko gora bayê dilê wî ye, der heqê wê da nakeve şubhê!

Yek ji peyhatên weswesê, ku ji gelekan ra tê pêş. Di qiraetê da ye, carna ji ber ducarkirin û stûrkirinê ji qa'idên tecwîdê jî derdikevin, car heye şiklê kelîmê bi temamî tê guherîn! Mesela: Dallînê wisa dixwîne ku nêzîk e bibe "qaf"! "Hê" ya «Rehman û Rehîm»ê... Wisa di geriya xwe ra dipêçe û asê dike ku dengek ecêb jê derdikeve! Navberê têxe navbeyna herfên yek kelîmê ku kelîme ji halê xwe derdikeve û şiklê wê bi temamî tê guherîn. Welhasil, nimêja ku mîraca mumin û muqerebîn û muteqîna ye û stûna dîn e. Vala dibe ji me'newiyet, remz û razên îlahî, hemû quweta xwe dide tecwîdê, vêca wê jî ji hed dertîne bi awayekî lê dike ku gora şerî'etê jî tu rêkek ji wê ra neyên dîtin. Gelo ev ji weswesên şeytan e, an ji danên Rehman? Ji nav van hedîsên der heqê huzûra dil di nimêjê da, wî rebenî hema tenê weswesa di niyetê da û kêşana medda «weled dallîn»ê fêhm kiriye ku di wextê gotina wê da zêdeyê ji hed dev û çavên xwe xwehro mehro dike. Ma gelo ev ne musîbet e, ku salên dirêj mirov ji huzûra dil û dermankirina teşwîşê xafil bimîne û li duristkirina wê negere û rêka islahê ji ehlê dil ne elime û pê amel neke û bi van karên pûç ve mijûl bibe û ewê, nîşana pakiyê bihesibîne?! Halhale go-

rekî gotina kitêba pîroz, ew ji “xennasê le'în” e[1] û gora gotina sadiqîn îmamên hîdayetê (a.s) ji amelê şeytan e û gora fetwaya feqîhan amelê pê wê batil e!

Carna jî sebebê çêbûn an zêdebûna weswesê di mirov da ji ber wê ye ku nezanen wek wî, ewê, jê ra seratî û başî hesab dikin. Wek vê ku pesnê diyanet û teqwa wî bidin û bêjin: Teqwatiya pir û zehfî bûye sebeb ku weswas jê ra çêbe! Halhale weswasê qet girêdan û pêwend bi dîn ve nîne, belkî dijê dîn e û ji nefehmiyê ye. Lê çiko heqîqeta meselê jê ra negotine û lome lê nekirine û pesnê wî dane û medhê wî kirine, ketiye pey vî karê xirab heta di xwe da şidandiye û xwe kiriye pêleyistoka şeytan û leşkerê wî û ji meydana qudsa muqereban dûr ketiye.

Nexwe ey ezîz! Niha ku me'lûm bû hem gora aqilê hem jî neqlê ku ev weswesa şeytanî ye û ji karên îblîs e. Û dixwaze amelê me betal bike û me ji Xwedê dûr bike. Belkî jî ji vê weswesa di amel da bes neke û weswesê di baweriyê û diyaneta te da çêke û bi şiklê dînî, te ji dîn derîne û te der heqê mebde û me'adê da bêxe di dudiliyê da û ji her û her ra te bextreş bike. Şeytan ku nikare yên wekî te, bi fisq û fucûran ji rê derîne, bi rêka îbadet û menasikan ve xwe nêzîk dike û cara yekê ewa amel û kiryaran pûç û batil dike ku bi wan mirov dikare nêzîkê Xwedê bibe, ew bi pûçkirina wan, rêka dûrketina ji Heq Teala û nêzîkiya şeytan û leşkerê wî vedike. Û tirsa wê yekê heye ku baweriyên te ji xwe ra bike pêleyistok. Gereke çawa hebe hûn li dermankirin û îlaca wê bigerin.

**Vebir: Çareya ilmî û amelî ya weswasê**

Bizane îlac û dermanê vê nexweşiya dilî ku tirsa wê yekê jê heye ku mirov bi aliyê bextreşiya ebedî ve bibe, wek nexweşiyên dî yên dil, bi zanîna bi feyde û amel, hêsan û sehl û rehet e. Lê ewil gereke mirov bizane ku nexweş û ne sax e, vêca di pey ra wê li

---

1- Îşare ye bal ayeta 4 û 5 ya sûretê Nas ve.

dermankirina xwe bigere. Lê ya nexweş ew e ku şeytan meselê wisa têxe rê ku rebenî xwe nexweş û nesax hesab nake, belkî xelkê xwehr û ne dîndar dihesibîne.

Rêka ilmî ya dermankirinê ew e ku, di xeberdana hatî gotin da bifikire. Ya baş ew e, mirov kar û amelê xwe bi fikir bike; bide fikra xwe, ev amelê wî yê dixwaze Xwedê pê razî be, gereke ji kî bigire û çawa pêk be. Me'lûm e ku gereke xelk bi rêka feqîh û şerî'etzana ve bizanin ka gereke çi bikin û feqîh jî bi rêka kitab û sunet û îctihadê ve bi vê yekê zanin. Vêca dema em dinhêrin kitêbên feqîhan em dibînin ku ewa zanayan tekzîba weswesê kirine û tiştek derewîn zanîne û hinek amelên weswasiyan betal zanîne; dema em berê xwe didin hedîsan û kitêba pîroza Xwedê, em dibînin ku kar û amelê wî ji şeytan zanîne. Nexwe mirovê aqil bi şertê ku şeytan ser aqilê wî xurt nebûbe, eger piçekî bide aqilê xwe û bifikire, gereke ji xwe ra lazim bibîne ku desta ji vê weswesa xirabker bikêşe û bixebite ku amelê xwe durist bike heta ku Xwedê pê razî be.

Lazim e her kesî di xwe da bi bêhna vê meselê bihese, biçê bal xelkê û ji wan bipirse gelo weswasî ye. Û gereke çawaniya amelê xwe ji aliman ra bêje. Çiko gelek caran çêdibe ku weswasî ji halê xwe bêxeber e û xwe durist dibîne û xelkê nedurist zane. Lê eger piçekî fikir bike wê fêhm bike ku ev jî ji şeytanê xebîs e. Çiko wê bibîne alim û zanayên mezin ku ilm û amelê wan qebûl dike û merce'ên teqlîdê ku ew meselên xwe yên şer'î ji wan digire û helal û heramê ji wan hîn dike, kar û amelê wan bervajiyê wî ye, hingê nikarê bêje giştiya dîndar û alimên mezin û mezinên dînî guh nadin dînê Xwedê û ji wan ra ne muhim e û tenê dîn ji yê weswasî ra muhim e. Vêca piştî ku bi rêka ilmî ve eva he zanî û fêhm kir, lazim e amelê xwe durist bike. Hingê gereke bikeve kar û amel, karê girîng di vê merhelê da ew e ku guh nedê weswesên şeytan û xeyalatên ew têxe dilê wî. Eger weswesa wî di destnimêjê da ye, bila ji rikê şeytan da hema ji çengek av tenê îstifade bike. Muheqeq wê şeytan bêjitê ev ne karek durist e, bila

hingê cewaba wî bide ku eger nedurist e, nexwe amelê Pêxember (s.a.a) û îmamên pak (a.s) û hemû feqîh û alimên dînî jî gereke nedurist be. Resûlê Xwedê (s.a.a) û îmamên pak (a.s) nêzîkê sêsed salan destnimêj girtine û gora exbarên mutewatir hema bi vî awayî destnimêj girtine, vêca eger amelê wan betal bê, hema bila yê min jî betal be. Û eger tu ji muctehidekî teqlîd dikî, weha bêje şeytan: Ez gora gotina muctehid amel dikim, eger destnimêja min betal be, Xwedê li min nagire, çiko delîl di dest min da heye. Eger şeytanê mel'ûn şik çêkir ku: Naxêr, muctehid we negotiye, hema kitêbên wan veke û bide pêş çavên wî. Eger tu çend caran bi vî awayî guh nedî gotinên şeytan û bervajiyê gotina wî bikî, wê ji te bêhêvî bibe. Hingê hêvî ew e, nexweşiya te derman bibe, çawa ku di hedîsên şerîf da jî hatiye gotin:

Zurare û Ebû Besîr dibêjin: “Me gotê (Îmam Baqir an Îmam Sadiq (a.s): Yek nimêj dike, lê di nimêjê da dikeve şikê û nizane çi kiriye û çi jê maye. Wê çi bike?” Got: “Wê dîsa nimêj bike”. Me got: “Eger çiqas ji ewil ve destpêkir dîsa her car ket şikê, wê çi bike?” Got: “Bila guh nede şika xwe”. Paşê got: “Bi şikandina nimêjê ewî adetê ji wî xebîsî ra çênekin, çiko wê timahiya wî di hewe da çêbe. Şeytanê xebîs wereng e, ku adeta tu jê ra çêkî dikeve ser wê adetê. Vêca guh nedin wehm û xeyalê û nimêjê pir xirab nekin. Çiko eger çend caran we bike, êdî şik lê nazivire”. Piştî wê kerem kir: “Şeytanê xebîs dixwaze guhdariya wî bêt kirin, vêca dema neguhdariya wî bêt kirin êdî nayê bal tu yek ji hewe”.

Îmam Baqir (a.s) got: «Dema pir ji bîr kirin ji te ra çêbûn, dewamê bide nimêja xwe, belkî desta ji te bikêşe, muheqeq şik ji şeytan e».

Helbet eger demekî tu guh nediyê wê bela xwe ji te veke û halê dilrehetiyê wê li te bizivire. Lê di gel vê muxalefeta xwe jî, xwe ji Xwedê ra bişikîne û ji ber xirabiya şeytan hewara xwe ji Xwedê ra bibe û hana xwe bigehîne wî zatê muqedes, ku muheqeq wê destê te bigire. Çawa ku di riwayeta Kafiyê da destûr hatiye ku isti’aze bêt gotin.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Kesek hat bal Resûlê Xwedê (s.a.a) û gotê: "Ey Resûlê Xwedê, min şikayeta xwe ya halê nimêjê aniye bal te, di nimêjê da ewqas weswese ji min ra çêdibin ku ez nizanim min çi kiriye û çi maye". Ewî (s.a.a) kerem kir: "Dema te dest nimêjê kir, tiliya xwe ya şehdê li ranê xwe yê rastê bide û bêje: «Bismillah we billah we tewekkeltu alellah e'ûzu billah essemî' el'elîm mineş şeytanir recîm», vêca hingê tu dê wî dûr bikî".»

## HEDÎSA BÎST Û ŞEŞÊ

بالسّند المتّصل إلى ثقة الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، عن محمّد بن الحسن و عليّ بن محمّد، عن سهل بن زياد و محمّد بن يحيى، عن أحمد بن محمّد، جميعا، عن جعفر بن محمّد الأشعريّ، عن عبد الله بن ميمون القدّاح، و عليّ بن إبراهيم، عن أبيه، عن حمّاد بن عيسي، عن القدّاح، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال قال رسول الله، صلّي الله عليه و آله:

**«مَن سَلَكَ طَرِيقًا يَطْلُبُ فيه عِلمًا، سَلَكَ الله به طريقا إلى الجنّةِ. و إنّ الملائكةَ لَتَضَعُ أجْنِحَتَها لِطالبِ العلمِ رضا به. و إنّه يَستَغْفِر لطالبِ العلم مَن فى السّماءِ و مَنْ فى الأرض حتّي الحُوتَ فى البَحْرِ. و فَضْلُ العالمِ علي العابدِ كَفضْلِ القَمَرِ علي سائرِ النُّجُوم لَيلَةَ البَدْرِ. و إنّ العُلماءَ وَرَثَةُ الأنبياءِ، إنّ الأنبياءَ لَمْ يُوَرِّثُوا دينارا و لا دِرهَمًا، و لكن وَرَّثُوا العلمَ، فَمن أخَذَ منه، أخَذَ بِحَظٍّ وافِرٍ.»**

Hezeretê Îmam Sadiq (a.s) dibêje, Pêxember (s.a.a) kerem kiriye: «Kesê bi rêkekî ve biçe, da ilm û zanînê destê xwe ve bîne, Xwedê wê ewî bêxe ser rêyek ya bihiştê. Û melaîket ji ber ku razî ne ji talibê ilmê, perê xwe jê ra datînin. Heçî yê di erd û ezmana da heyîn heta bi masiyên binê behra jî ji peyketê zanînê ra daxwaza lêborînê dikin. Û seratiya alim li ser abid wek seratiya heyva şeva çardehê ye li ser stêrên dî. Û alim warisê pêxembera ne. Pêxemberan dînar û dirhem paş xwe ve nehêlane; ya paş xwe ve hiştîn, hema ilm û zanîn e. Veca kesê ji wê destê xwe ve anî, ewî parek pir destê xwe ve xistiye».(1)

---

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 34, behsa seratî ya ilmê û xêra alim û muteellim, h. 1

## Şîrove:

Bizane kelîmên hedîsê ne muhtacê şerh û şirovê ne. Lê em ê di çend vebiran da hinekî behsa van xeslet û taybetmendiyan bikin ku Resûlê Xwedê (s.a.a) ji ilm û ehlê ilmê ra gotine, «Xwedê palgeh e ji me ra».

### Vebir: Yê li pey zanînê bi aliyê bihiştê ve diçe

Lazimê zanînê ye ku bi awayek giştî ilm û zanîn dibin du qisim: Yek ilmên dinyayî ku mexseda paşîn ji wan, gihana dinyayê ye. Ya dî jî ilmên axretî ne, mexseda paşîn ji wan jî, gihana muqedime û derecên melekûtî û gihana pêlekanên axretî ne. Pêşiya niha da îşare hatkirin ku: Zêdetirê caran tişta ferqê têxe navbeyna herduka da niyet e. Her çend ew bi xwe jî di cinsê xwe da ji du sinxên ji hev cuda ne. Ji ber eserên ku di vê hedîsa şerîf da ji peyketina ilmê û aliman ra hatî gotin, kifş e ku mexsed ji wê qismê duwê ye, yanî ilmê axretî.

Her weha pêşda me got ku hemû ilmên axretî ji sê qisman ne der in: An ji pêka zanîna bi Xwedê û mearifa ye; an ji pêka zanînên paqijkirina nefsê û sulûka bi aliyê Xwedê ve ye. An jî ji pêka adab û sunenên îbadetî ye. Niha jî em dibêjin avakirina axretê bi van sê mesela ve girêdayî ye. Vê anegorê bi awayek giştî bihişt jî sê bihişt in: Yek bihişta zat, ku xayeta ilmê bi Xwedê û mearifên îlahî ye. Ya dî bihişta sifetan, ku netîca temîzkirina nefsê ye. Ya sisê jî bihişta amela ye ku şiklê bendetiyê û netîca wê ye. Û ev bihiştên he, ne ava ne, çawa ku erdê cenneta amelan vala ne, wek erdê nefsê di destpêkê da. Û 'umran û avabûna wan tabi'ê 'umran û avabûna nefsê ye. Çawa ku eger meqamê xeybê nefsê bi mearifê îlahiye û cezebatên xeybiye yên zatiye tamîr û ava nebe, bihişta zat û cenneta liqaê, destê mirov ve nayê. Û eger tehzîb û pakiya batin û navdeyî çênebe û ezm û biryar xurt nebe û dil nebe cihê berqdana esma û sifetan, bihişta esma û sifetan ku bihişta navincî ye ji mirov ra çênabe. Û eger bendetî û îbadet neke û amel û

kiryar û hereket û sekenatên wî ne gora şerî'etê bin, bihişta amelan ji wî ra nîne, ew bihişta: «Fîha ma teştehîhil enfus...»[1]

Gora vê pêşekiyê ku rêketî ye gel burhana hekîm û zewqa ehlê mearif û exbarên enbiya û ewliya (a.s) her weha ji kitêba îlahî jî tê fêhmkirin, ulûm di her derecekî da bin, çi ilmê mearifa bin û çi xêncî wê, rêka gihana bihişta munasibê wê ye; û salikê rêka her ilmekî, salikê rêkek ji rêkên bihiştê ye. Û me pêşiya niha da got:[2] Ilim pêkve rêka amelkirinê ye, heta ilmê mearifan jî. Lê ilmê mearifî, amelên dilî û cezebên batinî ne, ku desthata wan amel û cezeban û şiklê wan yê navdeyî, şiklê cenneta zat û bihişta liqayê ye. Nexwe pê ve çûna rêka ilmê, pê ve çûna rêka terîq û rêka bihiştê ye û rêka rêkê jî hema rêk bi xwe ye.

## Nukteyek muhim

Eva he ku gotî: «Xwedê wê ewî bi wê rêkê, bêxe ser rêka bihiştê», rêka ilmê nisbet daye bal ebd ve û rêka bihiştê nisbet daye bal Xwedê Teala ve. Eva he ji wê ra ye ku di meqamê zêdahiyê da, xelebe daye aliyê dest ve anîna ebd, lê di meqamê zivirîna li wehdetê da aliyê Heq Teala xalib kiriye; eger ne, bi nêrînekî mirov dikare bêje: Pê veçûna rêka bihiştê jî mensûbê bal ebd ve ye: «Û ya kirine hazir dibînin»,[3] «vêca kesê qas zerekî başî kiribe wê bibîne * Û kesê qasî zerekî jî xirabî kiribe wê bibîne».[4] Û bi nêrînek dî mirov dikare bêje, pê ve çûna rêka ilmê jî bi teyîd û tewfîqa îlahiye û nisbeta wê bal zatê Heq Teala ve ye: «Bêje: Hemû ji aliyê Xwedêveye».[5]

Cenabê lêkolê felasifa û fexra bir a heqê, Sedrul Muteellihîn (r.a) vê der heqê da gotinek heye û koka wê ser vê ye ku: Nefs û esla

---

1- Zuxruf / 71: Heçî ya dil dixwaze û çav xweşîyê jê dibîne di wê da heye.

2- Hedîsa 23 û 24

3- Kehf / 49

4- Zilzal / 7 - 8

5- Nisa / 78: Qul kullun mîn îndîllah.

îdraka mulayim û munafir, cennet û dojeh in, ilm ji mulayimatên nefsê û cehl ji munafiratên wê ye.

Eva he bervajiyê gotina wî hêjayî bi xwe ye di kitêba «Mesfûratê Hikemiye» di redkirina ramanên Şêx Xezalî da.(1)

Gora jê hatî neqilkirin, ewî bihişt û dojeh heml kiriye ser xweşî û nexweşiyên nefsê û hebûna wan bi xwe înkar kiriye.(2) Û ev bîr û hizr digel wê yekê ku muxalifê burhana hekîma ye, dijê exbarên pêxemberan û kitêbên ezmanî û gotina hemû dîna ye. Û hezretê feylesofê giranbiha ew red kiriye û gomana wî pûç kiriye. Lê vêca ewî hêjayî bi xwe tiştek wek wê li vê behsê da gotiye, her çend bîr û hizra Xezalî qebûl nake. Di her hal û karî da ev gotin, gora fikra min nedurist e. Lê li vêderê jî zêdetirê ji evqas xeberdanê nedurist e.

### Vebir: Melaîket baskên xwe li ber talibê ilmê radixin

Melaîketên Xwedê gelek sinf û qisim hene ku ji zatê eqdesê Ellamul Xuyûb (c.c) pê ve çi kes bi wan ku leşkerên wî ne, nizane: «Û xêncî ji Xwedê kesî ji leşkerên Xwedayê te agahî nîne».(3)

Qismek ji wan melaîketan meczûb in, ku hema ji binî ve li alema wucûdê nanhêrin; nizanin ka ji xwe Xwedê Adem afirandiye yan ne; noqî bûne di cemal û celala Xwedê da û fanî bûne di kibriyaa zatê muqedes da. Hatiye gotin ku di ayeta mubareka «Nûn * Wel qelem we ma yesturûn» da, kelîma «nûn» îşare ye bal wan melaîketan ve. Birek dî melaîketên muqereb in, ku cihê wan di ceberûtê bilind da ye. Vêca deste û birên wan pir in û ji heryekî ra di aleman da ew şan û tedbîr hene ku ji yên dî ra nînin. Desteyek dî melaîketên ewalimê melekûtê e'la û cennetên bilind in, ku ew xwe vêca deste û birên muxtelif û cûr bi cûr in. Qismek dî melaî-

1- Esfarê Erbe’e, c. 9, p. 172

2- Tehafutul Felasife, Xezalî, p. 286

3- Muddessir / 31: We ma ye’lemu cunûde rebbeke îlla hû.

ketên ewalimên berzex û misalê ne. Qismek dî yên alema tebîet û mulk in û heryekî karek bi hêviya wan ve ye. Ev deste û qismêhe xêncî ji wa ne ku di alema berzex û misalê da heyîn, çawa ku jê hatî xeberdan û riwayet jî dibêjin.

Gereke ev jî bêt zanîn ku bask û pirtik bi hemû qismên melaîketan ve nîne, belkî ji melaîketên muheymin bigire heta yên di melekûtê e'la da cih girtine, berî û munezeh in ji van piç û endamên miqdarî. Lê di hemû melaîketên alema misal û mewcûdên melekûtî yê berzexî da çêdibe ku endam, bask û pirtik... hebin. Û çiko ewalimên teqedduratên berzexiye û temesûlatên misaliye ne, heryekî qasek kifş û endam û piçên mexsûs bi xwe ve hene. Der heqê vî qismê melaîketan da ye: «Sond bi rêzên melaîketan».[1] «Xweyê bask û çeng in; dudu, sêsê, çarçar çeng bi wan ve hene».[2] Lê vêca melaîketên muqereb, ew ên di ceberûtê e'la da cih girtine, ji ber hebûna wucûda qeyûmî dikarin gora her alemekî şiklê wê bi xwe bigirin, wek Cebraîlê Emîn ku ji muqereba ye û hilgirê wehya îlahî ye û di merteba jorî ya cihgirtî yên ceberûta e'la da ye, ji Resûlê pakê Xwedê ra daim di şiklê muqeyîd da û du caran di misala mutleq da û carna jî di mulk da xuya dikira. Heta di mulk da carna bi şiklê "Dihye yê Kelbî" hevşîrê Resûlê Xwedê (s.a.a) ku sipehîtirînê xelkê bû, dixweyha.

Lazim e ev jî bêt zanîn ku temsîla mulkî ya melaîketan ne bi awayê mewcûdatên mulkî ye ku her selîmul hissek bikarê wan bibine. Belkî dîsa layê melekûtiyê wan xurt e û aliyên mulkî lawaz û zeîf e. Ji ber vê yekê dema diketan şiklê mulkî da jî dîsa xelkê bi çavê mulkî ew nedidîtan, belkî bi teyîda Heq Teala û îşara hezretê Nebiyê Xatem (s.a.a) hinek ji sehaban ew di şiklê "Dihye yê Kelbî" da didîtan. Û pê vê ronahîkirinê, talibên ilm û marîfetê û ew ên berê wan li heq û heqîqetê û di rêka razîbûna Xwedê da ji zarokên ruhanî yên hezretê Adem in (a.s) ku me-

---

1- Saffat / 1

2- Fatir / 1

laîket jê ra çûne secde, berê melaîketan lê ye û emrê wan hatiye kirin ku ewî bihêz bêxin û perwerde bikin. Û çiko evê he bûye mulkî yê melekûtî û erdî yê ezmanî, piyê xwe datîne ser baskên melaîketan. Û eger çavên besîreta melekûtî û misalî vebin, wê bibîne ku li ser çeng û perê melaîketa ye û bi alîkariya wan rê ve diçe. Ev der heqê wan da ku ji mulk bi aliyê melekût ketine rê, her çend hêca li rê diçin û di rêkê da ne.

Lê ew ên hêca mulkî ne û neketine di melekûtê da, weheye yên melekûtî mijûlê teyida wan bin û perên xwe ji tewazu' ra li ber pî yê wan raxistibin, ji ber ku ji wan û kar û amelê wan razî ne û kêfa wan jê ra tê, çawa ku di hedîsê da hat gotin. Hedîsa di kitêba «Xewalî el-Lealî»yê da jî hatiye ku: "Miqdad (rehma Xwedê lê be) dibêje, min ji Pêxember (s.a.a) guh lê bû got: «Ji ber ku melaîket hej talibê zanînê dikin, baskên xwe ji wan ra datînin heta ew piyê xwe danin ser».

Nexwe kifş bû ku gav avêtina yekê bal Xwedê û bal razîbûna wî ve, hema gav avêtina li ser milê melaîketan û rûniştina li ser çeng û perê wa ye û heta bi axirîn derecên tehsîla ilm û zanînê ev rayêx her berdewam e. Lê derece û mertebe ferq têda hene, ev talibê ilm û zanînê çêdibe heta bi wê derecê pêşda biçe û bigehê wêderê ku êdî rêk ji melaîketê muqereb ra tunebe û ji ser baskê wan bilind bibe bi aliyê jorî ve û dewamê bide bilind çûna xwe heta bi wêderê ku Cebraîlê Emîn ê wehyê bêje, «Eger ez qas benda tiliyekî jî hêj biçim, ez ê bişewitim».

Piştî ku vê gotinê dijatî gel delîl û burhanê nîne. Belkî rêketî ye gel wê, çawa feylesofê hêja Sedrul Muteellihîn gotî, êdî tu sebeb nînin ku bêt tewîlkirin.

#### Vebir: Daxwaza lêborînê ji peyketê zanînê ra

Bizane di cihê xwe da hatiye nivîsîn ku heqîqeta wucûdê, eynê hemû kemal, esma û sifeta ne. Çawa ku sirfê wucûdê, sirfê kemalê ye. Û ji ber vê ye, Heq Teala ku sirfê wucûd e. Sirfê hemû

kemala ye û eynê hemû esma û sifetên cemal û celalê ye. Di hedîsê da hatiye: «Pêkve ilm û zanîn e û pêkve qudret û karîn e».[1] Û ev, hevrê ye digel burhanê ku: Heqîqeta wucûdê di ayne û mir'atan da eynê hemû kemalata ye û tu yek ji kemalan jê venabe. Lê eşkerebûna kemalan gora firehî û tengiya wucûdê û ronahîbûn û tarîtiya ayne û mir'atê ye. Ji ber vê yekê ye ku hemû silsila wucûdê nîşanên zat û ayne û mir'ata esma û sifeta ne. Her çend delîlek qewî û cihgirtî ser vê gotinê heye û rêketî ye gel muşahida ehlê şuhûdê û zewqa ehlê marîfetê, her weha rêketî ye gel ayetên Qurana pîroz û exbarên Ehlê Beytê.

Di çend cihên kitaba Xwedê da behsa tesbîhên hemû mewcûdan dike: «Heçî ya di erd û ezmana da heyî, tesbîhan ji Xwedê ra didin». «Tiştek nîne ku hemd û tesbîhên Xwedê nedin. Lê hûn tesbîhên wan fêhm nakin».[2] Gelek eşkere ye ku ji tesbîh û teqdîs û pesindana îlahî ra lazim e ku zanîn û marîfet hebe der heqê meqamê muqedesê Heq Teala, esma û sifetan da û ev yek bê awayek yê marîfet û zanîn û nasînê, çênabe. Û ev gotin di riwayetan da wereng eşkere û ronahî jê hatiye xeberdan ku qet rêk ji me'nekirin û tewîlê ra namîne. Lê perdekiriyên ji ehlê felsefa resmî û xirecira kelamî, bi awayek sar û bêtam, kelamê îlahî tewîl kirine ku xêncî ji muxalefeta gel eşkereyê riwayet û ayetan, wek: Behsa xeberdana mûrî yê di sûretê mubarekê «Neml» da, di hinek cihan da gel burhana hikmetê jî dijatî heye. Lê behsa ji burhanê û pêşekî yên wê, ne munasibê halê vê kitêbê ye.

Nexwe pesindana Xwedê ya mewcûdatan bi têgehan û zanîn e. Û di hedîsê da hatiye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «Dema pêşiya pêxemberiyê da min şivanî dikira, carna min didîta ku bêsebeb, pez dibizda û direviyan. Piştî hatina Cebraîl, min sebeb jê pirsî. Got: "Ev bizdan ji ber wê derbê ye ku li kafira didin û ji seqeleyna pê ve, mewcûd hemû ewê dibihîzin û baz didin".»

---

1- Fusûs, Farabî, p. 253 û 416

2- Îsra / 44

Û ehlê marîfetê dibêjin: Heta ku mirov mijûlê mulk û teybîra wê ve ye, der heqê melekût da ji hemû mewcûdan nixûmandîtir û mehcûbtir e. Çiko mijûliya wî ji hemûyan pirtir û qewîtir e. Nexwe perdebûna wî jî ji hemûyan pirtir e û ji gihana melekûtê ra mehrûmtir e.

Her weha hemû mewcûdan layê melekûtî hene ku gora wê ji wan ra jiyan û zanîn û tiştên ji jiyanê ra lazim, hene: «Û her weha me melekûtê erdê û ezmana nîşa Îbrahîm da».[1] Ev jî aliyek dî yê esera saxî û zanînê ye di mewcûdata da.

Vêca dema me'lûm bû ku mewcûdan hemûya zanîn û nasîn û layê melekûtî hene -lê çiko mirov ne ji pêka wa ye û ji melekûtê jî perdekirî ye, nikare zanînê der heqê jiyana wan da peyda bikene dûr e ku daxwaza lêborînê bikin ji mirovê ser silsila wucûdê ra ku di rêka ilm û zanînê da ye û berê wî li Heq Teala ye. Û bi zimanê qal yê melekûtî ku guhê vekirî yê melekûtî dibihîze, ji meqamê xefariyeta zatê muqedes ê Heq bixwazin ku evî welîdeyê kamil ê mulk û vî fexrê mewalîd ên tebîet di behra xufran a xwe da noqî bike û hemû neqs û kêmasiyên wî mestûr bike û veşêre.

Ev jî çêdibe ku, çiko mewcûdên dî zanin xêncî bi peyketina mirovê kamil û arifê mearifê îlahî û cami'ê ilm û amel nagihin fena ya di zatê muqedes da û noqîbûna di behra kemalê da ji bona wan çênabe -ev jî di cihê xwe da kifşe bûye-. Ji ber vê yekê kemala însanî ku bi noqîbûna di behra xefariyeta Heq da tê dest, bixwazin da ew bi xwe jî pê wê bigehin kemala layiqê xwe.

#### Vebir: Alim wek heyva di şevên bedrê da ye

Şeva bedrê, şeva sêzdeh, çardeh û pazdeh ê mehê ye

Bizane: Heqîqeta ilm û îmanê ku xwe bi ilmê radigire, nûr e. Ev

1- En'am / 75: We kezalîke nuriye Îbrahîme melekûte essemawati wel erd.

gotin, xêncî rêketina digel burhan û îrfanê, gel exbar û riwayetên Ehlê Beytê jî (a.s) rê ketiye. Çiko heqîqeta nûrê -eşkere yê zatî û eşkerekerê tiştan- ji heqîqeta zanînê ra sabit û durist e. Sidqa wê ji heqîqeta ilmê ra heqîqet e û ji nûrên hisiye ra pirtir rengê mecazê dide. Çiko nûra hisî di heqîqet da zuhûr û eşkereyî ya zatî jê ra nîne û ji te'eyyunatên wê heqîqet e û mahiyet jê ra heye. Lê heqîqeta ilmê eynê wucûdê ye bi zatê xwe û di mefhûm da muxalif e gel wê. Lê heqîqet û metnê e'yana da gel wê muwafiq û muttehid e. Heqîqeta wucûdê eynê nûr û ilmê ye: «Xwedê nûra ezmana û erdê ye».[1] Nexwe ilm hema nûr û ronahî bi xwe ye. Ayetên pîroz bi kelîma nûr ji ilm û îmanê xeber dane: «Kesê Xwedê nûr nedabiyê ew bênûr e».[2] Gora tefsîra ji Ehlê Beyta paqij gihayî destê me, nûr, di ayeta pîroza Nûr da, bi ilm û zanîn hatiye tefsîrkirin. Gorekî riwayeta Îmam Sadiq (a.s). Ji wê pêkê ye riwayeta Îmam Baqir jî (a.s).

Di riwayetek dî da hatiye: «Bawerdar di nav pênc nûra da ye: Medxela wî nûr e û derketgeha wî nûr e û zanîna wî nûr e û xeberdana wî nûr e û roja qiyametê rêka wî ya bi aliyê bihiştê ve, nûr e». Di hedîsa meşhûr da jî hatiye: «Ilm nûreke ku Xwedê dike dilê wî da yê ew bixwaze».

Evê nûrê, gora merteba ilm û îmana mirovan derece hene. Lazim e bêt  zanîn; çiko ev nûra heqîqî ya ku di dilê ehlê îman û ilmê da heyî ji qismê nûra axretî ye, wê nûraniyeta hisî peyda bike û hema ew e ku wê siratê ronahî bike. Nûraniyet gora xebata dilî ya di alema mulk da eşkere dibe. Nura hineka wek rojê ye û ya hineka wek heyvê. Heta bigehê wê nûrê ku hema li ber piyê wan tenê ronahî dike.

Eşkere bû ku ilm, nûr û eşkerebûna heqîqî ye û ne mecaz; lê em ên reben ku nav perdên tarî yên tebîet da û di şeva zulmanî ya

---

1- Nûr / 35: Allahu nûrus semawati wel erd meselu nûrîhî ke mîşkat…

2- Nûr / 40

mulk da ne, em ji şems û tava heqîqî ya ilmê û nûra zanînê mehcûb în û em goman dikin ku ev wek misalê ne û mecaz û isti'arat in. Belê, heta em di xewa vê dinyayê da ne û di nav serxweşiya tebîet ra ne û heqîqetan ji mecazê neqetînin, em ê heqîqetan ser şiklê mecazî bibinin. Mirov di xew da ne û dema bimirin wê hişyar bibin. Piştî ku em çavê xwe vekin, em ê bibînîn wek çawa nûra roj û heyvê ronahî dide, nûra ilmê jî wereng e. Di vê alemê da dilê tarî ronahî dike û jiyanê ji mirî yên nezanînê ra çêdike, di wê alemê da jî nûra wî her cih li ber xwe girtiye û wê bi wê ronahiyê şefaetê bike.

Gereke bêt zanîn ku bê ilm, îbadet jî nayê kirin, ji ber vê yekê ye ku mirovê abid jî ji bona xwe û taybetê xwe, nûr heye. Belkî ji xwe îman û îbadet jî ji qismê nûrê ne, lê nûra abid hema tenê ronahiyê ji wî ra çêdike û ber piyê wî tenê ronahî dike, û ronahiyê nade yên dî. Ji ber vê ye ku mesela nûra wî wek ronahiya stêra ye di şeva çardehê da ku ji ber ronahiya heyvê ronahiya wan xef dibe. Bi awayek wereng ku hema ronahiyê dide xwe û feydê û ronahiyê nade yên dî. Nexwe mesela abid ber alim da mesela stêra ye. lê ne di şeva tarî da ku heta qederekî ronahiyê dide, belkî di şeva bedrê da ku hema zahir û ronahî ne, ne ku muzhir û ronahîker.

Cenabê Sedrul Muteellihîn (q.s) dibêje: "Mexsed ji alim di vê hedîsê da, ne alimê rebbanî ye ku ilmê wî ledunî û Xwedêdayî ye, wek ilmên enbiya û ewliya (a.s); çawa ku misal anîna bi heyvê delîl e ji vê gotinê ra, eger we bûya baştir bû ku mesela rojê anîbûya, çiko nûra wê bê wasita tiştek dî ji Heq Teala ye".

**Vebir: Zana warisên pêxembera ne**

Ev weraset ruhanî ye û wîladeta aliman ji pêxemberan, wîladetek melekûtî ye. Mirov çawa ku bi hesebê alema mulkî û cismî jêderê mulk e, piştî terbiya pêxemberan û cih hatina meqamê qelbî ji bona wan, wîladeta melekûtî peyda dikin. Çawa ku serçavka vê

wîladet û bûnê, bavê cismanî ye, serçavka wê wîladetê jî pêxember in. Nexwe ew bavên ruhanî ne û weraset jî weraseta ruhanî ye û wîladet, wîladeta duwemî ya melekûtî ye. Piştî pêxemberan wezîfa terbiyet û hînkirinê bi hêviya aliman ve ye ku warisên ruhanî yên heqîqî yên pêxembera ne. Gora vê hedîsê, pêxember bi hesebê vî meqamê ruhanî, ne xweyê dirhem û dînaran bûne û berê wan ne li vê alema mulk bûye û bi hesebê vî meqamî irsa wan ji ilm û zanînan pê ve, ne tiştek dî bûye. Her çend bi hesebê wîladeta mulkî û kar û barê dinyayî wek beşeran bûne: «Bêje: Hema ez beşerek im wek hewe».[1] Bi hesebê vî meqamî alim ne warisê wan bûne, belkî warisê wan zarokên cismanî yên wan bi xwe bûne û çêdibe bi hesebê vî meqamê cismanî irsa wan dirhem û dînar bin.

Delaletek eşkere di vê hedîsa şerîf da heye ku mexsed weraseta ruhanî ye, çawa ku hat gotin. Hedîsa ku hatiye nisbet dan bal hezretê Resûl (s.a.a) ve ku dibêje: «Em ên pêxember, irsê paş xwe ve nahêlin»[2] eger durist be, hingê kifş e mexseda wî ev e ku: Bi hesebê karê pêxemberiyê û weraseta ruhanî, em mal û serwetê paş xwe ve nahêlin; irsa me ilm û zanîn e. Û ev yek eşkere ye.

1- Kehf / 110 : Qul înnema ene beşerun mîslukum…

2- Musneda Ehmedê Henbel, c. 2, p. 463

## HEDÎSA BÎST Û HEFTÊ

بالسّند المتّصل إلى الشيخ الأجلّ و الثّقة الجليل، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، رضوان الله عليه، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد، عن ابن محبوب، عن عمر بن يزيد، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال:

**«فى التّوريةِ مَكتوبٌ: يابنَ آدمَ، تَفرَّغْ لعبادتى، أَمْلَأُ قلبَك غِنًي و لا أَكِلُكَ إلى طَلَبِكَ، و عَلَيّ أنْ أَسُدَّ فاقَتَك و امْلَأُ قلبَك خَوفا مِنّى. و إن لا تُفَرِّغ لعبادتى، أَمْلَأُ قلبَك شُغْلا بالدّنيا، ثمّ لا أَسُدُّ فاقَتَك و أَكِلُكَ إلى طَلَبِكَ.»**

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Di Tewratê da nivîsiye: “Ey benî Adem! Xwe ji îbadetê min ra berde, ez ê jî dilê te dewlemend bikim û te nehêlim hêviya xwesta te ve. Û li ser min e ku ez feqîretiya te ji nav bibim û dilê te tijî tirsa ji xwe bikim. Lê eger tu xwe ji îbadetê min ra bernedî, ez ê dilê te bi dinyayê ve mijûl bikim û di pey ra jî ez feqîriya te ji nav nabim û ez ê te bihêlim hêviya peyketina te ve».[1]

### Şîrove:

«Teferrexe» yanî: Hemû wextê xwe pê borand, bi awayek wereng ku bi tiştek dî ve mijûl nebû. Teferruxa dil ji îbadet ra, valakirina wê ye ji berêxwedana tiştek dî.

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 83

**Vebir: Xwe valakirin ji bo îbadetê**

Bizane ku valabûna ji îbadet ra bi cudakirina wextê û valakirina dil e ji wê ra. Ev karek gelek girîng e, di mesela îbadet da ku bê wê huzûra dil çênabe û îbadetê ku huzûra dil pê ra nebe, bêqîmet e.

Du tişt dibin sebebê huzûra qelb: Yek valakirina wext û qelb e, ya dî ew e ku dil bi muhimiya îbadet bêt hesandin. Mexsed ji valakirina wext ew e ku mirov di şev û rojê da wextekî ji îbadetê xwe ra veqetîne û kifş bike ku di wî wextî da xwe ji îbadetkirinê ra berpirsiyar bizane û di wî wextî da xwe bi tiştek dî ve mijûl neke. Eger mirov pê bihese îbadet ji wan karên muhim û girîng e û muhimtir e ji karên dî û digel tu karekî nayê qiyas kirin, hingê bêşik wê wextekî jê ra deyne û hay jê bimîne. Em ê vê der heqê da paşê hinekî xeber bidin.

Di her hal û karî da gereke mirovê dîndar hay ji wextê îbadetê xwe hebe. Gereke hay ji wextê nimêja xwe hebe ku muhimtirîn îbadet e û di wextê fezîletê da nimêjên xwe bike û di wan wexta da bi karek dî ve mijûl nebe. Bi wî awayê ku ji kar û kesb û xwendin û mutali'a xwe ra wextekî datînê, gereke ji îbadetê xwe ra jî wextekî veqetîne û di wî wextî da bi karek dî ve mijûl nebe, da ku huzûra dil û qelb peyda bike ku mejiyê îbadet e. Lê eger wek vî nivîserî bizehmet nimêj bike û ewê ji xwe ra bar bizane û bendetiya me'bûd ji karên zêde bihesibîne, helbet hingê wê ewê bavêjê axirê wextê wê û dema bi cih jî bîne, çiko ewê muzahimê hinek karan dibîne ku bi gomana wî karên muhim in, îbadetê xwe serûpî şikestî pêk tîne. Ev îbadetê weha, ne hema nûraniyet jê ra nîne, belkî kerbê Xwedê jê tê û mirovê weha jî nimêj sivik kiriye û paş guhê xwe ve avêtiye. Ez ji ber sivikgirtina nimêjê hewara xwe ji Xwedê Teala ra dibim. Exbarên der heqê vê meselê da li vê kitêbê da cih nabin, lê ji dersgirtinê ra em ê hineka bînin:

Îmam Baqir (a.s) dibêje: «Nimêja xwe sivik negire. Çiko Resûlê Xwedê (s.a.a) li ber mirina xwe kerem kir: "Kesê nimêjê sivik bi-

gire, ew ne ji min e. Ne ji min e ewê tişta serxweşker vexwe, ez bi Xwedê kim, ew li ser hewz nayê bal min".»

Ebû Besîr dibêje, Îmam Kazim (a.s) kerem kir: «Dema bavê min ket ber wefatê, got min: "Kurê min, kesê nimêjê sivik bigire şefaeta me ber wî nakeve".»

Riwayet vê der heqê da pir in, lê ji dersgirtinê ra evqas bes e. Hema Xwedê zane birîna ji Pêxember (s.a.a) û derketina ji bin berevaniya wî çi musîbetek giran e; û bêbehrbûna ji şefaeta wî û Ehlê Beyta wî çi zelîliyek mezin e. Û goman neke ku bê şefaeta wî hêjayî kesek rehmeta Heq û bihiştê bibîne. Vêca hema tu bi xwe binhêre, pêşxistina karên piçûk û kêmehemiyet û menfî'eta xeyalî ser nimêjê ku ronahiya çavê Resûlê Ekrem e (s.a.a) û mezintirîn wesîla dest ve anîna rehmeta Heq Teala ye, îhmalkirina wê û bê ozr, paşxistina wê heta axirê wext û hayjênemana hed hudûdê wê, ka gelo sivik kirin û muhim negirtina nimêjê ye an ne? Eger ew e, bizane ku bi şahidiya Resûlê Ekrem (s.a.a) û îmamên pak, tu ji bin wîlayet û serokatiya wan derketî û şefaeta wan ber te nakeve. Vêca niha melheze bike, eger tu muhtacê şefaeta wa yî û tu dixwazî ji umeta Resûlê Ekrem (s.a.a) bî, evî emanetê îlahî mezin bizane û muhimatê bidiyê, eger ne, tu bi xwe zanî. Xwedê Teala û weliyên wî ne muhtacê kar û amelê te ne. Lê cihê tirsê ew e ku eger tu ewê muhim nezanî, bibe sebebê terkdanê û piştî hingê tu ewê înkar bikî û bikevî bextreşiya ebedî.

Muhimtir ji valakirina wext, valabûna dil e; ji xwe belkî valakirina wext ji valakirina dil û qelb ra ye. Ew jî bi vî awayî ye ku mirov di wextê îbadet da xwe vala bike ji xem û mijûliya bi dinyayê ve û berê dil ji kar û baran bizivirîne û bi temamî vala bike û xalis bike ji îbadet ra û berê wê bide gotûbêja Xwedê Teala. Heta dil ji kar û barê dinyayê vala nebe ji bo wî û ji îbadetê wî ra vala nabe. Lê vêca bextreşî di wê da ye ku em hemû fikrên bilave û melhezên xwe dihêlin ji wext û demê îbadet ra! Hema dema tekbîra nimêjê tê gotin, tu dibêjî qey me deriyê dikanê vekir û em berê dil didin

mijûliyên dî û em amelê xwe ji bîr dikin û bi hesebê adet hema ji nişikêda em dibînin em gihane demê selam danê! Hema bi rastî ev îbadet, sebebe şermezariyê ye û ev munacat şermîner e.

Ezîzê min, hema tu qet nebe, munacatê wek xeberdana digel kesek me'mûlî hesab bike. Çi bûye, eger tu digel dostekî, ne, dost jî ne, belkî digel nenasekî mijûlê xeberdanê bibî, heta tu digel wî xeber didî te hay ji yên dî nîne û berê te hemû li wî ye. Lê dema tu gel weliyê nîmetê xwe xeber didî û gel Xwedê munacat dikî, bi temamî tu jê bêxeber  î û bi tiştên dî ve mijûl î! Ma gelo bende biqîmetir in ji zatê muqedesê îlahî? An xeberdana digel wan ji axiftina digel Heq Teala hêjayîtir e? Ez û tu nizanin munacata digel Heq Teala çi ye. Em emr û teklîfên îlahî serbar zanîn, helbet eger tiştek hat barkirin û mirov ew serbara jiyanê zanî, mirov ewê muhim nagire. Gereke serkanî durist bibe û îman bi Xwedê û gotinên pêxemberan di dil da cih bigire, heta kar durist bibin. Bextreşî hemû ji lawaziya îmanê û sistî ya yeqînê ye. Îmana Seyyid bin Tawûs (r.a) ewî digehîne wê derecê ku roja bulûxa xwe, ji xwe ra dike roja cejn û kêfê, ji ber ku Xwedê Teala izn dayiyê ku digel wî bikeve munacatê û cilkên teklîfê kirine berda. Binhêre evî dilî, çiqas nûranî û xweyê sefa ye! Eger karê vî Seyyidê biqîmet ji te ra nabe delîl, halê Seyyidus Sacidîn û ewladên wî yên pak ji te ra hucet û delîl e. Li halê wan mezinan û îbadetê wan binhêre. Hinek ji wan di wextê nimêjê da rengê wan diguheriya û pişta wan dileriziya ji tirsa wê ku newebe di emrê îlahî da şimitînek çêbe. Halhale ew pak û bêguneh bûn. Meşhûr e ku tîrek li piyê Mîrê bawerdaran ra mabû, ku di demê nimêjê da tîr deranîn û ew pê nehesiya.

Ezîzê min, ev ne mehal e, tiştên wek wê di meselên me'mûlî da pir ji xelkê ra çêdibin. Mirov di halê xezeb û muhebetê da carna ji hemû tiştî xafil dibe. Yek ji hevalên cihê baweriyê digota li bajarê Îsfehanê me digel hinek pîsekan şer kir. Hineka ez dam ber kulma û min ewil nezanî çiye, paşê dema ez bi xwe ve hatim, min dît ewî ez dame ber kêran û heta demekî ji ber wan birîna,

ez mam nav cihkan ve. Nukta wê jî kifş e, eger bi temamî berê mirov ket tiştekî, ji mulkê bedenê xafil dibe û his ji kar dikevin û xema wî hema dibe yek xem. Me bi xwe di civata xirecir û munaqişan da ku Xwedê me jê biparêze, dîtiye ku ew bêxeber in ji wan tiştên di civatê da diqewimin. Lê mixabin ku xêncî ji îbadetê Reb me tewecuh bi her tiştî heye û ji ber vê ye ku em meselên weha dûr zanin.

Feraxet û valakirina dil ji xêncî Xwedê, ji karên berketî ye ku çawa hebe gereke mirov ewê bike; karek mumkin û sehl e jî. Bi piçek hayjêmanê ku teyrikê xeyalê demekî kontrol bike û çiqas xwest ji çiqekî bifire ser çiqa dî nehêle û îzin nediyê, wê çêbe. Piştî demekî bi vî awayî hay jê bimîne, kêm kêm wê berê wê ji tiştên bilave bizivire û başî jê ra bibe adet û dilê wî vala bibe ji bo Xwedê û ji îbadetê wî ra.

Ji van karan hemûyan muhimtir ku gereke tiştên dî pêşekî bin ji wê ra, haziriya dil e, ew ruhê îbadet e û heqîqeta îbadet bi wê ve girêdayî ye. Çawa ku di riwayetên hêjayî da weha hatiye:

Îmam Baqir (a.s) dibêje Fuzeylê kurê Yesar: «Ewqas ji nimêj, ya mirov e ku haziriya dil têda hebe. Vêca nexwe eger ewê xelet bi cih bîne, an ji adabên wê xafil bibe, wê li hev bêt pêçan û bêt avêtin ser rûyê wî yê ew nimêj kirî».

Ebû Hemzeyê Somalî dibêje: «Min dît Alî bin Husêyn (a.s) nimêj dikira û ebayê wî ji ser milê wî ket. Lê heta ji nimêjê xilas nebû ew rast nekir. Vêca min wê der heqê da jê pirsî, ewî kerem kir: "Ey belengaz, tu zanî tu li ber kî rawestayî? Nimêja ebd xêncî ji qasê dilhaziriya wî, jê ra qebûl nabe". Vêca min gotê: "Ez gorî, em ji nav çûn û em helak bûn!" Ewî kerem kir: "Ne; Xwedê, bi sunetan ewê ji wan ra temam dike".»

Mîrê bawerdaran (a.s) dibêje: «Bila kes di halê sistî û pûnjînê da ji nimêjê ra nesekine û di dilê xwe da nekeve melheze û fikir kirinê da. Çiko ew li beranberê Xwedayê xwe da rawesta ye. Ji ebd

ra hema ewqas ji nimêjê heye qasê haziriya dil heyî». Exbarên ji vê pêkê gelek in û her weha der heqê berêxwedana bi dil, em ê hinek ji wan jî li vêderê bînin ku evqas ji dersgirtinê ra bes in:

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Wek nimêja yê xwatiran dixwaze nimêj bike, ew ê xwatira dixwaze û tirsa wî ji wê ye ku êdî qet nezivire, paşê jî li cihê secda xwe binhêre. Eger te bizaniya kî li rast û çepê te da sekiniye te yê pir baş nimêj bikira. Evê jî bizane tu li ber wî kesî rawestayî ku ew te dibîne û tu wî nabînî». Dîsa Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Ez ji kesê bawerdar ra wê hez dikim û dixwazim ku dema ji nimêjê ra rabû, berê dilê xwe bide Xwedê û dilê xwe bi karê dinyayê ve mijûl neke. Dema mirov di nimêjê da berê dilê xwe bide Xwedê, Xwedê Teala jî bi hezkirin û hejêkirin berê xwe û yê bawerdaran dide wî».

Vêca bibîne ev çi mizgînî ye ku Sadiqê Alê Muhemmed (a.s) dide bawerdaran. Lê mixabin ku em rebenên perdekirî ji zanînê ji vê nêrîna Heq Teala bêbehr in û me hay ji dostiya zatê muqedes ê wî nîne û em dostiya Xwedê digel dostiya bende û evdan qiyas dikin. Ehlê marîfetê dibêjin, Xwedê Teala perdan li ber mehbûbên xwe radike û Xwedê zane di vê perderakirinê da çi hêjan û keramet hene. Xayeta amal û arzûyên weliyan û nihayeta mexseda wan hema rakirina van perda ye. Hezretê Mîrê bawerdaran û ewladên wî yên pak di munacata Şebaniye da dibêjin: «Îlahî, berê me bi temamî bide xwe û çavê dilê me pê berêxwedana te, wisa ronahî bike ku çavên dil perdên ronahiyê bidirîne. Veca bigehê jêdera mezinahiyê û rihên me bên hilawîstin bi izeta te ya muqedesve».[1]

Ey Xwedê! Ev çi besîret û ronahî ye ku weliyên te xwestine pê wê bi nûraniyeta te ve bigirhin? Ey Xwedê, perdên ji nûrê çi ne ku li ser zimanê wan îmaman herikiye? Ev jêdera ezemet, celal, izz, quds û kemalê çi ye ku axirîka mexseda wa ye û em heta

1- Misbahul Muctehid, p. 374

dûmahîkê jî ji fêhmkirina ilmî ya wê jî mehrûm in. Heta vêca dor bigehê tamkirina muşahida wê? Ey Xwedê tu bi xwe keremê gel me evdên rûreş û belengaz bike, em ên ku xêncî ji xew û buxz/tol û şehwetê me hay ji tiştek dî nîne û me ne niyet e jî ku hay jê hebin, hema tu me ji vê xew û serxweşiyê hişyar bike.

Welhasil, ji ehlê wê ra hema ev hedîs tenê bes e ku hemû omrê xwe ji dest ve anîna muhabet û tewecuha îlahî ra mesref bike. Lê çiko em ne mêrê vê meydanê ne, em xwe bi hedîsên dî digirin.

Rawî dibêje min ji Îmam Sadiq (a.s) bihîst, digota: «Kesê du rikat nimêj bike û bizane çi dibêje di wan herdu rikatan da, di halekî da ewê nimêjê xilas dike ku qet guneh li ser namînin û Xwedê hemûyan efû dike û lê dibore».

Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kiriye: «Du rikat nimêja sivik digel fikir kirinê baştir e ji îbadetê şevekî».

**Vebir: Mertebe û dereceyên haziriya dil**

Piştî ku kifş bû ku haziriya dil di îbadetan da, qelb û ruhê îbadet e û nûraniyet û derecên kemala wê bi haziriya dil û dereca wê ve girêdayî ye. Niha gereke bêt zanîn ku haziriya dil derece jê ra hene ku hinek ji wan derecan taybetê ewliyayên Heq in û kesên dî nagêhin wan derecan. Lê hinek derece jî hene ku xelk dikarin xwe bigehênînê. Gereke ev jî bêt zanîn ku bi awayek giştî huzûra dil, bi du qisman teqsîm dibe: Haziriya dil di îbadet da û haziriya dil di me'bûd da.

Pêş xeberdana vê der heqê da, lazim e pêşekiyek bêt gotin, ew jî ev e ku ehlê marîfetê dibêjin: Îbadat pêkve ji pesnê me'bûd ra ne, lê heryek ji wan ji ber nav û sifetek yê îlahî ve ye, xêncî ji nimêjê ku hemd û pesnê Heq Teala ye bi hemû nav û sifetên wî ve. Pêşda me di şîrovekirina hinek hedîsan da got ku: Pesnê me'bûd ji tiştên sirûştî û fitrî ye ku hêvinê (haven) hevîrê mirova ye. Lê çiko çawaniya pesnê zatê muqedes kes nikare bide, çiko pesindan çiqê nas-

kirina zat û sifet û çawaniya pêwenda alema xeyb û şuhûdê ye. û eva he ji kesî ra çênabe xêncî bi rêka wehy û îlhamê ve. Ji ber wê îbadet pêkve û bi awayek giştî «tewqîfî» ne ku ji aliyê Xwedê ve tên diyarkirin û kesî ew heq nîne ku ji aliyê xwe ve teşrî'ekî bike û îbadetekî çêke. Û ew karên li beranberê mezin û paşayan da têkirin li beranberê wî da qîmet jê ra nîne. Nexwe lazim e mirov hişyar be û bi rêka wehy û risaletê ve çawaniya îbadet û bendetiyê bigire û ew bi xwe têkel nebe û guherînê nexiyê.

Piştî ku me'lûm bû ku îbadet ji pesnê me'bûd ra ye; evê bizane ku haziriya dil çawa ku hat gotin du qîsmet e: 1- Huzûra dil di îbadet da; 2- Huzûra dil di me'bûd da. Huzûra dil di îbadet da jî, derece û mertebe hene ku bi giştî du mertebe ne:

1- Huzûra îcmalî di îbadet da; ev weha ye: Wextê mijûliya bi îbadet ve -çi îbadetê hebe, çi teharat: Wek destnimêj û xuslê û çi wek nimêj û rojî û hecê... mirov bi kurtî bizane ku pesnê me'bûd dide, her çend ew bi xwe nizane çi pesnî dide û gazî kîjan navê Xwedê dike. Şêxê me yê arifê kamil (ez gorî bim) ji vî awayê îbadeta re weha digota: "Ew wek vê ye ku kesek qesîdeyekî di medhê kesekî da vehûnê, vêca bide zarokekî ku me'na wê fêhm nake û di huzûra wî da bixwîne û bi zarok bide fêhmê ku ev qesîde medh û pesn dana wî ye. Vêca ewê zarok ku qesîde dixwune bi awayek giştî zane ev qesîde pesnê wî ye, gerçî çawaniya wê nizane". Em jî zarokê pesinderê Xwedê ne û em remz û raza îbadet nizanin. Em nizanin ku eva he digel kîjan navê Xwedê pêwend heye û çawa pesnê Xwedê ye, evqas gereke em bizanin ku heryekî ji van (îbadetan) pesindanekî ya me'bûd e. Ku zatê muqedes bi heryekî ji wan da pesnê xwe daye û gotiye kanê em li beranberê wî de çawa pesnê wî bidin.

2- Merteba dî ya huzûra dil, hazirbûna berfireh e di îbadet da û eva he bi şiklê xwe yê kamil xêncî ji weliyan û ehlê me'rifetê ra ji kesek dî re nabe. Lê hinek dereceyên wê yên binretir ji yên dî re jî çêdibin. ewilîn merteba wê di îbadetên wek nimêj û dua de,

melhezekirina me'na kelîma ye. Hinek riwayeta ku di Sewabul E’malê da hatine îşare kirin bal vê mertebê ve. Merteba dî ew e ku qasê mumkin remz û raza îbadeta ku çawaniya pesindana me'bûd fêhm bike. Û ehlê me'rifetê heta qederekî remz û raza nimêjê û îbadetên dî gotine. Ku di gotina wa remz û raza da ji riwayetên pakan (a.s) heta karîn îstifade kirine; her çend fêhmkirina heqîqeta eslî ji kêm kesa re çêdibe, lê qasê gotîn jî ji ehlê wê re xenîmet e.

Haziriya dil di me'bûd de; evê jî meratib hene ku giraniya wa sê mertebe ne: 1- Haziriya dil di tecelliyatê ef'alî da; 2- Haziriya dil di tecelliyatê esmaî û sifetî de; 3- Haziriya dil di tecelliyatê zatî da.

Bi awayê giştî ji bona heryekî çar mertebe hene: Merteba ilmî, merteba îmanî, merteba şuhûdî û merteba fenayî. Mexsed ji haziriya dil di tecelliyatê ef'alî da bi awayê ilmî ew e ku şexsê abide salik, bi awayek ilmî û bidelîl bizane ku hemû mertebên wucûd û xeyb û şuhûdê, ronahiya tecellî ya zatê muqedes in û ji axirîn zeratên alema tebîet heta bi serkaniya melekûtê e'la û ceberûtê mezin bi yek awayî bal zatê muqedesê wî hazir in û hemû ronahiya meşiyetê ne.

Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafiyê da hatî: Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Xwedê meşiyet bi xwe afirand, pey ra tişt pê wê meşiyetê afirandin». Nexwe meşiyet bi xwe bi xwe cilweya zat e û mewcûdatên dî pê wê hatine afirandin. Lê vê gavê me ne li ber e em delîlê ser vê gotina hêjayî bînin. Nexwe şexsê abid ku bi awayek ilmî û bi delîl, ev gotinahe zanî, fêhm dike ku ew bi xwe ku îbadet û ilm û îrade û dil û bizava dil û eşkere û navdeyê wê hemû li ber wî zatê muqedes hazir in. Belkî hema hemû, huzûr bi xwe ne. Û eger vêca bi qelema aqilê ev gotina bi delîl, li ser lewha dil bêt nivîsîn û dil bi awayek ilmî, amelî îman û bawerî bi vê gotinê anî. Hingê huzûra dil di tecelliyê da «îmankî» peyda dibe. Vêca piştî kamiliya vê îmanê, mucahidet, riyazet û xweparêziya kamila dil, hîdayeta îlahiye şamilê halê wî dibe û behreyek ji tecelliyatên

ef'alî bi eyan û şuhûd ji dilê wî ra peyda dibe, heta ku dil seraser bû eynka tecelliyatan û «se'q» û «fena» giha salik. Eva he axirîn merteba huzûrê ye ku axirîka wê fena ya hazir e di tecelliyatên ef'alî da. Û gelek ji ehlê sulûkê hema di vê «se'q»ê da dimînin û bi xwe ve nayên.

Eger dilê salik ji ber nûra ezelî ya Xwedayî qabiliyeta wê ji wê pirtir be, piştî vê se'qê bi xwe ve tê û dizivire bal memleketê xwe ve û dikeve ber tecelliyatên esmaî. Hema bi wan derece û merteban ve diçe heta bigehê fena ya sifetî û bi munasebeta eyna wê ya sabit di ismek ji esmaên îlahî da fanî dibe. Gelek ji ehlê sulûkê jî hema nav vê fenaa esmaî da dimînin û bi xwe ve nayên. Û belkî: «Înne ewliyaî tehte qubabî la ye'rifuhum xeyrî», îşare be bal vê ve.

Eger ji ber tecelliya feyza eqdes karîn û qabiliyeta wê ji vê zêdetir be, piştî vê fena û se'qê jî unsek peyda dibe û salik bi xwe ve tê û dikeve ber tecelliyatên zatiye, heta bi axirîn merteba fena ya zatî û se'qa kullî, seyr temam dibe û fenaya temam çêdibe. «We men yexruc min beytihî muhaciren...».[1] Hineka gotiye eva he îşare ye bal weliyên Xwedê û salikên rêka wî ve, xêra vî salikî jî hema bi hêviya Xwedê ve ye».

Carna jî di vî meqamî da ji salik ra seratiyek çêdibe û gora qabiliyet û îstidad û dagîriya eynê xwe yê sabit, dest hîdayeta xelkê dike: «Ey ew ê cilik li xwe pêçayî, rabe û hişyariyê çêke».[2]

Eger vêca eynê sabitê wî, tabi'ê ismê e'zem be, daira nubûwetê bi wî xilas dibe. Çawa ku bi Resûlê Ekrem (s.a.a) û nebiyê giranqedrê xatem (s.a.a) xilas bû. Û qet çi yek ji mewcûdên ewil û axir, çi yek ji enbiya û resûlan, eynê wan yê sabit bi awayek hemû alî tabi'ê ismê e'zem û zuhûra zat nebû, ji ber vê yekê ewî zuhûra hemû alî peyda kir û xilaseka zuhûrê giha hîdayetê û keşfa kullî çêbû û pêxemberî pê wucûda wî ya muqedes giha xilasekê. Fere-

---

1- Nisa / 100

2- Muddessir / 1 - 2

za eger ewliya bi tebe'iyeta wî zatê qudsî û hîdayeta wî bigehin vî meqamî jî, keşfa wî wê hema ew bi xwe be; tekrara di teşrî'ê da caiz nabe. Nexwe pêxemberî pê wucûda wî ya muqedes xilas bû û kelpîçê axir di benaya nubûwetê da hat danîn. Çawa ku di hedîsêdahatiye.[1]

Gereke bêt zanîn ku îbadet û çawaniya me'newî ya îbadetan di heryek ji van meqamatan da gelek muxtelif û cûr bi cûr e. Ji heryekî ra behr û nesîbek heye ku ji wî yê negihayî wî meqamî ra nîne. Helbet ew tişta di halê îbadet da dest hezretê Sadiq (a.s) ketî, dest yên dî nakeve, çawa ku ji Felahus Saila Seyyid bin Tawûs neqil bûyî, ewî gotiye: «Riwayet bûye ku hezretê Cafer bin Muhemmedê Sadiq (a.s) di nimêjê da Quran dixwenda, heta bêhiş bû. Vêca dema bi xwe ve hat, sebebê wê jê pirsîn. Vêca ewî gotinek bi vê me'nê got: “Min li pey hev ayetên Quranê dixwendan heta halekî ser min da hat heçweku min ayet ji aliyê wî yê daniya ve bi mukaşife û eyan guh lê dibûyan. Vêca qudreta beşerî nekarî mukaşifa celala îlahî ragire”.» (Rûpelê 107- 108)

Ew halê ji Resûlê Ekrem ra (s.a.a) dihata pêş ji kesî ra çênedibû, çawa ku di wê hedîsa meşhûr da hatiye: “Halê min digel Xwedê, ew hal e ku qet ji çi melekên muqereb û nebî yên mursel ra çênabe”. Ez ji vê behsê derbas bibim ku ji wêjeyê pê ve me çi behr tê nîne. Lê ya ji me ra muhim, ew e ku eger negihane meqamê weliyan qet ne em înkara wan nekin û teslîm bin ku teslîmiyet ji me ra pir feyde ye û înkar pir zerer têda heye. «Ey Xwedê, ez teslîmê fermana wa me û tu selewatê bide ser hemûyan».

## Rêka hazirbûna dil

Bizane huzûra qelb tenê hingê çêdibe ku mirov, muhimiya îbadet bi dil bide fêhmê, heta mirov remz û raza îbadet jî nezane heqîqeta wê nayê fêhmê. Ev jî eger çi ji me nayê em bizanin, lê

1- Kenzul Ummal, c. 11, p. 422, hedîs 31981

gora fêhma xwe û behregirtina ji exbarên Ehlê Beytê (a.s) qasê munasibê van pelan em ê jê xeber bidin.

Bizane çawa her daim me gotî, heryek ji amelên qenc û îbadî şiklek navdeyî û melekûtî heye û eserekî di dil da datîne. Şiklê wê yê batinî û navdeyî ew e ku alema berzexê û bihişta cismanî pê wê tê avakirin. Çiko çawa di riwayetê da hatî, erdê bihiştê, xwerî û vala ye, ji her tiştekî û gora gotina hedîsê, maddeya avakirina wê zikr û amel in. Û gelek ayetên pîroz ên Qurana Xwedê delalet dikin ser tecesuma amelan, wek: (Zilzal / 7–8): «Fe men ye'mel misqale zerretin xeyren yereh… Şerren yereh». Û: (Kehf / 49): «Wecedû ma 'emilû hazira». Exbarên ku delalet dikin ser tecesuma amelan û şiklê wan yên xeybî yên melekûtî jî ji xwe pir in, em ê hinekan bînin.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Kesê nimêjên xwe yên ferz di ewilê wextê da bike, şert û mercên wê bi cih bîne, wê melaîket ewê bi şiklek spî û paqij bilind bikin bi ezmana. Ew nimêj dibêje: "Xwedê te biparêze wek çawa te ez parastim, melaîketek hêjayî ez ji te girtim". Lê kesê piştî derbasbûna wext, bê ozr, nimêj bike û şert û mercên wê bi cih neyine, melaîket ewê bi şiklek reş û tarî di halekî da dibe ezmana ku ew lê dike hawar û dibêjite: "Te ez zayî kirim, Xwedê jî te zayî bike û ji nav bibe. Çawa tu hay ji min nemayî, Xwedê jî hay ji te nemîne".»

Ji vê hedîsa şerîf çawa ku tê fêhmê amel şiklê melekûtî heye, ev jî îstifade dibe ku amel saxî û heyat jî heye, awayek yê burhanê jî dikare jê ra bibe delîl. Her weha riwayet jî delalet dikin ku hemû mewcûdatan jiyanek melekûtî hene û alema melekûtê seranser saxî û zanîn e: "Û hema bi rastî mala axretê ye jiyan û saxî" (Enkebût / 64).

Hezretê Sadiq (a.s) kerem kiriye: «Dema Xwedê bawerdaran ji goran dertîne, misala wî (yek wek wî) jî digel wî derdikeve û pêşiya wî da rê ve diçe. Çiqa ku bawerdar bizdanderek ya qiyametê dibîne, misala wî dibêjiyê: "Netirse û xeman neke û ji aliyê Xwe-

dê ve û bi kerema wî şahî bibe” her bi vî awayî ye heta raberê Xwedê dibe û hesabek sivik digel wî tê dîtin. Û destûr jê ra tê ku here bihiştê, berdewam misala wî pêş wî da diçe. Vêca bawerdar dibêjitê: “Hey rehmet li te be, çi baş bû tu gel min ji qebrê derketî û te daim şahîbûna bi kerema Xwedê, da min, heta ez giham kerema Xwedê, dê bêje ka tu kî yî?” Ew dibêje: “Ez ew kêf û şahî me ku, te di dinyayê da ji birayê xwe yê bawerdar ra çêkirî, Xwedê ez ji wê şahiyê çêkirime, da ez mizgîniyê bidim te”.»

Ev hedîs jî dîsa delalet dike ser temsîl û tecesuma amelan di axretê da. Wek çawa Şêx Behauddîn (Şêxê Behaî) di xilaseka vê hedîsê da dibêje: “Di hedîsan da heye ku baweriyên durist jî di axretê da şikl û cism peyda dikin. Vê gorê nexwe hem amel û hem eqîde û baweriyên durist, şiklek melekûtiyê nûranî peyda dikin û şahî û kêfê ji xweyê xwe ra çêdikin. Hema bi vî awayî kar û baweriyên pîs jî şiklek kirêt û bêmerês ji wan ra peyda dibe û dibin sebebê kul û xeman ji xweyên xwe ra. Çawa komek ji mufesiran di tefsîra ayeta: «Roja ku her kes heçî başiya kirî hazir û berçav dibîne, her weha xirabiya kirî jî dibîne, daxwaza wî ew e ku xwezika di navbera wî û wê da vebirek dûr hebûya» (Alê Îmran / 20), da weha gotine: “Eva he berê me dide vê ayeta pîroz ku: «Wê rojê, xelk bi awayek belave derdikevin da amelên xwe bibînin» (Zilzal/ 6). Kesên di ayetê da qailê bi teqdîrê bûyîn û gotîn: Demîra «îre» nazivire bal amel ve û mexsed dîtina cezayê amel e, ew ji duristiyê dûr ketine.

Li vêderê gotinek xerîb ji hinek hedîsgêrên giranqedr hatiye gêran ku, neanîna wê baştir e. Ew jî ji ber wê ye ku goman kirine dijatî heye navbeyna gotina tecesuma amelan û me'ada cismanî da, halhale eva he ewê dişidîne. Kelîma «temessel» ku di hedîsa şerîf da derbas bû, wek wê temessulê ye ku di Quranê da hatî: «Ji wê ra wek beşerek durist lê hat» (Meryem/ 17) ku hema bi rastî li ser şiklê beşer xweyha, ne ku wek xewnê, xeyal û goman be. Di her hal û karî da deranîna van ayetan ji eşkere û zahirê wê, digel wê yekê ku rêketî ye digel delîl û burhana qewî ku di cihê xwe da

jê hatiye xeberdan, ji ber ku gora aqilê me nedurist e û gora rêçka hukema û feylesofa ye, ne tiştek baş e. Di van behsan da, baştirîn ew e ku mirov li ber Heq Teala û weliyên pak û paqij teslîm be.

Anegora ya hatî gotin, kifş bû her amelê li bal Heq Teala bêt qebûlkirin, gora xwe şikl û sûretek xweşik û sipehî ji hûr, qesr, bihişt, çem, rûbarên carî û herikî heye. Û çi mewcûdê di alemê da heyî, bêhesab nehatiye çêkirin. Û belkî di navbeyna wan da girêdan û pêwendek aqlî heye ku ji weliyên bilindmertebe pê ve, kes dî nikare pê bihese. Û bi awayek giştî ev gotin, di bin mîzana aqil û burhana hikmetê da cih girtiye.

Piştî kifş bû ku jiyana alema axretê û xweşiyên wê girêdayî ye bi wan amelan ve, ku şiklê wan yên kamil, munteqilê wê alemê dibin. Û ew amel îbadet in ku, bi keşfa navê Muhemmedî (s.a.a) ehlê vî dînî agahî jê peydakirin û kemal û sipehîtiya amelan bi niyet û berdana dil û hayjêmana hed û sînora ye. Û eger ev tişt an hinek ji wa di wan kar û amelan da tunebin hingê îtibar pê nayê kirin. Belkî şiklek nedurist ji wan ra çêdibe ku mirov di wê alemê da wê bigehêtê, çawa ku ji riwayetan hat fêhmê. Nexwe her mirovê bawerdarê bi alema xeybê û exbarên pêxemberan û ewliya û ehlê marîfetê û mirovê hej jiyana xwe ya ebedî bike, gereke xebatek baş ji bona duristkirina kar û amelê xwe bi cih bîne. Û piştî ku eşkereyê wan wek gotina şerî'etzanan û qewa'idên îctihadî lê kir, bixebite ku navdeyê wan jî durist bike. Û çiqas bikare xebatê bike ku qet ne ferzan bi huzûra dil pêk bîne û pê kirina sunetan jî kêmasiyên wê tijî bike, çawa ku di hedîsan da hatî: «Nafile, ferzan cubran dikin û dibin sebebê qebûliya wan».

Hezretê Baqir (a.s) dibêje: «Nimêjên sunet, hatine danîn da kêmasiyên ku ketîn ferzan, pê wa temam bibin».

Hezretê Sadiq (a.s) gotinek bi vê me'nê gotiye: «Qasî huzûra dilê mirov, çarêk an heştiyek an nîvê nimêjê an pirtir tê qebûlkirin, lê Xwedê Teala bi nafilan ewê temam dike».

Ji vê pêkê gelek riwayet hene. Û me'lûm e ku em vala nînin ji sehw û nisyan û wan tiştên dijatî heyîn gel nimêja bi kemal, vêca Xwedê Teala bi lutfa xwe ya kamil, sunet û nafile danîne da em bi wan, kêmasiyên nimêjên xwe rakin, vê gorê gereke heta çêbe em ji vê yekê bêxeber nebin û nafilan terk nedin.

Di her hal û karî da ey ezîz, piçekî hişyar bibe û binhêre nama amelên xwe, bitirse ji wê yekê ku amelên te yên bi gomana te qenc in, wek nimêj û rojî û hec... di wê alemê da bibin sebebê rebenî û zelîliyê. Nexwe heta te firsend heye di vê alemê da hesabê gel xwe bibîne û tu bi xwe mîzana amela ji xwe ra deyne û kar û amelê xwe di mîzana şerî'et û wîlayetê da bikêşe û duristî û neduristî û kemal û kêmasiya wan kifş bike û heta te derfet û firsend heye ewa cubran bike. Eger tu li vêderê hesabê gel xwe nebînî û hesaba xwe serast nekî, li wêderê ku hesab gel te bêt dîtin û mîzana amel bêt danîn, wê bela û musîbetên mezin ser te da bên. Ji mîzana edla îlahî bitirse û bi tiştekî neyê xapandin û xebat û cid û cehdê ji dest nede. Qasekî binhêre nama amel ên Ehlê Beyt a Pêxember (s.a.a) ku dûrê ji xeletî û gunehan bûn û têda bifikire. Vêca bibîne ku mesele çiqas zehmet e û rêk çiqas tarî û teng e, binhêre vê hedîsê û vêca bizane mesele di çi heddî da ye:

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Wellahî, Alîyê kurê Ebûtalib (a.s) qet ji heramê dinyayê nexwar heta ji dinyayê çû. Û dema du tiştên hezkirina Xwedê li ser, jê ra bihatan pêş, daim ew dikira ya zehmetir; çiqas nexweşiyek ji Resûlê Xwedê ra (s.a.a) bihata pêş, ji ber baweriya bi wî heyî, daim gazî wî dikira. Kesî ji vê umetê wek wî nikariya karê Resûlê Xwedê (s.a.a) ragire; ewî wek mirovê bizdayî amel dikira, heçweku di navbera cennet û dojehê da; xêra wê dixwesta û ji ezabê wê ditirsa. Bi malê bi keda destê xwe û xwêdana ehniya xwe bi dest ve anî hezar benî di rêka Xwedê da û ji bona xilasiya ji agir, berdan û azad kirin. Ewî qûtê mala xwe kiribû zeyt, sirke û xurma; lîbasê wî ji kerbasê bûn; eger milê cilkên wî dirêj bûya meqes dixwesta û kurt dikira. Ji nav zarokên wî û binemala wî kes di fiqih û lîbasê da wek Alîyê kurê Husêyn

(a.s) ne nêzîktirê wî bû, rojekî kurê wî, hezretê Baqir (a.s) çû balê, wekî dît di îbadet da gihaye wêderê ku kes negihayiyê; dît ji ber hişyariya şevê rengê wî zer bûye û ji ber giriyê, çavê wî qemitiye û rûyê wî birîndar bûye û pozê wî ji ber secdebirina pir, herişiye û ji ber rawestana di nimêjê da ling û piyê wî werimiye.

Hezretê Baqir (a.s) dibêje: "Vêca dema min ew li wî halî da dît, min nekarî ez xwe ragirim û dilê min ma pê ve û ez girîm, di wî halî da ew jî ketibû fikran û difikiriya. Piştî demekî gote min: "Kurê min, ka hinek ji wan kaxizên behsa îbadetê Alîyê kurê Ebûtalib dikin ji min ra bîne", min jê ra anî û dayê, piçekî hindik xwend, vêca bi xem û nerehetî ew danî aliyekî û got: "Kî taqet û quwetakirina îbadetê Alîyê kurê Ebûtalib heye?"»(1)

Hezretê Baqir (a.s) got: "Alîyê kurê Husêyn (selam li ser wa bin) di şev û rojekî da hezar rikat nimêj dikiran, bayê ew dihejanda wek çawa ûşiyê genim tê hejandin».

Ezîzê min, hinekî di van hedîsan da bifikire û bibîne ka hezretê Baqir (a.s) ji ber halê bavê xwe di îbadet da girî û hezretê Seccad (a.s) digel wî hemû îbadetê xwe, dema piçek ji kaxizên îbadetê hezretê Alî (a.s) têda hatî nivîsîn xwend, got: "Eva he ji min nayê!" Helbet kes nikare wek îbadetê Mîrê bawerdaran îbadet bike û xelk nikarin wek îbadetê me'sûman bikevin îbadet. Lê çênabe eger mirov nekarî bigehê wê dereca bilind, êdî desta ji îbadet bikêşe.

Gereke bêt zanîn ku haşa ev îbadet ne ji xweda bûye, belkî rêk pir xeter û teng e. Û astengên mirin û qiyametê bizehmet in, ji ber wê ye ku ehlê marîfetên heqîqî bi wî awayî îbadet dikiran û xwe li ser dişidandan. Ev sistî ya me ji sistiya îman û eqîdê ye û ji ber cehl û nezaniyê ye.

Ey Xwedê, tu ji qusûr û kêmasiyên me agah û zana yî û tu bi zeîfî û nekarîna me zanî, pêşiya ku em ji te bixwazin, te em nav

---

1- Îrşad, p. 255 - 256

rehmeta xwe da noqî kirine. Nîmet û kerema te bê xwestin tê dayîn. Em texsîra xwe îtiraf dikin û me kufrana nîmetan kiriye û em ezab û çûna dojehê ji xwe ra heq zanîn û xêncî wê ku rehmeta te berfireh e. Me tu wesîlekî xwepêgirtinê nînin û me tu pê rehm û dilovaniya berfireh nas kirî. «Eyne rehmetukel wasi'e? Eyne keremuke ya kerîm?»

## Valabûna ji îbadet ra sebebê dewlemendiya dil

Lazim e bêt zanîn ku dewlemendî ji wesfên kemala nefsê ye. Belkî ji xwe ji sifetên kemaliye ya "mewcûd bima huwe mewcûd" e û ji ber vî cihetî ye ku xina [dewlemendî] ji sifetên zatî yê zatê eqdesê Heq Teala ye. Û serwet û maldarî nabe sebebê dewlemendî ya nefsê, belkî mirov bikare bêje: Ew ên dewlemendîya nefsê neyîn, ew ji hebûna serwet û mal ra kolbotir û herîstir [timatir] dibin û pirtir xwe muhtacê wê zanin. Û çiko xêncî li bal Heq Teala dewlemendiya heqîqî peyda nabe û mewcûdên dî, ji heyûlayê ûla bigire heta bi ceberûtê e'la, pêkve feqîr, muhtac û niyazmend in. Ji ber vê çiqas berê dil li xêncî Xwedê be û çiqas navdeyê mirov li pey tamîra mulk û avakirina dinyayê bê îhtiyac, feqîrî û niyaz zêdetir dibe. Feqîriya dil û ruh ji xwe me'lûm e. Çiko hema dilgirêdana bi tiştekî ve, bi xwe feqîretî ye. Feqîretiya nenavdeyî û xaricî jî ku ser feqîriya dil ve zêde dike, pirtir dibe. Çiko kes bi xwe bi xwe nikarê hemû kar û barê xwe rê ve bibe, vêca muhtacê xêncî xwe dibe. Mirovên milk û mal heyîn, her çend li ber çavan ne muhtac xuya dikin, lê pê nêrînek hûr kifş dibe ku çiqas heyiya wan zêde be, ewqas îhtiyac û niyaza wan jî zêde dibe. Nexwe xweyên serwetê ew feqîr in ku di şiklê dewlemenda da ne û niyazmendên di qalibê bêniyaza da ne. Û çiqas berê mirov li avakirina dinyayê be û girêdan pirtir bibe, toza zelîliyê pirtir serda tê. Vêca bervajî, eger kesek pişt bide girêdana bi dinyayê ve û berê dil bide dewlemendê alel itlaq û bawerî bi feqra zatî ya mewcûdatan anî û fêhm kir ku çi tiştî tiştek ji xwe nîne û heçî tişta heyî ji Heq Teala ye û bi guhê dil gazî û hatifa melekûtî ji zimanê xeybê bihîst ku: «Ya eyyuhen nas entumul fuqera îlellah wellahu huwel

xeniyyul hemîd»[1] hingê wê ji du aleman bêniyaz bibe. Wê wisa bê îhtiyac bibe ku milkê Suleyman bi tiştekî hesab nake û eger kilîdên xiznên erdê bidinê jî qet lê nanhêre. Çawa ku di hedîsê da hatiye: «Hezretê Cebraîl ji aliyê hezretê Heq (c.c) ve kilîdên xezînên erdê ji Resûlê Xatem ra (s.a.a) anî, lê ew hezret bi feqîriyê razî bû û ew ji xwe ra fexr zanî». An hezretê Mîrê bawerdaran got Ibn Abbas: «Ev dinya hewe li bal min bêqîmetir e ji vê sola ku pir hatiye pîne kirin».[2] An hezretê Seccad dibêje: «Ez xwe paşda didim ji xwestina dinyayê ji xaliqê wê, vêca çawa ez ê wê ji yek wek xwe bixwazim». Ji nav xelkê jî, Necmuddînê Kubra[3] piştî sondên dijwar dibêje: «Eger mal û heyiya dinyayê, bihişt, hûr û qesrên axretê bidin min û civata gel zengîn û dewlemendan pê ve deynin; bextreşiya dinya û axretê bidin min û civata gel feqîran pê ve girêbidin, vêca heqê bijartinê ji min ra hebe, ez ê civata gel feqîran ji xwe ra bibijêrim û xwe naxim nav şerma rûniştina gel dewlemendan ra «wen nar xeyrun minel 'ar».[4] Belê ew zanin ku berêxwedana mal û heyiyê û xiznên dinyayê û civat û rûniştina gel ehlê wê çiqas dibe sebebê tarîtî û zulmeta dil. Û çiqas îrade û biryarê zeîf û lawaz dike û dil feqîr û muhtac dike. Û berê wê ji Heq Teala dizivirîne. Lê dema te dil da xweyê dil û te xanî teslîmê xweyê wê kir û êdî te bi xwe têda teseruf nekir û te dest ji xêncî wî kêşa û te dil teslîmê xasibê neheq nekir, wê xweyê malê bi xwe di wê da tecellî û ronahî bide. Helbet tecellî ya dewlemendê alel itlaq dewlemendî ya bênihayet çêdike û dil, nav behra izet û serbilindiyê da noqî dike û dil tijî dibe ji bêni-

---

1- Fatir / 15: Gelî mirovno, hûn in niyazmendê Xwedê û ew e dewlemendê xodanê pesn.

2- Nehcul Belaxe, x. 33

3- Ehmed kurê Omer kurê Muhemmed meşhûr bûyî bi navê Necmuddîn (540 - 618 h.q) Sûfiyê Xarezmî, ji arifên meşhûr û mezinên tesewwufê ye. Risaletul Xaiful Haim'en Lewmetil Laim, Fewatihul Cemal, Menazilus Sairîn û Minhacus Salikîn ji eserên wî yên nivîsarî ne.

4- Menahicus Salikîn, p. 157, menheca pêncê.

yaziyê: «Lillahil izzetu we li resûlihî we lil muminîn».[1] Hingê wê xweyê malê bi xwe kar û baran rê ve bibe û mirov nahêle bi hêviya wî ve û wê ew bi xwe hemû karê ebd rê ve bibe. Belkî ew bi xwe dibe guh û çav û dest û pî yê wî û wê qurba newafilan bê dest. Çawa ku di hedîsê da hatiye: Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Xwedê Teala dibêje: Çêdibe ku evd bi nafilan nêzîkê min bibe heta ez hejê bikim, vêca dema min hejê kir, ez dibim guhê wî yê pê guh lê dibe û çavê wî yê pê dibîne û zimanê wî yê pê diaxive û destê wî yê pê wê tişta digire...»

Vêca hingê feqîriya ebd bi temamî tê tijîkirin û ji du aleman bêniyaz dibe. Helbet di vê tecelliyê da tirsa ji her tiştî ji ser wî radibe û tirsa Heq Teala dikeve şûnê da û mezinahî û ezemeta Xwedê seraserê dilê wî ber xwe digire û xêncî ji Heq Teala ra mezinahiyekî nabînê û heqîqeta: «La muesire fil wucûd illellah», digehîne dilê xwe. Di vê hedîsa şerîf da îşare kiriye bal vê ve: «Tu xwe ji îbadetê min ra berde, ez ê jî dewlemendiyê bêxim dilê te...» ev xweberdana ji îbadet ra çêdibe ku kêm kêm mirov bigehîne bilindtirîn merteba huzûra dil di îbadet da.

Ev, ew eser in ku hinek ji wan hatin gotin. Eger berê dil ji mijûliya bi Heq Teala ve hat zivirandin, eva he sermaya hemû bextreşiyan û jêdera hemû kêmasiyan û koka nexweşiyên dilî ye. Vêca ji ber vê xefletê reşî û tarîtiyek di dil da peyda dibe û perdên stûr dikevin navbera dil û Heq da, ku êdî ronahiya hîdayetê têra xuya nake û ji tewfîqên îlahî bêbehr dimîne û berê dil pêkve dikeve avakirina dinyayê, zik, binzik û di nav perdên eniyet û enaniyetê [xwebîniyê] da tê pêçan û nefs bi serê xwe dimîne û zelîliya zatî û feqra heqîqî ya wê derdikeve meydanê. Û di hemû hereket û sekenatên xwe da ji Xwedê dûr dikeve û zelîlî dibe behra wî. Çawa ku di hedîsa şerîf da jê xeber dayî: «Ez ê dilê te bi dinyayê ve mijûl bikim û di pey ra jî ez feqîriya te ji nav nabim û ez ê te bihêlim hêviya peyketina te ve».

---

1- Munafiqûn / 8: Serbilindî, ya Xwedê û pêxemberê wî û bawerdara ye.

## Nukte

Gereke bêt zanîn eva he ku got: «Ez ê te bihêlim bi hêviya te ve», ne bi me'na dana vî karî ye ji wî ra. Çiko eva he di meşreba arif û mesleka burhan û mezhebe heq da tiştek nedurist û batil e. Qet tu mewcûdek ji bin teserufa Heq dernakeve û karê wî namîne bi hêviya kesek dî ve. Lêbelê çiko bende dilê xwe ji Heq Teala dizivirîne û berê xwe dide dinyayê, tebîet ser wî xurt dibe û enaniyet serî jê disitîne û layê xwebînî û xwexwazî û xweheziyê di wî da eserê datîne, ku ji vê yekê ra tê gotin: «Ew ma bi hêviya xwe ve». Lê vêca ebdê ku berê dilê wî ket Xwedê û melekûtê e'la û nûra Heq tijî dilê wî bû, hingê bi xwe bi xwe teserufatên wî û belkî di hinek wexta da wucûda wî dibe heqanî. Çawa ku di hedîsa behsa nafilan da, îşare hat kirin bal hinek ji van me'na ve. Wellahul alim.

## HEDÎSA BÎST Û HEŞTÊ

بالسند المتّصل إلى ثقه الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، رحمه الله، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد، عن محمّد بن خالد، و الحسين بن سعيد جميعا، عن القاسم بن محمّد، عن عبد الصّمد بن بشير، عن بعض أصحابه، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال قلت:

**«أَصْلَحَك الله، مَنْ أحَبّ لِقاءَ الله، أحَبّ الله لقاءَهُ؟ و مَن أبغَضَ لِقاءَ الله، أبغَض الله لِقاءَه؟ قال: نعم. قلتُ: فو الله، إنّا لَنَكْرَهُ المَوْتَ. فقال: ليسَ ذلك حيثُ تَذهَب. إنّما ذلك عند المُعايَنَة: إذا رأي ما يُحِبّ، فليسَ شيءٌ أحبَّ إليه مِنْ أنْ يَتَقدَّمَ علي الله، و الله تعالى يُحِبُّ لقاءَه، و هُوَ يحبّ لقاءَ الله [حينئذ]. و إذا رأي مَا يَكْرَهُ، فليس شيءٌ أبغَضَ [إليه] مِنْ لقاءِ الله، و الله يُبغِضُ لقاءَه.»**

Rawî dibêje, min got hezretê Sadiq (a.s): «Yê hej liqaya Xwedê bike, Xwedê jî hej liqaya wî dike? Yê ji liqaya Xwedê nexweş be Xwedê jî ji liqaya wî nexweş e? Got: "Belê". Vêca rawî dibêje: "Wellahî me ji mirinê nexweş e". Kerem kir: "Ne wereng e çawa tu goman dikî. Eva he di wextê mirinê da me'lûm dibe: Dema ew tişta ku jê hez dike bibîne, hingê tiştek ji wî ra şêrîntir nîne ji wê çendê ku bi aliyê Xwedê ve biçe û Xwedê jî hej dîdara wî dike û ew jî hej dîdara Xwedê dike. Lê dema ya jê nexweş bibîne, hingê tiştek ji wî ra nexweştir ji dîdara Xwedê nîne û Xwedê jî kerbê wî tê ji dîtina wî".»[1]

1- Furû'a Kafî, c. 3, p. 134

**Vebir: Der heqê liqaya Xwedê û çawaniya wê da ye**

Bizane ku ayet û riwayet der heqê «liqa û dîdara Xwedê» da bi awayê deqedeq, kinaye û îşare pir hene û li vêderê em nikarin hemûya bînin, lê bi kurtî em ê ji hineka biaxivin. Û eger kesek bixwaze zehftir bizane, bila binhêre risaleya Liqaullah ya rehmetî yê arif, Hac Mîrza Cewadê Tebrîzî[1] (rehma Xwedê lê be) ku hedîsên vê der heqê da heta bi qederekî kom kirine.

Bizane hinek ji alim û mufesiran ku bi awayek giştî rêka liqaullahê girtine û muşahidatên eyniye û tecelliyatên zatiye û esmaiye înkar kirine -bi gomana wê yekê ku zatê muqedes tenzîh bikinewa hemû ayet û riwayetên liqaa Xwedê, bi liqaa roja axretê û rû bi rûbûna digel ceza, sewab û îqabê me'ne kirine. Ev me'nekirin gerçî der heqê hinek ayet û hedîsan da ne dûr e. Lê der heqê hinek duayên cihê baweriyê û hinek hedîsan ku di kitêbên muteber da hatine û hinek riwayetên meşhûr ku alimên mezin xwe pê girtine, me'neyek gelek sar û dûr e.

Ev jî lazim e bêt zanîn: Mexseda wa yên rêk vekirî hîştin ji liqaullahê û muşahida cemal û celala Heq ra, ev nîne ku iktinaha zatê muqedes caiz e, an ilmê huzûrî û muşahida eynî ya ruhanî dagîrkirina wî zatê dagîrkerê alel itlaq mumkin e. Belkî imtina'a iktinaha di ilmê kullî û qasî tefekurê û îhata di îrfana şuhûdî da ji wan tişta ye ku delîl û burhan li ser heye û hemû aqilan û ehlê mearif û sahibdilan îtifaq li ser kiriye. Lêbelê ew ên mudde'iyê vî meqamî dibêjin: Piştî teqwa temam û i'raz û berzivirandina kullî ya qelb ji hemû aleman û refz û terkdana neş’eteyna ku mirov eniyet û enaniyetê bavêjê û bi temamî berê xwe bide Xwedê û

---

1- Mîrza Cewadê Tebrîzî wefatkirîyê sala 1344 e, zanayê mezinê hevçax bi salan di Necefê da hevrê digel Molla Husêynquliyê Hemedanî di tehzîbê da xebat kiriye. Di sala 1320-ê h.q da li Tebrêzê ziviriye û piştî hingê hatiye Qumê û mala wî daim cihê we’z û şîretan bûye. Ewî der heqê tehzîb û durust kirina exlaq da eserên hêjayî hene, wek: Risala Liqaullah, Esrarus Selat, el-Muraqibat fî E'malis Sene.

di esma û sifetên wî zatê muqedes û hub û hezkirina wî zatî da noqî bibe. Hingê sefa û zelaliyek ji dilê salik ra peyda dibe ku dibe cihê tecelliya esma û sifetan û perdên stûrên di navbeyna ebd, esma û sifetan da heyî tên dirandin û di esma û sifetan da fanî dibe. Û bi 'izza quds û celalê ve tê girêdan û tedelliya temam a zatî pêk tê û di vî halî da navbeyna ruhê muqedesê salik û Heq da ji perda esma û sifetan pê ve tu perdekî dî namînin.

Ji bona hinek ji ehlê sulûkê ra çêdibe perda nûrî ya esmaî û sifetî jî xerq bibe û bigehê tecelliyatên zatî yên xeybî û xwe, girêdayî û mutedellî bi zatê muqedes ve bibîne; di vê muşahidê da îhata qeyûmî ya Heq û fenaya zatî ya xwe muşahide bike û bi awayek eşkere wucûda xwe û hemû mewcûdatan sîbera Heq bibine. Çawa ku gora burhanê di navbera Heq û mexlûqê ewil da, ku mucered e ji hemû mewad û ‘elayiqan, hicabek nîne. Belkî gora burhanê ji muceredan ra mutleqa hicab nîne, bi wî awayî ev qelb ku di firehî û îhatê da ket rêza mewcûdên mucered da, belkî ji wan jî derbas kir, hingê hicabek jê ra nîne. Çawa ku di hedîsa şerîfa Kafî da hatî: «Girêdayîbûna ruhê bawerdar bi ruhê Xwedê ve şidhayîtir e ji ronahiya rojê ji rojê ra».

Di munacata Şe’baniye da hatiye, ku aliman ew qebûl e û kelîmên wê bi xwe delîl in ser wê yekê ku ewan hêjayan ew gotine: «Ey Xwedê, birîn û veqetînek temam bi aliyê xwe ve bide min, pê pertew û şewqa nêrîna xwe, çavê dilê me ewqas ronahî bike ku çavê dilan perdên nûrê şeq bike û bidire. Vêca bigehê jêdera mezinahiyê û ruhê me bi dergahê ‘izza qudsa te ve bigirhê û bêt hilawîstin. Ey Xwedê! Min bike ji wan kesan ku te gazî wan kir û ewan cewaba te da û te lê nihêrî vêca ji ber celala te, ew ji halê xwe çû, vêca te hêdîka û xef gazî kirê û ew eşkere ji te ra ket amel».

Kitêba şerîfa îlahî di behsa mîraca Resûlê Ekrem da (s.a.a) weha dibêje: «Summe dena fetedella * Fekane qabe qewseynî ew ed-

na».[1] Ev muşahida huzûrî ya fenaiye digel burhana 'edemê iktinah, îhatê, exbar û ayetên munezehe dijatî nîne; belkî ewê dişidîne û qewî dike.

Vêca çi îhtiyacî heye bi van me'nên dûr û sar? Eva he ku Mîrê bawerdaran dibêje: «Hema eger min li ser ezabê te sebir kir jî, vêca çawa ez ê li ser cudahiya ji te sebir bikim?»[2] Û gelo ew sotin û şewata ku weliyên Xwedê ji xwe nîşan didin, ma mirov dikare ser me'na hûrî û qesran bar bike? Ew ên digotan: «Em ne ji bona tirsa ji dojehê û çûna bihiştê îbadet dikin, belkî îbadetê me îbadetê azadeya ye û em xalis ji Xwedê ra îbadet dikin».[3] Gelo mirov dikare bi wî awayî me'ne bike ku ji ber cudahiya ji bihiştê, xwarin û vexwarinên wê ye? Ne; ne, eva he gotinek ne di cih da ye û pir nedurist e. Gelo tecelliyatên cemal a Heq di şeva mîracê da û ew cihê ku kesî nikariya biçiyê, heta Cebraîlê Emîn ê wehyê jî digel wan remz û razan namehrem bû, mirov dikare bêje behsa bihişt û qesrên wê yên xweş bûn? Û ew nûra ezemet û celalê, hema nîşandana nîmetên Xwedê bû? Gelo ew tecelliyên di duayên muteber da ji pêxemberan ra (a.s) çêbûyîn, ji pêka xweşiyên xwarin, vexwarina, bostan, xanî û qesran bûye?!

Mixabin ku em ên reben di nav perdên tarî yên tebîet da hatine pêçan û em ji zincîra amal û arzûyan ji xwarin, vexwarin û menkûhatan pê ve tiştek dî fêhm nakin û eger xweyê melheze û sahibdilek jî bixwaze evan perde û hicaban rakê, em ewî xelet dibînin. Heta ku em di çala tarî ya alema mulk da esîr bin, em nikarin ji mearif û muşahidatên ehlê dil tiştekî fêhm bikin. Lê vêca ey ezîz, qiyasa weliyan digel xwe neke û goman neke dilê Pêxember û weliyan wek dilê te ye. Toza viyanên dinyayî li ser dilê me heye û qirêja daketina di şehwet û viyana da nahêle ew bibe neynika tecelliyatê Heq û, mehbûb têra xuya bike. Helbet ji

---

1- Necm / 8 - 9: Paşê nêzîkê nêzîk bû. Vêca navber qasê du kevanan an kêmtir bû.

2- Binhêre hedîsa 16 ji vê kitêbê.

3- Binêre hedîsa 2 ji vê kitêbê.

xwe digel vê xwebînî û xwexwazî û xweperêsiyê em ji tecelliyên Heq Teala, cemal û celala wî tiştekî fêhm nakin û peyvên ewliya û ehlê marîfetê derewîn dikin. Eger em eşkere jî derewîn nekin, lê di dil da em ewa tekzîb û derewîn dikin. Eger vêca me rêyek ji derewînkirinê ra nebe, em deriyê tewîl û me'nekirinê vedikin. Welhasil çawa hebe em deriyê marîfeta Xwedê digirin. Em gotina: «Çiqa min tiştek dîtî, muheqeq min Xwedê jî digel wê û pêş wê da û di wê da dîtiye» me'ne dikin bi dîtina eseran. Û gotina: «Kesekî ku ez nebînim ez îbadetê wî nakim» em dibîn ser zanîna bi mefhûmên giştî wek zanînên xwe! Her weha ayetên liqaya Xwedê, em bi dîtina roja cezayê me'ne dikin. Her weha: «Liye me'ellahi hal»[1] em dibin ser me'na diltengiyê. Û gotina: «Ey Xwedê! Nêrîna li rûyê xwe yê hêjayî bike behra min» girî û zarî ya weliyan ji ber firaqê, em bi firaq û cudabûna ji hûrul eyn û teyrikên bihiştî me'ne dikin! Eva he hema ji ber wê ye ku em ne mêrê vê meydanê ne û em ji qisim û para heywanî û cismanî pê ve tiştekî fêhm nakin, vêca em zanînên dî hemûyan înkar dikin. Pîstira ji hemû bextreşiyan hema ev înkarkirin e ku deriyê hemû zanîn û mearifan li ber me digire û pêşiya peyketina me digire û me di heddê heywaniyetê da razî dihêle û me mehrûm dike ji cîhanên xeybê û enwarên îlahî. Em ên belengaz ku bi temamî ji van muşahidat û tecelliyatan mehrûm in û ji îmana bi van me'nan jî dûr in, ev di halekî da ye ku ev me'ne, yek ji derecên kemala nefsê ye û çêdibe pê wan em bigehin cihekî. Em ji zanînê jî ku weheye tovê muşahidatan bireşîne, direvin û em bi temamî çav û guhê xwe digirin û pembûyê xeflet û bêxeberiyê ditepisînin guhê xwe ra, da newebe ku peyva heq biçê têda. Eger em gotinek heq ji zimanê arif an salik an hekîmekî guh lê bibin, çiko me taqeta bihîstina wê nîne, em di cih da didin ber lanetan û xirabiyan jê ra çêdikin û kufr û fisqa wî dibêjin û hemû awayên xeybet û buxtanan em nisbet didin balê ve. Em kitêbê weqif dikin û şertê

---

1- Binêre hedîsa 27 ji vê kitêbê.

wê dikin ev ku rojê sed lanetan li rehmetiyê Feyzê Kaşanî[1] bibin! Sedrul Muteellihîn ku ji serhatên ehlê tewhîdê ye, bi navê zindîq jê xeber didin û der heqê wî da xwe ji çi gotinên xirab venadin. Qet ji çi kitêbên wî hêjayî qet piçek jî bêhna meyla bal sûfîtiyê ve xuya nake û kitêba: Kesru Esnam el-Cahiliye, di redda sûfiya da nivîsiye,[2] lê dîsa jî dibêjin ew sûfiyek tam û temam bûye. Em mirovên li ser zimanê Xwedê û Resûl (s.a.a) lanet li wan hatî kirin datînîn aliyekî û xwe têkel wan nakin. Lê em lanetê didin wî yê bi hawar û gazî behsa îmana bi Xwedê û Resûlê wî dike! Ez zanim ku ev le'n û tuhmet merteba wan kêm nakin û kêmasiyê naxin meqamê wan û belkî ser başiyên wan ve zêde dikin. Lê eva he ji me bi xwe ra zerer e û çêdibe bibe sebebê selba tewfîqê û zelîliya me. Şêxê me yê arif (ez gorî bim), digota: "Qet lanetê li şexsan nekin, heta bi wî kafirê ku hûn nizanin ser çi halî ji vê dinyayê çûye, xêncî ji wî yê welî yê pak ji halê piştî mirina wî xeber dayî, çiko çêdibe di demê mirinê da îman anî be, nexwe bi awayê kullî û giştî lanetê bikin". Yek xweyê vê nefsa qudsî ye ku nerazî ye lanet li kesekî bêt kirin ku eşkereyê wî ew e ku li ser kufrê miriye, ji ber ku îhtimal heye di demên mirinê da bawerî anî be. Yek jî yên wek me ne! Em hewara xwe ji Xwedê ra dibin, wa'izek meşhûr ku ehlê ilm û zanînê bû jî li ser minberê di huzûra alim û zana ya da digota: "Filan kes ku hekîm bû Quran jî dixwenda!"[3]

---

1- Feyzê Kaşanî, Muhemmed Muhsin kurê Şah Murteza, di sala 1091-ê h.q wefat kiriye. Muheddis û feqîh û arif û hekîmê sedê 11-ê ye. Ew feqîyê Şêxê Behaî û Seyyid Haşimê Behranî û Sedrul Muteellihîn bûye û esera fikrên Sedrul Muteellihîn di eserên Feyz ra xuya dikin. Allameyê Meclisî, Seyyid Nîmetullahê Cezairî, Qazî Seîdê Qumî... ji feqîyên wî bûne. Dora 90 eseran nisbet dane balê ve, kitêbên jêrî hinek ji wa ne: Tefsîra Safî, kitêba hedîsî ya Wafî, Meheccetul Beyza fî Tehzîbil Îhya, Şafî, Ilmul Yeqîn, el-Heqayiq, Kelimatun Meknûne, el-Usûlul Eslîyye.

2- Çar gotin di vê kitêbê da hene: 1- Meqamê alimê rebbanî û arifê heqîqî û butlana karê mutesewwifan, 2- Îbadatê bedenî, 3- Sifetên ebraran, 4- We'z û şîret.

3- Di civata şîna rehmetî Mîrza Alî Ekberê Hekîm da, hatiye gotin. Tefsîra

Eva he wek wê ye ku em bêjin: Filan kes ku pêxember bû, bawerî bi Xwedê û qiyametê hebû! Min jî baweriyek wereng bi ilmê vala nîne û ew ilmê ku îman pê ve neyê, ez ewê hicaba ekber zanim. Lê heta mirov danekeve hicabê nayê dirandin. Ulûm û zanînan tovê muşahidata ne. Bêje hema bila mirov bê hicaba îstilahat û ilman bigehê hinek derece û merteban jî, lê ev ne gora adetê û rêçka tebî'î ye û kêm çêdibe. Nexwe rêka Xwedê û pey gerhan Xwedê bi wê ye ku di destpêkê da wextê xwe bide gotûbêja Xwedênasiyê û xeberdar bibe ji zanîna der heqê Xwedê, esma û sifetên wî da bi rêka me'mûlî ve. Û li bal seydayên wî ilmî, piştî wê jî bi rêka ilm û amel ve zanîn û mearifan bigehîne dil, hingê helbet wê netîce û desthat jê ra hebe. Eger ne ehlê îstilahata ye, wê bi dildana mehbûb û bîranîna wî bigehê netîcê. Wê ev dildan û berdana navdeyî bibe sebebê hîdayeta wî û Xwedê Teala wê destê wî bigire û perdan rakê û wê ji van înkaran hinekî dakeve û belkî jî bi înayet û berdanên îlahî rêkekî bi aliyê mearifan ve peyda bike, hema bi rastî ew xweyê nîmet e.

**Vebir: Kifşbûna hinek ji veşartiyan di wextê mirinê da**

Ji vê hedîsê tê fêhmê ku di wextê mirinê da hinek ehwalên veşartî eşkere dibin. Eva he rêketî ye digel qismekê burhanê û muwafiq e gel keşfa ehlê keşf û eyanê û her weha rê dikeve gel hedîs û riwayetên dî jî. Heta ku mirov mijûlê avakirina vê dinyayê ye û berê dil bi wî alî ve ye û serxweşiya tebîet ew ji hal biriye, şehwet û xezebê ew gêj kiriye, şikl û sûretên amel û exlaqên wî bi temamî li ber wî perdekirî ne û ji eserên wan di melekûtê dil da bêxeber e. Vêca piştî ku sekereta mewtê û dijwarî û tengiya mirinê serda hat, heta bi qederekî berê wî ji vê dinyayê dizivire, eger ji ehlê îman û yeqînê be. Lê eger berê dilê wî li vê alemê be, di paşiya meselê da berê dilê wî dikeve wê alemê û ajokên îlahî û melaîketên Xwedê ku li ser wî hatine deynan ewî bi aliyê wê alemê ve

---

sûretê Hemd, p. 121.

dibin. Piştî vê birinê û wê berzivirînê nimûneyek ji alema berzexê jê ra xuya dike û zeraqeyek ji alema veşartî li ber vedibe û wez' û hal û meqam û merteba wî heta bi qederekî jê ra kifş dibe. Çawa ji Mîrê bawerdaran neqil bûyî ku kerem kir: «Nabe ku her xweyê ruhek ji vê dinyayê derkeve, ne heta bizane ka bihiştî ye an dojehî ye». Li vêderê hedîsek şerîf heye, her çend dirêj e jî, lê çiko mizgînî ye ji ehlê wîlayeta hezretê Mîrê bawerdaran ra û ji wan kesan ra ew ên xwe bi ehlê mala pak û paqij girtine (a.s) em ê hemûyê bînin. Cenabê Feyz, ev hedîs di Ilmul Yeqînê da aniye:

Rawî dibêje: «Min ji hezretê Sadiq (a.s) bihîst digota: "Wellahî wê ji hewe bêt qebûlkirin; wellahî hûnê bên bexşîn û efûkirin. Navbera hewe, kêf û şahiyê da, hema ew heye ku canê hewe bigehê gerî û qirika hewe. Dema ruh û can bigehê qirikê û wextê mirina hewe be, wê Resûlê Xwedê (s.a.a) û Alî (a.s) û Îmam, Cebraîl, Mîkaîl û melekê mewtê (selam li ser wan bin) hazir bibin; vêca Cebraîl (a.s) xwe nêzîk dike û dibêje Resûlê Xwedê (s.a.a): «Vî yê he, hej hewe Ehlê Beytê dikira, vêca hûn jî hejê bikin». Hingê vêca Pêxember (s.a.a) dibêje: «Ey Cebraîl, evî hej Xwedê dikira û kêfa wî bi pêxemberê Xwedê û binemala wî dihata, nexwe tu jî hejê bike». Vêca Cebraîl berê xwe dide melaîketê cangir û dibêjiyê: «Ey Ezraîl, evî mirovî hej Xwedê û Resûlê wî û Ehlê Beyt a Resûlê wî dikira, vêca tu jî hejê bike û digel wî nerm be». Vêca melekê cangir xwe nêzîkê wî dike û dibêjiyê: «Ey evdê Xwedê, te azadiya xwe stand? Te emannameya xwe stand? Tu di jiyana dinyayê da ketî pey parastina mezin?» Vêca Xwedê karînê didiyê û ew dibêje: «Belê». Melekê mewtê dibêjitê: «Ew çi ye?» dibêje: «Wilayeta Alîyê kurê Ebûtalib e". Dibêjitê: «Te rast got. Nexwe ewa tu jê ditirsiyayî, Xwedê êmnahî ji ber wê da te; ewa te dixwesta, te destê xwe ve anî. Mizgînî ji te ra ji ber hevalatiya borî yên qenc, Resûlê Xwedê (s.a.a) û Alî û îmamên ji zuriyeta wî (a.s)».

«Vêca bi nermî û rehetî canê wî digire û kefenê wî ji bihiştê jê ra tîne û hunûta wî wek miska xweş bêhn e. Vêca pê wî kefenî

kefen dike û pê wê hunûtê hunût dike û paşê cilkên zerên bihiştî dikin di ber da. Veca dema têxin di gorê da dergehek yê bihiştê li ber vedibe, rewh û reyhanên bihiştî serda tên. Paşê jê ra tê gotin: Wek çawa bûk li ser cihkê xwe radizê tu jî razê. Mizgîniya rewh û reyhan û bihişta pirnîmet û Xwedayê xezeb negirtî ji te ra be».

Di dewama gotinê da hezretê Sadiq (a.s) got: «Vêca dema demê mirina kafir be, dîsa Pêxemberê Xwedê (s.a.a), Alî, Îmam, Cebraîl, Mîkaîl û melekê mewtê tên (a.s) Cebraîl, xwe nêzîkê wî dike û dibêje: "Ey Resûlê Xwedê, evê he kerbê wî ji hewe Ehlê Beytê dihatan, vêca bila kerbê te jî ji wî bêt". Pêxember (s.a.a) dibêjitê: "Cebraîl, kerbê vî ji Xwedê û Pêxemberê Xwedê û binemala wî dihata, nexwe bila kerbê te jî jê bêt". Vêca Cebraîl berê xwe dide melaîketê cangir û dibêjiyê: "Ey Ezraîl, kerbê vî mirovî ji Xwedê û Resûlê wî û Ehlê Beyta Resûlê wî dihata, vêca bila kerbê te jê bêt û digel wî dijwar be". Vêca melekê cangir, xwe nêzîkê wî dike û dibêjiyê: "Ey evdê Xwedê, te azadiya xwe stand? Te emannameya xwe stand? Tu di jiyana dinyayê da ketî pey parastina mezin?" Dibêje: "Ne". Ezraîl dibêjitê: "Nexwe xezeba Xwedê û agir ji te ra ye û ewa tu li pey, ji destê te derket û ewa tu jê ditirsiyayî ser te da hat". Paşê jî canê wî bi dijwarî digire û ruhê wî teslîmê sêsed şeytana dike ku tif dikinê û ew ji ber bêhna wî dikevin eziyetê. Vêca dema datînin di qebrê da, deriyek yê dojehê li ber vedibe, bager û pêta goriya wê ser wî da tê».

Gereke bêt zanîn ku alema berzexa her kesî nimûneyeke ji alema wî ya qiyametê. Û berzex, alema navbera vê alemê û alema qiyametê ye û zeraqeyek ji bihişt û dojehê bi aliyê wê ve vekirî ye. Çawa ku di axirîka vê hedîsa şerîf da îşare kirî balê ve. Û di hedîsa meşhûra nebewî da jî îşare pê hatiye kirin: «Qebr, an bostanek ji bostanên bihiştê ye an jî çalek ya agir».

Nexwe kifş bû ku mirov di demê heziriya mirinê da eser û şiklê amelê xwe dibîne û mizgîniya bihiştê an dojehê ji melaîketê cangir dibihîze. Çawa ku van eserên kiryarî heta bi qederekî dibîne,

eserên wa ku di dil da çêdibin jî dibîne, çi nûraniyet û dilrehetî û dilfirehî, çi jî bervajiyê wê wek: Reşatiya dil û tengî û tarîtiya wê.

Nexwe li ber mirinê û dîtina berzexê, dil ji dîtina lutfa cemaliye ya îlahî ra hazir dibe û eserên tecellî ya lutf û cemalê eşkere dibin, eger ji bexteweran û ehlê îmanê be. Vêca huba liqa ya îlahî di dil da peyda dibe û dil difirijê cemala mehbûb, eger ji ehlê sabiqa husna û cezeba rubûbî be. Û ji Xwedê pê ve kes lezet û xweşî û hêjana wê nizane.

Eger ji ehlê îmanê û amelê qenc be, qasî îman û amelê xwe wê bikeve ber kerema Xwedê Teala û di wextê mirina xwe da wê bi eyan ewa bibîne. Vêca wê şewqa mirinê û gihana kerema Xwedê jê ra çêbe bikêf, rehetî û şahî wê ji vê cîhanê biçe cîhana dî. Çavên mulkî û zaiqa dinyayî nikarin evê şahî û kêfê û dîtina vê kerema Heq fêhm bikin û pê bihesin.

Lê vêca eger ji bextreş û înkarkeran û ji ehlê kufr û nifaqê be û amel û kiryarên wî pîs û nebaş bin, her kes gora kiryarên xwe yên dinyayî wê nimûneyekî ji qehr û xezeba îlahî bibîne û wê ewqas bizdan û nerehetî jê ra çêbe ku li bal wî tiştek neheztir ji tecelliyatên celaliye û qehriye yên îlahî nîne. Û ji ber vê kerb û dijminiyê, wê ewqas dijwarî, tengî, zulmet û ezab serda be ku, ji Xwedê pê ve kes nizane ka çiqas e. Eva he ji wan kesa ra ye ku di vê dinyayê da ehlê înkarê û dijminê Xwedê û ewiliyayên wî bin. Ji ehlê gunehan û kebaira ra jî qasî karê kirine, wê dojeh ji wan ra eşkere bibe, hingê ji bona wan nexweştir ji her tiştî cih guhaztina ji vê alemê ye. Vêca ewa têxin nav zehmet û tengî û dijwariyê ra û pir dikevin xem û hesretan.

Pê vê gotinê kifş bû ku heçî ya mirov di vê dinyayê da tovê wê reşandî û çandî û mirov jê bêxeber, di wextê mirinê da, dema perde û hicab rabin, mirov hinek ji wê dibîne û muşahide dike. Di alema dî da, mirov xêncî ji wê ya di vê alemê da kirî nabîne. Heçî tişta di vê alemê da tê kirin wek: Karê qenc û exlaqê baş û baweriyên durist, wê di wê alemê da bi eşkere şiklê wê û qencî û

kerema Xwedê vêra bibîne. Di bin ayeta: «Fe men ye'mel misqale zeretin xeyren yereh» di tefsîra Safî da ji Mecme'ê hedîsek neqil bûye ji Mîrê bawerdaran ku dibêje: «Ew muhkemtirîn ayeta Quranê ye û Pêxemberê Xwedê (s.a.a) jê ra digota: Cami'e».

Nexwe gereke em bizanin eger di vê cîhanê da hezkirina Xwedê û weliyên wî di dilê me da hebe û em îbadetê Xwedê bikin û berê dil bidin wî zatê muqedes, di demê mirinê da em ê heqîqeta wê li ser şiklek rind û sipehî bibînin. Vêca eger bervajî bû, berê dil ket dinyayê û ji Heq zivirî, çêdibe kêm kêm tovê dijminiya Xwedê û weliyên wî têda bêt reşandin. Di demê mirinê da ev dijminî dijwar bibe û eserên xerîb û bizdêner jê derkevin; wek çawa hat gotin.

Nexwe ji tiştên muhim û girîng ew e ku, mirov berê dil bide Xwedê Teala û weliyên wî û roja qiyametê, eva he jî pê wê çêdibe ku mirov di qencî û başiyên îlahî da melheze bike û hay ji taet û îbadetê wî hebe. Lê gereke mirov xwe û amelên xwe ji xwe ra neke palgeh û di her halî da nexasima di halê xelwetê da bi girî û zarî ji Xwedê bixwaze ku hezkirina xwe bêxe dilê wî û dilê wî pê marîfet û zanînê ronahî bike û hezkirina dinyayê û xêncî xwe ji dilê wî derîne. Helbet ev dua çêdibe di despêkê da bênaverok û bêmêjî û leqleqa ziman be, çiko hema bi rastî digel hebûna hezkirina pir ya dinyayê xwesta ji navçûna wê gelek zehmet e. Lê piştî demekî fikirînê, hayjêmanê û nîşandana desthata baş ya hezkirina îlahî û netîca xirab ya hezkirina dinyayê ji dil ra, hêvî ew e ji Xwedê, ku durist bibe û bigehê heqîqetê.

**Vebir: Me'na hezkirin û kerbê Xwedê Teala**

Bizane ku nisbetdana hezkirin û kerbê (hub û buxz) ji Xwedê ra, ku di Quranê û hedîsan da hatiye, ne bi wê me'nê ye ku di nav xelkê da heyî. Çiko lazimiya sifetên wek van ew e ku, di nefsê da eserek peyda bibe û Xwedê Teala munezeh û paqij e ji van tiştan. Di vê kurteyê da xeberdana dirêj vê der heqê da namunasib e, nexwe em ê bi kurtî û îcmal jê biaxivin:

Lazim e bêt zanîn ku gelek ewsaf û ehwal hene ku piştî daketina ji alema xeybiye ya mucered û hatina wan bi vê alema mulkiye ya tebî'iye, bi awayek wisa lê tên ku êdî ne bi şiklê wê ya alema xeybiye ya tecerudiye û lewazimên wê ne. Çawa ku Eflatûnî, hemû mewcûdatên mulkî mezahirên ruhên xeybiye û daketiyê heqîqetên melekûtiye zanin, 'ewariz û çawaniyên ku di vê alemê da bi awayek ne cewherî hene. Û dizanin ku di wê alemê da bi şiklên tecelliyên zatî yên wan e ku bi eynê wucûda xwe hene. Nexwe em weha bêjin: Tiştên wek van sifet û ehwalan ku di alema mulk mulazimê awayek yê tecerud û infi'alê ye, di alemên xeybiye û neşeatên tecerudiye da nexasima di alema esmaên îlahî û meqamê ehediyetê da bi şiklek munezeh û dûrê ji hemû kêmasiyan, hene û tabîr anîna ji wan bi hesebê alema mucered an su'qa rubûbî, tişteke xêncî ji vê alemê. Ji nimûne ra: Tecelliyatên rehmaniye û rehîmiye ku jê ra: Tecelliyatên cemaliye, lutfiye, hubiye û unsiye jî tê gotin. Eger di vê alemê da zuhûrê peyda bikin û eşkere bibin, bi awayê hub, rehmet û telettufa hevrê digel infi'alê ye. Eva he jî ji ber wê ye ku ev alem pir teng e. Di hedîsê da hatiye ku: «Rehmeta Xwedê sed piç e, ku yek piç ji wan daketiye vê alemê û hema ev rehmetên vê alemê hemû ji wê piçê ye». Wek rehmet û merhemeta di nav dayik, bav û zarokan da heyî... Çawa ku tecelliyatên qehriye û malikiye jî, ku ji tecelliyatên celalê ne, di vê alemê da bi şiklê kerb û xezeb eşkere dibin. Û ev hemû navdeyê hub, kerb, xezeb, rehmaniyet û qehhariye, tecelliyatên cemal û celalê ne. Û ew tecelliyat bi eynê zatê xwe hene. Û zêdahî û tecedud û infi'al di wan da nîne; çawa ku eşkerehiya rehmaniyet û qehhariyetê, ew muhabet û kerb û xezeb in ku di vê alemê da hene. Û çiko mezher fanî bûye di zahir da, zahir mutecellî ye di mezher da, tabîr anîna heryekî di şûna ya dî da di hinek ciyan da çêdibe. Anegora ya hatî gotin: Buxza Heq Teala ji ebd, zuhûr û eşkerehiya wî ye bi qehhariyet û întiqamê; hub û hezkirina wî jî, eşkerehiya wî ye bi rehmet û keremê. "Wellahul Alim».

## HEDÎSA BÎST Û NEHÊ

بالسّند المتّصل إلى أفضل المحدّثين و أقدمهم، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، رضى الله عنه، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد بن عيسي، عن عليّ بن النّعمان، عن معاوية بن عمّار، قال سمعت أبا عبد الله، عليه السّلام، يقول:

**«كان فِي وصيّةِ النّبيّ، صلّي الله عليه و آله و سلّم، لِعَلِيّ، عليه السّلام، أن قال: يا عَلِيّ، أُوصيك في نفسِك بِخِصالٍ، فَاحْفَظْها عَنّي. ثمّ قال: اَللّهمّ أَعِنْهُ. أمّا الأولى فالصِّدْق. و لا يَخْرُجَنَّ مِنْ فيكَ كَذِبَةٌ أبدا. و الثّانية، الوَرَعُ. و لا تَجْتَرِي علي خيانةٍ أبدا. و الثّالثة، الخَوفُ مِن الله عزّ ذِكْرُه كَأنّك تَراهُ. و الرّابعة، كَثْرة البُكاءِ مِن خَشْيَةِ الله تعالى. يُبْنَي لك بكُلِّ دَمْعَةٍ أَلْفُ بَيْتٍ في الجنّة. و الخامسةُ، بَذْلُك مالَكَ و دمَك دون دينِك. و السّادسة، الأَخْذُ بسُنّتي في صلاتي و صَوْمي و صَدَقَتي: أمّا الصّلاة فالخَمْسُون ركعةً، و أمّا الصّيام فثلاثةُ أيّام في الشّهر: الخَميس في أوّلِه و الأربَعاء في وَسَطِه و الخَميس في آخِره، و أمّا الصَّدَقَة فَجَهْدُك حتّي تقولَ قد أسرفتُ و لم تُسرِف. و عَلَيْكَ بصلاةِ اللّيلِ. و عليكَ بصلاةِ اللّيلِ، و عليك بِصلاةِ اللّيلِ، و عليك بصلاةِ الزَّوالِ، و عليكَ بِصلاةِ الزَّوالِ، و عليكَ بِصلاةِ الزَّوالِ، و عليك بتِلاوةِ القرآن علي كلِّ حالٍ، و عليكَ بِرَفْعِ يَدَيْكَ في صلاتك و تَقليبِهما، و عليك بالسِّواكِ عند كلّ وضوءٍ، و عليك بَمحاسنِ الأخلاقِ فَارْتَكِبْها، و مَساوِي الأخلاقِ فَاجْتَنِبْها. فَإنْ لم تَفْعَلْ، فَلا تَلُومَنَّ إلاّ نفسَكَ.»**

Ibn Emmar dibêje min ji Îmam Sadiq (a.s) bihîst digota: «Di wesiyeta Pêxember da (s.a.a) ji Alî ra (a.s) weha hatiye: “Ey Alî ez ê hinek wesiyeta li te bikim, ewa ji xwe ra bigire”. Paşê got: “Ya

Reb, alîkariya wî bike:

Ya yekê, rastî ye; bila derew û vir qet ji devê te dernekevin.

Ya duwê, paşketina ji herama ye; xwe nêzîkê xiyanetan neke.

Ya sisê, ew e ku tu ji Xwedê bitirsî; heçweku tu ewî bibînî.

Ya çarê, pir girîna ji tirsa Xwedê ye. Ji ber her rondikekî ve hezar avahî di cennetê da ji te ra ava dibin.

Ya pêncê, ew e tu mal û xwîna xwe li ber dînê xwe da bidî.

Ya şeşê, ew e tu di nimêj, rojî û sedeqê da xwe bi suneta min bigirî; nimêj pêncî rikat, rojî her heyv sê roj: Pêncşema ewilê mehê û çarşema nîvekê û pêncşema dûmahîkê; sedeqê jî bi awayek wereng pir bide û xwe bêxe zehmetê heta tu ji xwe ra bêjî ku êdî min zêdegavî kir. Lê hal ev e te zêdegavî û îsraf nekiribe. Hay ji nimêja şevê (tehecuda) hebe. Hay jê hebe. Hay jê hebe. Hay ji nimêja nîvro hebe, hay jê hebe, hay jê hebe. Di her hal û karî da Quranê bixwune. Di nimêjê da herdu destên xwe bilind bike û bizivirîne. Di demê her destnimêjekî da miswakê bi kar bîne. Exlaqên baş ji xwe ra bigire û bi kar bibe. Exlaqên pîs ji xwe bişo û xwe jê dûr bigire. Vêca eger te we nekir, ji xwe pê ve loman li kesî neke".»

## **Şîrove:**

«Xisal» cem'a «xeslet» e bi me'na exlaq, vê gorê bikarbirina wê di hemû ef'al û exlaqan da, wek çawa di vê hedîsê û hedîsên dî da hatî, mecaz e.

«Were'» bi me'na teqwatî an teqwatiya dijwar û xweparêziya tam û temam e. Belkî jî bi me'na xwepaşdedan, çiko were' di heqîqet da bi me'na vegirtin û vedana nefsê ye ji zêdegavî ya di hed û hudûdê şer' û aqilê da. Çêdibe bi me'na red be, dema deve ji vexwarina avê bêt paşdedan, dibêjin: «Were'etil ibil 'enil ma – Deve ji avê hat paşdedan». Ev ji ber wê ye, çiko nefs ji xwesta wê tê paşdedan.

«Cehd û cuhd», bi me'na zehmetê zêde ye; tengiya ji qamê der. Dema mirov heywana xwe ji qamê der bajo, dibêjin: «Cehede dabbeteh we echedeha». Cehd, her weha bi me'na xebata pir û cidî jî hatiye. Di vê hedîsê da ev me'ne hemû jî munasib in.

«‘Eleyke», ismê fiîl e û di şûna fiîla muteeddî da bi kar tê birin. «'Eleykum enfusekum, yanî: ji xwe venebin». Nexwe “ba” ji tekîdê ra ye, ne ji bo te’eddiyê. Di Mecmeul Behreynê da dibêje: “Eger ji bona te’eddiyê be, hingê bi me'na: «Istemsik – pê bigire» ye. Di Erebî da di demê mubalixê da wereng dibêjin.

Bi hezkirina Xwedê em ê di pêşekiyekî û çend vebiran da qasê lazim der heqê vê hedîsê da biaxivin.

## Pêşekî

Tê fêhmê ku ev şîretên hezretê Resûl di vê hedîsa şerîf da li Îmam Alî kirin, di hizra wî da gelek muhim bûne.

Yek ev ku: Her çend ji Îmam Alî (a.s) dûr e ku hay ji sînorên şer'î nemîne, lê dîsa evan wesiyetan lê dike. Eva he dixweyhîne ku ev gotin li bal wî hezretî pir girîng û muhim bûne. Eva he jî tiştek orfî ye ku mirov tiştek muhim ji kesekî ra bêje ku mirov zane muheqeq ew wan tiştan bi cih jî tîne.

Lê vêca ev îhtimal ku: Ev wesiyet ji bona wê ye ku bi vê rêkê ve ewa bigehîne guhê xelkê, wek çawa tê gotin: “Dîwaro, ez ji te ra dibêjim, bûkê tu bibihîze”, eva he dûr e. Çiko gora eşkereyê hedîsê, berê xeberdanê li hezretê Alî ye, şahidê wê jî “fî nefsik” û “Allahumme...” ye ku di hedîsê da hatiye. Û ev şiklê wesiyet kirinê di nav îmaman da jî hebûye. Wek vê ku Mîrê bawerdaran di wesiyeteka xwe da ji Îmam Hesen û Îmam Husêyn ra dibêje: “Ev wesiyeta min e ji hewe herduka ra û ji wan kesan ra ku nivîsoka min bigehê wan”.[1] Kifş e ku Heseneyn (a.s) ketine ber vê wesi-

1- Nehcul Belaxe, name ya 47

yetê. Wesiyetên weha muhimiya gotinê û hezkirina pir ji hevûdu nîşan didin. Hasil ev e ku, berê wesiyetan li Mîrê bawerdara ye ev nîşanê muhimiya wesiyet û şîreta ye.

Yekê dî ev e ku her çend mumkin nebe Mîrê bawerdaran bi van wesiyetan amel neke, lê dîsa bi tekîd jê ra hatiye gotin.

Yekê dî ev e ku piştî dibêje: "Ez wesiyetê li te dikim", dibêje: "Hay jê hebe û eva wesiyetan xweyî ke û ji min bigire". Û piştî wê jî jê ra dua kir: "Ya Reb aliyê bike". Xêncî ji van jî hinek tekîd û şidandin hene wek: "Nûn"a tekîdê, tekrar, ducar û sêcarkirin...

Nexwe kifş bû ku gotin pir muhim in û kifş e, ku di çi yek ji van gotina da menfeeta şexsî nehatiye melhezekirin. Belkî mexsed gihandina menfeetê ye ji yên dî ra. Û gerçî berê xeberdanê li Mîrê bawerdara ye, lê çiko ev gotin berpirsiyariya giştî ne, gereke em hay jê bimînin û bixebitın ku wesiyetên hezretê Resûl (s.a.a) li erdê nemînin. Gereke em bizanin ku hezkirina pir ya Resûlê Ekrem ji hezretê Alî nîşan dide ku evan gotina pir feyde têda hebin.

## Xirabiyên derewê

Yek ji wesiyetên hezretê Resûl (s.a.a) hevrêbûna rastiyê û dûriya ji derewê ye, eva he ku gotina wê pêş yên dî xist, nîşan dide ku di fikra wî (s.a.a) da, ev ji yên dî muhimtir e. Û em ê behsa xirabiyên derewê pêş gotina başiyên rastiyê bêxin.

Vêca bizane ev pîs û qebîha he, ji wa tişta ne ku aqil û neqil li ser pîsatî û xirabiya wê mutefiq in û ew bi xwe jî ji gunehên kebîre ye, çawa ku di hedîsan da hatiye. Her weha carna hinek pîsatiyên dî pê ve tên ku ne kêmtir in ji wê bi xwe. Carna ji ber eşkerebûna derewekî, mirov wereng ji çavan dikeve ku heta xilaseka omr jî cubran nabe. Xwedê neke mirov bi derewîniyê meşhûr bibe ku tiştek wek wê heysiyeta mirov pê naşike. Xêncî ji vê, vêca xirabiyên wê yên dînî û uxrewî jî pir in. Ku li vêderê em ê hinek ji van hedîsan bînin û çiko mesele ji wan tiştên gelek ronahî ye em xeberdanê dirêj nakin.

Îmam Baqir (a.s) dibêje: «Xwedê ji xirabiyan ra hinek qufl danîne û kilîda wan quflan kiriye ereq û derew; ku ji ereqê xirabtir e». Niha binhêre hedîsa ku ji alimê Alê Muhemmed (a.s) hatî neqilkirin ku di kitêbekî da hatiye nivîsîn ku aliman hemûyan (Xwedê ji wan razî be) ew qebûl kirine, vêca bibîne gelo rêkek ji ozr anînê ra dimîne? Gelo ev sivikgirtina derewê ji zeîfiya baweriya bi exbarên Ehlê Beytê pê ve ji ber tiştek dî ye? Em bi şiklên xeybî yên amelan û bi pêwenda me'newî ya mulk û melekût nizanin, ji ber vê ye ku em riwayetên ji vê pêkê haşa dikin û em dibêjin ev mubalixe ye, ev bi xwe rêkek nadurist e ku ji cehl û zeîfiya îmanê çêdibe. Fereza ku ji qismê mubalixê be jî, ma mubalixe ne gereke di cihê xwe da be? Gelo mirov dikare der heqê her tiştî da bêje ji ereq û şerabê pîstir e, an gereke pîsatiya wê pir zêde be ku bi şiklê mubalixe mirov bikare bêje ji şerab û ereqê xirabtir û pîstir e?

Hezretê Baqir (a.s) kerem kiriye: «Vir û derew, herifandina îmanê ye». Hema bi rastî exbarên weha mirov dilerizîne û pişta mirov dişikîne. Gomana min ew e, ku derew ewqas di nav xelkê da belav bûne ku xirabiya wê ji holê rabûye! Lê em ê hingê hişyar bibin ku em binhêrin îman ku sermaya jiyana axretê ye ji ber vê derewkirinê ji destê me derketiye û em pê nehesane.

Ji Îmam Riza (a.s) riwayet bûye ku: «Ji hezretê Resûlê Ekrem pirsîn: "Gelo çêdibe bawerdar tirsonek be?" Got: "Belê". Pirsîn: "Gelo çêdibe bexîl be?" Kerem kir: "Belê". Pirsîn: "Gelo çêdibe kezab û derewker be?" Kerem kir: "Na".»

Sedûqê Tayife ji Resûlê Xwedê (s.a.a) riwayet kiriye: «Derew ji ribayê pîstir e». Eva he di halekî da ye, ku dijwariya der heqê ribayê da hatiye gotin mirov heyirî û şaş dihêle.

Tiştek dî ku gereke mirov lê hişyar be, behsa derewa bi leyistok û yarî [henek] ye, ku di exbaran da ser nebaşiya wê bi dijwarî hatiye xeberdan û aliman fetwa daye ku, ew heram e. Çawa ku rehmetiyê xweyê Wesailê da di vê babetê da ku rêketî ye digel fetwa wî dibêje: "Derewa di karê piçûk û mezin û cidî û leyistok

da hemû heram e”. Di Kafiya şerîf da jî ji Îmam Baqir (a.s) neqil bûye ku: Îmam Alî bin Husêyn (a.s) ji zarokên xwe ra got: «Di hemû xeberdanên xwe da xwe ji derewên piçûk û mezin paşda bidin, çi cidî be û çi bi yarî û leyistok. Çiko dema mirov di karê piçûk da derew kir, curet û wêrekî peyda dibe ji derewkirina di karê mezin da, vêca her derewan bike. Ma hûn nizanin pêxemberê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Ebdê Xwedê rastiyê dide ber xwe, heta Xwedê ewî dinivîse ji rastgoyan û derewkirinê ji xwe ra dike adet, heta Xwedê ewî dinivîse ji derewker û kezaban”.»

Di Kafiyê da senedê digehîne cenabê Esbexê kurê Nebate, ew dibêje hezretê Mîrê bawerdaran (a.s) got: «Bende, bi tama îmanê nahese heta derewa bi leyistok û ji dil, terk bide».

Di wesiyeta Pêxember da (s.a.a) ji Ebûzer ra hatiye gotin: «Ey Ebûzer, jarî ji wî kesî ra ye, yê bi derew xeber dide, da xelk bikenin; belengazî û dojeh ji wî ra be».

Digel vê hemû dijwarî ya der heqê vê meselê da di exbarên Pêxember û binemala wî da hatiye, gereke mirov pir bextreş be ku evî karî bike û bikeve nav vî gunehî.

Bervajiyê derewê, ku ji xirabiyên pir pîs hesab bûye; vêca sidq û rastî jî pir baş jê hatiye xeberdan û di exbarên Ehlê Beytê da pir pesnê wê hatiye dayîn ku li vêderê em ê hinek ji wan hedîsan bînin.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Xelkê ji qencî û başiyê ra gazî bikin, ne bi zimanê xwe. Belkî bi xebat û cidiyetê di karê baş da û bi îbadet û duristî û teqwatiyê, [bila ew hewe di wan halan da bibînin]».

Cenabê Sedûq ji Resûlê Xwedê (s.a.a) digêre ku kerem kir: «Roja qiyametê ew ê ji hemûyan nêzîktirê min û şefaeta min jê ra hebe, ew e yê di xeberdanê da rastir û di emanet da emanetdartir û di exlaqê da xweş exlaqtir û di muamela gel xelkê da, pirtir nêzîkê wan be».

**Vebir: Heqîqeta were'ê û dereceyên wê**

Were', yek ji menazilên salik û rewingiyan jimartine. Ew, gora gotina arifê me'rûf Xace Abdullahê Ensarî: “Parastina kamila nefsê ye bi tirs û hayjêman ji ber şimitînan, an: Muamelekirina dijwar e digel nefsê, ji bona mezin ragirtina Xwedê Teala” ye. Eva he hemû mertebên wê li ber xwe digire. Çiko were'ê gelek derece û mertebe hene, çawa ku were'a giştî, xwevedan û paşdedana ji gunehên kebîre ye. Û were'a taybet xwe paşdedana ji tiştên şubhedar e, da ku nekeve nav herametiyê ra, çawa ku di hedîsa şerîfa “sêyane” da îşare pê hatiye kirin. Were'a ehlê zuhdê, xwevedana ji tiştên helal e, da ku giranî û zora wê jê ra çênebe. Were'a ehlê sulûkê ji gihana meqamatên dinyayê ra, nenêrîna li dinyayê ye. Were'a meczûbînan terka meqamata ye ji gihana babullah û şuhûda cemala Xwedê ra. Were'a weliyan xwevedana ji tewecuha xayet û xilasiya kara ye. Ji bona heryek ji van, şerh û şîroveyek heye ku ji me ra têda pir feyde nîne. Ya zanîna wê li vêderê lazim ew e ku: Were' û xwevedana ji heramên Xwedê binyat û pêleka hemû kemalên me'newî û derecên axretî ye, xêncî pê xwevedana ji heramên Xwedê, tu meqam û mertebekî destê kesî nakevin. Dilê bê were', ewqas zengo dibe ku berhêviya hingê ye ku ji wê xilas bibe. Nefs, bi were'ê zelal dibe û sefa jê ra çêdibe. Ji giştê ra ev ji muhimtirîn menazila ye û dest ve anîna wê ji sefera axretî ra ji muhimata ye û başî û seratiya wê gora exbarên Ehlê Beytê pirtir e ji wê yekê ku em bikarin li vêderê jê biaxivin. Em ê vê der heqê da hinek hedîsan bînin û yên berfirehtirê ji vê bixwazin bila binhêrin kitêbên hedîsî.

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje rawiyê hedîsê: «Ez wesiyeta teqwa Xwedê û were'ê û xebata di îbadet da li te dikim; bizane, îbadetê bê were', feyde nade». Riwayetên bi vê me'nê jî hene.

Ev delîl e ji wê yekê ra ku îtibar bi îbadetê bê were' nayê kirin. kifş e ku nukta di îbadet da heyî -teslîmbûna nefsê û serketina melekût li ser mulk û tebîet- bê were’ek xurt û teqwatiya kamil

dest ve nayê. Nefsên bê emriyên Xwedê dikin, nayên nexişandin û nexşik bêfeyde ye. Heta tu kaxizê ji reşatî û qirêjê paqij nekî, nexş li ser nayê kêşan. Nexwe îbadet ku şiklê kemalî yê nefsê ye, bê temîzkirina nefsê ji qirêja gunehan, feydê nade û şiklek bê me'ne û qalibek bê ruh e.

Kurê Xelîfe dibêje Îmam Sadiq (a.s) we'z dida û hema her got û got û fermana zuhdê da û paşê weha got: «Were'ê ji xwe ra bigirin, çiko hema bi rastî bê were', mirov nagihê ya li bal Xwedê». Gora vê hedîsa şerîf, mirovê bê were', mehrûm e ji wan keremên Xwedê Teala ku we'da wê dayî evdên xwe, eva he jî ji mezintirîn zelîlî û bextreşiya ye».

Îmam Baqir (a.s): «Xêncî bi amel û were'ê, kes nagihê wîlayeta me».

Di riwayetek dî da Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Kesê di bajarek sedhezar neferî da bijî û kesek ji wî pirtir ehlê were'ê hebe, ew ne ji peyrewên me ye». Di Kafiya şerîf da jî bi vê me'nê hedîs heye.

Lazim e bêt zanîn gora hedîsan, mîzan û kêşek di were'a kamil da dûrbûna ji heramên Xwedê ye û kesê xwe ji heramên Xwedê vede, ew ji xweyê were'tirîna ye. Nexwe bila şeytan vê meselê li ber çavan mezin neke û te bêhêvî neke. Çiko adeta wî mel'ûnî ye ku pê bêhêvîkirina xelkê, ewa dike nav koma bextreşên daimî da. Mesela, vê der heqê da dibêje: "Çawa çêdibe ku mirov ji xelkê bajarek sedhezar kesî pirtir xweyê were'ê be û di vê meselê da ji hemûyan pêştir be!" Eva he ji hîlên wî le'înî û xapandinên nefsa emmare ne. Cewaba wê ev e ku: Gora riwayetan, heçî kesê xwe ji heraman vede û paşda bide, dikeve ber van hedîsan û ji were'datirînê xelkê hesab dibe. Û dûrî ya ji heramên îlahî ne karek zehmet e, bi hinekî hayjêmana nefs û xwestinê, mirov dikare desta ji hemû heraman bikêşe. Helbet eger mirov bixwaze ehlê bexteweriyê be û di bin wîlayeta Ehlê Beytê da be û keremên Xwedê jê ra danîn bigehîne, lê evqas sebra wî li ser terka heraman tunebe, çênabe. Nexwe heta bi qederekî peyketin û ragirtin û xwe pê ve mijûlkirin lazim e.

**Tetmîm : Xirabiyên xiyanetê û heqîqeta emanet**

Li vêderê îşareya bal nukteyekî ve lazim e, ew jî ev e ku Resûlê Ekrem (s.a.a) di pey şîreta were'ê ra got: «Bila te cesareta xiyanetkirinê nebe». Eva he di halekî da ye ku were', hemû heraman li ber xwe digire û giştîtir e ji wê, çawa ku hat gotin. Nexwe li vêderê an gereke me'na xiyanetê ji fehma orfî ya wê giştîtir bêt me'nekirin, da beberanber bibe digel were'ê; bi vê me'nê xiyanet bi me'na hemû bê emriyan û hemû wan tişta be ku pêşîgir in li pêveçûna rêk a Xwedê da, çiko hemû emr û teklîfên îlahî emanetên wî ne. Çawa ku di ayeta şerîfe da hatî: «Me emanet raberê erd û ezmana kir…»[1] Hinek ji mufesiran gotine mexsed teklîf û destûrên îlahî ne, belkî hemû piç, endam, hêz û quwet, emanetên Xwedê ne û bikarbirina wan, ne di cihê razîbûna Xwedê da, xiyanet e û yek ji xiyanetan ew e ku mirov berê dil bide xêncî Xwedê:

Ev can ku dost bi emanet daye Hafiz – rojekî ez ê raberê wî bibim ûlêbizivirînim.[2]

An jî mexsed ji xiyanetê hema me'na wê ya mute'aref e û ji ber muhimiya wê ya pir zêde, di pey were'ê ra behsa wê kiriye. Heçweku tu dibêjî heqîqeta were'ê hema ew e, mirov xwe ji xiyanetê dûr bike. Û eger mirov li hedîsan da binhêre, behsa zivirandina emanet wê fêhm bike û têbigehê ku ev mesele li bal şari’ çiqas muhim û girîng e; xêncî ji wê vêca di fikra aqilan da jî hema ew bi xwe karek pir pîs e û gereke mirovê xain ji însana neyê hesabkirin. Belkî di nav rezîltirîn şeytana da bêt danîn. Û kifş e ku kesê bi xiyanet û neduristiyê nav xelkê da bêt naskirin, di vê dinyayê da jî wê jiyanek nexweş û nebaş hebe.

Mirov di vê dinyayê da bi alîkariya hev dikare jiyanê biborîne û jiyana tenêkî ji kesî ra çênabe, îlla ku ji nav koma beşerî derkeve û xwe bigehîne heywanên kûvî. Zivirîna jiyana komî jî barê wê yê

---

1- Ehzab / 72

2- Ji dîwana Hafizê Şîrazî.

giran li ser îtimad û hevbaweriyê ye û eger ev bawerî ji holê rabe, êdî jiyan bi rehetî rê ve naçe. Veca xîm û binyata îtimad û hevbaweriyê jî li ser emanetdarî û terka xiyanetê hatiye danîn. Nexwe bawerî bi mirovê xain nayê kirin û ew ji endamiya koma mirovan derketiye û ewî di civata medîna fazile da qebûl nakin ku endam û hevcivatiyê wan be. Û kifş e ku evê weha, wê çiqas bi zehmet û dijwarî bijî. Li vêderê ji temamkirina feyda behsê ra em ê çend hedîsekî bînin. Evqas ji dilên hişyar û çavên vekirî ra bes e.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Berê xwe nedin secde û rukû'ên dirêj yên mirov, çiko ew bûye adet jê ra, eger ewê neke wê nerehet bibe; lêbelê binhêre rast peyvî û emanetdariya wî».

Ebû Kehmes dibêje: «Min got Îmam Sadiq, (a.s) Ebî Ye'fûr selam ji te ra şandiye, kerem kir: "Selam li ser te û wî be; dema tu çûyî balê selaman lê bike û bêje: Caferê kurê Muhemmed got, bila li wê tiştê binhêre ewa ku Mîrê bawerdaran li bal Resûlê Xwedê (s.a.a) ewqas biqîmet kirî, vêca bila ew jî ewê yekê bike. Hema ew meqam û merteba ku Alî (a.s) li bal Resûlê Xwedê (s.a.a) peyda kirî, ji ber rastgoyî û emanetdariya wî bû".»

Ey ezîz, dê bifikire di van hedîsan da û binhêre rastgotinê û hayjêmana emanet, çiqas li bal Pêxember (s.a.a) qedr, qîmet û bihadan ji Alîyê kurê Ebûtalib (a.s) ra çêkiriye. Eva he ji hedîsê tê fêhmê ku ji hemû sifetê kemalî pirtir kêfa Pêxember (s.a.a) ji van du sifetan ra dihata ku evqas qîmet ji Mîrê bawerdaran ra li bal Pêxember (s.a.a) çêkir. Her weha ev du sifet li bal Îmam Sadiq ji seratirîn sifet û taybetmendî bûne ku ji xalistirîn hevalên xwe ra evê şîret û we'zê dibêje û jê dixwaze ku bi wî awayî be.

Îmam Baqir (a.s) dibêje: Ebûzer (r.a) dibêje: "Min ji Resûlê Xwedê (s.a.a) bihîst digota: «Roja qiyametê mirovatî û emanet li du aliyên siratê da ne, vêca dema ewê heqê mirovaniyê bi cih anî û yê hay ji emanet mayî bên, derbas dibin û diçin bihiştê. Lê dema xiyanetkarê heqê mirovaniyê pêk neanî tê, tu amelekî wî feydê nadiyê û sirat ewî davêje nav agir da".» Ji vê jî hat dest ku, şiklê

mirovanî û emanetdariyê di wê alemê da li du aliyê pirê rawestane û alî wa dikin ew ên heqê mirovaniyê pêk anîn û hay ji emanet mayîn. Û eger ew bên terkdan tu amelek feydê nadê û wê ewî bavêjin dojehê da.

Mîrê bawerdaran (a.s) kerem kir: «Emanet li xweyê wê bizivirînin, her çend ew qatilê zarokê pêxembera be jî».

Hezretê Sadiq (a.s) di wesiyeteka xwe da kerem kir: «Bizane eger ew ê derba şûr li Alî (a.s) dayî û ew kuştî, eger min bike emînê xwe û şîretê ji min bixwaze û gel min meşweret bike, ez ê jê qebûl bikim. Ez ê emanetê wî lê bizivirînim».

Hemzeyê Somalî dibêje: «Min ji Îmam Zeynul Abidîn Alî bin Husêyn bin Alî bin Ebûtalib bihîst, ji peyrewên xwe ra digota: "Hay ji emanet hebin, sond bi wî yê Muhemmed bi pêxemberî şandî, eger qatilê bavê min Husêynê kurê Alî ew şûrê ku bavê min pê kuştî emanet bisipêre min, ez ê emanetê wî lê bizivirînim".»

Îmam Sadiq ji bavên xwe ji Resûlê Xwedê (s.a.a) neqil dike ku dema behsa nekirina tişta dikira, kerem kir: "Xiyanetê nekin". Û got: "Kesê di dinyayê da xiyanetê di emanetekî da bike û emanet li xweyê wê nezivirîne, vêca mirina wî bigehê, ew ne li ser dînê min miriye. Wê di halekî da raberê Xwedê bibe ku kerbê wî jê têն. Û halê wî kesê malekî xiyanetê bikire jî wek xain bi xwe ye".

Hedîsên ji vê pêkê dîsa hene. Û kifş e ku netîca kerb û xezeba Xwedê ji ebd ra wê bibe çi. Ew ên şefaetê dikin jî, kifş e ku şefaeta wî yê Xwedê xezeb lê kirî nakin. Nexasima xiyanetkar ji xwe ji dînê Resûlê Xwedê (s.a.a) derketiye. Di hedîsek dî da hatiye ku: «Ew ê xiyanetekî li bawerdarekî bike, ew ne ji min e». Û di hedîsek dî da hatiye ku: «Ew ji dînê Îslamê derketiye û wê ewî bavêjin dojehê û ebedel ebed wê têda be». Em ji ber vî gunehî hewara xwe ji Xwedê ra dibin.

Ev jî kifş e ku xiyaneta li bawerdaran, ne hema xiyaneta malî tenê ye û xiyanetên mezintir jî li ber xwe girtiye. Nexwe gereke

mirov di vê alemê da gelek hay ji nefsa emmare hebe, çêdibe ku ew hinek kar û amelan ber mirov ve bavêje û hêsan nîşan bide ku dibin sebebê bextreşiya daimî. Ev xiyaneta li evdan, ji vêderê halê xiyaneta li emanetê Heq Teala jî me'lûm û kifş dibe.

**Vebir: Îşare bi hinek emanetên Heq Teala**

Gereke bêt zanîn ku Xwedayê Tebarek û Teala hemû hêz û endamên eşkere û navdeyî bi lutf û merhemeta xwe bi emanet sipartine me û ew di wî halî da bûye ku hemû pak û paqij bûne, hem bi şikl hem jî bi me'ne. Nexwe eger em jî di wextê mulaqata Reb da ewa emanetan pakê ji qirêja alema tebîet li wî bizivirînin, hingê em di parastina emanet da emîn û emanetdar bûne. Eger ne, em xiyanetkar in; ji Îslama heqîqî derketine û em ji dînê Resûlê Ekrem (s.a.a) der in. Di hedîsa meşhûr da hatiye: «Dilê bawerdar erşê Xwedê yê Rehman e». Û me'rûf e ku di hedîsa qudsî da hatiye: «Erd û ezmanê min nikarin min di xwe da bigirin, lê dilê ebdê min yê bawerdar, min di xwe da digire». Dilê bawerdar erş û textê padişahiya Heq Teala û sekingeha wî zatê muqedes e û sahibdil hema ew e. Berdana ji xêncî Heq Teala xiyanet e li Heq; huba xêncî zatê muqedes û xasanên wî ku hema muhabeta wî bi xwe ye, di meşreba arifan da xiyanet e. Wîlayeta Ehlê Beyt a pak û dostiya binemala risaletê (a.s) û nasîna meqamê wan yê pak û paqij, emanetê Xwedê ye. Çawa ku di gelek hedîsan da emanet di ayeta pîroz da bi wîlayeta Mîrê bawerdaran hatiye me'nekirin. Eger vegirtina wîlayet û hikûmeta wî hezretî xiyaneta di emanet da ye, pey neketina ji wî hezretî jî ji mertebên xiyanetê ye. Di hedîsên şerîf da hatiye: «Peyrewên wî ew in yên bi temamî bikevin pey wî; eger ne, hema ev gotin tenê ku em peyrewên wî ne, ji peyketinê ra ne bes e».

Gelek ji xeyalatan, wek viyana derewîn e! Hema dema em di dilê xwe da bi dostî û hezkirina Mîrê bawerdaran û zarokên wî yên paqij dihesin, em serxwe diçin û goman dikin gel terka peyçûna wan ew hezkirin wê bimîne. Çi dilrehetî heye ku eger mirov

hay jê nema û pey wan neçû, ev dostî û hezkirin bimîne? Çêdibe ku tengiya sekeratê ku ji nabawerdaran û namuxlisan ra tê pêş, mirov ji ber tirs û bizdanê Alîyê kurê Ebûtalib ji bîr bike. Di hedîsê da heye ku komek di dojehê da ezab dibînin û navê Resûlê Xwedê ji bîr dikin, heta wext û demê ezabê wan xilas bibe û ji qirêja gunehan bên şûştin û paqij bibin, hênûka navê mubarekê wî hezretî tê bîra wan û gazî ya: “Wa Muhemmedah” ji aliyê wan ve bilind dibe û ber rehmeta îlahî dikevin.

Em goman dikin qewimîna mirin û sekeratê wek wez' û halê tiştên vê alemê ne. Ezîzê min! Tu bi nexweşiyek kêm hemû zanînên xwe ji bîr dikî. Vêca ew dijwarî, tengî, musîbet û bizdan li kûderê ma? Eger mirov dostî kir û hejêkirin hebe û peyketin û tebe'iyet hebe, helbet dostiya welî yê mutleq û mehbûbê Heq wê bibe sebebê nêrîna Heq Teala. Lê eger de'we kir, lê bêamel û muxalefet jê çêbû, çêdibe ku hema di vê dinyayê û guherînên wê da mirov desta ji dostiya wî giranqedrî bikêşe û heta neûzu billah, bibe dijmin jî. Çawa ku me dîtin hinek kesên de'wa dostiyê dikiran, ji ber hinek hatin û çûnên ne di cih da û nadurist, dijminiya Xwedê, Resûl û Ehlê Beyta wî kirin. Û eger fereza bi muhabet ve ji vê alemê derket jî, her çend gora riwayetên şerîfe û ayetên pîroz, di qiyametê da ehlê xilasiyê ne û dûmahîkê digehin bexteweriyê, lê mirov ji musîbeta berzex û ehwalê mirinê û qiyametê xilas nabe. Çawa ku di hedîsa şerîf da hatiye: «Di qiyametê da em ê ji hewe ra şefaet bikin, lê di fikra berzexa xwe da bin». Em ji ber ezab û tengiya qebrê û zehmetê berzexê ku ne wekî tu tiştekî vê alemê ye, hewara xwe ji Xwedê ra dibin. Ew deriyê ji dojehê bi aliyê qebrê ve vedibe, eger li vê alemê vebe, wê xelk û hemûyên wê, hemû ji nav biçin. Xwedê me jê biparêze.

**Vebir: Tirsa ji Xwedê Teala**

Bizane ku xewf û tirsa ji Xwedê Teala ji wan menzila ye ku ji xelkê ra mirov kêmtir dikare menzilek bi wî awayî bibîne. Cuda ji wê ku ev tirs bi xwe, yek ji kemalatên me'newî ye, jêdera gelek

ji başiyên nefsanî ye û sebebek muhim e ji duristkirina nefsê ra. Belkî jî ji xwe mirov bikare bêje serkaniya hemû duristkirinan û destpêka dermankirina hemû nexweşiyên ruhî ne.

Mirovê bawerî bi Xwedê heyî û salik û muhacirê bi aliyê Xwedê ve, lazim e pir hay ji vê menzilê hebe û gelek berê wî li wan tişta be ku ewê di dil da bihêz bêxe û di qelb da qahîm bike. Wek bîranîna ezab û cezadanê û dijwariya demê mirin û paş mirinê di berzex û qiyametê da û tengaviyên sirat û mîzan û hesabê û ezab û nexweşiyên cûr bi cûrên dojehê. Her weha bîranîa celal û qehr û padişahiya girîng a Heq Teala û bîranîna istidracê ku Xwedê zûka û di cih da ezab nadê mirov û aqibet û dûmahîka xirab... Çiko me di vê kitêbê da heta qederekî behsa van meselan kir, li vêderê hema tenê em ê hinek hedîsan bînin der heqê başiya xewf û tirsa ji Xwedê Teala da:

Ji Îshaqê kurê Emmar riwayet bûye ku Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Ey Îshaq, wereng ji Xwedê bitirse, heçweku tu wî dibînî. Çi ko eger tu wî nabînî jî, ew te dibîne. Û eger tu wereng goman bikî ku ew te nabîne, hingê ji xwe tu kafir bûyî û eger tu dizanî ew te dibîne û dîsa jî tu eşkere gunehan li balê dikî, te ew lênêrek [bîner] gelek kêm hesab kiriye».

Eger kesek çawaniya tecellî ya Heq di mulk û melekûtê da bizane û zuhûra wî zatê muqedes di erd û ezmana da bi muşahida huzûriye an mukaşifa dil an bi îmana heqîqî fêhm bike. Û nisbeta Xwedê ji mexlûq ra û nisbeta mexlûq ji Xwedê ra wek çawa heyî bizane û çawaniya eşkerehî û meşiyeta îlahî di te’eyyunata da û fenaya wan di wî da wek çawa heyî îdrak bike û pê bihese, wê bizane ku Heq Teala di hemû cih û semtan da huzûrek temam heye û wê pê ilmê huzûrî ewî di hemû tiştî da bibîne. Çawa ku Îmam Sadiq (a.s) kerem dike: «Min tiştek nedîtiye xêncî ku min digel wê an di wê da Xwedê dîtiye». Û di nêzîkiya newafilan da jî heqîqeta: “Ez guh, çav û destê wî me...” Wê jê ra kifş û eşkere bibe. Vêca gora meqamê xwe bi awayê ilmî an îmanî an eynî an

şuhûdî wê Xwedê di temamê meratibê wucûdê da hazir bibîne. Helbet di vê mertebê da, salik di çi mertebê da be, wê haziriya Xwedê berçav bigire û xwe ji muxalifeta wî zatê muqedes paşda bide. Çiko hayjêman û berçavgirtina huzûr û mehzerê ji fitriyat û tiştên sirûştî ne, ku xelk bi wê ve hatine çêkirin. Çiqas mirov bêheya be jî, dîsa hazirî û nehazirî jê ra ferq dike. Nexasima eger huzûra mun'imê mezinê kamil be.

**Vebir: Wekyek nebûna xelkê**

Bizane ku heryek ji ehlê îman û sulûk û îrfan û wîlayetê bi awayekî hay ji hazirî û huzûrê dimînin ku taybetê wan bi xwe ye. Çawa ku bawerdar û ehlê teqwayê, berçavgirtina huzûrê bi terka tiştên hatine nehiykirin û bi kirina destûran, zanin û hay jê dimînin. Meczûbîn bi terka tewecuha bi xeyr û inqita' û birîna kamil zanin. Û ewliyayên kummel bi sebeb xeyriyet û nefya enaniyetê zanin. Welhasil yek ji meqamatên bilind ên ehlê marîfet û eshabê qulûb, muşahida hazirbûna Heq Teala û berçavgirtina huzûra wî ye. Çawa ku pê muşahida çawanî ya ilmê fiîlî yê Heq û fenaya tiştan di zatê Heq da û haziriya mewcûdan li ber bargaha wî ya muqedes, her weha fêhmkirina vê yekê ku alem bi temamî, mehzera rubûbî ye, di her meqamekî da hay ji huzûrê bimînin. Ev jî ji fitriyata ye.

Di vê hedîsa niha em şîrove dikin da, Resûlê Ekrem (s.a.a) îşare kiriye bal vî meqamê yekê ve. Û di hedîsa Îshaqê kurê Emmar da jî ku dibêje: «Ya sisê tirsa ji Xwedê ye, tirsek wereng, heçweku tu wî dibînî». Û her weha: «Bi wî awayî ji Xwedê bitirse, heçku tu wî dibînî». Îmam Sadiq (a.s) jî bi gotina jêrî, îşare kiriye bal meqamê duwê ve: «Çiko eger tu wî nabînî jî, lê ew te dibîne». Îmam Sadiq (a.s) her weha îşare kiriye bal hayjêmana huzûrê ku meseleyek fitrî û sirûştî ye: «Û eger tu dizanî ew te dibîne, lê dîsa jî tu gunehan dikî...»

Ji xewfê ra bi hesebê îxtilafa mertebên ehlê îman û sulûk û îrfanê gelek mertebe û derece hene ku xewf û tirsa ji ezemet û tecelliya

qehriye û celaliye ya Heq Teala ji girîngtirînê wan merteba ye. Mirov dikare evî meqamî ji mertebên tirs û xewfê nejimêre, çawa ku arifê me'rûf di Menazilus Sairînê da dibêje: "Ji heybeta îclal û celalê pê ve, tirsek ji ehlê dil û wîlayetê ra nîne".

**Vebir: Başiya giriyê**

Giriyê ji tirsa Xwedê jî gelek baş û hêjayî ye. Çawa ku di vê hedîsa şerîf da hatiye: «Ji ber her rondikekî ve, Xwedê hezar avahiya di bihiştê da jê ra ava dike». Cenabê Şêxê Sedûq jî (r.a) bi seneda mutesil ji Îmam Sadiq (a.s) û wî jî ji bavikên xwe, ew jî ji pêxemberê Xwedê (s.a.a) hedîs gêraye ku got: «Kesê çavê wî ji tirsa Xwedê rondik pêda bên, ji ber her rondikekî ve di bihiştê da qesrek xemilandî bi dur û cewheran didinê, ku qet tu çavekî ew nedîtiye û guha nebihîstiye û di dila ra jî derbas nebûye».

Îmam Baqir (a.s) ji Resûlê Xwedê (s.a.a) hedîsê digêre ku: «Xêncî ji Xwedê her tiştî beranberek heye, beranberê Xwedê tiştek nîne, "la îlahe îllellah"ê jî, beranber nîne. Rondikê ji tirsa Xwedê jî li ber tiştekî nayê kêşan, vêca eger bi rûyê wî da hat xwarê, qet toza zelîliyê nakeve ser wî rûyî».

Di hedîsê da hatiye ku: «Navbeyna mirov û bihiştê ji ber gunehan pirtir e ji navbera erdê heta erş. Lê vêca eger ji gunehan poşman bû û ji tirsa Xwedê girî, navbera wî û bihiştê ji navbera çav û mijûlankên [bijang] çav nêzîktir dibe».

Ji Îmam Sadiq (a.s) riwayet bûye ku: «Xêncî ji giriyê ku dilopeka wê agirê zehfî ditemirîne, her tiştek dî mîzan û pîvekek heye». Her weha kerem kiriye: «Eger yek kes girîker di nav komekî da hebe, rehmet li hemûya dibare». Hedîs ji vê pêkê zehf in.[1]

---

1- Kuleynî di Kafîyê da 13 hedîs di babetê girîyê da anîne. Şêx Hurrê Amilî jî 15 hedîs di babê 15 yê ebwabê cîhada nefsê da di Wesailê da anîne.

**Vebir: Başiya pir ji ber amelê kêm ve**

Hinek mirovên zeîf ku yeqîn neketiye dilê wan, îşkalê tînin ser van xêrên zehfî ku di beranberê karek kêm da tê dayîn. Lê ew bêxeber in ji vê yekê ku amelê di nezera me da di vê alemê da kêm û piçûk e, nabe delîl ku şikl û sûretê wê yê xeybî yê melekûtî jî piçûk û kêm e. Çawa ku bedena muqedes û şiklê cismanî yê Resûlê Ekrem ê Xatem û Nebiyê Mukerrem (s.a.a) yek ji tiştên piçûk yê vê alemê bû, lê ruhê pak û paqijê wî, mulk û melekût dagîr kiribû û sebebê çêbûna erd û ezmana bû. Nexwe şertê piçûk zanîna tiştekî bi hesebê batin û şiklê melekûtî, ew e ku mirov zanîn û agahî hebe bi alema melekût, batin û navdeyê tiştan. Û hukumdana bi vî awayî, ji heddên wek me der e. Gereke em çav û guhê xwe vekin ji bihîstin û dîtina gotinên zana yên alema axretê ra; yanî em guh bidin pêxemberan û weliyan (a.s).

Ya dî ev e ku xîmê wê alemê li ser kerem û rehmeta bê xilaseka Xwedayê Teala hatiye danîn û dûrdîtina kerema Xwedê; ew kerîmê alel itlaq û xweyê wê rehmeta berfireh, ji nezanîna pir zêde ye. Ev nîmetên pir zêde yên aqil nikarin ewan bijimêrin û di heyr û şaşiyê da ne, bê îstihqaq û xwestin, dane. Veca çi îşkalek heye ku bi rehm û kerema xwe û bê xwestin çend beranber xêrê bide evd û bendeyên xwe. Ew alema ku li ser esasê îrada însanî hatiye danîn û der heqê wê da hatiye gotin: «Di wê da heye tişta dil bixwaze û çav, xweşiyê jê bibîne».[1] Digel vê yekê ku viyana mirov bê hed û sînor e, qas û qeyde jê ra nîne; gelo der heqê wê da mirov dikare evê istib'adê bîne hizra xwe û bêje: Ev tiştek dûr e? Xwedayê Tebarek û Teala ew alem bi awayekî çêkiriye, îrade û xwesta mirov wereng qirar daye ku dema bixwaze tiştek hebe hema çêdibe.

Ezîz! Riwayet û exbarên vê der heqê da heyîn, ne yek û du û deh in ku mirov bikare di qebûl nekirina wê da bifikire, belkî ser

---

1- Zuxruf / 71

tewaturê ra ye. Hemû kitêbên cihê baweriyê tijî ne ji van hedîsan. Wisa ye heçku me bi guhê xwe ew ji wan pak û paqijan bihîstibe, ne bi awayekî ye ku deriyê tewîlê li ber vekirî be. Nexwe înkara vê gotinê ku hedîs li ser hene û dijatî jî digel burhanê nîne û bi awayekî burhan û delîl jî jê ra heye, ji ber lawaziya îmanê û nezaniyê ye. Mirov gereke li ber gotina enbiya û ewiliya (a.s) teslîm be. Qet tiştek ji kamilbûna mirov ra baştir ji teslîmbûna di beranberê Heq da nîne; nexasima di wan tişta da rêka aqil ji fêhmkirina wan ra girtiye. Eger mirov bixwaze aqilê xwe yê piçûk û gomanên xwe di karên xeybî û uxrewî û teebudî yên şer'î da bi kar bibe, wê bigehê wêderê ku musellemat û zerûratan jî înkar bike û wê ji kêmê berew zêdahiyê û ji binî bi aliyê jorî ve biçe. Fereza ku tu bikarî îşkalê bînî ser sened û zincîre bêjerên exbaran jî, her çend dîsa mecal ji înkarê ra nîne, kitêba pîroza îlahî. Qurana kerîm eve hazir e û îşkal nayê ser, di wê da jî behsa xêrên wek wan hatiye kirin, wek: «Şeva qedrê ku baştir e ji hezar şevan».[1] «Mesela [sedeqa] kesên malê xwe di rêka Xwedê da didin wek mesela libekî (ya tovê) ye ku heft ûşiyan bide, di her ûşiyekî da sed lib hebin; û Xwedê bo wî kesê bixwaze zêde dike, û Xwedê destfirehkerê pir zana ye».[2]

Gomana nivîser ev e ku stûneka vê istib'ad û înkar û dûr zanînê ser ucb û mezin zanîna amelan hatibe danîn. Mesela: Eger rojekî rojî bigire an şevekî rabe îbadet û tehecudan. Piştî hingê guh lê bibe ku xêrên pir mezin jê ra hatine dan, dûr nabîne, halhale eger qirar be kirha amel bêt dayîn, ev istib'ad û dûr zanîn heye. Lêbelê çiko ew amelê xwe zehf û pir dihesibîne, xêra wan jî tesdîq dike.

Ey ezîz! Fereza eger em di hemû omrê xwe da ku pêncî şêst sal e îbadet bikin û wezîfên xwe yên şer'î bi cih bînin û digel îmana durist û karê qenc û tewba heqîqî ji vê dinyayê biçin. Gelo kirha di beranberê vê îmanê û vî amelî da çiqas e? Halhale gora gotina

1- Qedr / 3

2- Beqere / 261

kitêb û sunetê û îtifaqa hemû dîn û olan, Xwedê rehma xwe ser mirovê weha da dirêje û ewî dibe bihişta ku soza wê hatî dan û wê daim di nav xweşî û rehetiyê da be. Gelo eva he tê înkar kirin? Halhale eger mesele mesela kirh û dana li beranberê amel da bûya -fereza eger amelê me kirh û xêrek jê ra hebe- dîsa wê evqas nebûya ku heta aqil nikare melheze bike. Nexwe kifş bû ku mesele bi awayek dî ye û bi şiklek dî dizivire. Gora wê êdî çi istib'ad û dûrî namîne û ne cihê înkar û qebûl nekirinê ye.

**Vebir: Der heqê hêjmara nafilan da ye**

Mexseda Resûlê Xwedê (s.a.a) ji pêncî rikat nimêj ku dibêje gora suneta min e. Nimêjên ferz û sunetên wa ne, du rikatên piştî nimêja eşayê rûniştî tên kirin û yek rikat hesab dibe, ne têda ye, dema ew jî bêt hesabê, nimêjên ferz gel sunet û nafilên xwe dibin: Pêncî û yek rikat. Behs nekirina ji vê rikatê di vê hedîsê da belkî ji ber wê be ku pêncî rikat suneta muekede bûye, çawa ku riwayeta Ibn Ebû Umeyr delîl e ji vê yekê ra: Dibêje min der heqê baştirîna wê ya sunet jê behs dike, pirsiyar ji Îmam Sadiq (a.s) kir, cewab da: «Her pêncî pêkve».

Ji hinek riwayetan jî îstifade dibe ku suneta Resûlê Xwedê (s.a.a) ser van pêncî rikatan herikiye. Her çend ji hinek dî tê fêhmê ku Pêxember (s.a.a) «'eteme – nafila nimêja eşayê» bi cih dianiya. Belkî jî negotina wê û herikîna sunetê li ser pêncî rikatan ew be ku 'eteme şûna nimêja «witr»ê da ye û ne serbixwe ye, çawa ku riwayeta Fuzeylê kurê Yesar delîl e ji vê gotinê ra û di riwayeta şerîfe da navê witir lê hatiye danîn. Di hinek riwayetan da hatiye: "Eger kesek ewê bike, vêca bimire heçku «witir» kirî wereng e". Nexwe di heqîqet da ev du rikat nimêja witir e ku ji tirsa qewimîna mirinê pêşiya demê wê da tê kirin, lê dema zemanê witrê bigehê, eva he ji ber wê ve ne kafî ye. Û di hinek riwayetan da hatiye ku ev du rikat ne ji pêncî rikatan bû û ew ji kamilkirina jimarê ra lê zêde kirine, da nafilên ferzan bibin ducar ferzan. Eva riwayetan îxtilafa medlûlî nîne û belkî ya baştir ku sunet li ser wê herikiye pêncî rikat be

û ev du rikat suneta ne mueked be û ji bona hayjêmana qewimîna mirinê û temamkirina jimarê hatibe danîn.

Welhasil, xêra nimêjên nafile yên rojane gelek e û heta di hinek riwayetan da terka wê, bê emrî hesab bûye û hinek riwayetên dî dibêjin: «Xwedê ji ber terka sunetan ezab dide» hinek riwayetan kelîma wacib jê ra bi kar anîne. Evên he hemû ji wê çendê ra ne ku bi cih bên û neyin terkdan. Heq ew e çiqas çêbe mirov ewan terk nede. Çiko bi hesebê gotina riwayetan, ew ji temamkirina ferzan û qebûliya wan ra ye. Hinek riwayet jî dibêjin: «Peyrewên me, ehlê pêncî û yek rikat nimêjê ne». Ji wan eşkere dibe ku mexsed ne bawerî ye bi wê hêjmarê, belkî mexsed bi cih anîna wa ye. Çawa ku ji hedîsa "nîşanên bawerdaran" jî, hema ev tê fêhmê.

**Vebir: Sunetbûna sê roj rojî di her heyvekî da**

Suneta duwê ya Resûlê Ekrem (s.a.a) ew e ku, di her mehê da sê roj rojî bên girtin, zêdetirê ji çil hedîsan vê der heqê da hene. Der heqê çawaniya wê da îxtilaf nav aliman da heye û gotina wan ya meşhûr digel piraniya hedîsan rêketî ye û Resûlê Xwedê (s.a.a) di axirîka omrê xwe da û îmamên hîdayetê jî wê gorê amel kirine; ew sê roj in bi vî awayî: Pêncşema yekê ku roja raberkirina amela ye, çarşema yekê ya dehkê duwê, ku roja nehsa berdewam û hatina ezab e. Û pêncşema paşîn ji dehkê axirê mehê, ku ew jî roja raberkirina amela ye. Di riwayetek dî da hatiye: «Çiqas ezab ser umetên pêşda bihata, daim di yek ji van sê rojan da dihata, vêca Resûlê Xwedê (s.a.a) di van rojan da rojî girt». Her weha hatiye ku: «Rojiya van sê rojan, beranberê rojiya salê ye». Hinek riwayetan ayet li ser anîne ku: «Kesê qenciyekî bîne, deh beranber jê ra heye».[1]

Riwayetên ne vê tertîbê dibêjin, hatine hemlkirin ser tertîba başiyê ve. Eger dij bin jî, ji gelek aliyan ve ev riwayet pêştir in. Belkî

1- En'am / 160

jî mirov bikare bêje dijatiya wan dijatiya di navbeyna deq û zahir an zahir û ezher da ye. Mursela Sedûq dibêje: «Eger di dehkê dûmahîkê da du pêncşem hebin, di ya yekê da rojî bigire, çiko belkî tu negihêyî ya duwê». Evê digel van riwayetan dijatî nîne. Çiko ya xuya dike ew e ku ji ber tirsa ji mirinê an tiştên dî lez dike ji gihana başiyê ra. Çawa ku sebebê danîna «‘eteme»yê jî hema ew e. Nexwe ev riwayet jî ji wa ye ku delalet dike ser mexsedê, yanî seratiya pêncşema dûmahîkê û ne ji riwayetên dij e. Ya eşkere ew e ku, eger pêncşema yekê rojî girt û giha pêncşema duwê jî, xêra rojîgirtina wê jî ji dest nede û belkî ya ewil cihê wê tijî neke. Gotina cenabê Feyzê Kaşanî û xweyê Hedaiqê (r.a) ku der heqê komkirina wan da gotine, dûr e, nexasima gotina yê duwê.(1)

**Vebir: Başiya sedeqê**

Suneta sisê ya hezretê Resûl (s.a.a) sedeqedan e; di nav sunetan da kêmtir hene ku di dereca wê da bin. Hedîs vê der heqê da gelek in ku di vê kurtê da cih nabin. Lê em ê hinek ji van hedîsan li vêderê bînin.

Ibn Sinan ji Îmam Sadiq (a.s) digêre: «Tiştek wek sedeqedanê ji bona bawerdar li ser şeytan giran nayê. Pêşiya ku ew bigehê destê ebd, digehê destê Xwedê».

Dîsa dibêje: «Xwedê Teala ji her tiştekî ra xiznedarek daniye, xêncî ji sedeqê, ku xweyîkerê wê Xwedê bi xwe ye. Û dema bavê min sedeqe bida xwazok, ew datanî di destê wî da û paşê jê digirta û maçî dikira û bêhn dikira û dîsa lê diziviranda».

Nêzîkê vê me'nê çend hedîsên dî jî hene ku delalet dikin ser hêjan û girîngiya sedeqê, ku Xwedê Teala ragirtin û xweyîkirina wê

---

1- Behranî, Yûsuf bin Ehmed bin Îbrahîm (1186 - 1107 h.q) feqîhê mezin ji binemala Alê Usfûr, serokatiya bîst sale ya hewzê ilmî yê Kerbelayê bi hêviya wî ve bûye. Yên wek: Mîrza yê Qumî, Seyyid Mehdiyê Behrul Ulûm, Molla Muhemmed Mehdiyê Neraqî ders ji wî hildane. Hedaiq ku ji kitêbên îstidlalî yên fiqhê tê hesabê ji eserên wî yên girîng e.

ne hêlaye hêviya kesî ve û ew bi xwe bi destê qudreta xwe sûret û şiklê wê yê xeybiye ya kamile ya wê xweyê dike.

Fikirîna di van hedîsa da ji bona ehlê dil û marîfetê keşfa tewhîda fiîlî û tecelliya qeyûmî ya Xwedê dike û nukteyek muhima wê ev e ku: Eger ew ê sedeqê dide, Xwedê nekirî, di dilê xwe da minetê li yê feqîr bike, vê minetê ewil li Xwedê dike, paşê li xwazok. Vêca bervajiyê wê jî heye. Yanî eger nefs sivikiyê û dilnizmiyê bike, vêca sedeqê bide, ewî cara ewil ji Xwedê re tewazu' kiriye û xwe şikandiye. Çawa ku Îmam Baqir (a.s) piştî ku sedeqe biketa destê muhtac da, ew radikira û bêhn dikira û maç dikira û bêhna mehbûb jê hiltaniya. Û Xwedê zane ku ji wî zatê pak û evîndarê mehbûb ra çiqas bêhnfirehî çêdibûya û çiqas kela dilê wî dataniya.

Gelek mixabin ku evî nivîserê noqîbûyî di nav bayê dil ra û xwe di erdê tebîetê da berdayî û esîrê zik û binzik û serxweşiyê, ku bi xweperestiyê hat vê alemê û ji nêzîk ve wê biçe û ji muhebeta weliyan qet îdrak nekir û tiştek ji cezbe, cezewat, menazil û muxazilatên wan fêhm nekir. Û sekina wî di vê alemê da sekina heywanî û bizava wî bizava heywanî û şeytanî bû. Eger we be, mirina wî jî mirina heywanî û şeytanî ye. Ey Xwedê, em şikayeta xwe tînin bal te û palgeha me tu yî. Ey Xwedê tu bi xwe me bi aliyê ronahiya xwe ve bibe û me ji vê xewa giran hişyar bike û bi aliyê xwe ve gazî bike.

Îmam Sadiq (a.s) dibêje, hezretê Resûlê Xwedê (s.a.a) gotiye: «Erdê qiyametê pêkve agir e, xêncî sîha bawerdar, çiko sedeqa wî jê ra sîberê çêdike».

Her weha di riwayetê da hatiye ku: «Wek çawa hûn golika devê perwerde dikin, wereng Xwedê jî, sedeqê perwerde dike. Eger hûn nîvê xurmê sedeqe bidin, wê Xwedê ewê wisa perwerde bike ku roja qiyametê ewê di şiklê çiyayê Uhudê an hêj mezintir teslîmê hewe bike». Hedîsên ji vê pêkê pir in. Di gelek hedîsa da hatiye ku sedeqe pêşiyê li mirinên pîs digire. Û rizq jorda tîne û deyn eda dike û temenan dirêj dike. Û heftêh awayên miri-

na nebaş paşda dide û Xwedayê Teala ji ber wê ve sed beranber dide û dibe sebebê zêdebûna mal. Û kesê spêdê sedeqê bide, ji belayên wê rojê tê parastin. Û eger di ewilê şevê da bide, ji belayên ezmanî yên wê şevê parastî dimîne û nexweşî bi sedeqê tên dermankirin û kesê hay ji maleka musilmana bimîne û ewa têr bike û cilka bide wan û avrûya wan biparêze, ji heftêh hecan baştir e. Halhale hecek tenê ji azadkirina heftêh kole û beniyan baştir e; eva he di halekî da ye ku der heqê azadkirina bende û benî da weha hatiye: «Kesê beniyekî azad bike, Xwedê ji ber her endamek yê wî ve qet û endamek yê azadker ji agirê dojehê diparêze». Û hezretê Mîrê bawerdaran bi keda destê xwe hezar benî azadkirin...

**Vebir: Nukteyek dîtir**

Em ê vî meqamî bi gotina nukteyekî dûmahî bînin, ew jî ev e ku di ayetê da hatiye: «Qet hûn nagîjin qenckariyê, heta hûn wê ya jê hez dikin [di rêka Xwedê da] înfaq bikin. Û heçiya hûn înfaq dikin bêgoman Xwedê pê dizane» (Alê Îmran/92). Di hedîsê da hatiye ku: «Gotin Îmam Sadiq (a.s) ku, "çima tu şekir dikî sedeqe?" Kerem kir: "Çiko ez ji her tiştî pirtir hej şekir dikim û ez dixwazim xweşdivêtirîna xwe bidim sedeqe".»

Mîrê bawerdaran lîbasek ji xwe ra kirî. Veca ew sedeqe da û got: "Min ji Resûlê Xwedê (s.a.a) bihîst ku kerem kir: "Kesê yên dî ser xwe ra bigirê, roja qiyametê wê Xwedê bihiştê jê ra bibijêre. Û kesê hej tiştekî bike vêca ewê ji Xwedê ra bidanê, roja qiyametê Xwedê dibêje: "'Evdan gora adeta baş kirha hev didan û îro ez ê bihiştê ji ber wî karê te ve bidim te".

Riwayet bûye dema yek ji sehabiyan ev ayet bihîst, baxçeyek yê xwe ku pir jê hez dikira, nav mirovên xwe da qismet kir, hingê Pêxember (s.a.a) gotê: «Xwezika te, ev karek pirsûd e ji te ra».

Ji hezretê Ebûzer ra mêvanek hat. Ji ber ku ewî kar hebû, got mêvan: "Here baştirîn deva min bîne da em ser jê bikin". Ew jî çû

û deveyek lawaz û zeîf anî. Ebûzer gotê: “Te xiyanet li min kir”, ewî got: “Baştirîn deve filan deve bû, lê min ew hişt ji roja îhtiyac û niyaza te ra”. Ebûzer got: “Roja niyaza min ew roj e ku min bikin di qebrê da, halhale Xwedê kerem kiriye: “Qet hûn nagîjin qenckariyê, heta hûn wê ya jê hez dikin bidin”.

Û got: “Sê şirîkên mal hene: Yek qeder e; bi jinavbirinê ra ew guh nadiyê ku ev baş e an xirab. Ya dî mîratber in; ku hêviyê ne tu bimirî, tu jî yê sisê yî, vêca eger te karî tu paş wan nekevî, paş nekeve. Xwedê dibêje: “Len tenalul birre hetta tunfiqû min ma tuhibbûn”.[1] Ev deve li bal min mehbûb bû di nav heyiya min da, vêca min dixwesta ez ji xwe ra ji pêşda rêkim”.

**Vebir: Yek ji remz û razên sedeqê**

Gereke bêt zanîn ku, mirov digel hezkirina ji mal, menal, xeml û zîneta dinyayê, mezin û perwerde bûye û evê hezkirinê cihê xwe di kûratiya canê mirov da vekiriye û jêdera pirtirê xirabiyên exlaqî, amelî û dînî ye. Çawa ku di gelek hedîsan da hatiye û me di şiroveya hinek hedîsan da jê behs kir. Vêca eger mirov bi dana sedeqê û fedakariyê bikare evê hezkirinê ji xwe bavêje, hingê ewî reh û rîşeyê fesad û xirabiyê biriye û ketiye ser rêka dest ve anîna mearifan û berê xwe daye alema xeyb û melekûtê û deriyê mele-keyên qenc û exlaqê kamil ji xwe ra vekiriye. Eva he yek ji nuk-teyên berketî yên dankirinên ferz û sunetên malî ne; ev nukte di dan û înfaqên sunet da ronahîtir e.

Nexwe ji koma hedîsên der heqê vî babetî da, ev tişt eşkere bû ku sedeqê, hemû başiyên dinyewî û uxrewî di xwe da kom kirine. Di destpêkê da ku mirov ewê dide, gel mirov e heta dûmahîka qiyametê ku mirov bibe bihiştê.

---

1- Alê Îmran / 92

## Tetimme

Bila bêt zanîn ku, sedeqeya sunet di xefayê da baştir e ji sedeqeya eşkere. Di Kafîyê da hatiye, Îmam Sadiq (a.s) dibêje Emmarê Sabatî: «Ey Emmar, wellahî sedeqa xef baştir e ji ya eşkere. Her weha îbadetê di xefiyê da baştir e ji îbadetê eşkere».

Di pir hedîsan da hatiye ku: "Sedeqa xef, xezeba Reb ji nav dibe". Her weha di hedîsê da hatiye ku: «Di wê rojê da ku çi sitar ji sitirandina Xwedê pê ve nînin, Xwedê wê heft koman bisitirîne, yek ji wan ew e ku bi xef sedeqe dayî, bi awayek wereng ku destê wî yê rastê bi sedeqedana destê çepê nehesayî».

Belkî nukteyeka baştir ya îbadetê xef ew be ku, ji riyayê dûrtir dibe û pirtir nêzîkê îxlasê ye. Di mesela sedeqê da jî bi veşartinê avrû û şerma feqîr tê parastin.

Sedeqa ji famîl û eqreba ra, baştir e ji yên dî; çiko xêncî ji sedeqê heqê mirovaniyê jî pêk tê, ku baştirîn îbadet e. Çawa ku di hedîsê da hatiye: «Baştirîn sedeqe, sedeqa gel mirov û eqrebayê mirov bi xwe ye. Pêkanîna heqê bîraderan bîst û ya famîl û eqreban bîst û çar e». Heta di hinek riwayetan da hatiye: «Eger mirov û eqrebayên mirov, yê muhtac û niyazmend hebin, sedeqedana bi yên dî qebûl nabe».

## Xilaseka vê gotinê

Di vê hedîsa şerîf da ku hat gotin: Ewqas xwe di sedeqedanê da rehet bike heta tu bêjî qey te îsraf û zêdegavî kiriye, halhale te zêdegavî nekiribe. Ev derdikeve ku çiqas pirtir sedeqe bêt dayîn ewqas baş e û sedeqe çiqas zêde be jî, îsraf û zêdegavî nayê hesabkirin. Di hedîsê da hatiye ku Îmam Hesen (a.s) sê caran malê xwe nîve nîv gel feqîran pişk kir, eger du sol hebû, an du cilik hebû, yek dida feqîran».

Îmam Riza (a.s) ji kurê xwe Îmam Cewad ra weha nivîsî: «Min bihîstiye ku dorûberên te, te di dergehê piçûk ra dibin, ew bexî-

letiyê dikin û dixwazin ku tu tiştekî nedî kesî. Ez te bi heqê xwe didim sondê ku bila hatin û çûna te di dergehê mezin ra be. Û dema tu siwar bûyî bila zêr û zîv gel te hebin û heçî xwest tu danê digel bikî. Ji mamên te heçî ji te xwest, ji pêncî dînaran kêmtir nediyê, eger te xwest tu zêdetir bidî, tu bi kêfa xwe yî. Ez hêvîdar im bi vî karî Xwedê merteba te bilind bike, vêca di rêka Xwedê da bide û ji tengiyê netirse».

Eva hedîsan dijatî nîne gel wan hedîsên dibêjin: «Sedeqedana zêde ku tengiyê ji mal û eyalê mirov ra çêke, ji îsrafê ye; û Xwedê dua wî yê ewqas danê bike heta tiştek ji jiyana xwe û maliyên xwe ra nehêle, qebûl nake» û di hedîsê da heye ku: «Baştirîn sedeqe ew e ku zêde neyê hesabkirin». Li hev anîna van hedîsan bi wî awayî ye ku dana pir ya sedeqê ne lazim e bi wî şiklî be ku tengî ji zarok û eyal ra çêbe. Çêdibe kesek nîvê malê xwe an zêdetir bide sedeqe û têra wî û zarokên wî jî bimînê û tengî ji ehlê malê ra jî çênebe.

**Vebir: Nimêja şevê; tehecud**

Di vê hedîsê da pir li ser tehecudan û nimêja nîvro şidandiye. Der heqê tehecudan da me di şiroveya hinek hedîsên borîn da piçekî axift, li vêderê em ê ji teberuk ra hinek hedîsan bînin:

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Hêjana [qedr û qîmet] bawerdar bi tehecuda ye û serbilindiya wî bi wê ye ku şerefa xelkê neşikêne».

Îmam Sadiq (a.s) dibêje: «Hezretê Resûl (s.a.a) got Cebraîl: “We’z û şîretê li min bike”. Cebraîl got: “Ey Muhemmed! Tu çawa bijî, bijî; paşî ra tu yê mirinê yî. Tu çi dixwazî bixwaze, tu wê paşî ra jê biqetî. Tu çi amelî bikî, bike; paşî ra tu wê raberê wê bibî. Evê jî bizane ku hêjana mirovê bawerdar rawestana wî ya di şevê da ye û serbilindiya wî xwe paşdedana ji şikandina şerefa xelkê ye».

Dîsa dibêje: «Mal û ewlad, xemla jiyana dinyayê ne; heşt rikat di axirîka şevê da digel witrê, xemla axretê ye. Carna Xwedê Teala herduka ji hineka ra berhev dike».

Ji şêxê Mufîd (r.a) neqil bûye ku Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Dema ebd ji tehecuda ra radibe, da Xwedayê xwe razî bike, gava dipûnijê, Xwedê bi wî fexrê li ser melaîketan dike û dibêje: "Hûn şahid bin ku ez lêborîm û min ewî efû kir".» Hedîsên ji vê pêkê pir in û vêderê derfet ji anîna wan ra nîne.

## Nimêja navîn

Nimêja zewalê jî ku Resûlê Ekrem (s.a.a) ji kirina wê ra haydan çêkiriye, mexsed ji wê nafilên nimêja nîvro ne. Çawa ku di hinek hedîsên dî da hatiye gotin. Muhimata di vê da heyî, an ji ber tayebetiya van nafila ye, ku xasiyetek taybet û muhim di wan bi xwe da heye; an jî ji ber wê ye ku peyhata nimêja nîvro ye û ji bona temamkirin û qebûliya wê ye.

Belkî jî di vê hedîsê da mexsed hema nimêja nîvro bi xwe be, ku jê ra tê gotin nimêja «wusta» (navîn) ji ber ku ketiye navbera nimêjên rojane da û Xwedê Teala bi taybet behsa bi cih anîna wê kiriye: «Nimêjan û nimêja navîn biparêzin û di halek şikestî da pêkve ji Xwedê ra rabin» (Beqere/238). Ya meşhûr di nav aliman da (r.a) ew e ku mexsed nimêja nîvro ye, ku bitaybet jê hatiye xeberdan û yekemîn nimêj e ku Cebraîl (a.s) ji Ademê bavê beşer ra anî (selam ser wî û Pêxemberê me bin).

Ya eşkere dibe ji gotina Resûlê Xwedê (s.a.a) ku got: «Hay ji nimêja zewalê hebe, ew e ku hay ji hed û sînor û wextê wê bimîne, ne hema tenê nimêjkirin, çawa ku ji emrê bi nimêjan û parastina nimêja nîvro jî hema ew tê zanîn. Çawa di gelek hedîsa da hatiye ku: «Hay ji wextê nimêjan bimînin û ewa di wextê seratî û başiya wan da bi cih bînin». Carna çêdibe ku paş xistina wan ji wextê fezîletê, bê ozr, nexasima eger dewamê bide vî karî, sistiya di karê nimêjê da bêt hesabê. kifş e ku eger tiştek ji mirov ra muhim be, mirov ewê zûtir û baştir bi cih tîne, vêca bervajiyê wê jî heye ku eger tiştek ji mirov ra ne muhim be, mirov bi xwe dide ji bîr kirin û sistiyê têda dike. Xwedê neke kar bigehê wêderê ku mi-

rov ji wan bêt hesabê, ew ên nimêjê sivik digirin, Resûlê Xwedê (s.a.a) der heqê wan da gotiye: «Ew ê nimêjê sivik bigire, vêca bimire, ew ne li ser dînê min miriye». Carna weheye ku ji ber sivikgirtina mesele ya nimêjê, mirov bigehê wêderê ku ew ê terk bide û neke. Tebî'î ye ku eger mirov tiştekî bêqîmet bizane kêm kêm ji dilê wî derkeve û ji bîr bike. Meselên dinyayî nexasima karên muhim yên wê, kêmtir tên ji bîr kirin, eva he ji ber wê ye ku daim dilê me pê ve ye û muhim zane û hejê dike û ji ber wê daim di melheza wî da ye, helbet nayê ji bîr kirin. Bi nimûne eger kesek soz bide te ku di destpêka nîvro ya filan rojê ez ê evqas pere bidim te ku jê ra berketî û muhim be û ewî xweyê soz bizane, qet ew wê rojê û qirargehê ji bîr nake û wê daim li saetê binhêre ka kengê wextê wê be û huzûra dil û tewecuhek temam li serê saetê da li wêderê hazir bibe. Ev ji ber wê ye ku hezkirin, ewê mezin û girîng dike; êdî di wê da tu qet sistiyê nakî. Her weha di karên dî yên dinyayî da, her kes gora halê xwe. Lê eger tiştek di dilê te da kêm û bêqîmet bû, eger berê dil bikeviyê jî, ji bêhnekî pê ve nîne û piştî demekî wê ji bîr jî bike.

Niha kifş bû ku ev sistiya me di karên dînî da ji ber çi ye; ji ber wê ye ku me bawerî bi xeybê nîne û stûna yeqîn û pê baweriyê sist e û me we'd û soza Xwedê û pêxemberan bi dil û can qebûl nekiriye. Vêca meselên dînî û wez' û halê Xwedêyî li bal me kêm û sist e; ev sistî kêm kêm wê bibe sebebê ji bîr kirinê û paşî ra hema di vê dinyayê da bibe sebebê derketina me ji dîn û an jî di demê mirinê da bibe sebebê dijwariyek temam.

Ev pênc wext nimêj, ku stûnên dîn û xîmê îmanê ne û di Îslamê da piştî îmanê tiştek bi girîngî û muhimiya wan nîne. Yek ji layên wê yên muhim ew e ku ev tekrar û ducarkirin û çendcarkirina wan dibe sebebê pêwend û girêdana mirov bi Heq Teala ve û girêdana bi alemên xeybiye ve qahîm û muhkem dike. Û meleka dilnizmî ya ji Xwedê ra di dil da cih dike û dara pir bereketa tewhîd û yekatiyê di dil da diçîne, ku êdî qet ji dil dernayê. Û di demê sekereta mirinê da ku, îmtihana mezin a îlahî ye bi başî ji

heqê îmtihanê tê der û dînê wî qet ji cih naçe û naqeliqe, ne wereng e ku emanetî be û pê piçek tengiyê ji cih derkeve.

Nexwe ey ezîz! Hay jê hebe, Xwedê di vê dinyayê û wê dinyayê da alîkarê te be. Newebe di karê dînê xwe da nexasima der heqê van pênc nimêjan da tu sistiyê bikî! Şik têda nîne ku enbiya û ewliya yên hîdayetê (a.s) ji ber dilovanî û merhemetê evqas hay dane ji nimêjkirinê ra û ji ber nekirinê tirsandine, eger ne, ne îmana me feydekî li wan dike, ne jî amel û kiryarên me menfeet û sûdekî digehîne wan.

**Vebir: Der heqê xwendina Quranê da ye**

Yek ji wesiyetên Resûlê Xwedê (s.a.a) xwendina Quranê ye. Der heqê başiya xwendin û parastin û ji ber kirin û hilgirtin û xwe pê girtin û hînkirin û fikirkirina di me'ne, remz û razên Quranê da ewqas gotin hene ku, di fêhma me ya kurt da cih nagirin û hedîsên vê der heqê da hatine gotin di vê kitêbê da cih nabin; em ê hineka bînin:

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Quran ehd û soznama Xwedê ye ji xelkê ra. Heq e mirovê musilman binhêre vê soznamê û rojê pêncî ayetan jê bixwune».

Zuherî dibêje min ji Alî bin Husêyn (a.s) bihîst digota: «Ayetên Quranê xizne ne. Vêca çiqas xizneyek vebû, heq e ku lê bêt nêrîn».

Eşkereyê van du hedîsan ew e ku fikirîna di Quranê da û melhezekirina me'na wê baş e. Fikirîna di ayetên muhkemên îlahî da û fêhmkirina zanîn û hikmetên wê, ne tefsîra bi reyê ye, ku nehy jê hatiye kirin; yanî me'nekirina bi awayê ku mirovên li pey bayê dil be nêrîna gotina Ehlê Beyta wehyê me'ne dikin. Eva he jî di cihê xwe da sabit bûye. Lê evder ne cihê berfireh xeberdana ji wê ye. Hema ji wê ra ev ayeta Quranê bes e ku kerem dike: «Vêca çima di Quranê da nafikirin û tedebur nakin; An qufl ser dilên wa ne» (Muhemmed/24).

Di hedîsa da jî gelek hatiye gotin ku berê xwe bidinê û di me'na wê da bifikirin. Ji Mîrê bawerdaran jî riwayet bûye ku kerem kir: «Bêfikir û bê melheze xwendina Quranê, bêfeyde û bêxêr e».

Hezretê Baqir (a.s) dibêje Resûlê Xwedê (s.a.a) kerem kir: «Kesê di şevekî da deh ayetan bixwune, ji xafilan nayê nivîsîn. Kesê pêncî ayetan bixwune ji zakira tê nivîsîn. Yê sed ayetan bixwune ji qanitan tê nivîsîn. Yê dused ayetan bixwune ji xaşi'an tê nivîsîn. Yê sêsed ayetan bixwune, ji faiz û xilasbûyan tê nivîsîn. Kesê pêncsed ayetan bixwune, ji muctehidan tê nivîsîn. Yê hezar ayeta bixwune xêrên pir jê ra tên nivîsîn...»

Di gelek hedîsan da hatiye ku Quran şikl û sûretek sipehî peyda dike û şefaetê dike ji wan kesên ew xwendîn ra. Di hedîsê da hatiye: «Kesê di ciwaniya xwe da Quranê bixwune, wê Quran bikeve nav goşt û xwîna wî ra û Xwedê ewî dide gel qenckaran; roja qiyametê jî Quran li hana wî tê û di huzûra Reb da dibêje: "Ey Xwedê, heçî yê karek kirî, kirha xwe girt; xêncî ji wî yê bi min amel kiriye. Vêca tu baştirîn danê digel wî bike". Vêca Xwedê Teala du cilkên bihiştî dike di ber da û taca kerameta xwe dide serî. Vêca deng tê: "Gelo tu razî bûyî?" Quran dibêje: "Ez berhêviyê pirtirê bûm". Vêca emn û emanê datînin di destê wî yê rastê da û xuldê didin destê wî yê çepê, di wî halî da diçê bihiştê, jê ra tê gotin: "Bixwîne û dereceyekî were jorê". Vêca ji Quranê ra tê gotin: "Gelo me ew gihand derecên bilind û tu razî bûyî?" Dibêje: "Belê"».

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Kesê pir Quranê bixwune û bi jiberkirin û parastina wê soza xwe nû bike, Xwedê du xêran didiyê». Ji vê hedîsê tê fêhmê ji xwendina Quranê ya baş ew e eserê di dil da deynê û şiklê navdeyê mirov bibe şiklê kelamê Xwedê û ji merteba melekê bigehê merteba tehequqê. Îşara bal wê ve, ew e ku dibêje: «Dema ciwanê bawerdar Quranê bixwune, Quran dikeve nav goşt û xwîna wî». Eva he kinaye ye ji wê yekê ku Quran di dilê wî da cih digire ku batin û navdeyê mirov gora qabiliyeta

wî dibe kelamê Xweda yê Mecîd û Hemîd. Hilgirê Quranê jî ew e ku batin û navdeyê wî pêkve heqîqeta kelamê îlahî be, wek Alî bin Ebûtalib (a.s) û zarokên wî yên pak ku ayetên îlahî ketiye di kûratiya canê wan da û ew, ayetên mezinên Xwedê û Qurana tam û temam in. Belkî hemû îbadet jî bi vî awayî ne û yek ji remz û razên îbadet û tekrara wê hema gihana vê mexsedê ye û ev e ku navdeyê mirov û dil bibe şikl û sûretê îbadet. Û di hedîsê da ye ku: «Alî (a.s) nimêja bawerdaran û rojiya wa ye».

## Îbadet eserê li ciwan dike

Ev esera qelbî û şikl girtina navdeyî di demê xortî û ciwaniyê da pirtir cih digire. Çiko dilê ciwan nazik û zelale û sefa wî pirtir û xwestên wî kêmtir û aloziya wî jî hindike. Pir dikeve bin teisîrê da û gelek qebûl dike; her exlaqek baş an xirab zûtir dikeve dilê ciwan û gelektir eser dike. Gelek caran çêdibe bê delîl, hema ji ber têkelî û muamelekî heq an batil, kirêtî an sipehîtî bikeve dilê ciwan û ewê qebûl bike. Nexwe lazime ciwan gelek hay ji rabûn rûniştin û têkeliya xwe hebe û xwe ji têkeliya xirab paşda bide; her çend dilê wan tijî be ji îman û baweriyê. Xêncî ji ciwanan jî têkeliya xirabkaran û ehlê exlaq û amelê xirab ji her kesî ra zerer têda heye û kes gereke ji xwe ne piştirast be û bi îman û exlaq û amelê xwe serxwe nece. Çawa ku di hedîsan da têkeliya ehlê gunehan nehiy jê hatiye kirin.

## Edebên xwendin a Quranê

Welhasil, ya durist ji xwendina Qurana pîroz ew e ku ser dil be, nexşkirin, emr û nehyên wê eser bikin û gaziyên wê di dil da cih bigirin. Lê eva he çênabe heta edebên xwendinê bi cih bên. Mexsed ji edeban ne ew e ku hinek qurra hemû xema wan bûye ew ku kelîma û herfan di mexrecê wan da bi kar tînin, bi awayek wereng ku êdî mirov ji fikirkirinê xafil û bêxeber dibe, weha dikin ku tecwîda wan xirab dibe û gelek caran kelîme ji şiklê xwe yê eslî derdikevin û tên guherîn û şiklek ecêb û xerîb bi xwe

digirin. Eva he yek ji xapandinên şeytan e ku mirov bi kelîmên Quranê ve mijûl bike û ji me'ne, remz, raz û heqîqeta emr û nehyên wê û ji gazî û de'weta wê û ji mearif û exlaqê wê dûr bêxe û bêxeber bihêle. Belkî mexsed ew edeb in ku di şerî'eta paqij da hatine melhezekirin, ku girîngtirînê wan tê fikirîn û hizirkirin û amelkirina bi ayeta ye, çawa ku hat gotin.

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: “Ev Quran, rênasê hîdayetê û çira ya şeva tarî ye. Vêca bila yê gerok e, çavê xwe lê bigerîne û ji behrebirina ji ronahî ya wê bila nêrîna xwe tîj bike. Çiko bi rastî fikirîna di wê da jiyana dilê mirovê bîna ye, çawa ku yê ronahî jê ra heyî di tarîtiyan da pê wê ronahiyê rê ve diçe”. Yanî di tarîtiya nezanînê û zulmata rê windabûnê da gereke ji ronahiya Quranê îstifade bêt kirin.

Mîrê bawerdaran (a.s) dibêje: «Vêca dema bigehin ayetekî ku beşaret û mizgînî têda ye, lê disekinin û lê tima dibin û dilê wan bi şewq difirijiyê û xweşiyan tînin ber çavê xwe. Û dema bigehin ayetekî ku tirsandin têda heye, guhê dil bi aliyê wê ve didin û wereng hesab dikin ku qêr û dengê fûrîna dojehê di guhê wan da ye».(1)

Ev kifş e ku eger kesek di Quranê da bifikire, wê eserê di dilê wî da deyne û kêm kêm bigehê meqam û merteba ehlê teqwayê. Û eger tewfîqa îlahî ewî li ber xwe bigire, wê ji wî meqamî jî derbas bibe û her endameka wî bibe ayeteka îlahî. Û belkî cezewat û cezebatên gotinên îlahî ewî ji hal bibe û hema di vê alemê da bigehê heqîqeta «bixwune û bilind bibe» heta ku bênavber, kelam ji bêjerê wê guh lê bibe, vêca ew biqewime, ya ku nayê xeyala min û te jî.

## Îxlasa di xwendinê da

Edebek dî ya xwendina Quranê ku ruknekê eserkirina li dil da ye û bê wê qet tu qîmetek ji amelan ra nîne, îxlas e; ku sermaya

---

1- Nehcul Belaxe, x. 193 ku bi xutbeya Hemmam meşhûr bûye.

meqamat û ticareta axretî ye. Di vê behsê da jî gelek hedîs hene ku yek ji wan ew e ku Kuleyniyê rehmetî gêrayî:

Îmam Baqir (a.s) dibêje: «Qariyên Quranê, sê deste ne: Yek ew e, yê Quran ji xwe ra kiriye wesîleya jiyanê û pê wê ji sultan pere digirin û xwe pêş xelkê têxin. Yek jî ew e ku, Quran ji ber kiriye, lê hed û sînorê wê ji nav biriye û paş guhê xwe ve avêtiye. Ev ên bi vî awayî Quran hilgirtine, hêvî ew e Xwedê wan zêde neke. Yê dî jî ew e ku, Quranê dixwune û bi dermanê Quranê birîna dilê xwe derman dike. Şevê digel wê hişyar dimîne û roj ve ji ber rojî girtinê têhnî dimîne, di cihê nimêja xwe da jî gel wê ye. Dema ji nav cihkan derkeve hema her gel wê ye; eha hema ji ber wa ye Xwedayê Ezîz ê Cebbar belan paşda dide; hema ji ber wa ye ku Xwedê baranê ji ezmana rê dike...»

Îmam Sadiq (a.s) : «Kesê Quranê bixwune, da îstifade ji xelkê bike, roja qiyametê, tê ku goşt bi hestiyê rûyê wî ve nîne».

Resûlê Xwedê (s.a.a) dibêje: «Kesê Quranê bielime, vêca pê amel neke û hezkirina dinyayê û xemla wê serî jê bistîne, ew musteheqê xezeb a Xwedê dibe û di dereca Cihû û Filehan da ye ku kitêba Xwedê paş guhê xwe ve avêtine».

Kesê Quranê bixwune, da xwe baş bide nîşandan û dinyayê destê xwe ve bîne, roja qiyametê di halekî da tê ku goşt bi hestiyê rûyê wî ve nîne û Quran wê li pişta wî bide heta ewî bavêje di dojehê da û wê bimîne gel wa yên ketine têda.

Kesê Quranê bixwune û pê amel neke, roja qiyametê Xwedê ew ê kor heşir dike. «Vêca dibêje: Ya Reb! Ez bîna bûm, vêca nexwe çima te ez kor anîm ber heşrê? Dibêjiyê: Wereng e, ayet û nîşanên me ji te ra hatin, vêca te ji bîr kirin, hema bi wî awayî îro tu jî ji bîr diçî». Vêca destûr tê ewî davêjin nav agir.

«Kesê ji Xwedê ra û ji bona zanabûna di dîn da, Quranê bixwune, qas xêra ji melaîket û nebî û pêxemberan ra heyî, ji wî ra heye».

«Kesê Quranê hîn bike ji riyayê ra, da ku gel cahila bikeve xirecirê û fexra xwe li aliman bike û dinyayê destê xwe ve bîne, roja

qiyametê wê Xwedê hestiyên wî hûr hûr bike û ezabê kesî ji yê wî nedijwartir e û ji ber ku pir kerbê Xwedê jê tên û xezebê lê dike, bi hemû awayên ezaba ewî ezab dide».

«Kesê Quranê bielime û di ilmê da dilnizim be û bendeyên Xwedê hînî zanîna Xwedayî dike û xêrê ji Xwedê dixwaze, di bihiştê da çi xêr ji ya wî mezintir û çi qedr û qîmet ji yê wî bilintir nînin. Û çi dereceyek bilind, xweş û baş di bihiştê da hebe muheqeq ewî baştirîn behr di wê da heye».

### Me'na tertîlê

Yek ji edebên xwendina Quranê, ku eserê di dil da datîne û heq e ku xwendayê Quranê hay jê bimîne, mesela tertîlê ye. Gora di hedîsê da hatî, tertîl, hayjêmana qeydê ye di lez xwendinê da, bi awayek wereng ku kelîme ji hev biqetin û cuda bibin. Abdullahê kurê Suleyman dibêje: «Min ji Îmam Sadiq (a.s) der heqê vê ayetê da pirsî: «We rettilil Qurane tertîla». wî got: "Mîrê bawerdaran (a.s) gotiye: "Yanî ew ê bi başî eşkere bike û çawa ku di şiîrê da lezketin heye di wê da lez nekeve. Kelîmên wê jî wereng ji hev neqetîne, wek çawa xîz ji hev cuda dibe û piçên wê hev nagirin. Lê wereng bixwunin ku eserê li dil bike û dilên qahîm bitirsîne, bila xema hewe ne ew be ku hûn bigehin xilaseka sûret". Yanî ne di wê fikrê da bin ku hûn zûka Quranê xitim bikin an bi lez sûretekî xilas bikin û pê ve biçin heta dûmahîkê.

Nexwe mirov ku dixwaze kelamê Xwedê bixwune û bi ayetên Xwedê dilê xweyê req derman bike û şifaya nexweşiyên dilî bigire û bi nûra wê bigehê mertebên axretî, gereke wesîle û esbabên zahirî û batinî yê wê dest ve bîne û edebên eşkere û me'newî yên wê bi cih bîne. Ne wek me ku eger car û baran jî em Quranê bixwunin, xêncî ku em ji me'ne, mexsed, destur, we'z û şîretên wê bêxeber in. Tu dibêjî qey ayetên der heqê ezabê dojehê û xweşiyên bihişta xweş da, ne ji me ra ne. Û neûzu billah dema em kitêba çîrokan dixwunîn dilê me hazirtir e ji hingê ku em kitêba

Xwedê dixwunin, xêncî ji van vêca em hay ji edebên xwendina rûyê Quranê jî namînîn.

Hedîs dibêjin: «Bi xem, huzn û bi dengek xweş Quranê bixwunin». Alî bin Husêyn wisa baş û xweş Quran tîlawet dikira û dixwenda ku kesên wêderê ra derbas dibûna disekinîna û guh didanê û hinek ji hal diçûna. Lê em, dema bixwazin dengê xwe yê xweş nîşa xelkê bidin, em Quranê an bangê dikin wesîle û mexseda me ne tîlaweta Quranê û ne amelkirina bi vê sunetê ye. Welhasil, hîle pîlên şeytan û nefsa emmare pir in û pir caran heq û batil têxin nav hev ra û sipehî û kirêtê tev hev dikin. Gereke mirov han û hawara xwe ji Xwedê ra bibe.

**Vebir: Bilind kirin û ziviranda desta di nimêjê da**

Di vê hedîsê da hat: «Di nimêjê da destên xwe bilind bike û bizivirîne». We dixweyhê mexsed bilind kirina desta be di demê tekbîr gotinê da. Çêdibe mexsed ji zivirandina desta jî ew be ku kefa dest bi aliyê qibleyê ve bêt zivirandin, çawa ku di wextê tekbîrê da yek ji suneta ye.

Belkî jî mexsed ji rakirina dest, rakirina di demê qunûtê da be û mexsed ji zivirandinê jî ew be ku kefa dest bi aliyê ezmana ve bêt zivirandin. Çawa ku feqîhan (Xwedê ji wan razê be) fetwa bi sunetbûna wê dane û ser delîla wî munaqeşe kirine. Lê piştî ku sîreya biryarî ya dîndara der heqê qunûtê da di destê me da heye, êdî îhtiyac bi delîlek dî nîne.

Vê jî bizane ku meşhûr nav fuqehan da, sunetbûna bilind kirina desta ye di wextê tekbîran da, hineka jî ji ber eşkereyê hinek riwayetan ku di tefsîra ayeta «Fe selli li rebbike wenher» da hatine, ew wacib zanîne û gotine: Mexsed ji «nehr»ê ku emr pê hatiye kirin, dest bilind kirina di demê tekbîrê da ye. Lê pir nîşan di hedîsa da hene ku sunetbûna wê nîşan didin; wek sebebên jê ra hatine gotin, nexasima riwayeta ku Fezlê kurê Şazan ji Îmam Riza neqil kirî. Xêncî ji vê sehîheya Alîyê kurê Cafer deqedeq dibêje ne wacib e...

Ev dest bilind kirin ku ji karên sunet e, heq e çiqas ji mirov bêt ewê terk nede. Nexasima di van sunetan da ku hinek ji aliman ferz zanîne, îhtiyata di dîn da jî berê mirov dide wê yekê ku ev kar neyê terkdan.

## Remz û raza bilind kirina destan

Bilind kirina destan di nimêjê da digel her tekbîrekî, xeml û zîneta nimêjê ye. Nimêja Cebraîl (a.s) û melaîketên heft ezmana jî bi vî awayî ye, çawa ku Esbexê Ibn Nebate ji Mîrê bawerdaran neqil dike. Ji Îmam Riza (a.s) neqil bûye ku gotiye: «Sebebê bilind kirina destan ew e ku di wê da berêxwedana Xwedê û awayek yê xwe şikandinê têda heye, Xwedê jî dixwaze di wextê zikir da, bende xwe ji wî ra berde û xwe jê ra bişikîne û xalis bike. Her weha ji wî qasî ra ye ku berê bende bikeve bîra Xwedê û bikare dilê xwe berhevê ser hev bike». Eva he rêketî ye gel wê ya ehlê marîfetê dibêjin: “Pê bilind kirina destan mirov xêncî Xwedê paş xwe ve tavêje û xwe ji Xwedê ra xalis dike û di pey ra bi mîraca heqîqî ya me'newî bi aliyê Xwedê ve dikeve rê. Ev mîrac û sefera he bê terka xêr û xwe çênabe; çawa ku bi tekbîrên heftane jî ji rakirina perdên heftane yên mulkiye û melekûtiye ra ne”.

Nexwe nimêja weliyan wereng e ku bi her tekbîrekî perdeyekî la didin û alemên van perde û hicaban ji nav dibin û piştî wê hicabek dî ji wan ra keşf dibe û tecelliyek teq’îdiya dî ser dilê wan da tê. Vêca wê jî bi tekbîrek dî şeq dikin, salikê rêka Xwedê bi vî awayî yek yek perde û hicaban la dide heta digehê tekbîra dûmahiyê. Hicaba heftê jî pê wê la dide û wek hezretê Îbrahîmê Xelîl (a.s) dibêje: «Înnî weccehtu wechiye lillezî feteres semawati wel erd - Bi rastî eve bi duristahî ve min berê xwe da wî yê ezman û erd çêkiriye. Û ez ne ji muşrika me» (En’am/ 79). Vêca di pey ra dergeh vedibe û subuhatên celalî jê ra keşf dibin, vêca isti’azê dibêje û bi navê Xwedê dikeve di nimêjê da. Di hedîsekî da îşare bal vê ve hatiye kirin. Ebul Hesen (a.s) dibêje: «Dema Resûlê Xwedê bilind bû bal ezmana ve, di şeva mîracê da heft

hicab la dan û li bal her hicabekî tekbîrek got, heta Xwedê ew gihand xilaseka hêjanê». Nêzîkê vê me'nê di hedîsa Îmam Mûsa bin Cafer da jî (a.s) hatiye. Lê di hedîsa pêşî da hatiye ku li bal her hicabekî tekbîrek got, eva he rêketîtir e gel meşreba arifan, çiko bi her tekbîrekî hicabek radibe û ronahiyek dixweyhê. Lê çiko ew nûr teq'îdeke ji hicabên nûraniyetê, ji ber wê bi dubare rakirina destan ew ji nav tê birin heta ku zatê mutleq tecellî bide û gihana xilaseka kerametê ku xayeta amal a ewliya ye dest bide. Û mirov dikare hedîsa pêşda bizivirîne bal vê ve.

Welhasil, em ji fêhma vê me'nê jî mehrûm in, vêca çi bigehê şuhûd û ûsûlê! Xirabî û bextreşiya me jî di wê da ye ku em înkara van mertebe, meqamat û mîraca ewliya dikin û nimêja wan jî wek ya xwe dihesibînin û kemala wan wek kemala amelê xwe hesab dikin. Axirîn tişta ji nimêja wan tê fêhma me, ew e ku em dibêjin, xwendin û edeba wan di nimêjê da baş e û nimêja wan bêşirk û bêriya ye, an ev ku: Ew ne ji tirsa dojehê û şewqa çûna bihiştê nimêj dikin, lê vêca mertebe û derecên wisa ji nimêj û mîraca wan ya ruhanî ra heye ku ji melheza me der e.

## Hişyariyek der heqê hîleyeka şeytan da

Welhasil, wekî bê îxtiyar behsa me hat ser vê, lazim e hişyariyek bêt dan der heqê yek ji hîlên mezinên şeytanê rêbir da, ku stiriyê ser rêka gihana mertebên me'newî ye. Yanî înkara meqamat û derecên xeybiye yên me'newî. Ev înkar sermaya hemû xeletî û nezaniya ye û sebebê sekinîn û temirînê ye. Ruhê şewqa gihana kemalan dimirîne û agirê evîna mîrac a ruhanî ditefîne û mirovan ji peyketinê paşda dide. Vêca bervajî, eger mirov bawerî hebe bi meqamatên me'newî û me'aricên îrfanî, çêdibe ku bibe alîkar ji agirê evîna fitrî ra ku di bin xweliyê da hatiye veşartin û pêta wê di dila da hilke û kêm kêm bikeve pey û mucahide û xebatê bike heta bikeve ber hîdayeta Heq Teala û ew zatê muqedes destê wî bigire.

**Vebir: Der heqê miswakê da ye**

Bizane miswak kirina didana ku Resûlê Xwedê (s.a.a) di vê hedîsê da wesiyet kiriye, yek ji edebên sunet yên şer'î ye, di hinek deman da jî suneta muekkede, wek pêş destnimêj û nimêjê da û di wextê xwendina Quranê û berbeyanê û hişyarbûna ji xew. Di hedîsan da gelek ji pêk anîna wê ra xeberdan hene û gelek xasiyet jî jê ra hene, li vêderê ji teberuk ra em ê ji hineka biaxivin.

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Di miswakê da duwazdeh xeslet hene: Ji suneta Pêxember e (s.a.a) (çawa ku di hedîsan da hatiye, miswak yek ji suneta pêxembera ye); dev paqij dike; çava ronahî dike; Xwedê razî dike; belxemê ji nav dibe; zêhn zêde dike; didana spî dike; xêran zêde dike; peqikên dev sax dike; pidû qahîm dike; meyla ji xwarinê ra çêdike û melaîketan şahî dike».

Hedîsek dî jî wek vê heye. Mexsed ji «hefr»ê di vê hedîsa şerîf da, ew kulikî peqik û çalikên piçûk in ku di binê didana da çêdibin û ‘edabek spî û bêhngenî têda peyda dibe ku di wextê cuyîna parî da dipeqin û ‘edava wê tevlî xwarinê dibe û nexweşî jê çêdibin, wek negivirandina xwarinê... Doktor pir muhimatê jê dixwin û heta ji dermankirina wê ra mecbûr dibin didana bikêşin. Nexwe eger aliyên navdeyî û xeybî jî ku muhimtirînê wan razîbûna Xwedê ye, berçav neyê girtin, ji selametiya bedenê û temîziyê ra be jî, gereke mirov hay jê bimîne û evê suneta berdewama pêxemberan bi cih bîne. Di hedîsê da hatiye Resûlê Xwedê (s.a.a) dibêje: «Cebraîl ewqas şîreta miswakê li min kir ku ez ji didanê xwe tirsiyam». Û kerem kir: «Eger ne ji ber zehmetê bûya min ê miswak kirina didana, pêşiya destnimêjê û her nimêjekî da ferz û wacib bikira». Resûlê Xwedê (s.a.a) ava destnimêjê û miswaka xwe, bi şev dataniya ber serê xwe û derê amana ava destnimêjê jî bi tiştekî dinixûmanda. Vêca dema ji xew radibûya didanê xwe miswak dikira û destnimêj digirta û çar rikat nimêj dikira û dîsa radiza. Di pey ra dîsa hişyar dibûya û miswak dikira û destnimêj digirta û nimêj dikira û xwe dirêj dikira. Îmam Sadiq (a.s) piştî

gotina vê hedîsê kerem kir: «Hûn jî baş baş bikevin pey dewsa Resûlê Xwedê (s.a.a)».

Di hedîsek dî da hatiye: «Du rikat nimêja bi miswakê baştir e ji heftêh rikat nimêja bê miswak». Heta eger mirov pêşiya destnimêjê da miswakê ji bîr bike, sunet e piştî destnimêjê miswak bike û sê caran avê li devê xwe werde. Hedîs vê der heqê da pir in, yê bixwaze bila binhêre kitêban.

**Vebir: Binyatên exlaqê qenc û xirab**

Her çend me di vê kitêbê da bi munasibeta ku pêş dihata, der heqê exlaq da bi dirêjî xeber da û me got ka çawa mirov bibe xweyê exlaqên hêjayî û xwe ji exlaqên pîs vede, lêbelê li vêderê jî em ê hinekî jê biaxivin:

Xulix, ew haletê nefsê ye ku bêfikir û melheze mirov hay dide ji kirina kar û amel ra. Mesela: Eger kesekî exlaqê sexawetê hebe, ew exlaq ewî bi aliyê cûd û danê ve dikişîne, bê wî qasî ku ber û pişta meselê melheze bike, heçku jê ra wek dîtin û bihîstinê be ku karek tebî'î û sirûştiyê wî ye. Her wereng nefsa paqij û efîf, ku evî sifetê têda cih girtiye, wereng xwe diparêze ku mirov goman dike xweparastin yek ji karên wî yên tebî'î û normal e. Lê heta nefs bi riyazet û tefekur û li peyhev kirinê negihe vê mertebê, ew tişt jê ra nebûye exlaq û tirsa ji wê heye ku eger ew xulq ji kemalata ye ji nav biçe û adet û xulqên xirab bikeve şûna wê da. Lê eger wek fiîl û kiryarên tebî'î û normal lê hat û di dil da rûnişt, ji navçûna wê zehmet e û pir kêm ev tişt diqewime.

Zanayên exlaq dibêjin: Ev halet û xulqê nefsê, di mirov da carna tebî'î û sirûştî ye û bi fitret û mizaca mirov ve girêdayî ye, çi ji aliyê başî û bexteweriyê ve, çi jî ji aliyê xirabî û bextreşiyê ve. Çawa ku tê dîtin hinek ji zemanê zarokiyê ve berew başiya diçin û hinek berew xirabî. Hinek ji ber tiştek kêm dikevin xezebê û bi tiştek kêm dikevin tirsê û dibizdin û hinek bervajiyê wa ne. Û carna ev xulqê nefsî ji adet û têkeliya xelkê û tedeburê çêdibe.

Car na jî ji ewil ve bi tefekur û melhezê çêdibe heta dibe meleke û di dil da rûdinê. Vê der heqê da îxtilaf kirine ku mijûliya bi wê ve feyde ji me ra têda nîne. Nexwe em biçin ser mexsedê û ji wê biaxivin ya feyde ji me ra têda heye.

Ya lazimê zanînê ev e ku mexsed ji tebî'î û fitrî bûna xulq û exlaq, ne ew e ku qet nayê guherîn. Belkî hemû meleke û exlaqên nefsanî, heta ku nefs di vê alemê da û di bin teserufa zeman û nûbûnê da ye û heyûlî û hêz jê ra heye, qabiliyeta guherînê jê ra heye û mirov dikare hemû exlaqên xwe biguherîne û bervajiyê wan di şûna wan da deyne. Çawa ku xêncî ji burhanê gaziya pêxemberan û şerî'etên heq ji exlaqên baş ra jî delîl in ji vê gotinê ra.

Em vê jî bizanin ku alimên exlaq, hêjanên nefsî bin çar serekiyan da danîne, yanî: Hikmet û îffet û şuca'et û edalet. Gotine: Hikmet, hêjayî ya nefsa natiqe ya mumeyize ye; şuca'et, hêjayî ya nefsa xezebiye ye; îffet hêjayî ya nefsa şehewiye ye; edalet jî duristahî û te'dîla sê hêjayî yên jorî hesab kirine. Hemû hêjan û fezîletên dî li van her çaran zivirandine û bi wan ve girêdane. Xeberdana berfireh vê der heqê da ji heddê vê kitêbê der e û ji yên wek me ra jî gelek feyde têda nîne. Ya muhim ew e ku gora hedîsa Pêxember (s.a.a) : «Ez ji kamilkirina exlaqa ra hatime hinartin» û xuya dike ku hedefa paşîn ji rêkirina xatemê resûlan (s.a.a) ew e ku exlaqan temam bike. Û di hedîsên şerîf da paş mearifan ji her tiştî pirtir ji exlaq xeber dane û ew muhim zanîne. Bi hezkirina Xwedê em ê jî jê xeber bidin. Muhimiya wê zêdetir e ji wê çendê ku em ji heqê wê bên der; lê hema evqas kifş û me'lûm e ku exlaqên hêjayî û qenc sermaya jiyana ebedî ya axretî ye. Û ew bihişta ku ji ber exlaqên hêjayî ve destê mirov dikeve ku bihişta sifeta ye, qet nayê qiyaskirin gel bihişta cismanî ya amelan, ku di wê da mezintirîn û baştirîn xweşiyên cismanî hene. Çawa ku tarîtî û bizdanên ji ber amelên xirab û pîs ser mirov da tên, ji hemû ezabên dijwar nexweştir in.

Heta mirov di vê cîhanê da ye, dikare xwe ji van tarîtiyan xilas bike û xwe bigehîne wan ronahiyan. Belê, çêdibe û mumkin e, lê

ne bi vî halê sar û sist û temirî û tefiyayî û bêhal, ku ne hema ev exlaqên pîs û xirabên me ji demê zarokiyê ve heyî ji xwe naşon, belkî roj bi roj em ser wan ve zêde dikin. Heçweku em goman nakin cîhan û alemek dî jî heye û wê di pey vê cîhanê ra bêt; heçweku gaziya pêxemberan qet ne ji me ra ye. Ne kifş e ku bi vî exlaqî û bi van amelan em ê bigehên kuderê û ser çi şiklî mehşûr bibin, demekî em ê hişyar bibin ku êdî tiştek ji destê me nayê û em ê bikevin hesret û kul û xeman. Hingê ji xwe pê ve em nikarin loman li kesî bikin. Pêxemberan rêka bexteweriyê nîşan dane, alim û hekîman gotinên wan ji me ra berfireh gotine û ronahî kirine û gotine ka çawa nexweşiyên dil û navdeyî derman dibin. Bi hemû awaya ji vê yekê ra xebitîn, lê di guhê me da neçû xwarê û me çav û guh û dilê xwe girt. Nexwe hema lome li me bi xwe dizivire çawa ku Pêxember di vê hedîsê da gotiye.

Ey ezîz! Eger tu ehlê xwendina kitêbên hedîsê yî, binhêre hedîsan, nexasima kitêba şerîfa Kafî bixwune. Eger tu ehlê ilmê û îstilahên ilmî yî, binhêre kitêbên exlaq, wek: Teharetul E'raq û kitêbên rehmetî yên Feyzê Kaşanî û Meclisî û du Neraqiyan.[1] Û eger tu xwe bêniyaz zanî an tu lazim nizanî exlaqên baş peyda kî û xwe ji exlaqên kirêt paşda bidî, qet ne cehla xwe ku maka nexweşiya ye, derman bike. Em ê vê xeberdanê ji teberuk ra bi neqla hinek hedîsan xilas bikin:

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje: «Xwedayê Teala exlaqên hêjayî dane Resûlê xwe (s.a.a) , vêca li xwe binhêrin eger di hewe da hebûn, hemdê Xwedê bikin û pirtir xwe pê ve rehet bikin. Deh ji wan ev in: Yeqîn, qena'et, sebir û xweragirî, şukir, hilm û nermî, xweşexlaqî, sexawet û merdî, xîret, şuca'et û cesaret, her weha camêrî».

Hezretê Sadiq (a.s): «Exlaqên hêjayî ji xwe ra bigirin, çiko bi rastî Xwedê hej exlaqên hêjayî û bijartî dike. Û xwe ji karên pîs û kirêt

1- Wek: Meheccetul Beyza, Kelimatu Meknûne, Heyata Cawîd, ji Feyzê Kaşanî. Û Heqqul Yeqîn ya rehmetîyê Meclisî. Û Camius Seadat ya Molla Mehdiyê Neraqî û Mîracus Seade ya Molla Ehmedê Neraqî ku ji Camius Seadatê hatiye girtin.

paşda bidin, çiko kerbê Xwedê jê tê... Xweşexlaq bin, çiko ew di dereca rojîgirê îbadetkar da ye...»

Hezretê Baqir (a.s): «Xweş exlaqtirîn, kamil îmantirîn e».

Pêxember (s.a.a) : «Roja qiyametê baştir ji xweşexlaqiyê nakeve di mîzan û kêşeka kesî da».

Û kerem kir: «Tiştên ku pirtir umeta min dibin bihiştê, teqwatî û xweş exlaqî ne».

Hezretê Sadiq (a.s) : «Qencî û xweşexlaqî, welatan ava dikin û temen dirêj dikin».

Kerem kir: «Xwedê xêra kesê şev û roj cîhadê dike, dide yê xweşexlaq».

Vê der heqê da hedîs pir in. Çawa qenc exlaqî dibe sebebê kemala îmanê û giraniya mîzane û çûna bihiştê, exlaqê pîs vêca bervajiyê wê: îmanê têk dide û mirov datîne ber ezabê îlahî, çawa ku di hedîsê da hatiye gotin:

Hezretê Sadiq (a.s): «Çawa sirke hingivê xirab dike, wereng nexweşexlaqî jî îmanê xirab dike». Di riwayetekî da jî weha hatiye: «Exlaqê xirab, amelan têk dide; çawa ku sirke hingivê xirab dike». Ji Pêxember neqil bûye ku got: «Xwedê tewba yê pîsexlaq, qebûl nake. Sebebê wê pirsîn, ewî kerem kir: “Çiko çiqas ji gunehekî poşman dibe û tewbe dike, dikeve nav gunehek xirabtir”.» Hedîs: «Nexweşexlaq, di nav ezab da ye». Ev me'lûm e ku pîsexlaqî, daim sebebê nexweşiyê ye û di alemên dî da jî sebebê tengî, nexweşî û tarîtiyê ye, çawa ku me di şirova hinek hedîsan da jê xeber da. «Wel hemdu lillah ewwelen we axiren».

## HEDÎSA SIYÊ

بسندى المتّصل إلى ثقة الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، رضوان الله عليه، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد بن خالد، عن أبيه عن هارون بن الجهم، عن المفضّل، عن سعد، عن أبى جعفر، عليه السّلام، قال:

**«إنّ القُلوبَ أربَعَةٌ: قَلبٌ فيه نِفاقٌ و إيمانٌ، و قلبٌ مَنْكُوسٌ، و قَلْب مَطْبُوعٌ، و قلب أَزْهَرُ أجْرَدُ. فقُلتُ: ما الأزهر؟ قال: فيه كهَيْئَةِ السِّراج. فأمّا المطبوع فقلبُ المُنافقِ، و أمّا الأزهر فقلب المؤمن: إن أعطاهُ شَكَرَ، و إن ابْتَلاهُ صَبَرَ. و أمّا المَنْكُوس فقلب المشرك، ثمّ قَرأ هذه الآيةَ: «اَفَمَنْ يَمْشى مُكِبّاً عَلي وَجْهِهِ أَهْدي أَمَّنْ يَمْشى سَوِيّا علَي صِراطٍ مُسْتَقيم.» فأمّا القلبُ الّذى فيه إيمان و نِفاقٌ، فهُمْ قَوْمٌ كانوا بالطّائِفِ. فإنْ أدْرَك أحدَهم أجَلُه علي نفاقِه هلك، و إن أدرَكَهُ علي إيمانه نَجا.»**

Îmam Baqir (a.s) kerem kiriye: “Çar dil hene, dilek ew e ku îman û nifaq têde ye û yek dilê bervajî ye û dilek muhrkirî ye û dilek ronahî û zelal e”. Min gotê: “«Ronahî» çi ye” Kerem kir: “Ew dileke wek çirayê. Lê vêca dilê muhrkirî, dilê minafiq e û ya ronahî jî dilê bawerdar e: Eger Xwedê bidiyê, şukir dike, eger bela serda bîne sebir dike. Dilê bervajî jî dilê muşrik e”. Di pey ra ev ayet xwend: «Ma gelo ew ê li ser rûyê xwe rê ve diçe rê rastir e an ew ê rasterast ser rêka rast dimeşe?!».[1] “Ew dilê îman û nifaq herdu têda heyîn jî, ew qewmeke li Taifê, vêca eger ecelê yek ji wan di

1- Mulk / 22

halê minafiqiya wî da bigehê, wê ji nav biçe û eger di halê îmana wî da ecel bigehêtê wê xilas bibe".[1]

**Şîrove:**

«Menkûs» bi me'na bervajî û meqlûb e. Zarokê menkûs ew e yê di wextê ji dayîkbûnê da piyên wî pêşiya serê wî da derkevin. Û «mukibbun 'ela wechih» nêzîkê vê me'nayê ye, ku di ayeta şerîfe da derbas bû û hezret, ew ji xwe ra kir delîl. Çiko «ikbab» bi me'na ketina deverû ye. Eva he kinaye ye ji wê yekê ku dil û qelbê mirovê muşrik deverû ye û hereket û bizava wê ne li ser rêka rast e. Çawa ku bi dirêjî em ê jê xeber bidin, înşaallah.

«Metbû'» bi me'naya muhrkirî ye, «teb'» bi me'na muhr e, «tebe'» jî bi me'na pîsatî ye. Li vêderê eger bi me'na muhrbûyî be, kinaye ye ji wî qasî ku gotina heq û heqîqetên Xwedayî qebûl nake. Bi vê me'nê nîne ku Heq Teala lutfa xwe ya taybet jê vedigire, gerçî ew me'ne jî durist e, lê ya hatî gotin munasibtir e.

«Ezher» , ser gotina «Niha»yê: Ji spiya ronahî ra, gora gotina Sihahê jî, ji tişta ronahî ra tê gotin, ji heyvê ra ezher tê gotin. Ibn Sikkît dibêje: "Du ezher, ji roj û heyvê ra tê gotin". Mirovê ezher ew e yê spî yê rûyê wî ronahî dide. Ji jina bi wê pêkê ra: zehra, tê gotin. Welhasil, ezher bi me'na spî û nûranî ye û ji ber wê yekê ji roj û heyvê ra ezheran hatiye gotin û ji zilamê spî yê nûranî ra, ezher, ji jina spî ya nûranî ra jî zehra, tê gotin.

«Ecred", ew e mû di bedena wî da tunebe. Di Sihahê da hatiye: Curd, erdê bê şînkatî ye. Eva he jî kinaye ye ji girêdayî nebûna bi dinyayê ve. Li vêderê qasê munasibê hedîsa şerîf em ê di yek pêşekî û çend vebiran da bêjin.

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 422, behsa "îman û kufrê", babetê "tarîtiya dilê munafiq", h. 2

## Pêşekî: Duristkirina dil

Ser zimanê şerî'etê û hekîm û arifan der heqê dil da hinek gotin hene ku vêderê ne cihê xeberdana ji wa ye û ji me ra jî gelek feyde têda nîne. Nexwe ya baş ew e çawa ku di hedîsên şerîf da bi îcmal jê derbas bûyîn, em jî jê derbas bibin û tişta ji me ra lazim û muhim em behsa wê bikin.

Evê bizane, duristkirina dil û xebata li vê der heqê da, ku duristî û xirabiya wê, sermaya bextewerî û bextreşiyê ye, lazimtir e ji teftîşa heqîqeta wê û duristkirina îstilahên rayic yên wê. Çiko carna çêdibe mirov pir bi îstilah û fêhma kelîman ve mijûl bibe û êdî ji dilê xwe bêxeber bibe û ji duristkirina wê paşde bimîne. Çêdibe mirov di şîrovekirina heqîqet û mahiyeta dil û qelb û îstilahên hekîm û arifan da bibe seydayek temam. Lê Xwedê nekirî dilê wî bi xwe ji dilên bervajî û muhrkirî be, wek kesê ku xasiyetên giyayên baş û nebaş bizane. Lê ew bi xwe, xwe ji yên zerer tê heyî nede paş û yên feyde tê heyî îstifade jê neke. Ev mirovê weha, digel wî qasî ku zanînek baş ya dermannasîn heye, wê ji nav biçe û ev zanîn nabe sebebê xilasiya wî.

Me pêşda got[1] ku zanîn bi awayek giştî amelî ne; heta bi ilmên mearifî jî ku bi awayekî amel di wan da jî heye.

Niha jî em dibêjin: Ilmê ehwalê dil û çawaniya selametî û nexweşî û duristî û neduristiya wê, ji wan ilma ye ku hema pêkve pêşekî û muqedima amel û rêka dermankirin û duristkirina wê ye û îdrak û fêhma wê ji kemalatên însanî nayê hesabê. Nexwe gereke berê mirov û mexseda wî ya eslî duristkirina dil û kamilkirina wê be, heta bigehê kemala bextewerî ya ruhanî û derecên bilind ên xeybiye. Û eger ji ehlê ilm û heqîqeta ye jî, bila zêdetirê mexseda wî ji daketina di afaq û enfusa da dest ve anîna haletên nefsanî yên wî bi xwe be, ku eger di halek nebaş da ye, li duristkirina wê bixebite û eger ji ehlê xilasiyê ye, li kemala wê bigere.

---

1- Hedîsa 26, nukteyek muhim.

**Vebir: Teqsîma dil der heqê çi da ye**

Bizane teqsîma ku di vê hedîsa şerîf da ji dil ra hatiye gotin, teqsîmek giştî û îcmalî ye. Û ji her dilekî ra mertebe û derece hene, çi ji aliyê şirk û nifaqê ve, çi jî ji aliyê îman û kemalê ve. Ji eşkereyê hedîsê ew xuya dike ku ev teqsîm ya dilan be, piştî kesb û bizava me'newî; ne bi heseb û fitret û sirûşta nefsê, da ku nebe dijê exbarên fitretê û evê yekê ku hemû yên ji dayikê dibin li ser tewhîdê diwelidin, şirk û nifaq di peyra çêdibe. Gerçî eger bi hesebê eslê fitretê be jî, bi awayekî durist e û mirov dikare dijatiyê rake û nabe cebra mehal jî. Lê ewa pirtir nêzîkê duristî, burhan û delîlê, gotina yekê ye. Û me peyra got[1] heta ku mirov di dinyayê da ye, dikare xwe ji hemû mertebên kêmasî û bextreşî, şirk û nifaqê xilas bike û xwe bigehîne mertebên kemal û bexteweriyên ruhanî û reyhanî. Û evê, dijatî nîne digel hedîsa binav û denga «yê bextreş di zikê dayika xwe da bextreş e» . Çiko me'na hedîsê ne ew e ku bextreşî zatî ye, belkî hedîs rêketî ye digel burhan û delîlê û di cihê xwe da hatiye ronahîkirin ku, bextreşî û şeqawet der heqê neqs û ‘edemê da ye û seadet û bextewerî jî der heqê wucûd û kemala wê da ye; ewa ji zatê dara pir xêra wucûdê ye, ew zatê muqedesê Heq e bi tertîba esbab û musebeban; ku terîqa baştirînê muteexiran û kamiltirînê muteqedima, nesîrul milleti wed dîn (q.s) e. An bi rêka zahiriyet, muzhiriyet, wehdet û zêdahî ve -ku terîqa mezintirînê feylesofan, hezretê Sedrul Muteellihîn e- û ewa der heqê neqs û ‘edemê da ji dara xebîsa mahiyetê ye û qabiliyeta wê ya ce'lî tune, çiko bin ce'lê ra û kêmtirê ji wê ye.

Mirov dikare der heqê bextewerî û bextreşiya di zikê dayikê da, ku di hedîsê da hat gotin, bêje ku mexsed ji «betnê umm – zikê dayikê» alema tebîet e. Û êdî «zikê dayikê» ne bi wê me'na orfî ya wê ye. Çiko seadet ji ber ku ji kemalat û fiîliyata ye, ji nufûsên heylûye ra nîne, îlla ku bi awayê quwe be. Û we dixweyhê ku bextewerê di zikê dayikê da, bilfiîl bextewer û seîd e. Nexwe di

1- Hedîsa 17

her hal û karî da gereke bi awayekî xilafê zahirek çêbe. Û çiko ya hatiye gotin gel delîlê rêketî ye, nexwe me'na wê bi wî awayî ye û an me'nayekî ku netîca wê bibe ew. Welhasil, xeberdana zêdetir vê der heqê û delîla wê da ji mexsedê der e, lê carna qelem serî ji mirov distîne û bervajiyê mexsedê diherike.

## Hegera hesra dilan da

Hineka gotine dil ku di van çar qisman da hatine vebirîn, ji ber wê yekê ye ku: Dilan, an îman hene û an nînin, eger hebin, an îman bi hemû wa tiştên pêxemberan anîn hene, an îman bi hinekî hene û bi hinekî nînin. Ya yekê, dilê bawerdare; ya duwê, dileke ku îman û nifaq herdu têda ne. Gora ya duwê, an eşkere de'wa îmanê dike, an ne. Vêca ya yekê dilê minafiq e, ya duwê dilê muşrik.

Lê eva he ku carna hema rastî baweriyê bîne bi hemû wan tiştên Pêxember (s.a.a) anî û carna jî bibe minafiq ku îmanê bi hinekî bîne, gel vê hedîsa şerîf rêk nakevê. Lê eger kesek pê kutanê bike, baştir ew e bêje: Dil an xweyê îman e bi hemûyê Pêxember (s.a.a) anî. An ne, gora ya duwê an îzhara îmanê bike. An ne, gora ya yekê, an îman têda rûniştî ye, an jî carna îmanê tîne û carna jî ji îmanê dizivire. Û di vî halî da jî îmanê ji xwe îzhar dike. Ji biniya hedîsê tê fêhmê ku, tewba wa yên ji îmanê dizivirin bi aliyê kufr û nifaqê ve her çend çendcar e bibe jî, qebûl dibe.

Di hedîsek dî da dil, kirine sê qisim: Dilê menkûs, ku xêr têda nîne, ew dilê kafira ye; dilê ku niqta reş têda heyî, ku başî û xirabî têda di halê şer da ne, ka kîjan xurt bibe û ser bikeve. Û dilê vekirî ku di wê da çirayên ronahî hene û heta roja qiyametê ronahiya wê natemire, ew jî dilê muminê bawerdar e. Evê hedîsê dijatî gel wê nîne, çiko di vê hedîsê da qismê yekê dagirê du qismên yekê ya hedîsa dî ye, yanî dilê menkûs dilê minafiq û kafira ye.

## Wez' û halê dilan

Em ê ewil behsa dilê bawerdaran bikin, da dilên dî bi muqayisa gel wê kifş bibin. Di zanistên 'alî da ronahî bûye ku heqîqeta

wucûdê eslê heqîqeta nûrê ye. Û ev herdu serek hikayet dikin ji heqîqetekî besît ya wahid, bê wê yekê ku bi aliyê cihetên muxtelif ve biçin. Her weha me'lûm bûye ku ewa ji sinxê kemal û temamê be, der heqê wucûdê bi xwe da ye. Û ev yek ji usûla ye ku kesê bi gihana wê muftexer bibe, deriyên zanînê li ber vedibin, nefsên me yên zeîf ji îdraka heqîqeta wî zatî mehrûm in, îlla ku bi awayê xeybî alîkarî bêt kirin û tewfîqa ezelî şamilê hal bibe. Her weha me'lûm e ku îmana bi Xwedê ji sinxê ilmê û ji kemalatên mutleqe ye. Çiko ji kemalata ye, nexwe eslê wucûdê ye û eslê heqîqeta nûrê û zuhûrê ye û ewa ne îman û ne pê ve girêdayiyê wê, ji sinxê kemalatê nefsaniye yê însaniye der e û pê ve girhayê zulmeta nebûnê û mahiyeta ye.

## Dilê mumin ezher e

Nexwe me'lûm bû ku dilê mumin ezher e. Di Kafiya şerîf da ji Îmam Sadiq (a.s) neqil bûye ku: “Tu hinek ji xelkê dibînî ku ji ber fesaheta pir, di lam û wawekî da jî xelet nabin. Lê dilê wan wek şeva tarî, tarî ye. Hinek jî nikarin bi ziman ji dilê xwe xeber bidin; lê dilê wan wek çirayê ronahî ye”. Her weha dilê bawerdar ser rêka rast û meşya wî ya me'newî ser ce'da durista însaniyetê ye. Çiko ji eslê fitreta îlahî derneketiye û hema ser fitreta tewhîdê ku niqta tewecuha bi kemala mutleq û cemala temam e, dimeşê û eva he rêka musteqîma ruhanî û ce'da durista batinî ye. Lê dilên dî ji fitretê derketine û ketine ser rêka xwehro mehro û ji rêka rast la dane. Ji hezretê Resûl (s.a.a) neqil bûye ku xetek rast kişand û hinek xetmetên dî li dûrê kêşan û kerem kir: «Ev xeta rast a navîn, terîqeta min e».

## Bawerdar ser rêka rast û durist e

Tişta dî ew e ku mumin li pey însanê kamil e. Û însanê kamil, çiko mezherê hemû esma, sifetan û perwerde bûyê Heq Teala ye, bi ismê cami’, tu yek ji esmaa di wî da seratiya kartêkirinê nîne û xweyê meqamê wesetiyet û berzexa kubra ye û meşya wê

gora terîqeta musteqîm a wesetiye ya ismê cami' e. Û heryek ji ekwanên dî navek ji navên muhît an nemuhît teserufê di wan da dike û hema mezherê wî navî ne û destpêk û zivirîna wan hema bi wî navî ye û navê muqabilê wan di butûna da ye û di wê da teseruf nake, îlla bi awayê ehediyeta cemi'a esmaa ku beyana wê ne munasibê vî meqamî ye. Nexwe Heq Teala bi meqamê ismê cami' û rebbul însan ser rêka durist e, çawa ku dibêje: «Hema bi rastî perwerdekarê min ser rêka rast û durist e».[1] Yanî meqamê wesetiyet û cami'iyetê, bê zêdahiya sifetekî ser sifetê dî û bê zahirbûna navekî û zahir nebûna navek dî. Û perwerde bûyê wî zatê muqedes, di vî meqamî da jî li ser rêka rast û durist e, bê zêdahiya meqam û şenekî li ser ya dî. Çawa ku di mîraca suûdî ya heqîqî da alîkariyê tenê ji wî zatê pak dixwaze û dibêje: «Îyyake ne'bud we iyyake neste'în * Îhdines siratel musteqîm». Ev sirat hema ew rêk e ku rebbê însan ê kamil li ser wê ye -ew bi awayê zahiriyet û rubûbiyet û ev bi awayê muzhiriyet û merbûbiyet- û mewcûdên dî yên bi aliyê Xwedê ve diçin tu yek ne li ser sirata musteqîm e. Belkî xwehrî di wan da heye, an bi aliyê lutf û cemalê ve an jî bi aliyê qehr û celalê ve xwehr bûne. Û muminîn çiko li pey însanê kamil in di meşy û çûnê da piyê xwe datînin ser dewsa wî û bi nûra hîdayet û ronahî ya çira ya wê pêşda diçin û ji zatê pakê însanê kamil ra teslîm in û ji bal xwe ve heta gavekî jî navêjin û di çawaniya seyr û meşya bal Xwedê ve aqilê xwe têkel nakin, ji ber vê, sirata wan jî musteqîm e û heşra wan digel însanê kamil e bi şertê ku dilên xwe yên zelal nexin di teserufa şeytan da û bi temamî teslîmê însanê kamil û meqamê xatemiyetê bibin.

**Vebir: Hîle pîlên şeytan**

Yek ji teserufatên şeytanê xebîs ew e ku, berê dilê xwe ji rêka rast xwehr bike. Yek ji xapînokên mezinên şeytan ê wesweseker ew e

1- Hûd / 56

ku carna evê tiştê dike guncikê guhê hinek meşayixan û ozrê vê kebîrê, ne, belkî vê şirka îrfanî weha tîne ku: Eger dil, ehediyet te'elluq be, ji selba 'elaqê ra zûtir muwefeq dibe! Carna jî berê murîdek sefêk dide dêwê mişî şêxî, ne, belkî şeytanê rêbir û ozrê vê şirka celî weha tîne ku: Şêx însanê kamil e û mirov gereke bi rêka însanê kamil ve bigehê meqamê xeyb a mutleq, ku di neynika ehedî ya şêx pê ve bi çi awayên dî zuhûr nake. Û heta axir omr ew bi bîra murîdê xwe û yê dî bi şiklê menkûsê şêxê xwe dikevin nav alema cin û şeytana. Ne girêdana heywanî ya wî ji nav diçe, ne jî ev bi rêka korkorane ve digehê mexsedê.

Gereke bêt zanîn ku meşy û çûna bawerdar, ser rêka rast e û dilê wî durist û berê wî li Xwedê û rêka wî rast e, lewma di wê alemê da jî rêka wî durist, ronahî û qameta wî rast, suret, sîret, navdeyî û eşkereyê wî ser şiklê û heyeta mirova ye. Pê vê muqayisê qelbê muşrik jî tê naskirin, çiko dilê wî ji fitreta îlahî derketiye û ji niqta merkezî ya kemalê xwehr bûye û ji nûra cemalê la daye. Ji ber wê di alemên dî da jî, wê ne li ser şiklê duristê însanî bêt heşir kirin û wê ser şikl û sûretê heywanek serberjêr heşir bibe. Çiko di wê alemê da şikl û heyet tabi'ê dila ne û zahir, sîbera batin û tûşal, siha kakil e û mewadên wê alemê ne wek yê vê alemê ne ku, eşkalên melekûtiye yên batiniye qebûl nekin; ev yek di cihê xwe da sabit bûye. Nexwe dilên berê wan ji heq û heqîqetê zivirîn û ji fitret û sirûştê derketine û berê wan ketiye dinyayê, siya wan jî wek wan nadurist û bervajî û berew tebîetê dinyayê ye ku esfelessafilîn e. Belkî di wê alemê da hinek ser rûyê xwe ve rê ve biçin û piyê wan li hewa be. Û hinek ser zikê xwe ve hinek jî ser çar dest û piyan wek heywana rê ve biçin, çawa ku meşya wan di vê alemê da bi wî awayî bûye: «Ma gelo ew ê devdevkî ketiye duristir rê ve diçe an ew ê rasterast û ser rêka durist rê ve diçe?» (Mulk/22). Çêdibe ev mecaza di alema mecazê da di alema heqîqetê da bi awayek ruhanî eşkere bibe û heqîqetê peyda bike. Hedîsên di bin vê ayetê da hatine, rêka durist tefsîr kirine bi Mîrê bawerdaran û îmamên pak (a.s):

Di Kafiyê da ji Îmam Ebul Hesen (a.s) neqil bûye der heqê vê ayetê da: «Ma gelo ew ê devdevkî ketiye duristir rê ve diçe an ew ê rasterast û ser rêka durist rê ve diçe?» Xwedê mesela wan kesan gotiye yên ji wîlayeta Alî (a.s) la dayîn, ew wek wa ne ku devdevkî rê ve diçin û nagehin mexsedê. Lê ew ên ketine pey wî jî, misala wan ev e ku rasterast ketine ser rêka rast û durist. Sirata musteqîm, Mîrê bawerdara ye (a.s).

Hedîsek dî dibêje: "Mexsed ji sirata musteqîm Alî û îmamên dûv wî ne (a.s)".

Neqil e ji Fuzeyl, dibêje: «Ez û Îmam Baqir (a.s) li Mescidul Heramê da bûn, ewî pala xwe dabû min û em li bal deriyê Benî Şeybe bûn, ewî li xelkê nihêrî û got: "Fuzeyl, di demê cahiliyetê da weha tewaf dikiran! Ne heq nas dikiran û ne dînek hebûn. Fuzeyl, binhêre, ew deverû ketine. Xwedê ewa ji rehma xwe dûr bike ku mexlûqên mesxbûyî û bervajî ne". Paşê ev ayetê xwend: «Efemen yemşî mukibben 'ela wechih ehda...» Û sirata musteqîm tefsîr kir bi Mîrê bawerdaran û wesî yên wî (a.s).

Me pêşda jî behs kir ku meşy û hereketa me'newî ya însanê kamil berew sirata musteqîm e. Lê eva he ku însanê kamil bi xwe sirata musteqîm be, ne ji mexseda me ya vê gavê ye.

### Tetmîm: Behsa qelbê minafiq û qelbê mumin

Heta niha halê dilê bawerdar, muşrik û belkî kafir jî hat zanîn û qelbê minafiq jî bi qiyaskirinê hat nasîn. Çiko qelbê mumin ji fitreta xwe ya eslî derneketiye, ji ber wê çiqas heqîqetên îmanî jê ra bên gotin, qebûl dike û ji ber vê ye ku di hedîsê da dibêje dilê bawerdar meftûh û vekirî ye,[1] her çend çêdibe eva he îşare be bal fethên sêyane ve, lê ji vê me'nê ra jî munasib e.

Lê dilê minafiq, çiko bi tiştên dijê fitretê wek: Teasubatên cahilî,

---

1- Mexsed ev sê feth in: Fetha Qerîb , Fetha Mubîn , Fetha Mutleq.

exlaqê pîs, huba nefsê û meqam..., qirêj û tarî bûye, ji ber wê hatiye muhrkirin û girtin, ku êdî qet gotina heq nabihîze û qebûl nake. Dile wî bûye wek reş ku êdî li ser nayê nivîsîn, xwe dîndar nîşandana wî jî ji şeyteneta wî ye û ew ji xwe ra kiriye wesîla dest ve anîna dinyayê.

Dilê muşrik û minafiqan vajî û muhrbûyî ye. Lê bikarbirina vajîbûnê ji muşrik ra û muhrbûnê ji minafiq ra ji ber wê ye ku berê dilê muşrik di îbadet da, ne li me'bûdê heqîqî ye. Nexwe dilê wî du xasiyet hene: Yek; xwe şikandina sadiqane, ya dî ew ku çiko evê xwe şikandinê kêmasî tê heye û ji mexlûqan ra ye, sebebê kêmasiyê û qirêjbûna dil e. Nexwe dilê wan vajî û menkûs e. Û ev sifetê wan yê eşkere ye. Lê minafiq, carna bi hesebê waqi' muşrik e û di vê vajîbûnê da beranber e gel muşrikan. Carna jî kafir û ne li pey çi dîna ye, ew jî her çend vajî ye, lê taybetiyek dî jî jê ra heye û ew eşkeretir e jî, ew jî ev e ku di zahir û eşkereyê da xwe xistiye nav koma heq ra û hemû gotinên ku bawerdar guh lê dibin ew jî dibihîzin. Lê çiko navdeyê bawerdaran zelal e, dilê wan meftûh û vekirî ye, gotina heq qebûl dikin, lê minafiq ji ber tarîtî û qirêja navdeyî, dilê wan muhrkirî û mextûm e û wê qebûl nakin.

Lê eva he ku bi taybet behsa du sifetên bawerdaran kiriye yanî: Şukir û sebir, ji ber wê ye ku eva herduka hinek taybetî û zêdahî hene û ji sifetên makî tên hesabê ku vêca sifetên başên dî pê ve tên. Me hinekî der heqê wan da di hedîsên pêşî da xeber da.[1]

### Xitam: Xefleta ji heq vajîbûna dil e

Ji gotina borî kifş bû ku, eger daim berê mirov li dinyayê û avakirina wê be û pişt dabe heq, her çend bawerî bi mebde û me'adê hebe jî, lê dîsa menkûs û vajî ye. Mîzan û pîveka vajîbûna dilan, xefleta ji heq û berêxwedana dinyayê û tamîr û avakirina wê ye.

---

1- Hedîsa 15, 16 û 21

Û ev ne bawerî û îman e, çawa me pêşda jê xeber da,[1] an jî îmana naqis û kêm e ku dijatî nîne gel vajîbûna dil. Kesê îmana bi xeyb û heşrê ji xwe bixweyhîne, lê tirsa ji wê tunebe û ev îman nebe sebeb ku ruknên îmanê bi cih bîne, gereke mirov wî di nav koma minafiqan da deyne, ne bawerdaran da. Û çêdibe bawerdarên şiklî yên bi vî awayî ew bin yên carna mumin in û carna minafiq, wek ehlê Taifê ku di hedîsê da derbas bû. Û çêdibe Xwedê nekirî ev îmana wan ya bêkakil ji nav biçe û tam minafiq ji dinyayê biçin û nav minafiqan da heşir bibin. Eva he nukteyeke ku gereke em muhim bigirin û hay jê hebin ku eserên îmanê di zahir, batin, xef û eşkereyê mirov da biherike. Eger bi dil de'wa îmanê heye bila di eşkereyê da jî esera wê bêt dîtin, da reh û rîşa îmanê qahîm bibe û bi tu awayek ji nav neçe û vî emanetê îlahî û dilê paqijê melekûtî be ku şeytan têkel bûbe û bê xiyanet li zatê muqedes bizivirînin.

1- Hedîsa 9, 20 û 26

## HEDÎSA SÎ Û YEKÊ

بالسّند المتّصل إلى الشّيخ الجليل، أفضل المحدّثين، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، عن علىّ بن إبراهيم، عن أبيه عن حمّاد، عن ربعيّ، عن زرارة، عن أبى جعفر، عليه السّلام، قال سمعته يقول:

**«إنّ الله عَزّ و جلّ لا يُوصَفُ. و كَيْفَ يُوصَفُ، و قال فى كتابه: «وَ مَا قَدَرُوا الله حَقَّ قَدْرِهِ» فَلا يُوصَفُ بِقَدَرٍ، إلاّ كانَ أعظمَ من ذلك. و إنّ النّبىّ، صلّي الله عليه و آله، لا يُوصَفُ. و كيف يُوصَفُ عبدٌ احتَجَب الله عزّ و جلّ بسبْعٍ و جَعَلَ طاعتَه فى الأرض كطاعتِه فى السّماء فقال: «وَ مَا اتيكُمُ الرَّسولُ فَخُذوهُ وَ مَا نَهاكُمْ عَنْهُ فَانْتَهُوا.» و مَنْ أطاعَ هذا فَقَدْ أطاعَنى، و مَنْ عَصاهُ فَقَدْ عَصانى. و فَوَّض إليه. و إنّا لا نُوصَفُ. و كَيْفَ يُوصَفُ قومٌ رَفَعَ الله عنهُمُ الرِّجْسَ، و هُوَ الشّكُّ. و المؤمنُ لا يُوصَفُ. و إنّ المؤمنَ لَيلْقَي أخاهَ فَيُصافِحُهُ، فَلا يَزالُ الله يَنْظُرُ إليهِمَا و الذُّنُوبُ تَتَحاتُّ عن وجوهِهما كما يَتَحاتُّ الْوَرَقُ عَنِ الشَّجَرِ.»**

Zurare dibêje min ji Îmam Baqir (a.s) bihîst digota: «Xwedê nayê wesifdan, wê çawa wesfê wî bêt dayîn, halhale di kitêba xwe da gotiye: "Qedrê Xwedê wek çawa layiqê wî nedayînê".(1) Çiqas miqdarek jê ra bêt danîn, Ew ji wî qasî mezintir e. Wesfê Resûlê Xwedê jî (s.a.a) nayê dayîn. Çawa wê wesfê wî bêt dayîn, halhale Xwedê wî bi heft tişta nixûmandiye û guhdana wî di erdê da wek

1- En'am / 91: We ma qederullahe heqqe qedrih.

guhdana xwe di ezmana da lê kiriye, kerem kiriye: «Ewa Resûl ji hewe ra anî bigirin û ya nehya hewe jê kir, jê vebin».[1] Û kesê guhdariya wî bike, ewî guhdariya min kiriye û kesê neguhdariya wî bike, ewî neguhdariya min kiriye. Û kibr hiştiye bi hêviya wî ve. Wesfê me jî nayê dayîn, çawa wê wesfê wê komê bêt dayîn. Ew koma ku Xwedê pîsatî, yanî şik, ji ser wan rakiriye. Bawerdar jî nayê wesifdan. Hema bawerdar dema raberê birayê xwe bibe vêca dest bidiyê, Xwedê berdewam li wan dinhêre û guneh ji wan diweşin û dirijin, wek çawa pelên dara diweşin û dirijin.[2]

## Şîrove:

“Ma qederullahe heqqe qedrih”: Cewherî dibêje: “Qedr bi me'na endaze û qas e, “qedere” jî bi wê me'nê ye û di esl da mesder e”. Yanî: Wek çawa heqê mezin ragirtine, ew mezin nekirine.

Nivîser dibêje: Ya eşkere ew e ku qedr, hema qas û endaze ye, kinaye ye ji nekarîna wesifdan û mezinkirinê ra, wek çawa heqê wê. Û tewsîfa qedr û endazekirinê mewsûf e di lîbasê wesfê da. Û eva he der heqê wî zatê pak da xêncî ji Xwedê ra çênabe, çawa ku înşaallah em ê jê xeber bidin.

Li vêderê qasê munasibê vê hedîsa şerîf, em ê di çend vebiran da bêjin.

### Vebir: Mexsed ji tewsîf nekirina Heq Teala çi ye

Bizane eva he ku di vê hedîsa şerîf da hatiye û dibêje tewsîfa Heq Teala nayê kirin, der heqê wesifdana hinek xirecirker û nezanen mutekeliman da ye ku tewsîfa Xwedê didin û tewsîfa wan sînorkirin û teşbiye û belkî te'tîl pê ve tê. Çawa ku di vê hedîsê bi xwe da îşare pê hatiye kirin, ku kerem kiriye: «Qedrê Xwedê wek çawa layiqê wî nedayînê». Di babetê nehya ji tewsîfê da di Kafiya şerîf da jî hedîsên delalet dikin ser vê yekê hene:

---

1- Heşr / 7: Ma atakumur Resûl fe xuzûhu we ma nehakum ‘enhu fentehû.

2- Usûla Kafî, c 2, p. 182, behsa “îman û kufrê”, b. “destdanê”, h. 16

«Abdurehîm dibêje, min ji hezretê Sadiq (a.s) ra nivîsî: “Hinek li Îraqê hene ku pê şikl û şemailan wesfê Xwedê didin. Ez gorî, eger tu hez bikî, ez dixwazim tu gotina durist der heqê tewhîd û yekatiya Xwedê da ji min ra binivîsî”. Vêca ewî weha ji min ra nivîsî: “Rehma Xwedê li te be. Te ji min xwestiye ez der heqê tewhîdê da û gotina wa yên li bal te ji te ra tiştekî binivîsim; Bizane ku: Ew Xwedayê tiştek wek wî neyî, pir bilind e û bihîser û bîner e. Xwedê pir bilindtir e ji wê wesifdanê ku ew wesfê wî didin û dişebihînin bi mexlûqê wî ve, ew derewan bi Xwedê ve datînin.

Rehma Xwedê li te be, tu bizane ku rêka durist der heqê tewhîda Xwedê da ew e ku Quranê der heqê sifetên Xwedê da gotiye. Vêca tu butlan û teşbîhê ji Xwedê nefiy bike; ne ku ewî sifet nînin belkî sifetên wî ne wekî mexlûqa ne. Ew, Xwedayê sabit û mewcûd e. Ew bilindtir e ji wesifdana wesifderan. Piştî ku Quranê ronahî kir, jê derbas nebin, çiko hingê hûnê li rê winda bibin.

Piştî fikirîna di vê hedîsa şerîf da ronahî dibe ku mexsed ne ew e mirov der heqê Xwedê da fikir neke û qet bi çi awayan behsa sifetên Xwedê neke, çawa ku hinek ji muhedisan jî gotine. Çiko evê hedîsê jî wek hinek hedîsên dî ji te'tîl û teşbîhê nehiy kiriye, ku ev bi xwe bê fikirkirina di sifetan da û bê zanîna temam der heqê wan da çênabe. Belkî mexseda wî hezretî ew e ku bi tiştên ne layiqê Heq Teala sifetê wî nedin; wek çêkirina şikl û şemail... ku ji sifetên mexlûqan e û dibin sebebê hebûna cih û mekan, neqs û kêmasiyan, ku Xwedayê Teala ji wan dûr û berî ye.

Lêbelê wesifdana layiqê zatê Heq Teala, ku di ulûmên aliye da jê ra mîzanek durist ya delîlê heye, ev karek durist e ku kitêba Xwedê û hedîs pir in wê der heqê da û ewî hezretî hema di vê hedîsê bi xwe da jî bi awayekî behsa mîzana durista burhanî kiriye. Lê xeberdana wê der heqê da vê gavê ji mexseda me der e. Û eva he ku hezretê Sadiq (a.s) kerem kir: «Di wesifdana Xwedê da ji Quranê neborîne», destûreke ji wan kesa ra ku mîzan û pîveka sifetan nizanin; me'na wê ne ew e ku wesifdan bi sifetên di kitaba

Xwedê da neyîn, çênabe û ne caiz e. Ji ber vê ye ku ewî hezretî hem ew destûr da û hem ewî bi xwe Xwedê bi du wesf û navan wesf da, ku bi hesebê eşkereyê di kitêba Xwedê da nîne, yanî: “Sabit û mewcûd”.

Belê, eger kesek bi aqilê xwe yê kêm û bê ronahiya marîfetê û alîkariya xeybî ya îlahî wesfê Heq bide, an wê bikeve rêka xeleta butlan û te'tîlê da, an jî di helaketa teşbîhê da. Nexwe yên wek me, ku bi perdên stûrên nezanî, xwexwazî, adet û exlaqê xirab dilê wan hatiye nixûmandin, gereke ji ber xwe, xwe têkel alema xeybê nekin û hinek xudayan ji aliyê xwe ve çênekin. Çiko çiqas ew xeyalan jî bikin, hemû dibin çêkiriyê wan bi xwe.

Mexseda me ji vê gotinê, ne ew e ku ev mirov bimînin nav nezanî û xwexwaziyê ra, an neûzu billah der heqê navên Xwedê da bikevin xwehriyê û înkar bikin: Desta bikêşin ji wa yên di navên wî da dikevin xwehriyê.[1] Û mexsed ne ew e xwe ji zanîn û nasînê ku reh û rîşa diyaneta ye, paşda bigirin; belkî ev gotin bi xwe ji wê ra ye ku eva perdên stûr ji holê rakin. Her weha hişyarkirina li vê yekê ye ku: Heta mirov di bela ya dîtina xwe û hezkirina ji meqam, mal, dinya û nefsê da ye, mirov ji mearifên heq û gihana mexseda eslî mehrûm û bêbehr dimîne. Û eger Xwedê nekirî, ji aliyê Xwedê û weliyên wî ve destê mirov neyê girtin, hingê ne me'lûm e ku wê dûmahîka karê wî bibe çi. Ya Reb, em gazî te dikin û alîkar tu yî.

Em ên şaş mayî di diyarê cehalet û nezaniyê û em ên noqîbûyî di tarîtî ya dinyayê û sergermbûyî bi xwe û xwexwaziyê ku hatine di vê dinya tarî ya mulk û tebîetê da û me çavê besîreta xwe venekir. Û nûra cemala te li ayneyên hûr û gir da nedît û bi çavê xwe yê şevşevok misal, me sifetên te li erd û ezmanan nedîtin. Û bi çavê kor û dilê bêxeber û di bêxeberî û xefletê da me temen xilas kir, eger tu bi rehmeta xwe ya berfireh alî nekî û dil bi

1- E'raf / 180

şewqa xwe ronahî nekî û ji dil re cezebe neyê dest û dil bêcezebe bimîne. Em ê heta hetayê di vê şaşiyê da bimînîn û em nagehin tu cihekî. Lê, gomana me ji te ne ew e –ma hakezez zennu bik–.[1] Xweşiyên te dayîn û rehmeta te bê xwestin û bê nimûne ye. Ey Xwedê, keremê gel me bike û destê me bigire û bi ronahiya cemal û celal a xwe, me rê rast bike û dilê me bi ronahiya nav û sifet ên xwe ronahî bike.

### Nasîna heqîqeta esma û sifetan ne mumkin e

Bila xef nemîne ku îdraka heqîqet a wesfên Xwedê û pê hesana wan û çawaniya wan ji wan tişta ye ku burhan nagihê kûratiya wê û arif nagehin kakilê wê. Û ew burhana ku alim û hekîman anî û arifan jê xeberdayî, heryek gora wan durist e. Lê ilm bi xwe hicabek stûr e û xerqa wê xêncî bi tewfîqa îlahî û bi rêka teqwayê û munacatên sadiqane digel Reb, çênabe û ronahiya cemal û celalê nade dilê salik. Û ev gotin gereke nebe sebebê pey neketin û xwe paşdedana ji gotûbêjê, ku ew bi xwe bîranîna Heq Teala ye. Çiko kêm çêdibe ku bê reşandina tovê zanistên heq, bi şert û mercên wê ve, dara pîroza zanîn û nasînê di dil da şîn bibe, an xurt û qewî bibe. Nexwe çênabe mirov di destpêkê da dev berde ji awayê ilmî û hayjêmana şert û mercên wê, çiko gotine: "Zanist, tovê dîtin û muşahida ye". Û eger zanist ji ber hinek pêşîgiran mirov di vê alemê da negehîne netîce û desthata temam jî, di wê alemê da wê fêkiyek baş ji mirov ra pê ve be; lê ya muhim hayjêmana şert û pêşekî yên wê ne, ku me di şiroveya hinek hedîsên borî da jê xeber da.

#### Vebir: Heqîqeta ruhanî ya enbiya bi fikrê nayê dest

Bizane marîfet û nasîna ruhanî û meqamê kemalî yê Xetmî Mertebet (a.s) bi taybet û meqamê enbiya û ewliyayên pak (a.s) bi fikirkirinê û seyra di afaq û enfusan da nayê dest û çênabe. Çiko

---

1- Hezretê Alî (a.s) di duaya Kumeyl da weha dibêje.

ew ji nûra xeybî ya îlahî û mezahirên tamme û ayetên bahre yên cemal û celalê ne û di seyra me'newî û sefera bi aliyê Xwedê ve ew gihane xayetul quswa ya fenaya zatî û dawiya urûca «qabe qewseynî ew edna»yê. Her çend xweyê meqam, bi awayê eslî Nebiyê Xetmî Mertebe ye û yên dî di urûcê da tabi' in û li pey wî ne. Û niha me ne li ber e em behsa çawaniya seyra wî zatê pak û ferqa mîraca ruhanî ya wî digel mîraca pêxemberên dî (a.s) bikin. Li vêderê em ê bi anîna hedîsekî ku der heqê nûraniyeta wan da ye, bes bikin. Çiko ji pê hesana nûraniyeta wan ra nûraniyeta navdeyî û cezeba îlahî lazim e.

«Cabir dibêje: Min der heqê ilmê alim da ji hezretê Baqir (a.s) pirsî, ewî got: "Ey Cabir, di Pêxember û wesiyên wan da pênc ruh hene: Rûhulqudus; ruhê îmanê; ruhê jiyanê; ruhê quwetê û ruhê şehwetê. Ey Cabir, ew bi ruhulqudusê tiştên bin erş heta bin axê ra zanin". Paşê got: "Ey Cabir, xêncî ji ruhulqudusê çêdibe qewimîn ser van çarên dî da bên, lê bêhûdeyî û leyistok ji ruhulqudus ra nîne".[1]

«Ebû Besîr dibêje, min der heqê vê ayetê da: "Her weha me ruhek ji aliyê xwe ve ji bona te wehy kir, te ne dizanî kitêb çi ye û ne jî îman"[2] ji hezretê Sadiq (a.s) pirsî, ewî kerem kir: "Ruh mexlûqek yê Xwedê Teala ye û mezintir e ji Cebraîl û Mîkaîl; digel Resûlê Xwedê bû (s.a.a) û ew ji tiştan agah dikira û xurt dikira. Piştî wî ew digel îmama ye (selewatên Xwedê li wan bin)".

Ji hedîsa yekê ev derdikeve ku nebî û wesiyan (a.s) meqamek bilindê ruhanî hene ku dibêjinê: Rûhulqudus; pê wê, ewan ji hemû zerratên kainatan xeber heye. Û di wî ruhî da xeflet, xew, nisyan û ji bîr kirin û kêmasiyên dî yên mulkiye têda nînin û mucered ji alema xeybê û ceberûtê e'zem e. Çawa ku ji hedîsa duwê jî me'lûm dibe: Ew ruh, ruhê muceredê kamil, mezintir e ji Cebraîl

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 272

2- Şûra / 52

û Mîkaîl, ku mezintirîn in di meqamê qurba ceberûtê da.

Belê, ewliyayên ku Xwedê, bi destê qudreta cemal û celala xwe hevîrê tîneta wan çêkirî û di tecelliya zatî ya ewwelî da bi hemû nav, sifetan û meqamê ehediyeta cem' di mir'ata kamila wan da xweyhaye û di xelwetgeha xeybê da ew hînî heqîqeta esma û sifetan kirine, ehlê marîfetê nikarin bigehin nasîna kibriya û celal û cemala wan. Û di hedîsa nebewî da (s.a.a) hatiye: “'Eleyye memsûsun fî zatillah”. Nivîser wek şevşevokê ku bixwaze der heqê ronahiya rojê da biaxive di nivîsokek serbixwe da bi navê «Misbahul Hidaye»[1] hinekî ji meqamê nubûwet û wîlayetê xeber daye.

**Vebir**

Der heqê vê rista hedîsê da: Çawa wê wesfê wî (s.a.a) bêt dayîn halhale Xwedê wî bi heft tişta nixûmandiye... Çend îhtimal hene ku em ê ji hineka biaxivin:

Yek- Ya rehmetiyê arifê kamil, cenabê rehmetiyê «Feyz» gotî. Ew dibêje: “Di hedîsê da hatiye: Ji Xwedê ra heftêh hicab ji nûr û zulmetê hene ku eger ewan rake wê nûra cemala wî, tişta tê dîtin bişewitîne. Nexwe çêdibe me'na wê ev be ku heft hicab jê der, hicabên dî hemû rabûne. Gora vê îhtimalê yanî heft hicab mane û yên dî rabûne. Lefza celale jî dibe fail”.

Her çend ev îhtimal nêzîktir e ji yên dî, lê dîsa çêdibe xirecir li ser bêt kirin. Bi hesebê lefzê ve, hingê gereke bihata gotin: Ji heft

---

1- Misbahul Hidaye, kitêbeka Îmam Xumêynî ye ku di sala 1349-ê h.q beraberê 1308-ê h.r nivîsiye. Vê kitêbê yek pêşekî û du mişkat û xatimeyek hene. Mişkata yekê der heqê hinek remz û razên xilafeta Muhemmedî (s.a.a) û wilayeta Alewî (a.s) da ye, di hezretê ilmiye da. Mişkata duwê jî der heqê hinek ji sirra xilafet û wilayetê da ye di neş'eya 'eyn û alema emr û xelq da. Di pêşekî ya wê da der heqê naverokê da weha dibêje: “Min dixwesta ez piçekî heqîqeta xilafeta Muhemmedî û wilayeta Alewî ji te ra ronahî bikim û evê yekê ku çewa ev du heqîqet di alemên xeyb û şehadetê da diherikin û di mertebên jordahatin û jêlilçûnê da nufûz hene”.

hicaban pê ve Xwedê li ser nehiştin. Bi gotinek dî: Gora kemala Pêxember (s.a.a) û evê yekê ku wesfê wî nayê dayîn, gereke bigota ew hicabên dî ji wî ra nîne ne ku bigota, heft hicab jê ra hene, munasib bû ev bigota. Lê vêca bi hesebê me'nê jî xeberdan ser vê îhtimalê heye. Çiko ewê xuya dike ev hicabên nûrî û zulmetî yên ji Xwedê ra heyîn hicabên xelqî bin, ne esmaî û sifetî, vê gorê gereke nêzîktirê ji nûra pak ya Resûlê Xwedê (s.a.a) aferîde û mexlûqek hebe, halhale sabit bûye ku ew zatê pak hicaba nêzîktir û mexlûqê yekê ye; çawa ku di cihê xwe da hatiye nivîsîn. Vêca meqamat û letayifên heftane yên wî serwerî jî ne hicaba wî bi xwe ne.

Îhtimala dî ew e ya muhedisê hêjayî rehmetiyê Meclisî (Xwedê ser hêjana wî ve zêde bike) munasib zanî û ew ji devê hinek dî jî neqil kiriye. Dibêje: "Ev rista he, ji pêşekî ra gotiye da bi gotinên pêretir wesfê Resûlê Xwedê (s.a.a) bide. Yanî: Çawa mirov dikare wesfê wî ebdî bide ku Xwedê bi heft hicaban ji xelkê xef, guhdana wî di erdê da wek guhdana xwe di ezmana da qirar daye. Wek padişahekî ku pişt heft perdan da ye û xelk nikare xwe bigehênitê, lê ji xwe ra wezîrekî datîne ku rêkê bal wan û ji wan ra bêje ku: Destûra wî destûra min e. Û mexsed ji heft hicaban, heft ezman in ku Xwedê ji pişt wan da wehyê ji Pêxember ra rê dike ku ew ji me ra bêje". Îhtimalek dî jî nêzîkê vê îhtimalê anîne, lê ferqa wê ev e ku gotine mexsed ji heft hicaban, hicabên nûriye yên esmaiye ne. Her çend munaqişa pêşda di vê îhtimalê da nîne. Lê bi hesebê lefzê û meqamê tewsîfê, dûr e û belkî ji îhtimala pêşda dûrtir e.

Îhtimalek dî li vêderê heye ku nisbet bi me'nayê gelek xweş û durist e û bi hesebê meqam jî munasib e. Lê duristiya wê girêdayî ye bi yek ji du tişta ve: An «ihteceb» muteeddî be û bi me'na «hucub» be an jî muteeddîkirina wê bi herfa "ba"ê durist be û di her halî da, mef'ûl muqedder be.

Ew jî ku girêdayî ye bi duristiya yek ji van du mesela ve, ev e ku: Çawa mirov dikare wesfê bendeyekî bide ku bi heft hicaban ha-

tiye perdekirin; ji cemal û ruhaniyeta wî ra ku hevrêzê meşiyetê ye, heft hicab ji merteba tebîetê heta merteba meşiyeta mutleqe jê ra danîne. Lê di luxet û îstimalê da, me nîşanek ji muteeddîbûna «ihtecebe»yê ra nedît. Her çend hinek ji zanayên edebiyatê digotan ku muteeddîbûna wê bi «ba»ê çi lê nayê. Zanîn ew e li bal Xwedê û belkî Xwedê di pey ra meselê ronahî bike.

**Vebir: Hêlana meselê bi hêviya Resûlê Xwedê ve**

Bizane ku «tefwîz»ê me'neyek heye ku di behsa cebr û tefwîzê da jê tê xeberdan. Ew jî ev e ku neûzu billah Xwedayê Teala di karekî ji karan da -çi ji alema xeybiye ya mucerede an jî ji alema xelq û tekwînê- dest ji kar kişandibe û karê wê hiştibe bi hêviya mewcûdekî ve. Çi mewcûdek kamil, temam, ruhanî û xweyê îrade be, çi jî mewcûdek tebî'î û bê şu'ûr û bê îrade be, bi awayek wereng karê wê bihêle bi hêviya wî ve ku bibe xweyê teserufek temam û serbixwe û musteqil. Tefwîz, bi vê me'nê di tiştekî da jî îmkan jê ra nîne, çi di mesela tekwîn û teşrî'ê da û çi jî di îdarekirin û rêvebirina xelkê û edebên wan da; eva he sebebê çêbûna neqsê ye di wacibul wucûd da û nefya îmkan û niyazê ye di mumkinul wucûd da.

Di beranberê wê da jî «cebr» e; ew jî selba eserên taybet e di meratibê wucûdê da û nefya esbab û musebebata ye. Ev bi temamî batil e û muxalifê burhana xurt û qewî ye. Ev jî ne taybetê ef'alê mukellefa ye, çawa ku meşhûr e; belkî nefya cebr û tefwîzê bi vê me'nê ji sunetullahê ye di hemû mertebên wucûd, meşahid, xeyb û şuhûdê da. Lêbelê lêkolîna vê meselê ji wezîfa vê kitêbê der e. Hedîsên ku cebr û tefwîzê nefy û red dikin, ew behsa vî awayê tefwîzê dikin; lê hedîsên ku behsa duristiya tefwîzê dikin, ew gora me'na dî ya tefwîzê ne. Çi di danîna hinek hukman da be, wek riwayeta şerîfa Kafiyê ku senedê digehîne hezretê Baqir (a.s) ew dibêje: "Resûlê Xwedê (s.a.a) diyeta çav û nefsê danî û hemû nebîz û hemû serxweşker heram kirin. Kesekî jê pirsî: Bê hatina tiştekî (ji wehyê) ew kar kir? Ewî got: Belê, da kesê guh-

darê Resûlê Xwedê (s.a.a) ji yê neguhdar biqete”. Û wek vê yekê ku çend rikat li nimêjê zêdekirin. Û rojî ya Şe’banê û ji her mehê sê roj rojî, kirin sunet. An kar û barên xelkê yên dî, çawa ku di riwayetên dî da wek riwayeta Kafiyê, hatiye: «Zurare dibêje min ji hezretê Baqir û Sadiq (a.s) bihîst, gotin: “Xwedayê ezîz û celîl kar û barê xelkê bi hêviya Pêxemberê xwe ve (s.a.a) hişt, da binhêre ku guhdarbûna wan çawan e, di pey ra jî ev ayet xwend: “Tişta Pêxember ji hewe ra bîne, bigirin û ya nehya hewe jê bike, xwe jê vedin”.

Der heqê vê hêvî hiştinê ve, alimên hêja hinek tişt gotine: Yek ji wan, gotina rehmetî yê Meclisî ye ku ji rehmetiyê Kuleynî û gelek hedîsgêrên dî neqil dike û ew bi xwe jî wê qebûl dike, hasilê wê ev e: “Piştî ku Xwedê Teala Pêxemberê xwe kamil kir bi awayek wereng ku çi bike û çi bêje, rêketî bêt gel Heq û viyana Xwedê Teala û çi tişta bêt zêhnê wî, dijê xwesta Xwedê Teala nebe, hingê hinek tişt hiştine bi hêviya wî ve ku bêje û bide kirin, wek zêdekirina li rikatên nimêjên ferz û rojî û nimêjên sunet..., ev tefwîza he ji nîşandana mezinahî û hêjana wî hezretî ye li bargaha îlahî da. Û eslê wê tiştê ne der e ji wehy û îlhamê û piştî bijartina vî karî wehy jî dihata û mesele dişidanda”. Rehmetiyê Meclisî gotinên dî jî wek vê gotinê, neqil kirine, wek: “Kar û barê rêvebirin, hînkirin û edebdana xelkê maye bi hêviya wî hezretî ve û jê ra tefwîz bûye; beyana hukman jê ra tefwîz bûye û maye bi hêviya wî ve. An beyan nekirina wan bi heseba mesleheta dem û wextan, wek zemanê xweparastinê û teqiyeyê jê ra tefwîz bûye”. Lê di tu yek ji wan da nehatiye gotin ku heta bi çiqasî maye bihêviyê ve, bi awayek wereng ku digel burhanê rêk bikeve û dijatî û munafat digel binyat û xîmên heqe tunebe, her weha ferqa navbeyna vê tefwîzê û tefwîza nadurist da nehatiye gotin. Ji xeberdanên wan nexasima gotina rehmetiyê Meclisî tê fêhmê ku: Karê xuliqandin û mirandin, rizq û saxkirinê bi hêviya xêncî Xwedê ve be, ew tefwîz e û kesê ser wê fikrê be, kafir dibe û bila tu aqilek di kufra wî da nekeve şikê. Her weha mesela keramat û mu'cizatan ji qis-

mê qebûliya dua hesab kirine ku Xwedê ye ew kesê ewa karan dike; lê tefwîza di hînkirin û terbiyeta xelkê û dan û standina enfal, xumsê û qirardana hinek hukman durist zanîne. Ev behs, ji wan behsa ye ku kêmtir hatiye mûxil kirin, vêca çi dor bigehê wê ku mîzan û pîvekek durist jê ra hatibe danîn. Pirtirê caran guhekê gotinê girtine û jê xeberdane. Ez ê nivîser jî, bi vê kêmasî û bêxeberiya heyî û qelema şikestî nikarim bikevim nav vê dûla şaşiyê. Lê ez neçar im bi kurtî îşare bikim bal meselê ve û ya heq eşkere bikim.

## Îşara kurt bal me'na tefwîzê ve

Gereke bêt zanîn ku tefwîza mehal bi vê me'nê ku destê Xwedê bêt girêdan û qudreta ebd bi awayek serbixwe û musteqil eser jê ra hebe, eva he di karê piçûk û mezin da ferq nake. Saxkirin, mirandin, çêkirin û ji navbirin ji çi mewcûdekî ra tefwîz nabe; rakirina tayek kayê nayê tefwîzkirin; ne ji melekê muqereb ra ne jî ji nebiyek mursel ra, ji aqilên mucered û cihgirên ceberûtê e'la bigire heta bi heyûlayê ewwelî. Temamê zerratên kainatê di bin emr û fermana kamil ya Heq Teala da ye û ewa bi xwe qet di çi tiştî da îstiqlal û serxwebûn nîne û ew hemû di wucûd û kemal, hereket, bizav, sekin, îrade, quwet û hemû tiştên dî da muhtac û feqîr in û feqîriya xwerî û xwerî niyaz û feqr in. Çawa ku qeyûmiyeta Xwedê û nefya îstiqlalê ji evdan û esera îrada Xwedê da jî ferq navbeyna karên piçûk û mezin da nîne, wek vê ku em ên zeîf dikarin karên lawaz bikin û ebdên taybetên Xwedê û melekên mucered dikarin karên mezin bi cih bînin, wek saxî û mirandin, rizq û çêkirin û ji navbirinê. Hema bi wê pêkê ku melekê mewtê ji mirandinê ra hatiye danîn û mirandina wî ne ji pêka qebûlbûna dua ye û cenabê Îsrafîl ji saxkirinê ra hatiye danîn û saxkirina wî ne ji pêka qebûlbûna dua ye û ne ji pêka tefwîza batil û nadurist e jî. Hema bi wî awayî eger weliyê kamil û nefsek zekiye ya qewî wek ya Pêxember û weliyan pê dana Xwedê bikare bimirîne û sax bike, ew ne tefwîza mehal e û nabe mirov wê

nedurist bizane. Eva he ku hinek tişt bimînin bi hêviya ruhanî yê kamil ve, ku meşiyeta wî fanî bûye di meşiyeta Heq da. Xêncî ya Xwedê dixwaze nakeve dilê wî û xêncî xwesta Heq Teala hereket û bizavek jê çênabe, çi ji qismê çêkirin û çi teşrî' û terbiyê, mani' jê ra nîne û belkî heq û durist e. Û eva he di heqîqet da, ne tefwîz e. Çawa di hedîsa Ibn Sinan da ku di vebira hêjbê da wê bêt, îşare hatiye kirin bal vê me'nê ve.

Kurtê gotinê ev e ku: "Bi me'na yekê, tefwîz di tiştekî da jî çênabe û muxalifê delîl û burhana xurt û cihgirtî ye. Û di me'na duwê da jî di hemû tiştî da caiz e û kêr tê û belkî ji xwe sîstem û rêketina alemê bê tertîba esbab û musebebatan çênabe. Xwedayê Teala kar û baran bi rêka esbab û wesîlan pê ve pêşve nabe û naherikîne. Evê jî bizane ku eva hatî gotin hemû rêketî ye digel delîl, burhana durist, mîzan û pîveka rast.

**Vebir: Der heqê meqamên îmaman da ye**

Bizane ku Ehlê Beyta pak û paqij (a.s) xweyê meqam û derecên bilind yên ruhanî ne di seyra me'newî ya bal Xwedê ve, ku fêhma wê bi awayê ilmî ji heddê beşer der e û ser aqilê aqilmendan û şuhûda ehlê îrfanê ra ye. Gorekî ji hedîsan tê fêhmê ew di meqamê xwe yê ruhanî da şirîkê Resûlê Ekrem in (s.a.a) û nûra wan pêş xilqeta aleman da hebûye û mijûlê tehmîd û tesbîhên zatê eqdesê îlahî bûne.

Muhemmedê kurê Senan dibêje, ez li bal Îmam Muhemmed Teqî (a.s) bûm, min xeberdan anî ser îxtilafa di nav şiiyan da heyî. Ewî hezretî got min: "Muhemmed! Xwedayê Tebarek û Teala di tekbûna xwe da tenê ye û şirîk jê ra nînin, piştî demekî Muhemmed (s.a.a), Alî û Fatime xuliqandin, ew hezar dewrana man, paşê hemû tişt çêkirin û ew ser wan kirin şahid û gihana wan ser wan da û karê wan bi hêviya wan ve hişt. Vêca tişta ew bixwazin helal dikin û ya bixwazin heram dikin û ew xêncî ji ya Xwedê dixwaze naxwazin". Paşê got: "Ey Muhemmed! Ev e ew dînê ku kesê pêş

wê bikeve ji rê derketiye û yê paşve bimîne ji nav çûye û yê gel wê be gihaye duristiyê. Ha, ew ê ji xwe ra bigire”.

Mufezzel dibêje: «Min got hezretê Sadiq (a.s), dema hûn li ber sîberê bûn, hûn çawa bûn? Kerem kir: “Mufezzel! Em bin sîhek kesk da li bal Xwedayê xwe bûn û kes dî ji me pê ve nebû. Me tesbîhên wî didan û Ew teqdîs dikira û behsa tekbûn û mezinahî ya wî dikira; hingê qet çi melekên muqereb û ruhdarek tunebû. Heta Xwedê Teala xwest ku mexlûqan çêke, vêca çawa xwestî wereng mexlûqê xwe ji melaîket û yên dî afirand, paşê vêca zanîna der heqê wan da, da me”.

Hedîsên der heqê hevîrê bedena wan û afirandina ruh û dilê wan û eva he ku ismê e'zem ji wan ra hatiye dayîn û zanînên wan yên ji xizna xeybê ji wan ra hatî dayîn ji ilmên pêxemberan û melaîketan û xeyrê wê û ewa nagihê fêhma min û te, ewqas pir in ku mirov heyirî û şaş dimînê û kesek xêncî ji wan pakan bi xwe nikare bi remz û raz û heqîqeta wan bihese. Û di vê hedîsê da ku em bi şîroveya wê ve mijûl in îşare hatiye kirin bal yek ji seratiyên wan ve. Yanî ayeta Tethîrê, ku hedîsên bi rêka sunnî û şiiyan ve gihayîn destê me, di heddê tewaturê da ne, ku ev ayet der heqê Ehlê Beyta pak da hatiye. Û mexsed ji Ehlê Beytê jî bi îtifaqa şiiyan û piraniya hedîsên bi rêka ehlê sunet ve gihayîn destê me, hema Ehlê Beyta Pêxember in (s.a.a) ku xeberdana ji wê ronahîkirina ronahiyê ye.

### Heqîqeta îsmetê

Di vê hedîsa şerîf û hedîsên dî da «rics» bi «şik» hatiye tefsîrkirin, hinek hedîsên dî ew bi hemû eyb û kêmasiyan tefsîr kirine. Û melhezekirina di xeberdanên di şiroveya hinek hedîsên borî da derbas bûyîn tê dest ku: Nebûna şikê hema dûrkirina kêmasiyên qelbî û qalibî ne û belkî hema îsmet bi xwe ye. Çiko îsmet tişteke bervajiyê îxtiyarê û ne ji qismê meselên tebî'î yê cibillî ye, belkî haletek nefsaniya nûriye ya navdeyî ye ku ji nûra kamil a yeqîn

û dilrehetiya temam tê dest. Hema ew xetîe û bê emriyên ji mirov çêdibin ji ber kêmasiya yeqîn û îmanê ye. Û derecên yeqîn û îmanê ewqas ferq in ku nayên jimartin. Yeqîna kamil a enbiya û îtmînana temam ya wan ku ji muşahida huzûriye hatiye dest, ew ji neduristiya parastine. Yeqîna Alî kurê Ebûtalib ew gihandiye wê derecê ku dibêje: «Eger dinyayê hemûyê bidin min, da ez bi standina liba genim ji mûriyê neheqiyê bikim, ez wî karî nakim».[(1)]

Welhasil, Xwedê şirk, şik, pîsatî û nebaşî ji wan biriye û ew ji xwe ra xalis û xulles kirine û ji xwe ra xwerî kirine û veqetandine û ew derece û meqam dane wan ku em ji xwe nikarin wesif bidin û binivîsîn. 'Enqa nayê nêçîrkirin, davê rake.[(2)]

#### Vebir: Îman nayê wesifdan

Bizane ku îman jî ji wan kemalatên ruhaniye ye û kêmtir kes hene ji heqîqeta wê ya nûraniye agah bibin. Heta bawerdar bi xwe jî çiqas ku di alema dinyayê û tarîtiya tebîet da ne, ji nûraniyeta xwe ya îmanî û hêjana xwe li bal Xwedayê Teala bêxeber in. Heta mirov di vê alemê da ye, wereng adet kiriye ku çiqas nîmet an ezabekê wê alemê bibihîze, hema di cih da gel xweşî û nexweşiyên vê alemê qiyas dike û li ber wê digire. Mesela: Ew başî, qedr, qîmet û xweşiyên ku Xwedê soza wan dayî bawerdaran, dema guh lê dibin digel xweşiyên sultan û padişahan an piçekî ji wan seratir qiyas dikin û ew tê melheza wan û nîmetên

---

1- Nehcul Belaxe, Subhî Salih, Xutbeya 224: Sond bi Xwedê, eger heft iqlîmê alemê hemûyê digel heçî ya li bin ezmana da heyî bidin min, da ku ez bê emriya Xwedê bikim li karek wek standina qalikê libek ceh ji mêrûyê, ez wê yekê nakim. Rastî ev e ku dinyaya hewe li bal min bê qîmetir e ji wî pelçimê li devê kuliyê da ku li ber didanê xwe dicû. Alî, wê çi bike ji wan nîmetên ku ji nav diçin û ji wê xweşî ya ku namînê?! Em han û penaha xwe ji Xwedê ra dibin ji ber wê çendê ku aqilê me bikeve xewa bêxeberîyê û em bikevin nav kirêtiya şimitînê ra, em alîkarîyê jî ji wî dixwazin.

2- 'Enqa şikarê kes neşewed, dam baz gîr; kanca hemûşê bad bidest est dam ra – Hafizê Şîrazî.

wê wek nîmetên vêderê an hinekî hêjayîtir dihesibînin, lê ev liberhevgirtin û ev pîvan û muqayise nedurist e. Em nikarin durist xweşiyên wê alemê û rewh û reyhanên wê melheze bikin û di dilê me ra jî derbas nabe. Em nikarin fêhm bikin ku şerbetek bihiştî hemû tam têda hebin û çawaniya tiştên wêderê li vêderê jê ra nimûne nînin.

Di vê hedîsê da behsa yek ji wan hêjanên bawerdaran kiriye ku di kêşeka ehlê dilan da tiştek beranber nabe digel wê. Ew jî ev e ku dibêje: «Bawerdar liqayê birayê xwe dibe û dest didiyê û Xwedê jî li wan dinhêre». Di gelek riwayetên dî da jî bal vê me'nê ve îşare hatiye kirin.

Hezretê Baqir (a.s) kerem kiriye: «Dema bawerdar raberê hev dibin, vêca dest didin hev, Xwedê berê xwe didê wan û guneh wereng ji wan diweşin wek çawa pelên darê diweşin».[1]

Hema Xwedê zane ku ev çi keramet û nûraniyeta navdeyî ye ku Xwedê li wan dinhêre û berê xwe dide wan û çi hicab û perdan di navbeyna bendeyê bawerdar û nûra cemala xwe da heyî, radike û alîkariya wan dike. Lê gereke sir, remz û raza heqîqî ya wê bêt zanîn û lazim e mirov ji wê bêxeber nebe; gereke berê dil li wê be, da di pey ra kar û amel jî nûranî û kamil bibe û nefxeya îlahî bikeve di qalibê amelan da. Ew jî ev e ku mirov biratî û hezkirina ji Xwedê ra di nav xwe da qahîm û xurt bike, çawa ku di hedîsên şerîfe da ev nukte pir muhim hatiye zanîn û di hedîsên vî babetî da jî îşare pê hatiye kirin:

Hezretê Baqir (a.s) dibêje: «Dema bawerdar rastî hev bên û dest bidin hev, Heq Teala destê xwe têxe nav destê wan û dest dide wî yê pirtir hej hevalê xwe dike».

Di riwayetek dî da hatiye: «Dema bawerdar rast yek bên û dest bidin yekûdu, Xwedê rehmetê li wan dibarîne, neh behrên reh-

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 180

metê li wî dibarin ew ê pirtir hej hevalê xwe dike, eger herdu di hezkirinê da beranber bin, rehmet û dilovaniya Xwedê herduka dinixûmîne». Hedîs vê der heqê da pir in lê em ê bi vî qasî bes bikin. Û her wextî hemd û sipas ji Xwedê ra ne.

## HEDÎSA SÎ Û DUWÊ

بالسّند المتّصل إلی محمّد بن يعقوب الكلينيّ، عن الحسين بن محمّد، عن المعليّ بن محمّد، عن الحسن بن عليّ الوشّاء، عن عبد الله بن سنان، عن أبی عبد الله، عليه السّلام، قال:

**«مِن صِحّةِ يَقينِ المَرْءِ المُسلِمِ أن لا يُرضِي النّاسَ بِسَخَطِ الله، و لا يَلُومَهُمْ عَلي ما لَمْ يُؤتِهِ الله، فإنّ الرّزقَ لا يَسوقُه حِرْصُ حَريصٍ، و لا يَرُدُّهُ كَراهِيَةُ كارِهٍ، و لَوْ أنّ أحدَكُمْ فَرَّ مِنْ رِزْقِه كما يَفِرُّ مِنَ الْمَوْتِ، لأَدْرَكَهُ رِزْقُه كمَا يُدْرِكُهُ الْموتُ. ثمّ قال: إنّ الله بعَدْلِه و قِسْطِه جَعَلَ الرَّوْحَ و الرّاحَةَ فی اليَقينِ و الرِّضا، و جَعَلَ الْهَمَّ والحُزْنَ فی الشّكِّ والسَّخَطِ.»**

Hezretê Sadiq (a.s) kerem kir: «Ji selametiya yeqîna mirovê musilman ew e ku, ji razîkirina xelkê ra Xwedê neyine xezebê û ji ber wê ya Xwedê nedayî wan, loman li wan neke. Çiko kulbûtî ya kulbû, riziq nayine û heznekirina kesî jî ew ê paşve nade. Eger kesek ji hewe wek çawa ji mirinê direve ji rizqê xwe bireve jî, çawa mirin digehê mirov, wereng rizqê wî jî wê bigehête». Di pey ra kerem kir: «Xwedê bi edalet û duristahiya xwe, rehetî û bêhnfirehî di nav yeqîn û razîbûnê da daniye, kul û xem jî nav şik û xezebê da daniye».[1]

### Şîrove:

Sexet û sext, bervajiyê razîbûnê ne, dema bêt gotin: Xezebê filan kes girt û kerbê wî hat, dibêjin: «Sexete». Qist, bi me'na edalet e,

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 57; behsa "îman û kufrê", b. "başiya yeqînê", h. 2

nexwe etfa wê tefsîrî ye. Ser gotina Cewherî, “rewh” û “rahe”, herdu bi me'na rehetî ne, nexwe li vêderê jî etf, tefsîrî ye. An jî rewh, rehetiya dil e û rahet, rehetiya bedenê ye, eva he gotina Meclisî ye. Cewherî, hemm û huznê jî bi yek me'nê zane, nexwe ev jî etfa tefsîrî ye. Meclisî dibêje: Belkî: Hemm, xema demê serdehatina xemê be û huzn, xem û bêtabiya piştî derbasbûna xemê be.

**Vebir: Muqederbûna rizq**

Der heqê vê gotinê da ku: «Ji ber wê ya Xwedê nedayî wan, loman li wan neke», du îhtimal hene: Yek ev e yanî: Ji ber wî qasî ku xelk tiştekî nedinê, lomê li wan neke û xirabiya wan nebêje. Çiko dan û nedan, bi teqdîr û qedera îlahî ye û Xwedê Teala ew tişt nekiriye rizqê wî. Vêca kesê ku ehlê yeqînê ye, dizane ku ev teqdîra Xwedê ye, ji ber wê loman li kesî nake. Lêkolê giranqedr, Feyzê rehmetî ev îhtimal daye û muhedisê zana, Meclisî jî piştîvanî kiriye ji vê gotinê.

Îhtimala dî jî ku cenabê Feyzê rehmetî daye ev e ku: Ji ber wê ya Xwedê nedayî wan, loman li kes nakin. Çiko Xwedê xelk muxtelif çêkirine di danê da, vêca gereke lome li kesî neyê kirin. Eva he wek wê riwayetê ye ku dibêje: «Eger xelk bizanin Xwedê çawa xelk çêkirine, kes lome li kesî nake». Cenabê rehmetiyê Meclisî gotiye: “Dûratiya vê îhtimalê ne veşartî ye, nexasima piştî melheza di dewama hedîsê da ku dibêje: «Çiko kulbûtiya kulbû, rizq nayine û heznekirina kesî jî ewê paşve nade».

Nivîserê vê kitêbê dibêje: “Îhtimala duwê ji ya yekê munasibtir e, nexasima piştî melhezekirina vî sebebê hatî gotin, çiko hingê di demê tengî û feqîriyê da, lome tên kirin ku rizq di destê wan da be û xebat bibe wesîla berfirehiyê, vêca mirov bêje: Ez xebitîm û tu nexebitî û ketî tengiya rizq. Lê ehlê yeqînê dizanin ku hirs û peyketin, rizq nayine; vêca lomê li xelkê nakin.

### Hedîsên pişk kirina rizq û baştiriya peyketinê

Gereke bêt zanîn, hedîsên bi vê pêkê ku dibêjin rizq teqsîm bûye û hatiye parve kirin. Û ayetên Quranê jî delalet dikin ser vê yekê, dijatî û munafat nînin gel wan hedîsên ku xelkê hay didin ji kar, xebat û kesb û ticaretê ra. Û kesê desta ji kar bikêşe lome lê hatiye kirin û nebaş hatiye zanîn, her weha kesê nekeve pey rizqê xwe, ji wan kesan hesab bûne. Ku duayên wan nayên qebûlkirin û Xwedê rizqê wan nade. Hedîsên vî babetî pir in û eve yek ji wan em ê li vêderê bînin:

Ibn Abdulezîz dibêje, Îmam Sadiq (a.s) got: "Omerê kurê Muslim çi kiriye?" Min gotê: "Berê xwe daye îbadet û terka ticaretê kiriye". Kerem kir: "Wey rebeno! Qey nizane kesê nekeve pey rizqê xwe, tu duayekî wî qebûl nabin? Dema ayeta: «Kesê teqwatiya Xwedê bike wê Xwedê derî lê veke û bi awayekî ku ne di hesaba wî da ye, wê rizqê wî bide»[1] hat, hinek ji sehabên Resûlê Xwedê (s.a.a) derî li ber xwe girtin û mijûlê îbadet bûn; gotin: "Ev ji me ra bes e, em bêniyaz bûn". Karê wan giha guhê Pêxember, ewî, ew anîn û got wan: "Çi sebeb ji vî karê hewe ra heye?" Gotin: "Ey Resûlê Xwedê, Xwedê Teala rizqê me li xwe girt û em jî mijûlê îbadet bûn". Vêca Resûlê Xwedê (s.a.a) got wan: "Kesê wisa bike, qet duayeka wan jî qebûl nabe, bikevin pey rizqê xwe".

Nebûna dijatiyê navbeyna wan da, bi vî awayî ye ku piştî peyketinê jî, rizq û hemû tiştên dî di destê Xwedê da ye, ne wisa ye ku peyketina me serbixwe, rizq pê ve tê. Belkî peyketina rizq ji wezîfa evda ye û pêkhatina kar û sebebên eşkere û xef jî ku pirtirê wan ne di îxtiyara mirov da ne, bi qedera Xwedê ve girêdayî ne. Nexwe mirovê yeqîndurist û ewê hay ji herikîna karan heyî, gereke ji peyketinê nesekine û wezîfa xwe ya şer'î û aqlî bi cih bîne û bi viyana derewîn deriyê peyketinê li ber xwe negire. Lê digel vê jî, hemû tiştî ji Xwedê bizane û qet tiştek dî di hebûn û

1- Telaq / 2-3

kemalan da xweyê eser nebîne. Talib û teleb û metlûb hemû ji wî ne. Me'na vê ristê di hedîsê da: «Xweyê yeqîna durist ji ber tengiya rizqê xelkê, loman li wan nake» ev e yanî: Eger bi awayek adetî ew pey rizqê xwe ketin, lome li wan nayê kirin; di gel vê jî lomekirina li wê koma pey rizqê xwe nakevin, baştir e da ewa rakin û ew pey rizqê xwe bikevin. Wek vê di hedîsên dî da jî hatiye.

Welhasil ev mesele yek ji çiqên cebr û tefwîzê ye, kesê lêkolîn wê der heqê da hebe, dikare kakilê wê derînê û behsa berfireh vê der heqê da ji wezîfa van kaxizan der e.

**Vebir: Nîşanên yeqîn a durist**

Di vê hedîsê da du tişt nîşanê yeqîn a durist hatine zanîn: Yek ev e ku xezeba Xwedê nede bi razîbûna xelkê. Ya dî ew e ku ji ber wê ya Xwedê nedayî xelkê lomê li wan neke. Ev du, ji fêkiyê kemala yeqînê ne, bervajiyê wan jî ji lawaziya yeqînê û nexweşiya îmanê ne. Di vê kitêbê da çiqas cihek munasib hebû me behsa îman û yeqînê kir, niha jî em ê bi kurtî hinekî behsa van du sifetan bikin ku çawa sebebê selametî û duristiya yeqînê ne û çawa bervajiyê wan sebebê nexweşî û zeîfiya yeqînê ne.

Gereke bêt zanîn, mirovê li pey razîbûna xelkê be û dilê wan bikire, ji ber wê ye ku ewa xweyê eser dibîne di wê tiştê da ku li pey e. Bi nimûne, yên maldost li ber dewlemenda şikestî ne û yên meqamdost û ew ên mezinahiyê dixwazin û li pey qedr û qîmetê şiklî ne, başiya murîdan dibêjin û xwe ji wan ra dişikînin û qedrê wan digirin û bi çi awayê heyî dilê wan dikirin û dest ve tînin. Hema ev zivirok û gerdûn li dora xwe dizivire. Bindest ji mezinên xwe û mezinên wan ji yên bin xwe ra zimanhilûtiyê dikin û behsa hev bi başî dikin, lê ew ên bi xwe ve mijûl û li pey razîbûna Xwedê ku dinyayê û xemla wê ew nelerizandine û di mezinahiyê da li pey razîbûna Xwedê bin û di halê bindestiyê da heqxwaz bin, ew ji nav vê zivirok û gerdûnê der in.

## Xelk du bir in

Welhasil, mirov di dinyayê da du tebeqe û deste ne: An yeqîna wan ewa digehîne wêderê ku hemû esbabên zahirî û eserên şiklî di bin îrada ezelî ya kamile ya Xwedê da dibinin. Ji Xwedê pê ve qet tiştekî ji kesî nabînin û naxwazin û îman anîne ku di dinya û axretê da muesir û malik ew e û bêşêlûtî îman û baweriyek temam bi vê ayeta Quranê anîne ku: «Ey Xwedê, ey xweyê padişahiyê, tu mezinahiyê didiyê, tu bixwazî û yê tu bixwazî jî mezinahiyê jê digirî».(1) Bi vî awayî Xwedê Teala xweyê hemû alema hebûnê zanin û hemû tiştî ji wî zanin. Ew ên weha, hinek deriyên mearif û zanîn û nasîna li ber wan vedibin û dilê wan dibe dilek îlahî; ew razîbûn û kerbê xelkê bi tiştekî hesab nakin û li pey razîbûna Heq Teala ne û çavê wan hema li dergehê îlahî tenê ye û hal û dilê wan hema evê dibêje: Ey îlahî, eger tu danê gel me bikî, ma kî dikare pêşiyê lê bigire û eger tu tiştekî ji me vegirî, kî dikare bide. Ew kesên weha, çavê xwe ji dana xelkê digirin û berê xwe didin dana Xwedayê ezîz û celîl; helbet mirovên weha razîbûna hemû mewcûdan pêkve li beranberê xezeba Xwedê da naxwazin, çawa ku hezretê Mîrê bawerdaran kerem kirî. Ev bir û desta he, her çend ji Xwedê pê ve tiştekî ji kesî ra nizanin û hemû tiştî niyazmendê Xwedê zanin. Lê digel vê jî dîsa qedr û qîmet didin xelkê û bi çavê merhemet û dilovaniyê berê xwe didin wan û ji terbiyet û duristkirinê pê ve ji ber çi tiştên dî lomê li kesî nakin. Çawa ku pêxemberên Xwedê (a.s) bi vî awayî bûn. Çiko ewan, ew girêdayê bi Heq Teala ve û mezahirê cemal û celala wî zaniyan û ji nêrîna merhemet û dilovanî pê ve li evdên Xwedê nanêrîna û bi hesebê dil ji ber kêmasî û sistiyê lome li kesî nakiran. Gerçî bi hesebê zahir û eşkere ji duristkirin û rastkirina beşer

---

1- Alê Îmran / 26-27: Bêje: Ey Xweda; padişahê padişahîyê! Kesê tu bixwazî tu padişahîyê didîyê û yê tu bixwazî padişahîyê jê digirî û yê te bivê tu ezîz dikî û yê te bivê tu zelîl dikî; hemû başî di destê te da ye, bi rastî te li ser her tiştî karîn heye; * Tu şevê dikî nav rojê da û rojê têxî di nav şevê da, tu sax ji mirî dertînî û mirî ji sax. û heçî tu bixwazî bê hesab rizqê wî didî.

ra lome dikiran. Ev ji fêkiyê dara pîroz a yeqîn û îmanê û zanîna hed û sînorên îlahî bû.

Lê bir û desta duwê ew in; yên ji Heq Teala bêxeber, an kêmxeber û xweyê îmanek naqis û na temam in. Vêca çiko nêrîna li zêdahiyan û esbabên eşkere ew ji musebebul esbab [ewê hemû tişt di destê wî da] xafil û bêxeber kirine, li pey razîkirina xelkê ne û carna jî ji bo razîkirina mexlûqek zeîf xezeba Xwedê dest ve tînin. Wek vê ku rêk dikevin gel ehlê guneh û an di cih da emrê bi me'rûf û nehya ji munker terk didin an fetwayek nadurist didin û an tesdîq û tekzîba ne di cih da dikin û an xeybeta bawerdara dikin û tuhmetê li wan didin, da ku berê ehlê dinyayê û xweyê meqamên zahirî bidin xwe. Ev hemû ji ber zeîfiya îmanê ye û belkî di dereceyekî da jî şirk e. Ev kar belayên zehfî ser mirov da tîne; yek ji wan ew e ku di hedîsa şerîf da hatiye. Mirovê weha, nebaş li evdên Xwedê dinhêre û dibe sebebê dijminî û nerehetiyê û di karan da lomê li wan dike.

**Vebir: Gotina Mutezile, Eşairan û ya durist**

Rehmetî yê Meclisî di Mir'atul Uqûlê da di bin vê hedîsa şerîf da behsa vê yekê kiriye: Gelo rizq ku hatiye teqsîm kirin, der heqê rizqê helal da ye an rizqê heram jî li ber xwe digire? Ewî ji tefsîra Fexrê Razî îxtilafa di navbeyna Eş'erî û Muteziliyan da gel delîlên herduka ji hedîsan neqil kiriye û ev gotiye ku: "Îmamiye jî di vê meselê da wek Muteziliyan gotiye, yanî rizqê heram li ber xwe nagire û ev teqsîm taybetê rizqê helal e". Û delîlên Muteziliyan gora eşkereyê hinek ayet û hedîsan û eşkereyê luxetê rizq -ku adeta Mutezilî û Eş'eriya ye- neqil kirine û ew bi xwe jî çiko gotina Muteziliyan gora meşhûrê Îmamiya ye, bi delîla wan razî bûye. Lê gereke bêt zanîn ev behs jî yek ji çiqên cebr û tefwîzê ye ku rêka Îmamiye di wê da ne wek ya Eşaire û Muteziliyan e û belkî gotina Muteziliyan ji ya Eş'eriyan jî naduristir e. Eger hinek ji mutekelimên Îmamiye (r.a) meyla wê kiribin jî, ketine xeflet û bêxeberiya hal û mealê. Çawa pêşda jî hat gotin, mesela zêdetirê

zanaya bi awayek kurt û tarî ji cebr û tefwîzê xeber dane û cihê îxtilafê gora mîzan û kêşeka durist ronahî nebûye. Ji ber wê çêdibe ku gelek, nezanin ku ev mesele bi cebr û tefwîzê ve girêdayî ye, halhale yek ji nimûnên wê yê gir e.

Welhasil, eger Eş'eriyan gotiye helal û heram herdu teqsîm bûye û mesele bi aliyê cebrê ve çûye, Muteziliyan jî gotiye heram nehatiye teqsîmkirin û bi aliyê tefwîzê ve birine, herdu jî batil û nadurist in û di cihê wê da jî naduristiya wan hatiye gotin. Em zanîn ku gora delîl û burhanê, helal û heram herdu ji aliyê Xwedê ve teqsîm bûye, wek çawa me'asî bi teqdîr û qezaya îlahî ne, lê digel vê yekê jî nabe cebr. Lê çiko evder ne cihê anîna delîlê ye û me gel xwe şert kiriye ji meselên ilmî ku em ji kûratiya wê bêbehr in neaxivin, lewmane em ê pê vê îşarê bes bikin. Û Xwedê rêrastker e. (Di şiroveya hedîsa 39 da xeberdan heye).

Rehmetiyê Meclisî di bin vê hedîsa şerîf da ji gotinek dî jî xeber daye ku: "Gelo Xwedê Teala bi çi awayê heyî rizqê ebdan li ser xwe ferz kiriye an hingê ferz kiriye ku ew li pey rizqê xwe bin û xebatê bikin". Ev gotin munasibê binyatên mutekelima ye û gereke di van behsan da mirov bi awayek dî meşy bike. Û ya baştir ew e ku ji van meselan neyê xeberdan; çiko feydeyek baş têda nîne. Me pêşda jî got ku teqsîma rizq bi hesebê qezaya îlahî dijatî gel peyketin û xebatê nîne.

**Vebir: Rehetî di yeqînê da û perîşanî di terdîdê da ye**

Der heqê vê da ku Xwedê rewh û rehetî di nav yeqînê da daniye, kul û xem jî, nav şik û xezebê da. Eva he gora edaletê ye. Rewh û rehetiya di vê hedîsê da hatiye, her weha kul û xem, ji ber ku di biniya hedîsê da behsa teqdîr û teqsîma erzaqan dike. Der heqê meselên dinyayî û dest ve anîna tiştên lazim ji jiyanê ra ye, her çend ev teqsîm bi awayekî der heqê karê axretî da jî durist e.

Helbet kesê yeqîn bi hebûna Xwedê û teqdîratên wî hebe û Xwedayê Qadirê Muteal palgeha wî be, ew Xwedayê ku her tiştî li ser

meslehetê datîne û xweyê rehmet û kerîm e, ew kes pê vê yeqînê wê hemû muşkil û hemû musîbet û bela jê ra sehl û rehet bibin û peyketina wî ji bona rizq, gelek ferq e digel peyketina yê ehlê dinê û şik û şirkê. Ew ên esbabên zahirî palgeha wan bin, daim dilê wan nexweş e û eger belayek ser wan da be gelek li wan giran tê. Çiko ew wan tişta girêdayî bi xeybê ve nizanin. Welhasil, kesê ku dest ve anîna vê dinyayê ji xwe ra bextewerî bizane, wê bi dest ve anîna wê da bikeve zehmetê û rehetî û xweşî wê jê biçe, hemm û xema wî wê bibe ew, çawa ku em dibînîn ehlê dinyayê daim di zehmet û eziyetê da ne û rehetî ya dil û bedenê ji wan ra nîne. Her weha eger dinya û xemla wê ji dest wan derkeve, dikevin kul, xem û kederan; eger belayek ser wan da bêt, tab û taqeta wan xilas dibe û nikarin ewê ragirin û li ber wê sebir bikin. Eva he ji wê pê ve ku der heqê qezaya îlahî da şik hene, ne tiştek dî ye û ev tiştên weha pê ve tên. Pêşiya niha da me vê der heqê da xeber da, ji ber wê ducarkirin di cih da nîne.

Lê vêca ev eserên yeqîn û rizayê û ew eserên şik û xezebê, gelo bi danîna Xwedê ne û gelo ev qirardan gora edaletê ne? Eva he girêdayî ye bi gotina vê yekê ve ku esera failiyeta Heq Teala di hemû meratibên wucûdê da, bê pêşhatina cebra mehal; her weha behsa etemmiyet bûna sîstema wucûdê ronahî bibe û bêt gotin. Lê ev herdu mesele jî ji wezîfa vê kitêbê der in. Hemd û sipas di her wextî da ji Xwedê ra ye.

## HEDÎSA SÎ Û SISÊ

بالسّند المتّصل إلى الشّيخ الأقدم، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، رضوان الله عليه، عن أحمد بن محمّد، عن الحسين بن سعيد، عمّن ذكره، عن عبيد بن زرارة، عن محمّد بن مارد، قال:

**«قلت لأبي عبد الله، عليه السّلام: حديثٌ رُوِيَ لنا أنّك قلتَ: إذا عَرفْتَ فَاعمَل ما شِئتَ. فقال: قد قلتُ ذلك. قال قلت: و إنْ زَنَوْا و إن سَرِقُوا و إنِ شَرِبُوا الخَمْرَ؟ فقال لي: إنّا لله و [إنّا] إليه راجعون. والله، ما أنْصَفُونا أن نَكُون أخَذْنا بالعَمَلِ و وُضِعَ عَنهُم! إنّما قلتُ إذا عَرَفتَ فَاعمَلْ ما شِئْتَ مِن قَليلِ الخَيرِ و كَثيرِه، فَإنّه يُقبَلُ مِنكَ.»**

Muhemmedê kurê Marid dibêje, min got hezretê Sadiq: “Ji me ra hatiye gotin ku te gotiye: “Dema te nasîn û zanîn peyda kir, tu çi dixwazî bike”. Kerem kir: “Belê, min ew gotiye”. Rawî dibêje, min got: “Heta eger zinayê bikin û diziyê bikin û ereqê jî vexwin?” Ewî kerem kir: «Înna lîllah we înna îleyhî racî'ûn». “Wellahî ewa der heqê me da bê însafî kirine, ku ji ber kiryarên me li me bêt girtin, lê ew bên berdan û li wan neyê girtin! Ya min gotiye ev e ku: Dema te nasîn peyda kir, çiqas tu dixwazî amel bike, çi kêm û çi zêde, wê ew ji te bêt qebûl kirin”.[1]

### Şîrove:

Mexsed ji «'ereftu»yê di vê hedîsê da naskirina îmam e.

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 57; behsa “kufr û îmanê”, b. “digel îmanê xirabî zererê nade”, h. 5

### Cem'a hedîsên teşwîq û vajiyê wan

Eger kesek binhêre xeberên der heqê ehwalê Resûlê Ekrem û îmamên hîdayetê (a.s) û çawaniya ubudiyet, bendetî, xebat û xwe şikandin û giriyê wan di îbadet û taetê Xwedê da, bibîne û wesiyetên hezretê Resûl (s.a.a) li Mîrê bawerdaran (a.s) û wesiyetên ku îmaman li hev dikiran û li peyrewên xwe yên xalis û muxlis dikiran û bi dijwarî hişyarî didan wan ku xwe ji bê emriya Xwedê bidin paş, wê bi zanînek qet'î û bivebir bizane ku eger hinek riwayet di eşkereyê xwe da dijê wan e, eşkereyê wan ne mexsed e. Nexwe eger çêbe bi awayekî bên me'nekirin ku nebin dijê wan, lazim e ew kar bêt kirin û eger cem'a orfî mumkin be, bêt cem'kirin, eger çênebe, em ê zanîna wê li bêjerê wê bizivirînin. Em niha di vê kitêbê da nikarin wan hedîsan hemûyan an dehyeka dehka wan jî bînin, lê ji kifşkirina hal ra em ê çendeka li vêderê bêjin.

Hezretê Sadiq dibêje: «Peyrewên me kuldar, xemîn û zeîf in (ji ber xebat û îbadetê pir); ew in yên bi xem ve diçin berahiya şeva tarî». Hedîsên ji vê pêkê ku behsa sifetên wan dikin pir in.

Her weha kerem dike: «Xwe ji yên pîsek paşda bide, çiko bi rastî peyrewên Alî (a.s) ew e ku zik û binzikê wî paqij û pak be û pir xebatker be û ji xaliqê xwe ra kar bike û hêviya xêrê ji wî bike û ji cezadana wî bitirse, vêca dema te yên wereng dîtin, hema ew in peyrewê Cafer jî».

Hezretê Baqir (a.s) dibêje Xeyseme: «Evê gotinê bigehîne peyrewên me ku: Em der heqê Xwedê da qet bê îhtiyacîhê çênakin (yanî: Pê baweriya bi me ji amel paşve nemînin) û ji peyrewên me ra bêje ku: Xêncî bi kar û amel, kes nagihê wê ya li bal Xwedê; ji peyrewên me ra ragehîne ku xemdartirîn kes roja qiyametê ew e behsa edaletekî bike û paşê xwe bal tiştek dî ve bide. Û bêje peyrewên me ku: Eger wezîfa xwe pêk bînin (berpirsiyariya xwe bi cih bînin) hema ew in yên roja qiyametê ser dikevin û xilas dibin».

Hezretê Baqir (a.s) dibêje: «Qet di rêyên batil da neçin, wellahî şîayên me ew in yên guhdarê Xwedê ne».

Yanî: Di bê emriya Xwedê da qet ozra ji xwe ra neyinin û nekevin pey gotinên pûç û beredayî, ku mesela em şîa ne û nisbeta me bal Ehlê Beytê ve, wê bibe sebebê xilasiya me. Sond bi Xwedê, ne şîayê me ye ji wî pê ve yê guhdarê Xwedê Teala be.

Cabir dibêje: «Hezretê Sadiq (a.s) got min: Ey Cabir, ma gotina: "Em hej Ehlê Beytê dikin", tenê bes e ku mirov pê wê bibe ji şiiyan? Vêca bizane, wellahî, ne peyrewê me ye ji wî pê ve yê hay ji navbeyna xwe û Xwedê hebe û guhdarê wî be... Vêca nexwe teqwatiya Xwedê bikin û ji wê ya li bal Xwedê ra kar û amel bikin. Xwedê gel kesî mirovatî nîne; xêncî bi taet û guhdanê kes nêzîkê Xwedê Teala nabe. Berata (xilasî û dûrketina) ji agir ne gel me ye û kesî delîl û hucet li beranberê Xwedê da nîne. Kesê guhdarê Xwedê be, ew heval û dostê me ye û yê neguhdarê Xwedê jî dijminê me ye. Û xêncî bi amel û teqwatiyê kes nagihê wîlayeta me».

Di Kafiya şerîf da senedê digehîne hezretê Baqir (a.s) ku kerem kir: "Ey cemaeta peyrewên Alê Muhemmed (s.a.a) hûn di navincî bin, da yên zêdeçûyî li hewe bizivirin û yên paşda mayîn bigehin hewe". Yek ji ensaran bi navê Se'd, pirsî: "Ez gorî, zêdeçûyî kî ye?" Kerem kir: "Ew komek in ku wan tiştan der heqê me da dibêjin ku em bi xwe der heqê xwe da nabêjin. Vêca ne ew ji me ne û ne em ji wan in". Pirsî: "Vêca paşde mayî (talî) kî ne?" Kerem kir: "Ew e yê hîdayet û rêrastiyê dixwaze, lê rêka wê nabîne û dixwaze ku amel bike û xêr jê ra be". Piştî wê berê xwe da peyrewên xwe û got: "Sond bi Xwedê, berat û azadiya ji ezabê Xwedê digel me nîne û navbeyna me û Xwedê da tu mirovanî nîne û me tu delîl ser Xwedê tunehin û xêncî bi taet û guhdariyê nêzîkiya bal Xwedê ve çênabe. Heçî kesê ji hewe guhdarê Xwedê be, wîlayet û dostiya me jê ra feyde heye. Û kesê ji hewe ne guhdarê Xwedê be, dostiya me feydê nadiyê; rebeno, ser xwe neçin, belengazino, hêç nebin".

Di Kafiya şerîf da hatiye hezretê Baqir (a.s) dibêje: «Resûlê Xwedê (s.a.a) çû ser girikê Sefayê û weha got: "Ey ewladê Haşim, ey zarokên Abdulmutelib, ez pêxemberê Xwedê me, bi aliyê hewe ve hatime û dilê min bi hewe ve ye. Amel û karê min ji min ra ye û amelê heryek ji hewe jî ji wî bi xwe ra ye. Nebêjin Muhemmed ji me ye û em ê biçin wî cihî, cihê ew biçiyê. Ne, sond bi Xwedê, ey benî Abdulmutelib, ji nav hewe û xêncî hewe, ji ehlê teqwayê pê ve kes ne dostê min e. Heyhê! Eger roja qiyametê hewe dinya hemû dabe pişta xwe û hûn bên bal min, lê xelkên dî bên û axret hilgirtibin, ez hewe nas nakim".

Her weha di riwayeta Cabir da borî ku hezretê Baqir (a.s) got: «Ey cabir, melhezên pûç, bîr û hizra xirab, te nexapîne ku tu goman bikî hezkirin û huba Alî (a.s) ji te ra bes e». Gelo kafî ye hema yek bêje ez wîlayetdarê Alî me (a.s) û hej wî dikim. Lê vêca ne xebatker û xweyê kar û amelê pir û zehf be? Eger bêje ez hej Resûlê Xwedê (s.a.a) dikim (gel wî qasî ku Resûlê Xwedê ji Alî (selam li ser wan bin) baştir e) lê piştî hingê ser rêka wî neçe û bi suneta wî amel neke, ji hezkirina wî tu feydekî nabîne.

Di hikayeta meşhûra Tawûs da jî hatiye ku: "Nalîn û giriyek bihîst, heta demekî ku dît xweyê nalînê, bêdeng bû û heçweku bêhiş bû. Dema hat ber serê wî, dît ku hezretê Alî bin Husêyn Zeynul Abidîn e (a.s)! Serê wî danî di koşa xwe da û hinek xeberdanên xweş û dilrehetker jê ra gotin; tu kurê Resûlê Xwedê yî; tu ji zarokên Fatima Zehra yî; bihişt ji hewe ra ye. Ewî hezretî kerem kir: «Xwedê bihişt ji wî ra çêkiriye, yê taet û guhdariya wî bike, her çend ciwanek Hebeşî be. Agir ji wî ra çêkiriye yê bê emriya wî bike, her çend ewlad an mezinê Qureyş be». Ev çend hedîsek bûn ku evê gotina me ehlê gunehan û dinyaxazan ku hewesek şeytanî ye û dij û muxalifê aqil û neqlê ye, pûç û nadurist zanî. Vêca tu ayetên Quranê jî lê zêde bike, wek van ayetan: «Her kes rehîna kar û amelê xwe ye» (Muddessir/38). «Kesê qas zerekî başiyê bike wê bibîne. Û yê qas zerekî xirabiyê bike wê bibîne» (Zilzal/7-8). Û: «Kesê başiyê bike ji wî ra ye û yê nebaşiyê

jî bike ji wî ra ye» (Beqere/286). Xêncî ji van ayetan jî ku di her pelekê kitêba îlahî da hatiye û tewîl jê ra ne lazim e.

Di beranberê van da vêca hinek hedîsên dî hene ku di kitêbên muteber da hatine nivîsîn, lê pirtirê wan bi awayek orfî li hev kom dibin. Û eger ev komkirin meqbûl jî neyê dîtin û neyên tewîl û me'nekirin jî, nikarin li beranberê van hemû hedîsên sehîh û rasterast û mutewatir da bisekinin ku digel eşkereyê Quranê û aqilê selîm û zerûreta musilmaniyê bisekinin û xwe ragirin. Ji wan riwayeta ye ewa Kuleynî di Kafiyê da ji hezretê Sadiq (a.s) gêrayî ku gotiye: «Digel hebûna îmanê çi amel zererê nadin, gel hebûna kufrê jî çi amel feydê nadin». Çend hedîsên dî jî bi vê me'nê hene. Û cenabê muhedisê giranqedr Meclisiyê rehmetî ev hedîsên he me'ne kirine û gotiye “mexsed ji «zerer»ê ketina nav agir an ebedî mayîna di nav agir da ye”. Eger mexsed neçûna nav agir da be, hingê çi lê nayê di berzex û mewaqifên dî da bi ezabên dî bêt ezabdan.

Lê nivîser goman dike ku, weheye me'na van hedîsan ev be ku, îman ewqas dila ronahî dike ku eger carna nebaşî an gunehek jî ji bawerdar çêbe, îmana wî ewî bi aliyê Xwedê û tewbê ve dibe û tê cubrankirin û xweyê îman nahêle karê wî bimîne ji axretê ra.

Nexwe ev hedîsên he heçweku mirov hay didin ji xweyîkirin û ragirtina îmanê ra. Hedîsek wek wê ew e di Kafiya şerîf da ji hezretê Sadiq hatiye gêran ku: «Hezretê Mûsa (a.s) got cenabê Xizir (a.s): “Şîretekî li min bike”; weha gotê: “Daim hevrê be gel wê tiştê ku eger ew hebe tiştek zererê nagihîne te û eger ew tunebe tiştek feydê nade te”.»

Yek dî ji wan riwayetan ew e ku hezretê Sadiq (a.s) got: «Pir caran Mîrê bawerdaran di xutbên xwe da digota: “Xelkîno! Hay ji dînê xwe hebin, dînê xwe xweyî bikin. Çiko xirabiya digel hebûna dîn baştir e ji başiya digel nebûna dîn. Û xirabî di wê da efû dibin û xêr bê wê qebûl nabin».

Ev hedîs û yên wek wê teşwîq e ji dîndariya heq ra ku gunehên dîndarê heqîqî paşî ra efû dibin, çawa ku ayeta Quranê dibêje: «Xwedê gunehan pêkve efû dike».[1] Û ji ber vê, mirov dikare bêje xirabiyên wan ji başiyên yên dî baştir in ku qet nayên qebûlkirin. Belkî ji xwe ew başiyên şertê wan wek îman û wîlayetê tunebin, bi xwe tarîtiyek têda hebe tarîtir ji nebaşiyên bawerdaran ku ji ber îmanê di nav xewf [tirs] û recayê [hêviyê] ra ne. Welhasil, ev hedîs nabe delîl ku ehlê îmanê muaxize nabin ji ber gunehên xwe, çawa ku ronahî bû.

Yek ji hedîsên dî ku dibêjin di nav herdu destan da meşhûr e, ev e ku: «Hezkirina ji Alî, ew başî ye ku digel wê tu xirabiyek, zererê nagihînê; kerbhatina ji wî jî, ew guneh e ku digel hebûna wê tu qenciyek feyde nakin».

Ev jî wekî behsa îmanê ye ku borî. Me'na wê jî hema ew e ku rehmetiyê Meclisî di şiroveya wan da gotiye, ku mexsed ji zererê çûna nav agir an xulûd û mana di nav agir da ye. Yanî: Hezkirina ji wî hêjayî, dibe sebeb ku bi şefaeta şefaetkeran ji agir xilas bibe, çawa ku di hedîsê da hatiye: «Hûn hay ji berzexa xwe hebin, em ê jî di qiyametê da ji hewe ra şefaet bikin». An jî belkî wereng be ku me gotî, yanî: Hejêkirina wî nûraniyetê û meleka îmanê di dil da datîne ku nehêle gunehan bike û eger carna guneh jî jê çêbin, ewê bi tewbê û zivirîna bal Xwedê ve bicebirîne û nehêle nefs serî jê bistîne.

Hinek hedîs jî di bin ayeta 68-70 ya sûretê Furqan da hatine ku me'na hemûya nêzîkê yek in, em ê di pey ayetê ra hedîsekî ji wan bînin. Ayet ev in: «Ew ên ber Xwedê ra gazî Xwedayên dî nakin û xêncî biheqî nefsa ku Xwedê jê ra hurmet çêkirî nakujin û zinayê nakin, kesê ewê bike wê bigehê cezayê xwe yê temam; wê di roja qiyametê da ezabê wî çend beranber bibe û wê bi zelîlî di wê da bimîne; xêncî ji wî yê tewbe bike û baweriyê bîne û karek qenc û

1- Zumer / 53

baş bike. Vêca ew in yên Xwedê şûna xirabiyên wan da qencîhê dide wan û Xwedê pirlêborê dilovan e» (Furqan/ 68-70).

Muhemmedê kurê Muslim dibêje, min der heqê ayeta: «Fe ulaike yubeddilullahu seyyiatihim hesenat...» ji Îmam Baqir pirsiyar kir, ewî got: "Roja qiyametê bawerdarê gunehkar tê anîn heta li bal cihê hesabê disekine; vêca Xwedê ji hesaba wî xeber heye û kesek ji xelkê agahî ji hesaba wî nîne. Vêca ew, ewî ji gunehên wî agah dike û ew jî ewa gunehan li ser xwe dibêje û qebûl dike. Vêca Xwedê dibêje nivîseran: "Gunehên wî jê ra biguherin bi qencî û ji xelkê ra bêjin". Vêca hingê xelk dibêjin: "Ma gelo evî ebdî gunehek tenê jî tunebû!" Di pey ra Xwedê destûrê didê ewî dibin bihiştê. Me'na ayetê ev e û taybet e ji peyrewên me ra".»

Eva he ku min ayetên şerîfe bi temamî û dirêjî anî ji ber wê ye ku mesele muhim e û hinek minberiyan xelk nebaş têgihandine û xêncî bi anîna ayetan me nedikarî em meselê ronahî bikin. Kesê li ser û binê ayetê binhêre wê fêhm bike ku her kes digel amelê xwe ye û ji ber nebaşiyan li wan tê girtin, îlla eger îmanê bînin û ji gunehên xwe tewbe bikin û karên qenc bi cih bînin. Û ev hersê di kî da hebin, ehlê xilasê ye. Û Xwedê keremê digel wî dike û Xwedê Teala qîmet didiyê û nebaşiyên wî jê ra başî tên hesibandin. Û hezretê Baqir jî (a.s) hema behsa van kesan kiriye ku hesaba wan bi wî awayî ye. Lê ya heyî ev e ku eva he taybetê peyrewên Ehlê Beytê ye û xelkên dî ji wê bêbehr in. Çiko bawerî çênabe ji wê pê ve ku wîlayeta Alî û wesî yên wî yên pak hebe (a.s) û belkî baweriya bi Xwedê û Resûl bê wîlayet ji xwe qebûl nabe, çawa ku em ê di vebira pey ra jê biaxivin înşaallah. Nexwe ev ayeta şerîfe û hedîsên di tefsîra wê da hatine, gereke ji delîlên eweliye bên hesabê, çiko delalet dikin ser vê yekê ku eger kesekî îman hebe û gunehên xwe bi tewbê û amelê salih cubran neke, ber vê ayetê nakeve.

Vêca nexwe ey ezîz, bila şeytan te nexerifîne û bayê dil te nexapîne. Helbet mirovê sist û mubtelayê bi şehwet û hezkirina dinya,

mal û meqamê, wek nivîserê vê kitêbê, daim li pey bihanekî ne ji teyîda tenbelî û sistiya xwe ra û çi tişta ser dilê wî be û rêketî be gel viyanên wî yên nefsanî, berê xwe didiyê, çav û guhê xwe jê ra vedike. Jarê belengaz goman dike qey hema dema bêje ez hej Ehlê Beytê dikim û peyrewê wa me, êdî dikare hemû heraman bike û qelema teklîfê ji ser rabûye! Xwelîser, nizane şeytan xwe li ber ve daye ku di axirîka temenê wî da evê mehebeta bê kakil jî jê bigire û di rêza newasiban da heşir bibe. De'wa wî kesê beyine û delîl tunebe nayê qebûlkirin. Çênabe ku ez dostê te bim û hej te bikim û bervajiyê hemû mexsedên te amel bikim. Fêkiyê hezkirinê amelkirina gora wê ye, eger ev fêkî jê ra nebe gereke bêt zanîn ku hezkirin nebûye, goman kiriye ku hezkirin hebûye. Pêxemberê giranqedr û Ehlê Beyta wî, omrê xwe hemû di rêka belavkirina hukm û exlaq baweriyan da borandine û hema yek mexsed tenê hebûne û ew jî ragihandina hukmên Xwedê û avakirin û duristkirina beşer bûye û di vê rêkê da hemû barên giran wek kuştin û talanbûn û tenêman... sehl zanîne û ji ber wan ji bizavê nesekinîne. Nexwe peyrewê wan ew in yên di hedef û mexseda wan da gel wan şirîkatiyê bikin. Eva he ku îqrara bi lisan û amelê bi erkana ji ragirên îmanê hesibandine, ronahîkirina remz û razek tebî'î ya sunetullahê ye, çiko heqîqeta îmanê digel îzhar û amel e. Eger amel nekir, ne mumin e û muhabet nîne û ev îmana şiklî ya bê kakil jî bi piçek tengî û qewimînan wê ji nav biçe û bi destê vala munteqilê mala cezayê amelan bibe.

### Wilayeta Ehlê Beytê şertê qebûlî ya amela ye

Ev ku biniya hedîsê dibêje wîlayet û marîfet şertê qebûliya amela ye ji meselên musellemê mezhebe paqijê şîa ye û gelek hedîs vê der heqê da hene û ji heddê tewaturê pirtir in. Em ê bi hinek ji wan eva rûpelan teberuk bikin:

Hezretê Baqir (a.s) dibêje: «Heqîqet û bilindahî û kilîda wê û deriyê tiştan û razîbûna Rehman di guhdariya îmam da ye piştî nasîna wî... Eger kesek bi şev îbadet bike û roj ve rojî bigire û

hemû malê xwe bike sedeqe û di hemû omrê xwe da biçe hecê, lê wîlayeta weliyê Xwedê nas neke, da bikeve pey wî û hemû amelên xwe wek yên wî lê bike, ewî di xêrdanê da tu heqekî ser Xwedê nîne û ne ji ehlê îmanê ye».

Ji hezretê Sadiq (a.s) neqil bûye ku: «Kesê bi wî awayê hûn li ser, roja qiyametê neyê bal Xwedê, qet tu qenciyek jê nayin qebûlkirin û ji tu xirabiyekî wî nayê borîn».

Dîsa dibêje: «Wellahî eger îblîsê lanetî piştî wê bê emrî û tekeburê, çiqas omrê dinyayê hebe, ji Xwedê ra biçe secdê jî, ne feydê didiyê, ne jî jê tê qebûlkirin, heta ku ji Adem ra neçe secdê wek çawa Xwedê emrê wî kiribû. Halê vê koma neguhdar û xapihayî ku terka îmamê xwe ku pêxemberê wan ji wan ra danî, kirin jî wereng e, tu amel ji wan nayin qebûlkirin û tu qencî ji wan ra bilind nabin, heta bi aliyê Xwedê ve bên, bi wî awayê fermana wan hatiye dayîn û bikevin pey îmamê ku destûra peyketina wî ji aliyê Xwedê ve hatiye û di wî dergehî ra biçin ku Xwedê û Resûlê wî ji wan ra vekiriye». Exbar vê der heqê da û bi vê me'nê pir in û evê meselê ronahî dikin ku wîlayet şertê qebûliya amela ye û belkî jî şertê qebûliya îmana bi Xwedê û pêxemberiya Pêxember e. Lê der heqê wî qasî da ku gelo ji duristiya amelan ra jî şert e, çawa ku hinek aliman gotine, ne kifş e û belkî ya xuya û zahir ew e ku ne şert be, çawa ku ji gelek riwayetan tê fêhmê. Wek riwayeta ku dibêje: «Yê mustebsir xêncî zekatê -ku di zemanê şaşiyê da ne di cihê wê da serf kiriye- ne lazim e amelên xwe yên dî qeza bike û Xwedê xêrê jî jê ra dinivîse». Û di riwayetek dî da hatiye: «Amelên dî wek nimêj, rojî, hec û sedeqeyê, wê pey hewe bên û bigehê hewe, lê zekat, çiko te nedaye xweyê wê, gereke tu di cihê wê da bidî». Di hinek riwayetan da hatiye ku roja pêncşemê amelan dibin bal Resûlê Xwedê (s.a.a) û roja Erefê Xwedê Teala berê xwe didiyê û hemûya li ber bayê berdide. Pirsiyar dikin ku ev amelên kî ne? Dibêje: Amelê dijminên me û dijminê peyrewên me ne. Û wek çawa ronahî ye eva he delîl e ji duristî û qebûl nebûnê ra. Di her hal û karî da ev behs ne berpirsiyariya me ye. Di hemû dema da hemd ji Xwedê ra ye.

## HEDÎSA SÎ Û ÇARÊ

بالسّند المتّصل إلى ثقة الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، قدّس سرّه، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد بن خالد، عن إسماعيل بن مهران، عن أبى سعيد القمّاط، عن أبان بن تغلب، عن أبى جعفر، عليه السّلام، قال:

**«لَمَّا أُسْرِيَ بالنّبى، صلّي الله عليه و آله، قال: يا رَبِّ، ما حالُ المؤمِنِ عندَك؟ قال: يا محمّدُ، من أهانَ لى وليًا، فقد بارَزَنى بالمحارَبَةِ، و أنا أَسْرَعُ شيءٍ إلى نُصرَة أوليائى، و ما تَردّدتُ فى شيءٍ أنا فاعلُه كتَرَدُّدى فى وَفاة المؤمنِ يَكْرَهُ الموتَ و أَكْرَهُ مَساءَتَه. و إنّ مِن عبادِيَ المؤمنينَ من لا [يُصلِحُه] إلاّ الغِنى، و لو صَرَفْتُه إلى غير ذلك لَهَلَكَ. و إنّ من عبادِيَ المؤمنينَ من لا [يُصلِحُه] إلاّ الفَقْرُ، و لو صَرَفْتُه إلى غير ذلك لَهَلَكَ. و ما يَتَقَرَّبُ إلَيّ عبدٌ مِن عبادى بشىء أحَبَّ إلَيّ مِمّا افْتَرَضْتُ عليه. و إنّه لَيَتَقَرَّبُ إلَيّ بالنّافِلَةِ حَتّي أُحِبّه، فاذا أَحْبَبْتُه، كُنتُ إذًا سَمْعَهُ الّذى يَسْمَعُ بِه و بصَرَهُ الّذى يُبْصِرُ به و لِسانَه الّذى يَنْطِقُ به و يَدَهُ الّتى يَبْطِشُ بها، إن دَعانى أَجَبْتُهُ، و إن سَأَلَنى أَعْطَيْتُهُ.»**

Ebanê kurê Texlib ji hezretê Baqir (a.s) neqil dike: «Dema Resûlê Xwedê (s.a.a) ji mîracê ra hatiye birin got: "Ey Xwedê! Bawerdar li bal te çawan in?" Kerem kir: "Ey Muhemmed! Eger kesek dostek min bêqîmet bike, ew hatiye şerê min. Ez ji her tiştî leztir alî dostên xwe dikim. Qasî ez li mirandina mumin da terdîd dikim di tiştek dî da nakim, ewî ji mirinê nehez e û min jî nexweşiya wî navê. Ji nav bendên min yên bawerdar ew hene ku dewlemendî ji durist-kirina wan ra baş e û eger ez ewî bi aliyek dî ve bidim wê ji nav

biçe. Hinek ji bendên min yên bawerdar jî ji feqîriyê ra baş in, eger ez wan bi aliyek dî ve bidim, wê ji nav biçin. Qasê ebd bi ferzan nêzîkê min dibe, bi tiştek dî nêzîk nabe. Bi sunetan jî ewqas nêzîkê min dibe heta ez hejê dikim, vêca dema min hejê kir, ez dibim guhê wî yê pê dibihîze û çavê wî yê pê dibîne û zimanê wî yê pê xeber dide û destê wî yê tişta pê digire. Vêca dema gazî min dike ez cewaba wî didim û dema ji min bixwaze ez didimê".»[1]

**Şîrove:**

"Usriye", fiîla mechûl e û bi me'na birina bi şev e. Nexwe eva he ku di ayetê da: "Subhanellezi esra biebdihi leyla"[2] ev kelîme bi "leyl" muqeyed bûye, an ji ber wê ye ku nekîre bûna "leyl"ê nîşan bide, zemanê vê birinê kêm bûye. Halhale ser gotina Şêxê Behaî navbera Mescidul Heramê û Mescidul Eqsayê çil şev e. An jî mebnî ser "tecrîd"ê ye ji wê yekê ra. Û mute'elleqên "Usriye Binnebî" hezf bûye, ji ber ku me'hûd e, mesela yanî: "Usriye bihî îla meqamil qurb".

"Ma halul mumin", yanî: Qedr û qîmetê wî li bal te çawa ye?

«Men ehane lî weliyyen», xiyanet, kêmkirin, bêbiha, bêqîmetkirin û zelîlkirin e. Zahir ew e ku car muteeliq e bi fiîlê ve, hingê yanî: Mexsed dibe ev ku, bêqîmetkirina bawerdar ji ber xatirê Xwedê be. Çêdibe jî ku bi welî ve muteeliq be, hingê mexsed ew e ku: Bi çi awayê hebe, bêt kêmkirin û bêqîmetkirin. Welî jî bi me'na muhib û dost e.

«Bereze», bi me'na derketin e, li vêderê mexsed ji mubarizê, şer û derketina ji şer ra ye, an jî eşkerekirina şer.

"Înne mîn îbadî men la yesluhuhu îllel xîna", rehmetî Şêxê Behaî dibêje: "Sena'eta nehwî dike lazimê xwe ku mewsûl ismê wê be,

---

1- Usûla Kafî, c. 2, p. 352

2- Îsra / 1 : Pak e ew ê ebdê xwe bi şev birî.

carr û mecrûr xeberê wê bin. Lê kifş e mexsed ne ew e ku xeber bide ji wa yên xêncî ji feqîriya hinek bendan ewan durist nake, belkî mexsed vajiyê wê ye. Nexwe baştir ew e zerf, bibe ism û mewsûl bibe xeber. Her çend ev ne mutearif e li bal nehwiyan, lêbelê hineka wek wê di ayeta "we mînen nasî men yeqûlu amenna bîllah"[1] caiz zanîne. Belkî jî di cihên weha da mubteda mehzûf be û carr delalet bike ser hezfê. Hingê êdî dijê qaîdeya nehwî jî nîne. Ji xweyê Keşşafê jî neqil bûye ku em ê carr û mecrûr bi tewîlê, bikin mubteda.[2] Û gora wê ya hatiye gotin ne muhtacê tewîlê ye jî.

Bizane ku gotina vê ristê li vêderê ji ber pirsiyarekî ye ku çêdibe bêt kirin ew jî ev e ku: Eger bawerdar li bal Xwedê evqas qîmet jê ra heye, nexwe çima feqîr û jar dibe. Eger dinya na qabil e, nexwe çima hinek ewqas dewlemend dibin. Vêca cewab didê ku halatê evdan û ehwalê dilê wan ne wekyek e: Hinek ji wan ji feqîriyê pê ve tiştek ewan durist nake, vêca ji duristiya wan ra ez wan feqîr dikim. Hinek jî çara duristkirina wan hema tenê bi rêka dewlemendiyê ye û ez mal û serwetê didim wan. Û ev herdu jî ji kerema Xwedayê Teala ye digel bawerdar û jê ra qedr û qîmet e li bargaha qudsa îlahî da.

Gotina rista: «Qasê ebd bi ferzan nêzîkê min dibe, bi tiştek dî nêzîk nabe. Bi sunetan jî ewqas nêzîkê min dibe heta ez hejê dikim...», behsa qurba bawerdarên kummel e; heçweku ji despêka hedîsê bi vî awayî behsa bawerdaran kiriye: Ewil halê giştê muminan got ku her kes ewê kêm bike ew hatiye şerê min, di pey ra bawerdar kirine du qisim û belkî gora çûna ehlê marîfetê, kirine sê qisim:

Yek giştî ya bawerdaran, ji «ma tereddettu fî emr - qasî ez li mirandina mumin da terdîd dikim» heta «ma yeteqerrebu îleyye

---

1- Beqere / 8: Hinek ji xelkê dibêjin me îman aniye bi Xwedê û roja axiretê, halhale îman neanîne.

2- Tefsîra ayeta 8 ya Beqere, Tefsîra Keşşaf, c. 1, p. 167

- bi tiştek dî nêzîk nabe», behsa wa ye. Ji ber ku ji mirinê hez nakin, feqîrî û dewlemendî eserê di dilê wan da datîne, ev du xasiyet ne der heqê bawerdarên bilind mertebe da ne, belkî der heqê bawerdarên me'mûlî da ne. Vê gorê işkal nayê ser eşkereyê hedîsê û dijatî nîne gel vê yekê ku hedîs dibêje bawerdarê xalis ji mirinê nakirihîne, heta ku em muhtac bin ji bo cewaba Muheqiqê Behaî ku ji Şêxê Şehîd gêrayî (Xwedê ji herduyê wan razî be). Yê bixwaze bila binhêre "Erbeîna Behaî".

Paşê behsa halê bawerdarên derecebilind kiriye, ji: «ma yeteqerrebul ebd...» heta dûmahîka hedîsê. Ev ristên he li bal ehlê marîfetê der heqê du bira da ye: Yek ew ên bi ferzan nêzîk bûyîn. Bira dî ew in yên bi nafile û sunetan nêzîk bûyîn, ku biniya hedîsê der heqê wan da ye. Em ê behsa herdu meqaman jî bikin înşaallah.

Cewherî, «betş», bi girtina bizehmet me'ne kiriye, lê li vêderê ji hemû awayên girtinê ra bi kar hatiye û belkî ji xwe isti'mala mute'aref jî hema ew be.

## Tenbîh

Şêx Behaiyê rehmetî dibêje ev hedîsek durist û meşhûr e di nav herdu firqan da. Ehlê sunet ew di kitêbên xwe yên sehîh da bi ferqek kêm neqil kirine û di pey ra jî evê hedîsê ji sehîhên wan neqil dike. Di haşiya Erbeînê da jî gotiye: Kelîma «'idde» ku di seneda hedîsê da hatiye, yek ji wan Alî bin Îbrahîm e, ji ber wê riwayet sehîh e û 'amme jî bi rêka sehîh ve gêrane û ev ji wan hedîsa ne ku ehlê Îslamê îtifaq li ser kirine.

### Vebir: Der heqê nisbetdana terdîdê bal Heq Teala ve

Me pêşda di şiroveya hinek hedîsan da behsa bêqîmetkirina bawerdaran kir[1] û êdî li vêderê ne muhtacê ducar kirinê ye û em ê ji hinek ristên dî yên hedîsê biaxivin.

1- Hedîsa 19

Bizane tereduda ku li vêderê nisbeta wê hatiye dayîn bal Xwedê ve, her weha hinek tiştên dî ku di hedîsa û kitaba hekîm a îlahî da nisbeta wan bal Xwedê ve hatiye dayîn, wek «beda» û «îmtihan»ê, aliman têda melheze kirine û heryekî gora meslek û rêka xwe me'ne û tewîlek lê dane. Şêxê giranqedr rehmetiyê Behaî di kitêba Erbeîn da sê me'ne anîne ku bi kurtî em ê jê biaxivin:

Ya ewil; ew e ku idmarek di xeberdanê da heye, yanî: Eger tereddud ji min ra caiz be.

Ya duwê; ev ku: Çiko xelk ber kirhandina mirovên biqedr dikevin û ber kirhandina yên dî nakevin, çêdibe ku bi awayê isti'are şûna qîmetdanê da bi kar bibin. Û mexsed ew e ku tu mexlûqek qasî bawerdar bal min biqedr û hurmet nîne.

Ya sisê; çawa ku di hedîsê da hatiye, Heq Teala bi awayekî mizgîniyê dide bendeyê xwe yê bawerdar yê li ber mirinê da ku nexweşiya mirinê jê bibe û dilê wî bifirije sekingeha wî. Vêca ev hal teşbiye kiriye bi halê kesekî ku dixwaze dostê xwe bişîne bi êşanekî ku di pey ra feydeyek pir zehf bidiyê. Vêca ew dikeve terdîdê ku bi çi awayî êşa wî kêmtir bike, vêca daim şahî û xweşiyê jê ra çêdike, heta ew wê êşê ji xwe ra qebûl bike.

## Me'na îrfanî

Lê rêçka hekîm û arifan di vê meselê û meselên wek vê da tiştek dî ye. Lê çiko ji fêhmê dûr e, em berfireh jê xeber nadin û desta ji pêşekiyan bikêşin û qasê fêhma wê rehetir bêjin.

Gereke bêt zanîn ku hemû mertebên wucûdê; ji bilindahiya melekût û xilaseka ceberûtê bigire heta biniya binê alema tarî ya heyûla. Mezahirê cemal û celala Heq û meratibê tecelliyatê rubûbî ye û qet tu tiştî serxwebûn û îstiqlalek ji xwe nîne û hema feqr bi xwe ne û guhdarê destûrên Xwedê Teala ne. Çawa ku gelek ayetên Quranê îşare dikin bal vê gotinê ve: «We ma remeyte iz remeyt...» «Dema te avêt, ne te avêt, belkî Xwedê avêt»

(Enfal/17). Ev îsbat û nefiy îşare ye bal mesela «emrun beynel emreyn» ve, yanî te avêt, lê te ew ne bi xwe avêt; belkî ew avêtin bi zuhûra qudret a Xwedê bû di neynika te da û bi esera qudret a wî bû di mulk û melekûtê te da. Nexwe tu avêjer bû lê di wî halî da jî avêjer Heq Teala bû. Wek vê ye ewa di sûretê mubarekê Kehf (ayetên 79-82) di behsa hezretê Mûsa (a.s) da hatiye ku hezretê Xizir (a.s) behsa remz û razên karê xwe dike: Di behsa kêmasiyê da nisbeta wê didê bal xwe ve û di behsa kemalê da nisbeta wê didê bal Xwedê ve û di cihê dî da herdu nisbet sabit kirin. Carekî got: Eredtu - min xwest. Carekî got: Erade rebbuk - Xwedayê te xwest. Carekî jî got: Eredna - me xwest. Û hemû jî durist bûn.[1]

Ji wan ayeta ye: «Di demê mirinê da Xwedê ruh û cana digire».[2] Halhale melekê mewtê memûrê mirandinê ye. Xwedê ye hîdayetker û windaker: «Yudillu men yeşau we yehdî men yeşa».[3] Halhale Cebraîl (a.s) hadî ye û Resûlê Ekrem (s.a.a) hadî ye: «Înnema ente munzirun we li kulli qewmin had».[4] Û şeytan e ku li rê winda dike. Her weha pifkirina Xwedê Teala di sûra Îsrafîl da.

Bi nêrînekî Îsrafîl û Ezraîl û Cebraîl û Muhemmed (s.a.a) û pêxemberên dî û hemû alema heyînê, ma di beranberê mulkê melkê alel itlaq da, ji xwe çi ne ku tiştek bal wan ve bêt nisbet dan? Pêkve mezherê qudret û îrada Heq Teala ne: «Ew e Xwedê di ezmana da û ew e Xwedê di erdê da».[5] Lê bi nêrînek dî û ew nêrîna zêdahî «kesret» û berêxwedana esbab û musebebata ye, esbab hemû di cihê xwe da durist in û ji xwe sîstema kamil ew e ku bi tertîb û rêzbûna esbab û musebebatan rê bikeve û îdare bibe. Eger mirov sebebekî rakê wê daira wucûdê bisekine; eger bi wesîlên hatine danîn hadis bi sabit ve negirêdayî be, wê dan û

---

1- Kehf / 79-82: Emmaus sefîne fekanet li mesakîne...

2- Zumer / 42

3- Nehl / 93

4- Re'd / 7: Tu tirsîner î û ji her komekî ra hidayetkerek heye.

5- Zuxruf / 84

rehmeta Heq bêt vegirtin. Û eger kesek bi binyat û pêşekiyan evê îmanê îdrak bike û bigehîne dil, wê derî lê vebin û pê bihese ku li merhela tehqîqa îrfanî da ev nisbet hemû durist in û qet mecaz têda nîne. Çiko melaîketên berpirsiyarê girtina ruhê bawerdaran merteba bawerdaran li bal Xwedê Teala dibînin, ji aliyê dî ve jî neheziya bawerdaran dibînin, dikevin terdîd û tezelzulê û hema ev haletê wa ye ku Xwedê Teala nisbet didê bal xwe ve. Çawa ku eslê mirandin û hîdayet û windakirinê nisbet daye bal xwe ve. Gora rêçka îrfanî, ka çawa ew durist in, ev jî durist e. Lê fêhma evê yekê niyaz heye bi letafet û zewqa salim.

Em vê jî bêjin, çiko heqîqeta wucûd ‘eynê heqîqeta kemal û ‘eynê temam e û nisbeta neqayis [kêmasî] û qebayhan [kirêtî] nayê dayîn bal Heq Teala ve û ne mec'ûl e -çawa ku di cihê wê da delîl jê ra anîne- ji vî cihetî ve çiqas feyz ji ufuqa kemalê ra nêzîktir be û ji zeîfî û sistiyê dûrtir be, girêdana wê bi Heq ve temamtir û nisbeta wê bi zatê muqedes ve duristir e. Vêca bervajiyê wê, heçî ya zulmeta te’eyyun û neyînê têda xurt be û sînor û kêmasiya wê zêdetir bin, rebt û girêdan naqis û nisbet dûr dibe. Ji ber vê ye ku di zimanê şerî’etê da pirtir nisbeta karên îbtida'î bal Heq Teala ve hatine dayîn û kêmtir karên nû peyda bûyên mulkî hatine nisbetdan bal wî ve. Û eger çav vebin û dil hişyar bibin, kirêt û sipehî ji hev bên qetandin, hingê çêdibe bêt fêhmê ku di gel wê yekê, alem tecelliya fiîlî ya Heq Teala ye û nisbeta wê bal wî ve tê dayîn. Hemû fiîlên wî cemîl û kamil in û qet çi kêmasî û kirêtî nayên nisbet dan bal wî ve. Întisaba bil‘erez ku li ser zimanê hekîman (r.a) herikiye di despêka hînbûnê û di hikmeta şayi’e da ye. Û di vî meqamî da hinek xeletî hene ku xebernedana ji wan baştir e.

Mexsed ji beyana vê nuktê cara ewil ji ber vê ye ku hinek tuhmên xirab ku çêdibe ji hinek nezana di vî meqamî da bêt kirin, rabin.

Ya duwê jî, me xwest ev nukte ronahî bibe ku terdîd û tewecuhên dewa'iyan ku ji hinek melekûtiyan çêdibin, nisbeta wan bal Heq

ve temamtir e ji wan tiştên di vê alemê da diqewimin.

Ya sisê; mirovê heqîqetzan gereke kemal û neqsê di van terdîd û tewecuha dewa'iyan da ji hev biqetîne û aliyê kemalê nisbet bide bal Heq Teala ve û aliyê neqs û kêmasiyê jê selb bike.

### Tetmîm: Me'neyek dî ji hedîsa terdîdê

Li vêderê me'neyek dî ji hedîsa şerîf ra heye ku ji mêjve gihaye fikra min a kurt. Ew jî ev e ku bendeyên Xwedê, an arif û ewliya ne û di bizava xwe ya Xwedêyî da di nav ehlê dilan da ne. Û ev bir ji bendeyên Xwedê meczûbê Heq Teala ne û qibla tewecuha amalên wan zatê muqedesê Heq Teala ye. Û ji wî pê ve berê wan ne li tu alemekî ye û heta li xwe û kemala xwe jî nanhêrin.

An jî ew in ku mijûlê xemla dinyayê ne û noqî bûne di huba mal û meqam da û berê dilê wan li wa ye û qet berê wan ne li alema quds û civata unsê ye. «Hum mulhidûne fî esmaillah».[1]

Desta sisê jî, bawerdar in ku ew bi hesebê nûra îmanê berê wan li alema qudsê ye û bi hesebê nêrîna wan li vê alemê jî ji mirinê nexweş in. Û Xwedê Teala bi kelîma «terdîd» ji vê rakêşana mulkî, melekûtî, îlahî, xelqî, axretî û dinyayî xeber daye, çawa ku di terdîdê da rakêşan ji herdu aliyan ra heye; heçweku kerem kiribe: Di çi tiştekî da wek ebdê bawerdar, ev tecazub û rakêşana mulkî û melekûtî nîne. Ji aliyekî ve ji ber nêrîna wî li alema mulk, kerbê wî ji mirinê tê, ji aliyê dî ve cezeba îlahî ewî bi aliyê xwe ve radikêşe, da wî bigehîne kemala wî. Nexwe Heq Teala nexweşiya wî lê nexweş e ku rêketî ye di gel mana wî di alema mulkê da, ewî bi xwe jî vêca mirin lê nexweş e. Lê xelkên dî ne wereng in, çiko ewliya cazba mulkî nînin û noqî bûyên di dinyayê da jî vêca cezeba melekûtî nînin. Û nisbeta vê tecazubê ji Xwedê ra hema ew e ku di me'neya pêş vê da hat gotin. Vê der heqê da lêkolê

---

1- Ew in ku pişt dane navên Xweda.

mezin seyyidê giranqedr Damad û feqiyê wî[1] hinek tehqîq û lêkolîn hene ku xeberdana ji wan, kelam dirêj dike.

**Vebir: Xwedê bi neyîn û heyînê bawerdaran durist dike**

Eva he ku di hedîsê da gotî, hinek ji bende yên min bi feqîriyê û hinek bi dewlemendiyê durist dibin, nîşan dide ku Xwedê çi bide, dewlemendî an feqîrî, silametî an nexweşî, emniyet an tirs... Ji wî qasî ra ye ku wez' û halê bawerdar û muminan durist bike û dilê wan xalis bike. Her weha evê hedîsê dijatî nîne gel wan hedîsan ku dibêjin: «Mirovê bawerdar pir bela, nexweşî, kul, derd û feqîrî serda tên». Çiko Heq Teala wek doktorek dermanker, her kesî bi awayekî ji dinyayê paşda dide. Carna mal dide hinekan, lê bi hesebê zeîfî, kemal û neqsa îmana wî, belayên dî didiyê. Û belkî serwet û dewlemendiyê wereng jê ra tevlî bela dike, ku ewî ji hezkirina dinyayê biazirîne. Ev mirovê he wereng e ku eger ewî feqîr bike, ji ber ku belkî bexteweriyê di mal û minalan da dibîne û ehlê dinyayê bextewer dibîne, berê wî bikeve dinyayê û bi dest ve anîna wê ve mijûl bibe û li helakê biçe û bibe bextreşek ebedî. Lê dema mal dayê û di wê halî da jî ew jê ra tevlî bela û nexweşî kir, hingê berê wî jê dizivire. Yekî ji seydayên me yên giranqedr digota: Çendjinî [zewcîna digel çend jinan] ku mirov goman dike ketina nav dinyayê ra ye, dema mirov tê dikeve, pê dihese digel wê yekê ku ketina nav dinyayê ra ye, lê di wî halî da deranîn û ber zivirandina ji dinyayê ye jî.

Nexwe Xwedê Teala carna bi feqîriyê, bawerdaran durist dike û berê wan ji dinyayê dizivirîne û dilê wan xweş dike. Carna jî bi serwet û mal, ewan pê ve dike; digel wê yekê ku mirov goman dike di xweşiyê da ne, lê di nav bela û musîbetê da ne. Digel vê jî dijatî nîne ku feqîrên musilmana li bal Xwedê biqedrtir bin, çawa ku ji riwayetan tê fêhmê. Û me hinekî vê der heqê da di şiroveya hinek hedîsên borî da axift.[2]

---

1- Seyda Mîrdamad e û feqî jî Molla Sedra.

2- Hedîsa 15-ê.

**Vebir: Nêzîk kirina ferz, sunetan û desthata wê**

Bi hesebê terîqa ehlê zewq û sulûkê

Bizane ku seferek ruhanî û sulûkek îrfanî heye ji salikê ilellah û koçerê beyta tarî ya nefsê bi aliyê ke'be ya heqîqî ve. Destpêka wê rêkê, mala nefsê û enaniyetê ye; menazilên wê, meratibê te'eyyunatê afaqî û enfusî, mulkî û melekûtî ne, ku ji wan ra tê gotin «hicabên nûraniye yên zulmaniye». Yanî enwarê wucûd û zulmeta te'eyyunê; an enwarê melekût û zulmeta mulk; an ednasê zulmaniye yên te'elluqatên nefsaniye û enwarê pakên te'elluqatên qelbî. Û ji van heftêh hezar hicabên nûrî û zulmanî carna bi awayê cem', tabîr bûye bi heft hicaban; çawa ku der heqê tekbîrên destpêka nimêjê da ji îmaman neqil bûye ku: «Ji xerqa her hicabekî ra tekbîrek gotine». Û di behsa secda ser axa Husêynî da (rih û canê min fedayê wî be) hatiye ku: «Heft hicaban radike». Û arifê meşhûr dibêje:

'Ettar li heft bajarê eşqê geriya

Lê hêj em di astenga kolanekî da ne.[3]

Evan hicaban, der heqê mirov da bi «letayifê seb'e» hatine tabîr kirin[4] û carna jimara wan gihandine sê hicabên kullî[5] di afaqa da bi «'ewalimê sêyane»[6] û di enfusan da bi «meratibê sêyane»[7] tabîr bûne. Carna bi awayê navincî bi hezar menzilên me'rûf li

3- Ev şiîr mensûbê Mewlewî ye, lê hineka gotine ji Abdurrehmanê Camî ye.

4- Rehmetîyê Şahabadî heft letîfên wucûda ademî weha jimartine: Nefs, aqil, ruh, sir, xefî, exfa. Reşehatul Bihar, p. 177

5- Mexsed hicaba ayat û esma û sifeta ye.

6- Ewalimê sêyane ev in: Alema tebî'et, alema misal, alema aqil. Molla Sedra vebirîna li ser sê aleman evê zanê ku mewcûd sê qisim e: Mehsûs, mutexeyyil, maqûl. Şewahidur Rubûbiyye, p. 320

7- Îşare ye bal merteba zahirê nefsê ve ku merteba eşkere bûna nefsê ye di bedenê da û merteba berzexa nefsê ku merteba tecerruda misalî û quwayê batinî ye, û merteba aqil ku tecerruda kamil e.

bal sayirîn û bi îtibarekî bi sed menzil û bi îtibarekî bi deh menzilan teqsîm kirine.[1] Şêxê me yê arifê kamil Şahabadî ji her menzileka sayirîna ra deh beyt datanîna, bi awayek nû ku ser hev dibûna hezar beyt. Hezretê Îbrahîmê Xelîl (a.s) di wê seyra ruhanî da ku Heq Teala jê dibêje, menazil bi sê meqaman tabîr kiriye; ji yekî ra gotiye «kewkeb» ji ya dî ra «qemer - heyv» û ji ya dîtir ra jî «şems - roj» gotiye.[2]

Welhasil, destpêka sefera ruhanî, mala tarî ya nefsê ye û menzil û sekingehên wê, merahil û meratibê afaq û enfusa ye. Û di ewilîkê da ji însanê kamil ra xayet û xilaseka wê, zatê muqedesê Heq Teala bi hemû esma û sifetên wî ve ye û esma û sifet têda heliyayî, di xilasekê da. Û ismî û sifetî û te'eyyunî ye ji esma û sifet û te'eyyunatan, ji xêncî wî ra.

Vêca piştî ku mirovê salik eniyet û enaniyeta xwe binpî kir û ji vê beytê derket û ket pey mexseda eslî û menazil, merahilê te'eyyunatan borandin û jê derbas bû û hicabên zulmanî û nûranî şeq kirin û dil ji hemû mewcûd û kainatan hilkir û pût ji dil deranîn û kewakib, eqmar û şumûs ji dilê wî daketin û berê dilê wî yekalî û yekcihet, bê qirêja girêdanên dî, bû Xwedêyî û wez' û halê dilê wî bû: «Weccehtu wechiye lillezî feteres semawati wel erd»[3] û di esma û sifetan da fanî bû, vêca hingê ji hal diçe û mehwa kullî jê ra peyda dibe û se'qa mutleq çêdibe. Vêca Heq di wucûda wî da kartêker dibe û bi sem'/guhê Heq dibihîze û bi beser/çavê Heq

---

1- Menazilus Sairîn.

2- Ayetên 76-78 ji sûretê mubarekê En'am weha dibêjin: Vêca dema şevê perde avêt ser, stêrek dît, got: Ev e Xwedayê min. Vêca dema awa bû (çû xwarê), got: Ez hej tiştên awa dibin (winda dibin, diçin xwarê) nakim. * Dema vêca heyv di halê derketinê da dît, got: Ev e Xwedayê min. Vêca dema awa bû, got: Bi yeqîn, eger Xwedayê min rêka durist nîşa min neke, muheqqeq ez ê bibim ji qewmê zalim. * Dema vêca roja ronahî dît, got: Ev e Xwedayê min; eva he mezintir e. Vêca dema awa bû, got: Ey qewmê min, ez dûr im ji wê ya hûn dikin şirîk [ji Xweda ra].

3- En'am / 80: Ez berê xwe didim wî yê ezman û erd çêkirîn.

dibîne û bi yed/destê qudreta Heq digire û bi lisan/zimanê Heq diaxive û bi Heq dibîne û ji Heq pê ve nabîne û bi Heq diaxive û ji Heq pê ve naxive. Xêncî ji Heq ra ker û lal dibe û çav û guhê wî ji Heq pê ve venabe. Ev meqam, xêncî bi cezeba îlahî û cezwe ya nar û agirê eşqê nayê dest û pê vê cezwe ya evîndariyê berdewam nêzîkê Heq dibe û pê wê cezbeya rubûbî ku di pey huba zatî ra ye, destê wî tê girtin ku di vê dûla heyret û şaşiyê da neşimite, netehise, nekeve belaya «şeth»ê ku şûnewarê enaniyetê ye. Di vê hedîsa şerîf da îşare bûye bi van herdukan pê rista: «Bi sunetan jî ewqas nêzîkê min dibe heta ez hejê dikim». Nêzîkiya ebd bi cezweya eşqê ye û cezebeya îlahî ya Heq jî ji hubê ye.

Heta ji aliyê me'şûq ve kêşanek nebe * Xebata aşiqê belengaz netîce nade.[1]

Nexwe xilaseka nêzîkî ya newafilan fenaya kullî û helhana mutleq û xebata tamm û temam e û desthata wê jî ev e ku: Ez dibim guhê wî yê pê dibihîze... Piştî vê fenaya tamm û mehwa kullî û mehqa mutleq û se'qa temam, carna we heye înayeta ezeliye ewî li ber xwe bigire û ew bizivire ser halê xwe û li memleketê xwe bizivire û jê ra haletê «sehw-صحو »ê be pêş û haletê uns û bêhnfirehiyê jê ra çêbe û subûhatên celal û cemalê li ber wî vebin û di vî halê sehwê da di neynika zat da, sifetan û di wan da jî e'yanên sabit û lewazimên wan keşif bike. Halê ehlê sulûkê di vî meqamî da jî wek meqamê ewil e di vê yekê da ku 'eynê wî yê sabit tabi'ê her ismekî ye, hema di wî ismî da fanî dibe û dimîne ser wî navî. Û di halê sehwê da jî hema ew ism jê ra keşif dibe û 'eynê sabitê tabi'ê wî ismî jê ra keşif dibe.

## Sirra ne wekyekbûna pêxemberiya pêxemberan

Bin ismê cami'ê e'zem da, e'yanê sabit û lewazimê ezelî û ebedî yê wan ji însanê kamil ra bi awayek mutleq keşif dibe, her weha halat û îstidada mewcûdan û çawaniya sulûk û rêka gihana wan

1- Emsal û Hikem; Dehxuda, c. 1, p. 537

ji wî ra kifiş dibe û xel'etê xatemiyet û nubûweta xetmî, ku netîca keşfa mutleq e, bi kêr bejn û bala wî tê. Û pêxemberên dî, heryek bi munasebeta wî navê ku jê ra mezher in û qasî berfirehiya dorûberê wê, e'yanên tabi'ê wî navî keşif dikin. Û deriyê kemal û neqs û eşrefiyet... û firehî û tengî ya daira de'wetê ji wêderê dest pê dike û li tebe'iyeta esmaê îlahiye dizivirin. Çawa ku me berfireh ji wê axiftiye di risaleya Misbahul Hidayetê da.(1)

Welhasil, piştî vî halî ku sehwa piştî mehwê çêbû, wucûda wî dibe wucûda heqanî û Heq Teala, û di neynika cemala wî da mewcûdên dî muşahide dike û belkî dibe hevrêzê meşiyetê. Û eger însanê kamil be, digel meşiyeta mutleqe hevrêz dibe û ruhaniyeta wî dibe 'eynê meqamê zuhûra fiîlî ya Heq; di vî halî da Heq Teala bi wî dibine, dibihîze, digire û hingê hema ew bi xwe ye îrada nafiza Heq û meşiyeta kamil û ilmê fiîlî... Nexwe qurba ferzan, sahwa be'del mehw e [sahwa piştî mehw e], desthata wê jî ew e ku te dît û bihîst.

Gereke bêt zanîn ku ev sehw û zivirîna li zêdahiyê, jê ra «qurb» tê gotin; çiko ev sahwa piştî mehwê, ne ev haletê xeflet û bêxeberiya me ye. Ev ketina di zêdahiyê da, piştî fenaya temam, ne ev zêdahî ye ku em têda ne. Çiko zêdahî hicab e ji me ra ji wechê Heq, lê ji wan ra mir'ata muşahidê ye. «Ma reeytu şeyen îlla we reeytullahe me'ehu we fîhî we qeblehu we be'deh».(2) Mirov dikare qurba newafilan fenaya esmaî û qurba ferzan jî fenaya zatî hesab bike; vê gotê netîca qurba ferzan, dibe mehwa mutleq.

Xeberdana zêdetir vê der heqê da ne munasibê vî meqamî ye û ev qasê hatiye gotin jî, ne gora van kaxizan bû.

#### Vebir: Gêrana kelamê Şêx Behaî yê giranqedr

Giranqedrê arif, Behaî (r.a) di kitêba Erbeînê da di bin vê hedîsa şerîf da dibêje: «Ji bona ehlê dil, di vî meqamî da hinek kelîmên

1- Pelê 192 - 195-ê.

2- Hedîsa 28-ê.

'aliye û îşaratên veşartî û halatên xweş hene ku ruhê wan xweşbêhn dike û can dide dil û ruhê wan. Û kes nagehê me'na wan û nikare bi heqîqeta wan bizane, xêncî ew kesê ku xwe ji riyazet û mucahidatên sehl û sivik dûr bigire heta qurtek ji şeraba wan kelîman vexwe û xwe bigehîne mexseda wan. Lêbelê ew kesê ji veşartiyên wan bêxeber û ji mucewherat û xemlên wan mehrûm e û bi noqîbûna di xweşiyên nefsaniye yê dinyayî, mijûl bûye bi xweşî û lezetên bedenî, ew ji bihîstin û pê hesîna wan kelîmatan di tehlûkê da ye û tirsa vê heye ku ew berew ilhadê ve biçe û di dilê wî da şik û dudilî û tewehumê can bigire; Xwedê Teala mezintir û her mezintir e ji wan tiştan. Em ê li vê meqamê da bi awayek hêsan û bê dirêjkirin ku her kes jê fêhm bike, biaxivin heta nêzîkê fêhman bibe. Vêca em vê dibêjin ku ew kelam, mubalexe ye di qurb û nêzîkiyê, desthelatî ya sultanê muhebetê [hezretê Heq Teala (c.c)] ye li ser zahir û batinê ebd û bendan û li ser xef û eşkereyê wî. Nexwe mexsed ev e -wellahu e'lem / Xwedê her zanatir e-: Dema ez hej ebd bikim ez ê wî bikêşim bi aliyê unsê ve û berê wî bidim alema quds û fikra wî di esrarê melekûtê da bikim xwar. Û hewasê wî mijûlê enwarê ceberûtê bikim, vêca ez ê wî di vî halî qurb û nêzîkiyê da sabit bihêlim. Muhebet wê tevlî goşt û xwîna wî bibe heta ku ji xwe dûr bikeve û ji hisa xwe bêxeber bibe. Vêca exyar ji ber wî winda bibin, heta ku ez bikevim şûna çav û guhê wî da. Çawa gotin:

"Ez dîwane û dînê te me û ev ne penî ye * Agirê dil ku min ji te heye, natemire * Vêca tu yî guh û çav * Û her endam û dilê min". Kelamê Şêx xilas bû; Xwedê meqamê wî bilind bike.

### Kelamê Muheqiqê Tûsî

Cenabê Xace Nesîrê Tûsî (q.s) kerem dike: «Dema arif ji xwe tê birîn û bi Heq ve tê girêdan, hemû karîn û qudretan di qudreta Heq da dibîne û hemû zanînan di zanîna Heq da dibîne û hemû biryar û îradan di biryara Heq da dibine. Vêca her tiştî û kemala wan ji aliyê wî ve dibîne, vêca hingê ye ku Heq Teala dibe guh,

çav, qudret, zanîn û wucûda wî, vêca di vî halî da arif dikeve ser exlaqêîlahî».[1]

Cenabê lêkol, Meclisî jî gotinek vê der heqê da heye. Gotina wî bi kurtî ev e: «Eger mirov hêz û qudreta xwe di rêka şehwet û şeytan da bi kar bir, ji xem û poşmaniyê pê ve tiştek ji wan namîne. Lê eger di rêka guhdana Xwedê da bi kar bir, Xwedê ewa dizivirîne ser quwetek ruhanî. Vêca guh û çavê wî dibin guh û çavên ruhanî û pê wî guhî wê kelamê melaîketan bibihîze. Û bi mirinê ew guh û çav êdî zeîf û lawaz nabin; di qebrê da pirsiyar û cewab bi wa ye. Di qiyametê da jî hema guh û çavên wî ev guh û çavên ruhanî ne, lê ew ên ev çav û guhên ruhanî neyîn, kor û ker tên ber heşrê. Ji ber vê hediya îlahî ye ku dibêje: "Ez guhê wî me, yê pê dibihîze..."»

## Tetimme

Şêxê Behaî dibêje: "Ev hedîs delalet dike ku ferz ser sunetan ra ne". Ewî her weha hedîsa ku dibêje: Naferz, ne ser ferza ra ye"; ji xwe ra nekiriye delîl ku ferz seratir in ji naferzan, çiko çêdibe beranber bin. Lê cihê gotinê ye ku xeberdana bi vî awayî di piraniya zemana da seratiyê nîşan dide. Şêxê Şehîd (r.a) hinek mesele jê deranîne: Yek jê, lêborîna deyn e ku ji muhlet danê xêrtir e, halhale ya yekê sunet e û ya duwê ferz e. Ya dî destpêkirina selamê ku xêrtir e ji cewabdanê. Ya sisê dubarekirina nimêja ne bi cemaet e bi nimêja bi cemaet... Hineka di hemûya da jî munaqişe kirine ku xeberdana ji wê ewqas ne lazim e. Gereke bêt zanîn ku eşkereyê hedîsa şerîf nîşan dide ku, ferz ji sunetan xêrtir in her çend ne ji sinxê hev bin. Mesela: Cewaba selamê xêrtir e ji heca sunet û avakirina medreseyek mezin û ziyareta Resûlê Xwedê (s.a.a). Her çend ev hinekî dûrê ji melhezê ye û ji ber vê ye ku rehmetiyê Meclisî gotiye: «Weheye ev der heqê wan tiştan da be ku ji cinsê hev bin»; lê piştî ku delîl heye, mirov ji ber dûriya ji

---

1- Şerha Îşarat, c. 3, p. 389

melhezê nikare ewê bêje. Her çend cihê teemul û têfikirînê ye, lê çêdibe bêt gotin ku mexsed ji ferzan, ferzên teebudî yên xalis û xwerî ne, wek: Nimêj, rojî, hec û zekatê... Naferzên dî wek: Muhletdana ji kesê ku neyê deynê xwe bide û cewaba selamê... «Di hemû hala da hemd ji Xwedê ra ye».

## HEDÎSA SÎ Û PÊNCÊ

بالسّند المتّصل إلى عماد الإسلام و المسلمين، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، رضوان الله عليه، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد، عن أحمد [بن محمّد] بن أبى نصر، قال، قال أبو الحسن الرّضا، عليه السّلام:

**«قال الله: يا ابنَ آدمَ، بمشيئتى كنتَ أنتَ الّذى تشاءُ لنفسِكَ ما تَشاءُ، و بقوّتى أَدَّيتَ فَرائضى، و بِنعمَتى قَويتَ علي معصيتى. جَعَلْتُكَ سَميعا بَصيرا قَوِيّا، ما أصابَك مِن حَسَنَةٍ فَمِنَ الله، و ما أصابَك مِنْ سَيِّئَةٍ فَمِنْ نَفْسِكَ. و ذلك أنّى أَوْلى بِحَسَناتِك منك، و أنت أولى بسَيِّئاتِك منّى. و ذاك أنّنى لا أُسْأَلُ عَمّا أَفْعَلُ و هُمْ يُسْأَلُونَ.»**

Hezretê Riza (a.s) dibêje: «Xwedê kerem kiriye: Ey benî Adem, bi xwesta min e ku ya te divê tu ji xwe ra dixwazî; pê wê quweta min dayî te, tu ferzan bi cih tînî. Û pê qencıya min li te kiriye ku, tu ji bê emriya min ra xurt bûyî. Min tu bihîzer, bîna û xurt kirî; heçî başiya bigehê te, ew ji Xwedê ye û heçî xirabiya bigehê te, ew ji te bi xwe ye. Eva he ji ber wê ye ku ez ji xêrên te ra ji te bi xwe heqtir im; tu jî ji nebaşiyên xwe ra heqtir î. Ev jî ji ber wê ye ku ez ji ber kirinên xwe ve ne berpirsiyar im, lê ew [benî Adem], berpirsiyarin».[1]

### Şîrove:

Ev hedîsa şerîf behsa tiştên pir muhim dike û eger em ji hemûya biaxivin, em ê ji behsa xwe dûr bikevin. Ji ber wê em ê awayê na-

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 152, behsa "Tewhîd"ê, b. "Meşiyyet û Îrade", h. 6-ê.

vincî bigirin ber xwe û hinek ji wan meselan di çend vebiran da jê xeber bidin. Û em pişta xwe bi Xwedê girê didin.

**Vebir: Du meqam ji navên Xwedê ra hene**

Bizane ne ji meşiyeta Heq Teala tenê ra, belkî ji hemû nav û sifetên wî ra wek ilm û jiyan û qudret... Du meqam hene:

Yek meqamê esma û sifetên zatî ye; evê yekê burhan jê ra heye ku zatê muqedesê wacibul wucûd ji heysa wahid e û cihetê besîte ya hemû kemalatan û mustecme'ê hemû esma û sifeta ye. Û cemî'ê kemalat, esma û sifetên cemal û celalê li aliyê besîte ya wucûdiye dizivirin û her çi xêncî ji wucûdê ye, neqs û kêmasî û nebûn e. Û çiko zatê muqedes sirful wucûd û wucûda sirf e û sirful kemal û kemala sirf e. Nexwe hema pêkve ilm e û pêkve qudret e û pêkve jiyan e.

Ya dî esma û sifetên fiîliye ne; ku meqamê zuhûra esma û sifetên zatiye û merteba tecellî ya cemal û celalê ye, ev meqam meqamê «me'iyyet û qeyyûmiyye” ye: «Ew gel hewe ye» (Hedîd / 4) , «Sê kes xef xeber nadin, îlla ku Xwedê çaremînê wa ye» (Mucadile / 7) û meqamê wechullah e: «Hûn ku ve binhêrin, hema ewder wechê Xwedê ye» (Beqere/115) û meqamê nûraniyetê ye: «Xwedê ronahiya ezmana û erdê ye»[1] û meqamê meşiyeta mutleqe ye: «Xêncî ji ya Xwedê dixwaze, hûn nikarin bixwazin».[2] Xwedê, tiştan bi meşiyetê afirandin û meşiyet, bi meşiyetê.[3] Ji wê ra di zimanê Xwedêyiyan da hinek îstilah û navên dî jî hene. Ayeta şerîfeya: «Ewil û axir, zahir û batin ew e»[4] bi awayekî bi herdu meqaman jî îşare hatiye kirin.

Welhasil, meqamê meşiyeta fiîliye ya mutleqe, bi awayê qeyûmî dagîrkerê hemû mewcûdên mulkî û melekûtî ye. Û mewcûdat

---

1- Nûr / 35

2- Însan / 30

3- Usûla Kafî, c. 1, p. 110

4- Hedîd / 3

hemû bi awayekî te’eyyunatên wê ne, bi awayekî jî mezahirê wê ne. Û bi hesebê vî meqamî, meşiyeta fiîliye, mezheriyet û fenabûna meşiyeta evdan di wê da, belkî jî mezheriyet û mir’atiyeta îbadan bi xwe û hemû tiştên bi wan ve girêdayî, di vê hedîsa şerîf da hatiye: «Ey benî Adem, bi meşiyeta min e ku tu bûyî ji meşiyetkeran; zatê te û kemala zatê te, bi ‘eynê meşiyeta min e; ne hema ev, belkî tu bi xwe û kemalatên te ji mezahir û te’eyyunatên meşiyeta min in»: «Dema te avêtî ne te avêt, belkî Xwedê avêt…»[1] Û ji vê gotina îrfanî ra pir şahid ji hedîs û ayetan hene, lê anîna wan ne lazim e.

Gora Şêxê giranqedr, Îşraqî ilmê tefsîlî yê Heq Teala der heqê tiştan da, hema ev meqamê ilmê fiîlî ye; Muheqiqê Tûsî jî di vê meselê da ketiye pey wî. Lê Sedrul Muteellihîn ilmê tefsîlî, hema meqamê zatê besît zane û bi gotina van du giranqedran, razî nebûye. Lê ez gora ronahîkirina ku namunasibê vî meqamî ye, kakilê xeberdana wan di yek tiştê da û xirecira wan lefzî û rûmetî zanim. Ji vê beyanê kifş bû ku çi tişta di darut tehequqê [cih û warê qewimînan] da çêbe, hemû, çi ji cewahirên qudsiye yên îlahiye an mulkiyeyê tebî'iye an e'raz, çi jî tiştên ji qismê ewsaf û kiryaran, pêkve bi qeyûmiyet û nufûza qudret û dagîrkirina hêza Heq Teala çêdibin û peyda dibin. Nexwe durist e ku: «Biquwwetî eddeyte feraizî». Hema ev meqamê meşiyeta mutleqe, meqamê rehmeta wasi’e û nîmeta cami’e ye, çawa ku dibêje: «Binîmetî qeweyte 'ela me'siyetî».

**Vebir: Îşare bal mesela cebr û tefwîzê ve**

Di vê hedîsa şerîf da îşareyek geş bi aliyê mesela cebr û tefwîzê ve kiriye û duristiya «emrê beynel emreyn û menzila beynel menzileteyn»ê, gora gotina ehlê marîfetê û ehlê dila ye. Çiko hem meşiyet û kirin, hêz û quwet ji bende ra îsbat kiriye, hem jî ew bi meşiyeta Xwedê ve girêdayî zaniye: «Te meşiyet kir, lê bi meşiye-

1- Enfal / 17

ta min meşiyeta te eşkere bûye; te ferzên min bi cih anîn, lê hêza te zuhûra hêza min e; û bi qenciya min ku merhemeta berfireh e, hêza te ya di guneh da destê te ket. Nexwe bi awayê giştî, ef'al û ewsaf û wucûdat ji te selb nabin û nayên şûştin, çawa ku bi awayek mutleq îsbat jî nabin; te meşiyet kir û meşiyeta te, fanî ye di meşiyeta min da û zuhûr û te’eyyuna wê ye. Û te bi hêz û quweta xwe ji guhdan û neguhdariyê ra karîn heye, lê di wî halî da jî quwet û qudreta te zuhûra qudret û quweta min e». Û piştî hingê çiko cihê vê gomanê hebû ku bihata gotin: Vê gorê nexwe gereke neqs û kêmasî û nebaşî û guneh jî bên nisbetdan bal Xwedê ve. Vêca bi awayek hekîmane delîl aniye û bi awayê îrfanî gotiye: “Çiko Heq Teala sirful kemal, xêr û cemal e, ji ber vê yekê ewa ji aliyê qudsa wî ve bêt, kemal û başî ye. Sîstema wucûd û heqîqeta hebûnê di xeyb û şuhûdê da ‘eynê kemalê û eslê temamiyet û cemal e. Û tişta ku kêmasî û nebaşî û xirabî bêt, dizivire bal ‘edem û te’eyyunê ve û ji lewazimên mahiyetê ye ku bi ce'l û dana Xwedê ve girêdayî nîne. Belkî ji xwe şurûrên di alema tebîet û neş’e ya mulk da hene ji ber dijatiya nav mewcûdan û tengiya dinyayê ye, dijatiya di nav wan da jî bi ce'lê ve negirêdayî ye.

Nexwe başî û kemalat, hesenat û qencî hemû ji Heq Teala ne, lê kêmasî û xirabî, neguhdarî û guneh ji xelkê ne. Çawa di ayetê da hatiye: «Ew başiya ser te da bêt, ji Xwedê ye û ew xirabiya ser te da bêt, ji te bi xwe ye». Nexwe hemû bextewerî yên dinyayî û axretî, hemû başiyên mulkî û melekûtî ji serkaniya başî û bexteweriyan hatiye dayîn; hemû bextreşiyên dinyayî û axretî û hemû xirabiyên vê alemê û alema dî jî ji texsîra zatî û kêmasî ya mewcûdan bi xwe ye. Eva he jî ku meşhûr e dibêjin: “Seadet û şeqawet ne muteeliqê ce'la cai'l e, belkî zatiya tişta ye”, der heqê seadeta bêkok da ye, çiko seadet ji aliyê Xwedê ve hatiye danîn, dayîn û seadet ji tu zat û mahiyetekî ra nîne, belkî xwerî helaket û şeqawetek temam li heysa mahiyetê dizivire. Û ji layê şeqawetê ve durist e, çiko şeqawet li mahiyetê dizivire û ne mec'ûl e, ji ber ku bin merteba ce'lê ra ye. Û ji hedîsa meşhûra: «Esseîd seîdûn fî

betni ummih we eşşeqî şeqiyyûn fî betni ummih»[1] ra me'neyek girêdayî bi esma û sifetan ve heye û behsa ji wê ne munasibê vêderê ye. Çiko piştî vê peyva heq û burhanî, şubheyek dî tê gomanê, ew jî ev e ku, ji layê başiyan ve jikarxistina mewcûdatan û ji aliyê xirabiyan ve jikarxistina qudreta qedîm ya Xwedê, dibe sebebê çêbûna cebr û tefwîzê. Ew jî xilafê mesleka îrfanî û rêka burhanî ye. Def'a vê işkalê di gotina borî da hat, bi vî awayî ye ku: Heq Teala ewla ye ji hesenatên evdan ra û ew jî ji xirabiyên xwe ra ewla ne ji zatê muqedesê Heq, ku di îsbata vê ewlewiyetê da îsbata nisbetdana bal du aliyan ve heye.

Beyana ewlewiyeta Xwedê ji evd, der heqê başiya da û nisbetdana eslê wê bal evdan ve ji ber wê ye ku, nisbeta başiya bal mebdeul mebadî ve nisbeta wucûd û bizzat e. Çiko başî, zatî yê wucûdê ye; ew di wacibul wucûd da ‘eynê zat e û di mumkinul wucûd da jî pê danîn û danê ye (ce'l û ifaze). Nexwe eslê dana başiyan ji Xwedê Teala ye, mir’at û neynika zuhûrê û cihê xuyakirina wê jî mexlûq e. Û ew nisbeta xweyhandin û danê, temamtir e ji vê nisbeta xweyhan û girtinê. Vêca di xirabî û nebaşiyan da bervajî ye, lêbelê herdu nisbet, di cih da ne; çiko ewa ji Xwedê tê dayîn, başî ne. Lazimê van başiyan jî, texellula nebaşiya ye bi awayê incirar û tebe'iyet, nexwe bil‘erez tê nisbetdan bal wî ve û bizzat ji nuqsaniya tiştan û kêmasiya mahiyeta ye. Çawa ku di ayeta şerîfe da bi du nêrîna ev du me'ne gotin: «Qul kullun min 'indillah» (Nisa/78). Û li wêderê ku texellula zêdahiyê bil‘erez dîtiye û wesîle qirar dane, kerem dike: «Ma esabeke min hesenetin fe minellah». (Nisa/78)

### Vebir: Xwedê ji ya dike ne berpirs e, yên dî berpirs in

Lêkolên felsefiyan dibêjin: Ji fiîla mutleq ya Heq ra xayet û xerezek ji zatê muqedes û tecelliyatên zatî yê wî pê ve nîne û çênabe ku zatê muqedes di çêkirina tişta da xêncî ji zatê xwe û ji zuhûr

---

1- Biharul Enwar, c. 5, p. 153: Bextewer ew e di zikê dayikê da bextewer be, bextreş jî di zikê dayikê da bextreş e.

û tecelliya zatê qudsê xwe pê ve, xayetek dî hebe. Çiko her failek ku bi mexsed û xayeta xeyrê zat, tiştekî çêke, ji çi mexsed û xayetê ra jî be, her çend ji feyde gihandin û xêrkirina gel yên dî be, an ji îbadet, marifet, pesindan û mehebetê ra be, mutekemilê bi wê ye û hebûna wê jê ra ji nebûnê baştir e. Lazimê vê jî neqs, kêmasî û feydebirin e, eva he jî ji zatê muqedesê kamilê alel itlaq û xenî yê bizzat û wacibê min cemî'il cihat ra mehal e û çênabe. Nexwe di kirinên wî da «limmiyyet» û pirsîna ji «limmiyyet»ê nîne: «La yus'elu 'emma yef'el...» (Enbiya/ 23). Lê mewcûdên dî di kirinên xwe da xêncî ji zatê xwe, mexsed û exrazên dî hene. Aşiqên cemala Heq û yên muqereb û meczûb, karê wan ji bona gihana dergahê Xwedê û liqaullahê ye. Û mewcûdên dî gora kemal û neqsa xwe xerez û mexsedên zêdeyê ji zatê xwe hene. Welhasil, kemala mutleq û wacibê bizzat, wacibê min cemî'il cihat e; çawa ku zatê muqedesê wî dûrê ji limmiyyetê ye, ef'al û kirinên wî jî dûr û berî ne ji limmiyyetê. Bervajiyê mewcûdên dî.

Her weha, çiko zatê wî yê muqedes, kamilê mutleq û cemîlê alel itlaq e, ke'ba amalên hemû mewcûdan û xayeta mexseda cemî'ê silsila kainatê ye. Ewî bi xwe jî ji xwe pê ve ke'ba amalan, xayet û mexsedek nîne, çiko mewcûdên dî naqisê bizzat in û her naqisek mehrûb 'enhu ye bilfitret, çawa ku her kamilek xweşdivê ye. Nexwe xilaseka hemû bizav û kirinan zatê muqedes e û zatê muqedes bi xwe jî ji xwe pê ve xayetek nîne. Nexwe: «La yus'elu 'emma yef'el we hum yus'elûn» (Enbiya/23).

Her weha, çiko zatê wî yê muqedes, di xilaseka bilindahiya cemal û kemalê da ye, sîstema daira wucûdê ku siha wî zatê cemîl e û di xilaseka kemalê da ye û ev sîstema heyî tamtirînê sîstema ye ku bên tesewurkirin, nexwe pirsîna ji: Çimahî û xayet, xerez û feydê, pirsiyarek cahilane û ne di cih da ye. Çawa ku îblîsê le'în di heft pirsiyaran da meşhûr bûye û Heq Teala bi kurtî û bi awayek sipehî ji ber hemûya ve, yek cewab daye. Nexwe çênabe Heq Teala ji ber fiîla xwe ya di xilaseka kemalê da, bikeve ber pirsiyarê; lê mewcûdên dî ji ber neqsa xwe ya zatî û fiîlî, gereke berpirs bin.

Her weha çiko Heq Teala hekîmê alel itlaq e, çi karên bike di nihayeta duristiyê da ye. Nexwe ne gerek berpirs be, vajiyê mewcûdên dî.

Her weha çiko fiîla ji wucûda qudsa wî çêbe ji eslê heqîqeta wî çêdibe û mewcûdên dî ne wereng in. Nexwe ew failê bizzat e û pirsiyara ji çimahiyê ji wî nadurist e, bervajiyê mewcûdan. Û çiko îrade û meşiyet û qudret hema ‘eynê zatê wî ne, şubha failiyetê ji xwe êdî çênabe. Eva he ji wan behsên hêjayî ne ku di cihê xwe da delîl jî jê ra heye û pê wê gelek şubhên mutekeliman di behsên zanînên îlahî da tên cewabdan.

Pê vê beyanê, girêdana van ristan bi heve di hedîsa şerîf da ku heryek, bûye illetê ya dî, xuya dibe. Nexwe çiko kirinên Heq Teala di kemala temamiyetê da ye û baştirîn sîstem e, der heqê ya dike da pirsiyar jê nayê kirin. Lê yên dî çiko ne we ne, berpirsiyar in. Eva he illet û sebeb e ji wê ra ku ew ewlatir be ji başiyan ra, bende jî ewlatir be ji xirabiyan ra. Û ev sebeb e ji wê ra ku xirabî hemû ji bende bin, hesenat û başî jî hemû ji Heq Teala bin. Bi awayên dî jî ev rebt û girêdan çêdibe ku nehat gotin. Di hemû halan da hemd û sipas ji Xwedê ra ne.

## HEDÎSA SÎ Û ŞEŞÊ

بالسّند المتّصل إلى ثقة الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، عن عليّ بن إبراهيم، عن محمّد بن خالد الطّياسىّ، عن صفوان بن يحيي، عن ابن مسكان، عن أبى بصير، قال سمعت أبا عبد الله، عليه السّلام، يقول:

**«لم يَزَلِ الله عزّ و جلّ رَبُّنا والعِلْمُ ذاتُه و لا مَعلُومَ، والسَّمْعُ ذاتُه و لا مَسْمُوعَ، والبَصَرُ ذاتُه و لا مُبْصَر، والقُدْرَة ذاتُه و لا مَقْدُورَ، فلمّا أَحْدَثَ الأشياءَ و كان المعلوم، وَقَع العِلْمُ منه علي المعلومِ، و السّمعُ علي المسموعِ، و البَصر علي المُبْصَر، و القدرةُ علي المقدورِ. قال قلت: فلم يزل الله مُتَحرِّكًا؟ قال فقال: تعالى الله عن ذلك! إنّ الحَرَكَةَ صِفةٌ مُحدَثةٌ بالفعل. قال فقلت: فلم يزل الله مُتَكَلِّمًا؟ قال فقال: إنّ الكلامَ صِفَةٌ مُحدثَةٌ لَيسَتْ بِأزليَّةٍ، كانَ الله عزّ و جلّ و لا مُتَكلّمَ.»**

Ebû Besîr dibêje: Min ji hezretê Sadiq (a.s) bihîst digota: “Xwedayê ezîz û celîlê Rebbê me, ku ilm zatê wî ye, hebû û di wî halî da me'lûmek nebû. Û bihîstin zatê wî bû û tiştek ku bihata bihîstin nebû. Û bînayî zatê wî bû û tişta bihata dîtin tunebû û karîn zatê wî bû û di wî halî da tişta karînê tunebû”. Rawî dibêje min gotê: “Nexwe daim Xwedê di halê hereket û bizavê da ye?” Kerem kir: “Xwedê ji wê yekê dûr e! Hereket û bizav nûpeydayeke ku bi fiîlê çêdibe”. Dibêje, min gotê: “Nexwe daim Xwedê peyver bûye?” Kerem kir: “Peyvîn nûpeyda ye û ne ezelî ye; Xwedayê ezîz û celîl hebû di halekî da ku tu tiştên bipeyivin tunebûn”.[1]

---

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 107-ê.

**Vebir: Yekbûna sifetan gel zat**

Di vê hedîsa şerîf da îşareyek heye bal yekbûna zatê Heq Teala digel sifetên kemaliye yên heqîqiye, wek ilm û qudret û bihîstin û dîtinê. Eva he jî yek ji behsên muhim e ku fireh xeberdana ji wê ji awayê vê kitêbê der e, em ê jî îşare bikin bal rêka durist ve, gora burhana xurta hekîman û terîqa ehlê marîfetê.

Bizane ku di cihê xwe da ronahî bûye ku ewa ji sinxê kemalê û cinsê cemal û temamê be, der heqê ‘eynê wucûdê û eslê heqîqeta heyînê da ye. Û di darut tehequqê da ji yek eslê tenê pê ve, tunehin; ku ew jî serçavka hemû kemalatan û jêdera hemû başiya ye, ew jî heqîqeta wucûdê ye. Û eger cemî'ê kemalatan ne ‘eynê heqîqeta wucûdê bin û bi awayekî jê cuda bin û duwîtî ji wan ra hebe, me'na wê ew e ku du esl di darut tehequqê da hebin, eva he jî gelek xirabî pê ve tên. Nexwe çi tişt kemal be, bi hesebê mahiyet û mefhûm ve ne kemal e, belkî bi wasita tehequq û çêbûna di metnê e'yana da kemal e. Û ewa di metnê e'yana da bi xwe bi xwe heye, ew wucûd e û hema yek esl tenê ye. Nexwe kemal, li yek eslê dizivire ku heqîqeta wucûdê ye.

Her weha ronahî bûye ku heqîqeta wucûdê bi hemû aliyan ve, besîtek xwerî ye û qet terkîb jê ra nîne, heta ku ser eslê zatê xwe be û xulûsa heqîqeta wê vê ra be. Û eger ji eslê heqîqeta xwe dakeve, bi hesebê munasebeta meşahid û menazilên xwe, wê terkîba aqlî û xaricî jê ra peyda bibe, lê bi hesebê zat, besît e û terkîb xerîb û ‘erezî ye.

Ji vê beyanê du qaîdên hêjayî tên dest:

Yek ev ku: Besîta hemû alî, ji nezer tekiyê ve kemalat hemû ne û ji wî cihetî ve ku mewcûd e. Alim, qadir, sax û xweyê biryar e û hemû nav û sifetên dî yên cemal û celalê jê ra durist in. Û alim e ji wî cihetî ve ku qadir e. Û qadir e ji wî cihetî ve ku alim e, bê îxtilafa îtibarê heta di aqil da jî. Lê vêca îxtilafa mefahîmê esmaan û mewzû'un lehê luxatan, ku mefahîmên aqlî labişert e [bêşert], ne girêdayî ye bi îxtilafa heqîqeta ‘eyniye da. Û ronahî

bûye ku mefhûmên muxtelifên kemalê ji tiştek tenê dertên; belkî pê vê beyana sabiq lazim e ku hemû mefhûmên kemalê ji heysek wahid derên. Û eger mefhûmên kemalê ji heysên muxtelif derên, çawa ku di hinek mumkinata da wereng e, ev bil'erez e.

Qaîda duwê jî ev e ku: Kamilê hemû alî û kemal û başiya sirf, gereke ji hemû aliyan ve besît be. Her weha bi van herdu wan hat dest ku: Ewa terkîb têda hebe, terkîb bi çi awayî be, ferq nake, ne kamilê hemû alî ye û neqs û ‘edem jê ra heye û heçî ya naqis, ne besîtê mutleq e.

Nexwe Heq Teala ku besîtê tam e û terkîb ku mustelzimê îmkan, feqr û te’elluqa bi xeyrê ve ye, mutleqa di wî da nîne. Ji hemû aliyan ve kamil e û xweyê hemû esma û sifeta ye. Û ew eslê heqîqet û serîhê mahiyeta heyînê ye, bê wî qasî ku wucûda wî meş’ûbê bi xeyr ve û wucûd û kemala wî meş’ûbê bi xeyrê kemalê be. Nexwe sirfa wucûdê ye, çiko eger xêncî ji wucûdê rê bal wî ve hebûya, hingê wê nebaştirîn terkîbê rê li balê hebûya; ku ew jî terkîba ji hebûn û nebûnê ye. Vêca ilmê xwerî ye û xwerî saxî ye û qudreta xwerî ye û xwerî beser û sem' û kemalên dî ye.

**Kelamê hekîman der heqê teqsîma sifetên Heq Teala da**

Hekîman sifetên Heq Teala kirine sê qisim:

Ya yekê, sifetên heqîqiye. Ew jî kirine du qisim: Sifetên heqîqî yên xwerî, wek: Saxî, subat, man û ezeliyet... Yek jî sifetên heqîqî yên zatul îzafe, wek: Ilm, qudret û îrade, ku tên paldan bal me'lûm û meqdûr û muradê ve. Eva herdu sifetan ‘eynê zat zanin.

Ya duwê, sifetên îzafiye yên xwerî, wek: Mebdeiyet, raziqiyet, rahimiyet, alimiyet û qadiriyet...

Ya sisê, sifetên selbiye yên xwerî, wek: Quddûsiyet, ferdiyet û subbûhiyet... Eva du awayên sifetan zêdeyê ser zatê muqedes zanin û suluban hemûyan pal didin bal selba wahid ve, ku selba

îmkanê ye. Çawa ku hemû îzafatan pal didin bal îzafe ya wahide ya mûcdiyetê ve, mebdeê îzafatan jî pal didin bal îzafa îşraqiye û îzafa nûriye ve.

Ev teqsîma çêkirîn û ‘eyniyeta di sifetên heqîqiye û zêdahiya di sifetên îzafe û selbiye bi awayê gotin û delîl li ser anîn, gora xweyê vê kitêbê natemam e û ne muwafiqê burhana metîn a hikemî û îtibara durist a îrfanî ye. Çiko eger babetê mefahîm, esma û sifetan bêt pêş û em binhêrin zêdahiya mefhûmî, gereke em çi sifetan ‘eynê zat nezanin. Û eger em zat ‘eynê sifetên îzafiye an selbiye bizanin, lazim e ku Heq Teala bibe îzafa xwerî û ‘eynê heysiyetê. Hema wereng, eger em ‘eynê sifetên heqîqiye bizanin, hingê gereke Heq Teala bibe mefahîmên îtibarî û me'nên aqlî bi xwe! (Haşa, Xwedê her mezintir e). Eger em heqîqetên ewsafan û misdaqa muheqeqa esma û sifetan melheze bikin, hemû esma û sifetên îzafiye û heqîqiye dibin zatê muqedes û ferqa navbeyna alimiyet û ilme, qadiriyet û qadir da, hema dimîne di îtibarên mefhûmî da. Û hemû sifetên îzafiye li rehîmiyet û rehmaniyeta zatî dizivirin, heta raziqiyet û xaliqiyet û…

Eva he jî ku sulûb hemû li selba îmkanê û îzafat hemû li îzafa wahide zivirandin û di ewsafên heqîqî da tiştek nekirin palgeh. Eger dîsa em li mefahîman binhêrin, qet çi yek li ya dî nazivire, ne di sulûb û îzafatan da, ne jî di ewsafên heqîqiye da. Eger li heqayiqan jî bêt nêrîn, hemû ewsafên heqîqiye jî li heqîqeta wahide ya wacibe dizivirin.

### ‘Eyniyeta sifetan gel zat

Tehqîqa wesfan di hikmeta nezerî da ew e ku: Ewsafên heqîqiye û îzafiye bi hesebê mefahîman muxtelif in û qet çi yek ne ‘eynê zatê wî ne, bi hesebê heqîqetê jî, hemû ‘eynê zatê muqedes in. Lê ji ewsafan ra du mertebe hene: Yek merteba zat û wesfên zatî ne, ku çêdibe ji wan ilm û alimiyet, qudret û qadiriyet derbên. Yek jî meqamê sifetên fiîliye ye ku mefhûmê ilm û alimiyetê, qudret û qadiriyetê çêdibe ji wan jî intza' bibe û dest ve bêt. Lê vêca ew-

safên selbiye ji pêka quddûsiyet û subbûhiyet û esmaên tenzîhî, ew ji lewazimên zatê muqedes in û zatê muqedes nisbet bi wan misdaqa bil'erez e. Çiko Heq Teala kemala mutleq e û kemala mutleq bizzat ji wî ra ye. Çiko eslê heqîqetê ew e û selba neqîsan ji lewazimê wê ne. Û kemal misdaqê 'erezî yê selba neqsê ye. Û ehlê marîfet û dil, meqamê tecellî ya bi «feyza eqdes» mebdeê esma ê zatiye zanin û meqamê tecellî ya bi «feyza muqedes» mebdeê esma ê fiîliye zanin. Û tecelliya bi feyza muqedes «xeyr» nizanin, çawa ku «'eyn» jî nizanin. Û xeberdana der heqê wê da ewê netîcê dide ku xeberdan der heqê esma û sifetan da bi awayê wan biherike û eva he me ji mexsedê dertîne.

Hineka jî sifetên Heq Teala bi tiştên 'edemî ve girêdane, gotine: Ilmê Xwedê, ew e ku ewî nezanîn û cehl nîne û qudreta wî bi wê me'nê ye ku ewî nekarîn nîne. Ji nav ehlê marîfetê ku pêkutan kiriye ser vê yekê, arifê giranqedr rehmetî Qazî Seîdê Qumî ye,[1] ewî peyrewî kiriye ji seydayê xwe. Heçweku rehmetiyê Mela Receb'elî[2] be, bi beyana ku di şerha tewhîdê da hatiye. Di zemanên borî da, me cewaba delîla wî û xwe girtina wî bi zahirê hinek hedîsan, daye bi awayek burhanî.

#### Vebir: Zanîna pêş çêkirinê da

Ji gotinên ku di vê hedîsê da îşare pê hatiye kirin, zanîna pêşiya çêkirinê ye der heqê çêkirî yên xwe da ji ezel ve, ev yekê gelek

---

1- Qazî Seîd, Muhemmed Seîdê Qumî ji mezinên zanayên Şîa ye û ji alimên mezinên hedîs, hikmet û edebiyatê hesab dibe, meyla bal îrfanê ve pir di wî da hebû. Ew ji feqiyên Molla Muhsinê Feyz û Molla Abdurrezzaqê Lahîcî û Molla Receb Alî Tebrîzî ye. Di sala 1103-ê h.q li bajarê Qumê wefat kiriye. Eserên jêrî ji wî ne: Erbeûn Hedîs, Esrarus Selat, Haşiyeya Îşaratê, Heqîqetus Selat, Şerha Tewhîda Sedûq, Bewariqul Melekûtiye, Kilîda Biheştê.

2- Molla Receb Aliyê Tebrîzî (- 1080-ê h.q) ji feqiyên Mîrfindiriskî ye, di felsefê da meşreba Meşşayî hebû û kitêbên Bû Alî ders dida. Qazî Seîdê Qumî û Muhemmedê Tunikabunî ji feqiyên wî bûne. Eserên jêrî ji wî ne: Kilîda Biheştê, Risaliya di îsbata wacib da.

îxtilaf li ser hatiye kirin, her weha der heqê çawaniya wê da ku gelo ev zanîn bi îcmal bûye an tefsîl. Ev jî ku gelo zaidê ser zat bûye an ‘eynê zat. Û ev jî kanê pêşiya çêkirinê da bûye an gel çêkirinê, di kitêban da berfireh jê hatiye xeberdan. Me der heqê wê da lêkolînek kiriye ku em ê bêjin û xwe ji işkal û îrada der heqê eqwalan vedin.

Gotina tehqîqî li bal ehlê delîlê ku vê hedîsê jî jê xeber daye, ew e ku ilmê bi me'lûm, pêşiya çêkirinê ji ezel ve hebûye û ew ‘eynê zat e. Îşare kiriye bal ilmê tefsîlî ve, ku dibêje: Bîna ye bi tiştan, di halekî da ku tişta bêt dîtin hêj tuneyî û dibihîsta hêca tişta bihîstinê neyî. Çiko beser [çav] û sem' [guh], şuhûda tefsîlî ya mubsirat [yên tên dîtin] û mesmû'ata [yên tên bihîstin] ye, ev eşkere ye. Her weha li wêderê ku dibêje: «Fe iza ehdesel eşyae...» ev îşare ye bal ilmê tefsîlî ve, çiko me'na wê ew e ku, piştî çêkirinê tiştek nû ser zanînê da nehatiye; belkî ilm hebûye û piştî çêbûnê ew ilm ketiye ser wê. Em ê ser vê meselê pirtir biaxivin.

Beyana vê peyva îmanî gora feylesofan ew bû ku di vebira pêşda derbas bû, yanî: Heq Teala wucûd û kemala xalis û xwerî ye, wucûda xwerî digel besatetê û wehdeta tamme ku heye mustecmi'ê hemû wucûdata ye bi awayê kemalê û tişta di wî da neyî ‘edem, qusûr û neqs e û nisbeta mertebên dî yên wucûdê ji wî ra nisbeta neqsê ye ji kemalê ra û ilmê bi kemala mutleq ilmê bi mutleqê kemalê ye, bê neqs û qusûr. Eva he hema ‘eynî keşfa kullî ya besît e digel wê jî ebedî û ezelî ilmê wî hemû mewcûd dagîr kirine û qet zêdahî û terkîb jê ra nîne.

Lê vêca bi awayê arifan: Heq Teala mustecmi'ê cemî'ê esma û sifeta ye di meqamê hezret «wahidiyet»ê û meqamê cem'a esmaî, e'yanê sabitê hemû mewcûdatan jî ji lewazimê esmaê îlahiye ye di hezretê cem' da ji ezel ve pêşiya îcad û çêkirinê. Û tecelliya mutleq a zat ji meqamê ehediyet û xeyba huwiyetê keşfa cemî'ê esma, sifetan û lewazimê wê ye, ku e'yanê sabitê hemû mewcûdata ye, bi tecellî ya wahid û keşfa besîta mutleq. Nexwe bi ‘eynê

keşfa ilmî bi tecelliya «feyza eqdes» zat û esma û sifet û e'yan keşf dibin bê wî qasî ku zêdahî û terkîbek çêbe.

Ev du rêk, gelek xurt in û di cih da ne. Lêbelê çiko peyv gelek deqîq û hûr e û li ser gelek xîman ava bûye û tijî ye ji îstilahatên giran û pir pêşekî yên wê hene, heta nasyariyê digel wan çênebe û gomana qenc der heqê alimên Xwedêyî da çênebe, ev peyv û kelam tiştekî hel nake û ji şaşkirinê pê ve çi fêkî dî nade. Ji ber wê, ya baştir ew e em bi gotinekî sade û hemû fêhm, jê xeber bidin. Vêca em weha bêjin:

Illiyet û mebdeiyeta wacibul wucûd, ne wek illiyeta failên tebî'î ye ku mewadên heyîn, gel hev terkîb bikin û li navhev bidin, wek neccar ku di maddeya heyî da, guherînê çêdike û bi heve datîne û terkîb dike. Û wek hosta ku tiştên heyîn, datîne serhev û terkîbekî jê çêdike. Belkî Heq Teala failê îlahî ye ku tiştan bi îrada xwe, bê hebûna pêşiyekî çêdike û hema ilm û zanîna wî bi xwe û îrada wî, illet û sebebê eşkerebûn û çêbûna tişta ye. Nexwe alem dagîrbûyiyê ilm û zanîna wî ye û bi îrada wî ji xefgehên xeybê dertên û eşkere dibin: "Û kilîdên xeybê (nihînî - veşartî) hema li bal wî ne; û ji wî pê ve kes pê nizane".[1] Dibêjin nisbeta sefha e'yana nisbet bi zatê muqedesê Heq Teala, wek nisbeta zêhn e ji nefsa însan ra ku hema dema bixwaze di cih da çêdike û wê ya di xeyba huwiyetê da eşkere dike. Nexwe alem hemû di bin zanîna Xwedê da ye, ji wê derdikeve û li wê dizivire: «Em ji Xwedê ne û em ê bal wî ve bizivirin».[2]

Bi gotinek ronahîtir, ilmê bi sebeb û illetê tammeyê tiştekî, mustelzimê ilmê bi wê tiştê ye.

Mesela: Zanîna xusûf û kusûfê di filan rojê û filan saetê da, ji ber wê ye sebebê wê zaniye, ku kengê wê erd bikeve navbera roj û heyvê an heyv bikeve navbera erd û rojê da. Eger bi başî zanîbe,

1- En'am / 59

2- Beqere / 156: Înna lîllah we înna îleyhî racî'ûn.

saniyekî jî muxalif nabe. Û çiko silsila hemû esbab û musebebatan dizivirin bal zatê eqdesê mebdeul mebadî û Heq Teala ku sebebê hemû mewcûdata ye û ilm bi zatê xwe heye, ji ber ku sebeb e, ilmê bi musebebatan jî heye. Hinek ji van gotina ji hineka xurtir in û her kes dikare gora xwe yekî bibijêre.

**Vebir: Sem' û beserê Heq Teala**

Yek ji meselên ketî ber xirecira felsefî yên biqedr, sabitkirina bihîstin û dîtinê ye ji Heq Teala ra. Cumhûra hukema û mutekeliman pala wê dane ilm û zanîna Xwedê, lê Şêxê Îşraqî pala ilm daye bihîstin û dîtinê.(1) Heryekî gotina xwe heye û em ê jî bi gotinekî behsê bikin ku hemû nav û sifetên Xwedê li ber xwe bigire.

Bizane ku gelek ji feylesofan ji îhmalkirina hinek heysan ra hinek nav û sifetên Xwedê li hinek dî zivirandine û pala wan dane hinek nav û sifetên dî. Çawa ku meşhûr di nav wan da ev e ku îrada Heq Teala hema ew ilm û zanîna wî ye bi sîstema etemm û cîhgirtî. Û wek xirecira wan der heqê bihîstin, dîtin û ilmê Xwedê da ku heryekî yek li ya dî zivirandiye û pala wê daye wê, çawa ku hat gotin. Lê ev gotin, xilafê tehqîqê ye û ji ber îhmalkirina hinek heysiyeta ye. Çiko zivirandina heryekî li ya dî, bi wê me'nê ye ku ne xweyê yek ji wan be û eva he gotinek batil e, çiko ev dike lazimê xwe ku Heq Teala mebdeê wucûdê be, lê mesela îrade û îxtiyar tunebe. Xêncî ji wê jî di babetê îtisaf û wesifkirina Xwedê bi sifetên kemalê da, ew heye ku ew sifet, sifetê kemalê be ji bona mewcûd bima ennehu mewcûd, hasil ev ku gereke sifet nefsa heqîqeta wucûdê be û ji kemalatên eslê zatê wucûdê be; bêşik «îrade» ji sifetên kemaliye yên heqîqeta mutleqe ya wucûdî ye. Ji ber wê çiqas wucûd berew xwarê biçe, îrade jî zeîf dibe, heta bi temamî ji nav biçe û wek giya û me'dena lê be, çiqas berew jorê jî biçe, îrade di wî da xurtir dibe. Heta bi wê derecê ku însanê kamil xweyê wê îrada kamil e ku hema dema îrade bike unsurekî

---

1- Şerha Hikmeta Îşraq, p. 358 – 366-ê.

dizivirîne bi unsurek dî û alema tebîetê dikeve bin îrada wî da. Pê vê keşif dibe ku îrade ji sifetên kemalî yê wucûdê û mewcûd bima ennehu mewcûd e. Û ev heqîqet ji zatê eqdesê îlahî ra sabit dibe, bê wî qasî ku li heqîqetek dî bêt zivirandin. Her weha sem' û beser gora tehqîqa durist, ji kemalatên mewcûdê mutleq e û heqîqeta sem' û beser ne girêdayî ye bi alet û esbaban ve, belkî ji eşkerebûna sem' beserê nefsê ra lazim e di alema mulk û tebîet da, çawa ku ji eşkerebûna ilmê di alema mulk û tebîet da jî muhtacê mêjî ye. Eva he ji neqs û kêmasiya alema tebîet û mulk e, ne ji kêmasiya ilm û bihîstin û dîtinê ye ku heqîqeta alema xeybê dibîne û kelamê melekûtî yê melaîket û ruhaniyan dibihîze; çawa ku Mûsayê Kelîmullah kelamê Xwedê di munacata da dibihîsta û Resûlê Xatemê Mukerrem gel melaîketan xeber dida û Cebraîl li ser şiklê wî yê melekûtî didîta ku qet tu guh ew nabihîsta û tu çav ew nedidîtan, lê di wextê hatina wehyê da, ew û hezretê Resûl di yek civatê da bûn.

Welhasil sem' û beser (bihîstin û dîtin) jî, ji wan zanista ne ku zêdeyê ser eslê ilmê ve ne û xêncî ji heqîqeta ilmê ne û ji kemalatên mutleqa wucûdê ne. Nexwe sabitkirina wan ji Heq Teala ra ku mebdeê eslê wucûdê û serkaniya kemala heyînê ye, lazim e.

Eger mexseda wan ku îrade û sem' û beser dizivirînin bal ilmê ve, an pala ilmê didin wan, ew bê ku ilm û îrade bi yek awayê ji Xwedê ra sabit e û sem' û beser û ilmê Xwedê heysiyetên muxtelif nînin, ev gotinek durist e û rêketî ye gel delîl û burhanê. Lê vêca hingê, ne taybetê van wesfan tenê ye, belkî hemû sifet dizivirin bal heqîqeta wucûda sirf û xwerî ve. Û evê dijatî nîne gel sabitkirina sifetên muxtelif ji Xwedê ra û belkî ew ê meselê dişidîne, çiko ronahî ye çiqas wucûd nêzîktirê wehdetê be û ji ufuqa zêdahiyê dûrtir be, nisbet bi esma û sifetan cami'tir e, heta bigehê wucûda xwerî û heqîqeta besîte ya wacibe ku nihayeta wehdet û besatetê ye û mustecmi'ê hemû kemalatan û cami'ê temamê esma û sifeta ye û hemû mefhûmên kemalê û me'nên cemal û celalê bi awayê heqîqî jê ra durist in û layiqtir in ji wî ra bi hemû mertebên xwe ve.

Bi gotinek kurt gotin ev e ku: Çiqas wehdet xurtir û temamtir be, sidqa mefhûmên kemalê pirtir dibe, nav û sifet pirtir dibin. Vêca bervajî, çiqas mewcûd ji ufuqê zêdahiyê ra nêzîktir bibe, mefhûmên kemalê der heqê wî da kêmtir rêk dikevin û rêketina wî jî gel wan lawaztir dibe û pirtir wek mecazê lê tê. Eva he ji ber wê ye ku wehdet musawiqê wucûdê ye û ji kemalatên mewcûd bima huwe mewcûd e, me'na musawiq jî di vî halî da ew e ku: Di mefhûm da gerçî wucûd û wehdet muxalifê hev in. Lêbelê di xaric da heqîqeta wucûdê ‘eynî heqîqeta wehdetê ye. Çawa ku zêdahî li kuderê hebe, kêmasî, ‘edem, xirabî û sistî li wêderê peyda dibe. Û ji ber vê ye ku çiqas wucûd berew xwarê biçe, zêdahî ji temamê meratibê wucûdê zêdetir e. Û meqamê rubûbî ku xwerî wucûd e, xwerî wehdet û besatet e û di wî da qet zêdahî û terkîb nîne. Me pêşda got ku, wucûd eslê heqîqeta kemalê û serkaniya cemal û celalê ye. Nexwe sirfa wucûd, sirfa wehdet û sirfa kemalê ye; nexwe sirfa wehdet jî sirfa kemalê ye. Nexwe ewa wehdeta wê di axirîn derecê da be, hemû esma û sifet û kemalat ji wî ra durist in û sidqa heryekî ji wî ra eheq û ewla ye. Bervajî vêca, çiqas nêzîkê zêdahiyê bibe, neqsa wê zêde dibe û sidqa mefhûmên kemalê ji wî ra kêm dibe û çawaniya sidqa wê jî zeîf dibe. Nexwe Heq Teala xweyê hemû nav û sifeta ye bê wî qasî ku yek li ya dî bizivire, belkî heryek bi heqîqeta xwe ji Xwedê ra hene: Bihîstin û dîtin, îrade û ilmê wî hemû, bi me'na heqîqî jê ra hene bê wî qasî ku bi awayekî zêdahî di zatê muqedesê wî da peyda bibe. Nexwe navên sipehî hemû ji wî ra ne...

**Çawaniya pê vegirhana zanîna Xwedê bi me'lûmatan ve**

Çawa me gotî, Heq Teala bi ilmê besîtê xwe yê zatî û keşfê wahidê ezelî bi hemû mewcûdatan zane. Ev keşif di wî halî da tefsîlî ye jî bi awayek wereng ku heta zereyek ji alemê derê ji zanîna wî nîne. Ev zanîn ji ezel ve heye û ‘eynê zatê wî ye û me'lûmat piştî çêbûnê bil‘erez muheqeq dibin û bil‘erez dibin muteeliqê ilmê û ev tehequqa bil‘erez piştî çêkirinê ye û hedîsa şerîf îşare kiriye

bal vê me'nê ve li wêderê ku dibêje: “Felemma ehdesel eşyae...” Weheye jî, ev gotin îşare be bal ilmê fiîlî ve ku bi «tecelliya muqedes» dest ve tê, mexsed ji me'lûmatên bizzat bin ku huwiyatên muteeliq bi feyza muqedes ve û tecelliya zuhûra nûrî ne.

Nexwe «fe lemma tecella bi feyzih…» gora herdu gotina jî ev tecelliya bi feyza muqedes ve nayê guherîn û îcada wî dûr e ji guherînê. Hukema gotine: Nisbeta sefha nefsul emr ji Xwedê ra wek nisbeta şiklê ilmî ye ji nefsê ra. Vêca ji ber vê îhatê û berfirehîyê û bisatet û nufûzê, gotine Heq Teala cuziyatan pê ilmê kullî zane, yanî cuziyet û muhatiyet û mehdûdiyet di me'lûm da nabe sebebê mehdûdiyeta di ilmê da. Nexwe ilm, muhît, qedîm û ezelî ye û guherîn têda nîne, lê me'lûm muhat û mehdûd û nûpeyda û mutexeyir e.

**Vebir: Mîzana sifetên subûtî û selbî**

Heçî sifetê kemaliye ku heyî, gereke ji Xwedê ra hebin; çiko eger nebin, hingê an gereke zatê wî yê muqedes ne wucûda xwerî be, an jî wucûda xwerî ne kemala xwerî û cemala xwerî be. Ev herdu jî gora îrfan û burhanê nadurist in.

Ji aliyê dî ve jî, vêca ew sifetên di sekingehek ya te’eyyunata da û li hudûd û mahiyetan bizivire, neqs û kêmasî têda hebe, lazim e ji Heq Teala bêt selbkirin û jê bêt dûrkirin.

Eva he ku gotine sifetên selbiye dizivirin bal selba wahid ve ku selba îmkanê ye, gora nivîser nadurist e. Belkî wek çawa ronahî bû, zatê muqedes misdaqê zatî yê hemû sifetên kemalê ye û qet tu yek li yê dî nazivire, hema bi wî awayî misdaqê bil‘erez û mesdûq aleyhê selba heryek ji neqaisa ye jî. Û nayê gotin ku, nebûn û neqs heysê wahide ne; çiko eger bi hesebê metnê waqi’ û nefsul emr bêt melhezekirin, çawa ku ‘edemê mutleq heysa wahid e. Lê digel wê jî dîsa nebûn hemû ye, wucûda mutleq jî heysa wahid û kullê kemalata ye. Nexwe bi vê nêrînê ku melhezekirina ehediyet û xeybul xuyûbe tu sifetek nayin sabitkirin. Lê bi nêrînek

dî ku melhezekirina meqamê wahidiyetê û cem'a esma û sifeta ye, wek çawa sifetên subûtiye yên kemaliye pir in, çawa jê ra tên gotin lazim e sifetên selbiye yên li beranberê wan da jî bên selbkirin. Û zatê muqedes ji wî cihetî ve ku misdaqê bizzat alim e, misdaqê bil'erez leyse bicahil; çiko qadir e nekar nîne. Û çawa ku di ilmê esmaaan da hatiye ku ji esma û sifetên subûtî ra muhîtiyet, muhatiyet, riyaset û mer'ûsiyet heye ji esma û sifetên selbî ra jî gora wê ev îbaret hene.

Hasil ev ku: Dema mîzan û kêşeka sifetên subûtî û selbî hat zanîn, mirov dikare fêhm bike ku hereket û bizav ku bihêza heyûlayî xwe radigire, hudûs û nûbûn têda heye, çênabe di zatê kibriyaî yê Heq Teala da hebe.

Xeberdan jî bi vê me'na orfî ya ku di hedîsê da hatî pirsîn ji Xwedê dûr e û çênabe hebe di zatê kibriyaî yê wî da. Lê evê dijatî nîne gel vê yekê ku xeberdanek zatî bi awayekî ku nebe sebebê nûbûn û hudûsê ji Heq Teala ra bêt sabitkirin.

Kurtiya vê gotina hêjayî ev e ku heqîqeta tekellum û xeberdanê ne bi derketina kelam e ji cihên taybet û mexsûs. Û eva he ku di orf û luxet da wereng hatiye fêhmê ji ber wê ye ku adet ew bûye û ji ber wê wereng hatiye xeyalkirin, eger ne eslê me'nayê teqyîd û te'eyyun jê ra nîne. Ilm, zanîna xwerî ye û eşkerebûna tiştekî ye li bal yê xweyê zanînê; nehatiye girêdan bi wê yekê ve ku pê wesîlên maddî wek mêjî, an me'newî wek hisa muşterek, an lewha xeyalê ew zanîn çêbe. Eger mesela, kesek bi destê xwe an piyê xwe der heqê tiştekî da zanînê peyda bike an tiştekî bibihîze an bibîne, ilm û sem', beser jê ra sadiq e. Her weha eger kesek di xew da bibîne û guh lê bibe û xeber bide û îhsas bike, ev me'ne hemû bêmecaz sadiq e, halhale çi yek ji wesîlên taybet yên mehsûs bi kar nehatine. Nexwe mîzan û kêşek hema pê hesan û îdraka taybet e ji bona duristiya van me'ne û mefhûman. Û heqîqeta tekelumê eşkerekirina xefên navda ne û îbraza ma fî demîr e bêyî wê ku alet û wesîleyek taybet bi kar hatibe. Fereza,

eger gora luxet û orfê mecaz be jî, ev teqyîd di me'ne û heqîqeta wan da nîne û gora aqil durist e. Me di behsa esma û sifetan da şol bi luxet nîne û mexsed hema sabitkirina heqîqeta ye. Her çend orf û luxet gel wê rêk nekeve jî. Vêca em dibêjin heqîqeta xeberdanê ew e ya navdeyî eşkere bike çi bi aletên hisî an ne pê wan û çi kelam ji pêka deng, kelîman û wêjeyan be an ne. Kelam bi hesebê vê heqîqetê ji wesfên kemalî yên wucûdê ye. Çiko zuhûr û îzhar ji heqîqeta wucûdê û bi heqîqeta wucûdê ye; çiqas wucûd berew kemalê biçe û xurt bibe, zuhûr û zihara wê pirtir dibe heta bigehê ufuqê e'la û meqamê esnayê wacibî ku nûrul enwar û nûra ser nûrê ye. Û bi feyza muqedesa itlaqî û kelîma «kun» ewê ya di xeyba meqamê wahidiyetê da ye, eşkere bike û bi feyza eqdes û tecelliya zatî ya ehedî xeyba mutleq û meqamê la meqamiyê ehediyetê kifş bike. Û di vê tecelliya ehedî da mutekelim, zatê muqedesê ehedî ye û kelam feyza eqdes û tecelliya zatî û sam' esma û sifet in; bi wê tecelliyê te'eyyunatên esma û sifetan guhdar dibin û tehequqa ilmî peyda dikin. Û di tecelliya wahidî da bi feyza muqedes, mutekelim zatê muqedesê wahidî yê hemû nav û sifet têda kom bûyîn, kelam jî tecellî bi xwe ye û sam' û guhdar di tehequqa e'yanê ilmiye da lazimeya esma û sifeta ye ku bi emrê «kun» tehequqa ‘eynî peyda dike: “Vêca hingê dema bixwaze tiştek çêbe dibêje: Çêbe û hebe, vêca guhdarê emrê îlahî dibe û hema çêdibe”.

Şahidên sem'î jî di vî babetî da pir in ku me jê xeber neda. Di her hal û karî da hemd û pesn ji Xwedê ra ne.

## HEDÎSA SÎ Û HEFTÊ

بالسّند المتّصل إلى محمّد بن يعقوب، عن علىّ بن محمّد، عمّن ذكره، عن أحمد بن محمّد بن عيسي، عن محمّد بن حمران، عن الفضل بن السّكن، عن أبى عبد الله، عليه السّلام، قال قال أمير المؤمنين، عليه السّلام:

**«اِعْرِفُوا اللهَ باللهِ، و الرّسولَ بالرِّسالَةِ، و أُولى الأَمْرِ بالأمرِ بالمَعرُوفِ والعَدْلِ والإِحْسانِ.»**

Hezretê Sadiq (a.s) dibêje ku hezretê Mîrê bawerdaran kerem kir: «Xwedê bi Xwedê nas bikin û Pêxember bi pêxemberiyê û mezinê dînî bi emrê bi qencîhê û pêkanîna edaletê û qencîkirinê».[1]

### Şîrove:

Îrfan û ilm, yanî nasîn û zanînê ferqek ronahî hene. Dibêjin, ilm di eslê luxet da taybetê kulliyata ye û marîfet taybetê cuziyat û kesayetiya ye. Her weha dibêjin: Arifê bi Xwedê, ew e yê bi muşahida huzûriye Xwedê nas bike. Û zanayê bi Xwedê, ew e yê bi burhan û delîlên felsefî der heqê Xwedê da zanîn hebe. Hinek jî dibêjin: Ilm û îrfan ji du aliyan ve gel hev ferq hene: Yek, ji cihet mute'elleq ve; çawa ku hat gotin. Ya dî, behsa ji bîr kirin û nisyanê di marîfetê da heye, nexwe tişta ku ji cara yekê ra pêhesan pê ve girha, dibêjin: Der heqê wê da ilm û zanîn peyda bû; lê ew

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 4-ê.

tişta ku me'lûm bûye hat ji bîr kirin û paşê dîsa hat zanîn, dibêjin der heqê wê da marîfet peyda bû. Ji ber wî qasî ji arif ra dibêjin arif, çiko ekwanên pêşiyê û neşeatên borî tên bîra wî. Hinek ji ehlê sulûkê jî de'wa bîrhatina alema «zerr» dikin û dibêjin eger hicaba tebîetê ku bûye sebebê vê xeflet û nisyanê, ji ber çavê salik rabe, hingê wê alemên derbas bûyî bên bîra wî. Yek ji pê hesan digota: «Heqîqeta mîraca me'newî û ruhanî bîranîna demên derbas bûyî ye». Dema paş xwe ve bizivirin û binhêrin halê xwe yê derbas bûyî, her kes bi awayekî heta demekî jiyana wî tê bîrê: Yek heta heft saliyê, yek heta pênc an sê saliyê, lê kêmtir kes hene ku binretirê ji wê bêt bîra wî -ji Şêxur Reîs digêrin ku gotiye, demê ji dayikbûna wî tê bîrê!- Digota: Çêdibe hê ji wê jî binretir bêt bîrê; mesela, demê di zikê dayika xwe da an li piştа bavê xwe da, bêt bîrê, her weha hemû halên wî yên di alema mulk da jê ra çêbûyîn, bêt bîra wî. Ji ekwanên alemê bigire heta melekûtê e'la û ji ceberûtê bigire heta ceberûta e'la, heta bigehê neş'e ya ilmê rubûbî, ku ev bîrhatin heqîqeta mîracê û nihayeta urûca ruhanî ye.

Ev gotin, eger xwe bi xwe durist be jî, lê heqîqeta mîracê bi vî awayî li bal îrfaniya û ehlê dil durist nayê dîtin. Li bal wan heqîqeta mîraca ruhanî, hereketa me'newiye ya in'itafiye ye ku pê wê daira wucûd û rucû'ê bi alema xeyba di silsila şuhûdê da heyî temam dibe. Û eva he di kevana su'ûdî û hereketa in'itafî da pêk tê. Û ev hereketa rucû'iya qehqerayî di mewcûdata da xilafê herikîna suneta îlahî ye, nexasima di enbiyan da û bi taybet di Xatemê wan da (selat û selamên Xwedê li ser wan hemûya be). Û ev awayê sulûkê dişibihê meczûbiyeta birek ji melaîketan ku şaş û heyirî ne di zatê Zulcelal da ku bi giştî ji zêdahiyan bêxeber in û qet nizanin ji xwe adem û alemek xuliqiye. Seydayê arifê kamil Şahabadî, ez gorî bim, digota: “Haletê ruhî yê hezretê Adem (a.s) ev bû ku bala xwe nede mulk ku meczûbê alema xeyb û meqamê qudsî be û ev bizava Adem (a.s) ji ademiyetê selb dikira. Vêca Xwedê şeytan lê xurt kir, heta berê wî bide dara tebîet û ewî ji wê cezeba melekûtî bi aliyê mulk ve bikêşe”.

**Vebir: Mexsed ji «Xwedê bi Xwedê ve nas bikin»**

Der heqê pişka: "Xwedê bi Xwedê ve nas bikin", di vê hedîsa şerîf da alimên giranqedr (r.a) heryekî gora mesleka xwe bi awayekî me'ne kiriye ku ji teberuk ra em ê hinekan bêjin:

Yek, gotina pêbawer Kuleynî (r.a) ye, bi kurtî ew weha dibêje: «Xwedayê Teala beden, ruh û nûr xuliqandine; ewî bi xwe tenêkî ew çêkirine û kes di çêkirina wan da nekiriye şirîk. Her weha ne wek tu yek ji wa ye. Kesê Xwedê wek yek ji wan bizane ewî Xwedê bi Xwedê nas nekiriye. Lê eger Xwedê ji wekbûna wan munezeh û dûr bizane, ewî Xwedê bi Xwedê nas kiriye». Xerîb ew e ku cenabê Sedrul Muteellihîn (q.s) ev kelam ji tetimma hedîsê zaniye û gora xwe bi dirêjî hinek gotin gotine.

Du, Şêx Sedûq (r.a) dibêje: «Me'na naskirina Xwedê bi Xwedê, ew e ku: Eger em Xwedê bi aqilê xwe nas bikin, ji xwe Xwedê ew daye. Û eger em bi pêxember û hucetan nas bikin, ji xwe Xwedê ew hinartine û kirine hucet. Û eger em bi nefsa xwe wî nas bikin, ji xwe Xwedê xaliqê wa ye».

Sê, gotina cenabê Sedrul Muteellihîn e ku dibêje: «Rêka nasîna Heq Teala bi du awaya ye: Yek, bi muşahidê û serîha îrfanê ye. Ya duwê jî rêka tenzîh û teqdîsê ye. Çiko rêka yekê ji enbiyaên giranqedr pê ve ji kes dî ra çênabe, ji ber wê di hedîsê da rêka duwê hatiye gotin». Tefsîra wî ser wê binyatê ye ku gotina Şêxê Kuleynî piçek ji hedîsê zanîne ku gotina hezretê Sadiq e ji Mîrê bawerdaran (a.s).

Çar, şiroveya cenabê Muheqiqê Feyzê rehmetî ye ku bi kurtî ew weha dibêje: «Ji her mewcûdekî ra mahiyet û wucûdek heye. Mahiyeta tiştan te'eyyunatên nefsiye û wecheyê zatî yê wa ye; wucûda wan jî cihetê yelî errebbî ye ku bi wê ye qiwama zat û eşkerehî ya eseran û hewl û quweta tiştan. Nexwe eger kesek binhêre mahiyetan û cihetên te'eyyunî yên tiştan û bixwaze ji aliyê çêbûna wan û niyaz û îhtiyaciya wan bal Xwedê ve Xwedê nas bike, ewî Xwedê bi tişta nas kiriye, ne Xwedê bi xwe. Ji xwe ev

ilm û nasîn, fitrî û sirûştî ye, ne kesbî. Lê vêca eger ji cihatê wucûdiye ve ku berêxwedana Xwedê ye û ayeta: «Huwe me'ekum eynema kuntum»[1] û: «Kullu şey'in halikun îlla wecheh»[2] û... Xwedê nas bike, ewî Xwedê bi Xwedê ve nas kiriye.

Pênc, îhtimaleke ku gihaye zêhnê nivîserê vê kitêbê, ew jî piştî gotina pêşekiyekî ku di ilmê esma û sifetan da hatiye, kifş û me'lûm dibe. Ew jî ev e ku: Ji zatê muqedesê Heq Teala ra hinek îtibar hene ku ji heryekî ra îstilahek hatiye danîn:

Yek jê, îtibara zat e ji nezerê zat ve. Ku bi hesebê vê îtibarê, zat mutleqa nenas e û tu nav û nîşanek jê ra nîne û amala urefa û arzûya ehlê dil nagihête û nikare bizane. Carna li ser zimanê ehlê marîfetê dibêjinê «'enqaya muxrib» 'enqa nabe nêçîra kesî, davê rake.[3] Carna jî jê ra gotine: 'Ema. Riwayet bûye ku gotin Pêxember (s.a.a) "Pêşiya ku Xwedayê te mexlûqan bixuliqîne, li kuderê bû?" Kerem kir: "Di 'emaê da bû".[4] Carna jî jê ra tê gotin «xeybul xuyûb» û «xeyba mutleq»... Her çend van hemû jî natemam in, 'enqa û 'ema û yên dî bi hesebê zewqa îrfanî ya rêketî gel awayek ya burhanê, der heqê vî meqamî da nîne.

Îtibara dî îtibara zat e bi meqamê te'yîna xeybî û 'edema zuhûra mutleq, ku ji vî meqamî ra dibêjin: Ehediyet. Zêdetirê wan tabîran gel vî meqamî rêk dikevin. Di vî meqamî da bi hesebê îstilaha alimên esmaî, dibe îtibara esmaê zatî, wek «batin» mutleq û «ewwel» mutleq û «'alî» û «'ezîm». Çawa ku ji riwayeta Kafiyê îstifade dibe, yekemîn navê ku Xwedê ji xwe ra girtî «'Alî» û «'Ezîm» bûye.

Ya dî îtibara zat e bi hesebê meqamê wahidiyet û cem'a esma û sifetan. Ji vî meqamî ra tabîra «wahidiyet» û «ehediyeta cem'a es-

---

1- Hedîd / 4: Hûn li ku bin, ew gel hewe ye.

2- Qeses / 88: Ji wechê wî pê ve, her tişt ji nav diçe.

3- 'Enqa şikarê kes neşeved, dam baz gîr; kanca hemûşê bad bidest est dam ra / Hafizê Şîrazî.

4- Ewalî el-Lealî, c. 1, p. 54

maî» û «cem'ul cem'»... bi kar hatiye. Bi hesebê îtibara ehediyeta cem'ê, ji vî meqamî ra «ismê e'zem» û «ismê cami'ê Allah» gotine.

Îtibara dî îtibara zat e bi hesebê merteba tecellî bi «feyza muqedes» û meqamê zuhûra esmaî û sifetî di merayên e'yanî da. Çawa ku meqamê «wahidiyetê» bi tecelliya bi «feyza eqdes» e. Ji vî meqamê zuhûra esmaî ra meqamê «zuhûra itlaqî» û meqamê «ulûhiyet» û meqamê «Allah» jî dibêjin, bi hesebê îtibaratên ku di esma û sifetan da hatine û nivîser di Misbahul Hidayetê da şîrove kirine.

Lazim e bêt zanîn ku ev îtibarên he, ser zimanê ehlê marîfetê nîşanê tecellî yên Heq in ser dilên wa yên safî. Û ew tecelliyat bi hesebê meqamat û meratibên sulûka ewliya û menazil û merahilên seyra sairên bal Xwedê ve ji meqamê zuhûra esmaî û sifetî dest pê dike ku meqamê «ulûhiyetê» ye û jê ra Allah jî dibêjin û: «Allahu nûrus semawati wel erd...»[1] îşare zanin bal wê ve, bi meqamê xeyb a ehedî û bi merteba esma ê zatiye û ismê «mustesir» jî xilas dibe ku xayeta seyrê û xilaseka mexsedê ye. Gotina Xwedê: «Ew edna»[2] îşare be bal vî meqamî ve.

Niha ku ev pêşekî hat gotin, em dibêjin: Heta ku mirov bi fikir û delîlê li pey Heq Teala ye û bi aliyê wî ve diçe, ev seyr û çûn, çûna aqlî û ilmî ye û ne ji ehlê marîfet û îrfanê ye û belkî ketiye nav hicaba ekber û mezin da. Çi binhêre mahiyeta tiştan û di wê da Heq bixwaze û pê bikeve, ku hicabên zulmanî ne. Û çi jî bi wucûda wan bikeve pey, ku hicabên nûraniye ne, ku kelamê Feyzê rehmetî jî ewê dibêje.

Yekemîn şertê çûna bi aliyê Xwedê ve, derketina ji mala tarî ya nefsê û xwexwaziyê ye. Çawa ku di sefera hisî ya 'eynî da heta ku mirov rêneketiye û di cihê xwe da ye, çiqas goman bike ku seferî ye û bêje ez seferî me jî, qet sefer û seferî jê ra nayê gotin.

---

1- Nûr / 35

2- Necm / 9

Sefera şer'î ew e ku mirov ji mal derkeve û bikeve rê û biçe heta êdî nîşanên bajar ji ber çavan winda bibin. Ev sefera îrfanî ya bi aliyê Xwedê ve û ev hicreta şuhûdî jî çênabe xêncî ku mirov ji mala tarî ya nefsê derkeve bi awayek wereng ku eserên wê êdî xuya nekin. Hetanî dîwarên te’eyyunatan û de'wa zêdahiya bangê li halê ye, mirov ne seferî ye; gomana seferê ye û de'wa seyr û sulûkê. Xwedê Teala kerem dike: «Û kesê bi qesta hicreta bal Xwedê û pêxemberê wî ve ji mala xwe derkeve di pey ra mirina wî bigehê, muheqeq kirha wî ketiye ser Xwedê». (Nisa/ 100)

Rêwîngiyê bal Xwedê ve, piştî ku bi teqwatiya kamil ve ji mal derket û te’eyyunat gel xwe nebirin û jê ra sefera bal Xwedê ve hat gotin, yekemîn tecelliya Heq Teala li ser dilê wî yê paqij tecelliya bi ulûhiyetê û meqamê zuhûra esma û sifeta ye. Ev tecellî, bi awayek rêkûpêk gorekî quwet û zeîfiya seyr û dilê sair ji esmaê muhate dest pê dike û pê ve diçe heta digehê esmaê muhîte, bi awayek wereng ku di vê kurteyê da cih nabe. Û heta bigehê refz û avêtina hemû te’eyyunatên alema wucûdê, çi ji xwe û çi jî ji xeyr. Û piştî refza mutleq, tecelliya bi ulûhiyet û meqamê Allah, ku meqamê ehediyeta cem'a esma ê zuhûrî ye, wê bêt cih û: “Xwedê bi Xwedê nas bikin”, wê bi merteba nazile ya ewweliye eşkere bibe.

Arif, di destpêka gihana vî meqamî û vê menzilê, di wê tecelliyê da fanî dibe. Û eger înayeta ezelî şamil bibe, wê bêhna arif fireh bibe û bizdan û zehmeta seyrê rabe û bi xwe ve bêt û bi vî meqamî qena’et nake û bi gava evînê wê bikeve rê û bi sefer biçe. Di vê sefera evînî da, Heq mebdeê seferê û eslê seferê û xilaseka wê ye. Û di nav enwarên tecelliyatan da gava xwe diavêjê û teqeddemê[1] guh lê dibe, heta ku esma û sifet di meqamê wahidiyetê da bi rêzê ve di dilê wî da tecellî bikin, heta ku bigehê meqamê ehediyeta cem'î û meqamê ismê e'zem zuhûr bike ku navê «Allah» e. Û di vî meqamî da gotina: “Xwedê bi Xwedê nas

---

1- Xitaba Heq Teala gel Resûlê xwe di demê mîracê da.

bikin", di dereca bilind da pêk tê. Piştî vê jî meqamek dî heye ku vê gavê me şol pê nîne.

Bi vî awayê meqamê nasîna resûl bi risaletê û ulul emr bi emrê bi me'rûf û edl û îhsanê, rêzek îrfanî ya hêjayî heye ku girêdayî ye bi xeberdana der heqê risalet û wîlayetê ve. Ew jî ji awayê vê kitêbê der e û bi hêviya risala pêşda nav jê hatiye birin ve ye.

Çênabe hedîsên mearifan bi awayê giştiyê bên me'ne kirin

Bila ev goman çênebe ku bi vê gotinê em dixwazin bêjin ku me'na hedîsa şerîf hema ew e ku di mesleka ehlê îrfanê da hat gotin, da ku bibe ji pêka ber avêtina di tarîtiyê da û ji pêka tefsîra bi reye. Belkî mexsed ew e ku bêt zanîn, newereng e ku hedîsên mearifan hema bi wê me'na orfî bin. Arif bi awayê xeberdanên îmaman (a.s) zanin ku exbarên di behsa mearif û baweriyan da bi fêhma orfî ya amiyane rêk nakeve. Belkî deqîqtirîn me'nên felsefî û xayeta zanînên ehlê marîfetê di wan da hene. Û eger kesek binhêre Usûla Kafî û Tewhîda rehmetiyê Şêx Sedûq wê vê gotinê tesdîq bike. Evê, munafat û dijatî nîne gel wê yekê ku ew îmam gotina xwe bi awayekî bêjin ku her kes bikare gora xwe ûşiyekî jê bicine. lê tu yek ji wan ew heq nîne ku bêje ya min fêhm kirî durist e û bes. Mesela, der heqê vê hedîsa şerîf da mirov dikare hem bi awayek orfî û me'mûlî me'ne bike; ji nimûne ra mirov bêje: Xwedê bi Xwedê nas bikin, yanî bi eser û nîşanên cihgirtî yên Xwedê, ku eserên xwedatiyê ne, Xwedê nas bikin. Çawa ku hûn dikarin pêxember bi gotin û xeberdanên wî yên cihgirtî nas bikin, ulul emr jî bi kirin û amelên wî, wek emrê bi me'rûf û edalet û qencîhê nas bikin. Nexwe heryek ji wan, bi eser û nîşanên xwe tên naskirin. Evê dijatî nîne gel wê ku me'neyek xweştir, hûrtir û letîftir hebe ku betn û kakilê hedîsê bêt hesabê. Û me'neyek hêj ji wê jî letîftir hebe ku betnê betn û kakilê kakil hesab bibe. Welhasil, peyva weliyan gel xeberdana yên wek xwe qiyas neke, çawa ku qiyaskirina wan jî gel xwe nadurist û naheqî ye. Li vêderê ez nikarim berfireh ji vê kurtegotinê û nukta wê baxivim.

Ji tiştên ecêbên tên gotin, ew e ku hinek ji xeletkirinê ra dibêjin: Gotinên îmamên hîdayetê (a.s) ji duristkirina xelkê ra dibêjin, gereke gora fêhma orfê be, ne ku gotinên deqîqên felsefî û îrfanî. Lê ev iftirayek ecêb û mezin e li wan ku ji ber lênekolîn û melheze nekirina di exbarên Ehlê Beytê (a.s) da û ji ber hinek tiştên dî tê gotin.

Ecêba! Eger enbiya û ewliya meselên hûr ên tewhîdê û zanînan ji xelkê ra nebêjin, kî wê bêje? Ma mearifan, meselên hûr û kûr nînin û her kes di wê da wekhev e? Gelo mearifên Mîrê bawerdaran (a.s) wek yên me ne û hema ev marîfetên amiyane ne, an ferq dikin? Ma hînkirin ne lazim e? Ew ên gotina sunetên xew û xwarin û destbabê paşve nehiştîn, ma wê ji mearifên îlahî ku xilaseka mexseda weliya ye xafil bibin? Ecêbtir ji wê ew e ku hinek ji wan ku eva xeberdana dibêjin û eva me'na înkar dikin, der heqê hedîsên fiqhî da ku bêşik fêhma wan gereke gora orfê be, wisa deqîq û hûr jê daxivin ku orf li cihê xwe, aqil ji ber wê şaş û heyirî dimînê! Vêca ewê nisbet didin bal irtikaza orfî ve! Kesê înkar dike, bila binhêre qaîdeyên kullî yê babetê “alel yed”[1] û… nexasima di behsa kirin û firotinê da.

Welhasil, xeberdan ji kontrolê derket û qelemê serî stand û nivîser Xwedayê Teala dike şahid ku mexsed ji vê xeberdanê hema tenê ew e ku ez birayên îmanî binasînim gel mearifên îlahî.

1- Îşare ye bal qaîda fiqhî ve, ji zanîna pitir ra binhêrin: Ewaidul Eyyam, Molla Ehmedê Neraqî, aida 33-ê.

## HEDÎSA SÎ Û HEŞTÊ

بالسّند المتّصل إلى الشّيخ الجليل عماد الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينيّ، رضوان الله عليه، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد بن خالد، عن أبيه، عن عبد الله بن بحر، عن أبي أيّوب الخزّاز، عن محمّد بن مسلم، قال:

**«سَألتُ أبا جعفرٍ، عليه السّلام، عَمّا يَرْوُونَ أنّ الله خَلَقَ آدمَ، عليه السّلام، عَلي صُورَتِه. فقال: هِيَ صُورَةٌ مُحْدَثَةٌ مَخلُوقَةٌ، [و] اصطَفاها الله واخْتارَها عَلي سائِرِ الصُّوَرِ الْمُخْتَلِفَةِ، فَأضافَها إلى نَفْسِه كَما أَضافَ «الكَعْبَةَ» إلى نَفْسِه، و «الرُّوحَ» إلى نَفْسِه، فقال: «بَيْتى» و «نَفَخْتُ فيهِ مِنْ رُوحي.»**

Cenabê Muhemmedê Muslim dibêje: «Min ji hezretê Baqir (a.s) pirsî der heqê vê gotinê da ku riwayet kirine: "Xwedê Adem (a.s) ser şiklê xwe çêkiriye". Kerem kir: "Ew [Adem] şiklek nû û mexlûq bû, vêca Xwedê Teala ew ji nav şiklên muxtelif bijart û nisbeta wî da bal xwe ve, wek çawa nisbeta Ke'bê û ruh dayî bal xwe ve û kerem kiriye: «Mala min» û «min ji ruhê xwe pif kirê».[1]

### Şîrove:

Destpêka hedîsê ji wan hedîsên meşhûr e ku ji zemanê îmaman ve heta zemanê me di kitêbên herdu biran da ser wê xeberdan çêbûye. Îmam Baqir (a.s) jî gotina wê tesdîq kiriye û me'neyek jê ra gotiye. Lêbelê Şêx Sedûq di Uyûnu Exbar er-Riza da ji îmamê heştê hezretê Riza (a.s) hedîsek gêraye ku me'na wê ev

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 134-ê.

e: «Husêynê kurê Xalid dibêje, min gote hezretê Riza (a.s) xelk ji Resûlê Xwedê (s.a.a) neqil dikin ku got: “Xwedê, Adem ser şiklê xwe çêkiriye”. Hezretê Riza (a.s) weha got: “Xwedê wan bikuje! Ewa destpêka hedîsê jê avêtine. Resûlê Xwedê (s.a.a) ber du kesa ra derbas bû ku xeber û dijûn didan hev; bihîst ku yek dibêje yê dî: “Xwedê te û yên wek te kirêt û pintî bike”. Vêca Pêxember (s.a.a) gotê: “‘Evdê Xwedê! We nebêje birayê xwe, çiko Xwedayê ezîz û celîl Adem li ser şikl û şemala wî çêkiriye”.

Ji ber vê, rehmetiyê Meclisî, gotina hezretê Baqir (a.s) aliyê teqiyeyê ve biriye. Her weha gotiye ev me'na hingê ye ku fereza selimandibe. Lê ev îhtimal gelek dûr e. Çêdibe hedîsa hezretê Riza (a.s) bi aliyê hedîsa yekê ve bêt zivirandin ku mexsed ji «Adem» new'ê ademî be û demîra «sûretihî» li Heq Teala bizivire û hezretê Riza (a.s) ji ber ku rawî, ne ehlê fêhma hedîsê bûye, destpêka hedîsê gêraye ku ew kes goman bike mexsed ji Adem, ne new’ e, belkî bavê beşer e, vêca demîra «'ela sûretihî» li wî mirovî bizivire. Têde melheze bike.

Belkî jî herdu hedîs hatibin gotin. Carekî Resûlê Xwedê (s.a.a) pêş pêşqewimînekî ew gotibe, yanî hedîsa ku hezretê Baqir (a.s) şîrove kiriye. Carekî jî piştî wê qewimînê gotibe û hezretê Riza (a.s) ji ber ku rawî nikariya me'na wê ragire, xeberdan bi wî alî ve bir ku ewê meselê pêşqewimînek hebû. Şahidê vê me'nê ew e ku di hinek riwayetan da şûna «ser şiklê wî», «ser şiklê Rehman» hatiye.(1) Û eva he gel hedîsa ku di kitêba Uyûnê da hatiye, rêk nakeve.

Fereza ku ev hedîsa şerîf, nehatibe gotin, lê me'na wê gora ku înşaallah em ê ronahî bikin di hedîsên dî da bi awayekî heye. Niha em li kelîmên hedîsê bizivirin:

Adem, di Sihahê da gotiye ku eslê wê bi du hemza ye, çiko eslê wê «ef’ele» ye. Hemza duwê bedel bûye bi elif û dema bixwa-

1- Tefsîra Quranê, Sedrul Muteellihîn, c. 2, p. 235

zin ewê bi hereke bixwunin, bedel dikin bi “waw”, cem'a wê bi awayê: Ewadim, anîne. Gotina Sihahê xilas. Eva he ku ji bavê beşer ra gotine Adem, belkî ji ber wê be ku ew esmer bûye. Çiko di luxet da hatiye: Adem ji nav mirovan, yanî ew ê esmer. Di hinek hedîsan da jî hatiye ku ji ber wê yekê ji Adem ra adem hatiye gotin, çiko ji «edyem»ê erdê yanî rûyê erdê hatiye çêkirin.

Sûret, di luxet da bi me'na şikl û heyet e. Çêdibe bêt gotin ku me'neyek giştiya muşterek di çend tişta da jê ra heye, ew muşterek ji şey’iyeta şey’ê û fiîliyeta wê pêk tê. Lê çiko ji her tiştekî ra fiîliyetek heye, bi îtibara wê jê ra xweyê sûret tê gotin û ew ê fiîliyetê sûretê wê dihesibînin. Eva he ku di felsefê da sûret ji wan tiştan ra dibêjin ku cami’ê wê hema fiîliyeta şey’ê û şey’iyeta wê ye, eva he ne muxalifê luxet e û nayê gotin ku ji pêka navdanîn û îstilahê ye. Şêx Ebû Alî Sîna, reîsê feylesofên Îslamê di îlahiyata Şifayê da weha dibêje: “Carna ji her heyet û fiîlekî ra ku qabilê wehdanî an murekebê be, jê ra sûret tê gotin; heta eger ku herekat û e'raz sûret bin. Û sûret ji wê ra tê gotin ku madde bilfiîl bi wê xwe ragire. Nexwe ji cewahirên aqliye û e'razan ra sûret nayê gotin. Û sûret ji wê tiştê ra tê gotin ku madde pê wê kamil bibe, gerçî bilfiîl muteqewimê bi wê nebe; wek sihetê û wê tişta ku bi awayê tebî'î wî alî ve bibizive. Û sûret ji new' û cins û fesla tiştê ra tê gotin û ji hemû yê wan ra jî. Û kulliyeta kull di eczaan da jî sûret e”. Xilas.

Bi melheza gotinên jorî kifş dibe ku mîzan di hemûyê wan da «fiîliyet» e û bi awayê îştiraka me'newî di hemû cihan da bi kar tê birin, heta ku ji Heq Teala ra jî tê gotin: «Sûretus Suwer».

Sefwe, bi me'na xalis û safî ye, îstifa jî bi me'na ji xwe ra girtina ya xalis, safî û zelal e û lazima wê ye. Lê Cewherî û xêncî wî jî «îstifa» bi me'na bijartin û îxtiyar me'ne kirine, çawa ku îxtiyar jî bi me'na îstifa me'ne kirine. Ev jî dîsa tefsîra bi lazimê wê ye, çiko îxtiyar jî bi me'na ji xwe ra girtina başiyê ye, ji ber wê dibe mulazimê îstifaê di xaric da, ne ku mefhûmê wê ye.

Ke'be, navê mala Xwedê ye. Hineka gotiye çiko wek muke'ebê ye jê ra Ke'be hatiye gotin, an jî ji ber ku çargoşe ye.[1] Di îstilaha riyazî da muke'eb cismeke ku şeş sethê musawî [wekhev] ser zewayayên [goşe] qaime [rasterast] ew di xwe da girtibin.

Ruh, di orfa tebîban da, hêlmek letîf e ku ji germiya xûna candaran di dil da çêdibe. Gotine dil du kortik hene: Yek li aliyê rastê ku xûn ji kezebê bi wî alî ve dikişe û germiya dil ewê li wêderê dike hêlm û ew hêlm dadikeve û bi aliyê kortika layê çepê da diherike û ji ber karê dil li wêderê letafetek jê ra çêdibe û ruhê candar jê çêdibe, pê girtî û vebûna [qotqotîna] qelb di rehan da diherike, çawa ku di cihê wê da hatiye gotin. Nexwe serçavka vî ruhê heywanî, qelb e û cihê herikînê jî reh û demar in. Carna ji xûna ku di kezebê da ser hevda tepisî ra ku cihê herikîna wê ewder e ye dibêjin ruh; ew ruhê tebî'î ye. Çawa di îstilaha hukema da jî carna ji ruhê nefsanî ra dibêjin ruh, ku mebdeê wê mêjî û herikîna wê di 'eseban da ye; ew jî zuhûr û daketina ruhê muceredê «emrî» ye ku sirra subhanî û «ruhullah» e, di: «nefextu fîhî min ruhî», da îşare pê hatiye kirin. Em ê paş niha behsa wê bikin ku ew ruhê bijartî yê Xwedê ye ku bi nefxa îlahî hatiye pifkirin.

**Vebir: Adem, mezherê temamê îlahî ye**

Bizane erbabê marîfet û ehlê dil dibêjin: Ji heryek ji navên Xwedê ra di hezretê wahidiyetê da sûretek heye ku tabi'ê tecellî ya bi feyza eqdes e di hezretê ilmiye da, ji ber huba zatî û xwestina kilîdên xeybî ku ji wî pê ve kes pê nizane.[2] Di îstilaha ehlullah da, ji wî sûretî ra dibêjin «'eynê sabit». Û pê vê tecelliya feza eqdes, cara yekê te'eyyunatên esmaî dest ve tên; û pê van te'yînên ismî, sûretên esmaî ku e'yanên sabite ne, çêdibin. Û yekemîn navê ku bi tecelliya ehediyetê û feyza eqdes di hezretê ilmiye yê wahidiye da eşkere dibe û mir'ata wê tecellî dide, navê mezinê cami'ê îlahî

1- Mecmeul Beyan, tefsîra ayeta 97-a sûretê Maide.

2- En'am / 59

û meqamê musemma yê «Allah» e ku di wecheya xeybî da ‘eynê tecelliya bi feyza eqdes e, di tecelliya zuhûrî da jî kemala cela û isticlaê, ‘eynê meqamê cem'a wahidiyetê ye bi îtibarekî û zêdahiya esmaiye jî bi îtibarek dî. Û te’eyyuna navê cami’ û sûretê wê ji ‘eynê sabitê însanê kamil û «heqîqeta Muhemmediye» ye (s.a.a). Çawa ku mezhera tecellî ya feyza eqdes jî, feyza muqedes e. Tecelliya meqamê wahidiyetê jî meqamê ulûhiyetê ye; mezhera tecellî ya ‘eynê sabitê însanê kamil, ruhê mezin e. Mewcûdên dî yên esmaî û ilmî û ‘eynî mezherên kulliye û cuziye yên van heqîqeta ne, bi wê rêzka bêmisala ku evder ne cihê wê ye û di risala Misbahul Hidaye da bi dirêjî me jê axiftiye.

Ji vêderê xweyha ku însanê kamil, mezherê navê cami’ û mir’ata tecellî ya ismê e'zem e, çawa ku di kitêb û sunetê da bi vê me'nê îşare hene: Xwedê kerem dike: «Adem elimand hemû navan».[1] Ev elimandina îlahî bi texmîra xeybî ya cem'î bi du destên cemal û celalê nisbet bi navdeyê Adem di hezretê wahidiyetê da pêk hat, çawa ku texmîra sûret û eşkere yê wî di alema şehadeyê da bi destên cemal û celalê di mezherê tebîet da hat danîn. Û Xwedê Teala kerem kiriye: «Înna ‘eredna el-emanete ‘ela essemawati wel erd...»[2] Û emanet di meşreba ehlê îrfanê da wîlayeta mutleqe ye ku ji mirovan pê ve kes ne layiqê wê ye. Wilayeta mutleqe jî hema meqamê feyza muqedes e ku di kitêba pîroza Quranê da Xwedê Teala pê vê ayetê îşare dike balê ve: «Kullu şeyin halikun îlla wecheh».[3] Di hedîsa şerîfa Kafiyê da jî ji hezretê Baqir (a.s) neqil bûye ku: «Nehnu wechullah». Û di dua Nudbe da hatiye: «Eyne wechullah ellezî ileyhi yetewеccehul ewliya? Eynes sebebul muttesil beyne ehlil erd wes sema» di ziyareta Cami’e ya Kebîre da jî hatiye: «Wel meselul e’la». Ev «meseliyet» û «wechiyet” hema ew e ku di vê hedîsa şerîf da hatiye: «Înnellahe xe-

1- Beqere / 31

2- Ehzab/ 72

3- Qeses / 88

leqe ademe 'ela sûretihî». Yanî: Adem mesela e'la ya Heq Teala û ayetullahê kubra û mezherê etemm û mir'ata tecelliyatên esma, sifetî wechullah, 'eynullah, yedullah û cenbullah e. Ev wechullah jî hema ew e ku di ayetê da hatiye: "Allahu nûrus semawat wel erd".[1]

Hezretê Baqir (a.s) di hedîsa şerîfa Kafiyê da dibêje Ebû Xalidê Kabulî: «Wellahî ew in ronahiya Xwedê di erd û ezmanan da». Di Kafiya şerîf da di tefsîra ayeta: «'Emme yetesaelûn 'enin nebe-il 'ezîm»[2] ji hezretê Baqir (a.s) neqil bûye ku ev der heqê Mîrê bawerdaran da ye.

Welhasil, mirovê kamil ku Ademê ebulbeşer yek ji wa ye, mezintirîn ayet û mezahirê esma û sifetên Heq Teala ne. Û Xwedê ji misl û şebîhan muberra û dûr e, lê negerek zatê muqedes ji meselê bi me'na ayet û 'elamet û nîşan bêt tenzîh kirin: «We lîllahil meselul e'la».[3] Hemû zerratên kainatan nîşan û mir'atên tecellî ya wî cemalê cemîl in. Lê heryek qas û gora xwe, digel vê jî çi yek nabe ayeta ismê e'zemê cami', yanî Allah, ji hezretê kewnê cami' û meqamê muqedesê berzexiyeta kubra pê ve...

Ji vêderê sebebê bijartina sûretê cami'ê însanî ji nav sûretên muxtelifên ekwanên dî, her weha remz û raza sergirtina Adem (a.s) ser melaîketan û nisbetdana ruhê wî bal xwe ve: «We nefextu fîhî min ruhî»[4] kifş bû. Lê çiko me li ber e em kurt biaxivin. Êdî me behsa heqîqeta nefxe ya îlahiye û çawaniya wê di Adem da û taybetiya wê ji wî ra nekir. «Wel hemdu lillah ewwelen we axira».

---

1- Nûr / 35

2- Nebe / 1-2

3- Rûm / 27

4- Hicr / 29 û Sad / 72

## HEDÎSA SÎ Û NEHÊ

بالسّند المتّصل إلى ركن الإسلام، محمّد بن يعقوب الكلينىّ، رضوان الله عليه، عن عدّة من أصحابنا، عن أحمد بن محمّد بن خالد، عن ابن محبوب و عليّ بن الحكم، عن معاوية بن وهب، قال سمعت أبا عبد الله، عليه السّلام، يقول:

**«إنّ مِمّا أَوْحَي الله إلى مُوسي، عليه السّلام، و أَنْزَلَ عليه فى التّوراة: أنّي أنا الله، لَا إله إلاّ أنا. خَلَقْتُ الخَلْقَ و خَلَقْتُ الخَيْرَ، و أَجْرَيتُه علي يدى مَن أُحِبّ، فَطُوبى لِمَن أجريْتُه علي يديه. و أنا الله لا إله إلاّ أنا. خَلَقْتُ الخَلْقَ و خَلَقتُ الشَّرَّ، و أجريْتُه علي يدى مَنْ أُريدُه، فَوَيْلٌ لِمَنْ أجريتُه علي يَديْه.»**

Muawiye kurê Weheb dibêje: «Min ji hezretê Sadiq (a.s) bihîst digota: "Ji wan tiştên di Tewratê da hatiye û Xwedê wehy kiriye ji hezretê Mûsa (a.s) ra ev bû ku: "Hema ez im ew Xwedayê tu xweda ji min pê ve neyîn. Min xelk xuliqand û başî jî xuliqand. Vêca min ew bi destê wî yê ez hejê dikim herikand, xwezika wî yê min başî ser destê wî herikandî. Û ez im ew Xwedayê xêncî min tu xwedê neyîn. Min xelk afirand û xirabî jî afirand, min ew bi destê kesê min viyayî herikand, vêca nexwezika wî yê min ew ser destê wî herikandî".»[1]

### Şîrove:

Elehe, bi me'na îbadet e, îlah, bi me'na mef'ûl e, wek îmam, bi me'na wî yê dikevin pey wî ye. Îlah, eslê Allah e ku piştî hatina

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 154-ê.

elif û lamê, hemze ji sivik kirinê ra ji nav birine. Hineka gotine elif û lam, ji ber hemzê ve ne. Heryekî ji van du gotina delîlek edebî heye ku jê xeberdana wan lazim nîne. Di zimanê xwedêyiya da jî «îlahiyet» û «ulûhiyet»ê zêdetir ji meqamê tecellî ya bi fiîl û meqamê feyza muqedes ra dibêjin. Allah jî ku lefza celale ye, xalib ji meqamê zatê mustecme'ê sifetan ra bi kar dibin. Carna jî bervajî bi kar tê birin. Îhtimal heye di vê hedîsa şerîf da bi me'na luxewî ya orfî bi kar hatibe, yanî: Ez me'bûd im û xêncî min me'bûd nînin. Eger bi vê me'nê be, me'na wê dibe ev ku hema bendetî tenê ji wî ra tê kirin û kes dî ne musteheqê wê ye, gerçî ji ber xeletî ya xelkê, tiştên dî jî dibin me'bûd. An jî gora gotina ehlê dil û erbabê marîfetê ye ku îbadet di her şiklî da îbadetê kamil mutleq e û mirov bi hesebê: «Fitretellah elletî feteren nase aleyha» (Rûm/30) li pey cemîlê alel itlaq e, gerçî ew ji vê fitretê hatibe perdekirin jî û xwe girêdayî bi mute'eyyin û te'eyyunê ve goman dike.

Belkî jî ji ber binê hedîsê ku nisbeta xêr û şerrê dide bal xwe ve, mexsed ji îlah, hema meqamê ulûhiyetê be û eva he îşare be bal tewhîda ef'alî ve ku li ser zimanê hukemayên giranqedr jê ra weha hatiye gotin: «La muesire fil wucûdi îllellah». Em ê di pey ra jê xeber bidin.

Lêkol, rehmetiyê Meclisî di biniya vê hedîsê da der heqê xeyrê da weha dibêje: «Xêr û şer ji guhdarî û neguhdariyê ra bi kar tên, gora cihê xwe ji tiştên bi feyde ra bi kar tên wek: Dan û fêkî û heywanatên goştê wan tê xwarin, her weha ji tiştên zerer têda heyî ra jî bi kar tên wek: Jehriya mar û dûpişkan, welhasil ji nîmet û belan ra bi kar tên". Eşaire dibêjin: "Ev hemû fiîlên Xwedê ne". Mutezile û Îmamiyan di ef'alê îbadan da gel wan muxalifet kirine û riwayetên heyîn bi vî awayî tewîl kirine ku: Heq Teala xêncî di ef'alê îbadan da bi hemû me'nên dî xaliqê xeyr û şerrê ye». Di pey ra weha dibêje: "Pirtirê hukemayan dibêjin: Di wucûdê da eserdaner ji Xwedê pê ve nînin. Û îrada bendan mu'id û zemîneçêker e ji wî qasî ra ku Xwedê Teala bi destê wî karan bide

kirin, eva he jî muwafiqê gotina hukema û Eşaire ya ye, çêdibe ev gotin bê paldan ser teqiyê ve”. Gotina wî xilas.

## Vejenîna xêr û şerrê

Xêr û şer di her cihî da ji kemal û neqsa di zat an sifetan û, di wucûd û kemalatên wucûdê da bi kar tê. Xêrat hemû bizzat li heqîqeta wucûdê dizivirin, eger ji tiştên dî ra bi kar tên, ji ber melheza şiklê wucûda wa ye. Çawa ku şer jî bizzat ‘edemê wucûd an ‘edemê kemala wucûdê ye û bikarbirina wê ji tiştên dî ra wek eziyetker û heywanên zererê digehînin bil’erez e. Eva he gora melheza layên wê gereke ji zerûratan hesab bibe û digel wê jî delîla qewî li ser heye.

Eva he ku gotî di behsa xuliqandina ef'alê îbadan da Îmamiye û Muteziliyan gel Eşariyan muxalefet kirine û ayet û hedîsên vê der heqê da tewîl kirine, der heqê muxalefeta Eşariya da ku mesleka nedurista cebrî hene û gel aqil, delîl û ya heyî rêk nakeve, ev durist e. Lê ayet û exbar gel fikra Muteziliyan rêk nakevin, ku mesleka wan tefwîzê ye û mesleka wan hêj ji ya Eşariyan neduristir û xirabtir e.

Lê vêca Îmamiye bi ronahiya Ehlê Beytê û bereketa binemala wehyê (a.s) mesleka heq girtine ber xwe ku rêketî ye gel ayetên şerîfe û burhanên cihgirtî û mesleka arifan û ehlê dil. Ne wek gotina evî muhedisê rehmetî ye û ewa qet îhtiyacî nîne bi tewîla ayeta û hedîsan ku pir in, belkî Îmamiye û îmamên wan qet di tu yek ji ef'alê îbadan da îrada Xwedê nadênin rexekî û qet karê tiştekî jî bi hêviya bendan ve nahêlin.

Vê der heqê da ku gotiye: “Zêdetirê hukeman gotine ku: Di hebûnê da ji Xwedê pê ve çi eserdêner nînin û eva he rêketî ye gel rêçka Eşariya, der heqê qismê yekê da ku hekîman gotî: Di hebûnê da ji Xwedê pê ve tu eserdêner nînin”, durist e û belkî çêdibe bêt gotin ku ev gotina hemû hukema û ehlê marîfetê ye -belkî gotine ku çi hekîmê vê gotinê nebêje, nûra hikmetê neketiye dilê

wî û navdeyê wî negihaye marîfetê- lê me'na wê ne ev e ku îrada ebd mu'id û hazirker e ji bona îcada Heq Teala, çawa ku li bal ehlê wê eşkere ye. Û neweye ku rêketî be gel gotina Eşaireya. Ya xerîbtir ew e ku rêçka Eşariya bi aliyê rêçka hukeman ve palda-ye! Halhale ji hev dûr in û kêmtir kes ji hekîmên vejen hene ku rêçka wan nedurist nezanîbe û muxalefeta wan nekiribe.

Lê behsa wê ku çêdibe ev exbar bi aliyê teqiyê ve bên paldan, eva he bê me'ne ye; çiko eşkereyê van exbaran rêketî ye gel rêçka du-rist û delîlê; xêncî ji wê jî ev exbar rêketî ne gel pir ayetên kitêba pîroz û çênabe ayet û hedîsên rêketî gel ayetan bi aliyê teqiyê ve bên birin. Ya sisê jî ev ku, riwayetên dijê van exbaran nînin, da di meqamê dijatiyê da bi aliyê teqiyê ve bên birin, ku yek ji mure-cihata ye, ji ber wê tê cem'kirin gel wê ya dibêje însan failê xêr û şerrê ye. Ya çarê jî ev ku, ya ewî gotî ku muwafiqê rêçka Eşariya ye, we xuya dike ku ne rêçka xalib û pir bûye. Çiko weha ye, cih ji heml û birina ser teqiyê ra namîne. Pênc, çawa ku ronahî ye, ev babet û dîtir babetê baweriyê, ne ji cihên murecihata ye di babetê exbarên dij da.

Cewherî dibêje: Tûba di esl da ji «teyyib»ê ye û ji ber berra pêş xwe da “ya”a wê qelb bûye bi “waw”.

Mecmeul Beyan dibêje: «Tûba lehum - jiyana xweş ji wa ra ye». Her weha hatiye gotin ku bi me'na xêr û xweşiya bênihayet e. Hineka jî gotiye Tûba navê darek ya bihiştê ye, ev jî gotine ku Tûba di zimanê ehlê Hindê da navê bihiştê ye. Tûba leke û tûba-ke, herdu bi kar tên. Di xeberekî da ji Resûlê Xwedê (s.a.a) neqil bûye ku: «Tûba, dareke di bihiştê da, koka wê di mala min da ye û çiqên wê di mala Alî da ye».[1]

Cewherî dibêje: Weyh, kelîmeyeke ku ji merhemetê ra bi kar tê û «weyl» ji ezab ra tê gotin. Yezîdî dibêje herdu bi yek me'nê ne. Bi ref'ê tê xwendin ser ibtidaiyetê, bi nesbê jî tê xwendin bi teqdîra

---

1- Mecmeul Beyan, tefsîra sûretê Re’d, ayeta 29-ê.

fiîlekî, wek: Elzemehullahu el-weyle. Hineka gotiye weyl dûleke di dojehê da ku ji ber germa pir, eger tu çiyan bavêjî têda, wê bihelin. Hineka jî gotiye navê çaleka dojehê ye.[1]

**Vebir: Xêr û şer girêdayê bi îcad ve ne**

### Şer di qezaya îlahî da

Di ulûmê aliye da ronahî bûye ku sîstema wucûdê di bilindtirîn merteba kemal, başî, husn û cemalê da ye. Eva he bi awayek kurt bi awayeka burhana limmî û bi awayek dî bi şiklê tefsîl, sabit e; gerçî agahî ji tefsîla wê taybetê zatê îradekerê wê «teqeddeset esmauh» an wehy û hînkirina îlahî ve girêdayî ye. Ewa ku munasib e di van kaxizan da bêt gotin ev e ku: Pêşda me got ewa ji sinxê kemal, cemal û xêyriyetê, ji eslê heqîqeta wucûdê ne xaric e, çiko ji wê pê ve ji tiştek dî ra tehequqî nîne û kifş e ku di beranberê heqîqeta wucûdê da ‘edem e an mahiyet, ku çi yek ji wan jî bi hesebê zat û xwe bi xwe netiştek in û bêbiha ne û butlana sirfan îtibara sirf in û heta bi nûra wucûdê nûranî nebin û pê wê eşkere nebin, yekcar ji wan ra subûtek nîne -ne subûta di zat da, ne jî di sifet û eseran da- û hingê ku wucûdê, ew li ber sîbera xwe girtin û destê merhemetê ser serê wan da hat kişandin, heryek dibin xweyê eşkerehî û eseran. Nexwe kemalat hemû bi cemala cemîlê alel itlaq û teceliya nûra muqedesa kamila mutleq e, mewcûdên dî tiştek ji xwe nînin û muhtaciya xwerî û laşeyê mutleq in. Nexwe gora vê, hemû kemalat ji wî ne û li wî dizivirin.

Her weha di cihê xwe da hatiye nivîsîn ku ewa ji zatê muqedes çêdibe, eslê haqê wucûdê û sirfa metnê heyînê ye bê wê yekê ku bi sînorên ‘edemî û mahuwî hatibe sînorkirin, çiko ‘edem û mahiyet ne sadir e. Mehdudiyeta di feyzê da jî ji mehdûdiyeta mufîz e. Û kesê çawaniya ifaze û feyzê bi awayê ehlê marîfetê gotine bizane, wê tesdîq bike ku di feyza xaliq da qet tehdîd û

---

1- Tefsîra Kebîr, c. 3, p. 140

sînor û teqyîd çênabe. Nexwe wek çawa gereke zatê muqedes bêt tenzîhkirin ji neqs, îmkan û mehdûdiyetê, feyza wî ya muqedes jî gereke ji hemû sînor û îmkaniye û îmkanatên li mahiyetê dizivirin û teqyîdatên li hudûd û neqaisan dizivirin, paqij, tenzîh û teqdîs bibin. Nexwe feyza wî ku sîha cemîlê mutleq e, cemîlê mutleq û cemala tam û kemala temam e û xêncî ji eslê wucûdê, ne muteeliq e bi ce'l û îcadê ve.

Her weha di cihê xwe da delîl ji vê ra heye ku: Hemû şurûr û bela, nexweşî û qewimînên 'ecîb û xerîb... ku di vê alema tenga tebîet da heyîn, ji ber lihevketin û dijatiya nav mewcûdatan da ye, ne ji cihet mewcûdiyetê ve, belkî ji ber kêmasiya di neş'eya tenga cihê sekina wan da ye. Eva he jî li hudûd û kêmasiyan dizivirê ku bi temamî ji hîteya nûra ce'lê der e û di heqîqet da bin ce'lê ra ye. Eslê heqîqetê, nûra wucûdê ye ku dûr e ji hemû awayên şurûr û eyb û kêmasiyan. Lê vêca neqs, şurûr û tiştên zerergihên û azarder, gerçî ji cihet neqs û zerer ve bizzat ne mewridê ce'lê ne, lê bil'erez mewridê ce'lê ne, bi hesebê nêrîna behsî û burhanî, çiko eger eslê alema tebîet muteheqeq nebe û ji cihet wucûdî ve mute'elleqê ce'lê nebe [neqais û şurûr di wê da çênebin] çawa ku nef', xêr û kemal jî têda nebin; çiko e'damên ji vê pêkê, nebûnên mutleq nînin. Belkî nebûnên muzaf in ku bi tebe' melekatên tehequqek bil'erez ji wan ra heye; qeziyeya mun'eqideya ji wan qeziyeya me'dûl e an mûcibeya salibetul mehmûl e, ne salibeya muhessel e.

Hasil ev ku: Ewa bizzat muteeliqê xilqetê û li ber ce'la îlahî, xêrat û kemalat in. Texellula şurûr û zerergihêna... di qezaya îlahî da bi tebe' û incirar e. Ayeta şerîfe ji meqamê yekê ra îşare kiriye li wêderê ku kerem dike: «Ma esabeke min hesenetin fe minellah we ma esabeke min seyyietin fe min nefsik»[1] û ayeta: «Qul kullun min 'indillah»[2] jî îşare kiriye bal meqamê duwê ve. Her weha di

---

1- Nisa / 79

2- Nisa / 78

gelek ayetan û hedîsên Ehlê Beytê da îşare hatiye kirin bal van herdu îtibaran ve, yek ji wan ev hedîsa şerîf e ku kerem dike: «Xêr û şer, herdu muteeliqê ce'l û xilqetê ne».

**Vebir: Herikandina xêr û şerran bi destê evdan**

Bi fikirîna di gotinên borî da ji ehlê wê ra derdikeve ka çawan Heq Teala başî û nebaşiyê bi destê bendan dide kirin, bê wê yekê ku cebr bêt pêş. Lêkolîna wê jî bi awayê ku mesele ronahî bibe girêdayiye bi beyana rêçk û pêşekiyên zehfî ve ku li vêderê em nikarîn jê xeber bidin, lê îşareyek jê ra lazim e bi awayekî ku munasibê vê xeberdanê be.

Bizane ku îstiqlala tu mewcûdekî di tu kar û amelan da çênabe, îlla ku fail û mûcid hemû e'damên caiz li ber me'lûl bigire, ku eger mewcûdek di wucûdê da xweyê sed şertan be û illet ji layê nod û neh şertan ve pêşiyê li e'damên mumkine yên me'lûl bigire û yek şert tenê bimîne. Çênabe ku ew illet di çêbûna wî me'lûlî da musteqil û serbixwe be. Nexwe serxwebûna di illiyetê da bi wê yekê ve girêdayî ye ku ew illet pêşiyê li hemû e'damên mumkine li ber me'lûl bigire heta me'lûl bigehîne heddê wucûbê û mewcûd bike. Û bizzerûre û burhan me'lûm e ku di hemû daira îmkanê da ji qatinînê ceberûtê uzma û melekûtê uliya heta bi sakinên alema mulk û tebîet, hemû quweyê fe'ale yê batin û zahir, ne di vî şan û meqamî da ne. Çiko yekemîn ‘edemî ku ji me'lûl ra caiz e, ‘edema wê bi ‘edema illeta faile û eserkere, di silsila mumkinatan da jî mewcûdek tune ku ji vî cihetî ve pêşiyê li ‘edema me'lûl bigire. Çiko eva he mustelzimê înqilaba îmkana zatî bi wucûba zatî û xurûca mumkin ji hudûdê buq'a îmkanê ye. Eva he jî di bedîhiyeta aqilê zerûrî da mehal e. Nexwe ev derket ku îstiqlala di îcadê da îstiqlala di wucûdê da dixwaze û eva he di mumkinatan da çênabe. Û ji vê beyanê kifş bû ku tefwîz di îcadê û çi yek ji şuûnên wucûdiye ji çi mewcûdekî ra çênabe, ev ne taybet e ji mukelef û kiryarên wan ra, gerçî bi hesebê kelîmên ji devên mutekeliman dertên, taybetî tê fêhmê, lê giştîbûna niza'ê ji

babetên muxtelif tê fêhmê, lê ev heye ku çiko xeberdan der heqê ef'alê mukelefan da muhim e, ji ber wê ye ku di rêçka kelamiyan da ji xirecira wê der heqê da xeberdane. Welhasil me şol bi xirecira mutekeliman nîne û em li pey tehqîq û lêkolînê ne û eva he kifş bû ku qet di tu yek ji karan da û ji tu mewcûdekê ra îmkana tefwîzê tune.

## Betalkirina cebrê

Batilbûna rêçka cebriyan jî piştî xeberdana ji wê, wê kifş bibe, bi vî awayî ku ew dibêjin qet tu yek ji wesîlên wucûdiye di îcada mewcûdatan da medxeliyet nînin û mirov goman dike ku medxeliyet hene. Mesela: Hêza agirî qet eser jê ra nîne û herikîna sunetullahê li piş îcada sûretê agirî, germayê çêdike bê wê yekê ku sûretê agirî di wê da medxeliyet hebe; eger sunetullah wereng biherikiya ku di pey sûretê agir ra sarîtî û cemidahiyê çêke, ferq nedikira digel wê ya niha heyî. Welhasil Xwedê bê tewesuta wesaitan, ew pê zatê xwe bi xwe mubaşir e gel hemû ef'alê mukellefan û eserên mewcûdatan. Bi gomana wan, bijartina vê rêçkê ji ber wê ye ku Xwedê tenzîh û teqdîs bikin û destê wî girê nedin: «Xullet eydîhim we lu'inû bima qalû...»[1] ji ber vê tenzîh û teqdîsê! Eva he di rêçk û burhana arifan da mustelzimê neqsê û teşbîhê ye, ew jî vêca mustelzimê te'tîlê ye. Çawa ku me di vebira borî da got ku Heq Teala kemala mutleq û wucûda sirf e û di zat û sifetên wî da sînor û neqs nayin melheze kirin, ewa muteeliq û îcad û ce'la îlahî jî mewcûdê mutleq û feyza muqedesa itlaqî ye û çênabe ku wucûda mehdûdê naqis ji wî zatê muqedes sadir bibe; qet tiştek jî ji neqsê di îcadê da nîne, belkî wek melheza mutekeliman, tehdîd û neqs hemû ji neqsa di mustefîz û me'lûl da ye. Û eva he di cihê xwe da sabit e. Nexwe ew wucûd û me'lûlê ku mumkin e bê wasite girêdayî be bi zatê muqedesê Heq Teala ve, ew mewcûdê mutleq û serîhê wucûd e. Ew jî an feyza muqedes

1- Maide / 64

e, gora mesleka îrfan, an jî aqilê mucered û nûra şerîfa yekê ye, gora rêçka hukeman.

Bi gotinek dî, bêşik mewcûdat di qebûlkirina wucûdê da muxtelif in: Hinek ji mewcûdatan ji destpêkê ve û serbixwe wucûdê qebûl dikin, mesela, wek cewahiran. Hinek ji mewcûdan jî piştî mewcûdbûna tiştek dî û bittebe'ê mewcûdek dî çêdibin û bê çêbûna wan çênabin, wek e'razan û tiştên zeîful wucûd, mesela, xeberdana Zeyd, ku bixwaze mewcûd bibe, ev ji wan tişta ye ku ji bittebe' pê ve çênabe. Mesela heta Zeyd bi xwe çênebe xeberdana wî jî çênabe. Her weha e'raz û ewsafên bê wucûda cewahir û mewsûfan vala ne ji wucûdê û îmkana tehequq û çêbûnê ji wan ra nîne. Eva he ji neqsa zatî û nuqsaniya wucûdî ya van mewcûdan bi xwe ye, ne nuqsaniya di failiyet û mewcûdiyeta Heq Teala da. Nexwe kifş bû ku cebr û nefya wesaitê wucûdiye di silsila mewcûdatan da bê îmkan e.

Ji burhanên qewî yên vî babetî ev e ku: Çawa mahiyat bi hesebê xwe mun’ezil in ji tesîr û teessurê û ce'l bizzat muteeliq bi wan ve nîne, heqîqeta wucûd jî bizatih menşeê tesîrê ye ku nefya tesîrê ji wê mutleqa mustelzimê tesîra zatî ye. Nexwe îcada meratibên wucûdê jî bê eser û menfiyul eserê mutleq ne mumkin e û dibe sebebê nefya tiştê ji zatê xwe.

Welhasil, kifş bû ku tefwîz û cebr herdu di kêşeka burhana temam û pîvekên aqlî da, nadurist in û çênabe û mesleka «emrê beynel emreyn» di terîqa ehlê marîfet û hikmeta aliye da sabit e, lê di me'na wê da aliman (r.a) îxtilafek mezin hene. Û ewa ji nav hemû rêçkan cihgirtîtir û dûrtir ji xirecirê û rêketîtir gel mesleka tewhîdî ya meşreba arifên giranqedr û ehlê dil -lê ev meselek di heryek ji mearifên îlahiye da ji pêka sehlê mumteni’ e ku hella wê bi gotûbêja burhanî çênabe- bê teqwaya temam ya dil û tewfîqa îlahî kes nagihêtê. Ji ber vê gereke ew ji ehlê wê ra bêt dayîn ku ewliyayên Heq in û em xwe bi awayê gotûbêj bikevin vê meydanê. Ew jî ev e ku tefwîzê -yanî serxwebûna mewcûdatan di

eserdanînê da- û cebrê ku nefya tesîrê ye, ji binî ve nefy bikin û menzile ya beynel menzileteynê ku îsbata tesîrê û nefya îstiqlalê ye qebûl bikin û bêjin: Menzileya îcadê, wek wucûdê û ewsafên wucûdê ye: Çawa ku mewcûdat mewcûd in û di wucûdê da ne serbixwe ne û ewsaf ji wan ra hene lê di wê da ne musteqil û serbixwe ne, asar û ef'al ji wan ra sabit e û ji wan çêdibin lê di hebûna xwe da ne serbixwe ne û fewa'il û mewcûdatên ne musteqill in di failiyet û îcadê da. Û gereke bêt zanîn -ku bi melheza gotinên vebira borî kifş bû- ku di gel wê yekê ku başî û nebaşî herdu hem bal heq û hem xelkê ve tên nisbetdan û herdu nisbet jî durist in. Ji ber wê ye ku di vê hedîsê da dibêje: «Min başî û nebaşî bi destê ebdan herikandin», digel wê yekê jî başî bizzat tên nisbetdan bal Heq Teala ve û bil'erez nisbeta wan bal ebda ve ye. Nebaşî jî bervajiyê wê ye; bi mewcûdên dî mensûbê bizzat e û bil'erez mensûb e bal Heq Teala ve. Di hedîsa qudsî da îşare kiriye bal vê me'nê ve: «Ey ewladê Adem! Ez ji başiyên te ra ji te musteheqtir im, tu jî ji xirabiyên xwe ra ji min musteheqtir î».

Me pêşda jê xeber da li vêderê êdî em jê xeber nadin. «Wel hemdulillah ewwelen we axiren».[1]

1- Cewahirus Sunniye, p. 279

## HEDÎSA ÇILÊ

بالسّند المتّصل إلى الشّيخ الأقدم و الرّكن الأعظم، محمّد بن يعقوب الكلينىّ. رضي الله عنه، عن محمّد بن يحيي، عن أحمد بن محمّد، عن الحسين بن سعيد، عن النّضر بن سويد، عن عاصم بن حميد قال قال:

**«سُئِلَ عليُّ بنُ الحُسينِ، عليهما السّلام، عن التّوحيدِ. فقال: إنّ اللهَ عزّ و جلّ عَلِمَ أنّه سيَكونُ فى آخرِ الزّمانِ أَقْوامٌ مُتَعَمِّقُونَ، فَأَنْزَلَ الله تعالى: «قُلْ هُوَ اللهُ أَحدٌ.» و الآياتِ مِن سُورَةِ «الحَديد» إلى قوله: «وَ هُوَ عَليمٌ بِذاتِ الصُّدُورِ.» فَمَنْ رامَ وَراءَ ذلك فَقَدْ هَلَكَ.»**

Asimê kurê Humeyd dibêje: «Der heqê tewhîdê da ji hezretê Seccad (a.s) hat pirsîn, ewî kerem kir: Xwedayê ezîz û celîl zanî ku di axirzeman da wê hinek kormelheze peyda bibin, vêca «Qul huwellahu ehed» û ayetên sûretê Hedîd, heta: «alimun bi zatis sudûr» hinartin. Vêca kesê xêncî ji wê bixwaze, muheqeq li helakêçûye».[1]

### Şîrove:

Cenabê Sedrul Muteellihîn dibêje: Zemanê Asimê kurê Humeyd ne girêdayî bûye di demê saxiya Îmam Seccad ve, nexwe hedîs merfû’ e.

Di destpêka hedîsê da «qale - got» ducar bûye, ev belkî ji ber birîna hedîsê be, an ji xeletiya nivîseran, an fail hebûye ku ji qe-

---

1- Usûla Kafî, c. 1, p. 93; behsa “Tewhîd”ê, b. “Niyyet”ê, h. 3-ê.

lemê ketiye, an fail mehzûf e, gora ku hezf caiz be. An jî failê yekê demîr e ku li Ibn Suweyd dizivire, lê ev gotina paşî gelek dûr e.

Tewhîd wek tef'îl, an ji zêdahiya di fiîlê da ye, bi me'na yekê yek, yanî xayetê wehdetê û nihayeta besatetê. An bi me'na întisaba mef'ûl e ji eslê fiîlê ra, wek: Tekfîr û tefsîqê. Hinek ji zanayan digotan ku ji babê tef'îlê bi me'na întisaba mef'ûl nehatiye, tekfîr û tefsîq jî bi vê me'nê xelet in. Belkî bi me'na gazîkirina ji kufr û fisqê ra ne û gereke şûna tekfîrê da «ikfar» bi kar bêt birin, çawa ku di Qamûsê da jî di madda «kufr» da tekfîr bi me'na întisaba bal kufrê ve nehatiye.

Nivîserê vê kitêbê dibêje: Gerçî min di Qamûsê da nedît ku tekfîr bi me'na întisaba bal kufrê ve bêt, zanayê luxetzanan Cewherî jî, tekfîr bi vê me'nê neaniye û ikfar bi vê me'nê zaniye -wek gotina zanayê ku me jê xeberdayî- lê di kitêbên edebiyatê da yek ji me'nên babê tef'îlê, întisaba mef'ûl bal eslê fiîlê ve hêjmartine û ji misalên wê jî «tefsîq» anîne. Welhasil me'na tewhîdê nisbet dana bal wehdaniyet û yekbûnê ve ye.

‘Emq û 'umq, bi me'na binê çal û kûrtika ye. Ji ber vê yekê ehlê hesabê, vê kelîmê ji bu'da sisê ya cism ra bi kar dibin ku ji aliyê serî dest pê dike heta binî. Çawa ku ji dirêjiyê ra dibêjin bu'da yekê û ji firehiyê ra dibêjin bu'da duwê. Hema ji ber vê ye ku ji mirovê xweyê melhezên kûr û hûr ra dibêjin: Mute’emmiq û ji fikra deqîq ra dibêjin: Hizra ‘emîq û ji fikra sere sere ra dibêjin: fikra ne ‘emîq û ne kûr. Heçweku ji gotinên ilmî ra jî 'umq û bin û kûratiyek hebe ku mirovê mute’emmiq xwe têda berdide û duristiyan ji binê wê dertîne, lê yê sere sere dinhêre, xwe têda bernade.

Ram, bi me'na teleb, xwestin û peyketin e, meram jî bi me'naya tê xwestin e, ku mirov wê dixwaze û li pey e.

Wera’, bi me'na pişt ve ye, carna jî ji pêşve ra bi kar hatiye, nexwe ji ezdada ye. Yanî di me'nên bervajiyê hev da bi kar tê. Bikarhatina wê di van me'na da bi munasebeta me'na yekê ye.

**Vebir: Kurteyek ji tefsîra sûretê pîrozê Tewhîdê**

Bizane tefsîra sûretê mubarekê Tewhîd û ayetên destpêka sûretê Hedîd ji heddê yên wek me der e û rastiya wê ev e ku destpêkirina tefsîra wan, me ji sînorên wezîfê dertîne. Çawa wê însaf be ku yên wek min wê tiştê tefsîr bikin ya ku Heq Teala ji mute'emmiqan û zanayên lêkol ra rê kiriye. Gora di tefsîra Burhan da hatî: «Îmam Baqir (a.s) piştî xeberdana ji remz û raza herfên kelîma mubareka «semed» kerem kir: Eger hinek hebûna ku wî ilmê Xwedê dayî min hilgirin, min ê bi semedê me'na tewhîd, Îslam, îman, dîn û şerî'etê belav bikira».

Cenabê Sedrul Muteellihîn der heqê ayetên sûretê Tewhîdê da weha gotiye: Bizane ku ev şeş ayetên ku hedîsê îşare balê ve kiriye, heryekî ji wan dergehek mezin ji zanîna tewhîd û xwedatiyê ber xwe girtiye û dagirê emrê muhkem e, ji hukmên semediyet û rubûbiyetê. Ku eger dewr û zeman muhlet û derfetê bide arifek rebbanî an hekîmek îlahî ku zanîna xwe ji ber çiraya pêxemberiyê girtibe û hikmeta xwe ji hedîsên ehlê pakî û paqijiyê (a.s) girtibe, heqê wî û heqê wan ayetan ew e ku ji tefsîr û ronahîkirina heryekî ra cildek mezin an çend cildan tijî bike ji nivîsandinan. Hasil ev e ku yên wek min, ne mêrê vê meydanê ye, lê ji ber ku di rêçka aqil da, ji ber zehmet û dijwar çênabe ku ya rehet ji dest bêt dan û derkeve. Em ê hinek ya me ji seydayên biqedr û kitêbên ehlê marîfetê, ronahiya hîdayeta Ehlê Beytê girtî, bi awayek kurt bêjin. «we mînellahil hidaye».

## Îşare bal bismillahê ve

Lazim e bêt zanîn, gora ehlê marîfetê dibêjin, besmela her sûretekî hema bi wî sûretî bi xwe ve girêdayî ye, ne bi «este'în» û xêrê wê ve girêdayî ye. Çiko ismê Allah temamê meşiyetê ye bi hesebê meqamê zuhûrî; meqamê feyza eqdese bi hesebê tecellî ya ehedî; meqamê cem'a ehedî ya esma'a ye, bi hesebê meqamê wahidiyetê. Û alem hemû ye bi îtibara ehediyeta cem'ê, ku kewna camî'e û meratibên wucûdê ye di silsila dirêjî ya su'ûdî ya nuzûlî da; heryek

ji huwiyatên ‘eyniye ye di silsila ‘erziye da, çiko ew musemmayê wan nava ye. Û bi hesebê her sûretekî ji sûretên Qurana pîroz, ku muteeleqê «bismillah»ê ye, di lefzê da û mezherê wê ye di me'nayê da; me'na besmelê ferq dike. Belkî ji xwe bi hesebê her fiîlekî ji fiîlan ku bi bismillahê dest pê dibe me'na wê tê guherîn û ew hema muteeliqê bi wê fiîlê ve ye. Arifê mezahir û zuhûratên navên îlahî, şuhûd dike ku hemû ef'al, e'mal, e'yan û e'raz bi ismê şerîfê e'zem û meqamê meşiyeta mutleqe, eşkere û muteheqiq dibe, vêca di meqamê bi cih anîna wî amelî û kirina wê da, evê me'nê di dilê xwe da çêdike û ewê heta merteba tebîet û mulkê xwe diherikîne û dibêje: Bismillah, yanî bi meqamê meşiyeta mutleqe ya xweyê meqamê rehmaniyetê, ku besta wucûdê ye û meqamê rehîmiyetê ku besta meqamê kemala wucûdê ye. An xweyê meqamê rehmaniyetê ku meqamê tecellî ya bi zuhûr û besta wucûdê ye û meqamê rehîmiyetê ku meqamê tecellî ya bi batin û qebza wucûdê ye: Ez dixwum, vedixwum, dinivîsim û dikim...

Nexwe salikê bal Xwedê ve û arifê bi Xwedê, bi nêrînekî hemû kiryar û mewcûdatan zuhûra meşiyeta mutleqe û fanî yê di wê da dibîne, di vê nêrînê da sultanê wehdetê xurt dibe û bismillahê di hemû sûretên Quranê da û di hemû amel û karan da bi yek me'nê dibîne. Û di wê nêrînê da ku berê wî dikeve ferqê û ferqul ferqê, ji her besmeleyekî ra di destpêka her sûretekî da û di destpêkirina her karekî da me'neyekî jê ra dibîne ku cudayê ji ya dî ye.

Di vî meqamî da ku niha em têda ne, ku meqamê tefsîra sûretê Tewhîdê ye; em dikarin bismillaha wê bi kelîma şerîfa «qul» ve bigirhînin. Hingê mexsed ji bismillahê di kisweya tecrîd û xurtiya tewhîdê da, meqamê meşiyeta mutleqe ye; di kisweta zêdahî û meqamê ber dana zêdahiyan da, te’eyyunat in. Û di meqamê cem'a navbeyna du meqaman da, ku meqamê berzexiyeta kubra ye, meşiyet, bi meqamê wehdet û zêdahî û zuhûr û butûna ye. Rehmaniyet û rehîmiyet jî, bi me'na duwê ne. Û di ayeta: «Qul huwellahu ehed» da, çiko cem'a navbeyna ehediyeta xeybiye

û ulûhiyeta esmaî ye, ji ber wê yekê mexsed navê «Allah» e, bi hesebê meqamê sisê; yanî meqamê berzexiyetê. Vêca ji meqamê xeyba ehedî ji dilê teqiyê neqiyê ehediyê ehmedî yê Muhemmedî ra tê gotin ku: «Qul – bêje», bi hesebê vê neş'eya berzexiye ya kubra bi zuhûra navê Allah, ku ew meqamê meşiyeta mutleqe û xweyê te'eyyun û zuhûra rehmaniyetê ye, hema di wî halî da jî xweyê rehîmiyet, best û qebzê ye.

«Huwe - Ew» îşare ye bi meqamê huwiyeta mutleqe, «min heysu hiye hiye – ji wî cihetî ku ew, ew e», bê wê yekê ku mute'eyyin bi te'eyyunê sifetî an mutecellî bi tecelliyatên esmaî be, heta bi esmaên zatiye jî ku di meqamê ehediyetê da tên îtibar kirin. Û ev îşare ji xêncî xweyê vî dilî û xweyê vî meqamî ne mumkin e. Û eger ne memûr bûya ji zahirkirina neseba heq ra, qet ev kelîma şerîf naniya ser ziman; lê di qezaya îlahî da hetmî ye ku Nebiyê Xetmî (s.a.a) evê îşarê eşkere bike.

Çiko ne baqî bû di cezeba mutleqe da û xweyê meqamê berzexiyetê bû, kerem kir: «Allahu ehed - Xwedê yek û yekane ye". Allah ismê cami'ê e'zem û rebbê mutleqê xatem e, û bi 'eynê berzexî yê zêdahiya esmaî bi zuhûra wahidiyetê, 'eynê wê tecelliya xeybî ya xefayî bi meqamê ehediyetê ye. Di dilê salikê weha da, ne layê ehediyetê xurt dibe ser wahidiyetê, ne jî wahidiyet ser ehediyetê. Û pêşxistina Allah ser ehed, her çend navên zatî di îtibarê da muqedem in, belkî îşare be bal meqamê tecellî ya qelbê salik ve. Çiko di tecellî ya zatiye da ji qelbê weliyan ra yekem car tecelliya bi esmaê sifetiye çêdibe ku di hezretê wahidiyetê da ye û di pey ra bi esmaê zatî yê ehedî çêdibe.

Ji nav navan ku tenê navê «Allah» aniye -halhale bi hesebê çawaniya sulûkê û nexşê tecellî ya ewil bi mezahirên navê Allah, ku navên dî hemû ne, bi munasebeta qelbê salik mutecellî dibe, piştî wê di dûmahîka temamiyeta sulûkê da di esmaê sifetiye da tecellî dike bi ismê Allah- dikare îşare be bal yek ji van du nuktan ve: An îşare ye bal wê ve ku tecelliya bi her navekî tecelliya bi navê Allah e, ji pêka îtihada zahir û mezher; nexasima di hezretê

îlahiyetê da. An jî îşare be bal xayeta sulûka wahidî ve; ku heta ew çênebe û pêk neyê, salik dest sulûka ehedî nake.

Welhasil, gora vê gotinê, «Huwe – Ew», îşare ye bal meqamekî ve ku îşare û viyan/amala arifan ji wê hatiye birîn û dûr e ji ism û rezman û berî ye ji tecellî û zuhûran. Ehed jî îşare ye ji tecelliya bi esmaên navdeyî yên xeybiye. Allah jî îşare ye bi tecelliya bi esmaên zahiriye. Û bi van sê cem'an, îtibarên ewweliye yên hezretê rubûbiyetê bi cih tên. Çar navên dî jî ku «semediyet» cami'ê wa ye, gora hinek hedîsan[1] ji esmaên selbiye yê tenzîhiye ye, ku bi tebe' esmaê subûtiye yên cemaliye tên îtibar kirin. Çawa ku di biniya hedîsekî da îşare pê hatiye kirin.

Heta bi vêderê ku hat gotin, hingê ye ku bismillah muteeliq be bi kelîma şerîfe ya: «Qul – bêje»yê ve. Her weha çêdibe bi heryek ji piçên vî sûretî ve muteeliq bin. Hingê gora heryekî tefsîra sûret û bismillahê ferq dike. Çiko xeberdan vê der heqê da dibe sebebê dirêj bûnê, em jê xeber nadin.

Seydayê me yê ez gorî, arifê kamil Şahabadî, digota: «Hû – Ew», burhan e ji şeş nav û kemalên dî ra, ku di sûretê mubarekê tewhîdê da piştî vê kelîma pîroz hatine. Ji ber ku zatê muqedes çiko «Huwe - Ew» mutleq e ku îşare ye ji sirfê wucûdê ra, mustecmi'ê cemî'ê kemalên esma'a ye; ku Allah e. Û çiko sirfê wucûd bi heqîqeta besîte, hemû esma û ewsaf têda hene û ev zêdahiya esmaî xirabiyê nayinê ser wehdeta zatê muqedes, nexwe ehed e. Û çiko mahiyet ji sirfê ra nîne, nexwe semed e. Û çiko neqs û kêmasî ji sirfê ra çênabe û ji xêncî xwe nayê dest û tekrar û ducar ji wî ra çênabe, nexwe ne «walid» e û ne «mewlûd» û hember û kufwek jê ra nîne.

Gelek hedîs hene der heqê me'ne, remz û razên ku di semedê da heyîn ku anîna wan, wê me ji qeyda vê kitêbê derîne, lê vêderê ez ê nukteyekî tenê bêjim, ew jî ev e ku: Eger gora hinek îtibaran

---

1- Tewhîda Sedûq, b. 4, p. 91, h. 3-ê.

semed, îşare be ji nefsa mahiyetê ra û me'nên «Allah»ê di «Allahus semed»ê da ji îtibaratên meqamê wahidiyetê û meqamê ehediyeta cem'a esma'a ye. Û eger îşare be bal sifetê izafî ve, çawa ku ji hinek riwayetan tê dest, îşare ye bal ehediyeta cem'a esma'an di hezretê tecellî ya feyza muqedes ve, me'na wê jî rêketî ye gel «Allahu nûrus semawat»ê.

**Vebir: Tefsîra ayetên destpêka sûretê Hedîd**

Ayeta yekê: «Sebbehe lillahi ma fîs semawati wel erd…»[1] delîl e ku hemû tişt tesbîhên Xwedê didin, heta bi giya û bêcan jî. Eva he ku tesbîh taybetê xweyê aqilan be, ji wan hicaba ye ku ji xweyê aqilan ra her car çêdibe. Eger ev ayeta şerîfe, fereza qabilê tewîl be jî, ayeta dî ne qabilê tewîlê ye ku kerem dike: «Elem tere ennellahe yescudu lehu men fîs semawati we men fil erd, weşşemsu wel qemeru wen nucûm wel cibalu weşşeceru wed dewabbu we kesîrun minen nas».[2] Her wereng tewîla tesbîhan bi tesbîhên tekwînî an sirûştî ji wan tewîlên dûr û sar e, ku hedîs û ayetê şerîfe ewê qebûl nakin, xêncî ji wê jî vêca xilafê burhana cihgirtî ya hikemî û meşreba îrfanî ye. Ya ecêb ew e ku hekîmê mezin Sedrul Muteellihîn dibêje ku ew, evan tesbîhan bi awayê nutqî hesab nake û nutqa hinek bêcanan wek kuçhûrikan ji pêka inşa'a nefsa muqedes dihesibîne û gotina hinek ji ehlê marîfetê ku heyatek nutqî ji hemû mewcûdatan ra zanin, xilafê burhanê û mulazimê te'tîl û dewama qesrê jimartiye. Ev di halekî da ye ku ev gotin vajiyê binyatên ewî hêjayî ye. Û qet xirabî nayên ser vê gotinê û eger ne ji tirsa dirêjbûnê bûya me dê bi hinek pêşekiyan li ser xeber bida, lê niha em ê bi kurtî jê biaxivin.

Pêşda me got ku heqîqeta wucûdê hema 'eynî şu'ûr, ilm, îrade, qudret, heyat û şu'ûnên dî yên jiyanê ye, bi awayek wereng ku

1- Ewa di ezmanan û erdê da heyî, tesbîh û pakiya Xweda dibêjin.

2- Hec / 18: Ma tu nizanî ewa di ezmanan û erdê da heyî, roj, heyv, ster, çiya, dar, dûl û gelek ji xelkê ji Xweda ra diçin secde.

eger tiştekî qet ilm û saxî jê ra tunebe, ewê wucûd nîne. Û kesê heqîqeta esaleta wucûdê û îştiraka me'newî ya wê têgihabe, dikare tesdîq bike ku saxî û jiyan di hemû mewcûdata da heye bi hemû lazimiyên saxiyê ve; wek ilm û îrade û tekelum... her weha eger bigehê meqamê şuhûd û 'eyanê, wê teqdîs û tesbîhên mewcûdatan muşahide bike. Niha ku serxweşkirina tebîet çav û guh... yên me adet dane, nahêle em bi heqîqetan bihesin û çawa ku di navbera me û heq da hicab hene, bi wî awayî der heqê mewcûdên dî da jî, heta nefsa me bi xwe da hicab û perde hene, ku me bêxeber dike ji saxî û zanîn û tiştên dî yên wan. Lê ji hemû hicaban reqtir, hicaba wê înkarkirinê ye ku bi fikrên perdekirî çêdibe ku, mirov ji hemû tiştî paşda dide. Û baştirîn wesîle ji bona me yên perdekirî ew e ku mirov teslîm be, ayet û hedîsên ewliyayên Xwedê tesdîq bike û deriyê tefsîra bi re'yê bigire.

Fereza, eger tewîla ayeta tesbîhan bi tesbîhên tekwînî û fitrî çêbe jî, hingê em çi li vê ayetê bikin ku kerem dike: «Qalet nemletun ya eyyuhen nemlu udxulû mesakinekum la yehtimennekum Suleyman we cunûduh we hum la yeş'urûn».[1] An mesela firindê ku der heqê bajarê Seba da ji hezretê Suleyman (a.s) ra xeber anî, wê çawa be? Her weha gelek hedîsên dî ku ji Ehlê Beytê neqil bûne, qet nayên tewîl kirin, em ê çi lê bikin?

Welhasil, gereke herikîna jiyanê û tesbîhên bi agahî û zanîna tiştan ji lazimiyên felsefa aliye û musellematên erbabê şerî'et û îrfanê bêt zanîn. Lê çawaniya tesbîhên wan û taybetî ya her şiklekî bi yekî ve, ev girêdayî ye bi ilmê esma'an ve û berfirehiya zanîna wê jî bi ilmên keşfî ve girêdayî ye ku taybetê weliyên bilind mertebe ne.

Çawa me di vebira borî da gotî ku, besmela her sûretekî bi wî sûretî bi xwe ve girêdayî ye, li vir jî bi «sebbehe lillah» ve girêdayî ye. Ku der heqê mesela cebr û tefwîzê da mesleka ehlê heq jê îstifade dibe. Çiko herdu nisbet hene, yanî nisbeta bi ismê Allah ku

---

1- Neml / 18: Mêrûyekî got: Ey gelî mêrûyan! Herin malên xwe da, da Suleyman û leşkerên wî hewe neperçiqînin.

meqamê meşiyeta fiîliye ye û nisbeta bi tiştên di ezmana û erdê da heyîn. Û pêşxistina întisaba bi meşiyeta Xwedê ji bona têgihandina qeyûmiyeta Heq Teala ye. Eger ne tirsa ji dirêjbûnê bûya me wê bigota ku: Heqîqeta tesbîhê çi ye û çawa tesbîh mulazim e digel tehmîdê, her weha me wê bigota ku her tesbîh û tehmîdek ku ji musebibe û hemd çêdibin, ji bona Heq Teala ne, û me wê behsa taybetmendiya du navên «ezîz û hekîm» û nisbeta wan gel «Allah» û ferqa Allaha di besmelê da û ya di ayeta «sebbehe lillah» da hatiye, bigota û me wê behsa ezmana, erdê û ya di wan da heyî bikira û me wê bigota ku «Huwe» ya di vê ayetê da heyî, çi ferq heye gel «Huwe» ya «qul huwellahu ehed»ê. Lê mexseda me di vê kitêbê da ew e em hay ji kurtiyê bimînîn.

Ayeta şerîfe ya duwê jî: «Lehu mulkus semawati wel erd, yuhyî we yumît we huwe 'ela kulli şey'in qedîr»[1] îşare ye bal malikiyet û hukumdariya Heq Teala (c.c) ve ku xweyê melekût û heqîqeta ezmana û erdê ye, ji ber vê malikiyetê ye ku saxkirin û mirandin, girtin û berfirehkirin çêdibe. Eva he yanî teserufa temam, ku muntehayê tewhîda fiîlî ye û ji ber vê ye ku nisbeta saxkirin û mirandinê -ku yek ji teserufatên mezinên melekûtî ye, an hemû girtin û berfirehkirin in- daye bal malikiyeta zatê muqedes ve. Her çend saxkirin ji şu'ûnê rehmaniyetê ye û mirandin ji şu'ûnê malikiyetê, nisbeta herduka daye bal malikiyetê ve. Eva he çêdibe ji fêhmandina nukteyek mezin ya îrfanî ra be, yanî her navekî navên dî hemû di xwe da girtbin, bi awayê ehedî û wecheyê xeybê; ku niha derfeta beyana wê nîne. Ser û binê ayetê jî çêdibe îşare be bal wehdeta di zêdahî û zêdahiya di wehdetê da be, di meqamê tecellî ya fiîlî bi feyza muqedes, çawa ku li bal ehlê wê ronahî ye.

Ya eşkere ew e ku demîra «lehu – ji wî ra» li Allahê dizivire, çêdibe jî li Ezîz û Hekîmê bizivire. Lê hingê me'na ayeta şerîfe ferq

1- Hedîd / 2: Hukumdariya ezmanan û erdê ya wî ye, ew e ku sax dikê û dimirîne û hema ew e ku her karekî dikare bike.

dike ku bi melhezekirinê, ji ehlê wê ra ronahî dibe.

Beyana çawaniya malikiyeta Xwedê û anîna «yuhyî û yumît - sax dike û dimirîne»yê bi sîxeyê mudari', delîl e ser wê yekê ku ev kar ducar dibe. Merce'ê demîra «huwe» û ferqkirina me'nê bi muxtelif bûna cihê zivirîna demîrê û gotina vê yekê ku «saxker û mirandinker û qadir» ji esma'ê zat in, an ewsaf û ef'al. Gereke li cihê wê da jê bêt xeberdan, her weha çawaniya saxkirin û mirandinê û heqîqeta sûra Îsrafîl, du pifên saxkirin û mirandinê, şûnên hezretê Îsrafîl û Ezraîl û meqamê wan, çawaniya saxkirin û mirandina wan, gereke li cihê wê da jê bêt xeberdan ku her yekî bi dirêjî beyanek îrfanî û burhana hikmî jê ra heye.

Ayeta sisê jî ev e: «Huwel ewwelu wel axiru wez zahiru wel batin…»[1] Arif û zanayê ehlê marifet, yeqînê û salikê rêka ehlê dil, zanin ku nihayeta sulûka salikan û xilaseka arzûya arifan hema ev yek ayeta şerîfe ya muhkeme ye. Ez bi canê dost kim, ji heqîqeta tewhîda zatî û esmaî ra gotinek ji vê baştir tunehin. Heq e ku hemû ehlê mearifan ji vê îrfana temama Muhemmedî ra (s.a.a) û ji vê keşfa cami'a ehmedî ra li ber vê ayeta muhkeme ya îlahî serê xwe biçemînin û biçin secdê. Sond bi heqîqeta îrfan û evînê, ku bi bihîstina vê ayeta şerîfe hejandinek melekûtî di arifê meczûb û evîndarê cemala mehbûb da çêdibe ku ji qama beyanê der e û çi mexlûqekî taqeta bihîstina wê nîne. «Fesubhanellah ma e'zeme şe'neh…»[2]

Ew ên xeletiyê tînin ser xeberdanên arifên giranqedr û alimên îlahî û ewliyaên rehmanî, bila baş binhêrin ka kîjan arifê rebbanî an salikê meczûb zêdetirê ji vê ya ev ayet dibêje tiştek gotiye? Eve ev ayeta şerîfe û ev kitêbên tijî îrfana arifan. Gerçî destê arzûyan ji mearifên vî sûretî û nexasima eva ayetên destpêkê kurt

---

1- Hedîd / 3: Ew e ewwil û axir, zahir û batin, ew bi her tiştî zane.

2- Munezzeh û paqij Xweda ye, merteba wî çi bilind e û qudreta wî çi girîng e û qedrê wî çi mezin e û çiqas dûr e gihana izeta wî û dergahê wî çi bilind e.

e. Lê gora baweriya vî nivîserî evê ayetê, taybetiyek heye ku di ayetên dî da nîne. Û beyana ewweliyet û axiriyet, zahiriyet û batiniyeta Heq Teala tişteke ku nayê beyankirin û qelem newêre xwe li nivîsandinê biqewimîne, nexwe em desta bikêşin û fêhma wê bihêlin hêviya dilên muhibîn û weliyan ve.

Ayeta şerîfe ya çarê: «Xeleqes semawati wel erde fî sitteti eyyam...»[1] Îşare dike bal çêkirina ezmana û erdê di şeş rojan da û îstiwaya ser erşê. Aqil di tefsîra vê ayeta şerîfe da şaş in û her kesî gora ilm û îrfana xwe bi awayekî me'ne kiriye. Çawa ku zanayên zahir dibêjin: Eger bikeve di pîveka wext û zeman da wê gel şeş rojan rêk bikeve. Feylesofê giranqedr Sedrul Muteellihîn (r.a) ew rêk xistiye gel eyyamê rubûbiyetê, ku hezar sal e û şeş roj muntebiq kiriye gel zemanê hatina Adem heta demê derketina roja Muhemmedî (s.a.a) ku şeş hezar sal in. Û destpêka roja cum'ê, roja kombûnê, ku roja heftê ye, ewilê roja rabûnê û destpêka îstiwa'a rehman li ser erş, zaniye. Vê der heqê da di şerha Usûla Kafiyê da bi kurtî û di tefsîra xwe da bi dirêjî xeber daye. Û hinek ji ehlê zanînê meratibê seyra nûra roja wucûdê di mera ya nuzûl û su'ûdê da, şeş roj hesab kirine.

Bi hesebê mesleka îrfanî, mertebên nuzûla wucûdê heta dûmahîka nuzûlê ku merteba îhticaba şemsa wucûdê ye di hicabên te'eyyunata da û ew heqîqet, leyletul qedr e. Û destpêka roja qiyametê ji ewilîn merteba rucû'a mulk li melekûtê û xerqa hicabên te'eyyunatê heta axirîn merteba zuhûr û rucû'ê, ku zuhûra temam ya qiyameta kubra ye. Ev şeş roj ku çêkirina ezmana û erdê têda temam bûye û muntehî dibe bi Erşullah û Erşur Rehman, di alema mezin da meratibê şeşane yên pêlilçûnê ye û erşê îstiwaya Heq, ku zahir dibe bi qehariyeta tamme û malikiyetê, merteba meşiyet

---

1- Hedîd / 4: Ew e Xweda, yê ku ezmanan û erdê di şeş rojan da çêkirî, paşê xurt bûyî ser erş; [ew] ewa dikeve di erdê da zanê û ya jê derdikeve jî û ya ji ezmanan tê xwarê û ya di wê da pêlil diçe. Hûn li ku bin ew gel hewe ye û Xweda bîna ye bi wê ya hûn dikin.

û feyza muqedesa rehmanî ye ku zuhûra temama wê piştî rabûna te’eyyunatan û xilasiya ji xuliqandina ezmana û erdê ye. Û li bal ehlê marîfetê heta ku wucûda semawat û erdê heye, çêkirina wan temam nebûye, gora: «Kullu yewmin huwe fî şe’n»[1] û bi muqteza ‘edema tekerurê di tecelliyê da. Di însanê kebîr û alema ekber da meratibên şeşane û letîfa sab’e ya wê Erşur Rehman e ku merteba qelbê heqîqî ye. Û eger ne ji ber dirêjbûnê bûya min ê bigota ka çawa eva he ji gotinên dî munasibtir e. Gerçî ilmê kitêba îlahî li bal Heq Teala taybetê wa ye, yên xeberdan gel wan hatiye kirin; lê bi hesebê zahir û eşkereyê em xeber didin.

Li vêderê gotinek dî heye ku dijatî gel vê beyana îrfanî nîne. Ew gora heyeta zemanê hazir e ku heyeta Betlemyûs ji nav biriye. Ew jî ev e ku xêncî ji vê ziviroka rojî, ku me heye, gelek zivirokên rojî yên dî hene ku kes nikare ewa bijimêre -çawa ku di heyeta nû da bi dirêjî li ser hatiye xeberdan: Mexsed ji semawat û erdê hema ev ziviroka rojî û medara stêrên wê be. Û sînorkirina wan bi şeş rojan gora zivirokek dî ya rojî be. Gora eşkereyê, ev îhtimal ji hemûyan nêzîktir e û gel îhtimala îrfanî jî ne dij e. Çiko gora navdeyî, ew navdeyek ji navdeyên Quranê ye.

Biniya ayetê: «Ye'lemu ma yelicu fîl erd...» îşare dike bal ilm û zanîna piçpiçên meratibên wucûdê di silsila xeyb, şuhûd, nuzûl û su'ûdê da. Îşare dike bal me'iyyeta qeyûmî ya Heq ve û çawaniya pê ve girhana ilmê Heq Teala bi piçpiçê tiştan ve bi awayê îhata wucûdî û si’eya qeyûmî ye. Xêncî ji weliyên taybetên Xwedê, kes nikare heqîqeta vê qeyûmiyeta Heq Teala têbigehê û bizane.

Ayeta şerîfe ya pêncê: «Padişahiya ezmanan û erdê ya wî ye, karûbar jî bal wî ve tên zivirandin»[2] îşare ye bal malikiyeta Heq Teala ve û evê yekê ku her tişt li wî dizivire. Û îşare ye bal wê ve ku ev li navê «malik» dizivirê, çawa ku di sûretê mubarekê

1- Rehman / 29: Herdem bi karekî ve ye.

2- Hedîd / 5

Hemd da gotî: «Maliki yewmid dîn». Û jê xeberdana heryek ji van meselan ra mecalek dî lazim e.

Ayeta şerîfe ya şeşê: «Yûlicul leyle fin nehar we yûlicun nehare fil leyl...»[1] îşare ye bal îxtilafa şev û rojê ve û, evê yekê ku çiqas ji yekî kêm bibe, ser ya dî ve zêde dibe û bervajî. Û di vê ne wek yekbûnê da gelek feyde hene ku evder ne cihê gotina wa ye. Ji vê ayeta şerîfe ra me'neyek îrfanî jî heye, lê me jê xeber neda.

## Xilasek

Di binê vê hedîsê da ku dibêje: «Vêca kesê xêncî ji wê bixwaze, muheqeq li helakê çûye». Îşare ye bal wê ve ku ev ayetên he û sûretê mubarekê Tewhîdê, nihayeta zanînan têda heye û eger kesek goman bike zêdetirê ji van zanînan li bal kesekî heye, ew xelet bûye. Çiko ev heddê bilindê zanîna beşer e, qusûra ji vî heddî jî helaket û nenasîna meqamê rubûbiyetê ye.

Ev hedîs, teşwîq dike ku vê der heqê da mirov fikra xwe bêxe kar, lê her ilmekî ehlek heye û her meydanekî qehremanek. Bila neyê gomankirin ku mirov dikare bi fikra xwe û bi awayê orfî ayetên Tewhîdê fêhm bike -çi di sûretê mubarekê Tewhîdê da û çi ayetên sûretê Hedîd û çi ayetên dî yên Quranê, her weha hedîs, xutbe, dua û munacatên îmaman (a.s) ku tijî ne ji mearifan. Ev xeyalek vala û weswesa şeytanî ye ku evî rêbirî, dav li ser rêka mirovan vedaye ku ewa ji zanînê paşda bide û deriyê marîfet û hikmetê li ber mirov bigirê û ewa di dûl û geliyê şaşiyê da winda bike. Xwedê şahid e û ew ji şahidiyê ra bes e,[2] mexseda min ne ew e ku ez tenûra felsefe û îrfana resmî germ bikim. Belkî mexseda min ew e ku birayên îmanî yên min, nexasima ehlê ilmê hinekî binhêrin mearifên Ehlê Beytê û Qurana pîroz.

---

1- Hedîd / 6: Şevê dike nav rojê ra û rojê dike nav şevê ra û ew pir zana ye bi wê ya di dilan da.

2- Nisa / 79: We kefa bîllahî şehîda.

Ji bîr nekin ku rêkirina pêxemberan û kitêban, giraniya wê ji bona marîfetullahê bûye ku hemû bexteweriya dinya û axretê bi wê ve tê dest. Lê mixabin, heta ku mirov di vê alemê da di bin perdan da hatiye nixûmandin, nikare rêka bexteweriyê bibine. Çiqas enbiya, ewliya û ulema we'z û şîretan dikin û gazî dikin jî, mirov ji xew hişyar nabin û penbûyê xefletê ji guh dernayinin. Hingê wê ji xewa bêxeberiyê hişyar bibin ku sermaya dest ve anîna bexteweriyê ji dest derkeve û ji xem û poşmaniyê pê ve tiştek dî nemîne.

**Dua û dûmahî**

Ey Xwedayê ku te dilê weliyan bi nûra muhabeta xwe ronahî kirî û te zimanê evîndarên cemalê ji me û min paşda dayî û te bêqîmetên xwexwaz ji xwe dûr kirî, me ji vê hêçî û serxweşiya dinyayê derîne. Me ji xewa giran ya tebîet hişyar bike û perdên stûrên xwexwazî û xweperestiyê bidirîne. Me bike layiqê mehfila paqijên dergahê xwe û civata paka muxlisên Xwedêxwaz. Sifetê neguhdarî, pîsî, nebaşî, riyayî û xwehriyê ji me bibe. Û bizav, rawestan, kar û kiryarên me, destpêk û dûmahîk, eşkere û navdeyê me hevrê bike gel îxlas û hezkirina xwe.

Ey Xwedê! Danên te bê xwestin in û xilasek jê ra nîne. Deriyê rehmet û merhemeta te vekiriye û xwana nîmetên te bêbinî û pehn e. Dilek bêtebat û halek perîşan, dilek xemdar û çavek bi giriyan, serek bêtebat û singek bi şewat merhemet bike. Dûmahîka karê me bi îxlasa ji xwe ra û hezkirina taybetiyên dergahê xwe, yanî dîbaca deftera wucûdê û xetma xeyb û şuhûdê, Muhemmed (s.a.a), Al û Ehlê Beyta wî yên pak (a.s) bi dûmahî bîne.

Destpêk û xilasek, eşkere û veşartî hemû yê Xwedê ye. Û hemd û sipas taybetê wî ne.

Pirtûk, êvara roja îniyê, çarê meha Muherremê sala 1358 hicrî qemerî (heyvî) bi destê vî yê fanî; nivîserê jar, xilas bû. Di destpêk û axirîkê da pişta me bi Xwedê germ e.

## NAVEROK


**PÊŞGOTIN** ........................................ 5

**HEDÎSA YEKÊ** ........................................ 7

Şerh: ........................................ 17

Meqamê yekê: Neş'eta mulk û eşkere ........................................ 18

*Vebir: Îşare bal meqamê ewil yê nefsê ve* ........................................ 18

*Vebir: Der heqê tefekurê da ye* ........................................ 19

*Vebir: Der heqê biryar û ezmê da ye* ........................................ 20

*Vebir: Muhimiya biryar a terka bê emriyan û pêkanîna wezîfan* ........................................ 21

*Vebir: Der heqê muşarite û muraqibe û muhasibe da ye* ........................................ 22

*Vebir: Der heqê bîranînê (tezekur) da ye* ........................................ 23

Meqamê duwê ........................................ 25

*Vebir: Der heqê şerê leşkerê navdeyî yê rehmanî û yê şeytanî da ye* ........................................ 25

*Vebir: Hinek hêzên navdeyî* ........................................ 28

*Vebir: Der heqê pêşgirî ya pêxemberan ji serberedayiyê da ye* ........................................ 30

*Vebir: Der heqê kontrola xeyalê da ye* ........................................ 31

*Vebir: Der heqê muwazeneyê da ye* ........................................ 32

*Hasilê hedîsê ev e:* ........................................ 38

*Vebir: Der heqê îlaca exlaqên pîs da ye* ........................................ 39

*Vebir: Çareya exlaqnebaşiyê* ....................................................................41

**HEDÎSA DUWÊ** .................................................................................................43

*Vebir: Der heqê riyayê û derecên wê da*...........................................................43

Meqamê yekê: Riya di baweriyê da .................................................................44

*Vebir: Heqîqeta riyayê* .......................................................................................44

*Vebir: Der heqê vê da ku ilm xêncî ji îmanê ye*...............................................45

*Vebir: Xetera karê riyayê* ....................................................................................47

*Vebir: Hişyariyek ilmî ji binbir kirina madda riyayê ra* ..................................47

*Vebir: Gazîkirin ji îxlasê ra*...................................................................................50

Meqamê duwê: Riya di exlaq û melekatên navdeyî da...............................53

*Vebira yekê: Kêşeka riyazetên heqanî û nefsanî*..............................................53

*Vebira duwê: Settariyeta Heq Teala ne pêşîgirê xeyûriyeta wî ye* ...................54

Meqamê sisê: Riya di amel da ..........................................................................56

*Vebira yekê: Têkeliya şeytan di îbadet da*.........................................................56

*Vebir: Hûriya mesela riyayê* ...............................................................................56

*Vebir: Der heqê beyana hedîsa hezretê Alî (a.s) da ye*......................................64

Tetimme: Sum'e ..................................................................................................67

**HEDÎSA SISÊ** .......................................................................................................69

Şîrove:.......................................................................................................................69

*Vebir: Mertebeyên ucbê* .......................................................................................71

*Vebir: Ehlê xirabiyê jî carna ji ber xirabiya xwe ecêbgirtî dibin*......................73

*Vebir: Pîvek ji hîleyên şeytan ra heye* ................................................................74

*Vebir: Xirabiyên ucbê* ............................................................................................76

*Vebir: Serçavka ucbê hezkirina ji nefsê ye* ........................................................80

**HEDÎSA ÇARÊ** ........................................ **87**

Şîrove: ........................................ 87

*Vebir: Der heqê derecên kibrê da ye* ........................................ *88*

*Vebir: Der heqê sebebê eslî yê tekeburê da ye* ........................................ *90*

*Vebir: Mefsedên tekeburê* ........................................ *94*

*Vebir: Der heqê hinek ji sebebên tekeburê da ye* ........................................ *98*

*Vebir: Der heqê dermanê tekeburê da ye* ........................................ *103*

*Vebir: Carna hesed destpêka tekeburê ye* ........................................ *110*

**HEDÎSA PÊNCÊ** ........................................ **113**

Şîrove: ........................................ 113

*Vebir: Der heqê hinek ji sebebên hesedê da ye* ........................................ *114*

*Vebir: Der heqê hinek xirabiyên hesedê da ye* ........................................ *116*

*Vebir: Der heqê reh û rîşe ya fesadên exlaqî da ye* ........................................ *120*

*Vebir: Der heqê dermankirina amelî ya hesedê da ye* ........................................ *122*

*Vebir: Der heqê hedîsa ref' da ye* ........................................ *123*

**HEDÎSA ŞEŞÊ** ........................................ **125**

Şîrove: ........................................ 125

*Vebir: Gotina Meclisî der heqê heqîqeta dinya xirab da* ........................................ *126*

*Vebir: Sebebên zêdebûna huba dinyayê* ........................................ *128*

*Vebir: Esera behrên dinyewî di dil da û xirabiyên wê* ........................................ *130*

*Vebir: Sirûşta kemalxwazî û işqa sirûştî bi cemalê* ........................................ *134*

**HEDÎSA HEFTÊ** ........................................ **139**

Şîrove: ........................................ 139

Gotara Ibn Miskiweyh di te'rîfa xezebê da ........................................ 139

*Vebir: Der heqê feydên quwe ya xezebiye da ye* ....................................140

*Vebir: Der heqê xirabiya zêdegavî ya di xezebê da ye* ..........................142

*Vebir: Der heqê îlac û derman kirina xezebê da ye* ...............................145

*Vebir: Der heqê îlaca xezebê da ye bi rakirina sebeban* ........................147

**HEDÎSA HEŞTÊ** ....................................................................................**151**

Şerh û şîrove: ............................................................................................151

*Vebir: Mefsedeyên esebiyetê* ..................................................................152

*Vebir: Der heqê sûretê melekûtî yê esebiyetê da ye* ..............................154

*Vebir: Der heqê esebiyetên ehlê ilmê da ye* ............................................157

**HEDÎSA NEHÊ** ......................................................................................**159**

Şîrove: ......................................................................................................159

*Vebir: Der heqê meratibên nifaqê da ye* .................................................160

*Vebir: Şiklê melekûtî yê nifaqê* ...............................................................161

*Vebir: Dermanê nifaqê* .............................................................................162

*Vebir: Hinek qismên nifaqê* .....................................................................163

**HEDÎSA DEHÊ** ......................................................................................**169**

Şîrove: ......................................................................................................169

Meqamê yêkê: Zemma peyketina hewayê nefsê ......................................170

*Vebira yekê: Di despêkê da însan heywanê bilfiîl e* ..................................170

*Vebira duwê: Zemma peyketin a bayê dil* ...............................................172

*Vebira sisê: Der heqê jimara hewa yên nefsê da ye* ..................................174

Meqamê duwê: Dirêjiya Emelê ...............................................................175

*Vebir: Arzûyên dirêj, axretê ji bîr dibin* ...................................................175

*Vebir: Sefera pirxeter û lazimiya zad û rahilê* .........................................176

**HEDÎSA YAZDEHÊ** .......... **179**

Şîrove: .......... 179

*Vebir: Der heqê me'na fitretê da ye* .......... *180*

*Vebir: Der heqê pê hesana hukmên fitretê da ye* .......... *180*

*Vebir: Îşareyek giştî bal hukmên fitretê ve* .......... *181*

Meqamê yekê .......... 182

*Eslê hebûna mebdeê mute'al ji fitriyatê ye* .......... *182*

Meqamê duwê .......... 185

*Tewhîda Xwedê û sifetên wî yên dî sirûştî ne* .......... *185*

Meqamê sisê .......... 186

*Mead ji meseleyên sirûştî ye* .......... *186*

**HEDÎSA DUWAZDEHÊ** .......... **189**

Şîrove: .......... 189

*Vebir: Der heqê başiya tefekurê da ye* .......... *191*

*Tetmîm, tefekura erîtî û nerîtî di zatê Xwedê da* .......... *192*

*Vebir: Der heqê fikirkirina di aferîde da ye* .......... *196*

*Vebir: Der heqê fikirkirina di ehwalê nefsê da ye* .......... *198*

*Vebir: Başiya hişyarî ya di şevê da* .......... *203*

*Vebir: Der heqê teqwayê da ye* .......... *206*

*Vebir: Der heqê teqwaya giştî da ye* .......... *207*

**HEDÎSA SÊZDEHÊ** .......... **211**

Şîrove: .......... 211

*Vebir: Der heqê me'na tewekulê û dereceyên wê da ye* .......... *212*

*Vebir: Der heqê ferqa tewekul û razîbûnê da ye* .......... *215*

*Vebir: Ferqa tefwîz, tewekul û pê baweriyê* ....................................................216

**HEDÎSA ÇARDEHÊ** ....................................................................................219

Şîrove: ....................................................................................220

*Vebir: Mirovê arif du nêrîn hene* ....................................................220

*Vebir: Qusûra mexlûq ji îbadetê Xwedê ra* ....................................................222

*Vebir: Der heqê ferqa reca û xurûrê da ye* ....................................................225

*Vebir: Der heqê muwazina xewf û recayê da ye* ....................................................227

**HEDÎSA PANZDEHÊ** ....................................................................................229

Şîrove: ....................................................................................229

*Vebir: Îmtihan û çawaniya nisbeta wê bal Xwedê Teala* ....................................................230

*Vebir: Dijwariya îmtihana pêxember, wesî û muminan* ....................................................232

*Vebir: Nexweşiyên cismanî yên pêxemberan (a.s)* ....................................................236

*Vebir: Dinya ne cihê xêr û cezadana Xwedê Teala ye* ....................................................237

*Vebir: Dijwariya bela yên ruhî gorekî têgihanê ye* ....................................................239

**HEDÎSA ŞAZDEHÊ** ....................................................................................241

*Vebir: Esareta şehwetê serçavka hemû esareta ye* ....................................................242

*Vebir: Peyketina şehwetê pêşîgirê me'newiyetê ye* ....................................................245

*Vebir: Me'na sebrê* ....................................................246

*Vebir: Desthatên sebrê* ....................................................249

*Vebir: Dereceyên sebrê* ....................................................251

*Vebir: Der heqê dereceyên sebra ehlê marîfetê da ye* ....................................................253

*Heqîqeta tewbê* ....................................................257

Nukteyek muhim û girîng ....................................................................................259

*Vebir: Der heqê erkanê tewbê da ye* ....................................................259

*Vebir: Der heqê şertên tewbê da ye* ....................261

Netîceya îstixfarê ....................266

Me'na tewbe ya nesûh ....................267

Xilasek: Hemû tiştî zanîn û jiyan heye ....................268

**HEDÎSA HIJDEHÊ ....................270**

Şîrove: ....................271

Qeyûmiyeta Xwedê Teala ....................271

*Vebir: Xwedê bîne bîr, da Xwedê jî te bîne bîr* ....................272

*Vebir: Der heqê ferqa tefekur û tezekurê da ye* ....................274

*Vebir: Zikrê tam ew e, ku hukmê wê di bedenê hemûyê da cih girtibe* ....................275

*Vebir: Hinek hedîs der heqê başiya zikir da* ....................277

**HEDÎSA NOZDEHÊ ....................280**

Şîrove: ....................280

*Vebir: Der heqê te'rîfa xeybetê da ye* ....................281

*Vebir: Der heqê mezinahiya gunehê xeybetê da ye* ....................283

*Vebir: Der heqê zererên civakî yên xeybetê da ye* ....................288

*Vebir: Der heqê derman kirina xeybetê da ye* ....................290

*Vebir: Dema xeybet caiz e jî, xeybet nekirin baştir e* ....................292

*Vebir: Guhdana xeybetê heram e* ....................294

*Tetmîm: Gotina Şehîdê Duwê* ....................295

**HEDÎSA BÎSTÊ ....................298**

Şîrove: ....................299

*Vebir* ....................299

Îşare bi çawaniya nisbeta îbtilaê bal Xwedê Teala ve ....................300

*Vebir: Xeşiyet û niyeta rast dibe sebebê duristiya kar û amel* ........................301

*Vebir: Der heqê îxlasê da ye* ........................305

*Vebir: Der heqê îxlasa piştî amelê da ye* ........................306

**HEDÎSA BÎST Û YEKÊ** ........................**312**

Şîrove: ........................313

*Vebir: Me'na îrfanî ya ayeta pîroz* ........................316

*Vebir: Der heqê heqîqeta şukrê da ye* ........................319

*Vebir: Der heqê çawaniya şukrê da ye* ........................321

*Tekmîle: Der heqê başî û seratiya şukrê da ye gorekî hedîsan* ........................323

Tetmîm ........................325

*Vebir* ........................325

**HEDÎSA BÎST Û DUWÊ** ........................**330**

Şîrove: ........................331

Heqîqeta bihişt û dojehê ........................335

Şeytan xelkê bi rehmeta berfireha îlahî hêç dike ........................337

**HEDÎSA BÎST Û SISÊ** ........................**340**

Şîrove: ........................341

*Vebir: Ilm ji aliyê Xwedê ve ye û tehsîl ji mu'iddata ye* ........................343

*Vebir: Der heqê xirabiya xirecirê* ........................346

*Vebir: Nîşanên xwexwazan* ........................349

*Vebir: Nîşanên aqilmend û têgehiştiyan* ........................352

**HEDÎSA BÎST Û ÇARÊ** ........................**354**

Şîrove: ........................355

*Vebir: Zanînên munasib*......355

*Vebir: Zanînên sêyane; bawerî, exlaq û fiqih*......360

*Vebir: Ayet û nîşan pîveka zanînê ye*......362

*Vebir: Ev hedîs gora lêkolîna feylesofê mezin*......365

*Vebir: Gelek ji zanistan dikevin bin van sê zanistan*......366

**HEDÎSA BÎST Û PÊNCÊ**......**368**

Şîrove:......368

*Vebir: Çawaniya tehareta pakan*......370

*Vebir: Çareya ilmî û amelî ya weswasê*......374

**HEDÎSA BÎST Û ŞEŞÊ**......**378**

Şîrove:......379

*Vebir: Yê li pey zanînê bi aliyê bihiştê ve diçe*......379

Nukteyek muhim......380

*Vebir: Melaîket baskên xwe li ber talibê ilmê radixin*......381

*Vebir: Daxwaza lêborînê ji peyketê zanînê ra*......383

*Vebir: Alim wek heyva di şevên bedrê da ye*......385

*Vebir: Zana warisên pêxembera ne*......387

**HEDÎSA BÎST Û HEFTÊ**......**390**

Şîrove:......390

*Vebir: Xwe valakirin ji bo îbadetê*......391

*Vebir: Mertebe û dereceyên haziriya dil*......396

Rêka hazirbûna dil......400

Valabûna ji îbadet ra sebebê dewlemendiya dil......406

Nukte......409

**HEDÎSA BÎST Û HEŞTÊ..........410**

*Vebir: Der heqê liqaya Xwedê û çawaniya wê da ye..........411*

*Vebir: Kifşbûna hinek ji veşartiyan di wextê mirinê da..........416*

*Vebir: Me'na hezkirin û kerbê Xwedê Teala..........420*

**HEDÎSA BÎST Û NEHÊ..........422**

Şîrove:..........423

Pêşekî..........424

Xirabiyên derewê..........425

*Vebir: Heqîqeta were'ê û dereceyên wê..........428*

*Tetmîm : Xirabiyên xiyanetê û heqîqeta emanet..........430*

*Vebir: Îşare bi hinek emanetên Heq Teala..........433*

*Vebir: Tirsa ji Xwedê Teala..........434*

*Vebir: Wekyek nebûna xelkê..........436*

*Vebir: Başiya giriyê..........437*

*Vebir: Başiya pir ji ber amelê kêm ve..........438*

*Vebir: Der heqê hêjmara nafilan da ye..........440*

*Vebir: Sunetbûna sê roj rojî di her heyvekî da..........441*

*Vebir: Başiya sedeqê..........442*

*Vebir: Nukteyek dîtir..........444*

*Vebir: Yek ji remz û razên sedeqê..........445*

Tetimme..........446

Xilaseka vê gotinê..........446

*Vebir: Nimêja şevê; tehecud..........447*

Nimêja navîn..........448

*Vebir: Der heqê xwendina Quranê da ye* ........ *450*

Îbadet eserê li ciwan dike ........ 452

Edebên xwendin a Quranê ........ 452

Îxlasa di xwendinê da ........ 453

Me'na tertîlê ........ 455

*Vebir: Bilind kirin û ziviranda desta di nimêjê da* ........ *456*

Remz û raza bilind kirina destan ........ 457

Hişyariyek der heqê hîleyeka şeytan da ........ 458

*Vebir: Der heqê miswakê da ye* ........ *459*

*Vebir: Binyatên exlaqê qenc û xirab* ........ *460*

**HEDÎSA SIYÊ ........ 464**

Şîrove: ........ 465

Pêşekî: Duristkirina dil ........ 466

*Vebir: Teqsîma dil der heqê çi da ye* ........ *467*

Hegera hesra dilan da ........ 468

Wez' û halê dilan ........ 468

Dilê mumin ezher e ........ 469

Bawerdar ser rêka rast û durist e ........ 469

*Vebir: Hîle pîlên şeytan* ........ *470*

Tetmîm: Behsa qelbê minafiq û qelbê mumin ........ 472

Xitam: Xefleta ji heq vajîbûna dil e ........ 473

**HEDÎSA SÎ Û YEKÊ ........ 476**

Şîrove: ........ 477

*Vebir: Mexsed ji tewsîf nekirina Heq Teala çi ye* ....................................477

Nasîna heqîqeta esma û sifetan ne mumkin e ....................................480

*Vebir: Heqîqeta ruhanî ya enbiya bi fikrê nayê dest* ....................................480

*Vebir* ....................................482

*Vebir: Hêlana meselê bi hêviya Resûlê Xwedê ve* ....................................484

Îşara kurt bal me'na tefwîzê ve ....................................486

*Vebir: Der heqê meqamên îmaman da ye* ....................................487

Heqîqeta îsmetê ....................................488

*Vebir: Îman nayê wesifdan* ....................................489

**HEDÎSA SÎ Û DUWÊ ....................................492**

Şîrove: ....................................492

*Vebir: Muqederbûna rizq* ....................................493

Hedîsên pişk kirina rizq û baştiriya peyketinê ....................................494

*Vebir: Nîşanên yeqîn a durist* ....................................495

Xelk du bir in ....................................496

*Vebir: Gotina Mutezile, Eşairan û ya durist* ....................................497

*Vebir: Rehetî di yeqînê da û perîşanî di terdîdê da ye* ....................................498

**HEDÎSA SÎ Û SISÊ ....................................500**

Şîrove: ....................................500

Cem'a hedîsên teşwîq û vajiyê wan ....................................501

Wilayeta Ehlê Beytê şertê qebûlî ya amela ye ....................................507

**HEDÎSA SÎ Û ÇARÊ ....................................510**

Şîrove: ....................................511

Tenbîh ........................................................................................................513

*Vebir: Der heqê nisbetdana terdîdê bal Heq Teala ve*......................................513

Me'na îrfanî.................................................................................................514

Tetmîm: Me'neyek dî ji hedîsa terdîdê ..........................................................517

*Vebir: Xwedê bi neyîn û heyînê bawerdaran durist dike*................................518

*Vebir: Nêzîk kirina ferz, sunetan û desthata wê* ..........................................519

Sirra ne wekyekbûna pêxemberiya pêxemberan ..........................................521

*Vebir: Gêrana kelamê Şêx Behaî yê giranqedr* ...............................................522

Kelamê Muheqiqê Tûsî ..................................................................................523

Tetimme ........................................................................................................524

**HEDÎSA SÎ Û PÊNCÊ..........................................................................................526**

Şîrove:............................................................................................................526

*Vebir: Du meqam ji navên Xwedê ra hene* .....................................................527

*Vebir: Îşare bal mesela cebr û tefwîzê ve*........................................................528

*Vebir: Xwedê ji ya dike ne berpirs e, yên dî berpirs in* ..................................530

**HEDÎSA SÎ Û ŞEŞÊ..............................................................................................534**

*Vebir: Yekbûna sifetan gel zat*...........................................................................535

Kelamê hekîman der heqê teqsîma sifetên Heq Teala da ..........................536

'Eyniyeta sifetan gel zat ................................................................................537

*Vebir: Zanîna pêş çêkirinê da* ...........................................................................538

*Vebir: Sem' û beserê Heq Teala*........................................................................541

*Çawaniya pê vegirhana zanîna Xwedê bi me'lûmatan ve* ............................543

*Vebir: Mîzana sifetên subûtî û selbî*..................................................................544

**HEDÎSA SÎ Û HEFTÊ ..........................................................................................548**

Şîrove: ........................................ 548

*Vebir: Mexsed ji «Xwedê bi Xwedê ve nas bikin»* ........................................ *550*

**HEDÎSA SÎ Û HEŞTÊ ........................................ 556**

Şîrove: ........................................ 556

*Vebir: Adem, mezherê temamê îlahî ye* ........................................ *559*

**HEDÎSA SÎ Û NEHÊ ........................................ 562**

Şîrove: ........................................ 562

Vejenîna xêr û şerrê ........................................ 564

*Vebir: Xêr û şer girêdayê bi îcad ve ne* ........................................ *566*

Şer di qezaya îlahî da ........................................ 566

*Vebir: Herikandina xêr û şerran bi destê evdan* ........................................ *568*

Betalkirina cebrê ........................................ 569

Şîrove: ........................................ 572

*Vebir: Kurteyek ji tefsîra sûretê pîrozê Tewhîdê* ........................................ *574*

Îşare bal bismillahê ve ........................................ 574

*Vebir: Tefsîra ayetên destpêka sûretê Hedîd* ........................................ *578*

Xilasek ........................................ 584

Dua û dûmahî ........................................ 585